# ÎNCÎL

## MIZGÎNÎ

Kitab-ı Mukaddes Şirketi

# ÎNCÎL

## (Mizgînî)

Kitab-ı Mukaddes Şirketi

Bütün hakları saklıdır. Telif hakkı sahiplerinin yazılı izni olmadan bu yayının
herhangi bir biçimde basılıp çoğaltılması (fotokopi yoluyla çoğaltılması,
bilgisayar ortamında kullanılması, kaset veya CD'ye kaydedilmesi dahil) yasaktır.
Kitabın metnini yukarıda anılan herhangi birbiçimde kullanmak isteyenler,
telif hakkı sahiplerinin yazılı izni için yayıncıya başvurmalıdır.
Kaynağını açıkça belirtmek koşuluyla 100 (yüz) ayeti geçmeyen,
Yeni Antlaşma kitaplarından birinin tamamını içermeyen alıntılar için,
telif hakkı sahiplerinden yazılı izin alma sorunluluğu yoktur.

ÎNCÎL (Mizgînî) © UNITED BIBLE SOCIETIES

Bu kitabın tüm yayın hakları Kitabı Mukaddes Şirketi'ne aittir.

ISBN: 975-462-056-3

3 M

Kitabı Mukaddes Şirketi
İstiklal Cad. No: 481 Tünel, Beyoğlu, İSTANBUL
Tel: 0 212 244 20 60
e-mail: info@kitabimukaddes.com
www.kitabimukaddes.com

Basım: Anadolu Ofset
Tel: 0 212 567 13 89
Eylül, 2005

# *NAVEROK*


*Pêşgotin* ........ *iv*

*Mizgîniya Îsa Mesîh li gor Metta* ........ *1*
*Mizgîniya Îsa Mesîh li gor Marqos* ........ *70*
*Mizgîniya Îsa Mesîh li gor Lûqa* ........ *111*
*Mizgîniya Îsa Mesîh li gor Yûhenna* ........ *180*

*Karên Şandiyan* ........ *229*

*Nameya Pawlos a ji Romayiyan re* ........ *291*
*Nameya Pawlos a pêşî ji Korîntiyan re* ........ *319*
*Nameya Pawlos a diduyan ji Korîntiyan re* ........ *345*
*Nameya Pawlos a ji Galatiyan re* ........ *362*
*Nameya Pawlos a ji Efesiyan re* ........ *372*
*Nameya Pawlos a ji Filîpiyan re* ........ *381*
*Nameya Pawlos a ji Kolosiyan re* ........ *388*
*Nameya Pawlos a pêşî ji Selanîkiyan re* ........ *395*
*Nameya Pawlos a diduyan ji Selanîkiyan re* ........ *401*
*Nameya Pawlos a pêşî ji Tîmotêyos re* ........ *405*
*Nameya Pawlos a diduyan ji Tîmotêyos re* ........ *413*
*Nameya Pawlos a ji Tîtos re* ........ *419*
*Nameya Pawlos a ji Filêmon re* ........ *423*

*Nameya ji Îbraniyan re* ........ *425*

*Nameya Aqûb* ........ *448*
*Nameya Petrûs a pêşî* ........ *456*
*Nameya Petrûs a diduyan* ........ *465*
*Nameya Yûhenna ya pêşî* ........ *470*
*Nameya Yûhenna ya diduyan* ........ *478*
*Nameya Yûhenna ya sisiyan* ........ *480*
*Nameya Cihûda* ........ *482*

*Peyxama Yûhenna* ........ *485*

*Ferheng* ........ *519*

*Nexş* ........ *553*

# PÊŞGOTIN

*Kitêba Pîroz ji du beşan pêk tê: Peymana Kevin û Peymana Nû. Xwedê bi peymanan bi mirovan re têkilî daniye. Peymanên di Kitêba Pîroz de, ne li ser bingeha lihevkirina du aliyan e, lê rasterast ji qencî û kerema Xwedê tên. Ev peyman keremên Xwedê yên ji mirovan re ne û ew gerdûnî ne. Mirov nikare tiştekî ji wan kêm bike û ne jî li ser wan zêde bike. Ev peyman herheyî û ji bo hemû deman in.*

*Xwedê bi destê Mûsa Peymana Kevin (Tewrat) bi Cihûyan re girêda û bi vî awayî bi wan re têkilî danî. Heçî Peymana Nû ye, ew ne tenê ji Cihûyan re, lê ji hemû mirovan re hat dayîn. Xwedê ew soza ku bi Peymana Kevin dabû bav û kalan, bi Peymana Nû temam kir.*

*Nivîsandina Peymana Kevin bi qasî hezar salî kişand. Nivîsîna Peymana Nû ji sed salî kêmtir kişand. Herdu peyman jî bi peyxama Xwedê hatine nivîsîn. Peymana Nû ya ku di nav gel de bi navê Mizgînî (Încîlê) tê zanîn, ji gotina Yewnanî «EVANGELIYON» tê. Mana vê gotinê bi Kurdî «MIZGÎNÎ» ye.*

*Peymana Nû ji 27 kitêban pêk tê. Ev bi giştî li ser çar mijaran e, ku hevdû temam dikin.*

***1.** Jiyana Îsa Mesîh ji aliyê çar nivîskarên bi navê Metta, Marqos, Lûqa û Yûhenna ve hat nivîsîn. Nivîskar hem bi çavê xwe ji bûyeran re bûn şahid û hem ji kesên ku dîtibûn agahî civandin. 150 salan piştî Îsa, ev nivîsên ha tev bi hev re hatin weşandin.*

***2.** Di Karên Şandiyan de ew tiştên ku piştî hilkişîna Îsa ya ezmanan çêbûn, ji aliyê Lûqa ve hatine nivîsîn. Îsa Mesîhê ku vejiya û hilkişiya ezmanan, Ruhê Pîroz ji bawermendan re şand. Kitêb bûyerên li ser pêkhatina civîna bawermendan û belavbûna wê dide.*

***3.** 21 nameyên ku Şandiyên Îsa Mesîh nivîsîne, li ser mirina Îsa, rabûna wî, çûna wî ya ezmanan û hatina wî ya diduyan disekinin û xuya dikin ku ev bi çi awayî bandûra xwe li ser jiyana bawermendan nîşan didin. Pawlosê Şandî 13 ji van nameyan ji civînên bawermendan ên hin cihan û ji hin kesan re*

*nivîsîne. Her heşt nameyên din ji bawermendên ku li gelek derên cihê belav bûne re hatine nivîsîn. Naveroka her nameyê li ser jiyana pîroz û pirsgirêkên rojane ye.*

*Xwedê ew e yê ku gunehkaran bi kerema xwe paqij dike. Mirov bi gunehkariya xwe ve nikare li ber pîroziya Xwedê bisekine. Dilê Xwedê bi mirovên gunehkar dişewite, loma wî ji mirovan re bi destê Xilaskar Îsa Mesîh rê vekiriye, ku ji gunehên xwe rizgar bibin.*

*4. Mijara Peyxama Yûhenna ya bingehî, li ser bûyerên dema dawî ye (eskatologiya). Naveroka wê li ser pêxemberîtiyên hatina Mesîh ya cara diduyan e.*

*Xwedayê ku di Kitêba Pîroz de tê diyarkirin, xwe bi pîrozî û karên hêzdar dide naskirin. Îcar ew Xwedayê ku di Peymana Kevin de xwe bi karên mezin dide nîşandan, di Peymana Nû de, bi karên hê hêzdartir xwe di şexsê Mesîh de kifş dike. Gelek pêxemberîtiyan hê ji berê ve hatina Îsa Mesîh a vê dinyayê ragihandine. Yûhennayê ku bi şahidî hatibû şandin, Îsa Mesîh bi her kesî da naskirin û rûmeta Îsa jî bi karên wî yên hêzdar hat dîtin. Îsa bi destê mirovên dîn û Romayiyên serwer hat xaçkirin, mir, piştre hat veşartin, roja sisiyan vejiya û piştî çil rojan hilkişiya ezmanan. Ev bûyera ku bi daxwaza Xwedê pêk hat, di nav Xwedê û mirovan de aştî* çêkir û wek danezana jiyana herheyî belav bû.*

*Ev 27 kitêb pêşî bi Yewnaniya kevin hatin nivîsîn. Di nîvê sedsala diduyan de ji aliyê civînên ruhanî ve hatin bi kar anîn. Di dora sala 200î de, dest pê kir, li zimanên din hatin wergerandin. Bi vî awayî komên bawermendan ên cihê, ew bi zimanên xwe xwendin.*

*Wergera di destê we de ji zimanê bingehî, ji Yewnanî[1] hatiye wergerandin û bi gelek wergerên zimanên din re hatiye rûbirûkirin.*

---

[1]*Binêre: The Greek New Testament 4th edition, United Bible Societies, Stuttgart, 1994, ISBN 3-438-05113-3. Di vê wergerê de ayetên ku li gor zanyarên UBSê pirsên girîng li ser nivîsîna wan a eslî hene, bi jêrenotan hatine nîşandan.*

## *BIKARANÎNA KITÊBÊ*

*Ji bo ku hûn baş ji kitêbê feydê bistînin, em li we pêşniyar dikin ku hûn diyarkirinên jêr bigirin ber çavê xwe:*

*Bîst û heft kitêbên Peymana Nû, her yek bi pêşgotineke ku ji aliyê wergeran ve hatiye amadekirin, dest pê dikin. Di van pêşgotinan de agahiyên li ser kitêbê cih distînin. Kitêb bi serî (beş) û ayetan hatine cihêkirin.*

*Di jêrenotan de jêgirên ku ji Peymana Kevin hatine standin, tên dayîn. Mesela Metta 1:23, ji Peymana Kevin, ji kitêba Îşaya 7:14 hatiye standin û di nav neynokan (« ») de hatiye dayîn. Dîsa Metta 2:6, ji Mîxa 5:1-3 hatiye standin. Ev jêrenot bi herfên a b c hatine nîşandan.*

*Jêrenotên ku cihê bûyerên di Peymana Kevin de nîşan didin jî hene. Mesela Îsa Mesîh li ser Sodom û Gomorayê got (Metta 10:15) û ew serhatî di Peymana Kevin, di Destpêkirin 19an de nivîsî ye.*

*Mijarên kitêbê di bin sernivîsekê de hatine dayîn. Mesela Metta 8:23-27, bi sernivîsa «Îsa Bagerê Radiwestîne» hatiye dayîn. Referansa jêr nîşan dide ku ev bûyer di Marqos 4:35-41 û di Lûqa 8:22-25 de jî derbas dibe.*

*Ji van pê ve, di hin mijaran de diyarkiriyên pêwist bi firehî hatine kirin. Wek Padîşah Hêrodês di Metta 2:1 de. Mijarên weha yên ku bi stêrikê (*) hatine nîşandan, di ferhengoka dawî ya kitêbê de hatine dayîn. Bi vî awayî hûnê li ser gelek mijaran di ferhengokê de agahiyên fireh bibînin. Li dawiyê jî lîsteyeke wan peyvan heye, yên ku di hemû devokan de ne wek hev tên gotin an fêmkirin.*

*Hûnê di kitêbê de rastî çend nexşan (xerîte) jî bên. Ev nexş bi armanca ku hûn kitêbê çêtir fêm bikin hatine dayîn.*

*Ji bo rast xwendina Mizgîniyê, divê xwendevan mana çend peyvên girîng baş fêm bikin:*

*Xudan:*

*Di Mizgîniyê de peyva «Xudan» bi mana xwedî (xweyî) tê bikaranîn. Di dema Îsa Mesîh de «Xudan» sifatek bû, hem ji bo Xwedê û hem ji bo Îsa Mesîh dihat bikaranîn.*

*Bav:*

*Di Mizgîniyê de «Bav» navekî Xwedê ye. Xwedê serkaniya her tiştî ye. Her tişt ji Xwedê ye û wî her tişt afirandiye. Çawa ku bê bav zarok çênabin, bê Xwedê jî tu tişt çênebûye. Lê belê Xwedê mirov di sûretê xwe de afirand, wî hiş û bîr û ruh da mirov. Ji ber vê yekê ew bi mana ruhanî bavê hemû mirovan e, lê belê ev qet bi mana cismanî (fîzîkî) nayê xebitandin. Û wek ku bav ji zarokên xwe hez dike, Xwedê jî wusa ji mirovan hez dike û bêguman hezkirina Xwedê qat qat di ser ya mirovan re ye. Xwedê bavê mirov ê ruhanî û ezmanî ye.*

*Kurê Xwedê:*

*Di nav bav û kalên Kurdan de tê gotin ku Îsa Mesîh «Nûranî» ye, «Nûra Xwedê» ye, yanî ew Ronahiya ku ji Xwedê tê ye. Di Mizgîniyê de hatiye nivîsîn ku Îsa Mesîh ronahiya rastîn e; yê ku hemû mirovan ronahî dike, ew e. Her weha hatiye nivîsîn ku Îsa Mesîh bi xwe Peyva Xwedê ye û ji wî re «Kurê Xwedê» tê gotin, çimkî Kur ji Bav Xwedê tê. Kurê Xwedê jî bi mana ruhanî ye û qet bi mana cismanî (fîzîkî) nayê xebitandin.*

# *Mizgîniya Îsa Mesîh li gor Metta*

### *Pêşgotin*

*Ev beşê Încîlê (Mizgîniyê) bi destê Metta hatiye nivîsîn. Îsa di dema xizmeta xwe ya li ser rûyê erdê de diwanzdeh şagirt* hilbijartin. Gava ku Metta navên diwanzdeh şagirtan dide, ew dide zanîn ku ew «Mettayê bacgir» e.*

*Metta Cihû bû û li ser navê Romayiyan bac dicivand. Herweha ew bi navê «Lêwiyê kurê Halfayos» jî tê zanîn (Marqos 2:14). Çaxê Îsa gazî Metta kir, wî dev ji karê xwe berda û li pey Îsa çû (Lûqa 5:27-28). Metta ji beşekî xelkê yê wusa dihat ku kesî ji wan hez nedikir. Lê belê wî guhê xwe da banga Îsa û riya wî bijart. Wî ziyafeteke mezin çêkir û Îsa jî vexwend.*

*Tê gotin ku ev nivîs di nîvê sedsala pêşî de li Entakyayê hatiye nivîsîn û ji mirovên ku dixwestin Îsa nas bikin re bûye çavkanî.*

*Îsayê ku Metta wî bi mirovan dide naskirin Mesîhê Xwedê ye û padîşahê ku li gor soza Xwedê wê bihata, ew e (2:2; 21:5; 25:34; 27:11, 37, 42). Di Peymana Kevin de gelek caran bi devê pêxemberan tê gotin ku Mesîh wê ji malbavka Dawid padîşah bê. Di Încîla Metta de heşt caran ji bo Îsa «Kurê Dawid» tê gotin. Îşaya pêxember* salixê bûyîn û jiyana wî dide (1:23; 12:18; 21:5). Yê ku nexweşiyên mirovan qenc dike û barê wan hildigire jî ew e (8:17).*

*Îsa fêmdariyeke nipûnû da Şerîeta Mûsa ya ku Xwedê di Peymana Kevin de diyar kiribû (5:21-24, 27-30, 33-37). Wê hurmeta kûr a ku Îsa ne ji herfên Şerîetê re, lê ji ruhê Şerîetê re dikir, dîndarên wê demê (Fêrisî, Sadûqî û Şerîetzan) hêrs kir. Hingê wan jiholêrakirina Îsa ji xwe re kirin armanca sereke. Di dawiyê de ew gihîştin wê armanca xwe û Îsa dan xaçkirin. Vê helwesta wan dîndarên ku ji naveroka Şerîetê dûr ketibûn, kir ku Padîşahiya* Xwedê ji wan bê standin û ji wan kesên ku berê qenc didin re bê dayîn (21:43).*

*Bûyerên ku Mettayê nivîskar dibêje ji aliyê pêxemberên Peymana Kevin ve jî bi eşkereyî tên diyarkirin. Loma jî gelek caran Metta dibêje «peyva pêxemberîtiyê hat cih» û bi vî awayî peyvên pêxemberên Peymana Kevin tîne bîra xwendevanan û diyar dike ku ev çawa tên cih. Peyvên pêxemberîtiyê wek mekûka bûyerên kitêbê ne.*

*Di vê nivîsê de «Padîşahiya Ezmanan» an «Padîşahiya Xwedê» dabaşeke girîng e û ev gotin sî caran derbas dibe. Ji bilî vê yekê Metta li ser bîst keranetên ku Îsa kirin, radiweste.*

*Pênc peyivînên Îsa yên dirêj jî di vê nivîsarê de cih distînin. Ev bi van sernivîsan tên dayîn:*

*1. Bingeha jiyana dilgeşiyê: 5:1-7:27*
*2. Berî şandina ser kar, peyivîna Îsa ya bi şagirtan re: 10:1-42*
*3. Meseleyên li ser Padîşahiya Xwedê: 13:1-52*
*4. Jiyana li gor Padîşahiya Xwedê divê çawa be: 18:1-35*
*5. Peyivîna li ser hatina Mesîh ya cara dawî: 24:1-25:36*

*Nivîsara Metta dikare weha bê beşkirin:*

*I. Malbavka Îsa û bûyîna wî (1:1-2:23)*
*II. Yûhennayê imadkar (3:1-12)*
*III. Imadbûn û ceribandina Îsa (3:13-4:11)*
*IV. Destpêkirina xizmeta Îsa û hînkirina li çiyê (4:12-7:29)*
*V. Kerametên Îsa (8:1-9:38)*
*VI. Îsa şagirtên xwe dişîne û dibe sedemê cudabûnê (10:1-12:50)*
*VII. Meseleyên Îsa (13:1-58)*
*VIII. Kerametên din; tiştên ku mirov murdar dikin (14:1-15:39)*
*IX. Îsa şagirtên xwe hîn dike (16:1-20:34)*
*X. Îsa diçe Orşelîmê (19:1-20:34)*
*XI. Hînkirina li Orşelîmê; serwerên Cihûyan Îsa qebûl nakin (21:1-25:46)*
*XII. Girtin û xaçkirina Îsa (26:1-27:66)*
*XIII. Rabûna Îsa ya ji nav miriyan (28:1-20)*

### *Malbavka Îsa Mesîh*

*(Lûqa 3:23-38)*

1 Kitêba* malbata Îsa* Mesîhê* kurê* Dawid ê kurê Birahîm*
ev e:

2 Birahîm bavê Îshaq* bû,
Îshaq bavê Aqûb* bû,
Aqûb bavê Cihûda* û birayên wî bû,

3 Cihûda bavê Perez û Zerah bû, ku diya wan Tamara bû,
Perez bavê Hesrûn bû,
Hesrûn bavê Aram bû,
4 Aram bavê Amînadav bû,
Amînadav bavê Nehşon bû,
Nehşon bavê Salmon bû,
5 Salmon bavê Bowaz bû, ku diya wî Rexab* bû,
Bowaz bavê Ovêd bû, ku diya wî Rût bû,
Ovêd bavê Yêşa* bû
6 Û Yêşa jî bavê Dawid* padîşah bû.

Dawid bavê Silêman* bû, diya wî jina Ûrya bû,
7 Silêman bavê Rêhoboam bû,
Rêhoboam bavê Ebiya bû,
Ebiya bavê Asaf bû,
8 Asaf bavê Yehoşafat bû,
Yehoşafat bavê Yoram bû,
Yoram bavê Ûziya bû,
9 Ûziya bavê Yotam bû,
Yotam bavê Ahaz bû,
Ahaz bavê Hizqiya bû,
10 Hizqiya bavê Minaşe bû,
Minaşe bavê Amos bû,
Amos bavê Yoşiya bû
11 Û Yoşiya jî bavê Yexonya û birayên wî bû, ku di dema sirgûnbûna* Babîlê de çêbûn.

12 Yexonya bavê Şaltiyêl bû, ku piştî sirgûnbûna Babîlê çêbû,
Şaltiyêl bavê Zerûbabel bû,
13 Zerûbabel bavê Abiyûd bû,
Abiyûd bavê Êlyaqîm bû,
Êlyaqîm bavê Azûr bû,
14 Azûr bavê Sadoq bû,

---

**1:7** Di nav hin destnivîsaran de di şûna «Asaf» de «Asa» nivîsî ye.
**1:10** Di nav hin destnivîsaran de di şûna «Amos» de «Amon» nivîsî ye.

Sadoq bavê Axîn bû,
Axîn bavê Êlyûd bû,
15 Êlyûd bavê Êlazar bû,
Êlazar bavê Metan bû,
Metan bavê Aqûb bû
16 Û Aqûb jî bavê Ûsivê mêrê Meryemê* bû.
Ji Meryemê jî Îsa*, yê ku jê re ‹Mesîh›* tê gotin çêbû.

17 Bi vî awayî ji Birahîm heta Dawid çardeh nifş*, ji Dawid heta sirgûnbûna* Babîlê çardeh nifşên din û ji sirgûnbûnê heta Mesîh jî çardeh nifş derbas bûn.

### *Bûyîna Îsa Mesîh*

*(Lûqa 2:1-7)*

18 Bûyîna* Îsa* Mesîh* jî bi vî awayî çêbû: Diya wî Meryem
dergistiya Ûsiv bû, lê berî ku ew bizewicin û bigihîjin hev, xuya
bû ku ew bi Ruhê* Pîroz bizaro ye.
19 Dergistiyê wê Ûsiv mirovekî
rast bû û ji ber ku nedixwest Meryemê li ber xelkê bide şermê, wî
niyet kir ku wê bi dizî berde.
20 Ew hê li ser vê yekê difikirî, mil-
yaketekî Xudan* di xewnê de lê xuya bû û got: «Ey Ûsivê Kurê*
Dawid! Netirse ku tu Meryemê ji xwe re bi jinîtî bînî. Çimkî yê ku
di malzaroka wê de çêbûye ji Ruhê* Pîroz e.
21 Ewê kurekî bîne û
tê navê wî Îsa* deynî, çimkî ewê gelê xwe ji gunehên wan xilas
bike.»
22 Ev hemû çêbûn, da ew peyva* ku Xudan* bi devê pê-
xember* gotibû, bê cih:

23 «Va ye, keçik* wê bizaro bibe û ewê kurekî bîne.
Û wê navê wî Îmanûêl deynin»[a],

ku bê wergerandin: «Xwedê bi me re ye.»[b]

24 Gava ku Ûsiv ji xewê hişyar bû, wek ku milyaketê Xu-
dan jê re gotibû kir û Meryem ji xwe re bi jinîtî anî.
25 Lê ew
neçû ba wê, heta ku wê kurê xwe anî. Û wî navê zarok Îsa*
danî.

---

[a] 1:23 Ji: Îşaya 7:14 [b] 1:23 Ji: Îşaya 8:8, 10

1:21 «Îsa» bi zimanê Îbranî weha tê fêmkirin: «Xwedê xilas dike» an «Xwedê rizgar dike».

### *Stêrnasên ji Rojhilat*

2 Îcar di dema Hêrodês* padîşah de, çaxê Îsa* li Beytlehma
Cihûstanê* çêbû, ji Rojhilat stêrnas hatin Orşelîmê* 2 û pirsîn:
«Ka padîşahê Cihûyan ê ku çêbûye li ku derê ye? Me li Rojhilat
stêra wî dît û em hatin ku biperizin* wî.» 3 Gava ku Hêrodês
padîşah ev yek bihîst, ew û hemû Orşelîm jî pê re bizdiya. 4 Wî
hemû serekên kahînan* û Şerîetzan* li hevdû civandin û ji wan
pirsî, ka Mesîh* wê li ku derê çêbe. 5 Wan jê re got: «Li Beytleh-
ma Cihûstanê, çimkî bi destê pêxember* weha hatiye nivîsîn:

6 ‹Û tu, ey Beytlehma li welatê Cihûda*!
Tu di nav serdarên Cihûda de bi tu awayî ne ya herî kêm î.
Çimkî ew serdarê ku şivantiya gelê min ê Îsraêl bike wê ji
te rabe!›[a]»

7 Li ser vê yekê Hêrodês bi dizî gazî stêrnasan kir û ji wan qenc hîn
bû ku stêr kengê xuya bûye. 8 Di pey de wî ew şandin Beytlehmê û
ji wan re got: «Herin û qenc li zarok bigerin. Gava ku we ew dît,
haya min pê bixin, da ku ez jî bêm û biperizim* wî.» 9 Piştî ku wan
padîşah guhdarî kir, ew ketin riya xwe. Ew stêra ku li Rojhilat
dîtibûn li pêşiya wan çû, heta li ser cihê ku zarok lê bû rawesta.
10 Gava ku wan jî stêr dît, bi şahiyeke mezin dilgeş bûn. 11 Ew
ketin malê û zarok bi diya wî Meryemê re dîtin, çûn ser çokan û
perizîn wî. Sindoqa xwe ya xezînê vekirin û diyariyên ji zêr,
cewîşêrîn* û murê* pêşkêşî wî kirin. 12 Piştî ku di xewna xwe de
hatin tembîhkirin, da ku venegerin ba Hêrodês, ew di riyeke din re
çûn welatê xwe.

### *Revîna ber bi Misrê ve*

13 Piştî çûyîna stêrnasan, milyaketekî Xudan* di xewnê de li
Ûsiv xuya bû û got: «Rabe, rahêje zarok û diya wî û bireve Misrê.
Li wê derê bimîne heta ku ez ji te re bêjim. Çimkî Hêrodês wê li
zarok bigere, da ku wî bikuje.» 14 Hingê Ûsiv rabû, rahişt zarok û
diya wî û bi şev çû Misrê 15 û heta mirina Hêrodês li wê derê ma.
Ev çêbû, da ew peyva* ku Xudan bi devê pêxember gotibû, bê cih:
«Min ji Misrê gazî kurê xwe kir.»[b]

---

[a] 2:6 Ji: Mîxa 5:2    [b] 2:15 Ji: Hoşêya 11:1

### *Kuştina Zarokan*

[16] Gava Hêrodês fêm kir ku ji aliyê stêrnasan ve hatiye xa-
pandin, gelek hêrs bû. Li ser vê yekê, tam li gor wî çaxê ku ji stêr-
nasan hîn bûbû, li Beytlehm û li hemû der û dora wê, fermana
kuştina hemû zarokên kurîn ên du salî û ji diduyan biçûktir derxist.
[17] Hingê ew peyva* ku bi devê Yêremya* pêxember hatibû gotin
hat cih:

[18] «Ji Ramayê dengek hat bihîstin,
Şîn û girîn û li xwe xistin!
Rahêl* ji bo zarokên xwe digirî
Û ew naxwaze bê aşkirin.
Çimkî êdî ew tunin.»[a]

### *Vegerîna ji Misrê*

[19] Piştî ku Hêrodês mir, milyaketekî Xudan li Misrê di xewnê
de li Ûsiv xuya bû [20] û got: «Rabe, rahêje zarok û diya wî û vegere
welatê Îsraêlê, çimkî ew ên ku li kuştina zarok digeriyan mirin.»
[21] Îcar Ûsiv rabû, zarok û diya wî hildan û vegeriyan welatê Îsra-
êlê. [22] Lê gava wî bihîst ku Arxêlayos* di cihê bavê xwe Hêrodês
de li ser Cihûstanê* bûye padîşah, ew tirsiya ku here wê derê. Piştî
ku di xewnê de hat tembîhkirin, bi aliyê herêma Celîlê* ve çû. [23] Li
wir, li bajarê ku jê re dibêjin Nisret bi cih bû. Ev çêbû, da ew
peyva ku bi devê pêxemberan hatibû gotin, bê cih: «Wê ji wî re yê
Nisretî bê gotin».

### *Banga Yûhennayê Imadkar*

*(Marqos 1:1-8; Lûqa 3:1-18; Yûhenna 1:19-28)*

**3** Di wan rojan de Yûhennayê* imadkar* li çola Cihûstanê*
derket meydanê û weha dest bi hînkirinê kir: [2] «Tobe bikin,
çimkî Padîşahiya* Ezmanan nêzîk e!» [3] Yûhenna ew e ku Îşaya*
pêxember weha li ser wî gotiye:

«Dengê yê li çolê gazî dike:
‹Riya Xudan* amade bikin,
Şiveriyên wî serrast bikin!›»[b]

---

[a] 2:18 Ji: Yêremya 31:15 [b] 3:3 Ji: Îşaya 40:3

4 Cilên Yûhenna ji pirça devê bûn û qayîşeke çermîn li pişta wî
girêdayî bû. Xwarina wî kulî û hingivê çolê bû. 5 Hingê ji Or-
şelîmê*, ji hemû Cihûstanê û ji tevahiya herêma Çemê Urdunê
dihatin ba wî, 6 gunehên xwe eşkere dikirin û di Çemê Urdunê de
bi destê wî imad* dibûn.
7 Lê gava Yûhenna dît ku ji Fêrisî* û Sadûqiyan* gelek tên ku
imad bibin, wî ji wan re got: «Hey têjikên koremaran! Kê ji we re
gotiye ku hûn ji ber xezeba ku tê birevin? 8 Îcar fêkiyê ku li tobe-
kirinê tê, bidin. 9 Ji xwe re nebêjin: ‹Birahîm* bavê me ye.› Çimkî
ez ji we re dibêjim ku Xwedê dikare ji van keviran jî zarokan ji
Birahîm re rake! 10 Ji xwe bivir li ser qurmê daran e! Her dara ku
berê qenc nede wê bê birrîn û bê avêtin nav êgir. 11 Erê, ez we ji bo
tobê bi avê imad* dikim, lê yê ku piştî min tê ji min bihêztir* e. Ez
ne hêja me ku çaroxa wî hilgirim. Ewê we bi Ruhê* Pîroz û bi êgir
imad bike. 12 Melhêba wî di destê wî de ye. Ewê bêndera xwe qenc
paqij bike, genimê xwe di embarê de bicivîne, lê ewê kayê bi agirê
ku venamire bişewitîne.»

### *Imadbûna Îsa*

*(Marqos 1:9-11; Lûqa 3:21-22)*

13 Hingê Îsa ji Celîlê* hat Çemê Urdunê ba Yûhenna, da ku bi
destê wî imad* bibe. 14 Lê Yûhenna xwest ku ji wî re bibe asteng û
got: «Ji dêla ku divê ez bi destê te bêm imadkirin*, ma tu têyî ba
min?» 15 Îsa bersîv da û got: «Niha bihêle, çimkî divê em hemû
rastiyan bi vî awayî bînin cih.» Li ser vê yekê Yûhenna razî bû.
16 Îsa imad bû, ji avê derket derneket û pêre pêre ezman qelişî û wî
dît ku Ruhê* Xwedê wek kevokekê hat xwarê û li ser wî danî. 17 Û
dengekî ji ezmanan weha got: «Ev e Kurê min ê delal. Dilê min bi
wî xweş e.»

### *Ceribandina Îsa Mesîh*

*(Marqos 1:12-13; Lûqa 4:1-13)*

4 Hingê Ruh* Îsa bir çolê, da ku ji aliyê Îblîs* ve bê ceribandin.
2 Piştî ku Îsa çil roj û çil şevî rojî girt, birçî bû 3 û yê ku di-
ceribîne hat ba wî û jê re got: «Eger tu Kurê* Xwedê yî, ji van
keviran re bêje, bila bibin nan.» 4 Îsa bersîva wî da û got: «Hatiye

nivîsîn ku: ‹Mirov ne bi nên tenê dijî, lê bi her peyva* ku ji devê
Xwedê derdikeve dijî.›[a]»
5 Piştre Îblîs ew bir Bajarê* Pîroz, ew danî ser birca Perest-
gehê* û jê re got: 6 «Eger tu Kurê* Xwedê yî, ka xwe ji vir bavêje
xwarê. Çimkî hatiye nivîsîn: ‹Ewê ji bo te li milyaketên xwe emir
bike û ewê te li ser destên xwe hilgirin, da ku lingê te li kevirekî
nekeve.›[b]» 7 Îsa bersîva wî da û got: «Ev jî hatiye nivîsîn: ‹Xudan*
Xwedayê xwe neceribîne.›[c]»
8 Îcar Îblîs ew derxist serê çiyayekî gelek bilind û hemû padî-
şahiyên dinyayê û rûmet û bedewiya wan nîşanî wî da 9 û jê re got:
«Eger tu li ber min herî ser çokan û biperizî* min, ezê van he-
mûyan bidim te.» 10 Hingê Îsa jê re got: «Ji min dûr keve, Îblîs!
Çimkî hatiye nivîsîn: ‹Biperize* Xudan Xwedayê xwe û bi tenê ji
wî re xizmetê bike.›[d]»
11 Piştî vê yekê Îblîs dev ji wî berda û milyaket hatin û ji wî re
xizmet kirin.

### *Îsa li Celîlê Dest bi Belavkirina Mizgîniyê Dike*
*(Marqos 1:14-15; Lûqa 4:14-15)*

12 Gava Îsa bihîst ku Yûhenna hatiye girtin, xwe da aliyê Ce-
lîlê*. 13 Ew ji Nisretê derket, çû Kefernahûma li qeraxê golê ya li
herêma Zebûlon û Nefteliyê bi cih bû, 14 da ew peyva ku bi devê
Îşaya* pêxember hatibû gotin, bê cih:
15 «Welatê Zebûlonê û welatê Nefteliyê
Ber bi golê ve, ji Çemê Urdunê wê ve,
Celîla miletan!
16 Ew gelê ku di tariyê de rûdine,
Ronahiyeke mezin dît.
Û li ser wan ên ku li welatê di bin siya mirinê de rûdinin
Ronahî derket.»[e]
17 Ji wê demê û pê ve, Îsa dest bi hînkirinê kir û got: «Tobe
bikin, çimkî Padîşahiya* Ezmanan nêzîk bûye.»

---

[a] **4:4** Ji: Dubarekirina Şerîetê 8:3
[b] **4:6** Ji: Zebûr 91:11-12
[c] **4:7** Ji: Dubarekirina Şerîetê 6:16
[d] **4:10** Ji: Dubarekirina Şerîetê 6:13
[e] **4:15-16** Ji: Îşaya 9:1-2

### *Îsa Gazî Çar Masîgiran Dike*

*(Marqos 1:16-20; Lûqa 5:1-11)*

18 Gava ku Îsa li perê Gola Celîlê digeriya, wî du bira dîtin,
Şimûnê* ku jê re Petrûs* digotin û birayê wî Endrawis. Wan tor
davêtin golê, çimkî ew masîgir bûn. 19 Îsa ji wan re got: «Li pey
min werin! Ezê we bikim nêçîrvanên mirovan.» 20 Wan jî di cih de
torên xwe hiştin û li pey wî çûn.
21 Îsa ji wê derê pêşve çû, wî du birayên din jî dîtin, Aqûbê*
kurê Zebedî û birayê wî Yûhenna*. Wan bi bavê xwe Zebedî re di
qeyikê de torên xwe vediçinîn. Îsa gazî wan jî kir. 22 Wan jî di cih
de qeyik û bavê xwe hiştin û ew li pey wî çûn.

### *Îsa Hîn Dike û Nexweşan Qenc Dike*

*(Lûqa 6:17-19)*

23 Îsa li seranserê herêma Celîlê digeriya, di kinîştên* wan de
hîn dikir, Mizgîniya* Padîşahiyê* dida û hemû êş û nexweşiyên di
nav xelkê de qenc dikirin. 24 Nav û dengê wî li seranserê Sûriyê
belav bû û xelkê hemû nexweşên ku ketibûn êş û janên cûr bi cûr,
cinoyî*, atî* û felcî anîn ba wî û wî hemû qenc kirin. 25 Îcar elale-
tên* mezin ji Celîlê, ji Dêkapolîsê*, ji Orşelîmê*, ji Cihûstanê* û
ji aliyê din ê Çemê Urdunê li pey wî çûn.

### *Xwezikdariya Rastîn*

*(Lûqa 6:20-23)*

5 Îsa elalet* dîtin û hilkişiya çiyê. Çaxê rûnişt, şagirtên* wî hatin
ba wî. 2 Wî dest bi hînkirina wan kir û got:

3 «Xwezî bi wan ên ku bi ruh belengaz in,
Çimkî Padîşahiya* Ezmanan ya wan e.
4 Xwezî bi wan ên ku şîndar in,
Çimkî ewê bên aşkirin.
5 Xwezî bi wan ên ku nefsbiçûk in,
Çimkî ewê erdê par bistînin.
6 Xwezî bi wan ên ku tî û birçiyên rastiyê ne,
Çimkî ewê bên têrkirin.

---

5:3 «bi ruh belengaz» weha tê fêmkirin: «li ber Xwedê şkestî».
5:4 Binêre: Îşaya 61:2-3 5:5 Binêre: Zebûr 37:11

[7] Xwezî bi wan ên ku dilbirehm in,
Çimkî dilrehmî wê li wan bê kirin.
[8] Xwezî bi wan ên ku dilpak in,
Çimkî ewê Xwedê bibînin.
[9] Xwezî bi wan ên ku aştîker* in,
Çimkî wê ji wan re zarokên Xwedê bê gotin.
[10] Xwezî bi wan ên ku di ber rastiyê de mirov tengahiyê didin wan,
Çimkî Padîşahiya* Ezmanan a wan e.

[11] Xwezî bi we, gava ku ew di ber navê min de we nizim bikin,
tengahiyê bidin we û bi bêbextî her cûreyê gotinên xerab ji bo we
bêjin. [12] Şa bibin û dilgeş bin! Çimkî xelata we li ezmanan mezin
e. Ji ber ku wan bi vî awayî tengahî da wan pêxemberên* beriya
we jî.

### *Xwê û Ronahî*

*(Marqos 9:50; Lûqa 14:34-35)*

[13] «Hûn xwêya dinyayê ne, lê eger xwê tama xwe winda bike,
careke din ewê bi çi bê bitamkirin? Êdî bi kêrî tiştekî nayê, ji bilî
ku bê avêtin derve û di bin lingên mirovan de bê perçiqandin.

[14] «Hûn ronahiya dinyayê ne. Bajarê ku li ser çiyê ye nikare bê
veşartin. [15] Ne jî kes çirayê pêdixe û dike bin melkebê, lê belê da-
tîne ser pêçirayê ku ronahiyê bide her kesên hundir. [16] Bi vî awayî
bila ronahiya we jî li ber mirovan wusa şewq bide, da ku kirinên
we yên qenc bibînin û pesnê Bavê* we yê li ezmanan bidin.

### *Şerîet û Nivîsarên Pêxemberan*

[17] «Nefikirin ku ez hatime Şerîetê* û nivîsarên pêxemberan* ji
holê rakim. Ez nehatime ku ji holê rakim, lê ez hatime ku temam
bikim. [18] Beriya ku erd û ezman bibihûre, herfek an nuqteyeke
biçûk ji Şerîetê winda nabe, heta ku her tişt bê cih. [19] Loma kî ku ji
van emran ê herî biçûk bişkêne û bi wî awayî hînî mirovan bike,
wê di Padîşahiya Ezmanan de jê re yê herî biçûk bê gotin. Lê kî ku
van emran bîne cih û hîn bike, wê di Padîşahiya Ezmanan de ji wî re
mezin bê gotin. [20] De îcar ez ji we re dibêjim, eger rastiya we ne

---

5:8 Binêre: Zebûr 24:3-4

di ser a Şerîetzan* û Fêrisiyan* re be, hûn tu caran nakevin Padî-
şahiya Ezmanan.

### *Hêrs û Mêrkujî*

21 «We bihîstiye ku ji pêşiyan re hatiye gotin: ‹Nekuje! Kî ku
bikuje, wê bê dîwankirin*!›[a] 22 Lê ez ji we re dibêjim, her kesê ku
li birayê xwe hêrs bibe, wê bê dîwankirin. Û kî ku ji birayê xwe re
bêje: ‹Bêmejî!› wê li ber Dîwana Bilind bê kişandin pirsyarê. Û kî
ku bêje: ‹Ehmeq!› ewê agirê dojehê* heq bike. 23 Loma, gava ku tu
li ser gorîgehê* diyariya xwe pêşkêş dikî, eger bê bîra te ku dilê
birayê te ji te maye, 24 diyariya xwe li wir, li ber gorîgehê bihêle.
Pêşî here bi birayê xwe re li hev were û hingê vegere, diyariya xwe
pêşkêş bike. 25 Hê ku tu di riya dadgehê* de yî, zû bi sûcdarkerê
xwe re li hev were. An na, ewê te bide destê dadger* û dadger jî te
bide destê qerdiyan û tê bikevî zîndanê. 26 Bi rastî ez ji te re di-
bêjim, heta ku tu qurişê* dawî nedî, tu ji wê derê qet dernakevî.

### *Zîna*

27 «We bihîstiye ku hatiye gotin: ‹Zînayê neke!›[b] 28 Lê ez ji we
re dibêjim, her kesê ku bi dilxwazî li jinekê binêre, ji xwe wî di
dilê xwe de bi wê re zîna kiriye. 29 Eger çavê te yê rastê te bixe
guneh, wî derxe û ji xwe bavêje! Ji bo te çêtir e ku tu endamekî ji
bedena xwe winda bikî, lê hemû bedena te nekeve dojehê*. 30 Û
eger destê te yê rastê te bixe guneh, wî jêke û ji xwe bavêje! Ji bo
te çêtir e ku tu endamekî ji bedena xwe winda bikî, lê hemû be-
dena te neçe dojehê.

### *Jinberdan*

*(Metta 19:9; Marqos 10:11-12; Lûqa 16:18)*

31 «Hatiye gotin: ‹Kî ku jina xwe berde, bila kaxeza jinberdanê
bide wê.›[c] 32 Lê ez ji we re dibêjim, her kesê ku zîna ne tê de, ji ber
sedemekî din jina xwe berde, dibe sedemê zînakirina wê. Û kî ku
bi jineke berdayî re bizewice zînayê dike.

---

[a] **5:21** Ji: Derketin 20:13; Dubarekirina Şerîetê 5:17

[b] **5:27** Ji: Derketin 20:14; Dubarekirina Şerîetê 5:18

[c] **5:31** Ji: Dubarekirina Şerîetê 24:1

### *Sondxwarin*

33 «We ev jî bihîstiye ku ji pêşiyan re hatiye gotin: ‹Bi derew
sond nexwe û sondên xwe li ber Xudan bîne cih.›[a] 34 Lê ez ji we re
dibêjim, qet sond nexwin! Ne bi ezmên, çimkî ew textê Xwedê ye,
35 ne jî bi erdê, çimkî pêgeha wî ye, ne jî bi Orşelîmê*, çimkî ew
bajarê Padîşahê Mezin e 36 û ne jî bi serê xwe sond bixwe, çimkî tu
nikarî mûyekî spî an reş bikî. 37 Bila erêya we «Erê» be û naya we
«Na» be. Ji vê zêdetir ji Yê Xerab e.

### *Heyfhilanîn*

*(Lûqa 6:29-30)*

38 «We bihîstiye ku hatiye gotin: ‹Çav di ber çav de, diran di
ber diran de.›[b] 39 Lê belê ez ji we re dibêjim, li ber ê xerab ranebin.
Eger yek sîleyekê li lama te ya rastê bixe, ya din jî bide ber. 40 Û
eger yek bixwaze te bide dadgehê û kirasê te ji te bistîne, ebayê
xwe jî bi dest wî ve berde. 41 Eger yek bi zorê te kîlometrekê rêve
bibe, bi wî re du kîlometran here. 42 Bide wî yê ku ji te dixwaze,
rûyê xwe ji yê ku ji te deyn dixwaze, nezivirîne.

### *Ji Dijminên Xwe Hez Bikin*

*(Lûqa 6:27-28, 32-36)*

43 «We bihîstiye ku hatiye gotin: ‹Ji cîranê xwe hez* bike, ji
dijminê xwe nefret bike!›[c] 44 Lê ez ji we re dibêjim, ji dijminên
xwe hez bikin û ji bo yên ku tengahiyê didin we dua bikin, 45 da ku
hûn bibin zarokên Bavê* xwe yê li ezmanan. Çimkî ew tava xwe
hem li ser xeraban û hem jî li ser qencan dertîne û barana xwe bi
ser rast û nerastan de dibarîne. 46 Eger hûn ji wan hez bikin, yên ku
ji we hez dikin, ma wê xelata we çi be? Ma bacgir* jî weha nakin?
47 Û eger hûn bi tenê silavê bidin birayên xwe, ma hûn ji yên din
zêdetir çi dikin? Ma pûtperest* jî weha nakin? 48 Loma bêkêmahî
bin, çawa ku Bavê* we yê li ezmanan bêkêmahî ye.

---

[a] 5:33 Ji: Qanûna Kahîntiyê 19:12; Hijmartin 30:2

[b] 5:38 Ji: Derketin 21:24; Qanûna Kahîntiyê 24:20; Dubarekirina Şerîetê 19:21

[c] 5:43 Ji: Qanûna Kahîntiyê 19:18

5:41 Bi Yewnanî: «Mîlek»; mîla Romayî (Îtalya) 1478,5 metre bû.

### *Xêrxwazî*

6 «Hay ji xwe hebin, kirinên xwe yên qenc li ber çavên mirovan
nekin, ji bo ku ji aliyê wan ve bên dîtin. An na, wê ji Bavê* we
yê li ezmanan ji bo we xelat nebe. 2 Loma, çaxê ku tu xêrê bikî, li
pêşiya xwe li boriyê nexe, wek ku durû li kuçê û di kinîştan* de di-
kin, da ku pesnê wan bê dayîn. Bi rastî ez ji we re dibêjim, wan xe-
lata xwe standiye. 3 Îcar çaxê ku tu xêrê bikî, bila destê te yê çepê
nezane ku destê te yê rastê çi dike, 4 da ku xêra te veşartî be. Bavê*
te yê ku tiştê veşartî tê kirin jî dibîne, wê bergîdana* te bide te.

### *Duakirin*

*(Lûqa 11:2-4)*

5 «Gava ku hûn dua dikin, wek ên durû nebin, çimkî ew hez*
dikin ku li serê kuçeyan û di kinîştan de dua bikin, da ku ji aliyê
mirovan ve bên dîtin. Bi rastî ez ji we re dibêjim, wan xelata xwe
standiye. 6 Lê çaxê ku tu dua dikî, bikeve hundirê odeya xwe,
deriyê xwe bigire û ji Bavê* xwe yê ku nayê dîtin re dua bike û
Bavê te yê ku tiştê veşartî tê kirin dibîne, wê bergîdana te bide te.
7 «Çaxê ku hûn dua dikin, wek pûtperestan* gotinên pûç pircar
nekin; ew guman dikin bi pircarkirina peyvan* wê bên bihîstin.
8 Îcar hûn nebin wek wan, çimkî Bavê* we hê berî ku hûn ji wî
bixwazin bi hewcedariya we dizane.
9 «Hûn bi vî awayî dua bikin:
Bavê me yê li ezmanan,
Navê te pîroz* be.
10 Bila padîşahiya te bê.
Daxwaza te wek li ezmên,
Bila li ser rûyê erdê jî bê cih.
11 Nanê me yê rojane roj bi roj bide me.
12 Û li deynên me bibihûre,
Wek ku em li deyndarên xwe bihûrtine.
13 Û me nebe ceribandinê,
Lê me ji Yê Xerab xilas bike.
Çimkî padîşahî, karîn û rûmet her û her ên te ne! Amîn*.

---

**6:9** Bi gotineke din: «Bila mirov qedrê navê te yê pîroz (bimbarek) bigire»;
Binêre: Hezekiyêl 36:23.

14 Eger hûn li sûcên mirovan bibihûrin, Bavê* we yê li ezmanan jî
wê li sûcên we bibihûre. 15 Lê eger hûn li sûcên mirovan nebihûrin,
Bavê we jî li sûcên we nabihûre.

### *Rojîgirtin*

16 «Û çaxê ku hûn rojiyê bigirin, wek durûyan mirûzê xwe
nekin; ew rûyê xwe tirş dikin, da ku mirov bibînin ku ew bi rojî ne.
Bi rastî ez ji we re dibêjim, wan xelata xwe standiye. 17 Lê çaxê ku
tu rojiyê bigirî, rûn li porê xwe bide û serçavê xwe bişo, 18 da ku
mirov nebînin ku tu bi rojî yî, lê Bavê te yê ku nayê dîtin bibîne. Û
Bavê te yê ku tiştê veşartî tê kirin dibîne, wê bergîdana te bide te.

### *Xezîna li Ezmanan*

*(Lûqa 12:33-34)*

19 «Li ser rûyê erdê ji bo xwe xezîneyan necivînin, ku li wir
zeng û bizûzk wan xera dikin, dixwin û diz dikevinê û didizin.
20 Lê ji bo xwe xezîneyan li ezmên bicivînin, ku li wir ne zeng û bi-
zûzk dikarin wê xera bikin, bixwin û ne jî diz dikarin bikevinê û bi-
dizin. 21 Çimkî xezîneya we li ku derê be, dilê we jî wê li wê derê be.

### *Çiraya Bedenê*

*(Lûqa 11:34-36)*

22 «Çiraya bedenê çav e. Eger çavê te qenc be, wê tevahiya be-
dena te bibe ronahî. 23 Lê eger çavê te xerab be, wê tevahiya bede-
na te di tariyê de be. Îcar, eger ronahiya di dilê te de tarî be, ew çi
tariyeke mezin e!

### *Xulamtiya ji Du Axayan re*

*(Lûqa 16:13)*

24 «Tu kes nikare xulamtiyê ji du axayan re bike; çimkî an ewê
ji yekî nefret bike û ji yê din hez* bike, an jî ewê qedrê yekî bigire
û yê din biçûk bibîne. Hûn nikarin xulamtiyê hem ji Xwedê re û
hem jî ji dewlemendiyê re bikin.

---

**6:13** Di hin destnivîsaran de ev tune: «Çimkî padîşahî, karîn û rûmet her û her ên te ne! Amîn.»

**6:24** Bi Yewnanî: «Mamon»; mana vê ev e: «Malê dinyayê, pere, dewlemendiya vê dinyayê».

### *Xeman Nexwin*
*(Lûqa 12:22-31)*

25 «Ji ber vê yekê ez ji we re dibêjim, ji bo jiyana xwe xeman
nexwin, ka hûnê çi bixwin, an çi vexwin û ne jî ji bo bedena xwe,
ka hûnê çi li xwe bikin. Ma jiyan ne di ser xwarinê re û beden jî ne
di ser lixwekirinê re ye? 26 Li teyrên ezmanan binêrin! Ew ne diçî-
nin, ne didirûn û ne jî di embaran de dicivînin. Dîsa jî Bavê we yê li
ezmanan wan têr dike. Ma hûn ne di ser wan re ne? 27 Îcar kî ji we
bi xemxwarinê dikare kêlîkekê bi ser jiyana xwe ve dirêjtir bike?
28 «Û hûn çima ji bo cilan xeman dixwin? Li sosinên çolê
binêrin ku çawa mezin dibin, ew ne dixebitin û ne jî rîs dirêsin.
29 Lê ez ji we re dibêjim ku Silêman* jî di hemû rûmeta xwe de
wek yeke ji wan cil li xwe nekirin. 30 Îcar, eger Xwedê giyayê çolê
yê ku îro heye û sibê di tendûrê de tê şewitandin, bi vî awayî bi cil
dike, ma ew we hê bêtir bi cil nake, hey kêmîmanno? 31 Loma xe-
man nexwin û nebêjin: ‹Emê çi bixwin?› an ‹Emê çi vexwin?› an jî
‹Emê çi li xwe bikin?› 32 Pûtperest* li van hemû tiştan digerin. Lê
Bavê we yê li ezmanan dizane ku hûn hewcedarê van hemû tiştan
in. 33 Lê hûn berî her tiştî li Padîşahiya* Xwedê û li rastiya wî
bigerin û ev hemû tişt jî wê ji we re bên dayîn. 34 Loma ji bo sibê
xeman nexwin, çimkî sibe wê ji bo xwe xeman bixwe. Derdê rojê
têra rojê dike.

### *Dadbarkirina Kesên Din*
*(Lûqa 6:37-38, 41-42)*

7 «Dadbar* nekin, da ku hûn jî neyên dadbarkirin. 2 Çimkî hûn
bi çi awayî yên din dadbar bikin, hûn jî, hûnê bi wî awayî bên
dadbarkirin. Hûn bi kîjan pîvanê bipîvin, wê bi wê pîvanê ji we re
jî bê pîvandin. 3 Tu çima qirşikê di çavê birayê xwe de dibînî, lê
girşê di çavê xwe de nabînî? 4 An çawa tu dikarî ji birayê xwe re
dibêjî: ‹Bihêle ku ez qirşikê di çavê te de derxim› hê ku girş di
çavê te de ye? 5 Hey mirovê durû, pêşî girşê di çavê xwe de derxe,
hingê tê zelal bibînî ku tu qirşikê di çavê birayê xwe de derxî.
6 «Tiştê pîroz* nedin kûçikan û ne jî durên xwe bavêjin ber
berazan. An na, ewê wan di bin lingên xwe de biperçiqînin û
bizivirin we perçe perçe bikin!

### *Ji Xwedê Bixwazin*
*(Lûqa 11:9-13)*

7 «Bixwazin, wê ji we re bê dayîn; lê bigerin, hûnê bibînin; li
derî bixin, ewê ji we re vebe. 8 Çimkî her kesê ku dixwaze, distîne
û yê digere, dibîne û yê li derî dixe, jê re vedibe. 9 Kî ji we, gava
ku kurê wî nên jê bixwaze, wê kevir bide wî? 10 An gava ku masî
bixwaze, wê mar bide wî? 11 Bi ser ku hûn xerab in jî, hûn dizanin
diyariyên qenc bidin zarokên xwe. Îcar Bavê we yê li ezmanan wê
çiqas bêtir tiştên qenc bide wan ên ku ji wî dixwazin!
12 «Loma her çi ku hûn dixwazin xelk ji we re bikin, hûn jî
wusa ji wan re bikin, çimkî hînkirina Şerîetê* û pêxemberan* ev e.

### *Deriyê Teng*
*(Lûqa 13:24)*

13 «Di deriyê teng re derbas bibin. Çimkî deriyê ku dibe helakê
fireh e, riya ku diçe wê rihet e û yên ku pê ve diçin gelek in. 14 Lê
deriyê ku dibe jiyanê teng e, rê jî dijwar e û yên ku wê dibînin
hindik in.

### *Dar û Berê Darê*
*(Lûqa 6:43-45)*

15 «Hay ji pêxemberên* derewîn hebin. Ew di postê miyan de
tên ba we, lê di hundir de ew gurên har in. 16 Hûnê wan ji berê wan
nas bikin. Ma mirov ji stiriyan tirî û ji diriyan hêjîran diçinin? 17 Bi
vî awayî her dara qenc berê qenc, lê her dara xerab jî berê xerab
dide. 18 Dara qenc nikare berê xerab bide û dara xerab nikare berê
qenc bide. 19 Her dara ku berê qenc nede tê birrîn û avêtin nav êgir.
20 Îcar hûnê wan ji berê wan nas bikin.

### *Daxwaza Bavê li Ezmanan*
*(Lûqa 13:26-27)*

21 «Ne ku her kesên ji min re dibêjin: ‹Ya Xudan*, ya Xudan›
wê bikevin Padîşahiya Ezmanan! Bi tenê yên ku daxwaza Bavê
min ê li ezmanan dikin, wê bikevinê. 22 Wê rojê gelek wê ji min re
bêjin: ‹Ya Xudan, ya Xudan! Ma bi navê te me pêxemberîtî nekir?
Bi navê te me cin dernexistin? Ma bi navê te me gelek keramet
nekirin?› 23 Hingê ezê bi eşkereyî ji wan re bêjim: ‹Min hûn qet
nas nekirin! Ji min dûr kevin, hûn ên ku neheqiyê dikin!›

### *Xaniyê Yê Aqilmend û Yê Bêaqil*
*(Lûqa 6:47-49)*

[24] «Îcar her kesê ku van peyvên min dibihîze û tîne cih, mîna
wî mirovê aqilmend e ku xaniyê xwe li ser latê ava kiriye. [25] Baran
dibare, bahoz radibe, lehî tên û li wî xaniyî dixin, lê ew hilnaweşe,
çimkî li ser latê hatiye avakirin. [26] Û her kesê ku van peyvên min
dibihîze û nake, mîna wî mirovê bêaqil e ku xaniyê xwe li ser
seylakê* ava kiriye. [27] Baran dibare, bahoz radibe, lehî tê û li wî
xaniyî dixin û xanî hildiweşe. Û bi hilweşîneke mezin dikeve.»
[28] Gava ku Îsa ev gotinên xwe xilas kirin, elalet* li hînkirina
wî gelek şaş ma. [29] Çimkî wî ne wek Şerîetzanên* wan, lê wek
yekî xweyî desthilatî ew hîn dikirin.

### *Îsa Yekî Kotî Paqij û Qenc Dike*
*(Marqos 1:40-45; Lûqa 5:12-16)*

8 Çaxê ku Îsa ji çiyê hat xwarê, elaleteke* mezin li pey wî çû.
[2] Îcar kotiyek* hat ba wî, li ber wî deverû çû erdê û got: «Ya
Xudan, eger tu bixwazî, tu dikarî min paqij bikî!» [3] Îsa jî destê xwe
dirêj kir, dest li wî da û got: «Ez dixwazim, paqij bibe!» Di cih de
kotîbûna wî paqij bû. [4] Hingê Îsa jê re got: «Binêre! Tu ji kesî re
nebêjî! Lê here, xwe nîşanî kahîn* bide û diyariya ku Mûsa* emir
kiriye pêşkêş bike, da ku ji wan re bibe şahidî.»

### *Baweriya Sersed*
*(Lûqa 7:1-10; Yûhenna 4:43-54)*

[5] Gava ku Îsa ket Kefernahûmê, sersedek* hat ba wî û bi lava
jê re got: [6] «Ya Xudan, xulamê min felcbûyî, bi êşeke giran li malê
di nav nivînan de ye.» [7] Îsa ji wî re got: «Ezê bêm û wî qenc
bikim.» [8] Sersed lê vegerand û got: «Ya Xudan, ez ne hêja me ku
tu bêyî bin banê min, lê bi tenê peyvekê* bêje û xulamê min wê
qenc bibe. [9] Çimkî ez jî mirovekî di bin emir de me û di bin emrê
min de leşker hene. Ez ji yekî re dibêjim ‹Here›, ew diçe; ji yekî
din re dibêjim ‹Were›, ew tê. Ez ji xulamê xwe re dibêjim ‹Vê
bike›, ew dike.»

---

**8:2** Li gor Şerîeta Mûsa mirovên kotî murdar bûn û destûra wan tunebû ku nêzîkî mirovan bibin. Binêre: Qanûna Kahîntiyê 13 û 14.

10 Gava ku Îsa ev yek bihîst, şaş ma û ji yên ku li pey wî
dihatin re got: «Bi rastî, ez ji we re dibêjim, di Îsraêlê de jî min
baweriyeke* weha di dilê kesekî de nedît. 11 Ez ji we re dibêjim ku
ji Rojhilat û ji Rojava gelek wê bên û di Padîşahiya Ezmanan de bi
Birahîm*, Îshaq* û Aqûb* re li ser sifrê rûnin. 12 Lê zarokên Pa-
dîşahiyê wê bên avêtin nav tariya derve û wê li wê derê bibe girîn
û qirçîna diranan.» 13 Îcar Îsa li sersed zivirî û jê re got: «Here, bila
wek ku te bawer* kir, ji te re bibe.» Û di wê gavê de xulamê wî
qenc bû.

### *Îsa Gelek Nexweşan Qenc Dike*

*(Marqos 1:29-34; Lûqa 4:38-41)*

14 Gava ku Îsa ket mala Petrûs*, wî xesûya wî bi tayêketî
razayî dît. 15 Îsa destê xwe danî ser destê wê, tayê ew berda, jinik
rabû û ji wî re xizmet kir.
16 Gava ku bû êvar, gelek mirovên cinoyî* anîn ba wî. Wî bi
gotinekê cin derxistin û hemû nexweş qenc kirin. 17 Ev çêbû, da ew
peyva ku bi devê Îşaya pêxember hatibû gotin, bê cih:

«Wî êşên me kişandin
Û nexweşiyên me hildan ser xwe.»[a]

### *Şertên Çûyîna li pey Îsa*

*(Lûqa 9:57-62)*

18 Gava Îsa elalet li dora xwe dît, wî li wan emir kir ku derbasî
aliyê din ê golê bibin. 19 Hingê Şerîetzanek nêzîkî wî bû û jê re got:
«Mamoste, tu herî ku derê, ezê li pey te bêm.» 20 Îsa jê re got: «Ku-
nên roviyan hene, hêlînên teyrên ezmanan jî hene, lê cihekî Kurê*
Mirov tune ku serê xwe lê deyne.» 21 Ji şagirtên* wî yekî jê re got:
«Ya Xudan! Destûrê bide min ku ez pêşî herim bavê xwe ve-
şêrim.» 22 Lê Îsa ji wî re got: «Tu li pey min were! Bihêle, bila mirî
miriyên xwe veşêrin!»

### *Îsa Bagerê Radiwestîne*

*(Marqos 4:35-41; Lûqa 8:22-25)*

23 Gava ew ket qeyikê, şagirtên* wî jî li pey wî siwar bûn. 24 Ji
nişkê ve di golê de bagereke mezin rabû, wusa ku pêlên avê bi ser

---

[a] 8:17 Ji: Îşaya 53:4

qeyikê diketin. Heçî Îsa bû, radiza. 25 Şagirt nêzîkî wî bûn, ew
hişyar kirin û gotin: «Ya Xudan! Me xilas bike! Em helak dibin!»
26 Îsa li wan vegerand: «Hey kêmîmanno, hûn çima ditirsin?»
Hingê ew rabû, li bayê û li golê hilat* û bêpêjiniyeke mezin çêbû.
27 Hemû şaş man û gotin: «Ma ev mirovekî çawa ye? Ba û gol jî bi
ya wî dikin!»

### *Îsa Du Mirovên Cinoyî Qenc Dike*

*(Marqos 5:1-20; Lûqa 8:26-39)*

28 Gava ku Îsa derbasî aliyê din bû û gihîşt herêma Gedarî-
niyan, du mirovên cinoyî* ji nav goristanê derketin û hatin pêşiya
wî. Ew ewqas har bûn ku kes nikaribû di wê riyê re derbas bibûya.
29 Îcar wan bi qîrîn gotin: «Ya Kurê* Xwedê, ma te çi ji me ye?
Ma ji berî ku wext bê, tu hatî vir ku me bidî ezabê?» 30 Ji wan wê-
vetir garaneke mezin a berazan diçêriya. 31 Cinan ji wî lava kirin û
gotin: «Eger tu me derxî, me bişîne nav garana berazan.» 32 Wî ji
wan re got: «Herin!» Hingê ew derketin û çûn nav berazan. Hemû
garanê xwe di kaşê re avêt golê û di avê de xeniqî. 33 Gavanên
berazan reviyan, çûn bajêr, her tişt û çi ji bo yên cinoyî çêbû,
gotin. 34 Hingê hemû xelkê bajêr hat pêşiya Îsa û gava ku ew dîtin,
jê lava kirin ku ji herêma wan here.

### *Îsa li Gunehan Dibihûre*

*(Marqos 2:1-12; Lûqa 5:17-26)*

9 Îsa ket qeyikekê, derbasî aliyê din bû û hat bajarê xwe. 2 Çend
mirovan felciyekî ku di nav nivînan de bû anî ba wî. Gava ku
Îsa baweriya* wan dît, wî ji yê felcî re got: «Bi zirav be lawo, li
gunehên te hat bihûrtin.»
3 Hingê ji Şerîetzanan hinekan di dilê xwe de got: «Ev mirov
çêran* dike!» 4 Lê Îsa bi fikrên wan dizanibû û got: «Hûn çima di
dilê xwe de tiştên xerab difikirin? 5 Ma kîjan hêsanîtir e? Gotina
‹Li gunehên te hat bihûrtin›, an gotina ku ‹Rabe û rêve here›? 6 Lê
ji bo ku hûn bizanin ku desthilatiya Kurê* Mirov heye ku li ser
rûyê erdê li gunehan bibihûre...» Hingê ji yê felcî re got: «Rabe,
nivînên xwe hilîne û here mala xwe.» 7 Û ew jî rabû û çû mala

9:1 Metta 4:13

xwe. [8] Gava ku elaletê ev yek dît, tirsiya û pesnê Xwedayê ku
desthilatiya weha daye mirovan dan.

### *Îsa Gazî Metta Dike*
*(Marqos 2:13-17; Lûqa 5:27-32)*

[9] Gava Îsa ji wê derê çû, wî mirovek bi navê Metta* li cihê
bacxanê rûniştî dît. Îsa ji wî re got: «Li pey min were.» Metta jî
rabû û li pey wî çû.
[10] Çaxê ku Îsa li mala Metta li ser xwarinê bû, gelek bacgir* û
gunehkar hatin, bi wî û şagirtên wî re li ser sifrê rûniştin. [11] Dema
ku Fêrisiyan* ev yek dît, wan ji şagirtên wî pirsî: «Çima Mamos-
teyê we bi bacgir û gunehkaran re xwarinê dixwe?» [12] Gava Îsa ev
bihîst, got: «Ne yên saxlem, lê yên nexweş hewcedarê hekîm* in.
[13] Îcar hûn herin û mana peyva: ‹Ez rehmê dixwazim, ne goriyê*›
hîn bibin. Ji ber ku ez nehatime gazî yên rast bikim, lê ez hatime
ku gazî yên gunehkar bikim.»[a]

### *Pirsa Rojîgirtinê*
*(Marqos 2:18-22; Lûqa 5:33-39)*

[14] Hingê şagirtên Yûhenna* hatin ba Îsa û ji wî pirsîn: «Çima
em û Fêrisî gelek caran rojiyê digirin, lê şagirtên te rojiyê na-
girin?» [15] Wî ji wan re got: «Heta ku zava bi wan re be, ma dibe ku
xelkê dawetê şînê bigirin? Lê rojên ku zava ji wan bê standin wê
bên û hingê ewê rojiyê bigirin.
[16] «Tu kes bi perçê qumaşê ku neçûye hev, cilê kevin pîne
nake, çimkî ew pînê ku hatiye lêxistin ji cil dikeve û cihê qetiyayî
hê xerabtir dibe. [17] Ne jî kes şeraba nû dixe meşkên kevin. Eger
bixeyê, meşk diteqin, şerab dirije û meşk ziyan dibin. Na, şeraba
nû dixin meşkên nû û herdu jî tên parastin.»

### *Vejandina Keçikê û Qencbûna Jinikê*
*(Marqos 5:21-43; Lûqa 8:40-56)*

[18] Gava ku Îsa ev digotin, serekek hat, li ber wî çû ser çokan û
got: «Ha niha keça min mir. Lê were û destê xwe deyne ser wê,
ewê bijî.» [19] Îsa rabû û tevî şagirtên xwe li pey wî çû.
[20] Di wê navê de jinikek ku ji diwanzdeh salan ve xwîn jê diçû,

---

[a] 9:13 Ji: Hoşêya 6:6

ji paş Îsa ve hat û destê xwe li rêşiyên* kirasê wî da. 21 Jinikê di
dilê xwe de digot: «Bi tenê ez destê xwe li kirasê wî bidim, ezê
qenc bibim.» 22 Îsa zivirî, ew dît û jê re got: «Bi zirav be keça min,
baweriya te tu qenc kirî.» Û jinik ji wê gavê ve sax bû.
23 Gava Îsa ket mala serekê kinîştê*, bilûrvan û elaleta ku
dikirin qîjeqîj dîtin, 24 wî got: «Xwe bidin aliyekî. Keçik nemiriye,
lê ew di xew de ye.» Îcar ew pê keniyan. 25 Piştî ku elalet hat
derxistin derve, ew ket hundir, wî bi destê keçikê girt û keçik rabû.
26 Ev xeber li seranserê wê herêmê belav bû.

### *Îsa Du Mirovên Kor Qenc Dike*

27 Gava Îsa ji wir derbas dibû, du mirovên kor li pey wî hatin û
bi qîrîn gotin: «Li me were rehmê, ey Kurê* Dawid!» 28 Çaxê Îsa
gihîşt malê, mirovên kor hatin ba wî. Hingê Îsa ji wan pirsî: «Hûn
bawer dikin ku ez dikarim vê bikim?» Koran lê vegerand û gotin:
«Erê, ya Xudan.» 29 Hingê Îsa destê xwe danî ser çavên wan û got:
«Bila li gor baweriya we ji we re bibe.» 30 Û çavên wan vebûn. Wî
bi hişkî tembîh li wan kir û got: «Binêrin! Bila tu kes bi vê nezane.»
31 Lê ew derketin, wan navê wî li seranserê wê herêmê belav kir.

### *Îsa Mirovekî Lal Qenc Dike*

32 Çaxê ku ew derketin, mirovekî lal û cinoyî anîn ba Îsa.
33 Gava ku cinê wî hat derxistin, mirovê ku lal bû peyivî. Elalet şaş
ma û got: «Li Îsraêlê tiştekî weha qet nehatiye dîtin.» 34 Lê Fêrisi-
yan got: «Ew bi destê mîrê cinan, cinan derdixe.»

### *Dilşewatiya Îsa*

35 Îsa li hemû bajar û gundan digeriya, di kinîştên* wan de hîn
dikir, Mizgîniya* Padîşahiyê dida û hemû êş û nexweşî qenc di-
kirin. 36 Gava wî elalet dîtin, dilê wî bi wan şewitî. Çimkî ew mîna
miyên bê şivan ên şaşbûyî û belavbûyî bûn. 37 Hingê wî ji şagirtên
xwe re got: «Dexil gelek e, lê pale hindik in. 38 Loma lava ji
Xudanê dexlê bikin, da ku ji bo dexla xwe paleyan bişîne.»

### *Diwanzdeh Şandî*

*(Marqos 3:13-19; Lûqa 6:12-16)*

10 Îsa her diwanzdeh şagirtên xwe gazî ba xwe kirin û
desthilatî da wan ku ruhên nepak derxin, her cûreyê êş û

nexweşiyan qenc bikin. 2 Navên her diwanzdeh Şandiyan* ev in:
Yê pêşî, Şimûn*, ku jê re Petrûs* digotin û birayê wî Endrawis,
Aqûbê* kurê Zebedî û birayê wî Yûhenna*. 3 Filîpos û Bertolome-
yos, Tûma û Mettayê* bacgir, Aqûbê* kurê Halfayos û Tedayos.
4 Şimûnê Welatparêz û Cihûdayê* Îsxeryotî yê ku Îsa da dest.

### *Şandina Diwanzdeh Şandiyan*
*(Marqos 6:7-13; Lûqa 9:1-6)*

5 Îsa ew her diwanzdeh şandin û li wan emir kir û got: «Neçin
nav miletên ne Cihû û nekevin tu bajarê Sameriyan*. 6 Lê hê bêtir
herin ba miyên windabûyî yên mala Îsraêl. 7 Gava ku hûn herin,
Mizgîniyê* bidin û bêjin: ‹Padîşahiya* Ezmanan nêzîk e!› 8 Nexwe-
şan qenc bikin, miriyan rakin, kotiyan* paqij bikin û cinan derxin.
We belaş stand, belaş bidin. 9 Di kemberên xwe de ne zêr, ne zîv û
ne jî sifir hildin. 10 Ji bo rêwîtiyê bi xwe re ne tûrik, ne du kiras, ne
du cot çarox û ne jî dar bibin. Çimkî pale hêjayî xwarina xwe ye.
11 «Kîjan bajar û gundê ku hûn herinê, bipirsin ka kî hêja ye û
heta ku hûn derkevin, li ba wî bimînin. 12 Gava ku hûn ketin ma-
lekê, silavê lê bikin. 13 Eger ew mal hêja be, bila aştiya* we li ser
wê be; eger ne hêja be, bila aştiya* we li we vegere. 14 Kî ku we
qebûl neke û guh nede peyva we, gava hûn ji wê malê an ji wî
bajarî derkevin, toza lingên xwe biweşînin. 15 Bi rastî ez ji we re
dibêjim, di Roja Dawî de, rewşa diyarê Sodom* û Gomorayê wê ji
ya wî bajarî çêtir be.

### *Tengahiyên Mezin*
*(Marqos 13:9-13; Lûqa 21:12-17)*

16 «Va ye, ez we wek miyan dişînim nav guran. Loma wek ma-
ran bi aqil û wek kevokan dilpak bin. 17 Îcar li hember mirovan hay
ji xwe hebin. Çimkî ewê we bidin destê civînên giregiran û di kinîş-
tên xwe de bidin ber qamçiyan; 18 ji rûyê min ewê we bibin ber walî
û padîşahan, da ku hûn ji wan û ji miletan re şahidiyê bikin. 19 Lê
çaxê ku ew we bidin dest, xeman nexwin ku hûnê çi bêjin û çawa
bêjin. Di wê gavê de wê ji we re bê dayîn ku hûn çi bêjin. 20 Çimkî
yê dipeyive ne hûn in, lê Ruhê Bavê we wê bi devê we bipeyive.

---

**10:15** Destpêkirin 19

21 «Bira wê birayê xwe, bav wê zarokê xwe teslîmî mirinê
bike; zarok wê li hember dê û bavê xwe rabin û wan bidin kuştin.
22 Hemû wê di ber navê min de ji we nefret bikin. Lê yê ku heta
dawiyê ragire, ewê xilas bibe.
23 «Gava ku li bajarekî tengahiyê bidin we, hûn birevin baja-
rekî din. Bi rastî ez ji we re dibêjim, beriya hatina Kurê* Mirov,
hûn pê re nagihîjin ku li hemû bajarên Îsraêlê bigerin.
24 «Şagirt ne di ser mamosteyê xwe re ye, ne jî xulam di ser
axayê xwe re ye. 25 Têra şagirt dike ku bibe wek mamosteyê xwe û
têra xulam jî dike ku bibe wek axayê xwe. Eger ji malxwê malê re
Belzebûl* bêjin, îcar ewê ji maliyan re çi û çi nebêjin!

### *Divê Hûn ji Kê Bitirsin*
*(Lûqa 12:2-7)*

26 «Îcar ji wan netirsin. Çimkî tu tiştê nixumandî tune ku
xuya nebe, ne jî tiştekî veşartî heye ku neyê zanîn. 27 Tiştê ku ez
di tariyê de ji we re bêjim, di ronahiyê de bêjin; tiştê ku di guhê
we de tê gotin, li ser banî gazî bikin. 28 Ji wan ên ku bedenê
dikujin, lê nikarin can bikujin netirsin. Hê bêtir ji wî bitirsin ê
ku dikare hem can û hem bedenê di dojehê* de helak bike.
29 Ma du çivîk bi çerxiyekî* nayên firotin? Dîsa jî bê destûra
Bavê we yek ji wan nakeve erdê. 30 Heçî hûn in, mûyên serê we
jî hemû hijmartî ne. 31 Loma netirsin, hûn ji gelek çivîkan hê-
jatir in.

### *Eşkerekirin û Înkarkirin*
*(Lûqa 12:8-9)*

32 «Îcar her kesê ku li ber mirovan min eşkere bike, ez jî, ezê
wî li ber Bavê xwe yê li ezmanan eşkere bikim. 33 Lê kî ku min li
ber mirovan înkar bike, ez jî, ezê wî li ber Bavê xwe yê li ezmanan
înkar bikim.

### *Îsa Dibe Sedemê Cudabûnê*
*(Lûqa 12:51-53; 14:26-27)*

34 «Nefikirin ku ez hatime aştiyê* bînim ser rûyê erdê. Ez ne-
hatime ku aştiyê bînim, lê ez hatime ku şûr bînim. 35 Çimkî ez

hatime ku ‹dijraberiyê bixim navbera bav û kur, dê û keçê, bûkê û
xesûyê. 36 Dijminê mirov wê maliyên mala wî bi xwe bin›.[a]
37 «Yê ku dê an bavê xwe ji min bêtir hez dike, ne hêjayî min
e. Yê ku kur an keça xwe ji min bêtir hez dike jî, ne hêjayî min e.
38 Û ewê ku xaça xwe hilneyne û li pey min neyê, ne hêjayî min e.
39 Yê ku jiyana xwe bibîne, ewê wê winda bike; lê yê ku jiyana
xwe di ber min de winda bike, ewê wê bibîne.

### *Xelat*

*(Marqos 9:41)*

40 «Yê ku we qebûl bike, min qebûl dike û yê ku min qebûl bike,
wî yê ku ez şandime qebûl dike. 41 Yê ku pêxemberekî ji ber ku pê-
xember e qebûl bike, ewê xelata ku ji bo pêxember e bistîne. Û yê ku
mirovekî rast ji ber ku rast e qebûl bike, ewê xelata yê rast bistîne. 42 Û
kî ku tasek ava sar bide yekî ji van biçûkan, ji ber ku ew şagirtê min e,
bi rastî ez ji we re dibêjim, ew tu caran xelata xwe winda nake.»

### *Îsa û Yûhennayê Imadkar*

*(Lûqa 7:18-35)*

11 Çaxê ku Îsa tembîhkirina li her diwanzdeh şagirtên xwe
xilas kir, ew ji wir çû bajarên wan, da ku hîn bike û Miz-
gîniyê bide.
2 Gava Yûhenna di girtîgehê de bihîst ku Mesîh çi dike, wî şa-
girtên xwe şandin ba wî 3 ku ji wî bipirsin: «Ma yê ku wê bihata tu
yî, an divê em li benda yekî din bimînin?» 4 Îsa li wan vegerand û
got: «Herin tiştên ku hûn dibihîzin û dibînin ji Yûhenna re bêjin:
5 Kor dibînin, şil û şeht* rêve diçin, kotî paqij dibin, kerr dibihîzin,
mirî radibin û Mizgînî ji belengazan re tê dayîn. 6 Xwezî bi wî yê
ku ji min neenire.»
7 Gava ku şagirtên Yûhenna diçûn, Îsa dest pê kir û ji elaletê re
li ser Yûhenna peyivî û got: «Hûn derketin çolê, da ku hûn çi
bibînin? Ma çîtikeke ku li ber bayê diheje? 8 Nexwe, hûn çûn ku çi
bibînin? Ma mirovekî ku cilên nermîn li xwe kirine? Ew ên ku
cilên nermîn li xwe dikin di qesrên padîşahan de ne. 9 Nexwe hûn
derketin ku çi bibînin? Ma pêxemberekî? Erê, ez ji we re dibêjim ji
pêxemberekî hê zêdetir. 10 Ev ew e yê ku li ser hatiye nivîsîn:

---

[a] 10:35-36 Ji: Mîxa 7:6

‹Va ye, ez qasidê xwe di pêşiya te de dişînim,
Ewê li pêşiya te riya te amade bike.›[a]
11 Bi rastî ez ji we re dibêjim, di nav wan ên ku ji jinan çêbûn de,
yekî ji Yûhennayê* imadkar meztir derneketiye. Lê di Padîşahiya
Ezmanan de yê herî biçûk ji wî meztir e. 12 Ji roja Yûhennayê* imad-
kar û heta niha, zor li Padîşahiya Ezmanan tê kirin û yên zordar wê
bi dest dixin. 13 Çimkî hemû pêxemberan û Şerîetê heta dema Yûhen-
na pêxemberîtî kirin. 14 Û eger hûn bixwazin vê yekê qebûl bikin,
Êlyasê* ku diviya bihata ew e. 15 Yê ku guhên wî hene bila bibihîze.
16 «Îcar ez vî nifşî* bimînînim çi? Ew mîna wan zarokan in ku
li meydanan rûniştine û gazî hevdû dikin 17 û dibêjin:
‹Me ji bo we li bilûrê xist û hûn nereqisîn.
Me avêt ser miriyan û we şîn negirt.›
18 Çimkî Yûhenna hat, ne dixwar û ne jî şerab vedixwar, lê ew di-
bêjin: ‹Ew bi cinan ketiye.› 19 Kurê* Mirov hat, dixwe û vedixwe,
îcar dibêjin: ‹Va ye xwera û serxweş, dostê bacgir* û gunehkaran.
Lê şehrezayî bi kirinên xwe rast tê dîtin.›»

### *Bajarên Bêbawerî*
*(Lûqa 10:13-15)*

20 Hingê Îsa dest pê kir li wan bajaran hilat*, ku di wan de
gelek ji kerametên wî çêbûbûn. Çimkî wan tobe nekir. 21 «Wey li
te Xorazînê! Wey li te Beytsaydayê! Eger ew kerametên ku li nav
we hatin kirin, li Sûr* û Saydayê bihatana kirin, wanê ji zû ve di
nav xirarî* û xweliyê de tobe bikira. 22 Lê ez ji we re dibêjim, di
Roja Dawî de rewşa Sûr û Saydayê wê ji ya we çêtir be. 23 Û tu, hey
Kefernahûm! Ma tê heta bi ezmên bilind bibî? Na, tê heta bi diyarê*
miriyan herî xwarê! Eger ew kerametên ku li nav te hatin kirin, li
Sodomê* bihatana kirin, ewê heta îro li cihê xwe bima. 24 Lê ez ji we
re dibêjim ku di Roja Dawî de rewşa Sodomê wê ji ya we çêtir be.»

### *Mizgînî ji Westayiyan re*
*(Lûqa 10:21-22)*

25 Di wî wextî de Îsa got: «Ey Bavo, ez ji te re şikir dikim,
Xudanê erd û ezmên! Çimkî te ev tiştên ha ji şehreza û zaneyan

---

[a] **11:10** Ji: Melaxî 3:1
**11:14** Melaxî 4:5 **11:23** Destpêkirin 19

veşartin û ji zarokên biçûk re eşkere kirine. 26 Erê Bavo, çimkî li ba
te ya bi dil ev bû.
27 «Her tişt ji aliyê Bavê min ve ji min re hat dayîn. Ji bilî Bav
tu kes Kur nas nake û ji bilî Kur û yên ku Kur dixwaze Bav bi wan
bide eşkerekirin, tu kes jî Bav nas nake.
28 «Werin ba min, ey hemû yên westayî û bargiran, ezê rihetiyê
bidim we. 29 Nîrê min deynin ser stûyê xwe û ji min hîn bibin, çim-
kî ez nerm û ji dil nefsbiçûk im û hûnê rihetiyê ji bo canê xwe
bibînin. 30 Çimkî nîrê min hêsanî û barê min sivik e.»

### *Pirsa Roja Şemiyê*
*(Marqos 2:23-28; Lûqa 6:1-5)*

12 Hingê Îsa rojeke* Şemiyê di nav dexlan re derbas dibû.
Şagirtên wî birçî bûbûn û dest pê kirin, simbil çinîn û
xwarin. 2 Gava ku Fêrisiyan* ev yek dît, wan ji wî re got: «Binêre!
Şagirtên te tiştê ku roja* Şemiyê nabe dikin.» 3 Îsa li wan vegerand
û got: «Ma we nexwendiye ku Dawid* çi kir, gava ew û yên pê re
birçî bûn? 4 Ew ket Mala* Xwedê, wî û yên bi wî re nanê* pêş-
beriyê xwarin, ku ji bo wî û yên bi wî re çênedibû, lê bi tenê ji bo
kahînan* bû. 5 Ma we di Şerîetê de nexwendiye ku kahîn* di ro-
jên* Şemiyan de, di Perestgehê* de roja Şemiyê xera dikin û dîsa
jî bêsûc in? 6 Lê ez ji we re dibêjim yekî ji Perestgehê meztir li vir
e. 7 Eger we mana vê gotina ‹Ez rehmê dixwazim, ne goriyê*› bi-
zaniya, weyê yên bêsûc sûcdar dernexistana.[a] 8 Çimkî Kurê* Mirov
Xudanê roja Şemiyê ye.»

### *Qenckirina Mirovekî Desthişkbûyî*
*(Marqos 3:1-6; Lûqa 6:6-11)*

9 Îsa ji wê derê rabû, çû kinîşta wan. 10 Li wir mirovek hebû,
ku destê wî hişkbûyî bû. Ji bo ku Îsa sûcdar bikin, wan jê pirsî:
«Ma cayîz e ku mirov roja* Şemiyê nexweşan qenc bike?» 11 Îsa ji
wan re got: «Ma kî ji we miyeke wî hebe û roja Şemiyê bikeve
çalê, ew wê nagire û dernaxe? 12 Îcar mirov hê çiqas ji miyê hêjatir

---

[a] 12:7 Ji: Hoşêya 6:6
12:4 Qanûna Kahîntiyê 24:9; 1 Samûêl 21:1-6

e! Loma roja Şemiyê qencîkirin dibe.» [13] Piştre Îsa ji zilam re got:
«Destê xwe dirêj bike.» Wî jî dirêj kir û wek destê din qenc bû. [14] Lê
Fêrisî derketin derve û bi hev şêwirîn ku ewê çawa Îsa bidin kuştin.

### *Xulamê Xwedê Yê Bijare*

[15] Ji ber ku Îsa bi vê yekê dizanibû, xwe ji wir da aliyekî. Ela-
leteke mezin li pey wî çûn û wî hemû nexweşên wan qenc kirin.
[16] Wî li wan hişk emir kir ku nebêjin ew kî ye, [17] da ew peyva ku bi
devê Îşaya pêxember hatibû gotin bê cih:

[18] «Va ye xulamê min ê ku min bijartiye,
Yê ku ez jê hez dikim û bi dilê min e.
Ezê Ruhê xwe deynim ser wî
Û ewê edaletê bi miletan bide zanîn.
[19] Ew pev naçe û naqîre
Û tu kes dengê wî li kuçeyan nabihîze.
[20] Çîtika perçiqandî naşkêne,
Û fitîla ku dû dike natemirîne,
Heta ku edaletê bigihîne serketinê.
[21] Û milet wê hêviya xwe bi navê wî ve girêdin.»[a]

### *Îsa Cinan Derdixe*

*(Marqos 3:20-30; Lûqa 11:14-23; 12:10)*

[22] Hingê wan yekî cinoyiyê kor û lal anî ba Îsa û wî ew qenc
kir, êdî hem peyivî û hem jî dît. [23] Tevahiya elaletê şaşmayî ma û
gotin: «Gelo Kurê* Dawid ev e?» [24] Lê gava ku Fêrisiyan ev
bihîst, wan got: «Ev mirov bi destê mîrê cinan Belzebûl*, cinan
derdixe.» [25] Îsa bi fikrên wan dizanibû û ji wan re got: «Her
padîşahiya ku di nav wê de dubendî hebe wêran dibe û her bajar an
mala ku di nav wê de dubendî hebe, namîne. [26] Eger Îblîs* Îblîs
derxe, di nav wî de dubendî heye. Êdî padîşahiya wî wê çawa bi-
mîne? [27] Eger ez bi Belzebûl cinan derxim, ma kurên we wan bi kê
derdixin? Ji ber vê yekê ewê bibin dadgerên* we. [28] Îcar, eger ez bi
Ruhê* Xwedê cinan derdixim, hingê Padîşahiya* Xwedê gihîştiye
we. [29] Nexwe çawa yek dikare bikeve mala mêrxasekî û tiştên wî
talan bike? Eger pêşî wî girêde, hingê dikare mala wî talan bike.

---

[a] **12:18-21** Ji: Îşaya 42:1-4

[30] «Yê ku ne bi min re ye, li hember min e û yê ku bi min re
nacivîne, belav dike. [31] Ji bo vê yekê ez ji we re dibêjim, her çêr* û
guneh wê li mirovan bê bihûrtin, lê li wê çêrkirina ku li Ruhê*
Pîroz tê kirin nayê bihûrtin. [32] Kî ku li dijî Kurê Mirov gotinekê
bêje wê li wî bê bihûrtin, lê kî ku li dijî Ruhê Pîroz gotinekê bêje
ne li vê dinyayê û ne jî li dinya ku bê, li wî nayê bihûrtin.

### *Dar û Berê Darê*

*(Lûqa 6:43-45)*

[33] «An darê qenc bikin, wê berê wê qenc be, an jî darê xerab
bikin, wê berê wê xerab be. Çimkî dar ji berê xwe tê naskirin.
[34] Hey nifşê* koremaran! Hûn bi xwe xerab in, çawa hûnê bikarin
tiştên qenc bêjin? Çimkî dev ji tijebûna dil dibêje. [35] Mirovê qenc
ji xezîna dilê xwe ya qenc tiştên qenc derdixe, lê mirovê xerab ji
xezîna dilê xwe ya xerab tiştên xerab derdixe. [36] Lê ez ji we re
dibêjim, mirov wê ji bo her peyva pûç a ku bêje, di Roja Dawî de
hesab bide. [37] Çimkî tê bi peyvên* xwe bêsûc û bi peyvên xwe
sûcdar bêyî derxistin.»

### *Nîşana Ûnis*

*(Marqos 8:11-12; Lûqa 11:29-32)*

[38] Hingê ji Fêrisî û Şerîetzanan hinekan ji wî re got: «Ma-
moste, em dixwazin ku nîşanekê ji te bibînin.» [39] Lê Îsa bersîva
wan da û got: «Nifşê xerab û zînakar li nîşanekê digere, lê ji
nîşana Ûnis* pêxember pê ve, nîşaneke din jê re nayê dayîn.
[40] Çawa ku ‹Ûnis sê roj û sê şevan di zikê masiyê mezin de ma›,
wusa jî Kurê Mirov wê sê roj û sê şevan di dilê erdê de bimîne.[a]
[41] Di Roja Dawî de xelkê Nînewê wê bi vî nifşî re rabe û wî sûcdar
derxe. Çimkî wan bi danezana Ûnis tobe kir û va ye, yekî ji Ûnis
meztir li vir e. [42] Şahbanûya* Başûr wê di Roja Dawî de bi vî nifşî
re rabe û wî sûcdar derxe. Çimkî ew ji wî kujê dinyayê hat, da ku
guhdariya şehrezayiya Silêman* bike û va ye, yekî ji Silêman
meztir li vir e.

---

[a] **12:40** Ji: Ûnis 1:17

**12:42** 1 Padîşah 10:1-13. Ew şahbanûya ji Şeba (li başûrê Erebistanê) hatibû ba Silêman padîşah.

### *Vegerîna Ruhê Xerab*

*(Lûqa 11:24-26)*

43 «Çaxê ku ruhê nepak ji mirov derdikeve, ew di cihên bêav re
derbas dibe, ku li rihetiyê bigere, lê nabîne. 44 Hingê ew dibêje:
‹Ezê vegerim mala xwe ya ku ez jê derketime.› Îcar tê û dibîne ku
ew vala, maliştî û xemilandî ye. 45 Hingê ew diçe, heft cinên din ên
ji xwe hê xerabtir tîne ba xwe û dikevinê û li wê derê rûdinin. Êdî
halê wî mirovî yê dawî ji yê pêşî xerabtir dibe. Wê weha bê ser vî
nifşê xerab jî.»

### *Dê û Birayên Îsa*

*(Marqos 3:31-35; Lûqa 8:19-21)*

46 Hê ku Îsa ji elaletê re dipeyivî, dê û birayên wî li derve
rawestan, xwestin ku bi wî re bipeyivin. 47 Yekî jê re got: «Va ye,
diya te û birayên te li derve ne û dixwazin ku bi te re bipeyivin.»
48 Îsa li wî vegerand û got: «Diya min kî ye û birayên min kî ne?»
49 Bi destê xwe şagirtên xwe nîşan da û got: «Va ne, diya min û
birayên min. 50 Çimkî kî ku daxwaza Bavê min ê li ezmanan bike,
birayê min, xwişka min û diya min ew e.»

### *Mesela Erdê Qenc û Neqenc*

*(Marqos 4:1-9; Lûqa 8:4-8)*

13 Wê rojê Îsa ji mal derket û li perê golê rûnişt. 2 Elaleteke
wusa mezin li dora wî civiya ku ew li qeyikekê siwar bû û
rûnişt. Hingê tevahiya elaletê li qerax rawesta. 3 Îcar Îsa bi meselan
ji wan re li ser gelek tiştan peyivî û got: «Cotkar derket ku tov
biçîne. 4 Gava ku wî tov direşand, hinek jê ket tenişta rê, teyr hatin
û ew xwarin. 5 Hinek ket ser erdê kevirî yê ku axa wî kêm bû û ji
ber ku ax ne kûr bû, ew zû şîn bû. 6 Lê çaxê ku roj hilat* ew kizirî
û ji ber ku rayên* wî tunebûn, hişk bû. 7 Hinekî din ket nav
stiriyan, stirî mezin bûn û ew fetisandin. 8 Û hinek ket ser erdekî
qenc, hinekan sed, hinekan şêst û hinekan jî sî qat ber dan. 9 Yê ku
guhên wî hene bila bibihîze.»

### *Armanca Meselan*

*(Marqos 4:10-12; Lûqa 8:9-10)*

10 Îcar şagirt hatin ba Îsa û jê pirsîn: «Tu çima bi wan re bi me-
selan dipeyivî?» 11 Wî li wan vegerand û got: «Zanîna sirên Padî-

şahiya Ezmanan ji we re hatiye dayîn, lê ji wan re nehatiye dayîn.
12 Çimkî bi kê re hebe, wê bêtir ji wî re bê dayîn û jê re zêde bibe.
Lê bi kê re tunebe, tiştê ku pê re heye jî wê jê bê standin. 13 Ji ber
vê yekê ez ji wan re bi meselan dibêjim: Ew dibînin, lê nabînin, ew
dibihîzin, lê nabihîzin û fêm nakin.
14 Li ser wan, ev pêxemberîtiya Îşaya tê cih, ku dibêje:

‹Hûn çiqas bibihîzin jî, hûn tu caran fêm nakin,
Hûn çiqas bibînin jî, hûn tu caran tênagihîjin.
15 Çimkî dilê vî gelî hişk bûye,
Guhên wan giran bûne
Û wan çavên xwe girtine.
Nebe ku ew bi çavên xwe bibînin
Û bi guhên xwe bibihîzin
Û bi dilê xwe fêm bikin
Û vegerin ku ez wan qenc bikim.›[a]

16 «Lê xwezî bi çavên we, çimkî ew dibînin; xwezî bi guhên
we, çimkî ew dibihîzin. 17 Bi rastî ez ji we re dibêjim, gelek pê-
xember û mirovên rast, dixwestin van tiştên ku hûn dibînin bi-
bînin, lê nedîtin. Dixwestin van tiştên ku hûn dibihîzin bibihîzin, lê
nebihîstin.

### *Şîrovekirina Mesela Erdê Qenc û Neqenc*

*(Marqos 4:13-20; Lûqa 8:11-15)*

18 «De îcar guhdariya mesela yê cotkar bikin: 19 Her kesê ku
peyva li ser Padîşahiyê dibihîze û fêm nake, Yê Xerab tê û tiştê ku
di dilê wî de hatiye çandin direvîne. Tovê ku ketiye tenişta rê ev e.
20 Ewê ku li ser erdê kevirî hatiye çandin jî, ew e ku peyvê dibihîze
û di cih de bi şahî wê qebûl dike. 21 Lê ji ber ku rayê* wî tune, tenê
demeke kurt dimîne. Gava ku ji bo peyvê cefa û tengahiyê
dikişîne, ew zû ji rê derdikeve. 22 Ewê ku di nav stiriyan de hatiye
çandin jî, ew e ku peyvê dibihîze, lê xemên vê dinyayê û xa-
pandina dewlemendiyê peyvê difetisînin û peyv bêber dimîne.
23 Lê ewê ku li erdê qenc hatiye çandin, ew e ku peyvê dibihîze û

---

[a] **13:14-15** Ji: Îşaya 6:9-10
**13:19** «Yê Xerab», yanî «Îblîs».

wê fêm dike. Ew jî ber dide. Hinek jê sed, hinek jê şêst, hinek jî sî
qat ber dide.»

### *Mesela Genim û Zîwanê*

24 Îsa meseleyeke din ji wan re got: «Padîşahiya Ezmanan
dimîne vê yekê: Zilamekî tovê qenc li erdê xwe çand. 25 Lê çaxê ku
her kes di xew de bû, dijminê wî hat, di nav genim de zîwan çand
û çû. 26 Çaxê ku genim gihîşt û ber da, hingê zîwan jî xuya bû.
27 Xulamên malxwê malê hatin û gotin: ‹Ezbenî, ma te tovê qenc di
zeviya xwe de neçand? Îcar ev zîwan ji ku derê çêbû?› 28 Wî ji wan
re got: ‹Dijminekî ev yek kiriye.› Xulaman jî jê pirsî: ‹Tu dixwazî
ku em herin û wan aşêf bikin?› 29 Wî got: ‹Na, çimkî çaxê ku hûn
aşêfa zîwanê bikin, dibe ku hûn genim jî pê re hilkin. 30 Bihêlin,
bila herdu bi hev re mezin bibin, heta dema dirûnê. Wî çaxî ezê
ji paleyan re bêjim: Pêşî zîwanê berhev bikin û ji bo şewitan-
dinê bikin gurz, piştre genim berhev bikin û bînin bixin embara
min.›»

### *Liba Xerdelê û Hevîrtirşk*

*(Marqos 4:30-34; Lûqa 13:18-21)*

31 Îsa meseleyeke din ji wan re got: «Padîşahiya Ezmanan
dimîne vê yekê: Zilamekî rahişt libeke xerdelê û ew di zeviya xwe
de çand. 32 Ew liba ku ji hemû tovan biçûktir e, dîsa jî gava ku ew
mezin dibe, ji pincaran meztir e û dibe dar. Wusa ku teyrên ezma-
nan tên û li ser çiqilên wê bi cih dibin.»
33 Wî meseleyeke din jî ji wan re got: «Padîşahiya Ezmanan
dimîne hevîrtirşkê ku jinekê ew hilda û xist nav sê çap* ar, heta
hemû tirş bû.»
34 Îsa ev tiştên ha hemû bi meselan ji elaletê re gotin û bê
mesele wî tu tişt ji wan re nedigot. 35 Ev çêbû, da ew peyva ku bi
devê pêxember hatibû gotin, bê cih:

«Ezê bi meselan devê xwe vekim
Û ezê tiştên ku ji damezrandina dinyayê vir ve veşartî
mane, eşkere bikim.»[a]

---

[a] **13:35** Ji: Zebûr 78:2
**13:33** Sê çap ar, di wê demê de kêm û zêde 25 kîlo bû.

### *Şîrovekirina Mesela Zîwanê*

36 Hingê Îsa elalet hişt û çû mal. Şagirtên wî hatin balê û jê re
gotin: «Mana mesela zîwana zeviyê ji me re bêje.» 37 Wî bersîva
wan da û got: «Yê ku tovê qenc diçîne Kurê Mirov e. 38 Zevî dinya
ye û tovê qenc jî zarokên Padîşahiyê ne. Zîwan zarokên ê Xerab in
39 û dijminê ku ew çandiye jî Îblîs* e. Dirûn dawiya dinyayê ye û
pale jî milyaket in. 40 Îcar çawa ku zîwan tê berhevkirin û di nav
êgir de tê şewitandin, di dawiya dinyayê de jî wê wusa bibe.
41 Kurê Mirov wê milyaketên xwe bişîne û ewê her tiştên ku mirov
ji rê derdixin û yên ku neheqiyê dikin ji Padîşahiya wî bicivînin.
42 Ewê wan bavêjin nav firna dadayî û li wir wê bibe girîn û qirçîna
diranan. 43 Hingê yên rast wê di Padîşahiya Bavê xwe de wek rojê
şewq bidin. Yê ku guhên wî hene bila bibihîze.

### *Xezîna Veşartî û Durê Giranbiha*

44 «Padîşahiya Ezmanan dimîne xezîna di zeviyê de veşartî.
Zilamekî ew dît, dîsa ew veşart, bi şahî çû, hemû hebûna xwe firot
û ew zevî kirrî.
45 «Dîsa Padîşahiya Ezmanan dimîne vê yekê: Bazirganek li
durên spehî digeriya. 46 Gava ku wî durekî gelek giranbiha dît, çû
hemû hebûna xwe firot û ew kirrî.

### *Mesela Torê*

47 «Dîsa Padîşahiya Ezmanan dimîne wê tora ku tê avêtin
deryayê û her cûreyê masiyan dicivîne. 48 Gava ku ew tije dibe,
masîgir wê dikişînin qerêx. Hingê ew rûdinin, yên qenc dixin
selikan û yên neqenc jî davêjin. 49 Di dawiya dinyayê de wê weha
bibe. Milyaket wê bên û wê xeraban ji nav rastan veqetînin 50 û
wan bavêjin firna dadayî. Li wir wê bibe girîn û qirçîna diranan.»
51 Îsa ji wan pirsî: «Ma we ev tiştên ha hemû fêm kirin?» Wan
got: «Erê.» 52 Hingê wî ji wan re got: «Ji ber vê yekê her Şe-
rîetzanê ku li ser Padîşahiya Ezmanan hatiye perwerdekirin, mîna
malxwê malê ye ku ji xezîna xwe tiştên nû û kevin derdixe.»

### *Îsa li Bajarê Xwe Nisretê Tê Redkirin*

*(Marqos 6:1-6; Lûqa 4:16-30)*

53 Piştî ku Îsa ev mesele xilas kirin, ji wê derê veqetiya. 54 Ew
hat bajarê xwe û wî xelk di kinîşta wan de hîn kir, wusa ku ew

gelek şaş man û wan got: «Ev keramet û şehrezayiya wî ji ku derê ne? 55 Ma ev ne kurê xerat e? Ma navê diya wî ne Meryem* e? Ma Aqûb, Ûsiv, Şimûn û Cihûda ne birayên wî ne? 56 Ma hemû xwişkên wî ne di nav me de ne? Vî mirovî ev hemû tişt ji ku derê anîn?»

57 Û bi vî awayî ew ji wî enirîn. Lê Îsa ji wan re got: «Pêxemberek ji bajarê xwe û ji mala xwe pê ve, li tu cihê din ne bê siyanet* e.» 58 Û ji ber bêbaweriya wan wî li wê derê gelek keramet nekirin.

### *Kuştina Yûhennayê Imadkar*

*(Marqos 6:14-29; Lûqa 9:7-9)*

14 Di wî wextî de Mîr Hêrodês* nav û dengê Îsa bihîst 2 û ji xulamên xwe re got: «Ev Yûhennayê* imadkar e, ji nav miriyan rabûye. Ji ber vê yekê ev karên hêzdar bi destê wî tên kirin.» 3 Çimkî Hêrodês ji ber Hêrodiya jina birayê xwe Filîpos, Yûhenna girtibû û ew avêtibû zîndanê. 4 Ji ber ku Yûhenna ji wî re digot: «Nabe ku tu jinbira xwe bînî.» 5 Loma Hêrodês dixwest ku wî bikuje, lê ji xelkê ditirsiya. Çimkî wan ew pêxember hesab dikirin.

6 Îcar di rojbûyîna Hêrodês de keça Hêrodiyayê li ber vexwendiyan reqisî. Ev yek li Hêrodês gelek xweş hat 7 û wî soz da û sond xwar ku keçik her çi jê bixwaze, ewê bide wê. 8 Keçika ku ji aliyê diya xwe ve hatibû şîretkirin, ji Hêrodês re got: «Serê Yûhennayê* imadkar, li vir li ser sêniyekê bide min.» 9 Padîşah xemgirtî bû, lê ji ber sonda xwe û ji ber ên ku bi wî re li ser sifrê rûniştibûn, wî emir kir ku daxwaza wê bê cih. 10 Wî şand û di zîndanê de serê Yûhennayê imadkar da jêkirin. 11 Serê wî li ser sêniyekê anîn û dan keçikê. Wê jî ew ji diya xwe re bir. 12 Hingê şagirtên Yûhenna hatin, cesedê wî birin û ew veşartin. Paşê çûn û ji Îsa re gotin.

### *Îsa Pênc Hezar Mirov Têr Dike*

*(Marqos 6:30-44; Lûqa 9:10-17; Yûhenna 6:1-14)*

13 Gava Îsa ev yek bihîst, ji wê derê bi serê xwe ket qeyikekê û xwe da cihekî bêpêjin. Lê gava elaletê ev yek bihîst, bi peyatî ji bajaran li pey wî çûn. 14 Çaxê Îsa derket bejê, wî elaleteke mezin dît û dilê wî bi wan şewitî û nexweşên wan qenc kirin.

15 Dema ku bû êvar, şagirtên wî hatin ba wî û jê re gotin: «Ev
der cihekî bêpêjin e û wext jî êdî dereng e. Destûra elaletê bide, da
ku herin gundan û ji xwe re xwarinê bikirrin.» 16 Lê Îsa ji wan re
got: «Ne hewce ye ku ew herin. Hûn xwarinê bidin wan!» 17 Şa-
girtan bersîv da û gotin: «Li vir bi tenê pênc nan û du masiyên me
hene.» 18 Wî got: «Wan bînin vir ba min.» 19 Û wî emir li hemû
elaletê kir ku li ser giyê rûnin. Hingê wî her pênc nan û herdu masî
hildan, li ezmên nêrî, şikir kir û nan şkandin. Wî ew dan şagirtên
xwe û şagirtan jî ew li xelkê belav kirin. 20 Hemûyan xwar û têr bûn.
Wan diwanzdeh selik pariyên ku zêde mabûn dan hev. 21 Hijmara yên
ku xwarin, ji bilî jin û zarokan, li dora pênc hezar mêr bû.

### *Îsa li ser Avê Rêve Diçe*
*(Marqos 6:45-52; Yûhenna 6:15-21)*

22 Gava ku Îsa elalet verêdikir, wî zû pêstûrî li şagirtên xwe kir
ku ew li qeyikê siwar bibin û ji beriya wî derbasî aliyê din ê golê,
Beytsaydayê bibin. 23 Piştî ku wî elalet verêkir, hingê bi serê xwe
hilkişiya çiyê, da ku dua bike. Dema ku bû êvar, ew li wir bi tenê
bû. 24 Di wê navê de qeyik ji bejê gelek dûr ketibû û ber pêlan
diket, çimkî ba ji hember wan ve dihat.
25 Nêzîkî berbanga sibehê, Îsa li ser golê rêve çû û nêzîkî şa-
girtan bû. 26 Gava wan dît ku ew li ser golê rêve diçe, bizdiyan û ji
tirsan kirin qîrîn û gotin: «Ev xeyalet e!» 27 Lê Îsa di cih de bi wan
re peyivî û got: «Bi zirav bin! Ez im. Netirsin!» 28 Petrûs lê vege-
rand û got: «Ya Xudan, eger tu bî, emir bide ku ez li ser avê bêm
ba te.» 29 Wî got: «Were!» Hingê Petrûs jî ji qeyikê peya bû, li ser
avê rêve çû û ber bi Îsa ve hat. 30 Lê çaxê dît ku bager xurt e,
tirsiya û xewirî* nav avê, qîriya û got: «Ya Xudan, min xilas
bike!» 31 Îsa di cih de destê xwe dirêj kir, ew girt û jê re got: «Ey
kêmîmano! Tu çima dudilî bûyî?» 32 Dema ku ew hilkişiyan qe-
yikê, ba rawesta. 33 Hingê yên ku di qeyikê de bûn, perizîn* wî û
gotin: «Bi rastî tu Kurê* Xwedê yî.»

### *Îsa li Cênîsartê Nexweşan Qenc Dike*
*(Marqos 6:53-56)*

34 Gava ew derbasî aliyê din bûn, ketin bejê û hatin bajarê
Cênîsartê*. 35 Çaxê mirovên wî cihî Îsa nas kirin, wan xeber şand

wan der û doran û xelkê hemû nexweşên xwe anîn ba wî 36 û ji bo
ku destê xwe li rêşiyên* kirasê wî bidin lava dikirin. Hemû yên ku
destê xwe lê dan qenc bûn.

### *Adetên Bav û Kalan*

*(Marqos 7:1-13)*

15 Hingê ji Orşelîmê* hinek Fêrisî û Şerîetzan hatin ba Îsa û
jê pirsîn: 2 «Ma çima şagirtên te adetên bav û kalan dişkê-
nin? Beriya xwarinê ew destên xwe naşon!» 3 Îsa li wan vegerand
û got: «Îcar hûn jî çima ji bo adetên xwe emrê Xwedê dişkênin?
4 Çimkî Xwedê gotiye: ‹Qedrê dê û bavê xwe bigire›[a] û ‹Yê ku
tiştê xerab ji dê û bavê xwe re bêje, divê bê kuştin.›[b] 5 Lê hûn
dibêjin: ‹Eger yek ji dê an jî ji bavê xwe re bêje: Ew alîkariya ku
wê ji min bigihîşta te, ji Xwedê re hatiye dayîn, 6 êdî ew ne mecbûr
e ku qedrê bavê xwe bigire.› Bi vî awayî we ji bo adetên xwe
peyva Xwedê rakir. 7 Hey durûno! Îşaya li ser we rast pêxemberîtî
kiriye:

> 8 ‹Ev gel bi devê xwe rûmetê dide min
> Lê dilê wan ji min dûr e.
> 9 Bi pûçîtî diperizin min,
> Di hîndariya xwe de,
> Emrên mirovan hîn dikin.›[c]»

### *Tiştên ku Mirov Murdar Dikin*

*(Marqos 7:14-23)*

10 Îsa elalet gazî ba xwe kir û ji wan re got: «Guh bidinê û fêm
bikin. 11 Tiştê ku di dev re diçe hundirê mirov, wî murdar nake, lê
tiştê ji dev dertê, ew mirov murdar* dike.» 12 Hingê şagirt nêzîkî
wî bûn û jê pirsîn: «Ma tu dizanî gava ku Fêrisiyan ev bihîst,
enirîn?» 13 Îsa li wan vegerand: «Her şitilê ku Bavê min ê li ez-
manan neçandiye, ewê ji ra* ve bê rakirin. 14 Dev ji wan berdin!
Ew kor in, rêberên koran in. Eger kor rêberiya yê kor bike, herdu jî
wê bikevin çalê.»
15 Hingê Petrûs jê re got: «Mana vê meselê ji me re bêje.»

---

[a] **15:4** Ji: Derketin 20:12; Dubarekirina Şerîetê 5:16

[b] **15:4** Ji: Derketin 21:17 [c] **15:8-9** Ji: Îşaya 29:13

16 Îsa ji wan re got: «Ma hûn jî hê fêmkor in? 17 Ma hûn fêm nakin
her tiştê ku dikeve dev, diçe zik û ji wê derê dertê derve? 18 Lê
tiştên ku ji dev derdikevin, ji dil tên û ew mirov murdar* dikin.
19 Çimkî fikrên xerab, kuştin, zîna, fuhûşî, dizî, şahidiya derewîn û
çêr* ji dil dertên. 20 Tiştên ku mirov murdar dikin ev in, lê xwarina
bi destê neşuştî mirov murdar nake.»

### *Baweriya Jinika Kenanî*

*(Marqos 7:24-30)*

21 Îsa ji wê derê derket û xwe da aliyê herêma Sûr* û Saydayê.
22 Jineke Kenanî ya* ku ji wê herêmê bû hat ba wî, gazî kir û got:
«Ya Xudan, Kurê* Dawid, li min were rehmê! Keça min ji destê
cinan êşeke mezin dikişîne.» 23 Lê wî tu peyv jê re negot. Hingê
şagirtên wî nêzîkî wî bûn û hêvî jê kirin: «Wê bişîne bila here,
çimkî li pey me tê û dike qîrîn.» 24 Îsa bersîv da û got: «Ez tenê ji
bo miyên windabûyî yên mala Îsraêl hatime şandin.» 25 Lê jinik
nêzîk bû, xwe avêt lingên wî û got: «Ya Xudan, alîkariya min
bike!» 26 Wî lê vegerand û got: «Ne rast e ku mirov nanê zarokan
bistîne û bavêje ber kûçikan.» 27 Wê got: «Erê ya Xudan, lê kûçik
jî hûrikên ku ji ber xwediyên wan dikevin erdê, dixwin.» 28 Hingê
Îsa got: «Ya sitiyê, baweriya* te xurt e! Bila wek ku tu dixwazî ji
te re bibe.» Ji wê gavê ve keça wê qenc bû.

### *Îsa Gelek Mirovan Qenc Dike*

29 Îsa ji wê derê derket û hat ber Gola Celîlê. Ew hilkişiya çi-
yayekî û li wir rûnişt. 30 Elaleteke mezin hat ba wî. Bi xwe re şil û
şeht*, kor, seqet, kerr û lal û gelek nexweşên din anîn û ew li ber
lingên wî dirêj kirin û wî ew qenc kirin. 31 Gava ku elaletê dît lal
dipeyivin, seqet sax dibin, şil û şeht rêve diçin û kor dibînin, şaş
man û pesnê Xwedayê Îsraêl dan.

### *Îsa Çar Hezar Mirov Têr Dike*

*(Marqos 8:1-10)*

32 Îsa şagirtên xwe gazî ba xwe kirin û got: «Dilê min bi vê
elaletê dişewite, ev sê roj e ku ew bi min re ne û tiştekî wan tune
ku ew bixwin. Ez naxwazim ku wan birçî bişînim, da ku di rê de
dilê wan nebihûre!» 33 Hingê şagirtên wî bersîv dan: «Li vê çolê

emê ji ku derê evqas nan bînin ku vê elaletê têr bikin?» [34] Îsa ji wan pirsî: «Ma çend nanên we hene?» Wan got: «Heft nan û çend masiyên me yên biçûk hene.»

[35] Wî li elaletê emir kir ku li erdê rûnin. [36] Hingê wî heft nan û masî hildan, şikir kir, ew şkandin, dan şagirtan û wan jî dan elaletê. [37] Hemûyan xwar û ew têr bûn. Piştre wan heft selik pariyên bermayî dan hev. [38] Hijmara yên ku xwaribûn jî, ji bilî jin û zarokan çar hezar mêr bû.

[39] Piştî ku Îsa elalet verêkir, li qeyikê siwar bû û çû herêma Megedanê.

### *Daxwaza Dîtina Nîşanekê*

*(Marqos 8:11-13; Lûqa 12:54-56)*

16 Hingê Fêrisî û Sadûqî* hatin ba Îsa û ji bo ku wî biceribînin, jê xwestin ku ji ezmên nîşanekê raberî wan bike. [2] Wî li wan vegerand û got: «Gava ku dibe êvar, hûn dibêjin ‹Hewa wê xweş be, çimkî ezman sor e!› [3] Îcar serê sibê hûn dibêjin: ‹Îro hewa wê nexweş be, çimkî ezman sor e û ewr belek in.› Hûn li ezmên dinêrin û dizanin ku hewa wê çawa be; ma hûn nîşanên deman fêm nakin? [4] Nifşê* xerab û zînakar li nîşanekê digere, lê ji nîşana Ûnis* pêxember pê ve, nîşanek jê re nayê dayîn.» Îsa ew hiştin û çû.

### *Hevîrtirşkê Fêrisî û Sadûqiyan*

*(Marqos 8:14-21)*

[5] Gava ku şagirt derbasî aliyê din ê golê bûn, ji bîr kirin ku bi xwe re nên bibin. [6] Îsa ji wan re got: «Hay ji xwe hebin û xwe ji hevîrtirşkê Fêrisî û Sadûqiyan biparêzin.» [7] Şagirt di nav xwe de peyivîn û gotin: «Ji ber ku me nan bi xwe re neaniye weha dibêje.» [8] Îsa dizanibû ku ew çi dibêjin, îcar wî got: «Ey kêmîmanno! Ji ber ku nanê we tune, çima hûn di nav xwe de dipeyivin? [9] Ma hûn hê jî fêm nakin? Ma nayê bîra we ku çawa pênc nan pênc hezar mirov têr kirin û we çend selik dan hev? [10] Û çawa heft nan çar hezar mirov têr kirin û we çend selik jî dan hev? [11] Ma çawa hûn fêm nakin ku ez ne li ser nên ji we re dibêjim? Lê li hember hevîrtirşkê Fêrisî û Sadûqiyan hay ji xwe hebin.» [12] Hingê wan fêm kir ku ew nabêje li hember hevîrtirşkê nên hay ji xwe hebin, lê ji hînkirina Fêrisî û Sadûqiyan xwe biparêzin.

### *Şahidiya Petrûs a li ser Îsa*
*(Marqos 8:27-30; Lûqa 9:18-21)*

13 Gava Îsa hat herêma Qeyseriya Filîpos, wî ji şagirtên xwe
pirsî: «Li gor gotina xelkê Kurê* Mirov kî ye?» 14 Wan lê ve-
gerand û gotin: «Hinek dibêjin Yûhennayê* imadkar, hinek dibêjin
Êlyas* û hinekên din jî dibêjin Yêremya* an jî yek ji pêxemberan*
e.» 15 Îsa ji wan re got: «Lê hûn çi dibêjin? Bi ya we ez kî me?»
16 Şimûn-Petrûs bersîv da û got: «Tu Mesîh* î, Kurê* wî Xwedayê
jîndar î.» 17 Îsa lê vegerand û got: «Xwezî bi te, ey Şimûnê kurê
Ûnis, çimkî yê ku ev ji te re vekiriye ne xwîn û goşt e, lê Bavê min
ê li ezmanan e. 18 Û ez ji te re dibêjim: Tu Petrûs* î û ezê li ser vê
latê Civîna* xwe ava bikim. Hêza diyarê* miriyan nikare wê bin-
dest bike. 19 Ezê mifta Padîşahiya Ezmanan bidim te, tu her çi li ser
erdê girêdî, ewê li ezmanan jî bê girêdan û tu her çi li ser erdê
vekî, ewê li ezmanan jî bê vekirin.» 20 Hingê wî li şagirtên xwe
emir kir ku ji kesî re nebêjin ew Mesîh e.

### *Îsa ji pêşî ve li ser Mirin û Rabûna Xwe Dibêje*
*(Marqos 8:31-9:1; Lûqa 9:22-27)*

21 Ji hingê ve Îsa dest pê kir nîşanî şagirtên xwe da, ku divê ew
here Orşelîmê û ji destê rihspî, serekên kahînan* û Şerîetzanan
gelek cefayê bikişîne, bê kuştin û roja sisiyan rabe.
22 Petrûs ew kişand aliyekî, lê hilat û got: «Ev ji te dûr be, ya
Xudan! Ev tişt tu caran bi te nayê!» 23 Lê Îsa zivirî û ji Petrûs re
got: «Xwe bide pey min, Îblîs! Tu ji min re dibî asteng; çimkî tu ne
tiştên xwedayî*, lê tiştên mirovî difikirî.»
24 Hingê Îsa ji şagirtên xwe re got: «Eger yek bixwaze li pey
min bê, bila xwe înkar bike, rahêje xaça xwe û li pey min bê.
25 Çimkî kî ku bixwaze jiyana xwe xilas bike, ewê wê winda bike;
lê kî ku jiyana xwe di ber min de winda bike, ewê wê bibîne.
26 Mirovek hemû dinyayê bi dest bixe jî, lê jiyana xwe winda bike,
çi feyda wî heye? An dikare çi di ber jiyana xwe de bide? 27 Çimkî
Kurê Mirov wê bi rûmeta Bavê xwe ve, tevî milyaketên xwe bê û

---

**16:17** Bi Yewnanî «kurê Yona» nivîsî ye. «Yona» bi zimanê Aramî* ye; ji bo vê bi Kurdî «Ûnis» tê gotin. Li vir ev nav kurtvebirrîna «Yûhenna» ye.
**16:18** Mana navê «Petrûs» bi zimanê Yewnanî ev e: «Lat» an «kevir».

hingê wê li gor kirinên her kesî bide wî. 28 Bi rastî ez ji we re
dibêjim, hin ji van kesên ku li vir radiwestin, heta ku nebînin Kurê
Mirov di Padîşahiya xwe de tê, ew mirinê qet tam nakin.»

### *Dîtina Îsa Diguhere*

*(Marqos 9:2-13; Lûqa 9:28-36)*

17 Piştî şeş rojan Îsa Petrûs, Aqûb û birayê wî Yûhenna bi
xwe re birin û ew bi serê xwe derxistin çiyayekî bilind. 2 Li
wir, li ber wan dîtina wî hat guhertin. Rûyê wî wek rojê şewq da û
cilên wî wek ronahiyê çîlspî bûn. 3 Ji nişkê ve Mûsa* û Êlyas* li
wan xuya bûn û bi Îsa re peyivîn. 4 Petrûs ji Îsa re got: «Ya Xudan,
qenc e ku em li vir in! Eger tu bixwazî, ezê li vir sê holikan çêkim.
Yekê ji te re, yekê ji Mûsa re û yekê jî ji Êlyas re.»
5 Hê ew dipeyivî, ewrekî ronahîdar li ser wan kir sî û dengek ji
ewr hat û got: «Ev e Kurê min ê delal. Dilê min bi wî xweş e. Guh-
dariya wî bikin!» 6 Gava şagirtan ev bihîst, ji tirsan deverû ketin
erdê. 7 Lê Îsa hat, destê xwe li wan da û got: «Rabin, netirsin!»
8 Gava şagirtan çavên xwe hildan, wan ji Îsa pê ve tu kesî din
nedît.
9 Çaxê ji çiyê dihatin xwarê, Îsa li wan emir kir û got: «Heta
ku Kurê Mirov ji nav miriyan ranebe, tiştên ku we dîtin, ji kesî re
nebêjin.» 10 Şagirtan ji wî pirsî û gotin: «Nexwe çima Şerîetzan di-
bêjin, divê pêşî Êlyas bê?» 11 Îsa li wan vegerand û got: «Bi rastî,
Êlyas tê û her tiştî serrast dike. 12 Lê ez ji we re dibêjim, ji xwe Êl-
yas hatiye û wan ew nas nekir. Lê çi ku dilê wan xwest bi wî kirin.
Bi vî awayî Kurê Mirov jî wê ji destê wan cefayê bikişîne.» 13 Hin-
gê şagirtan fêm kir ku ew ji wan re li ser Yûhennayê imadkar dibêje.

### *Îsa Zarokekî Cinoyî Qenc Dike*

*(Marqos 9:14-29; Lûqa 9:37-43)*

14 Çaxê hatin ba elaletê, mirovek nêzîkî Îsa bû, li ber wî çû ser
çokan 15 û got: «Ya Xudan, li kurê min were rehmê! Bi atiyê* di-
keve û êşeke mezin dikişîne. Ew gelek caran dikeve nav êgir û nav
avê. 16 Min ew anî ba şagirtên te, lê wan nikaribû wî qenc bikin.»
17 Îsa bersîv da û got: «Hey nifşê bêbawer û jirêderketî! Ezê heta

---

16:27 Zebûr 62:12 17:10 Melaxî 4:5

kengê bi we re bim, heta kengê ezê li we sebir bikim? Wî bînin vir
ba min.» 18 Îsa li cin hilat û ew jê derket. Ji wê gavê ve kurik qenc
bû.
19 Hingê şagirt bi serê xwe hatin ba Îsa û jê pirsîn: «Çima me
nikaribû em cin derxin?» 20-21 Wî li wan vegerand: «Ji ber ku bawe-
riya we kêm e. Bi rastî ez ji we re dibêjim, eger wek liba xerdelê
baweriya we hebe, hûn ji vî çiyayî re bêjin: ‹Ji vir here wir›, ewê
here. Tu tişt tune ku ji bo we çênebe.»

### *Îsa Careke Din li ser Mirin û Rabûna Xwe Dibêje*

*(Marqos 9:30-32; Lûqa 9:43-45)*

22 Gava ku ew bi hev re li Celîlê* bûn, Îsa ji wan re got: «Hin-
dik maye ku Kurê Mirov bidin destê mirovan. 23 Ewê wî bikujin û
roja sisiyan ewê rabe.» Şagirt bi vê yekê gelek xemgîn bûn.

### *Baca Perestgehê*

24 Çaxê ew gihîştin Kefernahûmê, bacgir* hatin ba Petrûs û jê
pirsîn: «Ma Mamosteyê we baca Perestgehê* nade?» 25 Wî got:
«Belê.»
Dema Petrûs hat malê, pêşî Îsa ji wî re got: «Tu çawa dibînî,
Şimûn? Padîşahên dinyayê bac û bêşê ji kê distînin? Ma ji kurên
xwe an ji yên biyanî?» 26 Petrûs got: «Ji yên biyanî.» Hingê Îsa ji
wî re got: «Nexwe kur serbest in. 27 Lê ji bo ku em dilê wan ne-
hêlin, tu here golê û şewkê xwe bavêje. Masiyê ku pêşî hat, bigire,
devê wî veke, tê zîvekî* mezin bibînî. Wî bibe, ji bo min û ji bo
xwe bide wan.»

### *Yê Mezin Kî Ye?*

*(Marqos 9:33-37; Lûqa 9:46-48)*

18 Wê gavê şagirt hatin ba Îsa û jê pirsîn: «Di Padîşahiya Ez-
manan de yê herî mezin kî ye?» 2 Wî gazî zarokekî kir, di
nav wan de da rawestandin 3 û got: «Bi rastî ez ji we re dibêjim,
heta ku hûn venegirin û nebin wek zarokan, hûn tu caran nakevin
Padîşahiya Ezmanan. 4 Loma, kî xwe wek vî zarokî nizim bike, di

---

17:20 Di hin destnivîsaran de ev jî heye: «Lê cinên weha ji bilî dua û rojiyê bi tiştekî din dernakevin.»

17:24 Derketin 30:13. Li gor Şerîeta Mûsa, baca Perestgehê dû zîv bûn.

Padîşahiya Ezmanan de yê herî mezin ew e. [5] Û kî ku zarokekî
weha bi navê min qebûl bike, ew min qebûl dike. [6] Lê kî ku yekî ji
van biçûkên ku bawerî bi min anîne ji rê derxe, ji bo wî çêtir e ku
beraşekî mezin bi stûyê wî ve bê daleqandin û bikeve binê der-
yayê.

### *Jirêderketin*

*(Marqos 9:42-48; Lûqa 17:1-2)*

[7] «Ji ber tiştên ku mirov ji rê derxin, wey li serê dinyayê! Nabe
ku ev sedem neyên, lê belê wey li wî mirovê ku ew sedem bi destê
wî bên. [8] Eger destê te an lingê te, te bixe guneh, wî jêke û ji xwe
bavêje. Ji bo te çêtir e ku tu bê dest an bê ling bikevî jiyanê, ne ku
tu bi herdu dest û bi herdu lingên xwe ve bêyî avêtin nav agirê her-
heyî. [9] Û eger çavê te, te bixe guneh, wî derxe û ji xwe bavêje. Ji
bo te çêtir e ku tu bi çavekî bikevî jiyanê, ne ku bi herdu çavan ve
tu bêyî avêtin nav agirê dojehê*.

### *Mesela Miya Windabûyî*

*(Lûqa 15:3-7)*

[10-11] «Binêrin! Hûn yekî ji van biçûkan kêm nebînin. Çimkî ez
ji we re dibêjim ku milyaketên wan li ezmanan hergav li rûyê Bavê
min ê li ezmanan dinêrin.

[12] «Gelo hûn çawa dibînin? Eger sed miyên mirovekî hebin û
yek ji wan riya xwe winda bike, ma ew not û nehan li çiyê nahêle
û naçe li ya windabûyî nagere? [13] Û eger wê bibîne, bi rastî ez ji
we re dibêjim, ewê ji wan not û nehên ku riya xwe winda nekirine
bêtir bi wê şa bibe. [14] Bi vî awayî Bavê we yê li ezmanan jî nax-
waze ku yek ji van biçûkan winda bibe.

### *Birayê ku Gunehan Dike*

*(Lûqa 17:3)*

[15] «Eger birayê te li hember te guneh bike, here û gava ku hûn
herdu bi tenê ne, sûcê wî nîşanî wî bide. Eger ew guhdariya te
bike, te birayê xwe kar kir. [16] Lê eger ew guhdariya te neke, kesek
an du kesên din jî bi xwe re bibe, ‹da ku her peyv bi devê dido an

---

**18:10-11** Di hin destnivîsaran de ev jî heye: «Ji ber ku Kurê Mirov hat, da
ku yê windabûyî xilas bike.»

sê şahidan rast derkeve.›[a] 17 Lê eger ew nexwaze guhdariya wan jî
bike, ji civîna* bawermendan re bêje. Îcar, eger ew nexwaze guh-
dariya civîna bawermendan jî bike, bila êdî ew ji bo te bibe wek
yekî pûtperest û bacgir.
18 «Bi rastî ez ji we re dibêjim, hûn çi li ser rûyê erdê girêdin,
ewê li ezmên jî bê girêdan. Û hûn çi li ser rûyê erdê vekin, ewê li
ezmên jî bê vekirin. 19 Careke din bi rastî ez ji we re dibêjim, eger
dido ji we li ser rûyê erdê, li ser her tiştê ku bixwazin, bibin yek,
ewê ji aliyê Bavê min ê li ezmanan ve ji wan re çêbe. 20 Çimkî li
ku derê dido an sisê bi navê min bên ba hev, li wir ez jî di nav wan
de me.»

### *Mesela Xulamê Bêrehm*

21 Hingê Petrûs hat ba Îsa û jê re got: «Ya Xudan, gava ku
birayê min li hember min guneh bike, divê ez çend caran li wî
bibihûrim? Ma heta heft caran?» 22 Îsa bersîva wî da: «Ez ji te re
dibêjim, ne heta heft caran, lê heta heftê caran heft. 23 Çimkî Padî-
şahiya Ezmanan dimîne vê yekê: Padîşahek hebû ku xwest bi xu-
lamên xwe re li hesab binêre. 24 Gava ku padîşah dest bi hesab kir,
yekî ku bi deh hezar telant* deyndarê wî bû, anîn ba wî. 25 Ji ber
ku nikaribû deynê xwe bide, axayê wî emir kir ku ew, jina wî,
zarokên wî û hemû malê wî bên firotin û deynê wî bê dayîn. 26 Xu-
lam xwe avêt ber lingên wî, jê lava kir û got: ‹Li min sebir bike,
ezê hemû deynê xwe bidim.› 27 Dilê axa bi wî şewitî, ew berda û li
deynê wî jî bihûrt.
28 «Lê gava ku xulam derket derve, wî hevalekî xwe yê xulam
dît ku bi sed zîvî* deyndarê wî bû. Wî destê xwe avêt qirika wî û
got: ‹Deynê min ê ku li te ye bide.› 29 Hevalê wî yê xulam xwe
avêt ber lingên wî û jê lava kir û got: ‹Li min sebir bike, ezê deynê
xwe bidim.› 30 Lê wî nexwest, çû û ew avêt zîndanê heta ku ew
deynê xwe bide.
31 «Gava ku hevalên wî yên xulam ev yek dîtin, gelek xemgirtî

---

[a] 18:16 Ji: Dubarekirina Şerîetê 19:15
18:22 Wusa jî tê fêmkirin: «lê heta heftê û heft caran».
18:24 Qîmeta telantekê heqê palekî ji bo panzdeh sala zêdetir bû.
18:28 Zîvek bi qasî heqê roja palekî bû.

bûn, rabûn çûn ba axayê xwe û hemû tiştên bûyî jê re gotin.
[32] Hingê axa xulam gazî ba xwe kir û jê re got: ‹Hey xulamê xerab!
Ji ber ku te ji min lava kir, ez li hemû deynê te bihûrîm. [33] Wek ku
ez li te hatim rehmê, ma ne diviya ku tu jî li hevalê xwe yê xulam
bihatayî rehmê?› [34] Axayê wî hêrs bû û ew da destê cefakeran, heta
ku ew hemû deynê xwe bide.

[35] «Eger her yek ji we ji dil li birayê xwe nebihûre, Bavê min ê
li ezmên jî wê bi vî awayî li we bike.»

### *Pirsa Jinberdanê*

*(Marqos 10:1-12)*

19 Gava ku Îsa gotina xwe xilas kir, hingê ji Celîlê derket û
derbasî herêma Cihûstanê ya aliyê din ê Çemê Urdunê bû.
[2] Elaleteke mezin li pey wî çû û wî ew li wir qenc kirin.

[3] Hinek ji Fêrisiyan ji bo ku wî biceribînin nêzîkî wî bûn û jê
pirsîn: «Ma dibe ku bi her sedemî mêr jina xwe berde?» [4] Îsa bersî-
va wan da û got: «Ma we nexwendiye ku Afirandar di destpêkê de
ew ‹nêr û mê afirandin›[a] [5] û got: ‹Ji ber vê yekê mêr wê dê û bavê
xwe berde, bi jina xwe re bibe yek û herdu jî wê bibin bedenek.›[b]
[6] Wusa ku êdî ew ne dido ne, lê bedenek in. Ji ber vê yekê yên ku
Xwedê ew kirine yek, bila mirov wan ji hevdû veneqetînin.»

[7] Hingê Fêrisiyan pirsî: «Nexwe çima Mûsa emir kir ku mêr
‹kaxeza jinberdanê bide jina xwe û wê berde›[c]?» [8] Îsa li wan ve-
gerand û got: «Ji ber serhişkiya we Mûsa destûr da we ku hûn ji-
nên xwe berdin. Lê di destpêkê de ne weha bû. [9] Ez ji we re dibê-
jim, kî ku ji zînayê pê ve bi sedemekî din jina xwe berde û yeke
din bîne, zînayê dike.»

[10] Şagirtên wî jê re gotin: «Eger rewşa navbera jin û mêr bi vî
awayî be, çêtir e ku nezewicin.» [11] Wî ji wan re got: «Her kes ni-
kare vê gotinê qebûl bike, bi tenê yên ku ji wan re hatiye dayîn
dikarin qebûl bikin. [12] Çimkî hin hene ji zikmakî nemêr in, hin
hene ji aliyê mirovan ve tên nemêrkirin û hin jî hene ku di ber

---

[a] 19:4 Ji: Destpêkirin 1:27; 5:2 [b] 19:5 Ji: Destpêkirin 2:24

[c] 19:7 Ji: Dubarekirina Şerîetê 24:1

19:9 Di hin destnivîsaran de ev jî heye: «Û yê ku ya berdayî bistîne, zînayê dike.»

Padîşahiya Ezmanan de xwe nemêr dikin. Yê ku dikare vê qebûl bike, bila qebûl bike.»

### *Îsa Zarokan Pîroz Dike*

*(Marqos 10:13-16; Lûqa 18:15-17)*

13 Hingê zarok anîn ba Îsa, da ku destên xwe deyne ser wan û ji
bo wan dua bike. Îcar şagirtan li yên ku ew anîn hilat. 14 Lê Îsa got:
«Bihêlin, bila zarok bên ba min û pêşiya wan negirin, çimkî Padîşahiya Ezmanan ji yên weha re ye.» 15 Û wî destên xwe danîn ser
wan û ji wê derê çû.

### *Xortê Dewlemend li Jiyana Herheyî Digere*

*(Marqos 10:17-31; Lûqa 18:18-30)*

16 Îcar mirovek nêzîkî Îsa bû û jê pirsî: «Mamoste, divê ez çi
qenciyê bikim, da ku ez jiyana herheyî bi dest bixim?» 17 Îsa lê
vegerand û got: «Tu çima li ser qenciyê ji min dipirsî? Bi tenê Yek
heye ku qenc e. Lê eger tu dixwazî bikevî jiyanê, emran bîne cih.»
18 Yê xort jê pirsî: «Kîjanan?» Îsa lê vegerand: «‹Nekuje!›, ‹Zînayê
neke!›, ‹Nedize!›, ‹Şahidiya derewîn neke!›, 19 ‹Qedrê dê û bavê
xwe bigire!› û ‹Wek ku tu ji xwe hez dikî, ji cîranê xwe hez bike!›[a]» 20 Yê xort jê re got: «Min ev tişt hemû pêk anîne. Hê çi
kêmahiya min heye?» 21 Îsa bersîva wî da: «Eger tu dixwazî bêkêmahî bî, here, her tiştê xwe bifiroşe û li belengazan belav bike.
Hingê wê li ezmanan xezîna te hebe. Û were, bikeve pey min.»
22 Gava ku yê xort ev peyv bihîst bi xemgînî çû, çimkî gelek mal û
milkê wî hebû.

23 Hingê Îsa ji şagirtên xwe re got: «Bi rastî ez ji we re dibêjim,
ji bo mirovê dewlemend, ketina Padîşahiya Ezmanan zehmet e.
24 Dîsa ez ji we re dibêjim, derbasbûna devê ya di qula derziyê re,
ji ketina mirovê dewlemend a Padîşahiya* Xwedê hêsanîtir e.»
25 Gava ku şagirtan ev bihîst, gelek şaş man û wan pirsî: «Eger
wusa be, kî dikare xilas bibe?» 26 Îsa li wan nêrî û got: «Li ba
mirovan ev nabe, lê li ba Xwedê her tişt dibe.»

27 Hingê Petrûs li Îsa vegerand û got: «Va ye, me her tişt
hiştine û em li pey te hatine. Îcar wê ji bo me çi hebe?» 28 Wî ji

---

[a] **19:18-19** Ji: Derketin 20:12-16; Dubarekirina Şerîetê 5:16-20; Qanûna Kahîntiyê 19:18

wan re got: «Bi rastî ez ji we re dibêjim, di nûbûna hemû tiştan de,
çaxê ku Kurê Mirov li ser textê xwe yê rûmetê rûne, hûn ên ku li
pey min hatine jî hûnê li ser diwanzdeh textan rûnin û dîwana*
diwanzdeh eşîrên Îsraêl bikin. 29 Her kesê ku di ber navê min de
dev ji mal, an xwişk, an bira, an dê an bav, an zarok an zeviyên
xwe berdaye, wê sed qatî li wan bistîne û jiyana herheyî par bistîne.
30 Lê gelek ên pêşî wê bibin ên paşî û yên paşî wê bibin ên pêşî.»

### *Mesela Paleyên Rêz*

20 «Padîşahiya Ezmanan dimîne vê yekê: Malxwêyekî malê
hebû, ku serê sibê zû derket, da ku ji bo rezê xwe paleyan
bigire. 2 Ew ji bo rojê bi zîvekî* bi paleyan re li hev hat û ew şan-
din nav rezê xwe.
3 «Saet li dora nehan ew derket û li meydana sûkê kesên din
dîtin, ku betal radiwestan. 4 Wî ji wan re got: ‹Hûn jî herin di rezê
min de bixebitin û heqê we çi be, ezê bidim.› 5 Ew jî rabûn û çûn.
Dîsa ew li dora nîvro û saet sisiyan derket û eynî tişt kirin. 6 Saet li
dora pêncan jî derket, hinekên din jî dîtin ku betal radiwestan. Wî
ji wan re got: ‹Çima hûn tevahiya rojê li vir disekinin û tiştekî na-
kin?› 7 Wan bersîv da: ‹Çimkî tu kesî em bi paletî negirtin.› Wî ji
wan re got: ‹Hûn jî herin nav rêz.›
8 «Gava ku bû êvar, xwediyê rêz ji serkarê xwe re got: ‹Gazî
paleyan bike û ji yên paşî dest pê bike heta yên pêşî heqê hemûyan
bide.› 9 Paleyên ku piştî nîvro li dora saet pêncan hatibûn girtin,
hatin û her yekî zîvek stand. 10 Îcar gava ku yên pêşî hatin, wan
guman kir ku wê bêtir bistînin. Lê her yekî ji wan jî zîvek stand.
11 Çaxê ku perê xwe standin, dest pê kirin, li hember malxwê malê
kirin pitepit 12 û gotin: ‹Evên ku paşiyê hatin, tenê saetekê xebitîn,
lê te em ên ku hemû giraniya rojê û germiya wê kişandin, bi wan
re yek girtin.› 13 Lê malxwê malê ji yekî ji wan re got: ‹Heval, ez
neheqiyê li te nakim. Ma tu bi min re bi zîvekî li hev nehatî? 14 Ra-
hêje heqê xwe û here. Ez dixwazim bi qasî ku min da te, bidim vî
yê paşî jî. 15 Ma heqê min tune ku ez çi bixwazim, ez bi malê xwe
bikim? An tu çavnebariya camêriya min dikî?›
16 «Bi vî awayî yên paşî wê bibin ên pêşî û yên pêşî wê bibin
ên paşî.»

### *Îsa Cara Sisiyan li ser Mirin û Rabûna Xwe Dibêje*
*(Marqos 10:32-34; Lûqa 18:31-34)*

17 Gava ku Îsa hildikişiya Orşelîmê, wî diwanzdeh şagirtên
xwe dan aliyekî û di rê de ji wan re got: 18 «Va ye, em hildikişin
Orşelîmê. Kurê Mirov wê bê dayîn destê serekên kahînan û Şe-
rîetzanan. Ewê cezayê mirinê li ser wî bidin 19 û wî bidin destê
miletan, da ku tinazên xwe bi wî bikin, bidin ber qamçiyan û wî
xaç bikin. Û roja sisiyan ewê ji nav miriyan rabe.»

### *Daxwaza Diya Kurên Zebedî*
*(Marqos 10:35-45)*

20 Hingê diya kurên Zebedî bi kurên xwe re nêzîkî Îsa bû, li ber
wî çû ser çokan û ji wî xwest ku tiştekî ji bo wê bike. 21 Îsa ji wê
pirsî: «Tu çi dixwazî?» Wê jî got: «Emir bike ku ev herdu kurên
min, di Padîşahiya te de yek li milê te yê rastê, yê din li milê te yê
çepê rûne.» 22 Îsa bersîv da û got: «Hûn nizanin ku hûn çi dixwa-
zin. Ma hûn dikarin wê kasa tehl a ku ezê vexwim, vexwin?» Wan
got: «Em dikarin.» 23 Îsa ji wan re got: «Bi rastî hûnê ji kasa min
vexwin, lê rûnandina li milê min ê rastê û çepê ne di destê min de
ye. Ev ji bo wan e ku ji aliyê Bavê min ve ji wan re hatiye ama-
dekirin.»
24 Gava her deh şagirtan ev yek bihîst, li herdu birayan hêrs
bûn. 25 Lê Îsa ew gazî ba xwe kirin û got: «Hûn dizanin ku serekên
miletan serdestiyê li wan dikin û giregirên wan jî hukumdariya
xwe li ser wan dikin. 26 Lê di nav we de wê ne weha be. Di nav we
de, kî ku bixwaze bibe yê mezin, divê bibe xizmetkarê we. 27 Û di
nav we de kî ku bixwaze bibe yê pêşî, divê bibe xulamê we.
28 Çawa ku Kurê Mirov jî nehatiye ku jê re xizmet bê kirin, lê
hatiye ku xizmetê bike û di ber gelekan de canê xwe berdêl bide.»

### *Îsa Çavê Du Koran Vedike*
*(Marqos 10:46-52; Lûqa 18:35-43)*

29 Çaxê ku ew ji bajarê Erîhayê derdiketin, elaleteke mezin li
pey Îsa çû. 30 Du mirovên kor li tenişta rê rûdiniştin. Gava bihîstin
ku Îsa di wê derê re derbas dibe, qîriyan û gotin: «Ya Xudan, Ku-
rê* Dawid, li me were rehmê!»
31 Elaletê li wan hilat, da ku dengê xwe bibirin, lê ew bêtir

qîriyan û gotin: «Ya Xudan, Kurê Dawid, li me were rehmê!»
32 Îsa rawesta, gazî wan kir û got: «Hûn çi dixwazin ku ez ji bo we
bikim?» 33 Wan bersîv da û got: «Ya Xudan, bila çavên me bi-
bînin.» 34 Dilê wî bi wan şewitî û destê xwe danî ser çavên wan. Di
cih de çavên wan vebûn û li pey Îsa çûn.

### *Îsa bi Rûmet Dikeve Orşelîmê*

*(Marqos 11:1-11; Lûqa 19:28-38; Yûhenna 12:12-19)*

21 Gava ku ew nêzîkî Orşelîmê bûn û hatin Beytfacê li ba
Çiyayê Zeytûnê, Îsa du şagirtên xwe şandin û 2 ji wan re
got: «Herin gundê pêşberî xwe, hema hûnê li wir kereke girêdayî
ya bi dehşik bibînin. Wan vekin û ji min re bînin. 3 Eger kesek tiş-
tekî ji we re bêje, jê re bêjin: ‹Ew ji Xudan re lazim in û ewê zû
wan bi şûn de bişîne.›»

4 Ev wusa çêbû, da ew peyva ku bi devê pêxember hatibû
gotin, bê cih:

5 «Ji bajarê Siyonê* re bêjin:
‹Va ye, Padîşahê te
Bi nefsbiçûkî li kerê siwarbûyî,
Li dehşikê, yanî li dehşikê kerê siwarbûyî tê ba te.›[a]»

6 Şagirt çûn û wek ku Îsa ji wan re gotibû kirin. 7 Wan ker û
dehşik anîn, cilên xwe danîn ser wan û Îsa siwar bû. 8 Elaleteke
mezin cilên xwe li ser rê raxistin. Hinekên din jî ji daran çiqil
birrîn û avêtin ser rê. 9 Elaleta ku li pêşiya wî diçû û yên ku li pey
dihatin weha diqîriyan û digotin:

«Hosanna* ji Kurê* Dawid re!
Yê ku bi navê Xudan tê pîroz* be!
Li bilindahiyên herî jorîn Hosanna!»[b]

10 Gava Îsa ket Orşelîmê, tevahiya bajêr hejiya û gotin: «Ev kî
ye?» 11 Elaletê got: «Ev Îsa pêxember e! Ji bajarê Nisreta Celîlê ye.»

### *Îsa Perestgehê Paqij Dike*

*(Marqos 11:15-19; Lûqa 19:45-48; Yûhenna 2:13-22)*

12 Îsa ket Perestgehê û hemû yên ku li wê derê kirrîn û firotin
dikirin, avêtin derve. Maseyên pereguhêran û kursiyên kevokfi-

---

[a] 21:5 Ji: Zekerya 9:9; Îşaya 62:11 [b] 21:9 Ji: Zebûr 118:25-26

roşan gêr kirin. 13 Wî ji wan re got: «Hatiye nivîsîn: ‹Wê ji mala
min re mala duayê bê gotin.› Lê hûn wê dikin ‹şkefta rêbiran›[a].»
14 Li Perestgehê, kor û şil û şeht* anîn ba wî û wî ew qenc ki-
rin. 15 Lê gava ku serekên kahînan û Şerîetzanan karên nedîtî yên
ku Îsa dikirin dîtin û dengê zarokan bihîstin ên ku di Perestgehê de
digotin: «Hosanna ji Kurê Dawid re!», hêrs bûn 16 û gotin: «Ma tu
nabihîzî ku ev zarok çi dibêjin?» Îsa li wan vegerand û got: «Belê,
ma we ev yek qet nexwendiye: ‹Te ji devê zarokên biçûk û yên li
ber şîr pesin deranî.›[b]» 17 Wî ew li wir hiştin û ji bajêr derket, çû
Beytanyayê û şev li wir bihûrand.

### *Dara Hêjîrê*

*(Marqos 11:12-14, 20-24)*

18 Serê sibê çaxê ku Îsa vedigeriya bajêr, ew birçî bû. 19 Li kê-
leka rê dareke hêjîrê dît û nêzîkî wê bû, lê ji pelan pê ve tiştek bi
wê ve nedît. Hingê wî ji darê re got: «Bila careke din êdî tu caran
tu ber nedî!» Dara hêjîrê di cih de hişk bû.
20 Gava ku şagirtan ev yek dît, şaş man û gotin: «Ma dara
hêjîrê çawa di cih de hişk bû?» 21 Îsa li wan vegerand û got: «Bi
rastî ez ji we re dibêjim, eger baweriya we hebe û hûn nekevin
şikê, hûn ne bi tenê dikarin tiştê ku bi vê dara hêjîrê bûye bikin, lê
eger hûn ji vî çiyayî re bêjin: ‹Ji cihê xwe rabe û xwe bavêje der-
yayê› wê bibe. 22 Eger baweriya we hebe, hûn bi dua çi bixwazin
hûnê bistînin.»

### *Pirsa li ser Desthilatiya Îsa*

*(Marqos 11:27-33; Lûqa 20:1-8)*

23 Îsa ketibû Perestgehê û hîn dikir, hingê serekên kahînan û
rihspiyên gel hatin ba wî û jê pirsîn: «Tu bi kîjan desthilatiyê van
tiştan dikî? Û kê ev desthilatî daye te?» 24 Îsa li wan vegerand û
got: «Ez jî, ezê pirsekê ji we bikim. Eger hûn bersîva min bidin,
ezê ji we re bêjim ka ez bi kîjan desthilatiyê van tiştan dikim:
25 Imadkirina* Yûhenna ji ku derê bû? Ma ew ji ezmên bû an ji
mirovan?» Ew di nav xwe de şêwirîn û gotin: «Eger em bêjin: ‹Ji
ezmên e›, hingê ewê bêje: ‹Nexwe we çima ji wî bawer nekir?›

---

[a] **21:13** Ji: Îşaya 56:7; Yêremya 7:11 [b] **21:16** Ji: Zebûr 8:2

[26] Lê eger em bêjin: ‹Ji mirovan e›, em ji xelkê ditirsin, çimkî he-
mû Yûhenna pêxember dihesibînin.» [27] Wan bersîv da Îsa û gotin:
«Em nizanin.» Hingê wî ji wan re got: «Ez jî ji we re nabêjim ku
ez van tiştan bi çi desthilatiyê dikim.»

### *Mesela Du Kuran*

[28] «Hûn çi difikirin? Du kurên mirovekî hebûn. Ew çû ba yê
pêşî û jê re got: ‹Lawo, tu here, îro di nav rêz de bixebite.› [29] Wî
got: ‹Ez naçim›, lê paşê poşman bû û çû. [30] Îcar bav çû ba kurê
xwe yê din û eynî tişt jê re got. Wî jî bersîv da û got: ‹Baş e, ezê
herim, bavo›, lê ew neçû. [31] Ji herduyan kîjanî bi daxwaza bavê
xwe kir?» Wan bersîv da û got: «Yê pêşî.»
Îsa ji wan re got: «Bi rastî ez ji we re dibêjim, bacgir û fahîşe jî
wê beriya we bikevin Padîşahiya Xwedê. [32] Çimkî Yûhenna hat ku
riya rastdariyê nîşanî we bide û we ji wî bawer nekir, lê bacgir û
fahîşeyan jê bawer kir. Piştî ku we ev dît jî hûn poşman nebûn ku
ji wî bawer bikin.

### *Mesela Rezvanan*

*(Marqos 12:1-12; Lûqa 20:9-19)*

[33] «Guhdariya meseleyeke din bikin: Malxwêyekî malê hebû
ku rez danî. Wî hawirdora wî sênc kir, li navê mahserek kola û bir-
ca nobedaran çêkir. Piştre wî rez bi kirê da rezvanan û çû welatekî
din. [34] Gava ku dema rezçinînê nêzîk bû, wî xulamên xwe şandin
ba rezvanan, da ku berê wî bicivînin. [35] Rezvanan xulamên wî gir-
tin, li yekî xistin, yek kuştin û yê din jî dane ber keviran. [36] Îcar wî
mirovî ji cara pêşî bêtir xulam şandin. Rezvanan eynî tişt anîn serê
wan jî. [37] Li dawiyê ew rabû û kurê xwe şand û got: ‹Ewê siya-
neta* kurê min bigirin.› [38] Lê gava ku rezvanan kur dît, ji hevdû re
gotin: ‹Ev wêris e! Werin, em wî bikujin û bibin xwediyê mîrasa
wî.› [39] Wan ew girt, avêtin derveyî rêz û kuştin. [40] Îcar gava ku
xwediyê rêz bê, ewê çi bi van rezvanan bike?» [41] Wan jî lê ve-
gerand û gotin: «Ewê wan mirovên xerab bi awayekî xerab bikuje
û rêz bide hinekên wusa ku di dema rezçinînê de berê wî bidinê.»
[42] Îsa ji wan re got: «Ma we qet di Nivîsarên* Pîroz de ev nexwen-
diye:

‹Ew kevirê ku hostayan red kir,
Bû kevirê serê rikin*.
Ev ji aliyê Xudan ve çêbû,
Û ev li ber çavê me karekî ecêb e!›[a]»

43 «Ji bo vê yekê ez ji we re dibêjim, Padîşahiya Xwedê wê ji
we bê standin û ji miletekî wusa re bê dayîn, yê ku berê wî bi-
gihîne. 44 Yê ku bi ser vî kevirî de bikeve, wê bibe perçe perçe û ev
kevir bi ser kê de bikeve, wê wî hûrhûr bike.» 45 Gava ku serekên
kahînan û Fêrisiyan ev mesele bihîst, wan fêm kir ku ew li ser wan
dibêje. 46 Wan xwest ku Îsa bigirin, lê ji elaletê tirsiyan, çimkî wan
ew pêxember didît.

### *Mesela Dawetê*
*(Lûqa 14:15-24)*

22 Îsa careke din bi meselan ji wan re peyivî û got: 2 «Pa-
dîşahiya Ezmanan dimîne vê yekê: Padîşahekî ji bo kurê
xwe dawet amade kir. 3 Wî xizmetkarên xwe şandin ba wan ên ku
ji bo dawetê hatine vexwendin, lê wan nexwest ku bên. 4 Piştre wî
hin xizmetkarên din şandin û got: ‹Ji yên vexwendî re bêjin: Min
şîva xwe amade kiriye; conega û dewarên min ên dermale hatine
serjêkirin û hemû tişt amade ye. Kerem bikin, werin dawetê.› 5 Lê
wan qet bala xwe nedayê, lêxistin û çûn. Yek çû zeviya xwe, yê
din çû bazirganiya xwe. 6 Yên mayî jî xizmetkarên wî girtin, riswa
kirin û ew kuştin. 7 Padîşah hêrs bû. Wî leşkerên xwe şandin, ev
mêrkujên ha kuştin û bajarê wan şewitand. 8 Hingê wî ji xiz-
metkarên xwe re got: ‹Dawet amade ye, lê yên vexwendî ne hêja
bûn. 9 De herin serê kuçeyan û hûn kê bibînin, gazî dawetê bikin.›
10 Hingê xizmetkar derketin kuçeyan, qenc û xerab, her kesên ku
dîtin civandin û eywana dîlanê bi vexwendiyan tije bû.
11 «Lê gava ku padîşah çû hundir da ku vexwendiyan bibîne,
mirovek dît ku cilên dawetê li xwe nekiribû. 12 Hingê wî jê pirsî û
got: ‹Heval, bê cilên dawetê ma çawa tu ketî vir?› Zimanê wî ne-
geriya. 13 Li ser vê yekê padîşah ji xizmetkaran re got: ‹Dest û
lingên wî girêdin û wî bavêjin derve, nav tariyê. Li wir wê bibe
girîn û qirçîna diranan.›

---

[a] 21:42 Ji: Zebûr 118:22-23

14 «Çimkî yên ku hatine gazîkirin pirr in, lê yên ku hatine hil-
bijartin hindik in.»

### *Pirsa Bacdayînê*

*(Marqos 12:13-17; Lûqa 20:20-26)*

15 Hingê Fêrisî derketin û bi hev şêwirîn, ka ewê çawa Îsa bi
peyva wî bixin xefikê. 16 Wan şagirtên xwe û alîgirên Hêrodês*
şandin ba wî û gotin: «Mamoste, em dizanin ku tu mirovekî rast î û
tu riya Xwedê bi rastî hîn dikî. Tu cihêtiyê naxî nav mirovan, çim-
kî tu li rûyê mirovan nanêrî. 17 Îcar ji me re bêje ka tu çawa dibînî?
Ma çêdibe ku em bacê bidin Qeyser an na?»
18 Ji ber ku Îsa bi niyetxerabiya wan dizanibû, got: «Hey durû-
no! Çima hûn min diceribînin? 19 Ka perê bacê nîşanî min bidin!»
Wan zîvek* ji wî re anî 20 û wî ji wan pirsî: «Ev resm û nivîsîn ên
kê ne?» 21 Wan got: «Yên Qeyser in.» Hingê Îsa ji wan re got:
«Nexwe tiştên Qeyser bidin Qeyser û tiştên Xwedê bidin Xwedê.»
22 Gava ku wan ev bihîst, şaş man, dev ji wî berdan û çûn.

### *Pirsa Rabûna Miriyan*

*(Marqos 12:18-27; Lûqa 20:27-40)*

23 Eynî rojê Sadûqiyên* ku digotin vejîna* miriyan tune, hatin
ba Îsa 24 û jê pirsîn: «Mamoste, Mûsa got: ‹Eger yekî ku zarokên
wî nebin bimire, divê birayê wî jina wî bîne û dûndanê* ji birayê
xwe re rake.›[a] 25 Îcar li ba me heft bira hebûn. Yê pêşî jin anî û mir.
Ji ber ku zarokên wî çênebûn, jina xwe ji birayê xwe re hişt. 26 Ey-
nî tişt hat serê yê dido û yê sisiyan jî, heta bi yê heftan, hemû
mirin. 27 Piştî hemûyan jin jî mir. 28 Îcar Roja* Vejînê, ji her heftan
ew jin wê bibe ya kê? Çimkî hemûyan ew anîbû!»
29 Îsa li wan vegerand û got: «Hûn şaş dibin, ji ber ku hûn
Nivîsarên* Pîroz û hêza Xwedê nizanin. 30 Piştî Roja Vejînê ew ne
jinê tînin û ne jî mêr dikin; çimkî wê bibin wek milyaketên ezmên.
31 Ma we nexwendiye ku li ser vejîna miriyan Xwedê ji we re çi
dibêje? 32 ‹Ez Xwedayê Birahîm*, Xwedayê Îshaq* û Xwedayê
Aqûb* im.›[b] Ew ne Xwedayê miriyan, lê Xwedayê zindiyan e.»
33 Gava ku elaletê ev yek bihîst li hînkirina wî gelek şaş ma.

---

[a] **22:24** Ji: Dubarekirina Şerîetê 25:5 [b] **22:32** Ji: Derketin 3:6

### *Emrê Herî Mezin*
*(Marqos 12:28-34; Lûqa 10:25-28)*

34 Gava Fêrisiyan bihîst ku Îsa devê Sadûqiyan girtiye, li hev
civiyan. 35 Ji nav wan yekî Şerîetzan ew ceriband û pirsî: 36 «Ma-
moste, di Şerîetê* de emrê herî mezin kîjan e?» 37 Îsa lê vegerand û
got: «‹Ji Xudan Xwedayê xwe bi hemû dilê xwe, bi hemû canê
xwe û bi hemû hişê xwe hez bike.›[a] 38 Emrê pêşî û mezin ev e.
39 Yê diduyan jî wek vî ye: ‹Wek ku tu ji xwe hez dikî, ji cîranê
xwe hez bike.›[b] 40 Hemû Şerîet û pêxember li ser bingeha van her-
du emran in.»

### *Mesîh Kurê Kê Ye?*
*(Marqos 12:35-37; Lûqa 20:41-44)*

41 Gava ku Fêrisî li hev civiyabûn Îsa ji wan pirsî: 42 «Hûn li
ser Mesîh* çi difikirin? Ew kurê kê ye?» Wan lê vegerand û gotin:
«Ew kurê* Dawid e.» 43 Îsa ji wan re got: «Nexwe çawa Dawid bi
saya Ruh navê Xudan hildide û dibêje:

44 ‹Xudan ji Xudanê min re got:
Li milê min ê rastê rûne
Heta ku ez dijminên te bikim bin lingên te.›[c]

45 «Eger Dawid ji wî re dibêje ‹Xudan›, çawa ew dibe kurê
wî?» 46 Îcar tu kesî nikaribû peyvekê bersîva wî bide. Û ji wê rojê
pê ve tu kesî newêribû ku tiştekî jê bipirse.

### *Durûtiya Fêrisî û Şerîetzanan*
*(Marqos 12:38-40; Lûqa 11:37-52; 20:45-47)*

23 Hingê Îsa ji elaletê û ji şagirtên xwe re got: 2 «Şerîetzan û
Fêrisî li ser kursiyê Mûsa* rûdinin. 3 Loma her tiştê ku ji
we re dibêjin, bikin û bînin cih. Lê li gor kirinên wan nekin, çimkî
ew dibêjin û nakin; 4 barên giran û hilgirtina wan zehmet girêdidin
û datînin ser pişta mirovan, lê ew bi xwe naxwazin ji bo rakirina
wan baran tiliya xwe jî bilebitînin.
5 «Hemû tiştên ku dikin ji bo dîtina mirovan e. Bazbendên*

---

[a] 22:37 Ji: Dubarekirina Şerîetê 6:5
[b] 22:39 Ji: Dubarekirina Şerîetê 19:18
[c] 22:44 Ji: Zebûr 110:1

xwe pehn dikin û rêşiyên* kirasên xwe dirêj dikin. 6 Di ziyafetan
de ji cihên jorîn, li kinîştan* jî ji kursiyên pêşî hez dikin. 7 Hez
dikin ku di sûkan de silav li wan bê kirin û ji aliyê xelkê ve jî bi
awayê ‹ya mamoste› bên gazîkirin. 8 Lê bila ji we re nebêjin ‹ma-
moste›, çimkî Mamosteyê we yek e û hûn hemû bira ne. 9 Û li ser
rûyê erdê ji tu kesî re nebêjin ‹Bavo›, çimkî Bavê we yek e, Bavê
ezmanî ye. 10 Ne jî bila kes ji we re bêje ‹rêber›, çimkî Rêberê we
yek e, Mesîh e. 11 Di nav we de yê herî mezin bila bibe xizmetkarê
we. 12 Çimkî kî xwe bilind bike, wê nizim bibe û kî xwe nizim
bike, ewê bilind bibe.

13-14 «Wey li we hûn Şerîetzan û Fêrisîno! Hûn durûno! Hûn
Padîşahiya Ezmanan li ber mirovan digirin. Hûn bi xwe nakevinê û
ne jî hûn dihêlin ên ku dixwazin bikevinê, derbas bibin.

15 «Wey li we hûn Şerîetzan û Fêrisîno! Hûn durûno! Hûn
derya û bejê li hev didin, da ku hûn yekî bînin ser baweriya xwe, lê
gava ku we ew anî jî hûn du caran ji xwe bêtir wî dikin kurê
dojehê*.

16 «Wey li we hûn rêberên kor! Hûn dibêjin: ‹Eger yek bi
Perestgehê sond bixwe, ne tiştek e, lê eger yek bi zêrê Perestgehê
sond bixwe, divê ew sonda xwe bîne cih.› 17 Hey bêhişên kor!
Kîjan meztir e? Zêr an Perestgeha ku zêr pîroz dike? 18 Dîsa hûn
dibêjin: ‹Eger yek bi gorîgehê* sond bixwe tiştek nabe, lê eger ew
bi diyariya li ser gorîgehê sond bixwe, divê ew sonda xwe bîne
cih.› 19 Hey korno! Kîjan meztir e? Diyarî, an gorîgeha ku diyariyê
pîroz dike? 20 Loma yê ku bi gorîgehê sond bixwe, hem bi wê û
hem jî bi hemûyên ku li ser wê ne sond dixwe. 21 Û yê ku bi Pe-
restgehê sond bixwe, hem bi wê û hem jî bi yê ku di nav wê de ye
sond dixwe. 22 Îcar yê ku bi ezmên sond bixwe, ew hem bi textê
Xwedê û hem jî bi yê ku li ser rûdine sond dixwe.

23 «Wey li we hûn Şerîetzan û Fêrisîno! Hey hûn durûno! Hûn
dehyeka* pûng, rizyan û kîmyona xwe didin, lê hûn tiştên Şerîetê
yên hê girîngtir, dadperwerî*, rehm û baweriyê dihêlin. Diviyabû

---

**23:5** Dubarekirina Şerîetê 6:8; Hijmartin 15:37-40

**23:13** Di hin destnivîsaran de ev jî heye: «Wey li we hûn Şerîetzan û Fêrisîno! Hûn durûno! Hûn malên jinebiyan dadiqurtînin û ji bo ku hûn bên dîtin, hûn duayên dirêj dikin. Ji ber vê yekê dîwana* we, wê girantir be.»

ku we ev bikirana û dev ji yên din jî bernedana. 24 Hey rêberên
kor! Hûn pêşûyê dipalînin, lê devê dadiqurtînin.
25 «Wey li we hûn Şerîetzan û Fêrisîno! Hûn durûno! Hûn
derveyî tas û sêniyan dişon, lê hundirê wan ji tiştên talankirî û
çavbirçîtiyê tije ye. 26 Hey Fêrisiyê kor! Pêşî hundirê tas û sêniyan
bişo, wê derveyê wan jî paqij bibe.
27 «Wey li we hûn Şerîetzan û Fêrisîno! Hey hûn durûno! Hûn
wek gorên spîkirî ne, ku ji derve xweşik xuya dibin, lê hundirê
wan tije hestiyên miriyan û hemû tiştên qirêjî ne. 28 Bi vî awayî
hûn jî ji derve wek ên rast li mirovan xuya dibin, lê ji hundir ve
hûn tije durûtî û neheqî ne.
29 «Wey li we hûn Şerîetzan û Fêrisîno! Hey durûno! Hûn go-
rên pêxemberan ava dikin û qubên mirovên rast dixemilînin. 30 Û
hûn dibêjin: ‹Eger em di dema bav û kalên xwe de bijiyana, meyê
bi wan re xwîna pêxemberan nerijanda.› 31 Bi vî awayî hûn li hem-
ber xwe şahidiyê dikin ku hûn kurên wan in ên ku pêxember kuş-
tine. 32 De hûn jî rabin, çapa xerabiya bav û kalên xwe tije bikin!
33 «Hey marno! Hûn nifşên koremaran! Hûnê ji cezayê dojehê
çawa birevin? 34 Ji ber vê yekê, va ye, ez ji we re pêxember, mi-
rovên şehreza û mamosteyan dişînim. Hûnê hinekan ji van bikujin
û xaç bikin û yên din jî li kinîştên xwe bidin ber qamçiyan û ji
bajarekî biteriqînin bajarê din. 35 Bi vî awayî hemû xwîna bêsûc a
ku li ser rûyê erdê hatiye rijandin, wê bikeve stûyê we: Ji xwîna
Habîlê* rast heta bi xwîna Zekeryayê Kurê Berexya, yê ku we di
navbera Perestgeh û gorîgehê de kuşt. 36 Bi rastî ez ji we re di-
bêjim, ev tiştên ha hemû wê bên ser vî nifşî.

### *Îsa li ser Orşelîmê Dilorîne*

*(Lûqa 13:34-35)*

37 «Wax Orşelîm, heywax Orşelîma ku pêxemberan dikuje û yên
ku ji wê re hatine şandin dide ber keviran. Ka çawa mirîşk çîçikên
xwe di bin çengên xwe de dicivîne, çend caran min jî xwest ku ez
zarokên te bicivînim, lê we nexwest. 38 Va ye, mala we wê li we
wêran û vala bimîne. 39 Çimkî ez ji we re dibêjim, êdî careke din hûn
min nabînin, heta ku hûn bêjin: ‹Yê ku bi navê Xudan tê pîroz be!›[a]»

---

[a] **23:39** Ji: Zebûr 118:26

### *Îsa ji pêşî ve li ser Wêranbûna Perestgehê Dibêje*
*(Marqos 13:1-2; Lûqa 21:5-6)*

24 Gava ku Îsa ji Perestgehê derket û çû, şagirtên wî nêzîkî wî
bûn û xwestin ku bala wî bikişînin ser avahiyên Perestgehê.
2 Wî ji wan re got: «Hûn van hemûyan dibînin? Bi rastî ez ji we re
dibêjim, li vir kevir li ser kevir namîne. Qet tiştek namîne ku neyê
hilweşandin!»

### *Tengahiyên Mezin*
*(Marqos 13:3-13; Lûqa 21:7-19)*

3 Çaxê Îsa li Çiyayê Zeytûnê rûdinişt, şagirtên wî bi serê xwe
hatin ba wî û jê re gotin: «Ji me re bêje, ka ev tişt wê kengê bibin?
Çi wê bibe nîşana hatina te û dawiya dinyayê?» 4 Îsa bersîva wan
da û got: «Hay ji xwe hebin, ku tu kes we nexapîne. 5 Çimkî gelek
wê bi navê min bên û bêjin: ‹Mesîh ez im› û wê gelekan bixapînin.
6 Hûnê dengê şeran û li ser şeran bibihîzin. Binêrin! Hûn netirsin.
Tiştên weha divê bibin, lê hê dawî nehatiye. 7 Milet wê li hember
miletan, padîşahî li hember padîşahiyan rabin. Û wê li cih cihan
xela û erdhejîn çêbin. 8 Lê ev tiştên ha hemû destpêka janan in.
9 «Hingê wê we teslîm bikin, da ku êşê bi we bidin kişandin û
we bikujin. Ji ber navê min hemû milet wê ji we nefret bikin.
10 Hingê gelek wê ji rê derkevin, hevdû bidin dest û ji hev nefret
bikin. 11 Û gelek pêxemberên derewîn wê derkevin û gelekan bi-
xapînin. 12 Bi zêdebûna neheqiyê, hezkirina gelekan wê sar bibe.
13 Lê yê ku heta dawiyê ragire*, ewê xilas bibe. 14 Û ev Mizgîniya
Padîşahiyê wê li seranserê dinyayê bê dayîn, da ku ji hemû miletan
re bibe şahidî û hingê dawî wê bê.

### *Felaketa Mezin*
*(Marqos 13:14-23; Lûqa 21:20-24)*

15 «Çaxê hûn tiştê mekruh ê ku xerakirinê tîne, tiştê ku Daniyêl
pêxember gotiye, li cihê pîroz rawestayî bibînin» – bila yê ku di-
xwîne fêm bike – 16 «hingê yên ku di Cihûstanê de ne bila birevin
çiyan. 17 Yê ku li ser banî be, bila neyê xwarê û tiştekî ji hundir
hilnede. 18 Û yê ku li nav zeviyê be jî, bila venegere ku ebayê xwe

---

**24:15** Binêre: Daniyêl 9:27; 11:31; 12:11

hilde. 19 Lê wey li wan ên ku di wan rojan de bizaro ne û dimê-
jînin! 20 Dua bikin ku reva we nekeve zivistanê an roja* Şemiyê.
21 Çimkî hingê tengahiyeke wusa mezin wê çêbe, ku ji destpêka
dinyayê ve tiştekî weha çênebûye û tu caran çênabe jî. 22 Eger ew
roj nehatana kurtkirin, tu kes xilas nedibû, lê ji bo xatirê yên bijartî
ew roj wê bên kurtkirin. 23 Hingê eger yek ji we re bêje: ‹Va ye,
Mesîh li vir e!› an jî: ‹Wa ye, ew li wir e!›, bawer nekin. 24 Çimkî
mesîhên derewîn û pêxemberên derewîn wê derkevin, wê nîşan û
karên mezin çêkin, wusa ku eger bibe, ewê bijartiyan jî bixapînin.
25 Va ye, min ji pêşî ve ev ji we re got. 26 Îcar, eger yek ji we re
bêje: ‹Wa ye, Mesîh li çolê ye!› dernekevin derve, an bêje: ‹Va ye,
li oda hundir e!›, bawer nekin. 27 Çawa ku birûsk ji Rojhilat davêje
û heta Rojava ronahî dike, hatina Kurê Mirov jî wê bi vî awayî be.
28 Kelaş li ku derê be, teyrên kelaşan jî wê li wê derê bicivin.

### *Vegerîna Kurê Mirov*
*(Marqos 13:24-27; Lûqa 21:25-28)*

29 «Di pey tengahiya wan rojan de, di cih de,
Roj wê tarî bibe
Û heyv ronahiya xwe nade.
Stêr wê ji ezmên bikevin
Û rojgêranên* ezmanan wê ji riya xwe derkevin.
30 «Hingê nîşana Kurê Mirov wê li ezmên xuya bibe û hemû
miletên li ser erdê wê li xwe bixin. Ewê bibînin ku ‹Kurê Mirov bi
hêz* û rûmeta mezin li ser ewrên ezmên tê.›[a] 31 Ewê milyaketên
xwe bi boriya dengbilind bişîne û milyaket wê bijartiyên wî ji çar
aliyan, ji perekî ezmanan heta perê din bicivînin.

### *Dersa ji Dara Hêjîrê*
*(Marqos 13:28-31; Lûqa 21:29-33)*

32 «Îcar ji dara hêjîrê vê dersê hîn bibin: Çaxê ku çiqilên wê
dibişkivin û pelên wê şîn dibin, hûn dizanin ku havîn nêzîk e. 33 Bi
vî awayî, çaxê ku hûn jî van hemû tiştan bibînin, bizanin ku ew
nêzîk e, li devê derî ye. 34 Bi rastî ez ji we re dibêjim, heta ku ev

---

[a] 24:30 Ji: Daniyêl 7:13. Binêre: Peyxama Yûhenna 1:7
24:29 Binêre: Îşaya 13:10; 34:4

tiştên ha hemû çênebin, ev nifş qet nabihûre. 35 Erd û ezman wê
bibihûrin, lê peyvên min tu caran nabihûrin.

### *Roj û Saeta ku Bi Tenê Xwedê Dizane*

*(Marqos 13:32-37; Lûqa 17:26-30, 34-36)*

36 «Lê heçî ew roj û ew saet e, ne milyaketên ezmanan û ne jî
Kur, ji Bav pê ve tu kes pê nizane. 37 Ka di rojên Nûh* de çawa bû,
hatina Kurê Mirov jî wê wusa be. 38 Çimkî di wan rojên beriya to-
fanê de, mirovan dixwar û vedixwarin, jin dianîn û mêr dikirin;
heta wê roja ku Nûh ket gemiyê, 39 wan nizanibû ku wê çi bibe,
heta ku tofan rabû û ew hemû bi xwe re birin. Hatina Kurê Mirov
jî wê bi vî awayî be. 40 Hingê du mirov wê li nav zeviyê bin, yek
wê bê birin û yek bê hiştin. 41 Du jin wê bi destar bihêrin, yek wê
bê birin û yek bê hiştin.
42 «Loma hişyar bimînin, çimkî hûn nizanin Xudanê we wê
kîjan rojê bê. 43 Lê vê yekê bizanin: Eger malxwê malê bizaniya ku
bi şev çi çaxî diz wê bê, ewê hişyar bima û nedihişt ku ew bikeve
xaniyê wî. 44 Ji ber vê yekê hûn jî amade bin, çimkî Kurê Mirov wê
di saetekê de bê ku hûn nizanin.

### *Xulamê Dilsoz û Xulamê Bêbext*

*(Lûqa 12:35-48)*

45 «Xulamê dilsoz û şehreza kî ye? Ewê ku axayê wî ew daniye
ser xulamên xwe, da ku xwarina wan di dema wan de bide wan.
46 Xwezî bi wî xulamê ku gava axayê wî bê, wî li ser karê wî
bibîne. 47 Bi rastî ez ji we re dibêjim, ewê wî deyne ser hemû malê
xwe. 48 Lê eger ew xulamê xerab ji xwe re bêje: ‹Axayê min wê bi
derengî bikeve› 49 û dest pê bike li hevalên xwe yên xulam bixe, bi
serxweşan re bixwe û vexwe, 50 axayê wî xulamî wê di wê rojê de
bê ku ew ne li hêviya wî ye û di wê saetê de ku ew pê nizane 51 û
wê wî perçe perçe bike û para wî bi durûyan re bide. Li wir wê
bibe girîn û qirçîna diranan.

### *Mesela Deh Keçan*

25 «Hingê Padîşahiya Ezmanan wê bimîne vê yekê: Deh ke-
çikan çirayên xwe hildan û çûn pêşiya zavê. 2 Pênc ji wan

---

**24:38** Destpêkirin 6-8

bêaqil û pênc ji wan şehreza bûn. 3 Yên bêaqil rahiştin çirayên
xwe, lê bi xwe re dohn hilnedan. 4 Lê yên şehreza bi çirayên xwe
re, di derdanan de dohn jî hildan. 5 Gava ku zava bi derengî ket,
xewê ew hemû girtin û razan.
6 «Nîvê şevê dengek hat: ‹Va ye, zava tê! Derkevin pêşiya wî!›
7 Hingê hemû keçik rabûn û çirayên xwe amade kirin. 8 Yên bêaqil
ji yên şehreza re gotin: ‹Hinekî ji dohnê xwe bidin me, çimkî çira-
yên me ditemirin.› 9 Wan bersîv da û gotin: ‹Na, çênabe, ew têra
me û we nake. Çêtir e ku hûn herin ba dohnfiroşan û ji xwe re
bikirrin.› 10 Lê çaxê ew çûn ku dohn bikirrin, zava hat. Keçikên ku
amade bûn bi wî re ketin şahiya dîlanê û derî hat dadan. 11 Paşê
keçên din jî hatin û gotin: ‹Mîrza, mîrza! Derî li me veke!› 12 Wî li
wan vegerand û got: ‹Bi rastî ez ji we re dibêjim, ez we nas nakim.›
13 «Loma hişyar bimînin, çimkî hûn ne wê rojê û ne jî wê saetê
dizanin.»

### *Mesela Telantan*
*(Lûqa 19:11-27)*

14 «Dîsa Padîşahiya Ezmanan dimîne vê yekê: Zilamek hebû,
gava ku çû welatekî din, gazî xulamên xwe kir û malê xwe spart
wan. 15 Wî li gor karîna her yekî ji wan da wan: Pênc telant* dan
yekî, du telant dan yekî û telantek jî da yekî û derket riya xwe.
16 Yê ku pênc telant standibûn, zû rabû, perê xwe da xebitandin û
pênc telantên din kar kirin. 17 Bi vî awayî yê ku du telant standibûn
jî du telantên din kar kirin. 18 Lê yê ku telantek standibû, rabû erd
kola û perê axayê xwe veşart.
19 «Piştî demeke dirêj axayê xulaman vegeriya û bi wan re
hesabê xwe kir. 20 Yê ku pênc telant standibûn, hat û pênc telantên
din jî anîn. Wî got: ‹Ezbenî, te pênc telant dabûn min. Binêre, min
pêncên din jî qezenc kirin.› 21 Axayê wî jê re got: ‹Aferim, xiz-
metkarê qenc û dilsoz! Tu di tiştên hindik de dilsoz derketî, ezê te
deynim ser gelek tiştan. Were û beşdarî şahiya axayê xwe bibe!›
22 «Yê ku du telant standibûn jî hat û got: ‹Ezbenî, te du telant
dabûn min; binêre, min diduyên din jî qezenc kirin.› 23 Axayê wî
got: ‹Aferim, xizmetkarê qenc û dilsoz! Tu di tiştên hindik de dil-
soz derketî, ezê te deynim ser gelek tiştan. Were û beşdarî şahiya
axayê xwe bibe!›

24 «Piştre yê ku telantek standibû hat û got: ‹Ezbenî, min di-
zanibû ku tu mirovekî hişk î û cihê ku te lê neçandiye tu didirûyî
û cihê ku te tov lê nereşandiye tu jê berhev dikî. 25 Îcar ez tir-
siyam, ez çûm, min telantê te di nav axê de veşart. Ha, ji te re
telantê te.› 26 Axayê wî lê vegerand û got: ‹Hey xizmetkarê xerab
û tiral! Madem te dizanibû cihê ku min lê neçandiye ez didirûm û
cihê ku min tov lê nereşandiye ez jê berhev dikim? 27 Nexwe
diviya te perên min danîna banqê, gava ku ez vegeriyam minê bi
fayiza wan ve bistanda. 28 Ji bo vê yekê wî telantî ji wî bistînin
û bidin wî yê ku deh telantên wî hene. 29 Çimkî yê ku pê re
heye, wê ji wî re bê dayîn û bi ser de bê zêde kirin. Lê yê ku pê
re tunebe, tiştê ku di destê wî de ye jî wê jê bê standin. 30 Lê vî
xizmetkarê bêkêr bavêjin tariya derve. Li wir wê bibe girîn û
qirçîna diranan.›»

### *Roja Dawî*

31 «Gava ku Kurê Mirov bi rûmeta xwe ve bê û hemû milyaket
pê re, hingê ewê li ser textê xwe yê rûmetê rûne. 32 Hemû milet wê
li ber wî bicivin û ewê wan ji hevdû veqetîne, wek ku şivan miyan
ji bizinan vediqetîne. 33 Ewê miyan bide aliyê xwe yê rastê, bizinan
bide aliyê xwe yê çepê. 34 Hingê Padîşah wê ji yên li aliyê xwe yê
rastê re bêje: ‹Werin, hûn pîrozên* Bavê min, wê Padîşahiya ku ji
damezrandina dinyayê ve ji bo we hatiye amade kirin, bistînin.
35 Çimkî ez birçî bûm, we xwarin da min; ez tî bûm, we av da min;
ez xerîb bûm, we ez hewandim; 36 ez tazî bûm, we ez bi cil kirim;
ez nexweş bûm, hûn hatin serdana min; ez di zîndanê de bûm, hûn
hatin ba min.›
37 «Hingê yên rast wê li wî vegerînin û bêjin: ‹Ya Xudan, me
kengê tu birçî dîtî û tu têr kirî, an kengê me tu tî dîtî û av da te?
38 Me kengê tu xerîb dîtî û tu hewandî, an tazî dîtî û tu bi cil kirî?
39 Me kengê tu nexweş an di zîndanê de dîtî û em hatin ba te?›
40 Padîşah wê bersîvê bide û ji wan re bêje: ‹Bi rastî ez ji we re
dibêjim, we çi ji yekî ji van birayên min ên herî biçûk re kiribe, we
ew ji min re kiriye.›
41 «Hingê wê ji yên li milê xwe yê çepê re jî bêje: ‹Ji min dûr
bikevin, hûn ên ku nifir lêbûyî, herin agirê herheyî yê ku ji bo

Îblîs* û milyaketên wî hatiye amadekirin. 42 Çimkî ez birçî bûm,
we xwarin neda min, ez tî bûm, we av neda min. 43 Ez xerîb bûm,
we ez nehewandim. Ez tazî bûm, we ez bi cil nekirim. Ez nexweş
û di zîndanê de bûm, hûn nehatin ba min.›

44 «Hingê ewê li wî vegerînin û bêjin: ‹Ya Xudan, me kengê tu
birçî, an tî, an xerîb, an tazî, an nexweş, an jî di zîndanê de dîtî û
me alîkariya te nekir?› 45 Hingê ewê bersîva wan bide û bêje: ‹Bi
rastî ez ji we re dibêjim, we çi ji bo yekî ji vanên herî biçûk
nekiribe, we ew ji bo min jî nekiriye.› 46 Îcar evên ha wê herin
ezaba herheyî, lê yên rast wê herin jiyana herheyî.»

### *Şêwira Kuştina Îsa*

*(Marqos 14:1-2; Lûqa 22:1-2; Yûhenna 11:45-53)*

26 Gava ku Îsa ev hemû peyvên ha xilas kirin, ji şagirtên xwe
re got: 2 «Hûn dizanin ku piştî du rojan Cejna* Derbasbûnê
ye. Wê Kurê Mirov bidin dest, da ku bê xaçkirin.»

3 Hingê serekên kahînan û rihspiyên gel, li qesra Serokkahînê
ku navê wî Qeyafa bû civiyan 4 û bi hev şêwirîn ku Îsa bi hîle
bigirin û wî bikujin. 5 Lê wan digot: «Bila ne di cejnê de be, da ku
di nav xelkê de hengame çênebe.»

### *Îsa li Beytanyayê*

*(Marqos 14:3-9; Yûhenna 12:1-8)*

6 Gava Îsa li Beytanyayê li mala Şimûnê kotî bû, 7 jinikekê di
firaxeke mermerê spî de rûnê bîhnxweş ê gelek giranbiha anî. Ça-
xê ku Îsa li ser sifrê rûniştibû, wê rûn bi serê wî de rijand. 8 Gava
şagirtan ev dît, hêrs bûn û gotin: «Çima ev rûnê ha badîhewa çû?
9 Ev dikaribû bi bihayekî giran bihata firotin û li belengazan bihata
belavkirin.»

10 Lê Îsa bi vê yekê dizanibû û ji wan re got: «Çima hûn jinikê
diêşînin? Wê ji bo min tiştekî qenc kir. 11 Çimkî belengaz hergav di
nav we de ne, lê ez hergav ne li ba we me. 12 Jinikê ev rûnê bîhn-
xweş bi ser bedena min de rijand, da ku min ji bo veşartinê amade
bike. 13 Bi rastî ez ji we re dibêjim, ev Mizgînî li ku dera dinyayê
bê dayîn, ev tiştê ku vê jinikê kir jî wê ji bo bîranîna wê bê gotin.»

---

25:41 Peyxama Yûhenna 20:10

### *Xayîntiya Cihûda*
*(Marqos 14:10-11; Lûqa 22:3-6)*

14 Hingê yek ji diwanzdehan, ku jê re Cihûdayê* Îsxeryotî di-
gotin, çû ba serekên kahînan 15 û ji wan pirsî: «Eger ez wî bidim
destê we hûnê çi bidin min?» Îcar wan jî sî zîv* hijmartin û danê.
16 Ji wê demê ve Cihûda li keysekê digeriya ku Îsa bide dest.

### *Îsa bi Şagirtan re Şîva Cejna Derbasbûnê Dixwe*
*(Marqos 14:12-21; Lûqa 22:7-13; Yûhenna 13:21-30)*

17 Di roja pêşî ya Cejna* Nanê Şkeva de şagirt hatin ba Îsa û jê
pirsîn: «Tu dixwazî em li ku derê ji te re şîva Cejna* Derbasbûnê
amade bikin ku tu bixwî?» 18 Wî li wan vegerand û got: «Herin
bajêr, ba filan mirovî û jê re bêjin: ‹Mamoste dibêje: Wextê min
nêzîk bûye. Ezê Cejna Derbasbûnê bi şagirtên xwe re li mala te
pîroz bikim.›» 19 Wek ku Îsa ji wan re gotibû şagirtan kir û şîva
Cejna Derbasbûnê amade kirin. 20 Gava bû êvar, ew bi diwanz-
dehan re li ser sifrê rûniştin. 21 Îcar çaxê ku wan şîv dixwar Îsa got:
«Bi rastî ez ji we re dibêjim, yek ji we wê min bide dest.» 22 Ew
gelek xemgîn bûn û dest pê kirin yek bi yek ji wî pirsîn: «Gelo ez
im, ya Xudan?» 23 Îsa li wan vegerand û got: «Yê ku bi min re
pariyê xwe li firaxê xist, ew e yê ku wê min bide dest. 24 Ji xwe
Kurê Mirov wek ku li ser wî hatiye nivîsîn, wê here. Lê wey li wî
mirovê ku Kurê Mirov bide dest! Wê ji bo wî çêtir bûya ku ew
nehata dinyayê.» 25 Hingê Cihûdayê ku wê ew bida dest, got:
«Mamoste, ma ew kes ez im?» Îsa bersîv da: «Erê, te bi xwe
got.»

### *Şîva Xudan*
*(Marqos 14:22-26; Lûqa 22:14-23; 1 Korîntî 11:23-25)*

26 Gava wan xwarin dixwar, Îsa nan hilda, şikir kir, ew şkand,
da şagirtan û got: «Bigirin û bixwin, ev bedena min e.»
27 Piştre wî kasek hilda, şikir kir, da wan û got: «Hûn hemû ji
vê vexwin. 28 Çimkî ev xwîna min a Peymanê* ye ku ji bo lêbihûr-
tina gunehan di ber gelekan de tê rijandin. 29 Ez ji we re dibêjim:
‹Êdî ez ji vî berê mêwê tu caran venaxwim, heta wê roja ku ez di
Padîşahiya Bavê xwe de bi we re ji ya nû vexwim.›»
30 Piştî ku wan zebûrek strand, derketin Çiyayê Zeytûnê.

### *Îsa ji pêşî ve li ser Înkarkirina Petrûs Dibêje*
*(Marqos 14:27-31; Lûqa 22:31-34; Yûhenna 13:36-38)*

31 Hingê Îsa ji wan re got: «Îşev hûnê hemû li ser min dudilî û
sist bibin, çimkî hatiye nivîsîn:

‹Ezê li şivên bixim
Û miyên kerî wê belav bibin.›[a]

32 Lê piştî ku ez ji mirinê rabim, ezê beriya we herim Celîlê.»
33 Petrûs lê vegerand û got: «Hemû jî li ser te dudilî û sist bibin, ez
tu caran dudilî û sist nabim.» 34 Îsa ji wî re got: «Bi rastî ez ji te re
dibêjim, hema îşev, berî ku dîk bang bide tê sê caran min înkar
bikî.» 35 Petrûs got: «Eger lazim be ku ez bi te re bimirim jî, ez tu
caran te înkar nakim.» Hemû şagirtan jî weha got.

### *Li Baxçê Gêtşemaniyê*
*(Marqos 14:32-42; Lûqa 22:39-46)*

36 Hingê Îsa bi şagirtên xwe ve çû cihê ku jê re ‹Gêtşemanî›
digotin û ji wan re got: «Hûn li vir rûnin, heta ku ez herim dera ha
û dua bikim.» 37 Wî Petrûs û herdu kurên Zebedî bi xwe re birin û
dest pê kir, keder û diltengiyê ew girt. 38 Hingê wî ji wan re got:
«Dilê min gelek teng dibe, ez dikim bimirim. Li vir bin û bi min re
hişyar bimînin.»

39 Hinekî pêşve çû, xwe deverû avêt erdê, dua kir û got: «Ya
bavê min, eger bibe bila ev kasa tehl ji min derbas bibe. Lê bila ne
wek ez dixwazim, lê wek ku tu dixwazî be.»

40 Piştre ew vegeriya ba şagirtan û ew di xew de dîtin. Ji Petrûs
re got: «Ma we nikaribû hûn saetekê jî bi min re hişyar bimînin?
41 Hişyar bimînin û dua bikin, da ku hûn nekevin ceribandinê. Erê,
ruh bi daxwaz e, lê beden lewaz e.»

42 Cara diduyan ew çû û dua kir: «Ya Bavê min, eger bêyî ku
ez vê kasa tehl vexwim, ew ji min derbas nebe, bila daxwaza te
bibe.» 43 Îsa vegeriya û ew dîsa di xew de dîtin. Çimkî çavên wan ji
xewê diçûn serhev. 44 Wî ew hiştin, careke din dûr ket, cara sisiyan
dua kir û eynî peyv gotin. 45 Paşê vegeriya ba şagirtên xwe û ji wan
re got: «Ma hûn hê jî radizin û bîhna xwe vedidin? Va ye, saet hat;

---

[a] **26:31** Ji: Zekerya 13:7

Kurê Mirov dikeve destê gunehkaran. 46 Rabin, em herin. Va ye,
yê ku min dide dest nêzîk bû.»

### *Girtina Îsa*

*(Marqos 14:43-50; Lûqa 22:47-53; Yûhenna 18:3-12)*

47 Hê ew dipeyivî Cihûdayê ku yek ji diwanzdehan bû hat. Bi
wî re elaleteke mezin a bi şûr û daran hebû. Ev ji aliyê serekên
kahînan û rihspiyên gel ve hatibûn şandin. 48 Îcar ê ku ew bida dest
bi wan re li ser îşaretekê li hev hatibû: «Ez kê ramûsim ew e, wî
bigirin.» 49 Cihûda sererast hat ba Îsa û got: «Silav li te, mamoste!»
û ew ramûsa. 50 Îsa lê vegerand û got: «Heval, tu ji bo çi hatibî, wê
bike.» Hingê ew mirov nêzîk bûn, dest avêtin Îsa û ew girtin. 51 Li
ser vê yekê, yekî ku bi Îsa re bû, şûrê xwe kişand, li xulamê Se-
rokkahîn xist û guhê wî pekand. 52 Hingê Îsa ji wî re got: «Şûrê
xwe bixe kalanê wî. Çimkî her kesê ku şûr bikişîne, ewê bi şûr bê
kuştin. 53 Ma tu dibêjî qey ez nikarim ji Bavê xwe bixwazim û ew
jî di cih de ji diwanzdeh lejyonan* zêdetir milyaketan bigihîne
min? 54 Lê hingê Nivîsarên* Pîroz ên ku dibêjin divê weha bibe,
wê çawa bên cih?»
55 Wê gavê Îsa ji elaletê re got: «Ma ez rêbirek im ku hûn bi
dar û şûran hatine ku min bigirin? Her roj ez li Perestgehê rûdi-
niştim û min hîn dikir, lê we ez negirtim. 56 Lê ev hemû çêbûn, da
ku nivîsarên pêxemberan bên cih.» Hingê hemû şagirtan ew hişt û
reviyan.

### *Îsa li ber Civîna Giregiran*

*(Marqos 14:53-65; Lûqa 22:54-55, 63-71; Yûhenna 18:13-14, 19-24)*

57 Yên ku Îsa girtin, ew birin ba Qeyafayê Serokkahîn. Li wir
Şerîetzan û rihspî civiyabûn. 58 Petrûs ji dûr ve li pey wî hat, heta
hewşa Serokkahîn. Ew derbasî hundir bû, bi parêzgeran re rûnişt,
da ku dawiyê bibîne.
59 Îcar serekên kahînan û tevahiya civîna* giregiran li hember
Îsa li şahidiya derewîn digeriyan ku biryara kuştina wî bidin. 60 Bi
ser ku gelek şahidên derewîn derketin jî, tiştê ku lê digeriyan
peyda nekirin. Li dawiyê du şahidên derewîn hatin 61 û gotin: «Vî
mirovî got: ‹Ez dikarim Perestgeha Xwedê hilweşînim û di sê
rojan de ava bikim.›» 62 Hingê Serokkahîn rabû ser lingan û ji Îsa

re got: «Ma tu bersîvê nadî? Ev çi şahidî ye ku evên ha li ser te
didin?» 63 Lê Îsa tu tişt negot. Serokkahîn ji wî re got: «Ez te bi
navê wî Xwedayê jîndar didim sondê, eger tu Kurê* Xwedê
Mesîh* bî, ji me re bêje.» 64 Îsa ji wî re got: «Erê, wek ku te got, lê
ez ji we re dibêjim:

Ji niha û pê ve, hûnê bibînin ku ‹Kurê Mirov
Li milê rastê yê hêza Xwedê rûniştî ye
Û li ser ewrên ezmên tê.›[a]»

65 Hingê Serokkahîn cilên xwe çirandin û got: «Wî çêr* kir! Êdî
çi hewcedariya me bi şahidan heye? Va ye, we çêrkirina wî bihîst.
66 Hûn çi dibêjin?» Wan lê vegerand û gotin: «Ew yê kuştinê ye!»
67 Hingê tif kirin rûyê wî û ew dan ber kulman. Hinekan jî sîle
lê xistin 68 û gotin: «Ji me re pêxemberîtiyê bike, ey Mesîh! Ka kî
bû ku li te xist?»

### *Petrûs Îsa Înkar Dike*

*(Marqos 14:66-72; Lûqa 22:56-62; Yûhenna 18:15-18, 25-27)*

69 Hingê Petrûs li derve, li hewşê rûniştibû. Keçikeke xizmet-
kar hat ba wî û got: «Tu jî bi Îsayê Celîlî re bûyî.» 70 Lê wî li ber
hemûyan înkar kir û got: «Ez nizanim ku tu çi dibêjî.» 71 Çaxê ew
çû ber dergeh, keçikeke din ew dît û ji yên li wê derê re got: «Evê
ha bi Îsayê Nisretî re bû.» 72 Wî dîsa bi sond înkar kir û got: «Ez
wî nas nakim!» 73 Piştî gavekê yên ku li wir bûn çûn ba Petrûs û
gotin: «Bi rastî tu bi xwe jî yek ji wan î. Çimkî peyivîna te, te dide
zanîn.» 74 Hingê wî dest bi nifiran kir, sond xwar û got: «Ez wî
mirovî nas nakim!» Di cih de dîk bang da. 75 Li ser vê yekê peyva
ku Îsa gotibû hat bîra Petrûs: «Berî ku dîk bang bide tê sê caran
min înkar bikî.» Hingê ew derket derve û bi dilşewatî giriya.

### *Cihûda Xwe Dadileqîne*

*(Marqos 15:1; Lûqa 23:1-2; Yûhenna 18:28-32; Karên Şandiyan 1:18-19)*

27 Çaxê bû sibe hemû serekên kahînan û rihspiyên gel ji bo ku
Îsa bikujin bi hev şêwirîn. 2 Ew girêdan, birin û dan destê
Pîlatosê walî.
3 Hingê Cihûdayê ku Îsa dabû dest, gava dît ku çi biryar li ser

---

[a] 26:64 Ji: Zebûr 110:1; Daniyêl 7:13

wî hat dayîn, li kirina xwe poşman bû û sî zîv li serekên kahînan û
rihspiyan zivirandin û got: [4] «Min guneh kir. Ez bûm sedemê xwî-
na bêsûc.» Wan lê vegerand û gotin: «Me çi ji vê ye? Tu bifikire.»
[5] Cihûda zîv avêtin nav Perestgehê û derket. Ew çû û wî xwe
daleqand. [6] Serekên kahînan zîv hildan û gotin: «Nabe ku em van
peran bixin xezîna Perestgehê, çimkî perên xwînê ne.» [7] Bi hev
şêwirîn û ji bo veşartina biyaniyan Zeviya Cerçêker kirrîn. [8] Loma
ji wê zeviyê re heta îro jî Zeviya Xwînê tê gotin. [9] Hingê ew peyva
ku bi devê Yêremya* pêxember hatibû gotin hat cih: «Wan sî zîv*
girtin, bi wî bihayê ku hinekan ji kurên Îsraêl ji bo wî vebirrîbûn
[10] û wan pê Zeviya Cerçêker kirrî, wek ku Xudan li min emir
kiribû.»[a]

### *Îsa li ber Pîlatosê Walî*

*(Marqos 15:2-5; Lûqa 23:3-5; Yûhenna 18:33-38)*

[11] Îsa li ber walî rawesta û wî jê pirsî: «Ma tu padîşahê Ci-
hûyan î?» Îsa lê vegerand û got: «Erê, wek ku te got.» [12] Çaxê ku
ew ji aliyê serekên kahînan û rihspiyan ve hat sûcdarkirin, wî tu
bersîv neda. [13] Hingê Pîlatos jê pirsî: «Ma tu nabihîzî ku ew li
hember te çiqas şahidiyê dikin?» [14] Îsa bersîv neda û peyvek jî
negot, wusa ku walî gelek şaş ma.

### *Îsa Cezayê Mirinê Distîne*

*(Marqos 15:6-15; Lûqa 23:13-26; Yûhenna 18:39-19:16)*

[15] Adeta walî bû ku di cejnê de girtiyekî ku xelkê dixwest ber-
de. [16] Wê demê bi navê Barabas girtiyekî navdar hebû. [17] Gava ku
elalet civiya Pîlatos ji wan pirsî: «Hûn dixwazin ez kîjanî ji bo we
berdim? Barabas an Îsayê ku jê re dibêjin Mesîh?» [18] Çimkî wî
dizanibû ku wan Îsa ji çavnebarî girtiye û dane destê wî. [19] Çaxê
Pîlatos li ser kursiyê dîwanê rûniştibû, jina wî jê re ev xeber şand:
«Nebe ku tu tiştekî bi wî mirovê rast bikî, çimkî îşev di xewna xwe
de min ji rûyê wî gelek tengahî dît.»

[20] Lê serekên kahînan û rihspiyan elalet qanî kirin ku bixwazin
Barabas bê berdan û Îsa bê kuştin. [21] Walî ji wan pirsî: «Ji her-
duyan hûn dixwazin ku ez kîjanî ji bo we berdim?» Wan jî got:

---

[a] **27:9-10** Ji: Zekerya 11:12-13; Yêremya 32:6-9

«Barabas!» 22 Pîlatos got: «Nexwe ez bi Îsayê ku jê re dibêjin Me-
sîh çi bikim?» Hemûyan bersîv da: «Bila bê xaçkirin!» 23 Pîlatos
pirsî: «Wî çi xerabî kiriye?» Lê ew hê bêtir qîriyan: «Bila bê xaç-
kirin!»
24 Gava Pîlatos dît ku tiştek ji destê wî nayê, lê hê bêtir hen-
game çêbibe, wî av hilda, li ber elaletê destê xwe şuşt û got: «Ez ji
xwîna vî mirovî bêrî me. Ev karê we ye.» 25 Hemû xelkê bersîv da:
«Bila xwîna wî di stûyê me û zarokên me de be!» 26 Hingê wî
Barabas ji bo wan berda, Îsa da ber qamçiyan û da destê wan, da
ku bê xaçkirin.

### *Leşker Tinazên Xwe bi Îsa Dikin*

*(Marqos 15:16-21; Yûhenna 19:2-3)*

27 Hingê leşkerên walî Îsa birin qesrê û hemû tabûra* leşkeran
li ser serê wî civandin. 28 Wan ew tazî kir û xiftanekî sor li wî ki-
rin. 29 Tacek ji stiriyan honandin û dan serê wî. Çîtikek kirin destê
wî yê rastê, li ber wî çûn ser çokan, tinazên xwe pê kirin û gotin:
«Bijî padîşahê Cihûyan!» 30 Tif kirinê, çîtik ji dest standin û li serê
wî xistin. 31 Piştî ku tinazên xwe pê kirin, xiftan hilanîn û cilên wî
lê kirin. Piştre ew birin ku wî xaç bikin.

### *Xaçkirina Îsa*

*(Marqos 15:22-32; Lûqa 23:27-43; Yûhenna 19:17-27)*

32 Gava ku derketin derve, wan yekî Kûrênî dît ku navê wî Şi-
mûn bû, wan bi zorê xaça Îsa bi wî dan hilgirtin. 33 Çaxê ew hatin
wî cihê ku jê re ‹Golgota› digotin – ku tê mana «Qoqê Serî» –
34 wan li wir şerab û zirav tevlihevkirî danê. Lê dema ku Îsa tam
kir, nexwest vexwe.
35 Piştî ku wan ew xaç kir, wan cilên wî bi pişk li xwe leva*
kirin. 36 Û li wir rûniştin û çavdêriya wî kirin. 37 Nivîsa sûcdar-
kirinê raserî serê wî danîn: EV ÎSAYÊ PADÎŞAHÊ CIHÛYAN E.
38 Hingê du rêbir jî bi wî re hatin xaçkirin; yek li milê wî yê rastê,
yê din li milê wî yê çepê. 39 Yên ku di wir re derbas dibûn, serê
xwe dihejandin, Îsa şermezar dikirin 40 û digotin: «Ka teyê Perest-
geh hilweşanda û di sê rojan de ava bikira! Eger tu Kurê Xwedê bî,
ji xaçê were xwarê û xwe xilas bike!» 41 Bi vî awayî serekên
kahînan, Şerîetzan û rihspiyan jî tinazên xwe pê dikir û digotin:

42 «Yên din xilas kirin, lê nikare xwe xilas bike! Ew Padîşahê
Îsraêlê ye! Ka bila niha ji xaçê bê xwarê, emê baweriyê bi wî
bînin. 43 Ew xwe dispêre Xwedê. Eger Xwedê ji wî hez bike, bila
niha wî xilas bike. Çimkî wî got: ‹Ez Kurê Xwedê me.›» 44 Rêbirên
ku bi wî re hatibûn xaçkirin jî bi vî awayî ew şermezar kirin.

## *Mirina Îsa*

*(Marqos 15:33-41; Lûqa 23:44-49; Yûhenna 19:28-30)*

45 Piştî nîvro saet ji diwanzdehan heta saet sisiyan tarî ket ser
seranserê welêt. 46 Saet li dora sisiyan Îsa bi dengekî bilind qîriya:
«Elî, Elî, lama sabaxtanî?» ku tê maneya: «Xwedayê min, Xweda-
yê min, te çima ez berdam?»[a] 47 Gava hin ji yên ku li wir rawesta
bûn ev bihîstin, gotin: «Ew gazî Êlyas* dike.» 48 Di cih de yek ji
wan bezî û avgirek* hilda. Wî ew bi sihikê tije kir, bi serê çîtikekê
ve danî û dirêjî Îsa kir ku vexwe. 49 Yên din jî gotin: «Ka bihêle,
em bibînin ma Êlyas wê bê ku wî xilas bike.»
50 Îsa careke din bi dengekî bilind qîriya û ruhê xwe da. 51 Di
wê gavê de perda Perestgehê ji serî heta binî çiriya û bû du perçe.
Erd hejiya û lat qelişîn. 52 Gor vebûn û gelek kesên pîroz ên ku
miribûn, rabûn. 53 Ew ji goran derketin û piştî rabûna Îsa çûn
Bajarê* Pîroz û ji aliyê gelekan ve hatin dîtin.
54 Gava sersed* û yên ku bi wî re çavdêriya Îsa dikirin erdhejîn
û tiştên bûyî dîtin, ji tirsa bizdiyan û gotin: «Bi rastî jî, ev Kurê
Xwedê bû!»
55 Gelek jin li wir bûn û ji dûr ve temaşe dikirin. Ew ji Celîlê li
pey Îsa hatibûn û ji wî re xizmet kiribûn. 56 Meryema* Mejdelanî,
Meryema* diya Aqûb û Ûsiv û diya kurên Zebedî di nav wan de
bûn.

## *Veşartina Îsa*

*(Marqos 15:42-47; Lûqa 23:50-56; Yûhenna 19:38-42)*

57 Gava ku bû êvar, mirovekî dewlemend ê ji Arîmetyayê hat.
Navê wî Ûsiv bû û ew bi xwe jî şagirtê Îsa bû. 58 Çû ba Pîlatos û
cesedê Îsa jê xwest. Pîlatos jî emir kir ku bidin wî. 59 Ûsiv cesed
hilanî, bi cawekî paqij ê keten pêça 60 û ew di gora xwe ya nû de ya

---

[a] **27:46** Ji: Zebûr 22:1

ku di latê de kolabû veşart. Wî kevirekî mezin gêr kir ber devê
gorê û çû. 61 Meryema Mejdelanî û Meryema din li pêşberî gorê
rûniştibûn.

### *Nobedarên Gorê*

62 Dotira rojê – rojekê piştî roja* Amadekirinê – serekên kahî-
nan û Fêrisî çûn ba Pîlatos û gotin: 63 «Ezbenî, di bîra me de ye, hê
ku ewê xapînok dijiya, gotibû: ‹Piştî sê rojan ezê rabim.› 64 Ji bo vê
yekê emir bide, da ku gor heta sê rojan bê parastin. An na, şagirtên
wî dikarin bên cesedê wî bidizin û ji gel re bêjin ku ew ji nav
miriyan rabûye. Hingê xapandina dawîn wê ji ya pêşî xerabtir be.»
65 Pîlatos got: «Nobedarên di emrê we de hene. Herin û hûn çawa
dizanin, wusa gorê biparêzin.» 66 Ew jî çûn gor parastin, kevir mor
kirin û nobedar danîn ber.

### *Rabûna Îsa ya ji nav Miriyan*

*(Marqos 16:1-8; Lûqa 24:1-12; Yûhenna 20:1-10)*

28 Piştî Şemiyê, roja pêşî ya heftiyê serê sibê zû Meryema
Mejdelanî û Meryema din çûn ku li gorê binêrin. 2 Ji nişkê
ve erdhejîneke mezin çêbû. Çimkî milyaketekî Xudan ji ezmên hat
xwarê, çû ser gorê, kevir gêr kir û li ser rûnişt. 3 Dîtina wî wek bi-
rûskê bû û cilên wî wek berfê spî bûn. 4 Nobedar ji tirsa wî lerizîn
û bûn wek miriyan.

5 Milyaket ji jinan re got: «Hûn netirsin, ez dizanim ku hûn li
Îsayê ku hatibû xaçkirin digerin. 6 Ew ne li vir e, wek ku wî gotibû,
ew rabûye. Werin û wî cihê ku ew lê dirêjkirî bû bibînin. 7 Îcar zû
herin ji şagirtên wî re bêjin: ‹Ew ji nav miriyan rabûye û niha beri-
ya we diçe Celîlê. Hûnê wî li wê derê bibînin. Va ye min ji we re
got.›»

8 Jin bi lez ji gorê vegeriyan, bi tirs û bi şahiyeke mezin bezîn,
da ku ji şagirtên wî re bêjin. 9 Ji nişkê ve Îsa rastî wan hat û got:
«Silav li we.» Ew nêzîkî wî bûn, xwe avêtin lingên wî û perizînê*.
10 Hingê Îsa ji wan re got: «Netirsin. Herin û ji birayên min re
bêjin, bila biçin Celîlê. Li wir ewê min bibînin.»

### *Bertîldayîna Nobedaran*

11 Gava ku hê jin di rê de bûn, hinek ji nobedaran gihîştin bajêr
û hemû tiştên bûyî ji serekên kahînan re gotin. 12 Piştî ku serekên

kahînan bi rihspiyan re civiyan û şêwirîn, gelek pere dan leşkeran
13 û gotin: «Bêjin: ‹Gava ku bi şev em razayî bûn şagirtên wî hatin
û ew dizîn.› 14 Eger ev bigihîje guhê walî, emê wî qanî bikin û
xemê bi we nadin xwarin.» 15 Wan jî pere standin û wek ku li wan
hatibû şîretkirin, kirin. Ev gotin heta îro jî di nav Cihûyan de belav
bûye.

### *Îsa Xwe Nîşanî Şagirtên Xwe Dide û Wan Dişîne*

*(Marqos 16:14-18; Lûqa 24:36-49; Yûhenna 20:19-23; Karên Şandiyan 1:6-8)*

16 Her yanzdeh şagirt çûn Celîlê, wî çiyayê ku Îsa ji wan re
gotibû herinê. 17 Gava ku wan ew dît, perizîn wî; lê hinek ji wan
dudilî bûn. 18 Hingê Îsa nêzîkî wan bû û ji wan re got: «Li erdê û li
ezmên hemû desthilatî ji min re hatiye dayîn. 19 Loma herin û
hemû miletan bikin şagirtên min: Wan bi navê Bav, Kur û Ruhê
Pîroz imad* bikin, 20 hemû tiştên ku min li we emir kirine, hînî
wan bikin, da ku pêk bînin. Va ye, ez herdem heta dawiya dinyayê
bi we re me.»

# *Mizgîniya Îsa Mesîh li gor Marqos*

## *Pêşgotin*

*Ev kitêb piştî Îsa*, di navbera salên 55 û 60an de, wek ku tê fêmkirin li Romayê hatiye nivîsîn.*

*Navê nivîskar di kitêbê de derbas nabe. Bi awayekî giştî tê zanîn ku nivîskar Yûhenna ye, ku bi navê Marqos tê naskirin (Karên Şandiyan 12:25). Marqos bi destê Petrûsê* Şandî* (resûl) bawerî bi Mesîh* anî (1 Petrûs 5:13). Navê diya Marqos Meryem bû. Bawermendên pêşî ji bo duakirinê li mala wan diciviyan (Karên Şandiyan 12:12).*

*Marqos bi Pawlos û Barnabas re beşdarî Gera Mizgîndana pêşî bû (Karên Şandiyan 12:25; 13:5). Herweha di gelek cihên nivîsarê de jî tê dîtin, Marqos dide kifşkirin ku jiyan û karê Îsa* xizmeteke wusa ye, ku bi hêzeke* mezin û bi desthilatiyeke xurt û bêrawestin berdewam dike. Desthilatiya Îsa di hînkirin, derxistina cinan û bexşandina gunehên mirovan de tê dîtin. Bi pêşveçûna bûyeran re dilsoz û bawermendên Îsa bêtir ew fêm dikirin û dijminahiya yên ku li ber wî radibin jî zêdetir dibû. Marqos nozdeh kerametên ku Îsa kirine tîne zimên, ji hînkirina wî bêtir li ser wan radiweste.*

*Ev nivîsar dikare bi vî awayî bê beşkirin:*

*I. Yûhennayê imadkar (1:1-13)*
*II. Xizmeta Îsa Mesîh a li Celîlê (1:14-7:23)*
*III. Serdana Sûr û Saydayê (7:24-30)*
*IV. Xizmet û hînkirina li bakûrê Celîlê (7:31-9:50)*
*V. Dawiya xizmeta li Pêreya û rêwîtiya Orşelîmê (10:1-52)*
*VI. Îsa li Orşelîmê hîn dike; serwerên Cihûyan wî qebûl nakin (11:1-13:37)*
*VII. Girtin û xaçkirina Îsa (14:1-15:47)*
*VIII. Rabûna Îsa ya ji nav miriyan (16:1-8)*
*IX. Xuyabûna Îsa piştî rabûna wî û hilkişîna wî ya ezmanan (16:9-20)*

### *Danezana Yûhennayê Imadkar*
*(Metta 3:1-12; Lûqa 3:1-18; Yûhenna 1:19-28)*

1 Ev destpêka Mizgîniya* Îsa Mesîhê Kurê* Xwedê ye. 2 Di
nivîsara Îşaya* pêxember de weha hatiye nivîsîn:
«Va ye, ez qasidê xwe di pêşiya te de dişînim.
Ewê riya te amade bike.[a]
3 ‹Dengek li çolê gazî dike:
Riya Xudan* amade bikin,
Şiveriyên wî serrast bikin!›[b]»
4 Û Yûhennayê* imadkar li çolê derket meydanê, mirov hîn
dikirin ku tobe bikin, da ku li gunehên wan bê bihûrtin û ew bên
imadkirin*. 5 Hemû xelkê Cihûstanê* û tevahiya Orşelîmiyan* di-
hatin ba wî, gunehên xwe eşkere dikirin û di Çemê Urdunê de bi
destê wî imad dibûn. 6 Yûhenna cilekî ji pirça devê li xwe kiribû û
li pişta wî jî qayîşeke çermîn hebû. Wî kulî û hingivê çolê dixwa-
rin. 7 Wî dida bihîstin û digot: «Yê ku piştî min tê, ji min hêzdartir
e û ez ne hêja me ku xwe bitewînim û benên çaroxa wî jî vekim.
8 Min hûn bi avê imad kirin, lê ewê we bi Ruhê* Pîroz imad bike.»

### *Imadbûn û Ceribandina Îsa*
*(Metta 3:13-4:11; Lûqa 3:21-22; 4:1-13)*

9 Îcar wan rojan Îsa* ji bajarê Nisreta Celîlê* hat û bi destê
Yûhenna di Çemê Urdunê de imad bû. 10 Îsa ji avê derket derneket,
dît ku ezman qelişî û Ruh* wek kevokekê li ser wî danî. 11 Û dengek
ji ezmanan hat: «Tu yî Kurê min ê delal. Dilê min bi te xweş e.»
12 Di cih de Ruh, berê Îsa da çolê, 13 ew çil rojî li çolê ma û ji
aliyê Îblîs* ve hat ceribandin. Ew bi heywanên çolê re ma û mil-
yaketan jê re xizmet dikir.

### *Îsa li Celîlê Dest bi Belavkirina Mizgîniyê Dike*
*(Metta 4:12-17; Lûqa 4:14-15)*

14 Piştî girtina Yûhenna, Îsa hat herêma Celîlê* û dest bi dayî-
na Mizgîniya* Xwedê kir 15 û got: «Wext hat, Padîşahiya* Xwedê
nêzîk bûye; tobe bikin û baweriya* xwe bi Mizgîniyê bînin!»

---

[a] 1:2 Ji: Melaxî 3:1 [b] 1:3 Ji: Îşaya 40:3

### *Îsa Gazî Çar Masîgiran Dike*
*(Metta 4:18-22; Lûqa 5:1-11)*

16 Gava ku Îsa di perê Gola Celîlê re diçû, Şimûn* û birayê wî
Endrawis dîtin. Wan tor davêtin golê, çimkî ew masîgir bûn. 17 Îsa
ji wan re got: «Li pey min werin, ezê we bikim nêçîrvanên miro-
van.» 18 Wan jî di cih de torên xwe hiştin û li pey wî çûn. 19 Dema
ku Îsa ji wê derê hinekî pêşve çû, kurên Zebedî, Aqûb* û birayê wî
Yûhenna* dîtin. Wan di qeyikê de torên xwe vediçinîn. 20 Îsa ew
dîtin nedîtin gazî wan kir, wan jî bavê xwe bi karkeran re di qeyikê
de hişt û li pey wî çûn.

### *Îsa Ruhê Nepak Derdixe*
*(Lûqa 4:31-37)*

21 Îcar ew gihîştin Kefernahûmê. Roja* Şemiyê hat û nehat, Îsa
çû kinîştê* û dest bi hînkirinê kir. 22 Ew jî li hînkirina wî gelek şaş
man. Çimkî wî ne wek Şerîetzanan*, lê bi desthilatî hînî wan dikir.
23 Hema hingê di kinîşta wan de mirovek hebû ku ruhê nepak ew
girtibû. Wî bi qîrîn got: 24 «Ya Îsayê Nisretî, te çi ji me ye? Ma tu
hatî ku me helak bikî? Ez dizanim tu kî yî: Tu Pîrozê* Xwedê yî!»
25 Îsa lê hilat* û got: «Deng neke û derkeve!» 26 Ruhê nepak jî ew
vehejand û bi dengekî bilind qîriya û jê derket. 27 Hemû heyirîn, ji
hev pirsîn û gotin: «Ev çi kar e? Hînkirineke nû! Bi desthilatî ew
emir li ruhên nepak dike û ew jî bi ya wî dikin.» 28 Û nav û dengê
Îsa zûka li hawirdora Celîlê*, li her cihî belav bû.

### *Îsa Gelek Nexweşan Qenc Dike*
*(Metta 8:14-17; Lûqa 4:38-41)*

29 Îsa ji kinîştê* derket derneket, bi Aqûb* û Yûhenna* re çû
mala Şimûn* û Endrawis. 30 Xesûya Şimûn bi tayêketî radiza. Di
cih de ji bo wê, ji Îsa re gotin. 31 Ew jî çû ba wê, bi destê wê girt û
rakir. Tayê ew berda û jinikê ji wan re xizmet kir. 32 Êvarê, piştî ku
roj çû ava, xelkê hemû nexweş û yên cinoyî* anîn ba wî. 33 Hemû
xelkê bajêr li ber derî civiyabû. 34 Îsa gelek kesên bi nexweşiyên
cûr bi cûr qenc kirin, gelek cin jî derxistin û nedihişt ku cin goti-
nekê bêjin. Çimkî wan dizanibû ku ew kî ye.

### *Îsa Mizgîniya Xwedê di Celîlê de Belav Dike*

35 Bi berbangê re, serê sibê zû Îsa rabû û derket, çû cihekî bêpê-
jin û li wir dua kir. 36 Şimûn û yên bi wî re, li Îsa geriyan 37 û gava
ku wan ew dît, jê re gotin: «Her kes li te digere.» 38 Wî ji wan re got:
«Em herin cihekî din, nav bajarên nêzîk, da ku ez li wan deran jî hîn
bikim, çimkî ez ji bo vê yekê hatime.» 39 Îcar ew li hemû herêma
Celîlê* digeriya û di kinîştên* wan de hîn dikir û cin derdixistin.

### *Îsa Yekî Kotî Paqij û Qenc Dike*

*(Metta 8:1-4; Lûqa 5:12-16)*

40 Û kotiyek* hat, li ber Îsa çû ser çokan, lava kir û got: «Eger
tu bixwazî, tu dikarî min paqij bikî.» 41 Dilê Îsa pê şewitî, destê
xwe dirêj kir, li wî da û got: «Ez dixwazim, paqij bibe!» 42 Û di cih
de kotîbûn jê çû û ew paqij bû. 43 Îsa bi hişkî tembîh li wî kir, di
cih de ew ji ba xwe rêkir 44 û ji wî re got: «Binêre! Ji kesî re tiştekî
nebêje. Lê here, xwe nîşanî kahîn* bide û tiştê ku Mûsa* emir ki-
riye, pêşkêş bike, da ji wan re bibe şahidî, ku tu paqij bûyî.» 45 Lê
ew derket, dest pê kir, bi eşkereyî peyivî û ev gotin belav kir, wusa
ku Îsa êdî nikaribû bi eşkereyî here bajarekî, lê li derve, li cihên
bêpêjin dima. Û xelk ji her aliyî ve dihatin ba wî.

### *Îsa Felciyekî Qenc Dike.*

*(Metta 9:1-8; Lûqa 5:17-26)*

2 Piştî çend rojan, dema ku Îsa vegeriya Kefernahûmê, hat bihîs-
tin ku ew li mal e. 2 Mirov di malê de wusa pirr civiyabûn ku
heta li ber derî jî cih nemabû. Îsa peyva* Xwedê hînî wan dikir.
3 Îcar hin mirov hatin, felciyek ku ji aliyê çar kesan ve dihat hil-
girtin anîn ba Îsa. 4 Lê gava ji ber elaletê* rê nedîtin ku nêzîkî wî
bibin, wan banê xaniyê ku ew lê dima qul kir û mirovê felcî tevî
nivînên wî daxistin jêr. 5 Gava ku Îsa baweriya* wan dît, wî ji yê felcî
re got: «Lawo, li gunehên te hat bihûrtin.» 6 Hinek Şerîetzan* li wir
rûniştibûn û di dilê xwe de digotin: 7 «Ev mirov çima wusa dibêje?
Çêran* dike! Ma ji Xwedê pê ve, kî dikare li gunehan bibihûre?»
8 Îsa jî di cih de bi ruhê xwe bi fikrên wan hesiya û got: «Hûn
çima tiştên weha di dilê xwe de dibêjin? 9 Ma kîjan hêsanîtir e?
Mirov ji yê felcî re bêje: ‹Li gunehên te hat bihûrtin› an bêje:
‹Rabe, nivînên xwe hilîne û rêve here›? 10 Lê ji bo hûn bizanin ku

desthilatiya Kurê* Mirov heye ku li ser erdê li gunehan bibi-
hûre...» 11 ji yê felcî re got: «Ez ji te re dibêjim: Rabe, nivînên xwe
hilîne û here mala xwe.» 12 Zilam jî rabû, di cih de nivînên xwe
hilanîn û li ber hemûyan derket û çû. Hemû jî heyirî man, pesnê
Xwedê dan û gotin: «Me tiştekî wusa tu caran nedîtiye!»

### *Îsa Gazî Lêwî Dike*

*(Metta 9:9-13; Lûqa 5:27-32)*

13 Îsa careke din çû perê golê. Hemû elalet* dihat ba wî û wî jî
ew hîn dikirin. 14 Çaxê ku Îsa derbas dibû, Lêwiyê* kurê Halfayos
li cihê bacxanê rûniştî dît û jê re got: «Li pey min were.» Ew jî
rabû û li pey wî çû. 15 Gava ku Îsa li mala Lêwî li ser xwarinê bû,
gelek bacgir* û gunehkar tevî wî û şagirtên* wî li ser sifrê rûdi-
niştin, çimkî yên li pey wî diçûn gelek bûn. 16 Şerîetzanên* ku Fê-
risî* bûn, dema ku Îsa bi bacgir û gunehkaran re li ser sifrê dîtin, ji
şagirtên wî pirsîn: «Çima ew bi bacgir û gunehkaran re xwarinê
dixwe?» 17 Gava ku Îsa ev bihîst, ji wan re got: «Ne yên saxlem, lê
yên nexweş hewcedarê hekîm* in. Ez nehatime gazî yên rast bi-
kim, lê ez hatime gazî yên gunehkar bikim.»

### *Pirsa Rojîgirtinê*

*(Metta 9:14-17; Lûqa 5:33-39)*

18 Şagirtên* Yûhenna û Fêrisî bi rojî bûn. Hinek hatin ba Îsa û
jê pirsîn: «Çima şagirtên Yûhenna û yên Fêrisiyan rojiyê digirin, lê
şagirtên te rojiyê nagirin?» 19 Îsa ji wan re got: «Heta zava bi wan
re be, ma dibe ku xelkê dawetê rojiyê bigirin? Heta zava bi wan re
be, ew nikarin rojiyê bigirin! 20 Lê rojên ku zava ji wan bê standin
wê bên. Hingê, wê rojê, ewê rojiyê bigirin.

21 «Tu kes bi perçê qumaşê ku neçûye hev cilê kevin pîne na-
ke. Eger bike, pînê nû ji cilê kevin diqete û cihê qetiyayî hê xe-
rabtir dibe. 22 Û tu kes şeraba nû naxe meşkên kevin. Eger bixeyê,
şerab wê meşkan bidirîne, hem şerab ziyan dibe, hem jî meşk. Na,
şeraba nû dixin meşkên nû.»

### *Pirsa Roja Şemiyê*

*(Metta 12:1-8; Lûqa 6:1-5)*

23 Îsa rojeke* Şemiyê di nav dexlan re dibihûrî. Çaxê şagirtên*
wî rêve diçûn, dest pê kirin, simbilên genim çinîn. 24 Fêrisiyan* ji

Îsa re got: «Binêre! Çima şagirtên te tiştê ku roja* Şemiyê nabe di-
kin?» 25 Îsa li wan vegerand û got: «Ma we nexwendiye ku Dawid*
û yên pê re gava birçî bûn û hewcedariya wan hebû, wî çi kir? 26 Di
dema Evyatarê Serokkahîn de ew ket Mala* Xwedê û nanê* pêş-
beriyê xwar, ku xwarina wî nanî ji bilî kahînan* ji kesî din re
çênabe. Bi ser de jî, Dawid nan da yên bi xwe re.» 27 Hingê Îsa ji
wan re got: «Roja Şemiyê ji bo mirovan hat danîn, ne ku mirov ji
bo roja Şemiyê! 28 Bi vî awayî Kurê* Mirov Xudanê roja* Şemiyê
ye jî.»

### *Qenckirina Mirovekî Desthişkbûyî*
*(Metta 12:9-14; Lûqa 6:6-11)*

3 Îcar Îsa careke din ket kinîştê*. Li wê derê mirovek hebû ku
destê wî hişk bûbû. 2 Çavên wan li Îsa bûn, ka ewê roja Şe-
miyê wî qenc bike, da ku wî sûcdar bikin. 3 Îsa ji mirovê ku destê
wî hişk bûbû re got: «Ka rabe, li navendê raweste!» 4 Piştre ji wan
re got: «Ma di roja Şemiyê de qencîkirin an xerabîkirin, xilaskirina
jiyana mirovekî an kuştin cayîz e?» Lê wan devê xwe girt. 5 Îsa bi
hêrs li wan ên ku li hawirdora wî bûn nêrî, ji ber serhişkiya wan
xemgîn bû û ji zilam re got: «Destê xwe dirêj bike.» Wî jî dirêj kir
û destê wî qenc bû. 6 Fêrisî* derketin derve û di cih de bi alîgirên
Hêrodês* re şêwirîn, ka ewê çawa Îsa bidin kuştin.

### *Civata li Perê Golê*

7 Îsa bi şagirtên* xwe ve xwe da perê golê. Ji Celîlê* elalete-
ke* mezin li pey wî hat. 8 Gava ku wan kirinên wî bihîstin, ji Ci-
hûstanê*, ji Orşelîmê*, ji Îdûmeyê* û ji aliyê Urdunê, ji herêma
Sûr* û Saydayê gelek mirov hatin ba wî. 9 Hingê Îsa ji şagirtên
xwe re got ku ji wî re qeyikekê amade bikin, da ku di nav elaletê
de neyê dehfandin. 10 Çimkî wî gelek kes qenc kiribûn, wusa ku
yên êşên wan hebûn, ji bo ku destê xwe li wî bidin, li wî teng
dikirin. 11 Dema ku ruhên nepak ew didîtin, li ber wî deverû xwe
davêtin erdê, diqîriyan û digotin: «Tu Kurê* Xwedê yî!» 12 Lê Îsa
hişk li wan emir dikir, da ji kesî re nebêjin ku ew kî ye.

---

**2:26** Qanûna Kahîntiyê 24:9; 1 Samûêl 21:1-6

### *Hilbijartina Her Diwanzdeh Şagirtan*

*(Metta 10:1-4; Lûqa 6:12-16)*

[13] Îsa hilkişiya çiyê û kesên ku wî dixwestin gazî ba xwe kirin.
Ew jî hatin ba wî. [14] Wî diwanzdeh kes hilbijartin ku bi wî re
bimînin û wan bişîne ku Mizgîniyê* bidin, navê wan kir Şandî*
[15] û wî desthilatî da wan ku cinan derxin. [16] Diwanzdeh kesên hil-
bijartî ev in: Şimûn – ku navê wî kir Petrûs* – [17] Aqûbê* Zebedî û
birayê wî Yûhenna* – wî navê ‹Boanerces› li wan kir, ku tê mana
«Kurên Gurîna Ezmên» – [18] Endrawis, Filîpos, Bertolomeyos, Met-
ta*, Tûma, Aqûbê kurê Halfayos, Tedayos, Şimûnê welatparêz [19] û
Cihûdayê* Îsxeryotî yê ku Îsa da dest.

### *Îsa û Belzebûl*

*(Metta 12:22-32; Lûqa 11:14-23; 12:10)*

[20] Paşê Îsa çû malekê. Dîsa ewqas elalet civiya, wusa ku ni-
karibûn xwarinê jî bixwin. [21] Dema mirovên wî ev yek bihîstin,
derketin ku wî bigirin, çimkî wan digot: «Wî hişê xwe winda
kiriye!» [22] Û Şerîetzanên* ku ji Orşelîmê* daketibûn, digotin: «Bel-
zebûl* bi wî re ye. Ew bi destê mîrê cinan, cinan derdixe!» [23] Îsa jî
ew gazî ba xwe kirin û bi meselan ji wan re got: «Îblîs* çawa di-
kare Îblîs derxe? [24] Eger di nav padîşahiyekê de dubendî hebe, ew
padîşahî nikare bimîne. [25] Û eger di nav malekê de dubendî hebe,
ew mal nikare bimîne. [26] Û eger Îblîs li hember xwe rabe û bi xwe
re bikeve dubendiyê, nikare bimîne û êdî dawiya wî hatiye. [27] Lê
belê tu kes nikare bikeve mala mêrxasekî û talan bike. Divê pêşî
wî mêrxasî girêde û piştre mala wî talan bike.
[28] «Bi rastî ez ji we re dibêjim, hemû guneh û çêrên* kurên
mirovan wê li wan bên bihûrtin, [29] lê belê kî ku çêrî Ruhê* Pîroz
bike, tu caran lê nayê bihûrtin; ew bi gunehê herheyî sûcdar e.»
[30] Îsa weha peyivî, çimkî wan digot: «Ruhê nepak bi wî re heye.»

### *Dê û Birayên Îsa*

*(Metta 12:46-50; Lûqa 8:19-21)*

[31] Dê û birayên Îsa hatin, li derve rawestan, yek şandin pey wî
û gazî wî kirin. [32] Elalet li dora wî rûdinişt, îcar jê re gotin: «Va ye,
diya te û birayên te li derve ne, li te digerin.» [33] Îsa li wan vegerand
û got: «Diya min û birayên min kî ne?» [34] Hingê li kesên li dora

xwe rûniştî nêrî û got: «Va ne, diya min û birayên min! 35 Kî ku
daxwaza Xwedê bîne cih, birayê min, xwişka min û diya min ew e.»

### *Mesela Erdê Qenc û Neqenc*

*(Metta 13:1-9; Lûqa 8:4-8)*

4 Îsa dîsa li perê golê dest bi hînkirinê kir. Elaleteke wusa mezin
li dora wî civiya ku ew li qeyika li ser golê siwar bû û rûnişt.
Hemû elalet li perê golê bû 2 û wî gelek tişt bi meselan hînî wan
dikir. Di hînkirina xwe de got: 3 «Guhdarî bikin! Cotkar derket ku
tov biçîne. 4 Çaxê wî tov direşand, hinek jê ket tenişta rê, teyr hatin
û ew xwarin. 5 Û hinek ket ser erdê kevirî yê ku axa wî kêm bû û ji
ber ku ax ne kûr bû, ew zû şîn bû. 6 Gava roj hilat, ew kizirî; ji ber
ku rayê* wî tunebû, hişk bû. 7 Û hinekî din ket nav stiriyan, stirî
mezin bûn û ew fetisandin û wî ber neda. 8 Û hinek ket ser erdekî
qenc û şîn bû, mezin bû û ber da, hinekan sî, hinekan şêst, hinekan
sed qat ber dan.»
9 Û Îsa ji wan re got: «Ewê ku guhên wî ji bo bihîstinê hene,
bila bibihîze.»

### *Armanca Meselan*

*(Metta 13:10-17; Lûqa 8:9-10)*

10 Gava Îsa bi tenê ma, diwanzdehan û kesên ku li hawirdora
wî bûn li ser meselan jê pirsîn. 11 Wî li wan vegerand û got: «Sirên
Padîşahiya* Xwedê ji we re hatine dayîn, lê ji bo wan ên ku li der-
ve ne, her tişt bi meselan tê gotin, 12 da ku:

‹Çiqas bibînin jî tênegihîjin;
Çiqas bibihîzin jî fêm nekin;
Nebe ku vegerin û li wan bê bihûrtin*.›[a]»

### *Şîrovekirina Mesela Erdê Qenc û Neqenc*

*(Metta 13:18-23; Lûqa 8:11-15)*

13 Îsa ji wan re got: «Ma hûn vê meselê fêm nakin? Nexwe hû-
nê çawa hemû meselan fêm bikin? 14 Cotkar peyvê* diçîne. 15 Yên
li tenişta rê, ew cihê ku peyv lê hatiye çandin, ew in ku dibihîzin,
lê di cih de Îblîs* tê û peyvê ji dilê wan dertîne. 16 Yên li ser erdê
kevirî hatine çandin jî ew in ku gava peyvê dibihîzin, di cih de bi

---

[a] **4:12** Ji: Îşaya 6:9-10

şahî wê qebûl dikin, 17 lê ji ber ku rayê* wan tune, ew tenê demeke
kurt dimînin. Dema ku ji bo peyvê cefa û tengahiyê dibînin, zû ji
rê derdikevin. 18 Û yên di nav stiriyan de hatine çandin ew in, ku
peyvê dibihîzin, 19 lê xema vê dinyayê û xapandina dewlemendiyê û
xwestina tiştên din dikevin navê û peyvê difetisînin û peyv bêber di-
mîne. 20 Û yên di erdê qenc de hatine çandin ew in ku peyvê dibihî-
zin, qebûl dikin. Hinek sî, hinek şêst û hinek jî sed qatî ber didin.»

### *Ronahiya Çirayê*

*(Lûqa 8:16-18)*

21 Û Îsa ji wan re got: «Gava çirayê tînin hundir, ma ji bo ku
bixin bin melkebê an jî bin nivînan tînin? Ma ne ji bo danîna ser
pêçirayê ye? 22 Tu tiştê veşartî tune ku neyê eşkerekirin, ne jî
tiştekî nixumandî heye ku nekeve ber ronahiyê. 23 Guhên kê ji bo
bihîstinê hebin, bila bibihîze.» 24 Û wî ji wan re got: «Bala xwe
bidin tiştên ku hûn dibihîzin. Hûn bi kîjan pîvanê bipîvin, bi wê
pîvanê wê ji we re jî bê pîvandin û bi ser de jî wê bê zêdekirin.
25 Çimkî bi kê re hebe, wê bêtir ji wî re bê dayîn û bi kê re tunebe,
tiştê ku pê re heye jî, wê jê bê standin.»

### *Padîşahiya Xwedê*

26 Û Îsa got: «Padîşahiya* Xwedê dimîne vê yekê: Zilamek li
erdê tov diçîne. 27 Bi şev radize, bi roj radibe, tov şîn dibe û mezin
dibe û mirov nizane ku ev çawa dibe. 28 Erd ji ber xwe ber dide;
pêşî zîl dide, piştre diseride, paşê jî liba gihîştî di simbil de dide.
29 Gava ku ber digihîje, mirov êdî dasê davêjê, çimkî dema dirûna
wî hatiye.»

### *Mesela Liba Xerdelê*

*(Metta 13:31-35; Lûqa 13:18-19)*

30 Îsa got: «Gelo em Padîşahiya Xwedê bimînînin çi? An jî em
wê bi kîjan meselê bêjin? 31 Ew dimîne liba xerdelê. Gava tê çan-
din, ji hemû tovên li ser erdê biçûktir e. 32 Lê gava digihîje, ji hemû
pincaran meztir dibe û çiqilên mezin dide, wusa ku teyrên ezmên
dikarin di bin siya wê de bi cih bibin.»

33 Bi gelek meseleyên bi vî awayî li gor ku ew têdigihîştin, wî
peyv* ji wan re digot. 34 Bê mesele ji wan re tiştek nedigot, lê gava
ew bi tenê bûn, ji şagirtên xwe re her tişt vedikir.

### *Îsa Bagerê Radiwestîne*

*(Metta 8:23-27; Lûqa 8:22-25)*

35 Wê rojê, gava ku bû êvar, Îsa ji şagirtên xwe re got: «Em
derbasî wî aliyê golê bibin.» 36 Şagirt ji elaletê veqetiyan, ketin qe-
yika ku Îsa tê de bû û wan ew bi xwe re bir. Qeyikên din jî bi wî re
bûn. 37 Îcar bagereke mezin rabû, pêlan wusa li qeyikê dixist ku êdî
ew bi avê tije dibû. 38 Lê Îsa di paşiya qeyikê de serê xwe danîbû
ser balgehekê û radiza. Wan ew hişyar kir û gotin: «Mamoste, ma
ne xema te ye ku em helak bibin?» 39 Îsa rabû, li bayê hilat* û emir
li golê kir: «Raweste, bêdeng be!» Ba sekinî, bêpêjiniyeke mezin
çêbû. 40 Îsa ji şagirtan re got: «Hûn çima ditirsin? Ma hê baweriya*
we tune?» 41 Tirseke mezin ket ser wan û ji hevdû re gotin: «Gelo
ev kî ye ku hem ba, hem jî gol bi ya wî dikin?»

### *Îsa Yekî Cinoyî Qenc Dike*

*(Metta 8:28-34; Lûqa 8:26-39)*

5 Ew derbasî aliyê din ê Gola Celîlê bûn û gihîştin herêma
Girasîniyan. 2 Gava ku Îsa ji qeyikê derket, wê gavê ji nav
goristanê mirovek rastî wî hat ku bi ruhê nepak ketibû. 3 Ew di nav
goran de dijiya û tu kesî nikaribû bi zincîran jî wî girêde; 4 çimkî
gelek caran ew bi qeyd û zincîran girêdabûn, lê wî zincîr qetan-
dibûn û qeyd şkandibûn. Tu kesî nikaribû ew zeft bikira. 5 Hergav,
bi şev û roj di goristanan de, li serê çiyan diqîriya û xwe bi keviran
birîndar dikir.

6 Gava wî Îsa ji dûr ve dît, bi lez hat, jê re çû ser çokan 7 û bi
dengekî bilind qîriya û got: «Ya Îsa, Kurê* Xwedayê bilind, ma te
çi ji min e? Ji bo xatirê Xwedê, min nede ezabê!» 8 Çimkî Îsa go-
tibû: «Hey ruhê nepak, ji vî mirovî derkeve!» 9 Îsa jê pirsî: «Navê
te çi ye?» Wî jî got: «Navê min Lejyon* e, çimkî em gelek in.»
10 Wî pirr ji Îsa lava kir ku ew wan neşîne derveyî wê herêmê. 11 Û
li wir, li pala çiyê garaneke mezin a berazan diçêriya. 12 Ruhên
nepak ji Îsa lava kirin û gotin: «Me bişîne nav berazan ku em bi-
kevin nav wan.» 13 Wî jî destûr da wan, ruhên nepak jî derketin û
ketin nav berazan. Ew garana ku nêzîkî du hezar beraz bû, wê xwe
di kaşê re avêt golê û xeniqî 14 Gavanên berazan reviyan û ev xeber
li bajêr û li gundan belav kirin. Û xelk jî hatin ku tiştên bûyî
bibînin. 15 Ew hatin ba Îsa û wan ew mirovê ku lejyoneke* cinan tê

de bû, bi cil û li ser hişê xwe û rûniştî dîtin. Hingê ew tirsiyan.
16 Yên ev yeka ku ji wî mirovê cinoyî* re hat kirin û tiştê ku bi
berazan hatibû, dîtin, ji xelkê re gotin. 17 Û wan dest pê kir lava ji
Îsa kirin ku ew ji herêma wan here.
18 Gava Îsa ket qeyikê, ew mirovê ku cinoyî bû, jê lava kir ku
bi wî re here. 19 Lê Îsa nehişt û jê re got: «Vegere mala xwe û ji
maliyên xwe re bêje ku Xudan* ji bo te çi kir û çawa li te hat reh-
mê.» 20 Ew jî çû û eva ku Îsa ji bo wî kiribû li herêma Dêkapolîsê*
belav kir û her kes şaş ma.

### *Vejandina Keçekê û Qencbûna Jinekê*

*(Metta 9:18-26; Lûqa 8:40-56)*

21 Gava Îsa dîsa bi qeyikê derbasî aliyê din bû, elaleteke mezin
li dora wî civiya. Ew li perê golê disekinî. 22 Yek ji serekên kinîştê
ku navê wî Yayîros bû, hat ba wî. Gava wî Îsa dît, xwe avêt ber
lingên wî, 23 jê gelek lava kir û got: «Keçika min a biçûk li ber
mirinê ye. Were û destên xwe deyne ser wê, da ku ew qenc bibe û
bijî.» 24 Îsa rabû bi wî re çû.
Elaleteke mezin li pey wî diçû û der û dor lê teng dikir. 25 Û
jinikek li wir hebû ku ji diwanzdeh salan ve xwîn jê diçû. 26 Wê ji
destê gelek hekîman* gelek êş kişandibû û hemû hebûna xwe me-
zaxtibû, dîsa feyde nedîtibû, lê hê xerabtir bûbû. 27 Jinikê tiştên ku
li ser Îsa hatibûn gotin, bihîstibû. Di nav elaletê de ji pişt ve hat û
destê xwe li kirasê wî da. 28 Çimkî wê di dilê xwe de digot: «Bi
tenê ez destê xwe li kirasê wî bidim, ezê qenc bibim.» 29 Û di cih
de xwîna ku jê diçû çikiya û jinikê jî ji bedena xwe fêm kir ku ji
êşa xwe qenc bû. 30 Îsa di cih de pê hesiya ku hêzek jê çû, di nav
elaletê de zivirî û pirsî: «Kê destê xwe li cilên min da?» 31 Şagirtên
wî gotin: «Tu dibînî ku elaletê der û dor li te teng kiriye, hê jî tu
dibêjî: ‹Kê destê xwe li min da?›» 32 Lê Îsa çav li dora xwe dige-
rand ku bibîne, kê ev kiriye. 33 Jinikê dizanibû ku çi bi wê hatiye
kirin, bi tirs û lerz hat û xwe avêt ber lingên wî û hemû rastî got.
34 Îsa ji wê re got: «Keça min, baweriya* te tu qenc kirî. Bi silamet
here û ji êşa xwe sax bibe.»
35 Îsa hê dipeyivî, ji mala serekê kinîştê mirov hatin û gotin:
«Keçika te mir. Tu çima hê mamoste diwestînî?» 36 Gava Îsa ev
bihîst, wî ji serekê kinîştê re got: «Netirse, bi tenê bawer bike!»

37 Wî nehişt ku ji bilî Petrûs, Aqûb* û birayê wî Yûhenna kes li
pey wî bê. 38 Çaxê gihîştin mala serekê kinîştê, Îsa dît ku dikin
qîjeqîj, digirîn û diqîrin. 39 Gava ew ket hundir, ji wan re got: «Çi-
ma hûn dikin qîjeqîj û digirîn? Zarok nemiriye, lê di xew de ye.»
40 Îcar ew pê keniyan.

Lê Îsa hemû derxistin derve, dê û bavê zarokê û her sê şagirtên
xwe birin û ket cihê ku zarok lê bû. 41 Destê zarokê girt û jê re got:
«Talîta qûm!» ku bê wergerandin: «Keçikê, ez ji te re dibêjim: Ra-
be!» 42 Keçik di cih de rabû û geriya. Ew diwanzdeh salî bû. Îcar
ew yekcar şaş man. 43 Îsa hişk li wan emir kir ku vê yekê ji kesî re
nebêjin û ji wan re got ku xwarinê bidin keçikê.

### *Îsa li Bajarê Xwe Nisretê Tê Redkirin*

*(Metta 13:53-58; Lûqa 4:16-30)*

6 Îsa ji wir derket û çû bajarê xwe. Şagirtên wî jî li pey wî çûn.
2 Çaxê bû roja Şemiyê, wî di kinîştê de dest bi hînkirinê kir û
gelekên ku ew bihîstin, gelek şaş man û gotin: «Vî mirovî ev tişt ji
ku derê anîn? Ev çi şehrezayî ye ku jê re hatiye dayîn? Ev çi ke-
ramet in ku bi destê wî çêdibin? 3 Ma ev ne xerat e? Ma ev ne kurê
Meryemê* û birayê Aqûb, Yûsês, Cihûda û Şimûn e? Ma xwişkên
wî ne li vir di nav me de ne?» Bi vî awayî ew ji wî enirîn.

4 Îsa jî ji wan re got: «Pêxemberek* ji bajarê xwe, di nav miro-
vên xwe de û ji mala xwe pê ve, li cihên din ne bê siyanet* e.» 5 Wî
li wê derê nikaribû tu keramet bikira, bi tenê destên xwe danîn ser
çend nexweşan û ew qenc kirin. 6 Îsa li bêbaweriya wan şaş ma.

### *Şandina Diwanzdeh Şagirtan*

*(Metta 10:5-15; Lûqa 9:1-6)*

Îsa li gundên hawirdorê digeriya û hîn dikir. 7 Wî her diwanz-
deh gazî ba xwe kirin û dest pê kir, ew cot bi cot şandin û li ser
ruhên nepak desthilatî da wan. 8 Li wan emir kir û got: «Ji bo
rêwîtiyê ji bilî dar tu tiştî bi xwe re nebin: Ne nan, ne tûr û ne jî di
kemberê de pere. 9 Çaroxên xwe bikin piyê xwe, lê du kirasan
wernegirin.» 10 Ser ve zêde kir û got: «Her li ku derê hûn bikevin
malekê, heta ku hûn ji wî cihî derkevin, li wê malê bimînin. 11 Ew
cihên ku we qebûl nekin û guh nedin gotina we jî, gava hûn ji wir
herin, toza lingên xwe biweşînin, da ku ev ji bo wan bibe şahidî.»

[12] Ew jî bi rê ketin û wan hîn kir ku mirov tobe bikin. [13] Wan
gelek cin derdixistin û rûn li gelek nexweşan didan û ew qenc
dikirin.

### *Kuştina Yûhennayê Imadkar*

*(Metta 14:1-12; Lûqa 9:7-9)*

[14] Û Hêrodês* padîşah ev yek bihîst, çimkî nav û dengê Îsa
derketibû. Hinekan digot: «Ev Yûhennayê* imadkar e ku ji nav
miriyan rabûye. Ji ber vê yekê karên hêzdar bi destê wî tên
kirin.» [15] Lê hinekan jî digot: «Ev Êlyas* e.» Hinekên din jî di-
gotin: «Ev pêxemberek* wek pêxemberên dema berê ye.» [16] Lê
gava Hêrodês ev yek bihîst, wî got: «Yûhennayê ku min serê wî
jêkiriye, ji nav miriyan rabûye.» [17] Çimkî Hêrodês bi xwe Yû-
henna dabû girtin, girêdabû û avêtibû zîndanê. Wî ev ji ber
Hêrodiya jina Filîposê birayê xwe kir, çimkî wî ew ji xwe re
anîbû. [18] Lê Yûhenna jê re gotibû: «Nabe ku tu jinbira xwe bînî.»
[19] Loma kîna Hêrodiya ji Yûhenna hebû, dixwest ku wî bide kuş-
tin, lê bi ser nediket, [20] çimkî Hêrodês ji Yûhenna ditirsiya û ew
diparast; ji ber ku dizanibû Yûhenna mirovekî rast û pîroz* e.
Gava ku guhê xwe dida gotina wî, ew heyirî dima, lê dîsa jî bi
dilxweşî guhdariya wî dikir. [21] Îcar fersendek derket. Hêrodês ji
bo rojbûyîna xwe ziyafetek da malmezin, serdarên leşkerî û gi-
regirên Celîlê. [22] Gava keça Hêrodiyayê ket hundir, reqisî û ev yek
li Hêrodês û vexwendiyên li ser sifrê rûniştî xweş hat. Hingê
padîşah ji keçikê re got: «Tu ji min her çi dixwazî bixwaze, ezê
bidim te.» [23] Û wî jê re ji dil sond xwar û got: «Tu ji min her çi
bixwazî, ezê bidim te, heta nîvê padîşahiya xwe jî!» [24] Keçik
derket û çû ji diya xwe pirsî: «Ez çi bixwazim?» Diya wê jî got:
«Serê Yûhennayê imadkar!» [25] Keçik hema bi lez çû ba padîşah û
daxwaza xwe jê re got: «Ez dixwazim ku tu niha serê Yûhennayê
imadkar li ser sêniyekê bidî min.» [26] Padîşah gelek xemgîn bû. Lê
ji ber ku li pêşberî vexwendiyan sond xwaribû, nexwest soza ku
daye wê, bişkêne. [27] Padîşah hema celad şand, emir lê kir ku serê
Yûhenna bîne. Celad jî çû zîndanê, serê wî jêkir [28] û li ser sêniyekê
anî û da keçikê. Wê jî ew bir û da diya xwe. [29] Gava ku şagirtên*
Yûhenna ev yek bihîstin, hatin cesedê wî birin û di gorekê de
veşartin.

### *Îsa Pênc Hezar Mirov Têr Dike*

*(Metta 14:13-21; Lûqa 9:10-17; Yûhenna 6:1-14)*

30 Û Şandî* vegeriyan ba Îsa, her tiştê ku kiribûn û hîn kiribûn
ji wî re gotin. 31 Îsa ji wan re got: «Hûn bi serê xwe werin cihekî
bêpêjin û piçekî bîhna xwe vedin.» Ji ber ên ku diçûn û dihatin pirr
bûn, wan fersend nedidît ku xwarinê jî bixwin. 32 Îcar ew bi serê
xwe ketin qeyikekê û çûn cihekî bêpêjin. 33 Lê gelek kesên ku çûna
wan dîtin ew nas kirin. Ji hemû bajaran peya bi lez ketin rê û
beriya wan gihîştin wir. 34 Çaxê Îsa derket bejê, wî elaleteke mezin
dît û dilê wî bi wan şewitî, çimkî mîna miyên bê şivan bûn. Dest
pê kir, gelek tişt hînî wan kir. 35 Êdî ji ber ku wext dereng bû,
şagirtên* Îsa hatin û jê re gotin: «Ev der cihekî bêpêjin e, wext jî
dereng e. 36 Bihêle ku ew herin gund û gundikên der û dorê û ji
xwe re tiştên xwarinê bikirrin.» 37 Îsa li wan vegerand û got: «Hûn
xwarinê bidin wan!» Şagirtan got: «Ma em herin bi du sed zîvî*
nên bikirrin û bi wan bidin xwarin?»

38 Îsa ji wan re got: «Herin binêrin, ka çend nanên we hene.»
Gava ku wan zanî, gotin: «Pênc nan û du masî hene.» 39 Wî emir li
wan kir ku hemûyan kom bi kom li mêrgê bidin rûniştin. 40 Ew jî ji
komên ku ji sed kesî û pêncî kesî pêk hatibûn li erdê rûniştin.

41 Îsa her pênc nan û herdu masî hildan, li ezmên nêrî, şikir kir,
nan şkandin û da şagirtên xwe, da ku ew deynin ber elaletê. Û
herdu masî jî li hemû elaletê leva* kir. 42 Hemûyan xwar û têr bûn.
43 Ji nan û masiyên ji ber wan mabûn diwanzdeh selik tije parî dan
hev. 44 Hijmara yên ku ji wî nanî xwarin pênc hezar mêr bû.

### *Îsa li ser Avê Rêve Diçe*

*(Metta 14:22-33; Yûhenna 6:15-21)*

45 Gava ku Îsa elalet verêdikir, wî zû pêstûrî li şagirtên xwe kir
ku ew li qeyikê siwar bibin û ji beriya wî derbasî aliyê din ê golê,
Beytsaydayê bibin. 46 Piştî xatir ji wan xwest, ji bo ku dua bike, çû
çiyê. 47 Dema ku bû êvar, qeyik di nava golê de bû û Îsa jî bi serê
xwe li perê avê bû. 48 Îsa dît ku şagirt di kişandina bêrikan de gelek
zehmet dikişînin, çimkî ba ji hember wan ve dihat. Nêzîkî berban-
ga sibehê, Îsa li ser golê rêve çû û nêzîkî wan bû. Wî xwest ku di
ber wan re derbas bibe, 49 lê gava wan dît ku Îsa li ser golê rêve
diçe, wan got qey xeyaletekê dibînin û qîriyan. 50 Çimkî hemûyan

jî ew dîtin û bizdiyan. Lê Îsa di cih de bi wan re peyivî û got: «Bi
zirav bin! Ez im. Netirsin!» 51 Hingê ew li ba wan, li qeyikê siwar
bû û ba rawesta. Şagirt bi carekê şaş man, 52 çimkî wan ew bûyera
li ser nên fêm nekiribû; hişê wan giran bûbû.

### *Îsa di Cênîsartê de Nexweşan Qenc Dike*

*(Metta 14:34-36)*

53 Gava ew derbasî aliyê din bûn, ketin bejê û hatin bajarê
Cênîsartê* û qeyik girêdan. 54 Ew ji qeyikê peya bûn û xelkê di cih
de Îsa nas kir. 55 Xelk bi lez li seranserê herêmê geriya, cihê ku Îsa
lê bû hîn bûn û hemû nexweş bi nivînên wan ve anîn. 56 Her cihên
ku Îsa diçûyê, bajar be, gund be û gundik be, nexweş li ser mey-
danan vedizelandin û ji bo ku bi tenê destê xwe li rêşiyên* kirasê
wî bidin, lava dikirin. Hemû yên ku destê xwe lê didan, qenc
dibûn.

### *Adetên Bav û Kalan*

*(Metta 15:1-9)*

7 Fêrisî û hinek Şerîetzanên ku ji Orşelîmê hatibûn, li dora Îsa
civiyan. 2 Û dîtin ku hinek ji şagirtên wî bi destên murdar*
xwarinê dixwin, yanî ne bi destên li gor adetê şuştî. 3 – Fêrisî û
hemû Cihû adetên bav û kalên xwe digirin, heta ku destên xwe baş
neşon, xwarinê naxwin 4 û çaxê ji sûkê tên jî, heta ku avê bi xwe
de nekin, naxwin. Gelek adetên din jî hene ku ji bav û kalan
distînin û tînin cih: Wek şuştina tas, şerbik û firaxên sifir. – 5 Îcar
Fêrisî û Şerîetzanan ji Îsa pirsîn: «Çima şagirtên te adetên bav û
kalan nagirin, lê bi destên murdar xwarinê dixwin?» 6 Wî li wan
vegerand û got: «Îşaya* ji bo we durûyan rast pêxemberîtî kiriye!
Wek ku hatiye nivîsîn:

‹Ev gel bi devê xwe rûmetê dide min,
Lê dilê wan ji min dûr e.
7 Bi pûçîtî diperizin* min,
Di hîndariya xwe de, emrên mirovan hîn dikin.›[a]

8 «Hûn emrê Xwedê dihêlin û xwe bi adetên mirovî ve
girêdidin.» 9 Û wî ji wan re got: «Hûn ji bo adetên xwe çi xweş

---

[a] 7:6-7 Ji: Îşaya 29:13

emrê Xwedê jî didin aliyekî. [10] Çimkî Mûsa gotiye: ‹Qedrê dê û
bavê xwe bigire›[a] û ‹Yê ku tiştê xerab ji dê û bavê xwe re bêje,
divê bê kuştin.›[b]
[11] Lê hûn dibêjin: ‹Eger mirovek ji dê an jî ji bavê xwe re bêje: Ew
alîkariya ku wê ji min bigihîşta te, «qurban» e›, ku tê mana «ji
Xwedê re diyarî ye», [12] êdî hûn nahêlin ew qet tiştekî ji dê û bavê
xwe re bike! [13] Bi vî awayî, bi adetên xwe yên ku hûn derbasî
nifşên* nû dikin, hûn peyva* Xwedê radikin. Û hûn gelek tiştên bi
vî awayî dikin.»

### *Tiştên ku Mirov Dilewitînin*

*(Metta 15:10-20)*

[14] Îsa careke din elalet gazî ba xwe kir û ji wan re got: «Hûn
hemû guhdariya min bikin û fêm bikin. [15-16] Tu tişt tune ku ji derve
bikeve hundirê mirov û bikare wî murdar bike, lê ew tiştên ku ji
hundirê mirov derdikevin, wî murdar dikin.» [17] Gava ji elaletê ve-
qetiya û hat malê, şagirtên wî mana wê meselê pirsîn. [18] Îsa li wan
vegerand û got: «Ma hûn jî fêmkor in? Ma hûn fêm nakin, her çi
tiştê ku ji derve dikeve hundirê mirov, nikare wî nepak bike.
[19] Çimkî ew naçin dilê wî, lê diçin zikê wî û ji wir jî dertên derve.»
Bi vê yekê Îsa hemû xwarin helal kirin. [20] Û got: «Ew tiştên ku ji
dilê mirov derdikevin, wî murdar dikin. [21] Çimkî ji dilê mirov fik-
rên xerab derdikevin: Fuhûşî, dizî, kuştin, [22] zîna, çavbirçîtî, xera-
bî, hîlebazî, bêedebî, çavnebarî, çêr, quretî û bêaqilî. [23] Tevahiya
van xerabiyan ji dil derdikevin û mirov murdar dikin.»

### *Baweriya Jinika Kenanî*

*(Metta 15:21-28)*

[24] Îsa ji wê derê rabû çû herêma Sûrê. Çû malekê û nexwest ku
kesek pê bizane, lê nikaribû veşartî bimîne. [25] Îcar jinikeke ku ruhê
nepak bi keça wê ya biçûk re hebû, gava li ser Îsa bihîst, di cih de
hat û xwe avêt ber lingên wî. [26] Jinik Yewnanî* bû û bi eslê xwe ji

---

[a] **7:10** Ji: Derketin 20:12; Dubarekirina Şerîetê 5:16

[b] **7:10** Ji: Derketin 21:17

**7:15** Di nav hin destnivîsaran de li dawiyê ev jî heye: «Yê ku guhên wî ji bo bihîstinê hene, bila bibihîze.»

Fînîkya Sûriyê bû. Wê ji Îsa lava kir ku cin ji keça wê derxe. 27 Îsa
ji wê re got: «Bihêle ku pêşî zarok têr bibin, çimkî ne rast e ku
mirov nanê zarokan bistîne û bavêje ber kûçikan.» 28 Lê jinikê got:
«Erê ya Xudan*, lê kûçik jî ji hûrikên zarokan ên bin sifrê di-
xwin.» 29 Wî ji jinikê re got: «Ji ber vê gotina te, tu dikarî herî, cin
ji keça te derketiye.» 30 Jinik çû mala xwe, keçik di nav nivînan de
raketî dît û cin jê derketibû.

### *Mirovekî Kerr û Lal Dipeyive*

31 Hingê ji Herêma Sûrê veqetiya, di nav Saydayê re derbas bû,
di herêma Dêkapolîsê* re hat Gola Celîlê. 32 Mirovekî kerr û lal
anîn û jê lava kirin ku destê xwe deyne ser wî. 33 Îsa ew ji elaletê
veqetand, tiliyên xwe xistin guhên wî, destê xwe tif da û li zimanê
wî da. 34 Çavên xwe ber bi ezmên ve hildan, axîn kişand û got:
«Effata!» ku tê mana «Vebe!» 35 Di cih de guhên wî bihîstin, zi-
manê wî vebû û bi awayekî zelal dest bi peyivînê kir. 36 Îsa tembîh
li wan kir ku ji kesî re nebêjin. Lê wî çiqas zêde tembîh li wan
dikir, wan ewqas zêdetir bûyer belav dikir. 37 Xelk gelek şaş ma û
digotin: «Wî hemû tişt qenc kir: Hem guhên kerran vedike, hem jî
lalan dipeyivîne.»

### *Îsa Çar Hezar Mirov Têr Dike*

*(Metta 15:32-39)*

8 Di wan rojan de dîsa gava ku elaleteke mezin civiya û tiştekî
wan tunebû ku bixwin, Îsa gazî şagirtên xwe kir û got: 2 «Dilê
min bi vê elaletê dişewite, çimkî ev sê roj e ku bi min re ne û
tiştekî wan tune ku bixwin. 3 Eger ez wan birçî bişînim malên wan,
ewê di rê de dilbihûrî bibin û hin ji wan jî ji cihên dûr hatine.»
4 Şagirtên wî lê vegerandin û gotin: «Li vê çolê mirov ji ku derê
dikare evqas kesî têr bike?» 5 Îsa ji wan pirsî: «Çend nanên we
hene?» Wan got: «Heft.» 6 Îsa li elaletê emir kir ku li erdê rûnin.
Wî heft nan hildan, şikir kir, ew şkandin û dan şagirtên xwe ku
deynin ber xelkê. Wan jî ew danîn ber wan. 7 Û çend masiyên wan
ên biçûk jî hebûn. Îsa ji bo wan jî şikir kir û got: «Van jî deynin
ber elaletê.» 8 Wan xwar û têr bûn û wan heft selik ji pariyên
bermayî dan hev. 9 Hijmara yên ku xwarin, nêzîkî çar hezar mirov

bû. Gava ku Îsa ew verêkirin, [10] di cih de bi şagirtên xwe ve ket
qeyikê û çûn herêma Dalmanûtayê.

### *Fêrisî li Nîşanekê Digerin*
*(Metta 16:1-4)*

[11] Fêrisî hatin û bi Îsa re dest bi munaqeşê kirin. Ji bo ku wî
biceribînin, nîşanek ji ezmên jê dixwestin. [12] Îsa ji kûr ve axînek
kişand û got: «Çima ev nifş* li nîşanekê digere? Bi rastî ez ji we re
dibêjim, ji vî nifşî re nîşanek nayê dayîn.» [13] Wî ew hiştin, dîsa ket
qeyikê û derbasî aliyê din ê golê bû.

### *Hevîrtirşkê Fêrisiyan û Hêrodês*
*(Metta 16:5-12)*

[14] Îcar şagirtan ji bîr kiribûn ku bi xwe re nên bînin. Li ba wan,
di qeyikê de ji nanekî pê ve, tiştek tunebû. [15] Îsa tembîh li wan kir
û got: «Hay ji xwe hebin, xwe ji hevîrtirşkê Fêrisiyan û ji hevîrtirş-
kê Hêrodês biparêzin.» [16] Şagirt di nav xwe de peyivîn û gotin: «Ji
ber ku nanê me tune, weha dibêje.» [17] Îsa dizanibû ku ew çi dibêjin
û wî ji wan re got: «Hûn çima di nav xwe de dipeyivin ku nanê we
tune? Ma hûn tênagihîjin û fêm nakin? Ma hişê we giran bûye?

[18] Çavên we hene, ma hûn nabînin?
Guhên we hene, ma hûn nabihîzin?

Ma nayê bîra we, [19] çaxê ku min pênc nan ji bo pênc hezar mirov
şkandin, ji pariyên nên we çend selikên tije dan hev?» Wan lê
vegerand û gotin: «Diwanzdeh.» [20] «Û gava min heft nan ji bo çar
hezar mirov şkandin, we çend selikên tije parî dan hev?» Wan got:
«Heft.» [21] Îsa ji wan re got: «Ma hûn hê jî fêm nakin?»

### *Li Beytsaydayê Qenckirina Korekî*

[22] Û ew hatin Beytsaydayê. Hinekan mirovekî kor anî ba Îsa û
jê lava kirin ku destê xwe deyne ser. [23] Wî jî bi destê mirovê kor
girt û ew derxist derveyî gund. Çaxê çavên wî bi tifa xwe şil kirin
û destên xwe danîn ser wî, pirsî: «Ma tu tiştekî dibînî?» [24] Wî jî li
jorê nêrî û got: «Ez mirovan dibijêrim, mîna daran in û rêve

**8:10** Dalmanûta: Di perê Gola Celîlê de bajarokek e.
**8:18** Binêre: Yêremya 5:21; Hezekiyêl 12:2

diçin.» [25] Careke din Îsa destên xwe danîn ser çavên wî, yê kor bi
baldarî nêrî û çavên wî vebûn û her tişt bi zelalî dît. [26] Îsa jî ew
şand mala wî û jê re got: «Nekeve nav gund.»

### *Şahidiya Petrûs a li ser Îsa*
*(Metta 16:13-20; Lûqa 9:18-21)*

[27] Îsa bi şagirtên xwe ve çû gundên Qeyseriya Filîpos û di rê de
ji şagirtên xwe pirsî: «Li gor gotina xelkê ez kî me?» [28] Wan lê
vegerand û gotin: «Hinek dibêjin Yûhennayê* imadkar e, hinek di-
bêjin Êlyas* e, hinekên din jî dibêjin yek ji pêxemberan e.» [29] Îsa ji
wan pirsî: «Lê hûn çi dibêjin? Bi ya we ez kî me?» Petrûs bersîva
wî da û got: «Tu Mesîh* î.» [30] Îsa jî li wan hişk emir kir ku li ser
wî ji kesî re nebêjin.

### *Îsa ji pêşî ve li ser Mirin û Rabûna Xwe Dibêje*
*(Metta 16:21-28; Lûqa 9:22-27)*

[31] Hingê Îsa dest pê kir şagirtên xwe hîn kirin, ku divê Kurê
Mirov gelek cefayê bikişîne, ji aliyê rihspî, serekên kahînan* û
Şerîetzanan ve bê redkirin, bê kuştin û roja sisiyan rabe. [32] Û wî ev
bi eşkereyî got. Îcar Petrûs ew kişand aliyekî û lê hilat*. [33] Lê Îsa
zivirî û li şagirtên xwe nêrî, li Petrûs hilat û got: «Ji min dûr keve,
Îblîs! Çimkî tu ne tiştên xwedayî*, lê tiştên mirovî difikirî.»
[34] Hingê Îsa elalet û şagirtên xwe gazî ba xwe kirin û ji wan re
got: «Eger yek bixwaze li pey min bê, bila xwe înkar bike, rahêje
xaça xwe û li pey min bê. [35] Çimkî kî ku bixwaze jiyana xwe xilas
bike, ewê wê winda bike; lê kî ku jiyana xwe di ber min û Miz-
gîniyê de winda bike, ewê wê xilas bike. [36] Mirovek hemû dinyayê
bi dest bixe jî, lê jiyana xwe winda bike, çi feyda wî heye? [37] Ma
mirov dikare çi di ber jiyana xwe de bide? [38] Kî ku di nav vî nifşê
zînakar û gunehkar de ji min û ji gotinên min şerm bike, Kurê*
Mirov jî, gava di rûmeta Bavê* xwe de tevî milyaketên pîroz* bê,
wê ji ber wî şerm bike.»

9 Û wî ji wan re got: «Bi rastî ez ji we re dibêjim, hin ji van
kesên ku li vir radiwestin, heta ku nebînin Padîşahiya Xwedê
bi hêz tê, ew mirinê qet tam nakin.»

### *Dîtina Îsa Diguhere*
*(Metta 17:1-13; Lûqa 9:28-36)*

[2] Piştî şeş rojan Îsa Petrûs, Aqûb û Yûhenna birin û ew bi xwe
re derxistin çiyayekî bilind; li wir ew bi serê xwe bûn û dîtina wî li
ber wan hat guhertin. [3] Cilên wî çîlspî bûn û ewqas dibiriqîn ku li
ser rûyê erdê tu cilspîker nikaribû ew wusa spî bikirana. [4] Hingê
Êlyas* û Mûsa* li wan xuya bûn û bi Îsa re peyivîn. [5] Petrûs ji Îsa
re got: «Mamoste, çiqas qenc e ku em li vir in! Ka em sê holikan
çêkin, yekê ji te re, yekê ji Mûsa re û yekê jî ji Êlyas re.» [6] Wî
nizanibû ku çi bêje, ji ber ku ew gelek tirsiyabûn. [7] Hingê ewrek
derket, li ser wan kir sî û dengek ji ewr hat: «Ev e Kurê* min ê
delal! Guhdariya wî bikin!» [8] Ji nişkê ve şagirtan li dora xwe nêrî,
ji Îsa pê ve kesek nedîtin.

[9] Çaxê ji çiyê dihatin xwarê, Îsa li wan emir kir ku heta Kurê*
Mirov ji nav miriyan ranebe, ew ji kesî re tiştên dîtî nebêjin. [10] Şa-
girtan ev peyv di dilê xwe de girt û ji hevdû pirsîn, ka mana rabûna
ji nav miriyan çi ye. [11] Û wan jê pirsî: «Gelo, çima Şerîetzan dibê-
jin divê pêşî Êlyas bê?» [12] Wî jî ji wan re got: «Bi rastî, pêşî Êlyas
tê û her tiştî serrast dike. Lê çima li ser Kurê* Mirov hatiye nivîsîn
ku ewê gelek cefayê bikişîne û biçûk bê dîtin? [13] Lê belê ez ji we
re dibêjim, Êlyas hatiye û çawa ku li ser wî hatiye nivîsîn, çi ku
dilê wan xwest bi wî kirin.»

### *Îsa Zarokekî Cinoyî Qenc Dike*
*(Metta 17:14-20; Lûqa 9:37-43)*

[14] Çaxê hatin ba şagirtên din, dîtin ku li dora wan elaleteke me-
zin civiyaye û Şerîetzan bi wan re munaqeşê dikin. [15] Îcar gava ku
hemû elaletê Îsa dît, gelek ecêbmayî ma û bi bez çûn pêşiya wî û si-
lav danê. [16] Îsa ji wan pirsî: «We bi wan re li ser çi munaqeşe dikir?»

[17] Ji nav elaletê mirovekî bersîva wî da: «Mamoste, min kurê
xwe yê ku cinekî lalîtiyê pê re heye ji te re anî. [18] Ruh her li ku
derê wî bigire, davêje erdê, kef bi ser devê wî dikeve, diranên xwe
diqirçîne û req dibe. Min ji şagirtên te hêvî kir ku vî ruhî derxin, lê
nikaribûn.»

[19] Îsa li wan vegerand û got: «Hey nifşê bêbawer! Heta kengê

---

**9:11** Melaxî 4:5

ezê bi we re bim, heta kengê ezê li we sebir bikim? Wî bînin ba
min.» [20] Wan jî kurik anî ba Îsa. Gava ku cin Îsa dît, di cih de kurik
vehejand. Ew ket erdê, kef bi ser devê wî ket û gevizî. [21] Îsa ji bavê
wî pirsî: «Ji kengê ve ew weha ye?» Wî jî got: «Ji zaroktiya xwe
ve. [22] Ruh ji bo ku wî helak bike, gelek caran ew avêt nav êgir û
avê. Lê eger tu bikarî tiştekî bikî, li me were rehmê û alîkariya me
bike!» [23] Îsa ji wî re got: «Te got: ‹Eger tu bikarî›! Ji bo yê ku ba-
wer* dike her tişt çêdibe.» [24] Wê gavê bavê kurik qîriya û got: «Ez
bawer dikim. Alîkariya bêbaweriya min bike!» [25] Gava Îsa dît ku
elalet bi bez li wê derê dicive, li ruhê nepak hilat û got: «Hey ruhê
kerr û lal, ez li te emir dikim: Ji kurik derkeve û careke din nekeve
wî!» [26] Ruh qîriya, bi şid kurik vehejand û jê derket. Û kurik bû
wek miriyan, wusa ku pirraniya wan digot: «Ew mir!» [27] Lê Îsa bi
destê wî girt û ew rakir. Kurik jî rabû ser xwe. [28] Piştî Îsa çû ma-
lekê, şagirtên wî bi serê xwe jê pirsîn: «Çima me nikaribû em cin
derxin?» [29] Îsa li wan vegerand: «Cinê bi vî cûreyî ji dua pê ve, bi
tu riyên din dernakevin.»

### *Îsa Careke Din li ser Mirin û Rabûna Xwe Dibêje*
*(Metta 17:22-23; Lûqa 9:43-45)*

[30] Ji wir çûn û di nav Celîlê re derbas bûn. Îsa nedixwest ku
kes bi vê yekê bizane, [31] çimkî wî şagirtên xwe hîn dikirin û ji wan
re digot: «Wê Kurê Mirov bidin destên mirovan, ewê wî bikujin û
piştî kuştinê bi sê rojan, ewê rabe.» [32] Lê wan ev gotin fêm nekir û
tirsiyan ku ji wî bipirsin.

### *Yê Mezin Kî Ye?*
*(Metta 18:1-5; Lûqa 9:46-48)*

[33] Û ew hatin Kefernahûmê. Gava Îsa li mal bû, ji şagirtan pir-
sî: «Hûn di rê de li ser çi dipeyivîn?» [34] Lê ew bêdeng man, çimkî
di rê de, di nav xwe de peyivîbûn, ka kî ji wan ê herî mezin e. [35] Îsa
rûnişt, gazî diwanzdehan kir û ji wan re got: «Eger kesek bixwaze
bibe yê pêşî, divê ew bibe yê paşî û xizmetkarê hemûyan.» [36] Îcar
wî bi destê zarokekê girt û ew di nav wan de da rawestandin, zarok
himbêz kir û ji wan re got: [37] «Kî ku zarokeke weha bi navê min
qebûl bike, ew min qebûl dike. Û kî ku min qebûl bike, ne min, lê
wî yê ku ez şandime qebûl dike.»

### *Yê ku ne li Dijî Me Ye, ji Aliyê Me Ye*
*(Lûqa 9:49-50)*

38 Yûhenna ji Îsa re got: «Mamoste, me mirovek dît ku bi navê
te cin derdixistin. Lê me nehişt, çimkî li pey me nedihat.» 39 Lê Îsa
got: «Rê lê negirin, çimkî tu kes tune ku bi navê min kerametekê bi-
ke û zû bikare li ser min bi xerabî bipeyive. 40 Çimkî yê ku ne li dijî
me ye, ji aliyê me ye. 41 Bi rastî ez ji we re dibêjim, kî ku tasek
av bide we, ji ber ku hûn ên Mesîh in, xelata xwe qet winda nake.

### *Ji Rê Derketin*
*(Metta 18:6-9; Lûqa 17:1-2)*

42 «Kî ku yekî ji van biçûkên ku baweriyê bi min tînin ji rê
derxe, ji bo wî çêtir e ku beraşekî mezin bi stûyê wî ve bê girêdan
û bê avêtin deryayê. 43-44 Eger destê te, te bixe guneh, wî jêke! Ji bo
te çêtir e ku tu bê dest bikevî jiyanê, lê ne ku bi herdu destên xwe
ve herî dojehê*, nav agirê ku venamire. 45-46 Eger lingê te, te bixe
guneh, wî jêke! Ji bo te çêtir e ku tu bê ling bikevî jiyanê, lê ne ku
tu bi herdu lingên xwe ve bêyî avêtin dojehê*. 47 Eger çavê te, te
bixe guneh, wî derxe! Ji bo te çêtir e ku tu bi çavekî bikevî Padî-
şahiya Xwedê, lê ne ku tu bi herdu çavan ve bêyî avêtin dojehê.
48 Li wir kurmê wan namire û agirê wê natemire. 49 Çimkî her kes
wê bi êgir bê xwêkirin. 50 Xwê qenc e. Lê eger xwê şoriya xwe
winda bike, hûnê careke din bi çi şoriya wê bidinê? Bila bi we re
tama xwê hebe û bi hev re di aştiyê* de bijîn.»

### *Pirsa Jinberdanê*
*(Metta 19:1-12; Lûqa 16:18)*

10 Îsa ji wir rabû, hat herêma Cihûstanê û derbasî aliyê din ê
Çemê Urdunê bû. Careke din elaletek li dora wî civiya û
wî, wek adeta xwe dîsa ew hîn dikirin. 2 Ji Fêrisiyan hinek nêzîkî
wî bûn û ji bo ku wî biceribînin jê pirsîn: «Ma dibe ku zilamek jina
xwe berde?» 3 Îsa bersîva wan da û got: «Mûsa çi emir da we?»
4 Wan jî got: «Mûsa destûr da, ku mêr kaxeza jinberdanê binivîse û
jinê berde.»[a] 5 Lê Îsa ji wan re got: «Ji ber serhişkiya we Mûsa ev

---

[a] 10:4 Ji: Dubarekirina Şerîetê 24:1-3
9:48 Binêre: Îşaya 66:24

emir ji we re nivîsî. 6 Lê di destpêka afirandinê de Xwedê ew ‹nêr
û mê afirandin›.[a] 7 ‹Ji ber vê yekê mêr wê dê û bavê xwe berde, bi
jina xwe re bibe yek 8 û herdu jî wê bibin bedenek.›[b] Wusa ku êdî
ew ne dido ne, lê bedenek in. 9 Ji bo vê yekê yên ku Xwedê ew ki-
rine yek, bila mirov wan ji hevdû veneqetînin.» 10 Gava ew li malê
bûn, şagirtan dîsa li ser vê meselê ji wî pirsîn. 11 Îsa ji wan re got:
«Kî ku jina xwe berde û bi yeke din re bizewice, li hember wê
zînayê dike. 12 Û eger jin jî mêrê xwe berde û bi yekî din re bi-
zewice, zînayê dike.»

### *Îsa Zarokan Pîroz Dike*

*(Metta 19:13-15; Lûqa 18:15-17)*

13 Îcar zarok dianîn ba Îsa ku destê xwe deyne ser wan, lê
şagirtan li yên ku ew dianîn hilat. 14 Gava ku Îsa ev yek dît, hêrs bû
û ji wan re got: «Bihêlin, bila zarok bên ba min; pêşiya wan
negirin, çimkî Padîşahiya Xwedê ji yên weha re ye. 15 Bi rastî ez ji
we re dibêjim, kî ku Padîşahiya Xwedê wek zarokekê qebûl neke,
tu caran nakeve wê.» 16 Hingê zarok himbêz kirin, destên xwe da-
nîn ser wan û ew pîroz kirin.

### *Xortê Dewlemend li Jiyana Herheyî Digere*

*(Metta 19:16-30; Lûqa 18:18-30)*

17 Gava Îsa bi riya xwe ve diçû, yek bezî ba wî, li ber wî çû ser
çokan û jê pirsî: «Mamosteyê qenc, ez çi bikim, da ku ez bibim
wêrisê jiyana herheyî?» 18 Îsa ji wî re got: «Tu çima ji min re qenc
dibêjî? Ji Xwedê pê ve, tu kes qenc tune. 19 Tu bi emran dizanî:
‹Nekuje!›, ‹Zînayê neke!›, ‹Nedize!›, ‹Şahidiya derewîn neke!›,
‹Heqê kesî nexwe!›, ‹Qedrê dê û bavê xwe bigire!›[c]»
20 Wî jî got: «Mamoste, ji xortaniya xwe heta niha, min ev tişt
hemû pêk anîne.» 21 Îsa lê nêrî, jê hez kir û ji wî re got: «Hê jî
kêmahiyeke te heye. Here, çi tiştê te heye bifiroşe û li belengazan
belav bike. Hingê wê li ezmên xezîna te hebe. Û were, bikeve pey
min.» 22 Li ser vê gotinê reng li wî nema û ew bi xemgînî çû, çimkî
gelek mal û milkê wî hebû.

---

[a] 10:6 Ji: Destpêkirin 1:27; 5:2 [b] 10:7-8 Ji: Destpêkirin 2:24
[c] 10:19 Ji: Derketin 20:12-16; Dubarekirina Şerîetê 5:16-20

23 Îsa li dora xwe nêrî û ji şagirtên xwe re got: «Çiqas zehmet e
ku kesên dewlemend bikevin Padîşahiya Xwedê!» 24 Şagirt li van
gotinên wî ecêbmayî man, lê Îsa careke din got: «Zarono! Ketina
Padîşahiya Xwedê çiqas zehmet e! 25 Derbasbûna devê ya di qula
derziyê re, ji ketina mirovê dewlemend a Padîşahiya Xwedê hêsa-
nîtir e.» 26 Şagirt gelek şaş man û ji hev re gotin: «Eger wusa be, kî
dikare xilas bibe?» 27 Îsa li wan nêrî û got: «Li ba mirovan ev nabe,
lê ne li ba Xwedê, çimkî li ba Xwedê her tişt dibe.» 28 Hingê Petrûs
dest pê kir û jê re got: «Va ye, me her tişt hiştine û em li pey te
hatine.» 29 Îsa ji wan re got: «Bi rastî ez ji we re dibêjim, tu kes
tune ku di ber min de û di ber Mizgîniyê de mal, an bira, an xwişk,
an dê an bav, an zarok an zeviyên xwe hiştibe 30 û li vê dinyayê sed
qatî xanî, bira, xwişk, dê, zarok û zeviyan nestîne û pê re cefayê jî
nekişîne û di dinya din de nekeve jiyana herheyî. 31 Lê gelek ên pê-
şî wê bibin ên paşî û yên paşî wê bibin ên pêşî.»

### *Îsa Cara Sisiyan li ser Mirin û Rabûna Xwe Dibêje*

*(Metta 20:17-19; Lûqa 18:31-34)*

32 Îcar ew li ser rê bûn û hildikişiyan Orşelîmê*. Ew li pêşiya
wan diçû, şagirt ecêbmayî diman û ew kesên li paş dihatin ditirsi-
yan. Îsa dîsa her diwanzdeh kişandin aliyekî û dest pê kir ew tiştên
ku wê bihatana serê wî ji wan re got: 33 «Va ye, em hildikişin
Orşelîmê. Kurê Mirov wê bê dayîn destê serekên kahînan* û Şerî-
etzanan. Ewê cezayê mirinê li ser wî bidin û wî bidin destê mile-
tan. 34 Ewê tinazên xwe bi wî bikin, tif bikinê, bidin ber qamçiyan
û wî bikujin. Û piştî sê rojan ewê ji nav miriyan rabe.»

### *Xwestina Aqûb û Yûhenna*

*(Metta 20:20-28)*

35 Hingê kurên Zebedî Aqûb* û Yûhenna nêzîkî Îsa bûn û jê re
gotin: «Mamoste, me divê ku em her çi ji te bixwazin, tu ji bo me
bikî.» 36 Wî jî ji wan pirsî: «Hûn dixwazin ku ez ji bo we çi bi-
kim?» 37 Wan jê re got: «Destûra me bide ku di rûmeta te de yek ji
me li milê te yê rastê, yê din jî li milê te yê çepê rûne.» 38 Îsa ji
wan re got: «Hûn nizanin ku hûn çi dixwazin. Ma hûn dikarin wê
kasa tehl a ku ezê vexwim, vexwin? An jî bi wê imada ku ezê pê
bêm imadkirin*, imad bibin?» 39 Wan jî got: «Em dikarin.» Îsa ji

wan re got: «Bi rastî hûnê ji wê kasa ku ezê vexwim, vexwin û bi
imada ku ezê pê bêm imadkirin, imad bibin, 40 lê rûnandina li milê
min ê rastê û çepê ne di destê min de ye. Ev bi tenê ji bo wan e ku
ji wan re hatiye amadekirin.» 41 Gava ku her deh şagirtan ev yek
bihîst, li Aqûb û Yûhenna hêrs bûn. 42 Lê Îsa ew gazî ba xwe kirin
û got: «Hûn dizanin ên ku di nav miletan de serek tên dîtin, serdes-
tiyê li wan dikin û giregirên wan jî li ser wan hukumdariyê dikin.
43 «Lê di nav we de, ne weha ye. Di nav we de, kî ku bixwaze
bibe yê mezin, divê bibe xizmetkarê we. 44 Û di nav we de kî ku
bixwaze bibe yê pêşî, divê bibe xulamê hemûyan. 45 Çimkî Kurê
Mirov jî nehatiye ku jê re xizmet bê kirin, lê hatiye ku xizmetê
bike û ji bo gelekan canê xwe berdêl bide.»

### *Îsa Parsekekî Kor Qenc Dike*

*(Metta 20:29-34; Lûqa 18:35-43)*

46 Hingê ew hatin bajarê Erîhayê. Gava Îsa bi şagirtên xwe ve
û bi elaleteke mezin ve ji bajêr derket, mirovekî kor, Bar-Tîmeyos,
yanî Kurê-Tîmeyos, li tenişta rê rûniştibû û pars dikir. 47 Gava bi-
hîst ku Îsayê Nisretî derbas dibe, dest pê kir, kir qîrîn û got: «Ya
Îsayê Kurê* Dawid, li min were rehmê!» 48 Gelekan li wî hilat, da
ku dengê xwe bibire, lê ew hê bêtir qîriya û got: «Ya Kurê Dawid,
li min were rehmê!» 49 Îsa rawesta û got: «Gazî wî bikin.» Wan jî
gazî mirovê kor kir û gotin: «Çavê te rohnî be! Rabe ser xwe, gazî
te dike.» 50 Wî jî ebayê xwe avêt, xwe hilavêt û hat ba Îsa. 51 Îsa jê
pirsî: «Tu çi dixwazî ku ez ji bo te bikim?» Yê kor jê re got: «Ma-
moste, ez dixwazim bibînim!» 52 Îsa jî jê re got: «Here, baweriya te
tu xilas kirî.» Û di cih de wî dît, ket rê û li pey Îsa çû.

### *Îsa bi Rûmet Dikeve Orşelîmê*

*(Metta 21:1-11; Lûqa 19:28-40; Yûhenna 12:12-19)*

11 Gava ku ew nêzîkî Orşelîmê bûn û di Çiyayê Zeytûnê re
gihîştin Beytfacê û Beytanyayê, Îsa du şagirtên xwe şandin
2 û ji wan re got: «Herin gundê pêşberî xwe. Hema gava hûn bike-
vinê, hûnê dehşikeke girêdayî bibînin ku hê tu kes lê siwar nebûye.
Wê vekin û bînin. 3 Û eger kesek ji we bipirse û bêje: ‹Çima hûn
vê yekê dikin?›, bêjin: ‹Ji Xudan re lazim e û ewê wê zû bi şûn de
bişîne.›» 4 Şagirt çûn û li ber deriyê aliyê kuçeyê, dehşikeke girê-

dayî dîtin. Gava ew vedikirin, 5 hinek kesên ku li wir rawesta bûn
pirsîn: «Hûn çi dikin? Hûn çima wê dehşikê vedikin?» 6 Şagirtan
wek ku Îsa ji wan re gotibû, bersîv dan. Û mirovan dev ji wan
berda. 7 Dehşik ji Îsa re anîn, cilên xwe avêtin ser wê û ew li wê
siwar bû. 8 Gelek mirovan cilên xwe li ser rê raxistin; hinekan jî
çiqilên ku ji zeviyan birrîbûn li ser rê raxistin. 9 Yên li pêşiyê diçûn
û yên li pey dihatin diqîriyan:

«Hosanna*!
Yê ku bi navê Xudan tê pîroz* be.
10 Padîşahiya bavê me Dawid* a ku tê, pîroz be.
Li bilindahiyan Hosanna!»[a]

11 Îsa ket Orşelîmê, çû Perestgehê*. Çav li her tiştî gerand, lê ji
ber ku wext bûbû êvar, bi diwanzdehan ve çû Beytanyayê.

### *Dara Hêjîrê*
*(Metta 21:18-19)*

12 Dotira rojê, gava ew ji Beytanyayê derdiketin, Îsa birçî bû.
13 Ji dûr ve dareke hêjîrê ya bi pel dît, ber bi wê ve çû, ka ewê tiş-
tekî pê ve bibîne. Gava gihîşt ba wê, ji pelan pê ve tiştek nedît.
Çimkî ne dema hêjîran bû. 14 Wî ji darê re got: «Bila êdî tu kes tu
caran ji te fêkî nexwe.» Şagirtên wî jî ev gotin bihîstin.

### *Îsa Perestgehê Paqij Dike*
*(Metta 21:12-17; Lûqa 19:45-48; Yûhenna 2:13-22)*

15 Û ew hatin Orşelîmê. Îsa ket Perestgehê* û dest pê kir ew
kesên ku di Perestgehê de kirrîn û firotin dikirin, avêtin derve. Ma-
seyên pereguhêran û kursiyên kevokfiroşan gêr kirin 16 û nehişt ku
tu kes tiştekî di Perestgehê re derbas bike. 17 Wî hînî wan kir û got:
«Ma nehatiye nivîsîn ku ‹Wê ji mala min re mala duayê ya ji bo he-
mû miletan bê gotin›. Lê we ew kiriye ‹şkefta rêbiran›[b].» 18 Serekên
kahînan û Şerîetzanan* ev bihîstin û dest pê kirin li riyên kuştina
wî geriyan. Ew ji wî ditirsiyan, çimkî tevahiya elaletê li hînkirina*
wî gelek şaş dima. 19 Gava ku bû êvar, ew ji bajêr derketin.

---

[a] **11:9-10** Ji: Zebûr 118:25-26. Binêre: Lûqa 1:32-33

[b] **11:17** Ji: Îşaya 56:7; Yêremya 7:11

### *Ji Dara Hêjîrê Dersgirtin*
*(Metta 21:20-22)*

[20] Serê sibê, gava ew di rê de derbas dibûn, dîtin ku dara hêjîrê
ji rayê* xwe ve hişk bûye. [21] Hat bîra Petrûs û wî ji Îsa re got:
«Mamoste, binêre, dara hêjîrê ya ku te nifir lê kiribû hişk bûye.»
[22] Îsa bersîva wan da û got: «Baweriya we bila bi Xwedê hebe.
[23] Bi rastî, ez ji we re dibêjim, Kî ku ji vî çiyayî re bêje: ‹Ji cihê
xwe rabe û xwe bavêje deryayê› û di dilê xwe de nekeve şikê, lê
bawer bike ku daxwaza wî wê bê cih, tiştê ku bixwaze wê jê re
bibe. [24] Ji ber vê yekê ez ji we re dibêjim: Her tiştê ku hûn bi
duakirinê bixwazin, bawer bikin ku we standiye û wê ji we re bibe.
[25-26] Û gava ku hûn ji bo duakirinê radiwestin, eger li hember ke-
sekî tiştekî we hebe, lê bibihûrin, da ku Bavê* we yê li ezmanan jî
li sûcên we bibihûre.»

### *Pirsa li ser Desthilatiya Îsa*
*(Metta 21:23-27; Lûqa 20:1-8)*

[27] Û ew dîsa hatin Orşelîmê. Dema ku Îsa di Perestgehê de di-
geriya, serekên kahînan, Şerîetzan û rihspî hatin ba wî [28] û jê pir-
sîn: «Tu bi kîjan desthilatiyê van tiştan dikî? Û kê ev desthilatî
daye te ku tu van bikî?» [29] Îsa ji wan re got: «Ezê pirsekê ji we bi-
kim. Bersîva min bidin, ez jî, ezê ji we re bêjim, ka ez bi kîjan
desthilatiyê van tiştan dikim: [30] Imadkirina* Yûhenna ji ezmên bû
an ji mirovan? Bersîva min bidin!» [31] Ew di nav xwe de şêwirîn û
gotin: «Eger em bêjin: ‹Ji ezmên bû›, hingê ewê bêje: ‹Nexwe we
çima ji wî bawer nekir?› [32] Lê eger em bêjin: ‹Ji mirovan bû›...?»
Ji xelkê ditirsiyan, çimkî hemûyan Yûhenna pêxemberê* rastîn di-
hesiband. [33] Wan bersîv da û gotin: «Em nizanin.» Îsa jî ji wan re
got: «Ez jî ji we re nabêjim ku ez van tiştan bi çi desthilatiyê dikim.»

### *Mesela Rezvanan*
*(Metta 21:33-46; Lûqa 20:9-19)*

12 Îsa bi meselan ji wan re dest bi peyivînê kir: «Mirovekî rez
danî, hawirdora wî sênc kir; mahserek kola û birca nobe-
daran çêkir. Piştre wî rez bi kirê da rezvanan û çû welatekî din.

---

11:25 Di hin destnivîsaran de ev jî heye: «Lê eger hûn lê nebihûrin, Bavê we yê li ezmanan jî li sûcên we nabihûre.»

2 Di demsala rêz de xulamek şand ba rezvanan, da ku ji berê rêz ji
wan bistîne. 3 Lê wan ew girt, li wî xistin û ew destvala şandin. 4 Û
dîsa wî xulamekî din şand ba wan, lê wan serê wî şkand û ew
riswa kirin. 5 Wî yekî din şand, ew jî kuştin. Wî gelek kesên din
şandin, li hinekan xistin û hinek jî kuştin. 6 Ji bo şandinê tenê ke-
sek mabû, kurê wî yê delal. Di pey re rabû, kurê xwe şand û got:
‹Ewê siyaneta* kurê min bigirin.› 7 Lê rezvan bi hev şêwirîn û
gotin: ‹Ev wêris e! De werin, em wî bikujin, mîras wê ji me re
bimîne.› 8 Hingê wan ew girt, kuştin û avêtin derveyî rêz. 9 Îcar
xwediyê rêz wê çi bike? Ewê bê, rezvanan helak bike û rêz bide
hinekên din. 10 Ma we ew nivîsar nexwendiye?

‹Ew kevirê ku hostayan red kir
Bû kevirê serê rikin*.
11 Ev ji aliyê Xudan ve çêbû.
Û ev li ber çavê me karekî ecêb e!›[a]»

12 Wan xwest ku Îsa bigirin, lê ji elaletê tirsiyan. Çimkî wan fêm
kir ku wî ev mesele di ber wan de anî. Îcar dev ji wî berdan û çûn.

### *Baca Qeyser*
*(Metta 22:15-22; Lûqa 20:20-26)*

13 Bi armanca ku Îsa bi gotina wî bixin xefikê, wan hinek ji
Fêrisî û alîgirên Hêrodês* şandin ba wî. 14 Ew hatin û jê re gotin:
«Mamoste! Em dizanin ku tu mirovekî rast î. Tu cihêtiyê naxî nav
mirovan, çimkî tu li rûyê mirovan nanêrî, lê tu riya Xwedê rast hîn
dikî. Ma çêdibe ku em bacê bidin Qeyser an na? Ma em bidin, an
em nedin?» 15 Lê Îsa bi durûtiya wan dizanibû û got: «Çima hûn
min diceribînin? Ji min re zîvekî* bînin ku ez bibînim.» 16 Wan jê
re zîvek anî. Wî ji wan pirsî: «Ev resm û nivîsîn ên kê ne?» Wan
got: «Yên Qeyser in.» 17 Îsa ji wan re got: «Tiştên Qeyser bidin
Qeyser û tiştên Xwedê bidin Xwedê.» Û ew li wî ecêbmayî man.

### *Pirsa Rabûna Miriyan*
*(Metta 22:23-33; Lûqa 20:27-40)*

18 Hinek Sadûqiyên* ku digotin vejîna* miriyan tune, hatin ba
Îsa û jê pirsîn: 19 «Mamoste, Mûsa ji bo me nivîsiye: ‹Eger birayê

[a] **12:10-11** Ji: Zebûr 118:22-23

yekî bimire, zarokên wî nebin û jina xwe li pey xwe bihêle, divê
birayê wî jina wî bistîne û dûndanê* ji birayê xwe re rake.›[a] 20 Îcar
heft bira hebûn. Yê pêşî jinek anî û bê dûndan* mir. 21 Yê diduyan
ew jin anî. Ew jî bê dûndan mir. Ev tişt hat serê yê sisiyan jî. 22 Bi
vî awayî ji her heftan re jî zarok çênebûn. Piştî hemûyan jî jin mir.
23 Îcar, Roja* Vejînê çaxê mirî rabin, ev jin wê jina kîjanî be? Çim-
kî her heftan jî ew anîbû.»
24 Îsa ji wan re got: «Ma sedemê şaşbûna we ne ev e ku hûn bi
Nivîsarên* Pîroz û bi hêza Xwedê nizanin? 25 Gava yên mirî ji nav
miriyan radibin, ne jinê tînin û ne jî mêr dikin, çimkî ew wek mil-
yaketên ezmanan in. 26 Ma li ser rabûna miriyan we di Kitêba*
Mûsa de, di serhatiya diriyê de nexwendiye ku çawa Xwedê jê re di-
bêje: ‹Ez Xwedayê Birahîm*, Xwedayê Îshaq* û Xwedayê Aqûb*
im.›[b]? 27 Ew ne Xwedayê miriyan, lê Xwedayê zindiyan e. Hûn ge-
lek şaş in!»

### *Emrê Herî Mezin*

*(Metta 22:34-40; Lûqa 10:25-28)*

28 Dema ku Şerîetzanekî munaqeşa wan bihîst û dît ku Îsa qenc
bersîva wan da, nêzîkî wî bû û jê pirsî: «Di nav hemû emran de yê
herî mezin kîjan e?» 29 Îsa lê vegerand: «Emrê herî mezin ev e:
‹Bibihîze, ya Îsraêl! Xudan Xwedayê me yek e. 30 Ji Xudan Xwe-
dayê xwe bi hemû dilê xwe, bi hemû canê xwe, bi hemû hişê xwe
û bi hemû hêza xwe hez bike.›[c] 31 Yê diduyan jî ev e: ‹Wek ku tu ji
xwe hez dikî, ji cîranê xwe hez bike.›[d] Ji van meztir tu emir tunin.»
32 Îcar Şerîetzan ji wî re got: «Rast e, Mamoste! Te ya rast got, ku
‹Xudan yek e û jê pê ve, yekî din tune.›[e] 33 Û ‹hezkirina ji wî bi
hemû dil, bi hemû fêmdariyê, bi hemû hêzê û hezkirina ji cîranê
xwe wek xwe, di ser her goriyên* şewitandinê û qurbanan re ye.›[f]»
34 Gava Îsa dît ku wî bi aqilmendî bersîv da, jê re got: «Tu ji
Padîşahiya Xwedê ne dûr î.» Piştî vê yekê, êdî tu kesî newêribû ku
tiştekî ji wî bipirse.

---

[a] **12:19** Ji: Dubarekirina Şerîetê 25:5
[b] **12:26** Ji: Derketin 3:6
[c] **12:29-30** Ji: Dubarekirina Şerîetê 6:4-5
[d] **12:31** Ji: Qanûna Kahîntiyê 19:18
[e] **12:32** Ji: Dubarekirina Şerîetê 6:4; 4:35; Îşaya 45:21
[f] **12:33** Ji: Dubarekirina Şerîetê 6:5; Qanûna Kahîntiyê 19:18; 1 Samûêl 15:22; Hoşêya 6:6

### *Mesîh Kurê Kê Ye?*
*(Metta 22:41-46; Lûqa 20:41-44)*

35 Gava ku Îsa di Perestgehê* de hîn dikir, got: «Şerîetzan ça-
wa dibêjin ku Mesîh kurê Dawid* e? 36 Dawid bi xwe bi saya Ru-
hê* Pîroz dibêje:

‹Xudan ji Xudanê min re got:
Li milê min ê rastê rûne,
Heta ku ez dijminên te bikim bin lingên te.›[a]

37 Dawid bi xwe ji wî re dibêje ‹Xudan›. Îcar ew çawa dibe kurê
Dawid?»

### *Şerîetzanên Durû*
*(Metta 23:1-36; Lûqa 20:45-47)*

Elaleteke mezin bi dilxweşî guhdariya Îsa dikir. 38 Wî di hînki-
rina xwe de digot: «Xwe ji wan Şerîetzanan biparêzin, yên ku hez
dikin bi xiftanên dirêj bigerin, di sûkan de silav li wan bê kirin,
39 di kinîştan* de li ser kursiyên pêşî û di ziyafetan de li cihên jorîn
rûnin. 40 Ew malên jinebiyan dadiqurtînin û ji bo ku bên dîtin dua-
yên dirêj dikin. Dîwana* wan wê hê girantir be.»

### *Diyariya Jinebiya Belengaz*
*(Lûqa 21:1-4)*

41 Îsa li pêşberî peredanka* Perestgehê rûnişt û nêrî ku elalet
çawa peran davêjin peredankê. Gelek kesên dewlemend pirr pere
avêtinê. 42 Jinebiyeke belengaz jî hat û du polên* ku dikirin quri-
şek* avêtê. 43 Îsa şagirtên xwe gazî ba xwe kir û ji wan re got: «Bi
rastî ez ji we re dibêjim, vê jinebiya belengaz ji wan hemûyan bêtir
avêt peredankê, 44 çimkî wan hemûyên din ji zêdehiya malê xwe
avêtinê. Lê vê jinikê ji belengaziya xwe çi tiştê wê hebû, hemû
abora xwe avêtê.»

### *Îsa ji pêşî ve li ser Wêranbûna Perestgehê Dibêje*
*(Metta 24:1-2; Lûqa 21:5-6)*

13 Gava Îsa ji Perestgehê derket, yekî ji şagirtên wî jê re got:
«Mamoste! Li van kevirên mezin û li van avahiyên xweşik

---

[a] **12:36** Ji: Zebûr 110:1

binêre!» 2 Îsa jê re got: «Tu van avahiyên mezin dibînî? Li vir
kevir li ser kevir namîne, qet tiştek namîne ku neyê hilweşandin!»

### *Tengahiyên Mezin*

*(Metta 24:3-14; Lûqa 21:7-19)*

3 Gava Îsa li pêşberî Perestgehê, li Çiyayê Zeytûnê rûdinişt,
Petrûs, Aqûb, Yûhenna û Endrawis bi serê xwe jê pirsîn: 4 «Ji me
re bêje, ka ev tişt wê kengê çêbin? Û çaxê ev tiştên ha hemû li ber
çêbûnê bin, nîşana wan çi ye?» 5 Îsa dest pê kir ji wan re got: «Hay
ji xwe hebin ku tu kes we nexapîne. 6 Gelek wê bi navê min bên û
bêjin: ‹Ez ew im› û wê gelekan bixapînin. 7 Gava hûn dengê şeran
û li ser şeran bibihîzin, netirsin. Tiştên weha divê bibin, lê hê dawî
nehatiye. 8 Çimkî milet wê li hember miletan rabe, padîşahî wê li
hember padîşahiyan rabe. Wê li cih cihan erdhejîn çêbin û xela wê
rabin. Lê ev hemû destpêka janan in. 9 Hay ji xwe hebin; wê we
teslîmî dadgehan* bikin û di kinîştan de wê li we bixin. Ji rûyê
min wê we derxin ber walî û padîşahan, da ku hûn li ber wan
şahidiyê bikin. 10 Divê pêşî Mizgînî ji hemû miletan re bê dayîn.
11 Gava ku ew, we bidin dest û bikişînin pirsyariyê, ji pêşî ve
xeman nexwin ku hûnê çi bêjin. Lê di wê gavê de çi ji we re bê
dayîn, wî bêjin. Çimkî yê dipeyive ne hûn in, lê Ruhê Pîroz e.
12 Bira wê birayê xwe û bav wê zarokê xwe teslîmî mirinê bike.
Zarok wê li hember dê û bavê xwe rabin û wan bidin kuştin. 13 Û ji
ber navê min hemû jî wê ji we nefret bikin. Lê yê ku heta dawiyê
ragire, ewê xilas bibe.

### *Felaketa Mezin*

*(Metta 24:15-21; Lûqa 21:20-24)*

14 «Çaxê hûn wî tiştê mekruh ê ku xerakirinê tîne, li cihê ku
divê tê de nebe, rawestayî bibînin» – bila yê ku dixwîne fêm bike –
«hingê yên ku di Cihûstanê de ne, bila birevin çiyan. 15 Yê ku li ser
banî be, bila neyê xwarê û nekeve hundir, da ku tiştekî hilde. 16 Û
yê li nav zeviyê jî bila venegere, ku ebayê xwe hilde. 17 Wey li wan
ên ku di wan rojan de bizaro ne û dimêjînin! 18 Dua bikin ku ev di
zivistanê de çênebe. 19 Çimkî di wan rojan de, tengahiyeke wusa
wê çêbe, ji destpêkê ve, gava ku Xwedê dinya afirandiye û heta

---

**13:14** Binêre: Daniyêl 9:27; 11:31; 12:11

niha çênebûye û tu caran çênabe. [20] Eger Xudan ew roj kurt neki-
rina, tu kes xilas nedibû. Lê ji bo xatirê yên bijartî yên ku wî ew
hilbijartine, wî ew roj kurt kirine.
[21] «Hingê, eger yek ji we re bêje: ‹Binêre, Mesîh li vir e›, an jî:
‹Binêre, ew li wir e›, bawer nekin. [22] Çimkî mesîhên derewîn û pê-
xemberên derewîn wê derkevin. Wê nîşan û karên mezin çêkin,
wusa ku eger bibe, ewê bijartiyan jî bixapînin. [23] Lê hûn hay ji xwe
hebin! Min her tişt ji pêşî ve ji we re got.

### *Vegerîna Kurê Mirov*

*(Metta 24:29-31; Lûqa 21:25-28)*

[24] «Lê di wan rojan de, piştî wê tengahiyê
Roj wê tarî bibe
Û heyv ronahiya xwe nade,
[25] Stêr wê ji ezmên bikevin,
Û rojgêranên* ezmanan wê ji riya xwe derkevin.
[26] «Û hingê wê bibînin ku ‹Kurê Mirov di nav ewran de bi hêz
û rûmeta mezin tê.›[a] [27] Hingê ewê milyaketên xwe bişîne û wê
bijartiyên xwe ji çar aliyan, ji perê erdê heta perê ezmên bicivîne.

### *Dara Hêjîrê*

*(Metta 24:32-35; Lûqa 21:29-33)*

[28] «Îcar ji dara hêjîrê vê dersê hîn bibin: Çaxê ku çiqilên wê
dibişkivin û pelên wê şîn dibin, hûn dizanin ku havîn nêzîk e. [29] Bi
vî awayî, çaxê ku hûn jî bibînin ev tişt çêdibin, bizanin ku ew
nêzîk e, li devê derî ye. [30] Bi rastî ez ji we re dibêjim, heta ku ev
tiştên ha hemû çênebin, ev nifş* qet nabihûre. [31] Erd û ezman wê
bibihûrin, lê peyvên min tu caran nabihûrin.

### *Roj û Saeta ku Bi Tenê Xwedê Dizane*

*(Metta 24:36-44)*

[32] «Lê heçî ew roj û ew saet e, ne milyaketên ezmên û ne jî
Kur, ji Bav* pê ve tu kes pê nizane. [33] Hay ji xwe hebin! Hişyar
bin! Çimkî hûn nizanin kengê ew wext wê bê. [34] Ev wek mirovekî

---

[a] **13:26** Ji: Daniyêl 7:13. Binêre: Peyxama Yûhenna 1:7
**13:24-25** Binêre: Îşaya 13:10; 34:4; Yoêl 2:10, 31; 3:15

ye ku mala xwe dihêle û derdikeve rêwîtiyê. Ew desthilatiya xwe
dide xulamên xwe, karê her yekî dide wî û emir dide dergehvan jî
ku hişyar bimîne. 35 Loma hişyar bimînin, çimkî hûn nizanin mal-
xwê malê wê kengê bê, êvarê an nîvê şevê, an wextê bangdana dî-
kan, an serê sibê. 36 Nebe ku ji nişkê ve bê û we di xewê de bigire.
37 Tiştê ku ez ji we re dibêjim, ez ji hemûyan re dibêjim: Hişyar bin!»

### *Şêwira Kuştina Îsa*

*(Metta 26:1-5; Lûqa 22:1-2; Yûhenna 11:45-53)*

14 Du roj ji beriya Cejna* Derbasbûnê û Cejna* Nanê Şkeva
bû. Serekên kahînan û Şerîetzan li riyên bi hîle digeriyan
ku Îsa bigirin û wî bikujin. 2 Û digotin: «Bila ne di cejnê de be, da
ku di nav xelkê de hengame çênebe.»

### *Îsa li Beytanyayê*

*(Metta 26:6-13; Yûhenna 12:1-8)*

3 Gava Îsa li Beytanyayê li mala Şimûnê kotî* li ser sifrê rûniş-
tî bû, jinikek hat û di firaxeke mermerê spî de rûnê nardê* yê safî
yê gelek giranbiha anî. Wê firaxa mermerî şkand û bi serê Îsa de
rijand.
4 Hinek hêrs bûn û ji hev re gotin: «Çima ev rûnê bîhnxweş
badîhewa çû? 5 Ev rûnê bîhnxweş dikaribû ji sê sed zîvî* zêdetir
bihata firotin û li belengazan bihata belavkirin.» Bi vî awayî lome
ji jinikê kirin.
6 Lê Îsa got: «Dev ji jinikê berdin. Çima hûn wê diêşînin? Wê
ji bo min tiştekî qenc kir. 7 Belengaz hergav di nav we de ne; ken-
gê hûn bixwazin, hûn dikarin qenciyê bi wan bikin. Lê ez hergav
ne li ba we me. 8 Çi ji destê wê hat, wê kir. Wê ji pêşî ve bedena
min ji bo veşartinê rûn kir. 9 Bi rastî ez ji we re dibêjim, ev Mizgînî
li ku dera dinyayê bê dayîn, ev tiştê ku vê jinikê kir jî wê ji bo
bîranîna wê bê gotin.»

### *Xayîntiya Cihûda*

*(Metta 26:14-16; Lûqa 22:3-6)*

10 Hingê Cihûdayê* Îsxeryotî yê ku yek ji diwanzdehan bû, çû
ba serekên kahînan, da ku Îsa bide destê wan. 11 Gava ku wan jî ev
yek bihîst, şa bûn û soz dan ku peran bidin wî. Cihûda jî li keysekê
digeriya ku Îsa bide dest.

### *Bi Şagirtan re Şîva Cejna Derbasbûnê*
*(Metta 26:17-25; Lûqa 22:7-14, 21-23; Yûhenna 13:21-30)*

12 Di roja pêşî ya Cejna* Nanê Şkeva de, roja serjêkirina
goriya* Cejna Derbasbûnê şagirtan ji Îsa pirsî: «Tu dixwazî ku em
herin, şîva Cejna Derbasbûnê li ku derê amade bikin, ku tu bix-
wî?» 13 Îsa du şagirtên xwe şandin û ji wan re got: «Herin bajêr.
Mirovek wê rastî we bê ku cerekî avê hildigire, li pey wî herin wî
xaniyê ku ew bikevê. 14 Ji xwediyê wê malê re bêjin: ‹Mamoste ji
te dipirse: Ka ew oda min a mêvanan a ku ez bi şagirtên xwe re li
wê şîva Cejna Derbasbûnê bixwim li ku derê ye?› 15 Hingê ewê li
qata jor odeyeke mezin a raxistî û amadekirî nîşanî we bide; li wê
derê ji bo me şîvê amade bikin.» 16 Şagirt ketin rê, hatin bajêr û
wan hemû tişt wek ku Îsa ji wan re gotibû dîtin. Û wan şîva Cejna
Derbasbûnê amade kir.
17 Gava bû êvar, Îsa bi diwanzdehan re hat. 18 Çaxê li ser sifrê
rûniştibûn û xwarin dixwarin, wî got: «Bi rastî ez ji we re dibêjim,
yek ji we wê min bide dest – yekî ku bi min re xwarinê dixwe.»
19 Ew xemgîn bûn û destpêkirin yek bi yek ji Îsa pirsîn: «Gelo ez
im?» 20 Wî ji wan re got: «Yek ji diwanzdehan e ku nanê xwe bi
min re li firaxê dixe. 21 Ji xwe, Kurê Mirov wek ku li ser wî hatiye
nivîsîn, wê here. Lê wey li wî mirovê ku Kurê Mirov bide dest!
Wê ji bo wî çêtir bûya ku ew nehata dinyayê.»

### *Şîva Xudan*
*(Metta 26:26-30; Lûqa 22:14-23; 1 Korîntî 11:23-25)*

22 Gava wan xwarin dixwar, Îsa nan hilda, şikir kir, ew şkand,
da şagirtan û got: «Bigirin, ev bedena min e.» 23 Piştre wî kasek
hilda, şikir kir û da wan. Hemûyan jî ji wê vexwar. 24 Îsa got: «Ev
xwîna min a Peymanê* ye ku di ber gelekan de tê rijandin. 25 Bi
rastî ez ji we re dibêjim, êdî ez ji vî berê mêwê tu caran venaxwim,
heta wê roja ku ez di Padîşahiya Xwedê de ji ya nû vexwim.»
26 Piştî ku wan zebûrek strand, derketin Çiyayê Zeytûnê.

### *Îsa ji pêşî ve li ser Înkarkirina Petrûs Dibêje*
*(Metta 26:31-35; Lûqa 22:31-34; Yûhenna 13:36-38)*

27 Îcar Îsa ji wan re got: «Hûnê hemû jî li ser min dudilî û sist
bibin, çimkî hatiye nivîsîn:

‹Ezê li şivên bixim
Û mî wê belav bibin.›[a]
28 Lê piştî ku ez rabim, ezê beriya we herim Celîlê.» 29 Petrûs jê re
got: «Eger hemû jî dudilî û sist bibin, ez dudilî û sist nabim.»
30 Îsa ji wî re got: «Bi rastî ez ji te re dibêjim, hema îro, îşev,
berî ku dîk du caran bang bide, tê sê caran min înkar bikî.» 31 Lê
Petrûs hê bêtir bi şid got: «Eger divê ku ez bi te re bimirim jî, ez tu
caran te înkar nakim.» Hemûyan jî weha got.

### *Li Baxçê Gêtşemaniyê*

*(Metta 26:36-46; Lûqa 22:39-46)*

32 Piştre ew çûn cihekî ku navê wî Gêtşemanî bû. Îsa ji şagirtên
xwe re got: «Hûn li vir rûnin, heta ku ez dua bikim.» 33 Wî Petrûs,
Aqûb û Yûhenna bi xwe re birin û dest pê kir ket halekî teng û
dijwar û diltengiyê ew girt. 34 Wî ji wan re got: «Dilê min gelek
teng dibe, ez dikim bimirim. Li vir bin û hişyar bimînin.» 35 Hinekî
pêşve çû, xwe deverû avêt erdê û dua kir, ku eger bibe, ev saet di
ser wî re derbas bibe. 36 Û wî got: «Abba*, Bavo! Tu dikarî her
tiştî bikî. Vê kasa tehl ji min dûr bixe! Lê bila ne tiştê ez di-
xwazim, lê tiştê ku tu dixwazî bibe.»
37 Piştre ew vegeriya û şagirt di xew de dîtin. Wî ji Petrûs re
got: «Şimûn, ma tu di xew de yî? Ma tu nikarî saetekê jî hişyar
bimînî? 38 Hişyar bimînin û dua bikin, da ku hûn nekevin ceriban-
dinê. Erê, ruh bi daxwaz e, lê beden lewaz e.» 39 Dîsa çû, dua kir,
eynî peyv gotin. 40 Careke din vegeriya û ew dîsa di xew de dîtin.
Çimkî çavên wan ji xewê diçûn serhev. Nizanibûn ji wî re çi bêjin.
41 Cara sisiyan vegeriya û ji wan re got: «Ma hûn hê jî radizin û
bîhna xwe vedidin? Bes e! Saet hat, va ye, Kurê Mirov dikeve des-
tê gunehkaran. 42 Rabin, em herin. Va ye, yê ku min dide dest nê-
zîk bû.»

### *Girtina Îsa*

*(Metta 26:47-56; Lûqa 22:47-53; Yûhenna 18:3-12)*

43 Ew hê dipeyivî, hema hingê Cihûdayê* ku yek ji diwanz-
dehan bû hat. Bi wî re elaleteke bi dar û bi şûr hebû. Ew ji aliyê

[a] **14:27** Ji: Zekerya 13:7

serekên kahînan, Şerîetzan û rihspiyan ve hatibûn şandin. [44] Îcar ê
ku Îsa bida dest, bi wan re li ser îşaretekê li hev hatibû û gotibû:
«Ez kê ramûsim, ew e. Wî bigirin, bibin û hay jê hebin.» [45] Cihûda
hema hat ba Îsa û got: «Mamoste!» û ew ramûsa. [46] Wan dest
avêtin Îsa û ew girtin. [47] Lê yekî ji yên ku bi wî re bûn, şûrê xwe
kişand, li xulamê Serokkahîn xist û guhê wî pekand. [48] Îsa ji wan
re got: «Ma ez rêbirek im ku hûn bi dar û şûran hatine ku min
bigirin? [49] Her roj li Perestgehê ez di nav we de bûm, min hîn dikir
û we ez negirtim. Lê ji bo ku Nivîsarên Pîroz bên cih, ev çêdibe.»
[50] Û hemûyan ew hişt û reviyan. [51] Xortek li pey wî diçû ku perçekî
cawê keten li bedena xwe ya tazî pêçabû. Wan ew girt, [52] lê wî
cawê keten hişt û rût û tazî ji wir reviya.

### *Îsa li ber Civîna Giregiran*

*(Metta 26:57-68; Lûqa 22:54-55, 63-71; Yûhenna 18:13-14, 19-24)*

[53] Îsa birin ba Serokkahîn. Hemû serekên kahînan, rihspî û Şe-
rîetzan li wir civiyabûn. [54] Petrûs ji dûr ve li pey wî çû, heta ku ew
gihîşt hundirê hewşa Serokkahîn. Li wir bi parêzgeran re li ber êgir
rûniştibû û xwe germ dikir. [55] Îcar serekên kahînan û hemû civîna*
giregiran, ji bo ku biryara* kuştina Îsa bidin, li hember wî li şahi-
diyê digeriyan, lê peyda nedikirin. [56] Gelekan li ser wî şahidiya de-
rewîn da, lê şahidiya wan hevdû nedigirt. [57] Hingê hinek rabûn û li
ser wî şahidiya derewîn dan û gotin: [58] «Me bihîst ku vî mirovî got:
‹Ezê vê Perestgeha ku bi dest hatiye avakirin, hilweşînim û di sê
rojan de ezê Perestgeheke din a ku ne bi dest hatiye çêkirin, ava
bikim.›» [59] Lê dîsa jî şahidiya wan hevdû negirt. [60] Serokkahîn ra-
bû, li navendê rawesta û ji Îsa pirsî: «Ma tu bersîvê nadî? Ev çi
şahidî ye ku evên ha li ser te didin?» [61] Lê Îsa tu tişt negot û deng
nekir. Serokkahîn dîsa ji wî pirsî: «Ma tu Kurê Yê Pîroz Mesîh î?»
[62] Îsa got: «Ez im.

Û ‹hûnê bibînin ku Kurê Mirov
Li milê rastê yê hêza Xwedê rûniştî ye
Û bi ewrên ezmên tê.›[a]»

[63] Hingê Serokkahîn cilên xwe çirandin û got: «Êdî çi hewcedariya
me bi şahidan heye? [64] We çêrkirina* wî bihîst! Hûn çi dibêjin?»

---

[a] **14:62** Ji: Zebûr 110:1; Daniyêl 7:13

Hemûyan jî ew sûcdar dît û gotin ku ew yê kuştinê ye. 65 Hingê
hinekan dest pê kir û tif kirin wî, rûyê wî nixamtin, dan ber kulman
û jê re gotin: «Ka pêxemberîtiyê bike!» Parêzgeran jî ew girt û dan
ber sîleyan.

### *Petrûs Îsa Înkar Dike*

*(Metta 26:69-75; Lûqa 22:56-62; Yûhenna 18:15-18, 25-27)*

66 Gava Petrûs li jêr li hewşê bû, ji xizmetkarên Serokkahîn
keçikek hat ba wî. 67 Gava wê dît ku Petrûs xwe li ber êgir germ
dike, çav lê zîq kirin û got: «Tu jî bi yê Nisretî re, bi Îsa re bûyî.»
68 Lê wî înkar kir û got: «Ez nizanim û fêm nakim ku tu çi dibêjî.»
Piştre derket derveyî hewşê û dîk bang da. 69 Gava ku keçika xiz-
metkar ew li wê derê dît, wê dîsa ji yên wê derê re got: «Evê ha jî
yek ji wan e.» 70 Lê Petrûs dîsa înkar kir. Piştî gavekê yên ku li wir
bûn dîsa ji Petrûs re gotin: «Bi rastî tu jî ji wan î, çimkî tu ji Celîlê
yî.» 71 Lê wî dest bi nifiran kir, sond xwar û got: «Ez wî mirovê ku
hûn li ser dipeyivin nas nakim.» 72 Di cih de dîk cara diduyan bang
da. Û Petrûs gotina Îsa ya ku ji wî re gotibû, anî bîra xwe: «Berî ku
dîk du caran bang bide, tê sê caran min înkar bikî.» Li ser vê yekê
dest pê kir û giriya.

### *Îsa li ber Dîwana Pîlatos*

*(Metta 27:1-2, 11-14; Lûqa 23:1-5; Yûhenna 18:28-38)*

15 Serê sibê zû serekên kahînan bi rihspî, Şerîetzan û hemû
civîna giregiran re şêwirîn. Îsa girêdan û birin, dan destê
Pîlatos. 2 Pîlatos ji wî pirsî û got: «Ma tu padîşahê Cihûyan î?» Îsa
bersîv da û got: «Erê, wek ku te got.» 3 Serekên kahînan bi gelek
tiştan ew sûcdar kirin. 4 Pîlatos dîsa ji wî pirsî û got: «Ma tu qet
bersîvê nadî? Binêre ku çiqas giliyê te dikin!» 5 Lê Îsa êdî tu bersîv
neda wî, wusa ku Pîlatos şaş ma.

### *Biryara Kuştina Îsa*

*(Metta 27:15-26; Lûqa 23:13-25; Yûhenna 18:39-19:16)*

6 Îcar adet bû ku di her Cejna Derbasbûnê de walî girtiyekî ku
gel dixwest berde. 7 Di nav serhildêrên ku di serhildanê de mêr
kuştibûn, girtiyek bi navê Barabas hebû. 8 Û elalet derket pêşberî
walî, jê xwestin ku li gor adeta xwe ji wan re bike. 9 Pîlatos jî ji
wan re got: «Ma hûn dixwazin ku ez ji bo we padîşahê Cihûyan

berdim?» [10] Çimkî wî dizanibû ku serekên kahînan ji ber çavne-
bariyê Îsa dane destê wî. [11] Lê serekên kahînan nav di elaletê dan
ku bixwazin Barabas ji bo wan bê berdan. [12] Pîlatos dîsa ji wan
pirsî: «Nexwe hûn dixwazin ez çi bi wî kesî bikim ê ku hûn jê re
padîşahê Cihûyan dibêjin?» [13] Ew qîriyan û gotin: «Wî xaç bike!»
[14] Pîlatos ji wan pirsî: «Çima? Wî çi xerabî kiriye?» Lê ew hê bêtir
qîriyan: «Wî xaç bike!» [15] Pîlatos xwest ku elaletê razî bike û Ba-
rabas ji wan re berda. Û Îsa da ber qamçiyan û da destê wan, da ku
bê xaçkirin.

### *Leşker Tinazên Xwe bi Îsa Dikin*

*(Metta 27:27-30; Yûhenna 19:2-3)*

[16] Hingê leşkeran ew bir hundirê qesrê, yanî hewşa qesra walî
û hemû tabûra* leşkeran li ser civandin. [17] Xiftanekî binefşî lê kirin
û tacek ji stiriyan honandî danîn ser serê wî. [18] Dest pê kirin silav
danê û gotin: «Bijî padîşahê Cihûyan!» [19] Bi çîtikekê li serê wî xis-
tin, tif kirin wî, çûn ser çokan û li ber wî xwe tewandin. [20] Piştî ku
tinazên xwe pê kirin, cilê binefşî jê kirin, cilên wî lê kirin û birin
derve ku wî xaç bikin.

### *Xaçkirina Îsa*

*(Metta 27:31-44; Lûqa 23:27-43; Yûhenna 19:17-27)*

[21] Şimûnê ji Kûrênê – ku bavê Skender û Rûfos bû – ji zeviya
xwe vedigeriya û di wir re derbas dibû. Leşkeran bi zorê xaça Îsa
bi wî dan hilgirtin. [22] Îsa anîn wî cihê ku jê re ‹Golgota› digotin, ku
bê wergerandin: «Qoqê Serî». [23] Şerab û mur* tevlihevkirî danê, lê
wî venexwar. [24] Îsa xaçkirin û cilên wî bi pişk li xwe leva* kirin, ka
wê kî çi bistîne. [25] Û saet di nehê sibê de ew xaç kirin. [26] Nivîsa ku
ew pê sûcdar dikirin weha bû: «PADÎŞAHÊ CIHÛYAN.» [27-28] Bi
wî re du rêbir* jî xaçkirin; yek li milê wî yê rastê, yê din li milê wî
yê çepê. [29] Yên ku di wir re derbas dibûn, serê xwe dihejandin, Îsa
şermezar dikirin û digotin: «Ka teyê Perestgeh hilweşanda û di sê
rojan de ava bikira! [30] Ji xaçê were xwarê û xwe xilas bike!» [31] Bi
vî awayî serekên kahînan û Şerîetzan jî di nav xwe de bi tinaz

---

15:24 Zebûr 22:18
15:27 Di hin destnivîsaran de ev jî heye: «Bi vî awayî Nivîsara Pîroz hat cih, ya ku dibêje: Ew bi xerabkaran re hat hesabkirin.»

dipeyivîn û digotin: «Yên din xilas kirin, lê nikare xwe xilas bike!
32 Bila niha padîşahê Îsraêlê Mesîh ji xaçê bê xwarê, da ku em bi-
bînin û bawer bikin.» Yên bi wî re hatibûn xaçkirin jî ew şermezar
dikirin.

### *Mirina Îsa*

*(Metta 27:31-44; Lûqa 23:27-43; Yûhenna 19:17-27)*

33 Piştî nîvro saet ji diwanzdehan heta saet sisiyan tarî ket ser
seranserê welêt. 34 Û saet di sisiyan de Îsa bi dengekî bilind qîriya:
«Êloyî, Êloyî, lama sabaxtanî?»[a] ku bê wergerandin: «Xwedayê
min, Xwedayê min, te çima ez berdam?»
35 Gava hin ji yên ku li wir bûn ev bihîstin, gotin: «Binêrin, ew
gazî Êlyas* dike.» 36 Yek ji wan bi lez çû avgirek* hilda, bi sihikê
tije kir, bi çîtikekê ve danî û dirêjî Îsa kir ku vexwe. Û got: «Bi-
hêlin, em bibînin, ka Êlyas wê bê ku wî bîne xwarê?»
37 Îsa bi dengekî bilind qîriya û ruhê xwe da. 38 Hingê perda
Perestgehê ji serî heta binî çiriya û bû du perçe. 39 Sersedê* ku li
pêşberî Îsa rawesta bû, gava dît ku Îsa çawa ruhê xwe da, got: «Bi
rastî jî, ev mirov Kurê* Xwedê bû!» 40 Jinên ku ji dûr ve li vê yekê
temaşe dikirin hebûn. Meryema Mejdelanî*, Meryema* diya Yû-
sês û Aqûbê ciwan û herweha Seloma jî di nav wan de bûn. 41 De-
ma ku Îsa li Celîlê bû, li pey wî diçûn û jê re xizmet dikirin. Ji van
pê ve, gelek jinên din jî li wir hebûn ku bi Îsa re hatibûn Orşelîmê.

### *Veşartina Îsa*

*(Metta 27:57-61; Lûqa 23:50-56; Yûhenna 19:38-42)*

42 Roja* Amadekirinê, yanî roja beriya Şemiyê bû. Îcar gava
bû êvar, 43 Ûsivê Arîmetyayî hat ê ku endamekî civîna* giregiran ê
bi rûmet bû. Ew bi xwe jî li hêviya Padîşahiya Xwedê bû. Wî wêrî
û çû ba Pîlatos, cesedê Îsa jê xwest. 44 Gava Pîlatos bihîst ku Îsa ji
xwe miriye, şaş ma. Gazî sersed* kir û jê pirsî: «Ma gelek wext di
ser mirina wî re derbas bûye?» 45 Gava ji sersed hîn bû, cesed da
Ûsiv. 46 Wî cawekî keten kirrî, cesed anî xwarê, bi caw pêça û di
goreke ku di latê de hatibû kolan de veşart. Kevirek gêr kir ser
deriyê gorê. 47 Meryema Mejdelanî û Meryema diya Yûsês dîtin ku
ew li ku derê hat veşartin.

---

[a] **15:34** Ji: Zebûr 22:1

### *Rabûna Îsa ya ji nav Miriyan*
*(Metta 28:1-8; Lûqa 24:1-12; Yûhenna 20:1-10)*

16 Piştî ku roja* Şemiyê derbas bû, Meryema* Mejdelanî,
Meryema* diya Aqûb tevî Seloma çûn giyayên bîhnxweş
kirrîn, da ku herin, rûn li cesedê Îsa bidin. 2 Roja heftiyê ya pêşî,
serê sibê zû, çaxê roj hilat ew hatin ser gorê. 3 Wan ji hev re digot:
«Kî wê ji bo me wî kevirê ku li ser deriyê gorê ye gêr bike?» 4 Û
gava ku li jorê nêrîn, dîtin ku kevir ji cihê xwe hatiye gêrkirin.
Kevir gelek mezin bû. 5 Çaxê ku ketin hundirê gorê, dîtin ku li ali-
yê rastê xortekî xiftanê spî wergirtî rûdine. Jin gelek şaş man. 6 Wî
jî ji wan re got: «Şaş nemînin! Hûn li Îsayê Nisretî yê ku hatibû
xaçkirin digerin. Ew rabûye! Ew ne li vir e. Va ye cihê ku ew lê di-
rêjkirî bû. 7 Lê hûn herin, ji şagirtên wî re û ji Petrûs re bêjin: ‹Wek
ku ji we re gotiye ewê beriya we here Celîlê, hûnê li wir wî bibî-
nin.›» 8 Jin jî derketin û ji gorê reviyan, çimkî şaş mabûn û dile-
rizîn. Ji kesî re jî tiştek negotin. Çimkî tirs ketibû dilê wan.

### *Îsa Xwe Nîşanî Şagirtên Xwe Dike*
*(Metta 28:9-10; Lûqa 24:13-35; Yûhenna 20:11-18)*

9 Îcar çaxê Îsa roja pêşî ya heftiyê sibê zû rabû, wî pêşî xwe
nîşanî Meryema Mejdelanî da, ya ku heft cin jê derxistibûn. 10 Ew
jî çû, xeber da wan ên ku bi Îsa re mabûn, ew ên ku şîn digirtin û
digiriyan. 11 Lê gava wan bihîst ku Îsa dijî û xwe nîşanî Meryemê
daye, bawer nekirin.

12 Piştî van tiştan wî xwe bi awayekî din nîşanî diduyan ji wan
da, ku diçûn çolê. 13 Ew jî çûn xeber dan ên din. Lê ji wan jî bawer
nekirin.

### *Îsa Xwe Nîşanî Yanzdeh Şagirtan Dide û Wan Dişîne*
*(Metta 28:16-20; Lûqa 24:36-49; Yûhenna 20:19-23; Karên Şandiyan 1:6-8)*

14 Paşê Îsa xwe nîşanî yanzdehan da, çaxê ku ew li ser sifrê
rûniştibûn. Wî ji ber bêbawerî û serhişkiya wan li wan hilat. Çimkî
wan ji yên ku ew rabûyî dîtibûn, bawer nekiribû. 15 Û wî ji wan re
got: «Herin her çar aliyên dinyayê û Mizgîniyê li hemû afirînê bi-
din bihîstin. 16 Yê ku baweriyê bîne û bê imadkirin* wê xilas bibe,
lê yê ku baweriyê neyne wê sûcdar bê derxistin. 17 Û ev nîşanên ha
wê bi yên ku baweriyê tînin re bin: Bi navê min wê cinan derxin,

wê bi zimanên nû bipeyivin, 18 wê maran bi destê xwe bigirin û
eger ew tiştên bi jehr jî vexwin, qet ziyanê nabînin. Ewê destê xwe
deynin ser nexweşan û nexweş wê qenc bibin.»

### *Îsa Hildikişe Ezmanan*

*(Lûqa 24:50-53; Karên Şandiyan 1:9-11)*

19 Îcar piştî ku Xudan Îsa bi wan re peyivî, hilkişiya ezmên û li
milê Xwedê yê rastê rûnişt. 20 Şagirt jî çûn, li her cihî Mizgînî dan
bihîstin. Xudan jî bi wan re dixebitî û bi wan nîşanên ku di pey de
dihatin peyv rast derdixist.

**16:20** Di hin destnivîsaran de ayetên 9-20 tune.

# *Mizgîniya Îsa Mesîh li gor Lûqa*

## *Pêşgotin*

*Ev kitêb di navbera salên 60 û 80an de bi destê Lûqa hatiye nivîsîn. Nivîskar Lûqa bi xwe hekîm (textor) û dîrokzan bû. Wî bi zimanekî bilind yê Yewnanî nivîsiye. Lûqa bi Pawlosê Şandî re digeriya û hevaltiya wî ya rêwîtiyê dikir (Karên Şandiyan 16:10; Nameya ji Kolosiyan re 4:14; Nameya ji Filêmon re 24; 2 Tîmotêyos 4:11). Nivîskar Lûqa du beşên Peymana Nû nivîsîne: Pêşî ev kitêba ha, Mizgîniya Îsa Mesîh û piştre Kitêba Karên Şandiyan, ya ku li ser kar û xebata Pawlos û Şandiyên din e. Herdu kitêbên wî ji mirovekî bi navê Têyofîlos re hatine nivîsîn (Lûqa 1:3, Karên Şandiyan 1:1). Maneya navê Têyofîlos ev e: Yê ku ji Xwedê hez dike.*

*Lûqa gelek hûr û kûr û ji her aliyî ve jiyan, hînkirin, mirin û rabûna Îsa Mesîh rast dide fêmkirin. Armanca Lûqa ev e ku bide xuyakirin ku Îsa Mesîh xilaskar e û xilaskarê dinyayê ye. Çend keramet û meseleyên Îsa hene ku bi tenê Lûqa ser van nivîsiye. Ew gelek girîng in; bo mînak: «Mesela Sameriyê dilpak» û «Mesela kurê windabûyî».*

*Nivîsara Lûqa dikare weha bê beşkirin:*

*I. Bûyîna Yûhennayê imadkar; bûyîn û zaroktiya Îsa (1:1-2:52)*
*II. Xizmeta Yûhennayê imadkar (3:1-20)*
*III. Imadbûn û ceribandina Îsa (3:21-4:13)*
*IV. Xizmeta Îsa li Celîlê (4:14-9:50)*
*V. Rêwîtiya Îsa ji Celîlê heta Orşelîmê (9:51-19:28)*
*VI. Îsa li Orşelîmê hîn dike; serwerên Cihûyan wî qebûl nakin (19:29-23:56)*
*VII. Girtin û xaçkirina Îsa*
*VIII. Rabûna Îsa ya ji nav miriyan û hilkişîna wî ya ezmanan (24:1-53)*

### *Pêşgotin ji Têyofîlos re*

1 Ya Têyofîlosê giranbiha,
gelekan dest bi rêzkirina wan tiştên ku di nav me de çêbûne,
kirine, 2 çawa wan kesên ku ji destpêkê ve bi çavên xwe dîtin û
peyv* belav kirin, ji me re ragihandin. 3 Loma, ez jî wek yekî ku ji
pêşî ve guhê xwe daye hemûyî û lê kolaye, min qenc dît ku ez wan
tiştan rêz bi rêz ji te re binivîsim, 4 da ku tu rastiya tiştên ku ji te re
hatine hînkirin, bizanî.

### *Mizgîniya Milyaket li ser Bûyîna Yûhennayê Imadkar*

5 Dema Hêrodês* padîşahê Cihûstanê* bû, kahînek* ji koma
Ebiya hebû. Navê wî Zekerya bû. Jina wî ji keçên Harûn* bû û na-
vê wê Êlîzabêt bû. 6 Û herdu jî li ba Xwedê rast bûn û li gor hemû
emir û qanûnên Xudan* bê kêmahî rêve diçûn. 7 Zarokên wan ne-
bûn, çimkî zarok ji Êlîzabêtê re çênedibûn û herdu jî bi nav salan
ve çûbûn.
8 De îcar wusa çêbû, çaxê wî di dora koma xwe de ji Xwedê re
xizmeta kahîntiyê dikir, 9 li gor adeta kahîntiyê, pişk li wî ket ku
ew here Perestgeha* Xudan* û bixûrê* bişewitîne. 10 Di dema şe-
witandina bixûrê de tevahiya elaleta* xelkê li derve dua dikir.
11 Hingê milyaketekî Xudan* jê re xuya bû û li aliyê rastê yê
gorîgeha* bixûrê rawesta. 12 Gava Zekerya ew dît, şaş bû û tirs ket
dilê wî. 13 Milyaket jê re got: «Zekerya, netirse! Çimkî duaya te hat
bihîstin û jina te, Êlîzabêt, wê kurekî ji te re bîne, tê navê wî Yû-
henna* deynî.

14 Û ewê ji te re bibe şahî û geşî
Û gelek wê bi bûyîna wî dilxweş bibin.
15 Çimkî ewê li ba Xudan* mezin be.
Ew şerab û vexwarinên giran qet venaxwe
Û hê di zikê diya xwe de wê bi Ruhê* Pîroz tije be.

16 Û ewê gelekan ji zarokên* Îsraêl li Xudan, Xwedayê wan, ve-
gerîne. 17 Û ewê bi Ruh* û bi hêza Êlyas* pêxember li ber Xudan
here, da ku ew dilê bavan li zarokan û neguhdaran li şehrezayiya
dilpakan vegerîne, da ji Xudan re miletekî pêkhatî amade bike.»

---

1:15 Binêre: Hijmartin 6:3 1:17 Binêre: Melaxî 4:5-6; 3:1

[18] Zekerya jî ji milyaket re got: «Ma ezê vê yekê bi çi bizanim?
Ez pîr im û jina min jî bi nav salan ve çûye.» [19] Milyaket lê ve-
gerand û got: «Ez Cibrayîl im, yê ku li ber destê Xwedê radiweste
û ez hatime şandin, da ez ji te re bêjim û vê mizgîniyê bidim te.
[20] Va ye, heta wê roja ku ev tişt pêk bê, tê lal bibî û hew bikarî
bipeyivî. Çimkî te bi wan gotinêñ min ên ku di wextê xwe de wê
bên cih, bawer* nekir.» [21] Di vê navê de xelk li hêviya Zekerya bû.
Ew şaş man, ka çima ew demeke dirêj di Perestgehê* de dima. [22] Û
gava ew derket derve, wî nikaribû bi wan re bipeyive û ew têgi-
hîştin ku wî di Perestgehê de dîtiniyek* dîtiye. Wî bi îşaretan ji
wan re digot û lal ma. [23] Û gava rojên xizmeta wî temam bûn, ew
vegeriya mala xwe. [24] Piştî wan rojan jina wî Êlîzabêt bizaro bû û
wê pênc mehan xwe veşart û got: [25] «Va ye, di van rojan de Xu-
dan* ev yek ji bo min kir: Wî li min nêrî û di nav xelkê de şerma
min rakir.»

### *Mizgîniya Milyaket li ser Bûyîna Îsa Mesîh*

[26] Di meha şeşan de Xwedê milyaket Cibrayîl şand bajarekî
Celîlê*, ku navê wî Nisret bû, [27] ba keçikeke ku dergistiya miro-
vekî bi navê Ûsiv bû. Ûsiv ji mala* Dawid bû. Navê keçikê jî
Meryem* bû. [28] Cibrayîl hat ba wê û jê re got: «Silav li te, ey ke-
çika ku kerema Xwedê li ser e. Xudan* bi te re ye.» [29] Meryem bi
vê silavê şaş ma û fikirî, ka ev çi silav e? [30] Milyaket jê re got: «Ya
Meryem, netirse! Kerema Xwedê li te bûye. [31] Va ye, tê bizaro bibî
û tê kurekî bînî û navê wî Îsa* deynî. [32] Ewê mezin be û wê jê re
Kurê Yê Herî Bilind bê gotin. Û Xudan, Xwedê wê textê bavê wî
Dawid* bide wî. [33] Û ewê her û her li ser mala* Aqûb padîşahiyê
bike û dawiya padîşahiya wî nayê.» [34] Meryemê ji milyaket re got:
«Ma gelo evê çawa çêbe? Çimkî tu mêr nêzîkî min nebûne.»
[35] Milyaket lê vegerand û got: «Ruhê* Pîroz wê bê ser te û tê bi-
kevî bin hêza siya Yê Herî Bilind. Ji ber vê yekê wê ji wî pîrozê ku
wê ji te çêbe re Kurê* Xwedê bê gotin. [36] Û va ye, Êlîzabêt a ku
mirova te ye, ew jî bi vê pîrîtiya xwe ve bi kurekî bizaro ye. Ya ku
jê re digotin ku zarokan nayne, va ye, ew di heyva xwe ya şeşan de
ye. [37] Çimkî tu tişt li ber Xwedê ne zehmet e.» [38] Meryemê got:

---

1:18 Binêre: Destpêkirin 18:11 1:19 Binêre: Daniyêl 8:16; 9:21

«Va me, ez cêriya Xudan im. Bila wek ku te gotî, ji min re bibe.» Piştre milyaket ji ba wê çû.

### *Meryem Diçe Serdana Êlîzabêtê*

39 Meryem rabû di wan rojan de bi lez çû nav çiyan, bajarekî ji
bajarên Cihûda*. 40 Ew gihîşt mala Zekerya û silav li Êlîzabêtê kir.
41 Gava ku Êlîzabêtê silava Meryemê bihîst, zarok di zikê wê de
xwe tevda û Êlîzabêt bi Ruhê* Pîroz tije bû, 42 û bi dengekî bilind
got: «Tu di nav jinan de pîroz* î û berê zikê te pîroz e! 43 Ma ez kî
me, heta ku diya Xudanê* min bê ba min? 44 Çimkî gava dengê si-
lava te ket guhê min, zarok ji şahiyê xwe di zikê min de tevda.
45 Xwezî bi wê, ya ku bawer* kir ew tiştên ku ji aliyê Xudan ve jê
re hatine gotin, wê bên cih.»

46 Hingê Meryemê got:

«Canê min pesnê* Xudan dide.
47 Û ruhê min bi Xilaskarê min, Xwedê şa dibe,
48 Çimkî wî li nizimahiya cêriya xwe nêrî.
Îcar ji niha û pê ve, hemû nifş wê ji min re bêjin: ‹Xwezî bi te.›
49 Çimkî Xwedayê hêzdar tiştên mezin ji min re kirin.
Navê wî pîroz e.
50 Û rehma wî nifş bi nifş li ser wan e,
Yên ku ji wî ditirsin.
51 Wî bi zendê xwe qudreta xwe nîşan da,
Û wî, yên di dilê xwe de pozbilind ji hev belav kirin.
52 Wî, yên mezin ji textên wan anîn xwarê,
Û yên nizim bilind kirin.
53 Yên birçî bi tiştên qenc têr kirin,
Û yên dewlemend destvala rêkirin.
54 Wî rehma xwe anî bîra xwe
Û alîkariya xulamê xwe Îsraêl kir,
55 Çawa ku ji bav û kalên me re,

---

1:46-55 Binêre: 1 Samûêl 2:1-10
1:48 Binêre: 1 Samûêl 1:11
1:50 Binêre: Zebûr 103:13, 17
1:51 Binêre: Zebûr 89:10; 2 Samûêl 22:28
1:52 Binêre: Eyûb 12:19; 5:11
1:53 Binêre: 1 Samûêl 2:5; Zebûr 107:9
1:54 Binêre: Zebûr 98:3; Îşaya 41:8

Ji Birahîm* û dûndana* wî re
Soza xwe ji bo her û her daye.»

[56] Meryem nêzîkî sê mehan li ba Êlîzabêtê ma û paşê vegeriya
mala xwe.

### *Bûyîna Yûhennayê Imadkar*

[57] Gava dema zarokanîna Êlîzabêtê hat, wê kurek anî. [58] Cîran
û mirovên wê bihîstin ku Xudan rehmeke mezin li wê kiriye û ew
jî bi wê re şa bûn. [59] Û di roja heştan de ji bo sinetkirina* kurik
hatin û xwestin, navê bavê wî Zekerya lê bikin. [60] Lê diya wî li
wan vegerand û got: «Na, navê wî wê Yûhenna* be.» [61] Wan jê re
got: «Di nav mirovên te de kesek bi vî navî tune.» [62] Îcar wan bi
îşaretan ji bavê wî pirsî, ka ew dixwaze çi navî li wî bike [63] Wî
nivîsdekek xwest û weha li ser nivîsî: «Navê wî Yûhenna ye.» Û
hemû şaş man. [64] Di cih de dev û zimanê wî vebûn, peyivî û pesnê
Xwedê da. [65] Tirs ket dilê hemûyên ku li dora wan rûdiniştin û li
seranserê çiyayên Cihûstanê* li ser van tiştan hat peyivîn. [66] Û
hemûyên ku ev tişt bihîstin, ew xistin dilê xwe û gotin: «Gelo ev
zarok wê bibe çi?» Çimkî destê Xudan li ser wî bû.

### *Pêxemberîtiya Zekerya*

[67] Û bavê wî Zekerya bi Ruhê* Pîroz tije bû, wî pêxemberîtî
kir û got:

[68] «Pesin ji Xudan Xwedayê Îsraêl re,
Ku ew hat serdana gelê xwe û wî ew bi berdêl xilas kir.
[69] Wî ji mala xulamê xwe Dawid
Strûhekî* xilasiyê* ji me re rakir,
[70] – Çawa ku wî hê ji berê ve bi devê pêxemberên* xwe
yên pîroz gotibû –
[71] Ku me ji dijminên me û ji destê hemûyên ku ji me nefret
dikin, xilas bike,
[72] Da li bav û kalên me bê rehmê,

---

**1:55** Binêre: Mîxa 7:20; Destpêkirin 17:7 **1:68** Binêre: Zebûr 41:13; 111:9
**1:69** Mana «Strûhekî xilasiyê ji me re rakir» ev e: Xilaskarekî bi hêz ji me re rakir; binêre: Zebûr 18:2.
**1:71** Binêre: Zebûr 106:10

Û peymana* xwe ya pîroz,
73 Wê sonda ku ji bavê me Birahîm* re xwaribû,
Bîne bîra xwe
74-75 Ku em ji destê dijminên xwe xilas bibin
Û bê tirs li ber wî di hemû rojên jiyana xwe de
Bi paqijî û rastî biperizin* wî.
76 Û tu jî, zaroko, wê ji te re pêxemberê Yê Herî Bilind bê gotin,
Çimkî tê di pêşiya Xudan de herî,
Da ku tu riyên wî amade bikî
77 Û ji bo lêbihûrtina gunehên wan,
Xilaskirinê bi gelê wî bidî zanîn.
78 Ji rehm û dilovaniya Xwedayê me,
Wê ji jor, wek ku roj hiltê, bê serdana me,
79 Da ronahiyê bide wan ên ku di tariyê de
Û di bin siya mirinê de rûniştine
Û ewê berê lingên me bide ser riya silametê.»

80 Kurik mezin dibû û bi ruh bi qewet dibû û heta bi wê roja ku ew ji Îsraêl re xuya bû, li çol û çolistanan ma.

### *Bûyîna Îsa Mesîh*

*(Metta 1:18-25)*

2 Di wan rojan de Qeyser Awgûstos emir da, ku hemû xelkên
dinya Romayê navên xwe bidin nivîsîn. 2 Di wê demê de, gava
Kûrênyos serdarê Sûriyê bû, ev hijmartina pêşî bû ku hat kirin. 3 Û
her kes çû bajarê xwe, da ku xwe bide nivîsîn. 4 Ûsiv jî ji bajarê
Nisreta Celîlê* çû Beytlehmê, bajarê* Dawid ê li Cihûstanê*, çimkî ew ji mala* Dawid û ji bavikê wî bû. 5 Ew çû wê derê, da ku
xwe bi dergistiya xwe Meryemê re bide nivîsîn. Dergistiya wî jî
bizaro bû. 6 Gava ew li Beytlehmê bûn, dema zarokanîna wê hat
7 û wê kurê xwe yê nixurî anî. Wê zarokê xwe di pêçekê de pêça û
di afirekî de danî, çimkî cihê wan li mêvanxanê tunebû.

---

1:72-73 Binêre: Zebûr 106:45-46; Zebûr 105:8-9; Destpêkirin 17:7
1:76 Binêre: Îşaya 40:3; Melaxî 3:1
1:78-79 Binêre: Melaxî 4:2; Îşaya 9:2; 58:8; 60:1-2

### *Şivan û Milyaket*

[8] Îcar li wê derdorê şivanan bi şev li çolê li ber keriyên xwe
nobe digirt. [9] Milyaketekî Xudan ji wan re xuya bû û rûmeta Xu-
dan hawirdora wan kir ronahî. Tirseke mezin ket ser wan. [10] Mil-
yaket ji wan re got: «Netirsin! Ez hatime, ku ez mizgîniya şa-
bûneke mezin bidim we, ku ji tevahiya gel re ye. [11] Îro li bajarê*
Dawid xilaskarek ji we re çêbûye. Ew jî Xudan* Mesîh* e. [12] Bila
ev ji we re bibe nîşan: Hûnê zarokekî di pêçekê de pêçayî û di
afirekî de razayî bibînin.» [13] Û ji nişkê ve ordiyeke leşkerên ezmên
bi milyaket re xuya bûn, pesnê Xwedê didan û gotin:
[14] «Li bilindahiyan ji Xwedê re rûmet
Û li ser erdê li ser wan ên ku Xwedê ji wan razî ye silamet.»
[15] Çaxê milyaket ji dora wan hilkişiyan ezmên, şivanan ji hev re
got: «De werin, em herin Beytlehmê û vî tiştê bûyî yê ku Xudan bi
me daye zanîn, bibînin.» [16] Îcar ew bi lez çûn. Wan Meryem, Ûsiv
û zarokê di afir de razayî dîtin. [17] Gava ew dîtin, wan ew xebera ku
li ser zarok bihîstibûn, belav kirin. [18] Hemûyên ku ev bihîstin, li
tiştên ku şivanan ji wan re got, şaş man. [19] Lê Meryemê ev xeberên
ha hemû di dilê xwe de hildianîn û kûr li ser wan difikirî. [20] Şivan
vegeriyan û wek ji wan re hatibû gotin, ji bo tiştên dîtî û bihîstî
pesnê Xwedê didan û rûmet didan wî.
[21] Çaxê heşt roj temam bûn, ew hat sinetkirin û navê wî Îsa*
danîn, wek ku hê berî ew bikeve zikê diya xwe, milyaket gotibû.

### *Pêşkêşkirina Îsa ji Xwedê re*

[22] Û gava rojên paqijbûna wan li gor Şerîeta* Mûsa temam
bûn, zarok birin Orşelîmê*, da ku wî pêşkêşî Xudan bikin, [23] wek
ku di Şerîeta Xudan de hatiye nivîsîn: «Her zarokê nêr ê nixurî wê
nedrê* Xudan be»[a] [24] û li gor gotina Şerîeta Xudan «Cotek kevo-
kên qumrî, an du ferxên kevokan» jê re bikin gorî*. [25] Hingê li
Orşelîmê mirovek hebû, ku gelek rast û xwedêtirs bû. Navê wî Şi-
mûn bû. Ew li hêviyê bû ku Îsraêl bê handan*. Ruhê* Pîroz li ser
wî bû. [26] Û Ruhê Pîroz bi wî dabû zanîn ku berî dîtina Mesîhê*
Xudan, ew mirinê nabîne. [27] Bi rêberiya Ruh ew hat Perestgehê*.

---

[a] 2:23 Ji: Derketin 13:2, 12, 15 [b] 2:24 Ji: Qanûna Kahîntiyê 12:8
2:22 Qanûna Kahîntiyê 12:3, 6

Gava dê û bavê wî, ji bo pêkanîna Şerîetê, Îsayê zarok anîn Pe-
restgehê, [28] Şimûn rahişt wî û ew xist himbêza xwe, wî pesnê
Xwedê da û got:

[29] «Ya Xudan, niha li gor gotina xwe
Xulamê xwe bi silamet berde.
[30] Çimkî çavê min xilaskirina te dît,
[31] A ku te li ber çavê hemû miletan amade kiriye:
[32] Ronahiya ku çavê miletan vedike
Û rûmeta ji bo gelê te yê Îsraêl e.»

[33] Dê û bavê wî li wan gotinên Şimûn gelek şaş man. [34] Şimûn ew
pîroz* kirin û ji diya wî Meryemê re got: «Ev zarokê ha hat dayîn,
da ku li Îsraêlê ji bo ketin û rabûna gelekan bibe sedem û ew
nîşanek e ku li hember derkevin, [35] wusa ku fikrên dilê gelekan bên
kifşkirin. Û şûrek wê di dilê te re jî here, wî qul bike.»

[36] Û li wê derê pêxemberek hebû, navê wê Hana bû. Ew keça
Fanowêl û ji eşîra Aşêr bû. Ew gelek pîr bû û piştî keçkaniya xwe
heft salan bi mêrê xwe re mabû [37] û piştre heta heştê û çar salan
jinebî mabû. Wê dev ji Perestgehê bernedida û bi şev û roj bi dua û
rojî diperizî* Xwedê. [38] Ew jî di wê kêlîkê de hat, pesnê Xwedê da
û wê li ser wî ji yên ku li hêviya xilasiya Orşelîmê bûn re got.

### *Meryem û Ûsiv bi Kurik re Vedigerin Bajarê Nisretê*

[39] Û çaxê wan li gor Şerîeta* Xudan her tişt pêk anî, vegeriyan
bajarê xwe Nisreta Celîlê*. [40] Îcar zarok mezin dibû, bi hêz dibû û
bi şehrezayiyê tije dibû û qenciya Xwedê jî li ser wî bû.

### *Îsayê Diwanzdeh Salî li Perestgehê*

[41] Dê û bavê wî her sal di Cejna* Derbasbûnê de diçûn Or-
şelîmê*. [42] Gava Îsa dibû diwanzdeh salî, ew li gor adeta cejnê dîsa
hilkişiyan Orşelîmê. [43] Piştî ku wan rojên cejnê temam kirin û ve-
geriyan, Îsayê zarok li Orşelîmê ma. Haya dê û bavê wî jê tunebû.
[44] Di gumana wan de ew jî di nav koma rêwiyan de ye û ew rojekê
rêve çûn. Hê ji nû ve di nav mirov û nasên xwe de li wî geriyan.
[45] Gava wan ew nedît, ew vegeriyan Orşelîmê û lê geriyan. [46] Di
roja sisiyan de wan ew di Perestgehê de dît. Ew di nav mamos-

---

**2:30-31** Binêre: Îşaya 40:5; 52:10 **2:32** Binêre: Îşaya 42:6; 49:6; 46:13

teyên Şerîetê* de rûniştî bû, guh dida wan û pirs ji wan dikirin.
47 Hemûyên ku gotinên wî dibihîstin li şehrezayî û bersîvên wî şaş
diman. 48 Dema dê û bavê wî ew dîtin, gelek şaş man. Diya wî ji wî
re got: «Kurê min, te çima wusa li me kir? Ez û bavê te, em bi xem
û xiyal li te digeriyan.» 49 Wî ji wan re got: «Çima hûn li min ge-
riyan? Ma we nizanibû ku divê ez li mala Bavê* xwe bim?» 50 Lê
wan maneya gotinên wî fêm nekir. 51 Îcar Îsa bi wan re daket û çû
bajarê Nisretê û bi ya wan dikir. Lê diya wî ev tiştên ha hemû di
dilê xwe de hilanîn. 52 Îsa jî bi şehrezayiyê pêşve diçû û mezin
dibû; ew li ber Xwedê û li ber mirovan keremdar bû.

### *Danezana Yûhennayê Imadkar*

*(Metta 3:1-12; Marqos 1:1-8; Yûhenna 1:19-28)*

3 Di sala panzdehan a padîşahiya Qeyser Tîberyos de Pîlatosê
Pontiyos waliyê Cihûstanê bû, Hêrodês* serdarê Celîlê* bû,
birayê wî Filîpos serdarê herêma Îtûrya û Traxonîdayê bû, Lûsan-
yas serdarê Avêlinya bû 2 û Henan û Qeyafa Serokkahîn bûn. Di
wê demê de gotina Xwedê li çolê ji Yûhennayê* kurê Zekerya re
hat. 3 Îcar Yûhenna çû û li seranserê Çemê Urdunê hîn dikir, ku
xelk imad* bibin û tobe bikin, da ku li gunehên wan bê bihûrtin.
4 Çawa ku di kitêba* gotinên Îşaya* pêxember de hatiye nivîsîn:

«Dengê yê li çolê bang dike:
‹Riya Xudan amade bikin
Şiveriyên wî serrast bikin!
5 Her gelî wê tije bibin,
Her çiya û gir wê nizim bibin,
Xwehrî wê rast bibin
Û riyên asê wê hilû bibin.
6 Û her mirov wê xilasiya Xwedê bibîne.›»[a]

7 Îcar elalet* dihatin, da ku ji aliyê Yûhenna ve bên imadki-
rin*. Wî ji wan re got: «Hey têjikên koremaran, kê ji we re gotiye
ku hûn ji ber wê xezeba ku tê, birevin? 8 De ka fêkiyê ku li to-
bekirinê tê, bidin û dest pê nekin û ji xwe re nebêjin: ‹Birahîm*
bavê me ye.› Ez ji we re dibêjim ku Xwedê dikare ji van keviran jî

---

[a] 3:4-6 Ji: Îşaya 40:3-5

zarokan ji Birahîm re rake. 9 Ji xwe bivir li ser qurmê daran e. Her
dara ku berê qenc nede, wê bê birrîn û bê avêtin nav êgir.»
10 Û elaletê ji wî pirsî û got: «Nexwe em çi bikin?» 11 Wî li
wan vegerand û got: «Yê ku du kirasên wî hebin, bila yekî bide wî
yê ku tune û yê ku xwarina wî hebe, bila ew jî wusa bike.» 12 Bac-
gir* jî hatin, da ku imad bibin û gotin: «Mamoste, ma em çi bi-
kin?» 13 Wî ji wan re got: «Ji wî tiştê ku divê hûn bistînin, bêtir
nestînin.» 14 Leşkeran jî pirsî û gotin: «Lê em çi bikin?» Û wî ji
wan re got: «Bêbextiyê li xelkê nekin û bi darê zorê tiştekî ji wan
nestînin û bi meaşê xwe razî bin.»
15 Ew xelk hemû di hêviyê de dima û li ser Yûhenna di dilê
xwe de digotin: «Ma gelo Mesîh* ev e?» 16 Û Yûhenna bersîva
wan da û got: «Ez bi avê we imad dikim, lê yê ji min hêzdartir tê,
ku ez ne hêja me, benên çaroxa wî jî vekim. Ewê bi Ruhê* Pîroz û
bi êgir we imad bike. 17 Melhêba wî di destê wî de ye, da ku bên-
dera xwe paqij bike û genim di embara xwe de bicivîne, lê ewê
kayê bi agirê ku venamire bişewitîne.»
18 Bi vî awayî wî bi gelek tiştên din jî şîret li xelkê dikir û
Mizgînî* bi wan dida bihîstin. 19 Lê gava Yûhenna ji ber jinbira
Mîr Hêrodês* Hêrodiya û ji ber hemû xerabiyên din, yên ku wî
kiribûn, li wî hilat*, 20 Hêrodês li ser hemû xerabiyên xwe ev jî bi
ser de zêde kir, ku wî Yûhenna avêt zîndanê.

### *Imadbûna Îsa*

*(Metta 3:13-17; Marqos 1:9-11)*

21 Gava xelk hemû dihat imadkirin*, Îsa jî imad bû. Wê kêlîka
ku Îsa dua dikir, ezman vebû 22 û Ruhê Pîroz bi beden di şiklê
kevokekê de li ser wî danî û dengek ji ezmên hat û got: «Tu yî
Kurê min ê delal. Dilê min bi te xweş e.»

### *Malbavka Îsa*

*(Metta 1:1-17)*

23 Îsa bi xwe, gava ku dest bi hînkirina xwe kir, nêzîkî sî salî
bû. Û wek ku dihat gumankirin ew kurê Ûsiv bû, kurê Elî, 24 kurê
Metat, kurê Lêwî, kurê Melkê, kurê Yannay, kurê Ûsiv, 25 kurê
Metîtya, kurê Amos, kurê Nahûm, kurê Heslî, kurê Necay, 26 kurê
Mehat, kurê Metîtya, kurê Şêmeyîn, kurê Yûsêx, kurê Yoda, 27 ku-

rê Yûhenan, kurê Rêşa, kurê Zerûbabel, kurê Şaltiyêl, kurê Nerî,
28 kurê Melkê, kurê Êdî, kurê Qosam, kurê Êlmedam, kurê Er,
29 kurê Yêşû, kurê Êliyazêr, kurê Yorîm, kurê Metat, kurê Lêwî,
30 kurê Şimûn, kurê Cihûda, kurê Ûsiv, kurê Yonam, kurê Êl-
yaqîm, 31 kurê Melya, kurê Mena, kurê Metêta, kurê Natan, kurê
Dawid*, 32 kurê Yêşa*, kurê Ovêd, kurê Bowaz, kurê Selmon, kurê
Nehşon, 33 kurê Amînadav, kurê Admîn, kurê Aram, kurê Hesrûn,
kurê Perez, kurê Cihûda*, 34 kurê Aqûb*, kurê Îshaq*, kurê Bi-
rahîm*, kurê Têrah, kurê Nehor, 35 kurê Serûx, kurê Rêwo, kurê
Pêlêg, kurê Eber, kurê Şalah, 36 kurê Qênan, kurê Arpexşad, kurê
Sam, kurê Nûh*, kurê Lamex, 37 kurê Metûşela, kurê Henox*, kurê
Yarêd, kurê Mehalêl, kurê Qênan, 38 kurê Enoş, kurê Sêt, kurê
Adem*, kurê Xwedê bû.

### *Ceribandina Îsa*

*(Metta 4:1-11; Marqos 1:12-13)*

4 Û Îsa bi Ruhê Pîroz tije ji Çemê Urdunê vegeriya. Ruh ew bir
çolê 2 û ew çil rojî ji aliyê Îblîs* ve hat ceribandin. Wî di wan
rojan de tiştek nexwar û gava ew roj derbas bûn, ew birçî bû.
3 Îblîs jê re got: «Eger tu Kurê* Xwedê yî, ji vî kevirî re bêje,
bila bibe nan.» 4 Îsa bersîva wî da û got: «Hatiye nivîsîn ku: ‹Mi-
rov ne bi nên tenê dijî.›[a]»
5 Îblîs ew derxist bilindahiyekê û di bîhnekê de wî hemû padî-
şahiyên dinyayê nîşanî wî dan 6 û jê re got: «Ezê hemû vê dest-
hilatiyê û rûmeta van padîşahiyan bidim te; çimkî ew ji min re
hatiye dayîn û ez dikarim wê bidim wî yê ku ez dixwazim. 7 Îcar,
eger tu ji min re herî ser çokan, hemû wê bibin ên te.» 8 Îsa bersîva
wî da û got: «Hatiye nivîsîn ku: ‹Biperize* Xudan Xwedayê xwe û
bi tenê ji wî re xizmetê bike.›[b]»
9 Hingê Îblîs ew bir Orşelîmê*, ew danî ser birca Perestgehê û
jê re got: «Eger tu Kurê* Xwedê yî, ka xwe ji vir bavêje xwarê.
10 Çimkî hatiye nivîsîn: ‹Ewê ji bo te li milyaketên xwe emir bike,
da ku ew te biparêzin› 11 û ‹ewê te li ser destên xwe hilgirin, da ku
lingê te li kevirekî nekeve.›[c]» 12 Îsa lê vegerand û got: «Hatiye

---

[a] 4:4 Ji: Dubarekirina Şerîetê 8:3 [b] 4:8 Ji: Dubarekirina Şerîetê 6:13
[c] 4:10-11 Ji: Zebûr 91:11-12

gotin: ‹Xudan, Xwedayê xwe neceribîne.›[a]» 13 Û gava Îblîs hemû
ceribandinên xwe xilas kirin, ew wextekê jê dûr ket.

### *Îsa li Celîlê Dest bi Belavkirina Mizgîniyê Dike*

*(Metta 4:12-17; Marqos 1:14-15)*

14 Û Îsa bi hêza Ruhê Pîroz vegeriya Celîlê û li seranserê wî
cihî nav û dengê wî belav bû. 15 Wî di kinîştên* wan de hîn dikir û
hemûyan pesnê wî dida.

### *Îsa li Bajarê Xwe Nisretê Tê Redkirin*

*(Metta 13:53-58; Marqos 6:1-6)*

16 Û ew hat Nisretê, cihê ku lê mezin bûbû û wek adeta xwe,
roja* Şemiyê ket kinîştê*, rabû ser xwe, da ku ji wan re bixwîne.
17 Kitêba Îşaya* pêxember dan wî. Gava wî nivîsara lihevpêçayî
vekir, wî ew cih dît ku tê de weha hatibû nivîsîn:

18 «Ruhê Xudan li ser min e,
Çimkî wî ez mesh* kirime,
Da ez Mizgîniyê* bidim belengazan;
Wî ez şandime, da ku ez ji girtiyan re azadiyê
Û ji koran re vebûna çavan bidim bihîstin,
Bindestan azad bikim
19 Û sala Xudan a keremê bidim naskirin.»[b]

20 Wî kitêb li hev pêça, ew da destê yê berdestî û rûnişt. Çavên he-
mûyên ku di kinîştê* de bûn, li wî diman. 21 Îcar wî dest pê kir û ji
wan re got: «Îro ev nivîsara ku we bihîst, hat cih.» 22 Û hemûyan
ew erê kir û li wan gotinên wî yên merdane, yên ku ji devê wî
derdiketin, şaş man û gotin: «Ma ev ne kurê Ûsiv e?» 23 Û wî ji
wan re got: «Bêguman hûnê vê meselê ji min re bêjin: ‹Hekîmo*,
de xwe bi xwe qenc bike! De ka wan hemû tiştên me bihîstine ku
te li Kefernahûmê kirine, li vê derê, li bajarê xwe jî bike!›» 24 Hin-
gê wî got: «Bi rastî ez ji we re dibêjim, tu pêxember bi dilê xelkên
bajarê xwe tune. 25 Lê ez ya rast ji we re dibêjim: Di rojên Êlyas*
pêxember de, çaxê ku ezman sê sal û şeş mehan hatibû girtin û di
tevahiya welêt de xelayeke giran çêbûbû, gelek jinebî li welatê
Îsraêlê hebûn. 26 Lê Êlyas hingê ji kesekî re nehat şandin, ji bilî ji

---

[a] **4:12** Ji: Dubarekirina Şerîetê 6:16 [b] **4:18-19** Ji: Îşaya 61:1-2

jinebiyekê re, ya ku ji Sarêfata herêma Saydayê bû. 27 Û di dema
Êlîşa* pêxember de gelek kotî* li welatê Îsraêlê hebûn û ji nav
wan ji Nemanê* ji Sûriyê pê ve, kesekî din nehat paqijkirin.»
28 Gava wan kesên di kinîştê de ev yek bihîst, hemû hêrs ketin 29 û
rabûn ser xwe, Îsa ji bajêr derxistin derve, birin ser kendalê girê ku
bajarê wan li ser hatibû avakirin, da ku wî ji wê derê bavêjin
xwarê. 30 Lê ew di nav wan re derbas bû û çû.

### *Mirovê bi Cinekî Nepak Ketî*
*(Marqos 1:21-28)*

31 Îsa bi xwar ve dageriya Kefernahûmê, bajarekî Celîlê û wî di
roja* Şemiyê de hîn kir. 32 Ew li hînkirina wî gelek şaş diman,
çimkî ew bi desthilatî peyivî. 33 Di kinîştê* de mirovek hebû ku
ruhê cinekî nepak pê re hebû. Wî bi dengekî bilind kir qîrîn û got:
34 «Ax, Îsayê Nisretî, ma te çi ji me ye? Ma tu hatiyî, da ku tu me
helak bikî? Ez te nas dikim, ez dizanim tu kî yî, tu Pîrozê* Xwedê
yî.» 35 Îsa lê hilat* û got: «Devê xwe bigire û ji wî derkeve!» Cin
ew mirov di navendê de avêt erdê, ji wî derket û ziyanek nedayê.
36 Û hemû heyirî man û tirsiyan, ew di nav hev de peyivîn û gotin:
«Gelo ev çi gotin e, çimkî ew bi hêz û desthilatî emir li ruhên ne-
pak dike û ew derdikevin?» 37 Êdî nav û dengê wî li her cihê wê
herêmê belav bû.

### *Qenckirina Gelek Nexweşan*
*(Metta 8:14-17; Marqos 1:29-34)*

38 Hingê Îsa ji kinîştê derket û çû mala Şimûn*. Xesûya Şimûn
tayeke giran girtibû û ji bo wê ji wî lava kirin. 39 Îcar ew raserî wê
rawesta û li tayê hilat. Ta ji wê çû û ew di cih de rabû ser xwe û
xizmeta wan kir. 40 Çaxê roj çû ava, hemûyan nexweşên xwe yên
ku ketibûn êş û janên cûr bi cûr, anîn ba wî. Wî jî destên xwe
danîn ser her yekî ji wan û ew qenc kirin. 41 Û ji gelekan jî cin
derdiketin, dikirin qîrîn û digotin: «Tu Kurê* Xwedê yî.» Wî li
wan hilat û nedihişt ku deng ji wan derkeve, çimkî wan dizanibû
ku ew Mesîh e.

---

**4:25-26** 1 Padîşah 17:8-16
**4:27** 2 Padîşah 5:1-14

### *Danasîna Mizgîniya Padîşahiya Xwedê li Seranserê Welêt*

42 Îcar gava bû roj, Îsa derket û çû cihekî ku bêpêjin bû. Elalet*
jî lê digeriya û dihatin heta ba wî. Wan dixwest ku wî bigirin, da
ku ew ji ba wan neçe. 43 Lê wî ji wan re got: «Divê ez Mizgîniya*
Padîşahiya* Xwedê bidim bajarên din jî, çimkî ez ji bo vê yekê
hatime şandin.» 44 Û wî di kinîştên Cihûstanê de hîn dikir.

### *Îsa Şagirtên Xwe Yên Pêşî Hildibijêre*

*(Metta 4:18-22; Marqos 1:16-20)*

5 Rojekê gava Îsa li ber perê Gola Cênîsartê* sekinîbû, elaletê li
wî teng dikir, da ku gotina Xwedê bibihîzin. 2 Îsa du qeyik li
devê golê dîtin. Masîgir ji wan peya bûbûn û torên xwe dişuştin.
3 Îsa li qeyikekê ji wan siwar bû. Ew jî ya Şimûn* bû û ji wî hêvî
kir ku qeyikê piçekê ji bejê dûr bixe. Û rûniştî ji qeyikê elalet hîn
dikir. 4 Piştî ku wî gotinên xwe xilas kirin, ji Şimûn re got: «Qeyi-
ka xwe ber bi kûrahiyê ve bajo, torên xwe bavêjin nêçîra ma-
siyan.» 5 Şimûn lê vegerand û got: «Ya Hosta! Tevahiya şevê me
kir û nekir, me tu tişt negirt. Lê li ser gotina te, ezê toran bavêjim.»
6 Gava wan wusa kir, wan ewqas masî girtin ku hindik mabû, torên
wan bidirin. 7 Wan bi nîşanan bang kirin şirîkên xwe, yên ku di
qeyika din de bûn, da ku bên û alîkariya wan bikin. Ew jî hatin û
herdu qeyik ewqas dagirtin ku hindik ma bû, ew bin av bibin.
8 Gava Şimûn-Petrûs* ev dît, wî xwe avêt ber çokên Îsa û got: «Ya
Xudan, ji min dûr keve, çimkî ez mirovekî gunehkar im.» 9 Çimkî
ew û hemû yên ku pê re bûn ji pirrbûna masiyên ku girtibûn, heyirî
diman û ditirsiyan, 10 wusa jî Aqûb* û Yûhenna*, kurên Zebedî,
yên ku şirîkên Şimûn bûn heyirîn. Hingê Îsa ji Şimûn re got: «Ne-
tirse! Ji niha û pê ve, tê bibî nêçîrvanê mirovan.» 11 Wan qeyikên
xwe kişandin bejê, dev ji her tiştî berdan û li pey wî çûn.

### *Qenckirina Mirovekî Kotî*

*(Metta 8:1-4; Marqos 1:40-45)*

12 Gava ku ew li nav bajarekî ji bajaran bû, li wir mirovek hebû
ku bedena wî hemû kotî* bû. Gava wî Îsa dît, xwe deverû avêt
erdê, jê lava kir û got: «Ya Xudan, eger tu bixwazî, tu dikarî min
paqij bikî.» 13 Îsa destê xwe dirêj kir, dest li wî da û got: «Ez
dixwazim. Paqij bibe!» Û di cih de kotîbûn jê çû. 14 Û Îsa tembîh li

wî kir, ku ew vê yekê ji kesî re nebêje, lê jê re got: «Here xwe
nîşanî kahîn* bide û wek ku Mûsa emir kiriye, pêşkêşekê bide, da
ji wan re bibe şahidî, ku tu paqij bûyî.» [15] Dîsa jî nav û dengê Îsa
hê bêtir belav dibû û elaleteke mezin li hev kom dibû, da ku
guhdariya wî bikin û ji nexweşiyên xwe qenc bibin. [16] Lê wî xwe
dida çolê û dua dikir.

### *Qenckirin û Lêbihûrtina Mirovê Şil û Şeht*
*(Metta 9:1-8; Marqos 2:1-12)*

[17] Rojekê ji rojan, çaxê wî hîn dikir, Fêrisî* û Şerîetzan* jî li
wir rûniştibûn. Ew ji her gundên Celîlê, Cihûstanê û ji Orşelîmê*
hatibûn. Hêza Xudan ji bo qenckirina nexweşiyên wan pê re bû.
[18] Hingê hin zilaman yekî felcî di nav nivînan de anî û dixebitîn ku
wî bînin hundir û deynin ber Îsa. [19] Lê gava wan ji ber elaletê tu rê
nedît ku wî bînin hundir, ew hilkişiyan ser bên, keremîtik rakirin û
ew tevî nivînên wî daxistin navendê ber Îsa. [20] Gava wî baweriya*
wan dît, ji yê felcî re got: «Ey mirovo! Li gunehên te hat bihûrtin.»
[21] Şerîetzan* û Fêrisiyan* dest pê kir, fikirîn û gotin: «Ma evê ku
çêrî* Xwedê dike kî ye? Ma ji Xwedê pê ve, kî dikare li gunehan
bibihûre?» [22] Îsa bi fikrên wan hesiya, wî bersîv da û ji wan re got:
«Ma hûn çima tiştên weha di dilê xwe de dibêjin? [23] Ma kîjan
hêsanîtir e? Ez bêjim: ‹Gunehên te li te hatin bihûrtin!› an ku ez
bêjim: ‹Rabe û rêve here!› [24] Lê ji bo ku hûn bizanin desthilatiya
Kurê* Mirov heye ku li ser erdê li gunehan bibihûre», ji yê felcî re
got: «Ez ji te re dibêjim, rabe nivînên xwe hilîne û here mala
xwe.» [25] Ew jî di cih de li pêş wan rabû ser xwe, rahişt wan nivînên
ku ew di nav wan de bû, çû mala xwe û pesnê Xwedê da. [26] Hemû
li vê yekê heyirî man, pesnê Xwedê dan, dilê wan tije tirs bû û go-
tin: «Îro me tiştên ecêb dîtin.»

### *Îsa Gazî Lêwî Dike*
*(Metta 9:1-8; Marqos 2:1-12)*

[27] Piştî vê yekê Îsa derket derve û bacgirekî* rûniştî di bacxanê
de dît, ku navê wî Lêwî* bû. Wî jê re got: «Li pey min were.»
[28] Wî jî dev ji her tiştî berda, rabû ser xwe û li pey wî çû. [29] Lêwî jê
re di mala xwe de ziyafetek da. Li ser sifrê bi wan re hijmareke
mezin ji bacgiran û hinekên din rûniştibûn. [30] Îcar Fêrisiyan* û

zaneyên wan ên Şerîetê* di serê şagirtên* wî de kirin pitepit û
gotin: «Çima hûn bi bacgir û gunehkaran re dixwin û vedixwin?»
31 Îsa li wan vegerand û got: «Ne yên saxlem, lê yên nexweş hew-
cedarê hekîm* in. 32 Ez nehatime, ku ji bo tobekirinê gazî rastan
bikim, lê ez hatime ku gazî gunehkaran bikim.»

### *Pirsa Rojîgirtinê*

*(Metta 9:14-17; Marqos 2:18-22)*

33 Îcar wan ji Îsa re got: «Şagirtên Yûhenna* gelek rojiyê digi-
rin û dua dikin û yên Fêrisiyan jî wusa dikin, lê yên te dixwin û
vedixwin.» 34 Îsa ji wan re got: «Heta ku zava bi wan re ye, ma hûn
dikarin ji xelkê dawetê re bêjin: ‹Rojiyê bigirin!› 35 Lê rojên ku
zava wê ji nav wan bê standin wê bên. Hingê di wan rojan de ewê
rojiyê bigirin.»
36 Wî meselek jî ji wan re got: «Tu kes perçeyekî ji cilekî nû jê
nake, ku cilekî kevin pê pîne bike. Eger bike, hem wê cilê nû bi-
dirîne, hem jî ew perçê ji cilê nû bi cilê kevin re li hev nayê. 37 Û tu
kes şeraba nû naxe meşkên kevin. Eger weha bike, şeraba nû wê
meşkan bidirîne, şerab wê birije û meşk wê ziyan bibin. 38 Lê belê
divê şeraba nû bikeve meşkên nû. 39 Û kesek tune ku piştî şeraba
kevin vexwe, ya nû bixwaze, çimkî ew dibêje: ‹Ya kevin xweş e.›»

### *Pirsa Roja Şemiyê*

*(Metta 12:1-8; Marqos 2:23-28)*

6 Rojeke Şemiyê, gava Îsa di nav dexlan re diçû, şagirtên* wî
simbil diçinîn, di nav destên xwe de difirikandin û dixwarin.
2 Lê hinekan ji Fêrisiyan* ji wan re got: «Çima hûn tiştê ku roja*
Şemiyê nabe, dikin?» 3 Îsa li wan vegerand û got: «Ma we nexwen-
diye, ku Dawid* çi kir gava ew û yên bi wî re birçî bûn? 4 Çawa
ew ket Mala* Xwedê, nanê* pêşberiyê stand, xwar û da wan ên bi
xwe re jî, ew nanê ku ji kahînan* pê ve çênabe ku kesek bixwe?»
5 Û wî ji wan re got: «Kurê* Mirov Xudanê* roja Şemiyê ye.»

### *Îsa Roja Şemiyê Mirovekî Desthişk Qenc Dike*

*(Metta 12:9-14; Marqos 3:1-6)*

6 Rojeke din a Şemiyê ew çû kinîştê* û hîn kir. Li wê derê

---

6:4 Qanûna Kahîntiyê 24:9; 1 Samûêl 21:1-6

mirovek hebû ku destê wî yê rastê hişkbûyî bû. [7] Îcar çavên Şe-
rîetzan* û Fêrisiyan* li Îsa bûn, ka ewê roja Şemiyê nexweşiyan
qenc bike. Çimkî ew li tiştekî digeriyan, da ku wî sûcdar bikin.
[8] Lê wî dizanibû ku ew çi difikirin û ji wî zilamê ku destê wî hişk-
bûyî bû re got: «Rabe ser xwe û li navendê raweste.» Ew jî rabû
ser xwe û rawesta. [9] Hingê Îsa ji wan re got: «Ez ji we dipirsim:
Ma di roja Şemiyê de qencîkirin an xerabîkirin, xilaskirina jiyana
mirovekî an helakkirin cayîz e?» [10] Û wî li hemûyên hawirdora
xwe nêrî û ji wî mirovî re got: «Destê xwe dirêj bike!» Wî jî wusa
kir û destê wî qenc bû. [11] Lê ew bi carekê har bûn û bi hevdû şê-
wirîn, ka ew çi li Îsa bikin.

### *Hilbijartina Her Diwanzdeh Şandiyên Îsa*
*(Metta 10:1-4; Marqos 3:13-19)*

[12] Di wan rojan de Îsa çû çiyê, da ku dua bike. Wî tevahiya
şevê bi duakirina li ber Xwedê derbas kir. [13] Û gava bû roj, wî gazî
şagirtên* xwe kir û diwanzdeh ji wan hilbijartin. Wî ji wan re
«Şandî»* got: [14] Ew jî ev bûn: Şimûn, yê ku wî navê Petrûs jî lê
kiribû û birayê wî Endrawis, Aqûb* û Yûhenna*, Filîpos û Berto-
lomeyos, [15] Metta û Tûma, Aqûbê* Halfayos û Şimûn, yê ku jê re
Welatparêz digotin, [16] Cihûdayê* kurê Aqûb û Cihûdayê* Îsxer-
yotî, yê ku li Îsa xayîn derket.

### *Bihîstina Mizgîniyê û Daxwaza Qencbûnê*
*(Metta 4:23-25)*

[17] Û ew bi wan re hat xwarê û li nav deştekê rawesta. Û li wir
komeke mezin a ji şagirtên* wî û elaleteke mezin ji xelkê hebû.
Ew ji seranserê Cihûstanê, ji Orşelîmê* û ji ber keviya deryayê, ji
Sûr* û Saydayê hatibûn, da ku guhdariya wî bikin û ji nexweşiyên
xwe qenc bibin. [18] Yên ku ji ruhên nepak jî cefa dikişandin, dihatin
qenckirin. [19] Û tevahiya elaletê dixebitî ku destê xwe li wî bidin,
çimkî hêz ji wî derdiket û hemû qenc dikirin.

### *Xwezîtî û Nexwezîtî*
*(Metta 5:1-12)*

[20] Îcar Îsa çavên xwe ber bi şagirtên xwe ve hildan û got:
«Xwezî bi we belengazan,
Çimkî Padîşahiya* Xwedê ya we ye.

[21] Xwezî bi we, hûn ên ku niha birçî ne,
Çimkî hûnê bên têrkirin.
Xwezî bi we, hûn ên ku niha digirîn,
Çimkî hûnê bikenin.
[22] Xwezî bi we, gava ku xelk di ber Kurê* Mirov de, ji we nefret
bikin, we ji nav xwe derxin, we nizim bikin û navê we bi xerabî
derxin. [23] Di wê rojê de şa bin û ji şahiyê bireqisin, çimkî xelata we
li ezmên mezin e. Bav û kalên wan jî li pêxemberan wusa dikirin.
[24] Lê belê wey li we dewlemendan,
Çimkî we handana xwe standiye.
[25] Wey li we, hûn ên ku niha têr in,
Çimkî hûnê birçî bibin.
Wey li we, hûn ên ku niha dikenin,
Çimkî hûnê bikevin şîn û girînê.
[26] Wey li we be, gava ku hemû mirov bi qencî li ser we bipeyivin,
çimkî bav û kalên wan jî bi pêxemberên derewîn wusa dikirin.

### *Ji Dijminên Xwe Hez Bikin*
*(Metta 5:38-48; 7:12)*

[27] «Lê ez ji we guhdaran re dibêjim: Ji dijminên xwe hez bikin;
qenciyê bi wanên ku ji we nefret dikin, bikin. [28] Duayên qenc ji bo
wan bikin, yên ku nifiran li we dikin; ji bo wan ên ku xerabiyê bi
we dikin, dua bikin. [29] Yê ku sîleyekê li lama te bixe, ya din jî bide
ber. Û eger yek ebayê te ji te bistîne, kirasê xwe jî bi dest ve berde.
[30] Bide her kesê ku ji te dixwaze û tiştên xwe ji wî yê ku ji te
distîne, bi şûn de nexwaze. [31] Çawa hûn dixwazin ku xelk ji we re
bikin, hûn jî wusa ji wan re bikin.
[32] «Eger hûn ji wan hez bikin, yên ku ji we hez dikin, gelo çi
feyda we wê jê hebe? Çimkî gunehkar jî ji wan ên ku ji wan hez
dikin, hez dikin. [33] Û eger hûn qenciyê bi wan bikin, yên ku qen-
ciyê bi we dikin, gelo çi feyda we wê jê hebe? Gunehkar jî wusa
dikin. [34] Û eger hûn bi deyn bidin wan ên ku hûn bi hêvî ne ji wan
bistînin, gelo çi feyda we wê jê hebe? Gunehkar jî bi deyn didin
gunehkaran, da ku tiştê dayî bi şûn de bistînin. [35] Lê belê ji dij-
minên xwe hez bikin û qenciyê bikin. Bi deyn bidin û li hêviya

---

6:21 Binêre: Yêremya 31:25; Zebûr 126:5-6

vegerandinê nemînin. Hingê xelata we wê mezin be û hûnê bibin
kurên Yê Herî Bilind. Çimkî ew ji nankoran û xeraban re qencîker
e. 36 Dilbirehm bin, çawa ku Bavê* we jî dilbirehm e.

### *Li ser Dadbarkirinê*
*(Metta 7:1-5)*

37 «Dadbar* nekin, hûn jî nayên dadbarkirin; sûcdar dernexin,
hûn jî sûcdar nayên derxistin; lê bibihûrin, wê li we jî bê bihûrtin.
38 Bidin, wê ji we re jî bê dan; bi pîvaneke qenc, bihevdedayî, bi-
hevdehejandî û sereavêtî, wê bikeve pêşa we. Çimkî bi çi pîvanê
hûn bipîvin, bi wê pîvanê jî wê ji we re bê pîvandin.»
39 Û Îsa meselek jî ji wan re got: «Ma yê kor dikare rêberiya yê
kor bike? Ma herdu jî nakevin çalê? 40 Şagirt* ne di ser mamostê
xwe re ye; lê her yekê ku di hînbûna xwe de bigihîje, wê bibe wek
mamostê xwe. 41 Û çima tu qirşikê di çavê birayê xwe de dibînî, lê
girşê di çavê xwe de nabînî? 42 An çawa tu dikarî ji birayê xwe re
bêjî: ‹Birawo, bihêle ku ez vî qirşikê di çavê te de derxim›, lê tu
girşê di çavê xwe bi xwe de nabînî? Hey mirovê durû! Ka pêşî girş
ji çavê xwe derxe, hingê tê zelal bibînî, ku qirşikê di çavê birayê
xwe de derxî.

### *Dar ji Fêkiyê Xwe Tê Naskirin*
*(Metta 7:17-20; 12:34-35)*

43 «Ne dara qenc a ku berê xerab dide heye û ne jî dara xerab a
ku berê qenc dide. 44 Her dar ji berê xwe tê naskirin; tu kes ji sti-
riyan hêjîran nade hev û ne jî ji diriyê tirî diçine. 45 Mirovê qenc ji
xezîna dilê xwe ya qenc tiştê qenc derdixe û yê xerab ji xezîna dilê
xwe ya xerab tiştê xerab derdixe, çimkî dev ji tijebûna dil dibêje.

### *Hîmê Du Malan*
*(Metta 7:24-27)*

46 «Û çima hûn ji min re dibêjin: ‹Ya Xudan*, ya Xudan› û ew
tiştên ku ez dibêjim, hûn nakin? 47 Ez nîşanî we bidim, ka her kesê
ku tê ba min û peyvên* min dibihîze û wan tîne cih, wek kê ye:
48 Ew wek mirovekî ye ku xaniyek ava kir. Wî kola û kûr kir û
bingeha xênî li ser latê danî. Gava lehî rabû, pêlên wê li xênî dan,
lê nikaribûn xênî ji cih bilebitînin, çimkî ew saxlem hatibû ava-
kirin. 49 Lê ewê ku peyva min dibihîze û nake, ew mîna mirovekî

ye ku xaniyek li ser axê, bê bingeh ava kir. Lehiyê li xênî da û ew
di cih de hilweşiya û ketina wî xaniyî gelek dijwar bû.»

### *Qenckirina Xulamê Sersedekî*
*(Metta 8:5-13; Yûhenna 4:43-54)*

7 Piştî ku wî ew gotinên ku xelkê guhdarî dikir, xilas kirin, ew
ket Kefernahûmê. 2 Xulamê sersedekî* nexweş ketibû û li ber
mirinê bû. Ew li ba sersed yekî hêja bû. 3 Dema wî li ser Îsa bihîst,
wî çend ji rihspiyên Cihûyan şandin ba wî û jê lava kir, ku ew bê û
xulamê wî xilas bike. 4 Gava ew hatin ba Îsa, wan gelek lavlav jê
kir û gotin: «Ew hêja ye ku tu vê jê re bikî, 5 çimkî ew ji miletê me
hez dike û wî bi xwe kinîşt* ji me re ava kiriye.» 6 Îsa bi wan re çû.
Gava hindik mabû ku ew bigihîje mala wî, yê sersed dost şandin
pêşiya wî, da ku ew weha jê re bêjin: «Ya Xudan*, xwe newestîne,
çimkî ez ne hêja me ku tu bêyî bin banê min. 7 Ji ber vê yekê jî min
xwe hêja nedît ku ez bêm ba te. Îcar hema peyvekê* bêje û xulamê
min wê qenc bibe. 8 Çimkî ez jî mirovekî di bin emir de me û di
bin min re jî leşker hene. Ez ji yekî re dibêjim: ‹Here!›, ew diçe û
ji yê din re dibêjim: ‹Were!›, ew tê û ez ji xulamê xwe re dibêjim:
‹Vê bike!›, ew dike.» 9 Gava Îsa ev bihîst, ew li wî şaş ma. Wî berê
xwe da elaleta ku li pey wî dihat û got: «Ez ji we re dibêjim ku
min di Îsraêlê de jî baweriyeke* evqas mezin nedîtiye.» 10 Û gava
yên şandî vegeriyan mal, wan dît ku xulamê wî sax bûye.

### *Saxbûna Kurê Jinebiyê*

11 Ne gelekî piştî vê, Îsa çû nav bajarekî ku jê re Nayîn digotin.
Şagirtên* wî û elaleteke mezin pê re diçûn. 12 Gava ew nêzîkî der-
gehê bajêr dibû, miriyek ji bajêr derdixistin. Ew kurê diya xwe yê
yekta bû û dê jî jinebî bû. Elaleteke mezin ji bajêr bi wê re bû.
13 Gava Xudan* dê dît, dilê wî pê şewitî û jê re got: «Negirî!»
14 Ew nêzîkî darbestê bû, destê xwe lê da û yên ku ew hilgirtibûn,
sekinîn. Wî got: «Xorto! Ez ji te re dibêjim, rabe ser xwe!» 15 Û yê
mirî rabû, rûnişt û dest pê kir, peyivî. Û Îsa ew da diya wî. 16 Îcar
tirs ket dilê hemûyan. Wan pesnê Xwedê da û digotin: «Pêxembe-
rekî mezin di nav me de rabûye» û «Va ye, Xwedê hatiye serdana
gelê xwe.» 17 Û ev gotina ha ya li ser wî li seranserê Cihûstanê û
hawirdora wê belav bû.

### *Îsa Bersîva Pirsa Yûhenna Dide*

*(Metta 11:1-19)*

18 Şagirtên Yûhenna* jî ji wî re li ser van tiştan hemûyan gotin.
Û Yûhenna gazî du şagirtên xwe kir 19 û ew şandin ba Xudan, da
ku jê bipirsin: «Ma ewê ku wê bihata tu yî, an em li hêviya yekî
din bimînin?» 20 Gava ew herdu zilam hatin ba wî, wan jê re got:
«Yûhennayê imadkar em şandine ba te, da ku em bipirsin: ‹Ma yê
ku wê bihata tu yî, an em li hêviya yekî din bimînin?›» 21 Wê gavê
Îsa gelek ji nexweşî, êş û ruhên xerab qenc kirin û çavên gelek
koran vekirin. 22 Îsa li wan vegerand û got: «Herin û we çi dîtiye û
çi bihîstiye ji Yûhenna re bêjin: Kor dibînin, şil û şeht* rêve diçin,
kotî paqij dibin, kerr dibihîzin, mirî radibin û Mizgînî ji belenga-
zan re tê dayîn. 23 Û xwezî bi wî yê ku ji min neenire.»
24 Gava qasidên Yûhenna çûn, wî dest pê kir û ji elaletê re li
ser Yûhenna got: «Ma hûn derketin çolê, da ku hûn çi bibînin?
Çîtikeke ku li ber bayê diheje? 25 Nexwe hûn derketin, ku hûn çi
bibînin? Ma mirovekî, ku cilên nermîn li xwe kirine? Va ye, yên bi
cilên spehî û di dewlemendiyê de dijîn, di qesrên padîşahan de ne.
26 Nexwe hûn derketin ku hûn çi bibînin? Ma pêxemberekî? Erê, ez
ji we re dibêjim, ji pêxemberekî hê zêdetir. 27 Ev ew e, yê ku li ser
hatiye nivîsîn:

‹Va ye, ez qasidê xwe di pêşiya te de dişînim,
Ewê riya te li pêşiya te amade bike.›[a]

28 Ez ji we re dibêjim, di nav wan ên ku ji jinan çêbûn de, tu kes ji
Yûhenna meztir tune, lê di Padîşahiya* Xwedê de yê herî biçûk ji
Yûhenna meztir e.»
29 Gava tevahiya xelkê, heta bi bacgiran* jî ev yek bihîst, wan
Xwedê erê kir, çimkî bi imadkirina* Yûhenna hatibûn imadkirin.
30 Lê Fêrisî* û Şerîetzanan* daxwaza Xwedê ya ku ji bo wan bû
red kir, çimkî bi imadkirina Yûhenna nehatibûn imadkirin. 31 «Ma ez
mirovên vî nifşî* bimînînim kê û ew mîna kê ne? 32 Ew wek zarokan
in ên ku li nav meydana bajêr rûdinin, bang dikin hev û dibêjin:

‹Me ji we re li bilûrê xist û hûn nereqisîn.
Me avêt ser miriyan û hûn negirîn.›

---

[a] 7:27 Ji: Melaxî 3:1

33 Çimkî Yûhennayê imadkar hat, ne nan dixwar û ne şerab ve-
dixwar û we digot: ‹Ew bi cinan ketiye.› 34 Kurê* Mirov jî hat, ew
dixwe û vedixwe û hûn dibêjin: ‹Ev mirovekî xwera û serxweş e,
dostê bacgir û gunehkaran e.› 35 Lê şehrezayî ji aliyê hemû zarokên
xwe ve rast tê dîtin.»

### *Lêbihûrtina li Jineke Gunehkar*

36 Yekî ji Fêrisiyan* Îsa vexwend, ku bi wî re xwarinê bixwe.
Ew jî çû mala yê Fêrisî û li ser sifrê rûnişt. 37 Û li bajêr jineke gu-
nehkar hebû. Gava wê bihîst ku ew li mala yê Fêrisî li ser sifrê
rûniştiye, wê di firaxeke mermerê spî de rûnê bîhnxweş anî. 38 Ew
ji pişt ve li ber lingên wî rawesta, bi girîn dest pê kir, lingên wî bi
hêstiran şil kirin û ew bi porê serê xwe zuwa kirin. Wê lingên wî
ramûsandin û rûnê bîhnxweş li wan da. 39 Gava Fêrisiyê ku ew ga-
zî mala xwe kiribû, ev dît, ji xwe re got: «Eger ev pêxember bûya,
wê bizaniya, ka ev jina ku destê xwe li wî dide kî ye û ew çi jin e.
Çimkî ew yeke gunehkar e.»
40 Îsa jê re got: «Şimûn*, ez dixwazim tiştekî ji te re bêjim.»
Wî got: «De bêje, mamoste.» 41 «Du deyndarên deynxwazekî he-
bûn; yek ji wan bi pênc sed û yê din bi pêncî zîvî* deyndar bû.
42 Lê ji ber ku tiştekî wan tunebû ku deynê xwe bidin, ew li her-
duyan jî bihûrt. Îcar kîjan ji herduyan wê bêtir ji wî hez bike?»
43 Şimûn lê vegerand û got: «Ez dibêjim hema, ewê ku bêtir lê hatî
bihûrtin.» Wî jî jê re got: «Te rast tê derxist.» 44 Wî berê xwe da
jinikê û ji Şimûn re got: «Tu vê jinikê dibînî? Ez hatim mala te, te
av jî ji bo lingên min neda, lê wê lingên min bi hêstiran şil kirin û
bi porê xwe zuwa kirin. 45 Te ramûsanek jî neda min, lê wê ji hinga
ku ez ketime hundir ve, dev ji ramûsandina lingên min bernedaye.
46 Te rûnê bîhnxweş li serê min neda, lê wê rûnekî bîhnxweş li
lingên min da. 47 Loma ez ji te re dibêjim, li gunehên wê yên gelek
hat bihûrtin. Ji ber vê yekê wê gelek hez kiriye. Lê yê ku jê re hin-
dik tê lêbihûrtin, ew hindik hez dike.» 48 Û wî ji wê re got: «Li
gunehên te hat bihûrtin.» 49 Yên ku pê re li ser sifrê rûniştibûn, dest
pê kirin û ji xwe re gotin: «Gelo ev kî ye ku li gunehan jî dibi-
hûre?» 50 Hingê wî ji jinikê re got: «Baweriya* te tu xilas kirî. Îcar
bi silamet here.»

### *Ew Jinên ku li pey Îsa Diçûn*

8 Piştî demekê Îsa gund bi gund, bajar bi bajar digeriya, hîn dikir
û Mizgîniya* Padîşahiya* Xwedê dida. Her diwanzdeh jî pê re
bûn. [2] Herweha hin jinên ku ji ruhên xerab û nexweşiyan hatibûn
qenckirin bi wan re bûn: Meryema* ku jê re Mejdelanî digotin a ku
heft cin jê derketibûn, [3] û Yohana jina Xûzayê şahneyê* mala Hêro-
dês* û Sosin û gelekên din ên ku bi malê xwe alîkariya wan dikirin.

### *Mesela Erdê Qenc û Neqenc*
*(Metta 13:1-9; Marqos 4:1-9)*

[4] Û gava elaleteke mezin ji xelkê ji her bajarî li ba Îsa civiya,
wî meselek ji wan re got: [5] «Cotkar derket, da ku here tovê xwe
biçîne. Çaxê wî tovê xwe direşand, hinek ket tenişta rê. Xelkê pê lê
kir û teyrên ezmanan ew xwarin. [6] Û hinek jê ket ser erdê kevirî û
şîn bû, lê zû hişk bû, ji ber ku ew bê rewa bû. [7] Hinek ket nav
stiriyan, stirî jî pê re şîn bûn û ew fetisandin. [8] Hin jî ket ser erdekî
qenc, şîn bû û berê wî sed tovî bû.»

Piştî van gotinan Îsa bi dengekî bilind got: «Ewê ku guhên wî
ji bo bihîstinê hene, bila bibihîze!»

### *Armanca Meselan*
*(Metta 13:10-17; Marqos 4:10-12)*

[9] Şagirtên* wî jê pirsîn: «Ka maneya vê meselê çi ye?» [10] Wî jî
got: «Zanîna sirên Padîşahiya Xwedê ji we re hatiye dayîn, lê ji
yên din re bi meselan tê gotin, da ku ‹ew binêrin, lê nebînin û bi-
bihîzin, lê fêm nekin.›[a]»

### *Şîrovekirina Mesela Erdê Qenc û Neqenc*
*(Metta 13:18-23; Marqos 4:13-20)*

[11] «Maneya vê meselê jî ev e: Tov peyva Xwedê ye. [12] Tovê ku
ket tenişta rê ew in ku dibihîzin, lê Îblîs* tê û wê ji dilê wan der-
dixe, da ku ew baweriyê* neynin û xilas nebin. [13] Yên ser erdê ke-
virî ew in ku çaxê gotina Xwedê dibihîzin, wê bi dilxweşî qebûl
dikin; lê ew bê ra* ne, baweriya wan heta bi demekê ye û di wextê
ceribandinê de ew ji rê derdikevin.

[14] «Yên ku ketine nav stiriyan jî, ew in, yên ku dibihîzin û

---

[a] 8:10 Ji: Îşaya 6:9

diçin, bi xem, dewlemendî û kêfên vê dinyayê difetisin û berê
gihîştî nadin. [15] Lê yên di nav erdê qenc de ew in ku peyva Xwedê
dibihîzin, bi dilekî pak û durust di dilê xwe de hiltînin û bi bîhna
fireh ber didin.

### *Çira Nayê Nixumandin*
*(Marqos 4:21-25)*

[16] «Tu kes çirayê pênaxe û bi firaxekê nanixumîne, an jî wê
naxe bin nivînan. Lê belê ew wê datîne ser pêçirayê, da yên ku bên
hundir, ronahiyê bibînin. [17] Çimkî tiştekî veşartî tune ku neyê eşke-
rekirin û ne jî tiştekî nixumandî heye ku neyê zanîn û nekeve ber
ronahiyê. [18] Loma hay ji xwe hebin ku hûn çawa guhdarî dikin,
çimkî yê ku pê re heye, wê ji wî re bêtir bê dayîn û yê ku pê re
tune, tiştê ku ew yê xwe guman dike jî, wê ji wî bê standin.»

### *Dê û Birayên Îsa*
*(Metta 12:46-50; Marqos 3:31-35)*

[19] Hingê dê û birayên Îsa hatin ba wî, lê ji ber elaletê wan nika-
ribû ku xwe bigihînin wî. [20] Û jê re gotin: «Diya te û birayên te li
derve ne û dixwazin te bibînin.» [21] Lê wî li wan vegerand û got:
«Diya min û birayên min ew in ên ku peyva Xwedê dibihîzin û
dikin.»

### *Îsa Bagerê Radiwestîne*
*(Metta 8:23-27; Marqos 4:35-41)*

[22] Rojekê ji rojan ew bi şagirtên* xwe ve ket qeyikekê û ji wan
re got: «Werin, em herin aliyê din ê golê.» Û bi rê ketin. [23] Gava
ew bi qeyikê diçûn, ew bi xew ve çû. Hingê bagerek li golê rabû,
av diket qeyikê û ew ketin talûkê. [24] Û şagirt nêzîkî wî bûn, ew
hişyar kirin û gotin: «Ya Hosta, ya Hosta, em helak dibin!» Ew jî
rabû û li ba û pêlên avê hilat*. Êdî bager rawesta û dinya bê deng
bû. [25] Hingê wî ji wan re got: «Kanî baweriya we?» Ew tirsiyan,
şaş man û ji hev re gotin: «Ma ev kî ye, ku li ba û avê jî emir dike
û ew bi ya wî dikin?»

### *Îsa Yekî Cinoyî li Girasînê Qenc Dike*
*(Metta 8:28-34; Marqos 5:1-20)*

[26] Ew çûn herêma Girasîniyan, ya ku diket pêşberî Celîlê.
[27] Gava ew derket ser bejê, mirovek ji wî bajarî rastî wî hat ku bi

cinan ketibû. Wî ji mêj ve cil li xwe nedikirin û li malê nedima.
Ew li nav goristanan dima. 28 Gava wî Îsa dît, kir qîrîn û xwe li ber
wî avêt erdê û bi dengekî bilind got: «Ma te çi ji min e, ya Îsa,
Kurê* Xwedayê Herî Bilind? Ez lava ji te dikim, min nede ezabê.»
29 Çimkî Îsa emir li ruhê nepak kiribû, ku ji wî mirovî derkeve. Wî
cinî pirr caran ew digirt. Bi ser ku ew bi qeyd û zincîran girêdayî
dihat girtin jî, dîsa wî qeyd dişkandin û cin ew diajot çol û ço-
listanan. 30 Îsa jê pirsî û got: «Navê te çi ye?» Wî got: «Lejyon*»,
ji ber ku gelek cin ketibûn wî. 31 Cinan ji Îsa lavlav kir, da ku ew
emir li wan neke, ku ew herin kortala* bêbinî. 32 Li wê derê
garaneke mezin a berazan li pala çiyê diçêrî. Cinan jê lava kir, ku
ew destûrê bide wan, da ku ew bikevin wan berazan. Wî jî destûr
da wan. 33 Îcar cin ji wî mirovî derketin û ketin berazan, garan jî çû
û xwe di kaşê re avêt golê û xeniqî. 34 Çaxê gavanan dît ku çi çêbû,
ew reviyan û ev xeber li nav bajêr û gundan belav kirin. 35 Îcar
xelk derketin, da ku bibînin, ka çi çêbûbû. Ew hatin ba Îsa û ew
mirovê ku cin jê derketibûn, bi cil û li ser hişê xwe li ber lingên Îsa
rûniştî dîtin û tirsiyan. 36 Yên ku ev tişt dîtibûn, ji wan re gotin, ka
çawa yê cinoyî* hat qenckirin. 37 Hingê tevahiya xelkê ji hawir-
dora Girasînê ji Îsa xwestin ku ew ji nav wan here, çimkî tirseke
mezin ketibû dilê wan. Îsa jî ket qeyikê û vegeriya. 38 Lê ew zilamê
ku cin ji wî derketibûn, lava ji Îsa kir, da ku ew li ba wî bimîne. Lê
Îsa ew rêkir û jê re got: 39 «Vegere mala xwe û eva ku Xwedê ji bo
te kiriye, bêje.» Ew jî çû û li nav tevahiya bajêr got ku Îsa çi ji wî
re kiriye.

### *Qencbûna Jinikê û Vejîna Keçikê*

*(Metta 9:18-26; Marqos 5:21-43)*

40 Gava Îsa vegeriya, elaletê ew qebûl kir, çimkî hemû li hê-
viya wî bûn. 41 Û serdarekî kinîştê hat, ku navê wî Yayîros bû. Wî
xwe avêt ber lingên Îsa û jê lava kir, ku ew pê re here mala wî.
42 Çimkî keçeke wî ya yekta hebû ku nêzîkî diwanzdeh salî bû û li
ber mirinê bû. Gava Îsa diçû, elalet bi ser wî de dizêriya. 43 Û jine-
ke ku ji diwanzdeh salan ve xwîn jê diçû û her tiştên ku wê abora
xwe pê dikir jî, dabû hekîman* û kesekî nikaribû wê qenc bike,
44 ji pişt ve hat û destê xwe li rêşiyên* kirasê Îsa da. Û di cih de
xwîna ku jê diçû çikiya. 45 Îsa pirsî: «Ew kî bû ku destê xwe li min

da?» Gava hemûyan înkar kir, Petrûs* got: «Hosta, elalet li te tê
hev û li te teng dikin.» 46 Lê Îsa got: «Yekî destê xwe li min da; ez
pê hesiyam, ku hêz ji min derket.» 47 Gava jinikê dît ku ew veşartî
nema, ew lerizî, hat û li ber wî xwe avêt erdê û li pêş tevahiya
xelkê got ku wê ji ber çi destê xwe li wî da û çawa ew di cih de
qenc bû. 48 Îsa ji wê re got: «Keça min, baweriya te tu qenc kirî. De
îcar bi silamet here.» 49 Hê Îsa dipeyivî, yek ji mala serdarê kinîştê
hat û got: «Keça te mir. Êdî mamoste newestîne.» 50 Gava Îsa ev
bihîst, lê vegerand û got: «Netirse, tenê bawer bike, keçik wê qenc
bibe!» 51 Gava ew hat xênî, wî nehişt ku ji bilî Petrûs*, Yûhenna*,
Aqûb* û dê û bavê keçikê kes bi wî re derbas bibe. 52 Hemû li ser
wê digirîn û şîn digirtin. Lê belê Îsa ji wan re got: «Negirîn, ew ne-
miriye, lê ew di xew de ye.» 53 Ew pê kenîn, çimkî wan dizanibû
ku keçik miriye. 54 Wî rahişt destê wê, gazî wê kir û got: «Keçikê,
rabe ser xwe!» 55 Îcar ruhê wê lê vegeriya û ew di cih de rabû ser
xwe. Û Îsa emir kir, ku tiştekî xwarinê bidinê. 56 Dê û bavê wê
heyirî man. Wî tembîh li wan kir, ku ew ji kesekî re nebêjin, ka çi
çêbûye.

### *Îsa Her Diwanzdeh Şagirtên Xwe Dişîne*
*(Metta 10:5-15; Marqos 6:7-13)*

9 Îsa her diwanzdeh şagirtên xwe civandin, li ser hemû cinan û ji
bo qenckirina nexweşiyan hêz û desthilatî da wan. 2 Wî ew şan-
din, da ku ew Padîşahiya Xwedê bidin bihîstin û nexweşan qenc
bikin 3 û ji wan re got: «Tiştekî ji bo rê bi xwe re nebin, ne dar, ne
tûr, ne nan, ne pere û ne jî du kiras. 4 Û xaniyê ku hûn bikevinê, li
wir bimînin û ji wir bidin rê. 5 Û li her dera ku ew we qebûl nekin,
ji wî bajarî derkevin û toza lingên xwe biweşînin, da ku ji bo wan
bibe şahidî.» 6 Şagirt derketin û gund bi gund geriyan. Wan Miz-
gînî* dida û li her derê nexweş qenc dikirin.

### *Hêrodêsê Serdar Şaş Dimîne*
*(Metta 14:1-12; Marqos 6:14-29)*

7 Û Mîr Hêrodês* her tiştê ku çêbûbû, bihîst û şaş ma, çimkî
hinan digot ku Yûhenna* ji nav miriyan rabûye; 8 hinekên din di-
gotin ku Êlyas* xuya bûye û hinan jî digot ku yek ji pêxemberên
berê ji nû ve rabûye. 9 Hingê Hêrodês got: «Min serê Yûhenna da

birrîn. Lê gelo, evê ku ez van tiştan li ser dibihîzim, kî ye?» Û
dixebitî, ku wî bibîne.

### *Îsa Pênc Hezar Mirov ji Pênc Nan û Du Masiyan Têr Dike*

*(Metta 14:13-21; Marqos 6:30-44; Yûhenna 6:1-14)*

10 Gava ku Şandî* vegeriyan, ji Îsa re her tiştê ku kiribûn, go-
tin. Wî ew bi xwe re birin û bi serê xwe çûn nêzîkî bajarekî bi navê
Beytsayda. 11 Îcar gava elaletê ev bihîst, ew li pey wî çûn. Wî ew
qebûl kirin û ji wan re li ser Padîşahiya Xwedê peyivî. Wî yên
hewcedarê saxbûnê, qenc dikirin. 12 Çaxê ku roj li ber ava bû, her
diwanzdeh hatin û jê re gotin: «Elaletê berde, da ku ew herin gun-
dên hawirdor û nav malan, xwarin û cihê razanê ji xwe re bibînin,
çimkî em li vir li cihekî bêpêjin in.» 13 Lê wî ji wan re got: «Hûn
xwarinê bidin wan!» Wan lê vegerand û gotin: «Ji pênc nan û du
masiyan pê ve, tiştekî me tune. Wekî din divê em herin û ji teva-
hiya vê elaletê re xwarinê bikirrin.» 14 Çimkî ew nêzîkî pênc hezar
mêr bûn. Îcar Îsa ji şagirtên xwe re got: «Wan kom bi kom, di her
yekê de li dor pêncî kesan bidin rûniştin.» 15 Şagirtan ji wusa kir û
hemû dan rûniştin. 16 Û wî rahişt her pênc nan û herdu masiyan,
çavên xwe ber bi ezmên ve hildan û şikir kir, ew şkandin û dan şa-
girtên xwe, da ku ew deynin ber elaletê. 17 Wan xwar û hemû têr
bûn û hê diwanzdeh selikên ji pariyên hûrbûyî yên ku ji ber wan
mabûn, dan hev.

### *Îsa Kî Ye?*

*(Metta 16:13-19; Marqos 8:27-29)*

18 Carekê, gava wî bi tenê dua dikir, şagirtên wî li ba wî bûn û
wî ji wan pirsî û got: «Li gor gotina xelkê ez kî me?» 19 Wan lê ve-
gerand û gotin: «Hin dibêjin Yûhennayê* imadkar e, hinek dibêjin
Êlyas* e û hinekên din jî dibêjin ku yek ji pêxemberên berê rabûye.»

### *Şahidiya Petrûs a li ser Îsa*

*(Metta 16:20-28; Marqos 8:30-9:1)*

20 Hingê wî ji wan pirsî: «Lê hûn çi dibêjin? Bi ya we ez kî
me?» Petrûs lê vegerand û got: «Tu Mesîhê* Xwedê yî!» 21 Îsa jî
tembîh li wan kir û hişk emir da wan, ku ew vê yekê ji kesekî re
nebêjin. 22 Wî got: «Divê Kurê* Mirov gelek cefayê bikişîne û ji ali-
yê rihspî, serekên kahînan* û Şerîetzanan* ve bê redkirin û kuştin

û roja sisiyan rabe.» 23 Û wî ji hemûyan re got: «Eger yek bixwaze
li pey min bê, bila ew xwe înkar bike, her roj rahêje xaça xwe û li
pey min bê. 24 Çimkî kî ku bixwaze jiyana xwe xilas bike, ewê wê
winda bike; lê kî ku jiyana xwe di ber min de winda bike, ewê wê
xilas bike. 25 Eger mirovek hemû dinyayê bi dest bixe jî, lê ew xwe
bi xwe winda bike, an ziyaneke mezin bigihîne xwe, çi feyda wî
heye? 26 Û kî ku ji ber min û gotinên min şerm bike, Kurê Mirov jî
gava ku bi rûmeta xwe, ya Bavê* xwe û ya milyaketên pîroz ve bê,
wê ji ber wî kesî şerm bike. 27 Ez rast ji we re dibêjim, hin ji van
kesên ku li vir radiwestin, heta ku ew Padîşahiya Xwedê nebînin,
ew mirinê qet tam nakin.»

### *Şagirt Îsa di Şewq û Rûmeta Wî de Dibînin*
*(Metta 17:1-8; Marqos 9:2-8)*

28 Îcar nêzîkî heşt rojan piştî van gotinan, wî Petrûs, Yûhenna û
Aqûb bi xwe re birin û hilkişiya ser çiyê, da ku dua bike. 29 Û gava
ku wî dua dikir, xuyabûna rûyê wî hat guhertin, cilên wî spî bûn û
şewq dan. 30 Û va ye, du zilam pê re dipeyivîn. Ew Mûsa* û Êl-
yas* bûn. 31 Ew di nav rûmetê de xuya bûbûn û li ser mirina wî, ya
ku wê li Orşelîmê biçûya serî, dipeyivîn. 32 Petrûs û yên pê re ke-
tibûn xewa giran; gava ew qenc hişyar bûn, wan rûmeta wî û herdu
zilamên pê re rawestayî dîtin. 33 Û çaxê ew ji wî veqetiyan, Petrûs
ji Îsa re got: «Ya Hosta, qenc e ku em li vir in. Ka em sê holikan
çêkin, yek ji te re, yek ji Mûsa re û yek jî ji Êlyas re.» Lê wî ni-
zanibû ku ew çi dibêje. 34 Îcar hê ew wusa dipeyivî, ewrek hat û li
ser wan kir sî. Çaxê ew ketin nav ewr, tirsiyan. 35 Û dengek ji ewr
hat û got: «Ev e Kurê min ê bijartî! Guhdariya wî bikin!» 36 Gava
ku deng sekinî, Îsa tenê ma. Û wan devê xwe girt û di wan rojan de
ji tiştê ku dîtibûn ji kesekî re tiştek negotin.

### *Îsa Cinê Nepak ji Kurikekî Derdixe*
*(Metta 17:14-18; Marqos 9:14-27)*

37 Dotira rojê, gava ew ji çiyê hatin xwarê, elaleteke mezin ber
bi wî ve hat. 38 Zilamekî ji nav elaletê bi dengekî bilind bang kir û
got: «Mamoste, ez lava ji te dikim, bi çavê rehmê li kurê min bi-
nêre. Ew yê min ê yekta ye. 39 Cinek wî digire, kurik ji nişkê ve dike
qîrîn û cin wî ji hev vedihejîne, heta kef bi ser devê wî dikeve, wî

bi şid dipelixîne û zû bi zû ji wî venaqete. 40 Min lava ji şagirtên te
kir, da ku ew wî derxin, lê wan nikaribû.» 41 Îsa lê vegerand û got:
«Hey nifşê* bêbawer û jirêderketî, ma ezê heta kengê bi we re bim
û li we sebir bikim? Ka kurê xwe bîne vir!» 42 Lê hê ew di rê de,
cin ew avêt erdê û ji hev vehejand. Û Îsa li ruhê nepak hilat, kurik
qenc kir û ew li bavê wî vegerand. 43 Îcar ew hemû li mezinahiya
Xwedê gelek şaş diman.

### *Îsa Careke Din li ser Mirin û Rabûna Xwe Dipeyive*

*(Metta 17:22-23; Marqos 9:30-32)*

Gava hê hemû li tiştên ku Îsa kiribûn gelek şaş diman, wî ji
şagirtên xwe re got: 44 «Van gotinan bixin guhên xwe: Kurê Mirov
wê bikeve nav destên mirovan.» 45 Lê wan ev gotin fêm nekir. Ew
ji wan veşartî bû, da ku ew tênegihîjin. Û ew ditirsiyan ku li ser vê
gotinê jê bipirsin.

### *Yê Mezin Kî Ye?*

*(Metta 18:1-5; Marqos 9:33-37)*

46 Û devjenî ket nav wan, ka di nav wan de yê herî mezin kî ye.
47 Lê Îsa bi fikrên dilê wan dizanî, zarokek anî, li tenişta xwe danî
48 û ji wan re got: «Kî ku vê zarokê bi navê min qebûl bike, ew min
qebûl dike û kî ku min qebûl bike, yê ku ez şandime qebûl dike.
Çimkî yê ku di nav we hemûyan de yê herî biçûk e, ew yê mezin e.»

### *Yê ku ne li Dijî We Ye, ji Aliyê We Ye*

*(Marqos 9:38-40)*

49 Yûhenna jê re got: «Ya Hosta, me mirovek dît, bi navê te cin
derdixistin, lê me nehişt, çimkî ew bi me re li pey te nayê.» 50 Îsa jê
re got: «Rê lê negirin, ji ber ku yê ne li dijî we ye, ew ji aliyê we
ye.»

### *Gundekî Sameriyan Îsa Qebûl Nake*

51 Çaxê rojên hilkişandina wî nêzîk dibûn, Îsa berê xwe da Or-
şelîmê, da ku here wê derê. 52 Îcar wî qasid li pêşiya xwe şandin.
Ew çûn gundekî Sameriyan*, da ku amadekariyê jê re bikin. 53 Lê
wan ew qebûl nekir, ji ber ku wî berê xwe dabû Orşelîmê. 54 Îcar
gava şagirtên wî Aqûb û Yûhenna ev yek dîtin, gotin: «Ya Xudan,
tu dixwazî, ku em emir bikin, da ku agir ji ezmên bibare û wan

helak bike?» 55 Lê ew zivirî û li wan hilat. 56 Piştre ew çûn gunde-
kî din.

### *Şertên Çûna li pey Îsa Çi Ne*
*(Metta 8:19-22)*

57 Çaxê ew rêve diçûn, yekî jê re got: «Tu herî ku derê, ezê li
pey te bêm.» 58 Îsa jê re got: «Kunên roviyan û hêlînên teyrên
ezmanan hene, lê cihek tune ku Kurê Mirov serê xwe lê deyne.»
59 Wî ji yekî din re got: «Li pey min were!» Lê wî got: «Ezbenî,
destûrê bide min, ku ez pêşî herim bavê xwe veşêrim.» 60 Îsa jê re
got: «Bihêle, bila mirî miriyên xwe veşêrin, heçî tu yî, tu here û
Mizgîniya Padîşahiya Xwedê bide!» 61 Yekî din jî got: «Ya Xudan,
ezê li pey te bêm, lê pêşî destûrê bide min, ku ez xatirê xwe ji
maliyên xwe bixwazim.» 62 Îsa jê re got: «Çi kesê ku destê xwe
deyne ser halet û paş ve binêre, ew ne hêjayî Padîşahiya Xwedê
ye.»

### *Şandina Heftê Şagirtî*

10 Piştî vê yekê Xudan heftê şagirtên din jî hilbijartin û ew
dido dido li pêşiya xwe şandin her bajar û her cihê ku ew bi
xwe wê biçûyayê. 2 Wî ji wan re got: «Dexil gelek e, lê pale hindik
in. Loma ji xwediyê dexlê lava bikin, da ku ji bo dexla xwe pa-
leyan bişîne. 3 Herin! Ez we wek berxan dişînim nav guran. 4 Ne
kîsik, ne tûr û ne jî çaroxan bi xwe re bibin û di rê de silavê nedin
tu kesî. 5 Û kîjan mala hûn bikevinê, pêşî bêjin: ‹Silamet li ser vê
malê.› 6 Û eger mirovekî hêjayî aştiyê* li wir hebe, aştiya we wê li
ser wî bimîne; lê eger nebe, ewê dîsa li we vegere. 7 Îcar di wê
malê de bimînin, tiştê wan ê heyî, bixwin û vexwin, çimkî yê pale
hêjayî heqê xwe ye. Ji malekê neçin a din. 8 Û kîjan bajarê hûn
bikevinê û we qebûl bikin, tiştê ku bê ber we, bixwin. 9 Nexweşên
li wî bajarî qenc bikin û ji wan re bêjin: ‹Padîşahiya Xwedê nêzîkî
we bûye.› 10 Lê kîjan bajarê hûn bikevinê û we qebûl nekin, der-
kevin ser meydanên wî û bêjin: 11 ‹Em wê toza ku ji bajarê we bi
lingê me ve maye jî, li ber wijdana we diweşînin, lê vê bizanin ku
Padîşahiya Xwedê nêzîkî we bûye.› 12 Ez ji we re dibêjim, wê rojê
rewşa Sodomê wê ji rewşa wî bajarî çêtir be.

---

**9:54** 2 Padîşah 1:9-16 **10:12** Destpêkirin 19

### *Bajarên Bêbawerî*
*(Metta 11:20-24)*

13 «Wey li te Xorazînê! Û wey li te Beytsaydayê! Eger ew ke-
rametên ku di nav we de hatin kirin, di Sûr* û Saydayê de bihatana
kirin, wanê ji zû ve di xirarî* û di xweliyê de rûniştî tobe bikirana.
14 Lê belê di Roja Dawî de halê Sûr û Saydayê wê ji yê we çêtir be.
15 Û tu, hey Kefernahûmê, ma tê heta bi ezmên bilind bibî? Na, tê
heta bi diyarê* miriyan herî xwar! 16 Yê ku guhdariya we dike, ew
guhdariya min dike û yê ku we red dike, ew min red dike û yê ku
min red dike, ew wî yê ku ez şandime, red dike.»

### *Vegerîna Heftê Şagirtî*

17 Her heftê bi şahî vegeriyan û gotin: «Ya Xudan, cin jî bi
navê te bi ya me dikin.» 18 Wî ji wan re got: «Min dît ku çawa Îb-
lîs* wek birûskê ji ezmên ket. 19 Va ye, min desthilatî daye we, ku
hûn pê li mar û dûpişkan û hemû hêza dijmin bikin û tu tişt qet zi-
yanê nade we. 20 Lê belê bi vê şa nebin ku cin bi ya we dikin, lê bi
vê şa bin ku navên we li ezmanan hatine nivîsîn.»

### *Dilşabûna Îsa*
*(Metta 11:25-27; 13:16-17)*

21 Wê gavê Îsa bi Ruhê Pîroz gelek şa bû û got: «Ya Bavo*,
Xudanê erd û ezmên, ez ji te re şikir dikim, ku te ev tiştên ha ji
şehreza û zaneyan veşartine û ji zarokan re eşkere kirine. Erê,
Bavo, çimkî ev yek li te xweş hat. 22 Her tişt ji aliyê Bavê min ve ji
min re hatiye dayîn. Ji Bav pê ve kesek nizane Kur kî ye û ji bilî
Kur û yê ku Kur bixwaze bi wî bide eşkerekirin, kesek nizane, Bav
kî ye.» 23 Û wî berê xwe da şagirtan û bi taybetî ji wan re got:
«Xwezî bi wan çavên tiştên ku hûn dibînin, dibînin. 24 Çimkî ez ji
we re dibêjim ku gelek pêxember û padîşahan xwestin wan tiştên
ku hûn dibînin, bibînin, lê nedîtin. Xwestin wan tiştên ku hûn dibi-
hîzin, bibihîzin, lê nebihîstin.»

### *Mesela Sameriyê Dilpak*

25 Îcar Şerîetzanek rabû, ji bo ku Îsa biceribîne got: «Mamoste,
ma ez çi bikim, da ku ez bibim wêrisê jiyana herheyî?» 26 Îsa lê ve-
gerand û got: «Ma di Şerîetê de çi nivîsî ye? Tu çawa dixwînî?»

27 Wî lê vegerand û got: «‹Bi hemû dilê xwe, bi hemû canê xwe, bi
hemû hêza xwe û bi hemû hişê xwe ji Xudan, Xwedayê xwe hez
bike› û ‹Wek ku tu ji xwe hez dikî, ji cîranê xwe hez bike.›[a]» 28 Îsa
lê vegerand û got: «Te rast got, de îcar wusa bike, tê bijî.»
29 Lê wî xwest xwe rûspî derxe û ji Îsa re got: «Ma cîranê min
kî ye?» 30 Îsa lê vegerand û got: «Zilamek ji Orşelîmê daket xwarê
û çû bajarê Erîhayê. Ew ket nav destên rêbiran. Rêbiran ew tazî
kir, lê xistin û hema bêje nîvkuştî dev jê berdan û çûn. 31 Îcar bi
rasthatinî kahînek di wê riyê de dadiket. Gava wî ew dît, wî xwe jê
dûr kir û di aliyê din re bihûrî û çû. 32 Bi vî awayî yekî Lêwî* jî hat
wê derê, wî jî ew dît û di aliyê din re bihûrî û çû. 33 De îcar yekî
Samerî* jî rêwîtî dikir û hat ba wî. Gava wî ew dît, dilê wî pê şe-
witî. 34 Ew çû ba wî. Wî zeyt û şerab bi birînên wî de kirin û ew
girêdan. Wî ew li ser dewara xwe siwar kir, bir mêvanxaneyekê û
lê bû xweyî. 35 Roja din du zîv* derxistin, dan xwediyê mêvan-
xaneyê û jê re got: ‹Li vî mirovî bibe xweyî, her tiştê ku tu bêtir lê
serf bikî, gava ez vegerim, ezê bidim te.›
36 «Îcar, li gor dîtina te, kîjan ji van her siyan bû cîranê wî yê
ku ketibû destê rêbiran?» 37 Şerîetzan got: «Ewê ku dilê wî pê
şewitî.» Îsa got: «De îcar, tu jî here û wusa bike!»

### *Di Mala Merta û Meryemê de*

38 Û gava ew bi riya xwe ve diçûn, Îsa ket gundekî. Û jineke
ku navê wê Merta bû, ew qebûl kir mala xwe. 39 Xwişkeke wê jî
hebû ku navê wê Meryem* bû. Ew jî li ber lingên Xudan rûniştibû
û guhê xwe dida gotina wî. 40 Lê Merta bi gelek tiştan ve pirr mijûl
dibû. Ew hat ba Îsa û jê re got: «Ya Xudan, ma tu xema xwe jê
naynî ku xwişka min ez di kar de bi tenê hiştime? De jê re bêje ku
ew alî min bike.» 41 Xudan lê vegerand û got: «Merta, Merta, tu xema
gelek tiştan dixwî û xwe bi wan reht dikî, 42 lê tiştek bi tenê lazim e.
Meryem ew para qenc ji xwe re bijartiye û ew ji wê nayê standin.»

### *Duakirin*

*(Metta 6:9-13; 7:7-11)*

11 Carekê Îsa li cihekî dua dikir û gava wî dua xwe xilas kir,
yekî ji şagirtên wî jê re got: «Ya Xudan, ka me hînî dua-

---

[a] **10:27** Ji: Dubarekirina Şerîetê 6:5; Qanûna Kahîntiyê 19:18

kirinê bike, çawa ku Yûhenna şagirtên xwe hîn kirine.» 2 Îsa ji wan
re got: «Çaxê hûn dua bikin, bêjin:

Ya Bavo,
Navê te pîroz* be,
Bila Padîşahiya te bê.
3 Nanê me yê rojane, roj bi roj bide me.
4 Û li gunehên me bibihûre,
Çimkî em jî li hemû deyndarên xwe dibihûrin
Û me nebe ceribandinê.»

5 Û wî ji wan re got: «Kî ji we dostekî wî hebe û ew nîvê şevê
here ba wî û jê re bêje: ‹Dosto, ka sê nanan bi deyn bide min,
6 çimkî dostê min ji riyeke dûr hatiye ba min û tiştekî min tune ku
ez deynim ber wî.› 7 Û yê din jî ji hundir lê vegerîne û bêje: ‹Min
reht neke. Êdî derî girtî ye û zarokên min li ba min di nav nivînan
de ne. Ez nikarim rabim û bidim te.› 8 Ez ji we re dibêjim, eger ew
ji bo dostaniyê ranebe û nede wî jî, ewê ji ber bêerziya wî rabe û çi
jê re lazim be, wê bide wî. 9 Û ez ji we re dibêjim:

Bixwazin, wê ji we re bê dayîn,
Lê bigerin, hûnê bibînin,
Li derî bixin, ewê ji we re vebe.
10 Çimkî yê ku dixwaze, distîne
Û yê ku digere, dibîne
Û yê ku li derî dixe, jê re vedibe.

11 Ka di nav we de bavek heye ku kurê wî masiyekî jê bixwaze û
ew di şûna masî de marekî bide wî? 12 An ku ew hêkekê bixwaze û
ew dûpişkekî bide wî? 13 Bi ser ku hûn xerab in jî, hûn dizanin di-
yariyên qenc bidin zarokên xwe. Îcar Bavê* ezmanî hê çiqas bêtir
wê Ruhê Pîroz bide wan ên ku ji wî dixwazin.»

### *Derxistina Cinan*

*(Metta 12:22-30; Marqos 3:20-27)*

14 Îsa cinekî lal derdixist û gava ku cin derket, yê lal peyivî û
elalet şaş ma. 15 Lê hinekan ji wan got: «Ew bi serekê cinan Bel-

---

**11:2** Bi gotineke din: «Bila mirov qedrê navê te yê pîroz (bimbarek) bigire». Binêre: Hezekiyêl 36:23.

zebûl*, cinan derdixe.» [16] Hinekên din ji bo ku wî biceribînin, nî-
şanek ji ezmên jê dixwestin. [17] Lê Îsa bi fikrên dilê wan dizanî û ji
wan re got: «Her padîşahiya ku di nav wê de dubendî hebe, wêran
dibe û mal li hember malê derdikeve. [18] Û eger Îblîs li dijî xwe bi
xwe rabe, padîşahiya wî wê çawa bimîne? Çimkî hûn dibêjin ku ez
bi Belzebûl* cinan derdixim. [19] Eger ez bi Belzebûl cinan derxim,
ma yên ku li pey we tên wan bi kê derdixin? Ji ber vê yekê ewê
bibin dadgerên* we. [20] Lê eger ez bi tiliya Xwedê cinan derdixim,
nexwe hingê Padîşahiya Xwedê gihîştiye we. [21] Çaxê yekî çekdar û
bi hêz qesra xwe diparêze, tiştên wî di ewlehiyê de dimînin. [22] Lê
çaxê yekî ji wî bihêztir bavêje ser wî û bikare wî, wê hemû çekên wî
yên ku ew li wan ewle dibû, bistîne û talan leva* bike. [23] Yê ku ne bi
min re ye, li hember min e û yê ku bi min re nacivîne, belav dike.

### *Vegerîna Ruhê Xerab*
*(Metta 12:43-45)*

[24] «Çaxê ruhê nepak ji mirov derdikeve, ew li cihên bê av
digere ku rihetiyê bibîne, lê nabîne. Hingê ew dibêje: ‹Ezê vegerim
mala xwe ya ku ez jê derketime.› [25] Îcar tê û dibîne ku ew maliştî û
xemilandî ye. [26] Hingê ew diçe û heft ruhên din ên ji xwe xerabtir
tîne û ew dikevinê û li wir rûdinin. Êdî halê wî mirovî yê dawî ji
yê pêşî xerabtir dibe.»

### *Xwezîtiya Rast*

[27] Çaxê Îsa hê ev tişt digotin, jinekê ji elaletê dengê xwe hilda
û ji wî re got: «Xwezî bi wî zikê ku tu aniyî û bi wan çiçikên ku tu
mêjandiyî.» [28] Lê wî got: «Rast e, lê hê bêtir xwezî bi wan ên ku
peyva Xwedê dibihîzin û pêk tînin!»

### *Nîşanan Dixwazin*
*(Metta 12:38-42; Marqos 8:12)*

[29] Û çaxê ku elalet li dor wî zêde dibû, Îsa dest bi gotinê kir:
«Ev nifşê ha nifşekî xerab e, li nîşanekê digere û ji nîşana Ûnis*
pêxember pê ve, nîşaneke din ji wan re nayê dan. [30] Çawa ku Ûnis
ji xelkê Nînewê re bûye nîşan, Kurê Mirov jî wê ji vî nifşî re wusa
be. [31] Şahbanûya* Başûr wê di Roja Dawî de bi xelkê vî nifşî re

---

**11:30** Ûnis 3

rabe û wan sûcdar derxe; çimkî ew ji kujên dinyayê hat, da ku
guhdariya şehrezayiya Silêman* bike û va ye, yekî ji Silêman
meztir li vir e. 32 Di Roja Dawî de xelkê Nînewê wê bi vî nifşî re
rabin û wan sûcdar derxin, çimkî wan bi danezana Ûnis tobe kir û
va ye, yekî ji Ûnis meztir li vir e.

### *Çira Bedena Te Çavê Te Ye*

*(Metta 5:15; 6:22-23)*

33 «Tu kes çirayê pênaxe û danayne cihekî veşartî, an jî naxe
bin melkebê, lê datîne ser pêçirayê, da yên ku dikevin hundir, rona-
hiyê bibînin. 34 Çira bedena te çavê te ye. Eger çavê te saxlem be,
hemû bedena te jî dibe ronahî, lê eger çavê te xerab be, bedena te jî
dibe tarî. 35 Îcar hay ji xwe hebe ku ronahiya di dilê te de nebe tarî.
36 Eger bedena te hemû ronahî be û tu dera tarî tê de nebe, ew hemû
wusa ronahî dibe, wek ku çirayek bi şewqa xwe te ronahî dike.»

### *Îsa Fêrisiyan û Şerîetzanan Neheq Dike*

*(Metta 23:1-36; Marqos 12:38-40; Lûqa 20:45-47)*

37 Çaxê Îsa dipeyivî, yekî Fêrisî* ew vexwend, ku li ba wî
xwarinê bixwe. Ew jî çû û li ser sifrê rûnişt. 38 Lê gava yê Fêrisî dît
ku ji berî xwarinê wî destê xwe li gor adeta wan neşuşt, şaş ma.
39 Lê Xudan ji wî re got: «Hûn Fêrisî derveyê tas û sêniyan paqij
dikin, lê hundirê we ji tiştên talankirî û xerabiyê tije ye. 40 Hey bê-
aqilno, ma yê derve çêkirî hundir jî çênekiriye? 41 Lê ya qenc ew e
ku hûn ji tiştên xwe yên hundir xêran bidin, hingê her tişt wê ji we
re paqij bibe. 42 Lê belê wey li we Fêrisiyan! Hûn dehyeka* pûng,
catir û hemû cûreyên pincarê didin, lê belê hûn dev ji dadperwerî*
û hezkirina Xwedê berdidin. Diviya we ev bikirana û dev ji yên
din jî bernedana. 43 Wey li we Fêrisiyan! Hûn di kinîştan* de ji
kursiyê pêşî û di sûkan de ji silav standinê hez dikin. 44 Wey li we!
Hûn wek wan gorên nenas in, yên ku mirovên li ser wan digerin, bi
wan nizanin.»

45 Û yekî ji Şerîetzanan li Îsa vegerand û got: «Mamoste, bi
van gotinan tu me jî şermezar dikî.» 46 Lê Îsa lê vegerand û got:
«Wey li we jî, hûn Şerîetzanno! Hûn barên ku hilgirtina wan zeh-
met e, didin pişta mirovan û hûn bi xwe tiliyeke xwe jî nadin wan

---

11:31 1 Padîşah 10:1-13

baran. [47] Wey li we! Hûn qubên pêxemberan çêdikin, yên ku bi
destê bav û kalên we hatine kuştin. [48] Bi vî awayî hûn şahidiyê di-
kin ku hûn kirinên bav û kalên xwe erê dikin, çimkî wan pêxember
kuştin û hûn jî qubên wan çêdikin. [49] Ji ber vê yekê jî Şehrezayiya
Xwedê got: ‹Ezê ji wan re pêxemberan û şandiyan* bişînim. Wê
hin ji wan bikujin û tengahiyê bidin hinan jî›, [50] da ku xwîna hemû
pêxemberan a ku ji damezrandina dinyayê ve hatiye rijandin, ji vî
nifşî bê xwestin, [51] ji xwîna Habîl* heta xwîna Zekerya, yê ku di
navbera gorîgeh* û Perestgehê* de hat kuştin. Erê, ez ji we re di-
bêjim ku wê ji vî nifşî bê xwestin. [52] Wey li we Şerîetzanan! We
rahiştiye mifta zanînê; hûn bi xwe neketin hundir û yên dixwestin
bikevin hundir jî, we nehişt bikevinê.» [53] Çaxê Îsa ji wir derdiket,
Şerîetzan û Fêrisiyan, li ser gelek tiştan pirs ji wî kirin û ew dan
tengiyê. [54] Ew li ber wî letabûn*, da ku xeberekê ji devê wî bigirin.

### *Durûtî*

12 Di wê demê de, çaxê ku xelk bi hezaran civiya, wusa ku
pêlhev dikirin, Îsa pêşî ji şagirtên xwe re dest pê kir û got:
«Xwe ji hevîrtirşkê Fêrisiyan biparêzin. Ew durûtî ye. [2] Tiştekî ni-
xumandî tune ku xuya nebe û tiştekî veşartî tune ku neyê zanîn. [3] Ji
ber vê yekê her tiştê ku we di tariyê de gotiye, wê di ronahiyê de
bê bihîstin û tiştê ku we di odeya hundir de di guh de gotiye, wê li
ser banan bê gazîkirin.

### *Bizanin ku Divê Tirsa We ji Kê Hebe*

*(Metta 10:28-31)*

[4] «Lê ez ji we dostên xwe re dibêjim: Ji wan netirsin, yên ku
bedenê dikujin û ji wê pê ve nikarin tiştekî xerabtir bikin. [5] Lê ez
nîşanî we bidim ku hûnê ji kê bitirsin: Ji wî bitirsin, yê ku piştî
dikuje, dikare bavêje dojehê*; erê, ez ji we re dibêjim ku ji wî bi-
tirsin! [6] Ma pênc çivîk bi du peran nayên firotin? Lê dîsa Xwedê
yek ji wan jî ji bîr nekiriye. [7] Wusa jî hemû mûyên serê we hijmartî
ne. Loma netirsin, hûn ji gelek çivîkan hêjatir in.

### *Eşkerekirin an Înkarkirina Îsa li ber Mirovan*

*(Metta 10:32-33; 12:32; 10:19-20)*

[8] «Û ez ji we re dibêjim: Her kesê ku min li ber mirovan eşkere
bike, Kurê Mirov jî wê wî li ber milyaketên Xwedê eşkere bike,

9 lê yê ku min li ber mirovan înkar bike, ewê li ber milyaketên
Xwedê bê înkarkirin. 10 Û her kesê ku li dijî Kurê Mirov peyvekê
bêje, wê li wî bê bihûrtin, lê yê ku li dijî Ruhê Pîroz çêrekê* bike,
li wî nayê bihûrtin. 11 Çaxê we bibin kinîştan, ber serek û hukum-
daran, xeman nexwin kù hûnê çawa xwe biparêzin an çi bêjin.
12 Çimkî Ruhê Pîroz wê di wê demê de hînî we bike, ka divê hûn çi
bêjin.»

### *Mesela Dewlemendê Bêaqil*

13 Yekî ji nav elaletê ji Îsa re got: «Mamoste, ji birayê min re
bêje, da ku ew mîrasê bi min re leva* bike.» 14 Lê Îsa jê re got:
«Camêr, kê ez li ser we kirime dadger* an levaker?»
15 Û ji wan re got: «Hay ji xwe hebin û xwe ji her cûreyê çav-
birçîtiyê biparêzin. Çimkî jiyana mirov ne bi pirrbûna malê wî ye.»
16 Û wî meselek ji wan re got: «Erdê mirovekî dewlemend gelek
ber da. 17 Ew difikirî û wî di dilê xwe de got: ‹Hew cih maye ku ez
dexla xwe bêximê. Gelo ez çi bikim?› 18 Û got: ‹Ezê weha bikim:
Ezê hemû embarên xwe xera bikim, hinekên meztir ava bikim û
ezê hemû dexil û malê xwe di wan de kom bikim. 19 Êdî ezê ji xwe
re bêjim: Ya canê min, te ji xwe re têra gelek salan mal hilaniye.
De rûne, bixwe, vexwe û kêfê bike.› 20 Lê Xwedê jê re got: ‹Bêa-
qilo, îşev canê te wê ji te bê xwestin. Îcar ew malê ku te hilaniye
wê ji kê re bimîne?›
21 «Ha ev e, halê wî kesê ku ji xwe re xezîneyan dicivîne û di
çavê Xwedê de ne dewlemend e.»

### *Xeman Nexwin!*

*(Metta 6:25-34)*

22 Û Îsa ji şagirtên xwe re got: «Ji ber vê yekê ez ji we re dibê-
jim, ji bo jiyana xwe xeman nexwin ka hûnê çi bixwin û ne jî ji bo
bedena xwe ka hûnê çi li xwe bikin. 23 Çimkî jiyan di ser xwarinê û
beden di ser lixwekirinê re ye. 24 Li qirikan binêrin, ew ne diçînin,
ne jî didirûn, ne kewarên wan, ne jî embarên wan hene û Xwedê
dîsa jî wan xweyî dike; hûn çiqasî ji teyrikan hêjatir in! 25 Kî ji we
bi xemxwarinê dikare kêlîkekê bi ser jiyana xwe ve dirêj bike?
26 Loma, madem hûn nikarin tiştê herî biçûk jî bikin, çima hûn ji
bo tiştên din xeman dixwin?
27 «Li sosinan binêrin, çawa mezin dibin; ew ne dixebitin, ne jî

rîs dirêsin. Lê ez ji we re dibêjim, Silêman* jî di hemû rûmeta xwe
de wek yeke ji wan li xwe nekiribû. 28 Îcar, eger Xwedê giyayê ku
îro di zeviyê de heye û sibê di tendûrê de tê şewitandin, bi vî awayî
bi cil dike, ewê çiqas bêtir we bi cil bike, ey kêmîmanno? 29 Hûn li
xwarin û vexwarina xwe negerin û xeman nexwin, 30 çimkî hemû
miletên dinyayê li van digerin, lê Bavê we dizane ku hûn hew-
cedarê van tiştan in. 31 Lê belê hûn li Padîşahiya wî bigerin û ev
tiştên ha jî wê ji we re bên dayîn. 32 Ya keriyê biçûk, netirse, çimkî
li Bavê we xweş hat ku Padîşahiyê bide we.

### *Xezîna li Ezmanan*
*(Metta 6:19-21)*

33 «Çi tiştê we heye bifiroşin û bikin xêr, ji xwe re kîsikên ku
kevin nabin û xezînên ku li ezmanan kêm nabin, çêkin; li wê derê
diz nêzîk nabe û bizûzk jî naxwe. 34 Çimkî xezîna we li ku derê be,
dilê we jî wê li wê derê be.

### *Xulamê Hişyar*
*(Metta 24:45-51)*

35 «Bila pişta we girêdayî be û çirayên we pêketî bin. 36 Hûn jî
wek wan mirovan bin ên ku li hêviya axayê xwe sekinîne, da ku
çaxê ew ji dawetê vegere û li derî bixe di cih de bikarin ji wî re
vekin. 37 Çi xwezî bi wan xulamên ku gava axayê wan bê, ew wan
hişyar bibîne! Bi rastî ez ji we re dibêjim, ewê pişta xwe girêde,
wan li ser sifrê bide rûniştin û wê bê, xizmetê ji wan re bike. 38 Eger
ew di nobeta diduyan de an di nobeta sisiyan de bê û wan xulaman
weha bibîne, çi xwezî bi wan xulaman! 39 Lê vê bizanin, eger mal-
xwê malê bizaniya, ku diz wê di kîjan saetê de bê, ewê hişyar bima
û nedihişt ku ew bikeve xaniyê wî. 40 Hûn jî amade bin, çimkî
Kurê Mirov wê di saetekê de bê, ku ne di gumana we de ye.»
41 Petrûs got: «Ya Xudan, tu vê meselê ji me re an ji hemûyan
re jî dibêjî?» 42 Û Xudan got: «Ew şahneyê* dilsoz û şehreza kî ye,
yê ku axayê wî ew daniye ser xulamên xwe, da ku xwarina wan di
dema wan de bide wan. 43 Xwezî bi wî xulamê ku gava axayê wî
bê, wî li ser karê wî bibîne. 44 Ez rast ji we re dibêjim, ewê wî
deyne ser hemû malê xwe. 45 Lê eger ew xulam di dilê xwe de
bêje: ‹Axayê min di hatina xwe de dereng dimîne› û dest pê bike li

xulam û xadiman bixe, bixwe û vexwe û serxweş bibe, [46] axayê wî
xulamî wê di rojekê de bê, ku ew ne li hêviya wî ye û di saetekê de
ku ew pê nizane û wê wî perçe perçe bike û para wî bi bêbaweran
re bide. [47] Ew xulamê ku daxwaza axayê xwe dizane jî, lê amadekarî
nekiriye û ne jî li gor daxwaza axayê xwe kiriye, wê gelek lêdanê
bixwe. [48] Lê ewê ku nizane û tiştên hêjayî lêdanê kirine, wê hin-
dik lêdanê bixwe. Ji kê re gelek hatibe dayîn, wê gelek ji wî bê
xwestin û ji kê re gelek hatibe spartin, wê ji wî bêtir bê xwestin.

### *Îsa Dibe Sedemê Cudabûnê*

*(Metta 10:34-36)*

[49] «Ez hatime, ku agir bavêjim ser erdê û min çiqas dixwest ku
ew ji niha ve pêketî bûya! [50] Lê imadeke* min heye ku divê ez pê
imad bibim û ez çiqas reht im, heta ku ew temam bibe. [51] Ma hûn
guman dikin ku ez hatime aştiyê* bînim dinyayê? Ez ji we re di-
bêjim: Na, lê belê ez hatime, da ku ez dubendiyê bînim. [52] Ji niha û
pê ve, di malekê de pênc wê hebin, sisê li hember diduyan û dido li
hember sisiyan wê dubendiyê bikin. [53] Bav wê li dijî kur rabe û kur
li dijî bav, dê li dijî keçê û keç li dijî dê, xesû li dijî bûkê û bûk wê
li dijî xesûyê rabe.»

### *Nîşanên Zemên*

*(Metta 16:2-3; Metta 5:25-26)*

[54] Îsa ji elaletê re jî got: «Çaxê hûn dibînin ku ewrek ji Roja-
vayê bilind dibe, di cih de hûn dibêjin: ‹Baran wê bibare› û wusa jî
çêdibe. [55] Û çaxê bayê başûr tê, hûn dibêjin ku wê gelekî bibe
germ û wusa dibe. [56] Hey durûno! Hûn li erd û ezmên dinêrin û
dizanin ku hewa wê çawa be; lê çawa hûn vê demê fêm nakin? [57] Û
çima hûn ji ber xwe nawezinînin, ka ya rast çi ye? [58] Loma çaxê tu
bi sûcdarkerê xwe re herî dadgehê*, di rê de bixebite, ku tu ji wî
xilas bibî, da ku ew te nekişîne ber dadger û dadger te nede destê
karbidest û karbidest jî te neavêje zîndanê. [59] Ez ji te re dibêjim,
heta ku tu polê* paşî jî nedî, tu ji wê derê qet dernakevî.»

### *Tobe Bikin, da ku Hûn Helak Nebin*

13 Di wê demê de hinek li wir bûn û ji Îsa re li ser wan Ce-
lîliyan digotin, yên ku Pîlatos xwîna wan tevli qurbanên
wan kiribû. [2] Îsa li wan vegerand û got: «Ma hûn guman dikin ku

ev Celîlî ji hemû Celîliyên din gunehkartir bûn ku ev yek hat serê
wan? [3] Ez ji we re dibêjim: Na! Lê belê eger hûn tobe nekin, hûn
jî, hûnê hemû wusa helak bibin. [4] An ew her hejdehên ku birca li
Sîlwamê bi ser wan de ket û ew kuştin, ma hûn guman dikin ku
sûcên wan ji sûcên wan hemûyên ku li Orşelîmê rûdinin, bêtir
bûn? [5] Ez ji we re dibêjim: Na! Lê belê eger hûn tobe nekin, hûn jî,
hûnê hemû wusa helak bibin.»

### *Mesela Hêjîra Bêber*

[6] Wî ev mesele jî got: «Di rezê mirovekî de dareke hêjîrê çandî
hebû. Ew hat, da ku li berê darê bigere, lê nedît. [7] Wî ji yê rezvan
re got: ‹Ev sê sal e, ez têm û li berê vê dara hêjîrê digerim û ez
nabînim. Wê bibire! Ji bo çi ewê erdê jî bêkêr bike.› [8] Yê rezvan lê
vegerand û got: ‹Ezbenî, îsal jî wê bihêle, heta ku ez hawirdora wê
bikolim û zibil bikim. [9] Eger ev sala ku bê, wê ber da, qenc e, lê
eger neda, hingê wê bibire.›»

### *Roja Şemiyê Îsa Jineke Qof Qenc Dike*

[10] Rojeke Şemiyê Îsa di kinîştekê de hîn dikir. [11] Li wir jinek
hebû ku ji hejdeh salan ve ruhekî nexweşiyê pê re hebû. Ew qof
bûbû û nedikarî xwe rast bike. [12] Gava Îsa ew dît, gazî wê kir û ji
wê re got: «Jinê, tu ji nexweşiya xwe azad bûyî!» [13] Wî destên xwe
danîn ser wê, jinik di wê gavê de rast bû û pesnê Xwedê dida. [14] Lê
serekê kinîştê bi hêrs ket ku Îsa di roja Şemiyê de sax kir. Wî dest
pê kir û ji xelkê re got: «Şeş roj hene ku divê mirov di wan de kar
bike. Ne di roja Şemiyê de, lê di wan rojan de werin û ji nexweşiyên
xwe qenc bibin.» [15] Lê Xudan lê vegerand û got: «Hey durûno! Ma
her yek ji we roja Şemiyê ga, an kerê xwe ji afir venake û nabe ser
avê? [16] Îcar eva ha ya ku keçeke Birahîm* e û ev hejdeh sal bû, Îb-
lîs ew girêdabû, ma bila ew di roja Şemiyê de ji vê qeyda ha nehata
vekirin?» [17] Gava wî ev tişt gotin, neyarên wî hemû fihêt bûn û teva-
hiya elaletê bi wan kerametên birûmet ên ku wî dikirin, şa dibûn.

### *Du Meseleyên li ser Padîşahiya Xwedê: Liba Xerdelê û Hevîrtirşk*
*(Metta 13:31-33; Marqos 4:30-32)*

[18] Îcar Îsa got: «Padîşahiya Xwedê mîna çi ye? Û ez wê bimî-
nînim çi? [19] Ew dimîne vê yekê: Mirovekî libeke xerdelê bir û avêt

baxçê xwe. Ew şîn bû û bû dar û teyrên ezmên hêlînên xwe di nav
çiqilên wê de çêkirin.»
20 Û wî dîsa got: «Ma ez Padîşahiya Xwedê bimînînim çi?
21 Ew mîna hevîrtirşk e ku jinekê hilda û xist nav sê çap* ar, heta
hemû tirş bû.»

### *Deriyê Teng*
*(Metta 7:13-14, 21-23)*

22 Û Îsa di gund û bajaran re derbas dibû, hîn dikir û ber bi Or-
şelîmê ve diçû. 23 Hingê yekî jê re got: «Ya Xudan, ma yên ku wê
xilas bibin, hindik in?» Wî ji wan re got: 24 «Li ber xwe bidin, ku
hûn di deriyê teng re derbas bibin, çimkî ez ji we re dibêjim, gelek
wê lê bigerin ku bikevin hundir û nikarin. 25 Piştî ku malxwê malê
rabe û derî bigire, hûnê li derve bimînin, dest pê bikin li derî bixin
û bêjin: ‹Ya Xudan, ji me re veke!› Hingê ewê li we vegerîne û ji
we re bêje: ‹Ez nizanim hûn ji ku derê ne.› 26 Hingê hûnê dest pê
bikin û bêjin: ‹Me li ber te xwar û vexwar û te di kuçeyên me de
hîn kir.› 27 Lê ewê bêje: ‹Ez ji we re dibêjim ku ez nizanim hûn ji
ku derê ne. Ji min dûr kevin, hey hûn hemû yên ku neheqiyê
dikin!› 28 Li wir wê bibe girîn û qirçîna diranan, gava hûn Bi-
rahîm*, Îshaq*, Aqûb* û hemû pêxemberan di Padîşahiya Xwedê
de, lê xwe li derve avêtî bibînin. 29 Xelk wê ji Rojhilat û Rojava, ji
Bakur û Başûr bên û di Padîşahiya Xwedê de li ser sifrê rûnin.
30 Va ye, hin ên paşî wê bibin ên pêşî û hin ên pêşî wê bibin ên
paşî.»

### *Îsa li ser Orşelîmê Dilorîne*
*(Metta 23:37-39)*

31 Wê gavê hinek Fêrisî hatin û ji Îsa re gotin: «Rabe ji vê derê
here, çimkî Hêrodês dixwaze te bikuje.» 32 Û wî ji wan re got:
«Herin, ji wî roviyî re bêjin: ‹Va ye, ez îro û sibê cinan derdixim,
nexweşan qenc dikim û roja sisiyan karê min temam dibe.› 33 Lê
belê divê ez îro, sibê û dusibe bi riya xwe ve herim, çimkî nabe ku
pêxemberek ji derveyî Orşelîmê bê kuştin. 34 Wax Orşelîm, heywax
Orşelîma ku pêxemberan dikuje û wan ên ku ji wê re hatin şandin,
dide ber keviran! Ka çawa mirîşk çîçikên xwe di bin çengên xwe
de dicivîne, çend caran min jî xwest ku ez zarokên te bicivînim, lê

we nexwest! 35 Va ye, mala we wê bi hêviya we ve bimîne. Ez ji
we re dibêjim, êdî hûn min qet nabînin, heta wî çaxê ku hûn bêjin:
‹Pîroz be yê ku bi navê Xudan tê!›[a]»

### *Îsa li Mala Yê Fêrisî Mirovekî Nexweş Qenc Dike*

14 Rojeke Şemiyê gava Îsa çû mala serekekî Fêrisiyan, ku
xwarinê bixwe, wan çavnêriya wî dikir. 2 Û mirovekî
nexweş, ku ava zer ji bedena wî dihat, li ber wî bû. 3 Û Îsa dest
pê kir û ji Şerîetzan û Fêrisiyan re got: «Ma di roja Şemiyê de
dibe ku nexweş bên qenckirin an na?» 4 Lê deng ji wan nehat. Û
wî rahişt yê nexweş, ew qenc kir û berda. 5 Piştre Îsa ji wan re got:
«Kî ji nav we ku kurê wî an gayê wî bikeve bîrekê, roja Şemiyê be
jî, wî di cih de jê dernaxe?» 6 Û wan nikaribû bersîva vê yekê
bidin.

### *Yên ku li Navê Xwe Digerin*

7 Gava wî dît ku yên vexwendî çawa cihên pêş ji xwe re dibi-
jêrin, wî ji wan re meselek got: 8 «Gava tu ji aliyê kesekî ve ji bo
dawetê bêyî vexwendin, li cihê pêş rûnene. Belkî yekî ji te bi qe-
dirtir ji aliyê wî ve hatibe vexwendin 9 û ew kesê ku hûn herdu
vexwendine, bê û ji te re bêje: ‹Cih bide vî!› Hingê tê rabî û bi
şermî li cihê herî paş rûnî. 10 Lê belê çaxê tu bêyî vexwendin, here,
li cihê herî paş rûne, da ku yê tu vexwendiyî bê û ji te re bêje:
‹Dosto, kerem bike, pêşve were!› Hingê tê li ber wan hemûyên bi
te re li ser sifrê rûniştî, serbilind bibî. 11 Çimkî her kesê ku xwe bi-
lind bike, wê bê nizimkirin û her kesê ku xwe nizim bigire, wê bê
bilindkirin.»

12 Îsa ji wî yê ku ew vexwendibû re jî got: «Gava ku tu fira-
vînekê an şîvekê çêkî, dostên xwe, birayên xwe, mirovên xwe û cî-
ranên xwe yên dewlemend venexwîne, da ku ew jî te dîsa vene-
xwînin û qenciya te li te venegerînin. 13 Lê belê çaxê tu ziyafetekê
çêkî, gazî belengaz, seqet, kulek û koran bike. 14 Hingê tê bextewar
bî, çimkî tiştekî wan tune ku li te vegerînin. Lê wê di Roja* Vejîna
mirovên rast de bergîdana te bê dayîn.»

---

[a] 13:35 Ji: Zebûr 118:26

### *Mesela Şîva Mezin*
*(Metta 22:1-10)*

15 Îcar yekî ji yên ku bi wî re li ser sifrê rûniştî bûn, gava ev
yek bihîst, ji Îsa re got: «Xwezî bi wî yê ku di Padîşahiya Xwedê
de nên bixwe!» 16 Lê Îsa ji wî re got: «Mirovekî şîveke mezin çêkir
û gelek xelk vexwendin. 17 Û çaxê şîvê xulamê xwe şand, da ku
gazî yên vexwendî bike û ji wan re bêje: ‹De werin, her tişt amade
ye.› 18 Û her yekî ji wan dest pê kir û lêbihûrtin ji xwe re xwest. Yê
pêşî jê re got: ‹Min erdek kiriye û divê, ez herim lê binêrim. Ez hê-
vî ji te dikim ku tu li min negirî.› 19 Û yekî din got: ‹Min pênc cot
ga kirrîne, ez diçim, wan biceribînim. Ez ji te hêvî dikim ku tu li
min negirî!› 20 Û yekî din jî got: ‹Min jin aniye û ji ber vê yekê ez
nikarim bêm.› 21 Yê xulam vegeriya û ev tişt ji axayê xwe re got.
Hingê malxwê malê hêrs ket û ji xulamê xwe re got: ‹Bi lez here
derve nav meydan û kolanên bajêr, belengaz, seqet, kor û kulekan
bîne hundir.› 22 Xulam got: ‹Ezbenî, emrê ku te da, pêk hat, lê hê jî
cih heye.› 23 Û axa ji xulam re got: ‹Rabe, derkeve ser rê û sêncan,
bi zorê xelkê bîne hundir, da ku mala min tije bibe. 24 Ez ji we re
dibêjim ku yek ji wan mirovên vexwendî, ji şîva min tam nake.›»

### *Mirov Çawa Dibe Şagirtê Îsa*
*(Metta 10:37-38)*

25 Elaleteke mezin bi Îsa re diçû. Ew ziviri û ji wan re got:
26 «Eger yek bê ba min û ji dê û bavê xwe, ji jin û zarok, xwişk û
birayên xwe, erê, heta ji jiyana xwe bi xwe nefret neke, ew nikare
bibe şagirtê min. 27 Û kî xaça xwe hilnegire û li pey min neyê, ni-
kare bibe şagirtê min. 28 Ma kî ji we ku bixwaze bircekê ava bike,
pêşî rûnane, mesrefa wê hesab nake, ka tiştên wî hene ku pê xilas
bike? 29 Nebe ku bingeh danîbe û nekare temam bike û hemû yên
ku wê yekê bibînin, dest pê bikin û tinazên xwe bi wî bikin 30 û bê-
jin: ‹Vî mirovî dest bi avakirinê kir û nikaribû bibe serî.› 31 An kî-
jan padîşah, çaxê here pêşiya padîşahekî din, da ku bi wî re bikeve
cengê, pêşî rûnane, naşêwire, ka ji wî tê, ku ew bi deh hezaran here
pêşiya wî yê ku bi bîst hezaran ve tê ser wî. 32 Eger na, ewê hê ji
dûr ve qasidan bişîne û jê hêvî bike, ku li hev bên. 33 Loma kî ji we
dev ji her tiştê xwe bernede, nikare bibe şagirtê min.

### *Xwêya Bê Tam*
*(Metta 5:13; Marqos 9:50)*

34 «Xwê qenc e, lê eger ew tama xwe winda bike, wê bi çi bê
bitamkirin? 35 Ew êdî ne bi kêrî axê û ne jî bi kêrî zibil tê, wê da-
vêjin derve. Ewê ku guhên wî ji bo bihîstinê hene, bila bibihîze!»

### *Mesela Miya Windabûyî*
*(Metta 18:12-14)*

15 Îcar hemû bacgir* û gunehkar ber bi Îsa ve hatin, da ku
guhdariya gotinên wî bikin. 2 Fêrisî û Şerîetzanan kirin pi-
tepit û gotin: «Evê ha, gunehkaran qebûl dike û bi wan re dixwe!»
3 Îsa ev mesele ji wan re got: 4 «Kî ji we, ku sed miyên wî
hebin û yek ji wan winda bibe, her not û nehên din li çolê nahêle û
naçe li ya windabûyî nagere, heta ku wê bibîne? 5 Û gava ew wê
bibîne, bi şahî wê datîne ser milê xwe 6 û vedigere mal, gazî dost û
cîranên xwe dike û ji wan re dibêje: ‹Hûn bi min re şa bin, ji ber ku
min miya xwe'ya windabûyî dît.› 7 Ez ji we re dibêjim, wusa jî li
ezmên, ji bo gunehkarekî ku tobe kiriye, ji not û neh rastên ku ne
hewcedarê tobekirinê ne, wê bêtir bibe şahî.

### *Mesela Zîvê Windabûyî*

8 «An kîjan jin, ku deh zîvên* wê hebin û yekî ji wan winda
bike, ew çirayê pê naxe û xênî namale û qenc lê nagere, heta wî
bibîne? 9 Û gava ew wî bibîne, ew bang dike dost û cîranên xwe û
ji wan re dibêje: ‹Hûn bi min re şa bin, ji ber ku min zîvê xwe yê
windabûyî dît.›
10 «Ez ji we re dibêjim: Wusa jî wê li ba milyaketên Xwedê ji
bo gunehkarekî ku tobe kiriye, bibe şahî.»

### *Mesela Kurê Windabûyî*

11 Û Îsa got: «Du kurên mirovekî hebûn. 12 Kurê biçûk ji bavê
xwe re got: ‹Bavo, ka ji malê xwe wê para ku ji min re dikeve,
bide min.› Wî jî malê xwe li wan leva kir.
13 «Piştî çend rojan kurê biçûk her tiştê xwe da hev û çû we-
latekî dûr. Li wir wî bi serserîtî malê xwe tert û bela kir. 14 Piştî ku
wî her tiştê xwe mezaxt, xelayeke dijwar bi ser wî welatî de hat.
Ew ket tengahiyê 15 û çû xwe li yekî ji xelkên wî welatî girt; wî jî
ew şand nav erdên xwe, ber berazan. 16 Îcar ew minêkar bû ku zikê

xwe bi wê xernûfa ku berazan dixwar, têr bike, lê kesekî ew jî
nedidayê. 17 Çaxê aqilê wî hat serê wî, wî got: ‹Ewqas palên bavê
min hene ku xwarin ji ber wan dimîne, lê ez li vê derê ji nêzan bi-
mirim. 18 Ezê rabim, li bavê xwe vegerim û jê re bêjim: Bavo, min
li ber te û li hember ezmên guneh kiriye. 19 Êdî ez ne hêja me ku ji
min re ‹kurê te› bê gotin. Min bike wek yekî ji paleyên xwe.›
20 «Û ew rabû, li bavê xwe vegeriya. Lê hê ji dûr ve bavê wî
ew dît û dilê wî bi kurê wî şewitî. Û ew bi lez ber bi wî ve çû û ew
da ber singê xwe û ramûsand. 21 Kurê wî jê re got: ‹Bavo, min li
ber te û li hember ezmên guneh kiriye. Êdî ez ne hêja me ku ji min
re kurê te bê gotin.› 22 Lê bav ji xulamên xwe re got: ‹Bilezînin û
herin xiftanê herî qenc bînin û li wî bikin, gustîlkekê bikin tiliya wî
û pêlavekê bixin lingên wî. 23 Conegayê dermalekirî bînin û ser-
jêkin, da ku em bixwin û şahiyê bikin, 24 çimkî ev kurê min mirî bû
û va ye, rabûye, ew windabûyî bû û va ye, hatiye dîtin.› Û dest bi
şahiyê kirin.
25 «Di wî çaxî de kurê wî yê mezin li zeviyê bû. Gava ew
vegeriya û nêzîkî malê bû, wî dengê stran û govendê bihîst. 26 Wî
gazî yekî ji xulaman kir û jê pirsî, ka çi bûye? 27 Yê xulam jê re
got: ‹Birayê te hatiye, bavê te conegayê dermalekirî serjêkiriye,
çimkî ew sax û silamet vegeriyaye.› 28 Birayê mezin hêrs ket û
nexwest ku here hundir. Bavê wî derket û jê hêvî kir. 29 Lê wî ji
bavê xwe re got: ‹Binêre, evqas sal in ku ez xizmeta te dikim û ez
tu caran ji gotina te derneketim, te kehrikek jî neda min, ku ez bi
dostên xwe re pê şa bibim. 30 Lê gava ev kurê te, yê ku malê te bi
fahîşeyan re xwar, vegeriya, te conegayê dermale ji wî re serjêkir.›
31 Wî lê vegerand û got: ‹Lawo, tu hergav bi min re yî û her tiştê
min, yê te ye. 32 Lê diviya em şa bibûna û me şahî bikira, çimkî ev
birayê te mirî bû û rabû, ew windabûyî bû û hat dîtin.›»

### *Mesela Şahneyê Bêbext*

16 Îsa ji şagirtên xwe re got: «Mirovekî dewlemend hebû ku
şahneyekî* wî hebû. Rojekê giliyê vî şahneyî li ba axayê
wî hat kirin ku ew malê wî tert û bela dike. 2 Yê dewlemend gazî
wî kir û jê re got: ‹Ev çi ye ku ez li ser te dibihîzim? Ka hesabê
şahnetiya xwe bide, ji ber ku êdî tu nikarî şahnetiyê bikî.› 3 Şahne
jî ji xwe re got: ‹Ka ezê çi bikim? Axayê min şahnetiyê ji min

distîne. Kolan ji min nayê ku ez bikim û ez ji parskirinê şerm di-
kim. 4 Lê gava ku ez ji şahnetiyê bêm derxistin, ez dizanim ezê çi
bikim, da ku dîsa xelk min qebûl bikin malên xwe.› 5 Wî bang kir
her yekî ji wan ên ku deyndarên axayê wî bûn û ji yê pêşî re got:
‹Tu çiqas deyndarê axayê min î?› 6 Û wî got: ‹Sed den zeyt.› Wekîl
jê re got: ‹Rahêje seneda xwe û bi lez rûne, pênciyî binivîse.› 7 Di
pey de wî ji yekî din re got: ‹Tu çiqas deyndar î?› Û wî jî got: ‹Sed
kewar genim.› Wekîl ji wî re jî got: ‹Rabe rahêje seneda xwe û
heştêyî binivîse.› 8 Îcar axa pesnê vî şahneyê bêbext da, çimkî wî
aqilmendî kiribû. Çimkî zarokên vê dinyayê di danûstandina xwe
de li gor nifşê xwe ji zarokên ronahiyê bi aqiltir in. 9 Û ez ji we re
dibêjim: Bi malê neheqiyê ji xwe re dostan çêkin, da ku gava ev
mal nemîne, ew we li bin konên herheyî qebûl bikin. 10 Ewê ku di
tiştekî hindik de dilsoz e, ew di tiştekî gelek de jî dilsoz e; lê ewê
ku di tiştekî hindik de ne dilsoz e, ew di tiştekî gelek de jî ne dilsoz
e. 11 Îcar, eger di malê neheqiyê de hûn dilsoz derneketibin, kî wê
dewlemendiya rastîn bispêre we? 12 Û eger hûn di tiştên hinekên
din de ne dilsoz bin, kî wê ya we bi xwe bide we? 13 Xulamek
nikare ji du axayan re xulamtiyê bike; çimkî an ewê ji yekî nefret
bike û ji yê din hez bike, an jî ewê qedrê yekî bigire û yê din biçûk
bibîne. Hûn nikarin xulamtiyê hem ji Xwedê re û hem jî ji dew-
lemendiyê re bikin.»

### *Şerîet û Padîşahiya Xwedê*

*(Metta 11:12-13; 5:31-32; Marqos 10:11-12)*

14 Gava Fêrisiyên ku ji peran hez dikirin, ev tiştên ha hemû
bihîstin, tinazên xwe bi Îsa dikirin. 15 Hingê Îsa ji wan re got: «Hûn
ew in ku xwe li ber mirovan rûspî derdixin, lê Xwedê bi dilê we
dizane; çimkî tiştê ku di nav mirovan de bi qedir e, li ba Xwedê
mekruh e. 16 Dema Şerîet* û pêxemberan heta bi hatina Yûhenna*
kişand; ji hingê ve Mizgîniya Padîşahiya Xwedê tê dan û her kes
bi zorê dikeve wê. 17 Lê bihûrtina erd û ezmanan ji ketina nuq-
teyeke Şerîetê hêsanîtir e. 18 Her kesê ku jina xwe berde û jineke
din bîne, ew zînayê dike û yê ku jineke ku mêrê wê ew berdaye
bîne jî, ew zînayê dike.

---

16:6 Dena Cihûyan a hingê nêzîkî 37 lître bû.

### *Mirovê Dewlemend û Lazarê Belengaz*

19 «Mirovekî dewlemend hebû ku cilên binefşî û ji kitanê tenik
li xwe dikir. Wî her roj dixwar, vedixwar û ew bi kêf û şahî dijiya.
20 Bi navê Lazar yekî belengaz jî hebû, ku li ber deriyê yê dew-
lemend dihat dirêjkirin. Bedena wî tije kûnêr bû. 21 Ew minêkar bû
ku xwe bi wan bermayiyên ku ji sifra yê dewlemend diketin, têr
bike. Heta kûçik jî dihatin û kûnêrên wî dialîstin. 22 Roj hat ku yê
belengaz mir û milyaketan ew bir û xistin himbêza Birahîm*. Yê
dewlemend jî mir û hat veşartin. 23 Û gava wî di diyarê* miriyan
de ezab dikişand, çavên xwe hildan, wî ji dûr ve Birahîm û Lazarê
ku di himbêza wî de bû dît. 24 Wî gazî kir û got: ‹Ya bavê me Bi-
rahîm, rehmê li min bike! Lazar bişîne, bila ew serê tiliya xwe bixe
nav avê û zimanê min hênik bike; çimkî ez di nav vê guriya êgir de
ezabê dikişînim.› 25 Lê Birahîm lê vegerand û got: ‹Lawo, bîne bîra
xwe ku çi tiştên qenc hebûn, te di jiyana xwe de distandin û çi tiş-
tên xerab hebûn, digihîştin Lazar. Lê niha li vir di ber dilê wî de tê
hatin û tu ezabê dikişînî. 26 Û ji vê pê ve jî, di navbera me û we de
geliyekî mezin hatiye danîn, da yên ku dixwazin ji vê derê bibihû-
rin ba we û yên ku dixwazin ji wê derê bibihûrin ba me, nekarin.›
27 Wî jî got: ‹Nexwe, ya bavê me, ez ji te lava dikim ku tu wî bişînî
mala bavê min. 28 Çimkî pênc birayên min hene, bila ew wan hiş-
yar bike, da ku ew jî neyên vî cihê ezabê.› 29 Lê Birahîm ji wî re
got: ‹Mûsa û pêxemberên wan hene, bila guhdariya wan bikin.›
30 Wî got: ‹Na, ya bavê me Birahîm, eger yek ji nav miriyan rabe û
here ba wan, ewê tobe bikin.› 31 Birahîm ji wî re got: ‹Eger ew
guhdariya Mûsa û pêxemberan nekin, yek ji nav miriyan jî rabe,
ew bawer nakin.›»

### *Çend Gotinên Îsa li ser Gunehkirin, Lêbihûrtin û Bawerkirinê*

*(Metta 18:6-7, 21-22; Marqos 9:42)*

17 Îsa ji şagirtên xwe re got: «Nabe ku sedemên jirêderketinê
neyên. Lê belê wey li wî mirovê ku ew sedem bi destê wî
bên. 2 Ji dêla ku ew yekî ji van biçûkan ji rê derxe, wê ji wî re çêtir
be ku beraşek bi stûyê wî ve bê girêdan û ew bê avêtin nav der-
yayê. 3 Hay ji xwe hebin. Gava birayê te li hember te sûcekî bike,
dengê xwe lê hilde û eger ew tobe bike, hingê lê bibihûre. 4 Eger
ew di rojê de heft caran li hember te sûc bike û heft caran li te

vegere û bêje: ‹Ez tobe dikim›, hingê divê tu lê bibihûrî.»
5 Şandiyan* ji Xudan re got: «Baweriya me zêde bike.» 6 Û
Xudan got: «Eger baweriya we wek libeke xerdelê jî hebûya, weyê
ji vê dara tûyê re bigota: ‹Ji ra* ve rabe û xwe di deryayê de biçi-
kilîne!› Û wê bi ya we bikira.
7 «Kî ji we, xulamekî wî yê şivan an cotkar hebe, gava ew ji
zeviyê vegere malê, wê jê re bêje: ‹Hema were û li ser sifrê rûne?›
8 Ma ew di şûna vê de ji wî re nabêje: ‹Rabe, pişta xwe girêde, heta
ku ez bixwim û vexwim xizmeta min bike û paşê tu jî bixwe û
vexwe?› 9 Û ji bo ku wî ew tiştên ku li wî hatibûn emirkirin anîn
cih, ma ewê spasiya xulam bike? 10 De îcar hûn jî, çaxê we hemû
tiştên ku li we hatine emirkirin anîn cih, bêjin: ‹Em xulamên bêkêr
in; me ew karê ku li ser me deyn bû, kir.›»

### *Paqijkirina Deh Mirovên Kotî*

11 Gava Îsa diçû Orşelîmê, ew di navbera Samerya* û Celîlê re
dibihûrî. 12 Û gava ew ket gundekî, deh mirovên kotî* yên ku ji dûr
ve sekinî bûn, rastî wî hatin. 13 Û wan bi dengekî bilind got: «Ya
Îsa, ya Hosta, rehmê li me bike!» 14 Gava wî ew dîtin, wî ji wan re
got: «Herin û xwe nîşanî kahînan bidin!» Û çaxê hê ew diçûn, ew
ji kotîbûna xwe paqij bûn. 15 Îcar gava yekî ji wan dît ku ew sax
bûye, vegeriya û bi dengekî bilind pesnê Xwedê da. 16 Wî li ber
lingên Îsa xwe deverû avêt erdê û spasiya wî kir. Ew yekî Samerî*
bû. 17 Îsa lê vegerand û got: «Ma ne her deh hatine paqijkirin? Ka
her nehên din li ku derê ne? 18 Ma ji viyê xerîb pê ve kesek vene-
geriya, ku navê Xwedê bilind bike?» 19 Hingê Îsa jê re got: «Rabe
ser xwe û here! Baweriya te tu xilas kirî.»

### *Hatina Padîşahiya Xwedê*

*(Metta 24:23-28, 37-41)*

20 Carekê Fêrisiyan pirs ji Îsa kirin û gotin: «Padîşahiya Xwedê
wê kengê bê?» Wî li wan vegerand û got: «Padîşahiya Xwedê wê
ne wusa bê ku mirov bikare temaşeyî wê bike. 21 Ne jî mirov wê
bêje: ‹Va ye, li vê derê ye!›, an jî: ‹Wa ye, li wê derê ye!› Çimkî
Padîşahiya Xwedê di nav we de ye.» 22 Û Îsa ji şagirtan re got:
«Roj wê bên ku hûnê bêriya dîtina rojeke ji rojên Kurê Mirov bi-
kin, lê hûn nabînin. 23 Wê ji we re bêjin: ‹Va ye, li vê derê ye› an:

‹Wa ye, li wê derê ye!› Lê neçin û bi pey wan nekevin. 24 Çimkî
çawa birûsk ji aliyekî ezmên ve birq dide û heta bi aliyê din rona-
hiyê dide, Kurê Mirov jî wê di roja xwe de wusa be. 25 Lê divê ew
pêşî gelek êşan bikişîne û ji aliyê vî nifşî ve bê redkirin. 26 Çawa di
rojên Nûh* de dibû, wusa jî wê di rojên Kurê Mirov de bibe: 27 He-
ta roja ku Nûh ket gemiyê mirovan dixwar, vedixwarin, jin dianîn
û mêr dikirin. Hingê tofan rabû û hemû helak kirin. 28 Di rojên
Lût* de jî wusa bû: Mirovan dixwar, vedixwarin, dikirrîn, difiro-
tin, diçandin û ava dikirin. 29 Lê roja ku Lût ji Sodomê derket, ji
ezmên agir û kewkurt barî û hemû helak kirin. 30 Ew roja ku Kurê
Mirov xuya bibe jî, wê wusa be. 31 Wê rojê ewê ku li ser banî be û
tiştên wî di hundir de bin, bila ji bo ku wan hilde, neyê xwarê û
ewê ku li nav zeviyê be, bila ew jî venegere! 32 Jina Lût* bînin bîra
xwe! 33 Kî bixebite ku jiyana xwe biparêze, ewê wê winda bike; lê
kî ku jiyana xwe winda bike, ewê wê xilas bike. 34 Ez ji we re dibê-
jim: Di wê şevê de du kes wê di nav nivînekê de bin; yek ji wan wê
bê birin û yê din bê hiştin. 35-36 Du jin wê bi hev re li ser destar bin,
yek ji wan wê bê birin û ya din wê bê hiştin.» 37 Wan lê vegerand û
gotin: «Ya Xudan, ma ev wê li ku derê bibe?» Wî jî ji wan re got:
«Kelaş li ku derê be, teyrên kelaşan jî wê li wê derê bicivin.»

### *Mesela Jinebiyê û Dadger*

18 Ji bo ku ew herdem dua bikin û newestin, Îsa meselek ji
wan re got: 2 «Di bajarekî de dadgerek* hebû ku ne ji Xwe-
dê ditirsiya û ne jî ji mirovan şerm dikir. 3 Di wî bajarî de jinebiyek
jî hebû ku dihat ba dadger û jê re digot: ‹Heqê min ji neyarê min
bistîne!› 4 Dadger demekê nexwest, lê piştre ji xwe re got: ‹Her çi-
qas ez ne ji Xwedê ditirsim û ne jî ji mirovan şerm dikim, 5 lê belê
ji ber ku ev jinebiya ha hergav tê û min reht dike, ezê rabim, heqê
wê bidim wê, da ku ev herdem neyê, serê min gêj neke.›» 6 Û Xu-
dan got: «Bibihîzin ku dadgerê neheq çi dibêje. 7 Ma Xwedê heqê
bijartiyên xwe yên ku bi şev û roj hawara xwe digihînin wî nas-
tîne? Ma wê wan li hêviyê bihêle? 8 Ez ji we re dibêjim, ewê heqê

---

**17:27** Destpêkirin 6-8 **17:29** Destpêkirin 19 **17:32** Destpêkirin 19:23-26
**17:35** Di hin destnivîsaran de ev jî heye: «Dido jî wê li nav zeviyê bin, yek ji
wan wê bê birin û yê din wê bê hiştin.»

wan zû bistîne. Lê dîsa jî gava Kurê Mirov bê, gelo ewê baweriyê*
li ser rûyê erdê bibîne?»

### *Mesela Fêrisî û Bacgir*

[9] Îsa ev mesele jî ji hinekên ku ji rastdariya xwe piştrast in û
yên din kêm dibînin re got: [10] «Du mirov hilkişiyan Perestgehê, da
ku dua bikin. Yek ji wan Fêrisî bû û yê din bacgir* bû. [11] Yê Fêrisî
li ser piyan rawesta û ji xwe re weha dua kir: ‹Ya Xwedê, ez şikir ji
te re dikim ku ez ne wek mirovên din im: Ez ne rêbir, ne neheq, ne
zînakar, an jî ne wek vî bacgirê ha me. [12] Ez di heftiyê de du caran
rojiyê digirim û dehyeka* hemû derameta* xwe didim.› [13] Lê yê
bacgir ji dûr ve rawesta û nedixwest çavên xwe jî ber bi ezmên ve
hilde; wî li singê xwe dixist û digot: ‹Ya Xwedê, li min gunehkarî
were rehmê!› [14] Ez ji we re dibêjim: Ne yê Fêrisî, lê yê bacgir
rastdar çû mala xwe. Çimkî her kesê ku xwe bilind bike, wê bê
nizimkirin; lê yê ku xwe nizim bike, wê bê bilindkirin.»

### *Îsa Zarokan Pîroz Dike*

*(Metta 19:13-15; Marqos 10:13-16)*

[15] Zarokên biçûk jî anîn ba Îsa, da ku destê xwe deyne ser wan.
Lê gava şagirtan ev yek dît, li wan hilatin. [16] Lê Îsa gazî wan kir,
ku bên ba wî û got: «Bihêlin, bila zarok bên ba min, pêşiya wan
negirin. Çimkî Padîşahiya Xwedê ji yên weha re ye. [17] Bi rastî ez ji
we re dibêjim, kî ku Padîşahiya Xwedê wek zarokekê qebûl neke,
tu caran nakeve wê.»

### *Serdarê Dewlemend*

*(Metta 19:16-30; Marqos 10:17-31)*

[18] Û serdarekî ji wî pirsî û got: «Ya Mamostê qenc, ez çi bi-
kim, da ku ez bibim wêrisê jiyana herheyî?» [19] Û Îsa ji wî re got:
«Çima tu ji min re qenc dibêjî? Ji Xwedê pê ve, tu kesê qenc tune.
[20] Tu emran dizanî: ‹Zînayê neke!›, ‹Nekuje!›, ‹Diziyê neke!›, ‹Şa-
hidiya derewîn neke!›, ‹Qedrê dê û bavê xwe bigire!›[a]» [21] Wî jî got:
«Ev tiştên ha hemû min ji xortaniya xwe ve pêk anîne.» [22] Gava Îsa
ev bihîst, ji wî re got: «Hê jî tiştek ji te kêm heye: Çi tiştê te heye
bifiroşe û li belengazan belav bike. Hingê wê li ezmanan xezîna te

---

[a] 18:20 Ji: Derketin 20:12-16; Dubarekirina Şerîetê 5:16-20

hebe. Û were, bikeve pey min.» 23 Lê gava wî ev tiştê ha bihîst, ew
gelek xemgirtî bû, çimkî ew gelek dewlemend bû. 24 Îcar gava Îsa
dît ku ew gelek xemgirtî bû, got: «Çiqas zehmet e ku yên dewle-
mend bikevin Padîşahiya Xwedê! 25 Çimkî derbasbûna devê ya di
qula derziyê re, ji ketina mirovê dewlemend a Padîşahiya Xwedê
hêsanîtir e.» 26 Û yên ku ev bihîstin gotin: «Eger wusa be, kî dikare
xilas bibe?» 27 Lê Îsa got: «Tiştê ku li ba mirovan nabe, li ba Xwe-
dê dibe.» 28 Hingê Petrûs got: «Va ye, me yên xwe hiştine û em li
pey te hatine.» 29 Îsa ji wan re got: «Bi rastî ez ji we re dibêjim, tu
kes tune ku di ber Padîşahiya Xwedê de dev ji mal, an jin, an za-
rok, an dê, an bav, an birayan berdabe, 30 di vê dinyayê de gelek
bêtir û di dinya ku bê de jiyana herheyî nestîne.»

### *Îsa Cara Sisiyan li ser Mirin û Rabûna Xwe Dibêje*

*(Metta 20:17-19; Marqos 10:32-34)*

31 Îsa her diwanzdeh anîn ba xwe û ji wan re got: «Va ye, em
derdikevin Orşelîmê û hemû tiştên ku bi destê pêxemberan li ser
Kurê Mirov hatine nivîsîn, wê bên cih: 32 Ewê bê xistin nav destê
miletan, wê tinazên xwe bi wî bikin, wê wî riswa bikin, wê tif bi-
kin wî, 33 wê wî bidin ber qamçiyan û wê wî bikujin û ewê roja
sisiyan ji nav miriyan rabe.» 34 Lê wan tu tişt fêm nekir. Ev peyv ji
wan re veşartî ma û tiştên ku wî gotin, fêm nekirin.

### *Îsa Parsekekî Kor Qenc Dike*

*(Metta 20:29-34; Marqos 10:46-52)*

35 Çaxê Îsa nêzîkî Erîhayê dibû, yekî kor li tenişta rê rûniştibû
û pars dikir. 36 Gava wî bihîst ku elaletek dibihûre, pirsî û got: «Ev
çi ye?» 37 Lê vegerandin û gotin: «Îsayê Nisretî dibihûre.» 38 Yê
kor kir qîrîn û got: «Ya Îsa, Kurê* Dawid, li min were rehmê!»
39 Û yên ku di pêşiyê de diçûn, lê hilatin, da ku ew dengê xwe bi-
bire; lê wî hê bêtir kir qîrîn û got: «Ya Kurê Dawid, li min were
rehmê!» 40 Îsa rawesta, emir kir, ku yê kor bînin ba wî. Û gava yê
kor nêzîk bû, Îsa ji wî pirsî: 41 «Tu çi dixwazî ku ez ji te re bikim?»
Wî got: «Ya Xudan, bila çavên min bibînin.» 42 Îsa jî ji wî re got:
«Bila çavên te bibînin, baweriya* te tu xilas kirî.» 43 Û wî di cih de
dît, li pey Îsa çû û pesnê Xwedê da û hemûyên ku ev yek dîtin, rû-
met dan Xwedê.

### *Îsa û Zexayosê Bacgir*

19 Îsa ket Erîhayê û di bajêr re derbas dibû. 2 Zilamek li wir
hebû, ku navê wî Zexayos bû. Ew serekê bacgiran* bû û
dewlemend bû. 3 Wî dixwest ku Îsa bibîne, ka ew kî ye, lê ji ber
elaletê nikaribû, çimkî bejna wî kin bû. 4 Îcar ew di pêşiya wan de
bezî, çû ser dareke hêjîra bejik, da ku Îsa bibîne, çimkî ewê di wê
riyê re derbas bibûya. 5 Û çaxê Îsa hat wî cihî, li jor nêrî û jê re got:
«Zexayos, bilezîne, were xwarê, çimkî divê îro ez li mala te bimî-
nim.» 6 Wî lezand, hat xwarê û bi şahî Îsa anî mala xwe. 7 He-
mûyên ku ev yek dîtin, kirin pitepit û gotin: «Ew li ba mirovekî
gunehkar bû mêvan.» 8 Lê Zexayos li pêş hemûyan rawesta û ji
Xudan re got: «Ya Xudan, va ye, ez nîvê malê xwe didim be-
lengazan û eger min ji kesekî bi neheqî tiştek standibe, ezê çar qat
lê vegerînim.» 9 Û Îsa jê re got: «Îro xilasî gihîştiye vê malê, çimkî
ev jî kurekî Birahîm e. 10 Ji bo vê yekê Kurê Mirov hatiye ku li yê
windabûyî bigere û wî xilas bike.»

### *Mesela Deh Zêran*

*(Metta 25:14-30)*

11 Çaxê wan guh didan van tiştan, Îsa meseleke din got, çimkî
nêzîkî Orşelîmê bû û wan digot qey Padîşahiya Xwedê ha niha wê
xuya bibe. 12 Îcar Îsa got: «Zilamekî esilzade çû welatekî dûr, da
ku padîşahiyekê bistîne û dîsa vegere. 13 Wî gazî deh xulamên xwe
kir û deh zêr* dan wan û got: ‹Bi van ticaretê bikin, heta ku ez
bêm.› 14 Lê welatiyên wî ji wî nefret dikirin, qasid li pey wî şandin
ku bêjin: ‹Em naxwazin ku ev mirov li ser me bibe padîşah.› 15 Û
çaxê wî padîşahî stand û vegeriya, emir kir, ku gazî wan xulaman
bikin ku wî pere dabûn wan, da ew bizane ku her yekî ji wan çi bi
ser xistiye. 16 Yê pêşî hat ber wî û got: ‹Ezbenî, zêrê te deh zêrên
din bi ser xistin.› 17 Wî ji xulam re got: ‹Aferim, xulamê qenc! Ji
ber ku tu di hindikî de dilsoz bûyî, li ser deh bajaran bibe serwer.›
18 Yê diduyan hat û got: ‹Ezbenî, zêrê te pênc zêr bi ser xistin.› 19 Û
ji vî re jî got: ‹Tu jî li ser pênc bajaran bibe serwer.› 20 Yekî din hat
û got: ‹Ezbenî, va ye zêrê te, min ew di nav destmalekê de pêça û
hilanî. 21 Ez ji te tirsiyam, çimkî tu mirovekî hişk î; tiştê ku te
dananiye, tu radihêjî û tiştê ku te neçandiye, tu didirûyî.› 22 Wî jê
re got: ‹Hey xulamê neqenc! Ezê ji devê te dîwana* te bikim.

Madem ku te dizanibû, ez mirovekî hişk im, tiştê ku min dananiye,
ez radihêjim, tiştê ku min neçandiye, ez didirûm, 23 nexwe çima te
perê min neda pereguhêran? Çaxê ez vegeriyam, minê ew bi fayiza
wî ve bistanda.› 24 Û ji yên ku li wê derê bûn re got: ‹Wî zêrî ji wî
bistînin û bidin wî yê ku deh zêrên wî hene.› 25 Wan jê re got: ‹Ya
mîrza, deh zêrên wî hene.› 26 ‹Ez ji we re dibêjim, yê ku pê re he-
ye, wê jê re bê dayîn, lê yê ku pê re tune, tiştê di destê wî de ye jî
wê ji wî bê standin. 27 Lê belê wan dijminên min, yên ku nedi-
xwestin, ez li ser wan bibim padîşah, bînin vê derê û wan li ber
min bikujin.›»

### *Îsa bi Rûmet Dikeve Orşelîmê*

*(Metta 21:1-11; Marqos 11:1-11; Yûhenna 12:12-19)*

28 Piştî Îsa ev tiştên ha gotin, derket ser rê, di pêşiyê wan de çû,
da ku here Orşelîmê. 29 Çaxê ew nêzîkî Beytfacê û Beytanyayê
dibû, li cihê ku jê re Çiyayê Zeytûnê digotin, wî du şagirtên xwe
şandin 30 û ji wan re got: «Herin vî gundê pêşberî we. Gava hûn
bikevin nav gund, hûnê dehşikeke girêdayî bibînin ku hê tu kes lê
siwar nebûye. Wê vekin û bînin vir. 31 Û eger kesek ji we bipirse û
bêje: ‹Çima hûn wê dehşikê vedikin?› weha bêjin: ‹Ew ji Xudan re
lazim e.›»

32 Yên ku hatibûn şandin çûn û her tişt wek ku Îsa ji wan re
gotibû dîtin. 33 Gava wan dehşik vedikir, xwediyên dehşikê ji wan
re gotin: «Çima hûn dehşikê vedikin?» 34 Wan jî got: «Ew ji Xudan
re lazim e.» 35 Û dehşik anîn ba Îsa. Wan cilên xwe ji Îsa re danîn
ser dehşikê û ew lê siwar kirin. 36 Gava Îsa diçû, xelkê ji wî re
cilên xwe li ser rê radixistin. 37 Êdî gava ew nêzîkî berwara Çiyayê
Zeytûnê bû, elaleta şagirtên wî dest pê kir û bi dilxweşî û bi den-
gekî bilind pesnê Xwedê ji bo wan hemû karên mezin ên ku
dîtibûn, didan. 38 Û wan digot:

«Pîroz be ew Padîşahê
Ku bi navê Xudan tê.[a]
Li ezmên silamet
Û li bilindahiyan rûmet!»

39 Û hin ji Fêrisiyan, yên ku di nav wê elaletê de bûn, ji Îsa re

---

[a] **19:38** Ji: Zebûr 118:26

gotin: «Mamoste, dengê xwe li şagirtên xwe hilde!» 40 Îsa li wan
vegerand û got: «Ez ji we re dibêjim: Eger ew bêpêjin bimînin,
kevir wê dengê xwe hildin.»

### *Îsa li ser Orşelîmê Digirî*

41 Çaxê Îsa nêzîk bû, bajar dît û li ser wî girî 42 û got: «Xwezî
îro te jî ev tiştên ku ji bo aştiya* te ne bizaniyana! Lê niha ew ji
ber çavên te hatine veşartin. 43 Roj wê bi ser te de bên, ku dijminên
te wê li dora te çeperan çêkin û hawirdora te bigirin, ji her aliyî ve
te bidin tengahiyê 44 û wê te û zarokên te yên di nav te de li erdê
bixin û ewê di nav te de kevir li ser kevir nehêlin, çimkî te wextê
serdana xwe nezanî.»

### *Îsa Perestgehê Paqij Dike*

*(Metta 21:12-17; Marqos 11:15-19; Yûhenna 2:13-22)*

45 Îsa ket Perestgehê û dest pê kir, yên ku tê de kirrîn û firotin
dikirin, avêtin derve 46 û ji wan re got: «Hatiye nivîsîn:
‹Mala min wê bibe mala duayê›,
Lê we ew kiriye ‹şkefta rêbiran›.»[a]
47 Îsa her roj di Perestgehê de hîn dikir. Serekên kahînan*, Şe-
rîetzan* û giregirên gel dixebitîn, ku wî bikujin, 48 lê wan nikaribû
tiştekî bibînin ku bi wî bikin, çimkî tevahiya xelkê ji dil guhdariya
wî dikir.

### *Pirsa li ser Desthilatiya Îsa*

*(Metta 21:23-27; Marqos 11:27-33)*

20 Rojekê ji rojan, çaxê wî di Perestgehê de xelk hîn dikir û
Mizgînî dida, serekên kahînan, Şerîetzan û rihspî tevde bi
ser de hatin 2 û jê re gotin: «Ji me re bêje, tu van tiştan bi çi dest-
hilatiyê dikî, an yê ku ev desthilatî daye te kî ye?» 3 Îsa li wan
vegerand û got: «Ez jî, ezê tiştekî ji we bipirsim, ka ji min re bêjin:
4 Imadkirina* Yûhenna* ji ezmên bû, an ji mirovan bû?» 5 Ew bi
hevdû şêwirîn û gotin: «Eger em bêjin: ‹Ji ezmên e›, ewê bêje: ‹Çi-
ma we ji wî bawer nekir?› 6 Û eger em bêjin: ‹Ji mirovan e›, ji xwe
tevahiya xelkê wê me bide ber keviran, çimkî ew qenc bawer dikin
ku Yûhenna pêxember e.» 7 Îcar wan lê vegerand û gotin: «Em

---

[a] 19:46 Ji: Îşaya 56:7; Yêremya 7:11

nizanin ji ku derê ye.» [8] Îsa ji wan re got: «Ez jî ji we re nabêjim
ku ez van tiştan bi çi desthilatiyê dikim.»

### *Mesela Rez û Rezvanan*
*(Metta 21:33-46; Marqos 12:1-12)*

[9] Îsa dest pê kir, ev mesele ji xelkê re got: «Mirovekî rezek
çand, ew bi kirê da rezvanan û ji bo demeke dirêj çû welatekî din.
[10] Û di demsala rêz de wî xulamek şand ba rezvanan, da ku ji berê
rêz bidin wî. Lê rezvanan li wî xist û ew destvala şandin. [11] Hingê
wî xulamekî din şand, wan li wî jî xist, riswa kirin û destvala
şandin. [12] Yê sisiyan jî şand, ew jî birîndar kirin û avêtin derve.
[13] Xwediyê rêz jî got: ‹Gelo ez çi bikim? Ezê kurê xwe yê delal
bişînim, belkî ew siyaneta* wî bigirin.› [14] Lê gava rezvanan ew dît,
bi hevdû şêwirîn û gotin: ‹Ev wêris e. De werin, em wî bikujin, da
ku mîras ji me re bimîne.› [15] Wan ew avêt derveyê rêz û kuştin. Ma
îcar xwediyê rêz wê çi bi wan bike? [16] Ewê bê, van rezvanan helak
bike û wê rêz bide hinekên din.» Gava wan ev yek bihîst, gotin:
«Xwedê neke!» [17] Lê Îsa li wan nêrî û got: «Nexwe eva ku hatiye
nivîsîn çi ye?

‹Ew kevirê ku hostayan red kir
Bû kevirê serê rikin*.›[a]

[18] Her kesê ku bi ser wî kevirî de bikeve, wê bibe perçe perçe û ew
kevir bi ser kê de bikeve, wê wî hûrhûr bike.» [19] Şerîetzan û sere-
kên kahînan xwestin ku di cih de dest bavêjin wî, çimkî wan fêm
kir, ku Îsa ev mesele anî ser wan, lê ew ji xelkê tirsiyan.

### *Pirsa Dan û Nedana Baca Qeyser*
*(Metta 22:15-22; Marqos 12:13-17)*

[20] Çavê wan li Îsa bû û wan casûsên ku xwe rast nîşan didan,
şandin ba wî, da ku ew wî bi xebera wî bigirin û derxin ber dîwan*
û desthilatiya walî. [21] Wan ji wî pirsî û gotin: «Mamoste, em diza-
nin ku tu rast dibêjî û hîn dikî. Tu cihêtiyê naxî nav mirovan, lê be-
lê tu riya Xwedê rast hîn dikî. [22] Îcar ma ji bo me çêdibe ku em
bacê bidin Qeyser an na?» [23] Lê Îsa bi qurnaziyên wan hesiya û ji
wan re got: [24] «Ka zîvekî* nîşanî min bidin. Ma ev resm û nivîsîn

---

[a] 20:17 Ji: Zebûr 118:22

ên kê ne?» Wan got: «Yên Qeyser in.» 25 Îsa jî ji wan re got:
«Madem ku wusa ye, tiştên Qeyser bidine Qeyser û tiştên Xwedê
bidin Xwedê.» 26 Wan nikaribû wî li ber xelkê bi gotina wî bigirin,
ew li bersîva wî şaş man û devê xwe girtin.

### *Pirsa Rabûna Miriyan*
*(Metta 22:23-33; Marqos 12:18-27)*

27 Hinek ji wan Sadûqiyên* ku digotin vejîna* miriyan tune,
hatin ji wî pirsîn û gotin: 28 «Mamoste, Mûsa ji bo me nivîsiye:
‹Eger birayê yekî zewicî be û ew bê zarok bimire, divê birayê wî
jina wî bistîne û dûndanê* ji birayê xwe re rake.›[a] 29 Îcar heft bira
hebûn. Yê pêşî jinek anî û bê zarok mir. 30 Yê diduyan 31 û yê sisi-
yan jî ew jin stand û bi vî awayî her heftan zarok li pey xwe ne-
hiştin û mirin. 32 Piştre jin jî mir. 33 Ma di Roja* Vejînê de ew jin
wê bibe jina kîjanî ji van? Çimkî her heftan jî ew anîbû.» 34 Îsa jî ji
wan re got: «Zarokên vê dinyayê jinê tînin û mêr dikin. 35 Lê ew ên
ku hêja hatine dîtin ku bigihîjin wê dinyayê û vejîna miriyan, ne
jinê tînin û ne jî mêr dikin; 36 ew careke din nikarin bimirin, ew
eynî wek milyaketan in; ew zarokên Xwedê ne, çimkî ew zarokên
vejînê ne. 37 Mûsa jî da xuyakirin, ku mirî wê ji nû ve rabin. Ew di
serhatiya diriyê de navê Xudan hildide û dibêje: ‹Xwedayê Bira-
hîm*, Xwedayê Îshaq* û Xwedayê Aqûb*.›[b] 38 Îcar ew ne Xweda-
yê miriyan e, lê Xwedayê zindiyan e, çimkî hemû ji wî re sax in.»
39 Hinekan ji Şerîetzanan bersîv dan û gotin: «Mamoste, te qenc
got.» 40 Çimkî êdî wan qet nediwêrî, ku tiştekî ji wî bipirsin.

### *Pirsa Kurê Dawid*
*(Metta 22:41-46; Marqos 12:35-37)*

41 Îcar Îsa ji wan re got: «Çawa dibêjin ku Mesîh kurê Dawid*
e? 42 Çimkî Dawid bi xwe di kitêba Zebûrê de dibêje:

‹Xudan ji Xudanê min re got:
Li milê min ê rastê rûne,
43 Heta ku ez dijminên te bikim pêgeha lingên te.›[c]

44 Loma, eger Dawid jê re dibêje Xudan, çawa ew dibe kurê Dawid?»

---

[a] **20:28** Ji: Dubarekirina Şerîetê 25:5 [b] **20:37** Ji: Derketin 3:6
[c] **20:42-43** Ji: Zebûr 110:1

### *Şerîetzanên Durû*
*(Metta 23:1-36; Marqos 12:38-40; Lûqa 11:37-54)*

45 Û çaxê tevahiya xelkê guhdariya wî dikir, wî ji şagirtên xwe
re got: 46 «Hay ji xwe û Şerîetzanan hebin, yên ku dixwazin bi xif-
tanên dirêj bigerin û hez dikin ku di sûkan de xelk silavê bidin wan
û di kinîştan* de li ser kursiyên pêşî û di ziyafetan de li cihên jorîn
rûnin. 47 Ew malên jinebiyan dadiqurtînin û ji bo ku bên dîtin, dua-
yên dirêj dikin. Dîwana wan wê hê girantir be.»

### *Diyariya Jinebiya Belengaz*
*(Marqos 12:41-44)*

21 Îsa serê xwe hilda û kesên dewlemend, yên ku diyariyên
xwe davêtin peredanka* Perestgehê, dîtin. 2 Wî jinebiyeke
reben jî dît ku du pol* avêtinê. 3 Hingê Îsa got: «Ez rast ji we re di-
bêjim, vê jinebiya belengaz ji wan hemûyan bêtir avêtê. 4 Çimkî
van hemûyan ji tiştên ku ji wan zêde bûn, avêtin nav diyariyan, lê
vê jinikê ji belengaziya xwe hemû abora xwe avêtê.»

### *Îsa ji pêşî ve li ser Wêranbûna Perestgehê Dibêje*
*(Metta 24:1-2; Marqos 13:1-2)*

5 Çaxê hinekan digot ku Perestgeh çawa bi kevirên spehî û bi
diyariyan hatiye xemilandin, Îsa got: 6 «Heçî ev tiştên ha ne yên ku
hûn dibînin, roj wê bên, ku hingê li vê derê kevir li ser kevir namî-
ne. Tiştek namîne ku neyê hilweşandin.»

### *Li ser Xapandin û Tengahiyên Mezin*
*(Metta 24:3-14; Marqos 13:3-13)*

7 Wan jî ji Îsa pirsî û gotin: «Mamoste, ev tişt wê kengê çêbin?
Û çaxê ev tiştên ha li ber çêbûnê bin, nîşana wan çi ye?» 8 Îsa jî
got: «Hay ji xwe hebin ku hûn neyên xapandin, çimkî gelek wê bi
navê min bên û wê bêjin: ‹Ez ew im› û ‹Wext nêzîk bûye!› Li pey
wan neçin! 9 Çaxê hûn li ser şer û hengameyan bibihîzin, netirsin,
çimkî divê pêşî ev tiştên ha çêbin, lê belê dawî pêre pêre nayê.»
10 Hingê wî ji wan re got: «Milet wê li hember miletan rabe,
padîşahî wê li hember padîşahiyan rabe. 11 Erdhejînên mezin wê
çêbin û li cih cihan xela û êşa zirav wê derkevin. Tiştên tirsehêz û
nîşanên mezin wê li ezmên bibin. 12 Lê ji berî van hemû tiştan wê
dest bavêjin we û tengahiyê bidin we. Ewê we teslîmî kinîştan

bikin û we bavêjin zîndanan û di ber navê min de ewê we derxin
ber padîşah û waliyan. 13 Ev tişt wê çêbin, da ku hûn şahidiyê ji bo
min bikin. 14 Loma bixin dilê xwe ku hûn ji pêşî ve nefikirin ku
hûnê çawa xwe biparêzin. 15 Çimkî ezê dev û ziman û şehrezayiyê
bidim we, ku neyarên we nekarin li ber we bipeyivin an bisekinin.
16 Lê heta bi dê û bav, bira, mirov û dostên we wê we bidin girtin û
wê hinan ji we bikujin. 17 Ji ber navê min hemû jî wê ji we nefret
bikin. 18 Lê mûyek ji serê we winda nabe. 19 Hûnê bi sebira xwe ca-
nê xwe bi dest bixin.

### *Îsa li ser Wêrankirina Orşelîmê Dibêje*
*(Metta 24:15-21; Marqos 13:14-19)*

20 «Lê çaxê hûn bibînin ku hawirdora Orşelîmê bi leşkeran bê
girtin, hingê bizanin ku xerabûna wê nêzîk e. 21 Hingê yên ku di
Cihûstanê de ne, bila birevin çiyan! Û yên ku di bajêr de bin, bila
jê derkevin! Û yên ku li çolê bin, bila nekevin bajêr! 22 Çimkî ev
rojên heyfstandinê ne, da ku heçî tiştên hatine nivîsîn, bên cih.
23 Wey li wan ên ku di wan rojan de bizaro ne û dimêjînin. Çimkî
tengahiyeke mezin wê bê ser welêt û xezeb wê bê ser vî gelî.
24 Ewê bikevin ber devê şûr, bi hêsîrtî* wê bên birin nav hemû mi-
letan û heta zemanê miletan temam bibe, Orşelîm wê di bin lingên
wan de biperçiqe.

### *Vegerîna Kurê Mirov*
*(Metta 24:29-31; Marqos 13:24-27)*

25 «Li ser roj, heyv û stêran nîşan wê çêbin û li ser erdê ji ber
xuşîn û mişîna pêlên deryayê milet wê bibizdin û şaş bibin. 26 Ew
mirovên ku li benda wan tiştên ku bên serê dinyayê disekinin, ji
tirsan dilê wan wê bibihûre; çimkî stêrên ezmanan wê ji riya xwe
derkevin 27 Hingê wê bibînin ku ‹Kurê Mirov di nav ewrekî de bi
hêz û rûmeta mezin tê.›[a] 28 Çaxê ev tiştên ha dest pê bikin û çêbin,
li jor binêrin û serê xwe hildin, çimkî xilasiya we nêzîk dibe.»

### *Mesela Hêjîrê*
*(Metta 24:32-35; Marqos 13:28-31)*

29 Û Îsa ji wan re meseleyek got: «Li dara hêjîrê û li hemû

---

[a] 21:27 Ji: Daniyêl 7:13. Binêre: Peyxama Yûhenna 1:7

darên din binêrin. 30 Çaxê ku ew dibişkivin, hûn dibînin û hûn ji
ber xwe dizanin ku êdî havîn nêzîk e. 31 Bi vî awayî, çaxê hûn jî
bibînin ku ev tiştên ha çêdibin, bizanin ku Padîşahiya Xwedê nêzîk
e. 32 Bi rastî ez ji we re dibêjim, heta ev tiştên ha hemû çênebin, ev
nifş qet nabihûre. 33 Erd û ezman wê bibihûrin, lê peyvên min tu
caran nabihûrin.»

### *Hişyar Bimînin!*

34 «Hay ji xwe hebin ku bi xwarina zehfî, serxweşî û bi xemên
vê jiyanê dilê we giran nebe û ew roj ji nişkê ve wek dafikekê bi
ser we de neyê. 35 Çimkî ewê bi ser wan hemûyên ku li ser rûyê
erdê dimînin de, bê. 36 Lê herdem dua bikin û hişyar bimînin, da ku
hûn bikarin ji ber van hemû tiştên ku wê bibin, birevin û li ber
Kurê Mirov rawestin.»
37 Îsa bi roj di Perestgehê de hîn dikir û bi şev derdiket, diçû wî
çiyayê ku jê re Çiyayê Zeytûnê digotin û şeva xwe dibihûrand. 38 Û
xelk hemû sibê zû dihatin Perestgehê ba wî, da ku guhdariya wî
bikin.

### *Bêbextî û Xayîntiya Cihûda*

*(Metta 26:1-5, 14-16; Marqos 14:1-2, 10-11; Yûhenna 11:45-53)*

22 Cejna* Nanê Şkeva, ya ku jê re Cejna* Derbasbûnê tê
gotin, nêzîk dibû. 2 Serekên kahînan û Şerîetzan li riyekê
digeriyan, ka çawa Îsa bikujin, çimkî ew ji xelkê ditirsiyan. 3 Hin-
gê Îblîs* ket dilê Cihûdayê ku jê re Îsxeryotî digotin. Ew yek ji her
diwanzdehan bû. 4 Cihûda rabû, çû ba serekên kahînan û serwerên
parêzgerên Perestgehê, bi wan re peyivî, ka wê çawa bikare Îsa
bide destê wan. 5 Ew gelek şa bûn û bi wî re li hev hatin ku ew
peran bidin wî. 6 Cihûda jî razî bû û li keysekê geriya, bêyî ku
elalet hebe, wî bide destê wan.

### *Amadekirina Şîva Cejna Derbasbûnê*

*(Metta 26:17-25; Marqos 14:12-21; Yûhenna 13:21-30)*

7 Û roja Cejna* Nanê Şkeva hat, a ku diviya, tê de berxê go-
riya* Cejna Derbasbûnê bê serjêkirin. 8 Îsa Petrûs û Yûhenna şan-
din û ji wan re got: «Herin, şîva Cejna Derbasbûnê ji me re amade
bikin, da ku em bixwin!» 9 Wan jî got: «Ma tu dixwazî ku em wê li
ku derê amade bikin?» 10 Wî li wan vegerand û got: «Gava hûn

bikevin nav bajêr, mirovekî ku rahiştiye cerekî avê, wê rastî we bê.
Hûn li pey wî herin wî xaniyê ku ew dikevê 11 û ji malxwê malê re
bêjin: ‹Mamoste ji te dipirse: Ka ew odeya mêvanan a ku ez li wê
bi şagirtên xwe re şîva Cejna Derbasbûnê bixwim, li ku derê ye?›
12 Hingê ewê li jor odeyeke mezin a raxistî nîşanî we bide. Li wê
derê şîvê amade bikin.» 13 Ew çûn, wan her tişt wek ku Îsa ji wan
re gotibû, dîtin û şîva Cejna Derbasbûnê amade kirin.

### *Şîva Xudan*

*(Metta 26:26-30; Marqos 14:22-26; 1 Korîntî 11:23-25)*

14 Gava bû çaxê şîvê, Îsa bi Şandiyan* re li ser sifrê rûnişt 15 û
ji wan re got: «Hê ji berî ku ez cefayê bikişînim, dilê min gelek
xwest ku ez bi we re vê şîva Cejna* Derbasbûnê bixwim. 16 Çimkî
ez ji we re dibêjim, heta ku di Padîşahiya Xwedê de pêk neyê, ez
tu caran ji vê cejnê naxwim.» 17 Piştre wî rahişt kasekê, şikir kir û
got: «Ha ji we re vê bistînin û di nav xwe de leva* bikin. 18 Çimkî
ez ji we re dibêjim, heta Padîşahiya Xwedê neyê, ez qet ji ava mê-
wê venaxwim.» 19 Piştre wî rahişt nanekî, şikir kir û şkand. Wî ew
da destê wan û got: «Ev bedena min e, ya ku di ber we de hatiye
dayîn. Vê yekê ji bo bîranîna min bikin.»
20 Piştî şîvê wî wusa jî kas da wan û got: «Ev kasa ha, Pey-
mana* Nû, ya ku bi xwîna min e, ku di ber we de tê rijandin. 21 Lê
va ye, destê wî yê ku min bide dest, bi min re li ser sifrê ye. 22 Erê,
Kurê Mirov wek ku biryar hatiye dayîn, wê here, lê belê wey li wî
kesê ku wî bide dest.» 23 Hemû şagirtan dest pê kir û ji hev pirsîn,
ka kî ji wan e, yê ku wê vî karî bike?

### *Yê Mezin Kî Ye?*

24 Devjenî ket nav wan, ka kî ji wan wê yê mezin bê hesi-
bandin. 25 Îsa ji wan re got: «Padîşahên miletan hukumdariyê li ser
wan dikin û yên ku serdestiyê li wan dikin, dixwazin ku ji wan re
qencîxwaz bê gotin. 26 Lê belê divê hûn ne wusa bin. Bila yê herî
mezin di nav we de wek yê herî biçûk û yê serek wek yê xulam be.
27 Ma yê meztir kî ye? Gelo yê li ser sifrê rûniştî, an yê ku xizmetê
dike? Ma yê li ser sifrê rûniştî ne meztir e? Lê ez di nav we de wek
xizmetkarekî me.
28 «Hûn ew in, yên ku di ceribandinên min de bi min re ra

girtine*. [29] Û ezê ji we re padîşahiyekê bidim, çawa Bavê min ew
daye min, [30] da ku hûn di Padîşahiya min de li ser sifra min bixwin,
vexwin û li ser textan rûnin û dîwana* her diwanzdeh eşîrên Îsraêl
bikin.

### *Îsa ji pêşî ve li ser Înkarkirina Petrûs Dibêje*

*(Metta 26:31-35; Marqos 14:27-31; Yûhenna 13:36-38)*

[31] «Şimûn*, Şimûn, va ye, Îblîs xwest ku we wek genim li bê-
jingê bixe. [32] Lê min ji bo te dua kir, da ku baweriya te sist nebe û
çaxê tu dîsa vegerî, dilê birayên xwe qayîm bike.» [33] Şimûn lê
vegerand û got: «Ya Xudan, ez amade me bi te re herim zîndanê û
mirinê jî.» [34] Îsa got: «Petrûs, ez ji te re dibêjim, hê dîk îro bang
nedayî, tê sê caran min înkar bikî.»

### *Xweamadekirina ji Tengahiyê re*

[35] Îsa ji şagirtên xwe re got: «Çaxê min hûn bê xelîtik*, bê tûr
û bê pêlav şandin, ma tiştek ji we kêm bû?» Wan got: «Na, tu kê-
mahiya me nebû.» [36] Îsa ji wan re got: «Lê niha ewê ku xelîtka* wî
heye, bila wê bi xwe re bîne, wusa jî yê ku tûrê wî heye, û ewê ku
bê şûr e, bila ebayê xwe bifiroşe û ji xwe re şûrekî bikirre. [37] Çimkî
ez ji we re dibêjim ku eva hatiye nivîsîn, divê li ser min bê cih, ya
ku dibêje: ‹Û ew bi xerabkeran re hat hesabkirin.›[a] Çimkî tiştên ku
li ser min hatine nivîsîn wê bên cih.» [38] Wan got: «Ya Xudan, va
ye, du şûr li vir hene.» Wî jî ji wan re got: «De bes e.»

### *Îsa li ser Çiyayê Zeytûnê Dua Dike*

*(Metta 26:36-46; Marqos 14:32-42)*

[39] Îsa derket û wek her car çû Çiyayê Zeytûnê, şagirtên wî jî li
pey wî çûn. [40] Gava ew gihîşt wê derê, wî ji wan re got: «Dua
bikin, da ku hûn nekevin ceribandinê.» [41] Ew, hema bêje bi dûr-
bûna avêtina kevirekî ji wan dûr ket, çû ser çokan, dua kir [42] û got:
«Ya Bavê* min, eger tu bixwazî, vê kasa tehl ji min derbas bike.
Lê bila ne bi daxwaza min be, bi ya te be.» [43] Îcar milyaketek ji
ezmên jê re xuya bû û hêz da wî. [44] Îsa ket berxwedaneke dijwar û
bi kelegermî bêtir dua kir. Xwihdana wî dibû wek dilopên xwînê

---

[a] **22:37** Ji: Îşaya 53:12

yên gir û diketin ser erdê. 45 Çaxê ku ew ji dua xwe rabû û li
şagirtên xwe vegeriya, wî dît ku ew ji kederê bi xew ve çûne. 46 Wî
ji wan re got: «Çima hûn bi xew ve diçin? Rabin ser xwe û dua
bikin, da ku hûn nekevin ceribandinê.»

### *Girtina Îsa*

*(Metta 26:47-56; Marqos 14:43-50; Yûhenna 18:3-11)*

47 Hê ew wusa dipeyivî, birrek mirov, li pêşiya wan Cihûdayê
ku yek ji her diwanzdeh şagirtan bû, bi ser wan de hat. Cihûda ber
bi Îsa ve hat, da ku wî ramûse. 48 Îsa jê re got: «Cihûda, ma tê bi
ramûsanekê Kurê Mirov bidî destê wan?» 49 Gava yên li dora wî
dîtin, ka wê çi bibe, wan got: «Ya Xudan, ma em bi şûr lêxin?»
50 Û yekî ji wan şûr avêt xulamê Serokkahîn û guhê wî yê rastê
jêkir. 51 Lê Îsa got: «Bes e!» Wî destê xwe danî ser guhê wî û ew
qenc kir.

52 Piştre Îsa ji wê koma ku bi ser wî de hatibû re, ji serekên
kahînan, serwerên parêzgerên Perestgehê û mezinan re got: «Hûn
weha bi şûr û daran hatine; ma hûn hatine pêşiya rêbirekî? 53 Çaxê
ez her roj di Perestgehê de di nav we de bûm, we destê xwe dirêjî
min nekir. Lê belê ev saeta we ye, serdestiya taristaniyê ye.»

### *Petrûs Îsa Înkar dike*

*(Metta 26:57-58, 67-75; Marqos 14:53-54, 66-72; Yûhenna 18:12-18, 25-27)*

54 Îcar wan Îsa girt û birin, ew xistin xaniyê Serokkahîn. Petrûs
jî ji dûr ve li pey wî diçû. 55 Gava di hewşa xanî de agir dadan û li
dorê rûniştin, Petrûs di nav wan de rûnişt. 56 Keçikeke berdestî ew
li ber êgir dît, wê çav lê zûr kirin û got: «Evê ha jî bi Îsa re bû.»
57 Lê wî înkar kir û got: «Ya jinikê, ez wî nas nakim.» 58 Piştî
kêlîkekê, yekî din ew dît û got: «Tu jî yek ji wan î.» Petrûs lê ve-
gerand û got: «Na camêr, ez ne ji wan im.» 59 Gava nêzîkî saetekê
di wê navê de derbas bû, yekî din jî rabû û ji dil got: «Hema bi
rastî evê ha jî bi wî re bû, çimkî ew ji Celîlê ye.» 60 Lê Petrûs lê
vegerand û got: «Ey camêr, ez nizanim ka tu çi dibêjî.» Hema
hingê hê ew dipeyivî, dîk bang da. 61 Hingê Xudan li pişt xwe
zivirî, li Petrûs nêrî; îcar peyva Xudan hat bîra Petrûs, çawa ku wî

---

22:44 Di hin destnivîsaran de ayetên 43-44 tune.

jê re gotibû: «Hê dîk îro bang nedayî, tê sê caran min înkar bikî.»
[62] Petrûs derket derve û bû kûrkûra giriyê wî.

### *Parêzger bi Îsa Dikenin û li Wî Dixin*

[63] Îcar ew zilamên ku Îsa girtibûn, pê kenîn û lê xistin. [64] Wan
çavên wî girêdan, jê pirsîn û gotin: «De ka pêxemberîtiyê bike, yê
ku li te xist kî ye?» [65] Û wan hê bêtir gotinên bêfihêt jê re gotin.

### *Îsa di Civîna Giregirên Cihûyan de*

*(Metta 26:59-66; Marqos 14:55-64; Yûhenna 18:19-24)*

[66] Gava bû roj, rihspiyên milet, serekên kahînan û Şerîetzan li
hev civiyan. Û ew anîn civîna xwe ya giregiran [67] û ji wî re gotin:
«Eger tu Mesîh î, ji me re bêje!» Îsa bersîva wan da û got: «Eger
ez ji we re bêjim, hûn qet bawer nakin [68] û eger ez ji we bipirsim jî,
hûn qet bersîva min nadin. [69] Lê ji niha û pê ve ‹Kurê Mirov wê li
tenişta rastê ya hêza Xwedê rûne.›[a]» [70] Îcar hemûyan bi hev re jê
pirsî: «Nexwe tu Kurê* Xwedê yî?» Wî jî ji wan re got: «Hûn bi
xwe dibêjin ku ez ew im.» [71] Wan got: «Ma çi hewcedariya me bi
şahidiyê heye? Me bi xwe ji devê wî bihîst.»

### *Îsa li ber Pîlatosê Walî*

*(Metta 27:1-2, 11-14; Marqos 15:1-5; Yûhenna 18:28-38)*

23 Tevahiya civînê rabû ser xwe û Îsa birin ber Pîlatos. [2] Wan
dest bi giliyê wî kir û gotin: «Me dît ku evê ha miletê me ji
rê derdixe. Nahêle ku baca Qeyser bê dayîn û ji bo xwe dibêje ku
ew Mesîh e, yanî padîşah e.» [3] Pîlatos jê pirsî û got: «Ma tu padî-
şahê Cihûyan î?» Îsa lê vegerand û got: «Wek ku te got.» [4] Pîlatos
ji serekên kahînan re û ji elaleta milet re got: «Ez tu sedemê sûc-
darkirina vî mirovî nabînim!» [5] Lê ew li ser ya xwe man û gotin:
«Vî mirovî milet li seranserê Cihûstanê, ji Celîlê û heta vir bi hîn-
kirina xwe rakiriye ser lingan.»

### *Îsa li ber Hêrodês*

[6] Gava Pîlatos ev bihîst, wî pirsî û got: «Ma ev mirov ji Celîlê
ye?» [7] Gava ew hîn bû ku ew ji wê dera ku di bin hukumdariya
Hêrodês* de ye, wî ew şand ba Hêrodês. Hêrodês bi xwe jî di wan

---

[a] **22:69** Ji: Zebûr 110:1

rojan de li Orşelîmê bû. 8 Gava Hêrodês Îsa dît, ew gelek şa bû. Hê
ji mêj ve wî dixwest ku wî bibîne, çimkî wî gelek tişt li ser Îsa
bihîstibûn û hêvî dikir, ku Îsa li ber wî kerametekê bike. 9 Wî jî
gelek pirs li ber Îsa danîn, lê Îsa qet bersîva wî neda. 10 Serekên
kahînan û Şerîetzan li ser piyan rawestan û giliyê xwe li hember
Îsa giran kirin. 11 Hêrodês û leşkerên wî jî ew kêm dîtin û tinazên
xwe pê kirin. Wan cilekî spehî yê ku diçirise lê kir û careke din ew
vegerandin ba Pîlatos. 12 Di wê rojê de Pîlatos û Hêrodês, yên ku
beriya hingê dijminahî bi hev re dikirin, dostanî bi hev re danîn.

### *Îsa Cezayê Mirinê Distîne*

*(Metta 27:15-26; Marqos 15:6-15; Yûhenna 18:39-19:16)*

13 Pîlatos gazî serekên kahînan, serdaran û xelkê kir 14 û ji wan
re got: «We ev mirovê ha anî ber min û we got ku ew gel ji rê
derdixe. Min jî ew li ber we kişand pirsyariyê û min tu sûcê ku we
dixistin stûyê wî, li ser wî nedîtin. 15 Hêrodês jî nedît. Ji ber vê ye-
kê wî ew li me vegerand. Û binêrin, vî mirovî tiştek nekiriye ku bê
kuştin. 16-17 Loma ezê wî bidim ber qamçiyan û berdim.»
18 Lê koma elaletê bi dengekî kir qîrîn û got: «Vî ji ber çavê
me rake, Barabas ji me re berde!» 19 Heçî Barabas bû, ew ji ber
serhildaneke di bajêr de û ji ber mêrkujiyê ketibû zîndanê. 20 Pî-
latos careke din bi wan re peyivî, çimkî wî dixwest Îsa berde. 21 Lê
wan kir qîrîn û gotin: «Wî xaç bike, wî xaç bike!» 22 Hingê wî cara
sisiyan ji wan re got: «Ka vî mirovî çi xerabî kiriye? Min tu se-
demê kuştina wî nedîtiye. Loma ezê wî bidim ber qamçiyan û
berdim.» 23 Lê dîsa ew li ser ya xwe diman û bi qîrîneke bilind
dixwestin ku ew bê xaçkirin û dengê wan bi ser ket. 24 Pîlatos
biryar da, ku daxwaza wan bê cih. 25 Wî ewê ku ji ber serhildan û
mêrkujiyê girtî bû, yê ku wan dixwest, ji zîndanê berda û Îsa bi
hêviya daxwaza wan ve hişt.

### *Xaçkirina Îsa*

*(Metta 27:31-44; Marqos 15:21-32; Yûhenna 19:17-27)*

26 Û gava ew dibirin, wan Şimûnê ku ji Kûrênê bû û ji zeviyê
vedigeriya, girtin. Xaç danîn ser pişta wî ku ew wê li pey Îsa bibe.

---

**23:16** Di hin destnivîsaran de ev jî heye: «Heçî Pîlatos bû, diviya ew di her cejnê de yekî girtî ji wan re ji zîndanê berde.»

27 Elaleteke mezin ji xelkê li pey Îsa diçû, di nav wan de pîrek jî
hebûn ku li singê xwe dixistin û li ser Îsa digirîn. 28 Îsa li wan zivirî
û got: «Ya keçên Orşelîmê, li ser min negirîn! Li ser xwe û za-
rokên xwe bigirîn! 29 Va ye, roj wê bên ku mirov wê bêjin: ‹Xwezî
bi yên ku bê ber in û xwezî bi wan zikên ku zarok neanîne û bi
wan çiçikên ku nemêjandine!›

30 Hingê mirov wê dest pê bikin û ji çiyan re bêjin:
‹Çiyano, bi ser me de bikevin!
Û ji giran re bêjin:
Girno, me veşêrin!›[a]

31 Eger weha bi dara ter bikin, ma halê dara hişk wê bibe çi?»
32 Û du mirovên din ên sûcdar jî dibirin, da ku ew jî bi Îsa re
bên kuştin. 33 Û çaxê ew gihîştin wî cihê ku Qoq jê re digotin,
wan ew û herdu sûcdar xaç kirin, yek li milê wî yê rastê û yê din
li milê wî yê çepê. 34 Hingê Îsa got: «Ya Bavê* min, li wan bi-
bihûre, çimkî ew nizanin ku ew çi dikin!» Wan jî pişk avêtin ser
cilên wî û li xwe leva kirin. 35 Xelk jî li wê derê rawestabû û te-
maşe dikir. Serdarên Cihûyan jî henekên xwe bi Îsa dikirin û di-
gotin: «Wî kesên din xilas kirin; eger ew Mesîhê bijartiyê Xwedê
be, de bila xwe xilas bike!» 36 Leşkeran jî tinazên xwe pê dikirin,
ew nêzîkî wî bûn û sihik* jê re anîn 37 û gotin: «Eger tu padîşahê
Cihûyan bî, de xwe xilas bike!» 38 Û di ser wî re jî bi herfên
Yewnanî, Latînî û Îbranî* weha hatibû nivîsîn: EV PADÎŞAHÊ
CIHÛYAN E.
39 Yekî ji wan sûcdarên daleqandî jî, Îsa şermezar kir û jê re
got: «Ka, ma tu ne Mesîh î? De ka xwe û me xilas bike!» 40 Lê yê
din lê hilat û got: «Ma tu ji Xwedê natirsî? Ma ne va ye, tu bi xwe
jî di bin eynî cezayî de yî? 41 Hema heçî em in, ev heqê me ye,
çimkî em bergîdana* wan tiştên xerab ên ku me kirine, distînin. Lê
wî tiştekî nerast nekiriye!» 42 Û ji Îsa re got: «Ya Îsa, çaxê tu di
Padîşahiya xwe de bêyî, min bîne bîra xwe!» 43 Îsa jî lê vegerand û
got: «Bi rastî ez ji te re dibêjim ku tê îro bi min re di bihiştê* de
bî!»

---

[a] **23:30** Ji: Hoşêya 10:8
**23:34** Di hin destnivîsaran de ayeta 34 tune.

### *Mirina Îsa*

*(Metta 27:45-56; Marqos 15:33-41; Yûhenna 19:28-30)*

44-45 Gava dibû nêzîkî saet diwanzdehê nîvro, rojê tarîtî girt û
tarî heta saet sisiyan ket ser seranserê welêt û perda Perestgehê di
nîvî re çiriya 46 û Îsa bi dengekî bilind kir qîrîn û got: «Ya Bavê
min, ‹ez ruhê xwe didim destên te!›[a]» Piştî ku wî ev gotina xwe
got, wî ruhê xwe da. 47 Gava sersedê* leşkeran tiştê çêbûyî dît, wî
pesnê Xwedê da û got: «Bi rastî ev mirovê ha, mirovekî rast bû.»
48 Ew hemû xelkê ku ji bo dîtina van tiştan civiyabû, gava dît ku çi
dibû, li singê xwe xist û vegeriya. 49 Hemû nasên Îsa û ew jinên ku
ji Celîlê li pey wî hatibûn, ji dûr ve rawestabûn û ev tiştên ha temaşe dikirin.

### *Veşartina Îsa*

*(Metta 27:57-61; Marqos 15:42-47; Yûhenna 19:38-42)*

50 Îcar zilamek bi navê Ûsiv hebû; ew endamekî civîna* giregiran û mirovekî qenc û rast bû.
51 Ev mirov bi xwestin û kirina civîna giregiran razî nebûbû. Ew ji bajarekî Cihûyan, ji Arîmetyayê
bû û li hêviya hatina Padîşahiya Xwedê bû. 52 Ew çû ba Pîlatos û
cesedê Îsa jê xwest. 53 Gava cesed ji xaçê anî xwarê, wî ew di nav
cawekî de pêça û ew xist goreke ku di latê de hatibû kolan. Hê kesek tê de nehatibû veşartin.
54 Ew roj roja* Amadekirinê bû û roja*
Şemiyê dest pê dikir. 55 Ew jinên ku ji Celîlê bi Îsa re hatibûn, li
pey Ûsiv çûn, wan gor û çawa cesedê Îsa tê de hat danîn, dîtin.
56 Hingê ew vegeriyan, wan rûn û giyayên bîhnxweş amade kirin.
Û roja Şemiyê li gor Şerîetê* tu kar nekirin û bîhna xwe vedan.

### ***Rabûna Îsa ya ji nav Miriyan***

*(Metta 28:1-10; Marqos 16:1-8; Yûhenna 20:1-10)*

24 Lê roja pêşî ya heftiyê, hê sibê zû, ew jin hatin ser gorê.
Wan giyayên bîhnxweş ên ku amade kiribûn, bi xwe re
anîn. 2 Wan dît ku kevirê ser gorê ji cihê xwe gindiriye, 3 lê gava
ew çûn nav wê, wan cesedê Xudan Îsa nedît. 4 Gava ew ji ber vê
yekê hê şaş diman, ji nişkê ve du zilamên ku şewq ji cilên wan
diçû li ba wan rawestan. 5 Jinan ji tirsa serê xwe kirin ber xwe.

---

[a] 23:46 Ji: Zebûr 31:5

Zilaman ji wan re got: «Çima hûn di nav miriyan de li yê sax
digerin? [6] Ew ne li vê derê ye, ew rabûye. Bînin bîra xwe, çaxê ku
ew hê li Celîlê bû, wî çi ji we re digot: [7] ‹Divê Kurê Mirov bikeve
nav destên gunehkaran, bê xaçkirin û roja sisiyan dîsa rabe.›»
[8] Û jinan jî gotinên Îsa anîn bîra xwe. [9] Ew ji ser gorê vege-
riyan û çûn, ji her yanzdeh şagirtan û ji hemûyên din re her tişt
gotin. [10] Yên ku xeber ji Şandiyan* re anîn, ev in: Meryema* Mej-
delanî, Yohana, Meryema* diya Aqûb û hinekên din ên ku bi wan
re bûn. [11] Ev yek li ber çavên Şandiyan wek çîrokeke pûç xuya bû
û wan ji jinan bawer nekir. [12] Lê Petrûs rabû ser xwe û bezî ser
gorê. Gava wî xwe bi ser de xwar kir, wî ji kefenan pê ve tu tiştê
din nedît. Ew çû mala xwe û li vî tiştê bûyî şaş dima.

### *Li ser Riya Emwasê*

*(Marqos 16:12-13)*

[13] De îcar di wê rojê de dido ji wan diçûn gundekî ku navê wî
Emwas bû. Ev gund bi qasî yanzdeh kîlometreyan ji Orşelîmê dûr
bû. [14] Herdu ji xwe re li ser wan hemû tiştên bûyî dipeyivîn. [15] Îcar
gava ew hê ji xwe re dipeyivîn û ji hev dipirsîn, Îsa bi xwe nêzîkî
wan bû û bi wan re çû. [16] Lê çavên wan dihatin girtin, da ku ew wî
nas nekin.
[17] Îsa ji wan re got: «Ev çi gotin in ku hûn di rê de ji hev re
dibêjin?» Ew sekinîn û xemgîn man [18] û yekî ji wan, ku navê wî
Klêpas bû, lê vegerand û got: «Ma tu yê bi tenê yî ku li Orşelîmê
dimîne û nizane ku li wê derê di van rojan de çi çêbûye!» [19] Wî ji
wan pirsî û got: «Çi çêbûye?» Û wan got: «Ew tiştên ku li ser Îsa-
yê Nisretî, yê ku pêxember bû û bi gotin û kirinê li ber Xwedê û li
ber tevahiya gel hêzdar bû [20] û çawa serekên kahînan û mezinên
me, ji bo ku cezayê mirinê bidinê, ew dan dest û wan ew xaç kir?
[21] Lê me hêvî dikir, ku yê Îsraêl xilas bike, ew e. Ji bilî van hemû-
yan jî, va ye, îro roja sisiyan e ku ev tişt bûne. [22] Bi ser de çend
jinên ji nav me em şaş kirin. Ew hê sibê zû li ser gorê bûn, [23] û
cesedê wî tê de nedîtin. Ew vegeriyan û gotin ku milyaket li ber
çavên wan xuyabûn û gotin ku ew dijî. [24] Li ser vê yekê hinek ji
yên ku bi me re ne, çûn ser gorê û çawa ku jinan gotibû, wusa
dîtin. Lê wan ew bi xwe nedît.»
[25] Îsa ji wan re got: «Hey hûn bêhişno, hûn ên ku bi derengî bi

wan hemû gotinên pêxemberan bawer dikin. 26 Ma nediviya ku
Mesîh ev tişt bikişandana û biçûya nav rûmeta xwe?» 27 Îcar wî ji
Mûsa* û hemû pêxemberan dest pê kir û ji wan re tiştên ku li ser
wî di hemû Nivîsarên* Pîroz de hatibûn nivîsîn, şîrovekirin.

28 Gava ew nêzîkî wî gundê ku ew diçûnê, bûn, Îsa wek ku ewê
hê wêvetir biçûya kir. 29 Lê wan li ber wî da û jê re gotin: «Li ba
me bimîne, çimkî berêvar e û roj li ber ava ye!» Îsa bi wan re çû û
derbasî hundir bû, da ku li ba wan bimîne.

30 Û gava ew bi wan re li ser sifrê rûnişt, wî rahişt nên, şikir
kir, şkand û da wan. 31 Hingê çavên wan vebûn û wan ew nas kir.
Lê ew ji ber çavên wan winda bû. 32 Wan ji hev re got: «Çaxê ku
ew di rê de bi me re dipeyivî û Nivîsarên Pîroz ji me re şîrove
dikirin, ma gotinên wî agir bi dilê me nedixistin?» 33 Û hema di wê
saetê de herdu rabûn û vegeriyan Orşelîmê. Wan her yanzdeh şa-
girt û yên din ên bi wan re li hev civiyayî dîtin. 34 Wan ên din di-
gotin: «Xudan bi rastî rabûye û xwe nîşanî Şimûn* daye.» 35 Wan
herduyan jî got ku di rê de çi çêbû û gava ku Îsa nan şkand, wan
çawa ew nas kir.

### *Îsa Xwe Nîşanî Şagirtan Dide*

*(Metta 28:16-20; Marqos 16:14-18; Yûhenna 20:19-23;*
*Karên Şandiyan 1:6-8)*

36 Hê ew wusa bi hev re dipeyivîn, Îsa bi xwe di nav wan de
rawesta û got: «Silamet li ser we be!» 37 Lê ew bizdiyan û tirsiyan,
wan guman kir ku ew ruhekî li ber çavên xwe dibînin. 38 Îsa ji wan
re got: «Çima hûn şaş mane û dudilî ne? 39 Li dest û lingên min
binêrin, ez bi xwe me. Destên xwe li bedena min bidin û bibînin;
çimkî ruh bê goşt û hestî ye, lê wek ku hûn dibînin, ez bi goşt û
hestî me!» 40 Û gava wî ev ji wan re got, wî dest û lingên xwe nî-
şanî wan dan. 41 Lê wan ji şabûnê hê bawer nekiribû û şaşmayî
bûn. Îcar wî ji wan re got: «Ka tiştekî xwarinê li ba we heye?»
42 Wan jî perçek ji masiyekî biraştî dan wî. 43 Wî ew ji destê wan
rahişt û li pêş wan xwar. 44 Hingê wî ji wan re got: «Ha ew gotinên
min ên ku gava hê ez bi we re bûm, min ji we re gotibûn, ev in:
Divê ew hemû tiştên ku di Şerîeta Mûsa, di Nivîsarên Pêxemberan
û di Zebûran de li ser min hatine nivîsîn, bên cih.»

45 Hingê wî hişê wan vekir, da ku ew bikarin Nivîsarên* Pîroz

fêm bikin. 46 Û wî ji wan re got: «Weha hatiye nivîsîn, Mesîh wê
cefayê bikişîne û wê roja sisiyan ji nav miriyan rabe 47 û ji Orşe-
lîmê bigire heta hemû miletên dinyayê, bi navê wî tobe û efûbûna
gunehan, wê ji wan re bê danbihîstin. 48 Hûn şahidên van tiştan in
49 û va ye, ezê soza Bavê xwe bişînim ser we. Lê hûn li bajêr bi-
mînin, heta ku hûn ji jor hêzê bistînin.»

### *Hilkişîna Îsa nav Ezmanan*

*(Marqos 16:19-20; Karên Şandiyan 1:9-11)*

50 Îcar wî ew derxistin û birin heta bi Beytanyayê û li wê derê
wî destên xwe hildan û ew pîroz kirin. 51 Û wê gava ku wî ew pîroz
dikirin, ew ji wan cuda bû, hat rakirin û hilkişiya nav ezmên. 52 Ew
jî perizîn* wî û bi dilekî pirr xweş vegeriyan Orşelîmê. 53 Û ew her
dem di Perestgehê de bûn û pesnê Xwedê didan.

# *Mizgîniya Îsa Mesîh li gor Yûhenna*

### *Pêşgotin*

*Nivîskarê vê kitêbê di dawiya sedsala pêşî de ev berhem nivîsiye. Nivîskar bi xwe navê xwe nade. Herwekî ku tê zanîn, nivîskar yek ji her diwanzdeh şagirtên* Îsa*, Yûhenna ye. Yûhenna xwe wek şagirtê ku Îsa jê hez dikir dide naskirin (1:14; 19:35; 21:24).*

*Armanca sereke ya nivîsara vê kitêbê diyarkirina Peyva* Xwedê ye (1:1-18). Nivîskar çend karên Îsa yên nedîtî û hêzdar (keramet, mûcîze) û rabûna wî ya ji nav miriyan tîne zimên û diyar dike ku wî ev nîşanên bijare ji bo ku mirov baweriyê bi Mesîh* bînin û bigihîjin jiyana herheyî nivîsîne (20:30, 31).*

*Îsa bi hînkirin, jiyan, mirin û vejîna xwe (rabûna xwe ya ji nav miriyan) riya perizîna (îbadeta) rastîn û aştiyê* nîşanî mirovan dide û ji bo jiyana herheyî dibe ronahî. Ew weha dibêje: «Rê, rastî û jiyan ez im» (14:6). Îsa bi meseleyên ku bi jiyana rojane re têkildar in, wek av, nan, şivan, mî û hwd. bêhijmar rastiyên ruhanî ji nêzîk ve ronahî dike.*

*Taybetiyeke nivîsara Yûhenna heye ku wê ji nivîsara Metta, Marqos û Lûqa cihê dike. Di bijartina mijarê de, di gel ku ew bêtir li ser xizmetên Îsa yên li Celîlê radiwestin, Yûhenna li ser xizmeta li Orşelîmê* radiweste. Ew hînkirina Îsa bi meselan dibêjin, Yûhenna vê hînkirinê bi peyivînên* rûbirû tîne zimên. Bêguman ji bilî van hê gelek cihêtiyên din jî di navbera wan de hene. Çimkî her nivîskarî komên xwendevanên cihê ji bo xwe armanc girtiye.*

*Ev nivîsar dikare bi vî awayî bê beşkirin:*

- *I. Destpêk û Peyva pêşî (1:1-18)*
- *II. Şahidiya Yûhennayê imadkar û şagirtên Îsa yên pêşî (1:19-51)*
- *III. Xizmeta Îsa ya li aliyê Çemê Urdunê, li Celîlê û li Orşelîmê (2:1-12:50)*
- *IV. Gotinên Îsa yên ji şagirtan re (13:1-17:26)*
- *V. Girtin û xaçkirina Îsa (18:1-19:42)*
- *VI. Rabûna Îsa ya ji nav miriyan (20:1-31)*
- *VII. Îsa careke din xwe nîşanî şagirtan dide (21:1-25)*

### *Di Destpêkê de Peyv Hebû*

1 Di destpêkê de Peyv* hebû. Peyv bi Xwedê re bû û Peyv bi
xwe Xwedê bû. 2 Ew di destpêkê de bi Xwedê re bû. 3 Her tişt
bi wî afirî û bêyî wî qet tu tişt neafirî. 4 Jiyan di wî de bû û jiyan
ronahiya mirovan bû. 5 Ronahî di tariyê de şewq dide û tarî nikare
wê binixême.
6 Mirovek ji aliyê Xwedê ve hatibû şandin ku navê wî Yûhen-
na* bû. 7 Ew ji bo şahidiyê hat. Ew hat ji bo ku şahidiya ronahiyê
bike, da ku hemû bi rêberiya wî baweriyê* bînin. 8 Ew bi xwe ne
ronahî bû, lê ew hat ku şahidiya ronahiyê bike. 9 Ronahiya rastîn,
ewê ku hemû mirovan ronahî dike, dihat dinyayê. 10 Ew li dinyayê
bû û dinya bi wî afirî. Lê dinyayê ew nas nekir. 11 Ew hat mala
xwe, lê gelê wî ew qebûl nekir. 12 Lê hemûyên ku ew qebûl kirin û
bawerî* bi navê wî anîn, wî desthilatî da wan ku bibin zarokên
Xwedê. 13 Ew ne ji xwînê, ne ji xwestina bedenê û ne jî ji xwestina
mirov çêbûn, lê ew ji Xwedê çêbûn.
14 Û Peyv* bû xwîn û goşt, bi kerem û rastiyê tije di nav me de
konê* xwe danî. Me rûmeta wî, yanî rûmeta Kurê* yekta yê ku ji
Bav* tê dît. 15 Yûhenna ji bo wî şahidî kir û bi dengekî bilind got:
«Min gotibû: ‹Yê ku piştî min tê di ser min re ye, çimkî ew beriya
min hebû.› Yê ku min li ser digot ev bû.» 16 Me hemûyan ji xezîna
wî kerem li ser keremê stand. 17 Çimkî Şerîet* bi destê Mûsa* hat
dayîn, kerem û rastî bi destê Îsa* Mesîh* hatin. 18 Tu caran, tu kesî
Xwedê nedîtiye, lê Kurê yekta, Xwedayê ku li ber singê Bav* e,
wî bi xwe ew da zanîn.

### *Şahidiya Yûhennayê Imadkar*

*(Metta 3:1-12; Marqos 1:1-8; Lûqa 3:15-17)*

19 Şahidiya Yûhenna ev e: Çaxê serekên Cihûyan ji Orşelîmê*
hin ji kahîn* û ji Lêwiyan* şandin, da ku ji wî bipirsin: «Tu kî yî?»,
20 wî eşkere got, wî înkar nekir û got: «Ez ne Mesîh im.» 21 Wan jê
pirsî: «Nexwe tu kî yî? Ma tu Êlyas* î?» Yûhenna got: «Na, ez ne
ew im.» Ji pirsa «Ma tu ew pêxember* î?» re jî, wî got: «Na, ez ne
ew im jî» 22 Îcar wan jê re got: «Tu kî yî? Tu ji bo xwe çi dibêjî?
Da ku em bersîvekê bidin wan ên ku em şandine.» 23 Wî got:

---

**1:21** Melaxî 4:5; Dubarekirina Şerîetê 18:15, 18

«Ez ew deng im ku li çolê gazî dike:
‹Riya Xudan* rast bikin!›[a]
wek ku Îşaya* pêxember gotiye.» 24 Niha yên ku hatibûn şandin ji
Fêrisiyan* bûn. 25 Wan jê pirsî: «Madem tu ne Mesîh, ne Êlyas û
ne jî ew pêxember î, nexwe tu çima imad* dikî?» 26 Yûhenna ber-
sîva wan da û got: «Ez bi avê imad dikim, lê yek di nav we de
radiweste, hûn nizanin ew kî ye. 27 Ew e, yê ku piştî min tê, ez ne
hêja me ku benên çaroxa wî vekim.» 28 Ev tişt hemû li wî serê
Urdunê, li Beytanyayê, li cihê ku Yûhenna lê imad dikir çêbûn.

### *Berxê Xwedê*

29 Dotira rojê Yûhenna dît ku Îsa* ber bi wî ve tê. Û wî got:
«Va ye! Berxê Xwedê yê ku gunehên dinyayê radike. 30 Ev ew kes
e ku min ji bo wî gotibû: ‹Piştî min yek tê ku di ser min re ye,
çimkî ew beriya min hebû.› 31 Min bi xwe nizanibû ew kî ye, lê ji
bo ku ew ji Îsraêlê re bê diyarkirin, ez hatim ku bi avê imad
bikim.» 32 Yûhenna şahidî kir û got: «Min dît ku Ruh ji ezmên
wek kevokê hat xwar, li ser wî danî û ma. 33 Min bi xwe nizanibû
ew kî ye, lê yê ku ez şandim da ku ez bi avê imad bikim, ji min re
got: ‹Tu bibînî ku Ruh bê xwar û li ser kê dane, yê ku bi Ruhê*
Pîroz imad dike, ew e.› 34 Min jî dît û şahidî kir ku Kurê* Xwedê
ev e.»

### *Şagirtên Pêşî*

35 Dotira rojê dîsa Yûhenna bi du şagirtên* xwe re radiwesta.
36 Dema wî dît ku Îsa* derbas dibe, wî got: «Va ye, Berxê Xwe-
dê!» 37 Du şagirtan gotina wî bihîst û li pey Îsa çûn. 38 Îsa li pişt
xwe zivirî û dît ku ew li pey wî tên. Wî ji wan re got: «Hûn li çi
digerin?» Wan jê re got: «Rebbî» – ku bê wergerandin: «Ma-
moste» – «tu li ku derê dimînî?» 39 Wî ji wan re got: «Werin, hûnê
bibînin.» Îcar ew çûn û wan dît ku ew li ku derê dimîne û ew wê
rojê li ba wî man. Wext piştî nîvro, saet li dora çaran bû. 40 Yek ji
wan herdu kesên ku Yûhenna bihîstibûn û li pey Îsa çûbûn, End-
rawisê birayê Şimûn-Petrûs bû. 41 Wî di cih de birayê xwe Şimûn
dît û jê re got: «Me Mesîh* dît», ku bê wergerandin «Yê Rûnkirî»

---

[a] **1:23** Ji: Îşaya 40:3

ye. [42] Wî ew anî ba Îsa. Îsa li Şimûn nêrî û got: «Tu Şimûnê* kurê
Yûhenna yî. Wê bi navê Kîfas» – ku ‹Petrûs*› e û bi mana ‹lat› e –
«gazî te bikin.»

### *Îsa Gazî Filîpos û Natanyêl Dike*

[43] Dotira rojê Îsa biryar da ku here herêma Celîlê*. Wî Filîpos
dît û jê re got: «Li pey min were!» [44] Filîpos ji Beytsaydayê bû, ji
wî bajarê ku Endrawis û Petrûs lê dijiyan. [45] Filîpos Natanyêl dît û
jê re got: «Me Kurê Ûsiv, Îsayê Nisretî dît, yê ku Mûsa di Şerîeta*
xwe de û pêxemberan li ser nivîsîne.» [46] Natanyêl jê pirsî: «Ma ji
Nisretê tiştekî qenc dikare derkeve?» Filîpos jê re got: «Were û
bibîne!» [47] Gava Îsa dît ku Natanyêl ber bi wî ve tê, li ser wî got:
«Va ye, Îsraêliyekî rastîn ê ku tu hîle li ba wî tune.» [48] Natanyêl jê
pirsî: «Ma tu ji ku derê min nas dikî?» Îsa bersîva wî da: «Beriya
ku Filîpos gazî te bike, gava ku tu hê li binê dara hêjîrê rûniştî
bûyî, min tu dîtî.» [49] Natanyêl jê re got: «Mamoste, tu Kurê* Xwe-
dê yî! Tu Padîşahê Îsraêlê yî!» [50] Îsa lê vegerand û got: «Ji ber ku
min ji te re got: ‹Min tu li binê dara hêjîrê dîtî›, tu bawer* dikî? Tê
tiştên ji vê meztir bibînî.» [51] Û Îsa jê re got: «Bi rastî, bi rastî ez ji
we re dibêjim, hûnê bibînin ku çawa ezman diqelişe û milyaketên
Xwedê tên xwarê ser Kurê* Mirov û diçin jorê.»

### *Dîlana li Gundê Qenaya Celîlê*

2 Piştî du rojan li bajarê Qenaya Celîlê* dîlanek hebû û diya Îsa
jî li wê derê bû. [2] Îsa û şagirtên* xwe jî ji bo dîlanê hatibûn
vexwendin. [3] Dema ku şerab ber xilasbûnê bû, diya Îsa jê re got:
«Şeraba wan nema.» [4] Îsa lê vegerand û got: «Sitiyê, te çi ji min e?
Hê saeta min nehatiye.» [5] Diya wî ji xizmetkaran re got: «Her çi ji
we re bêje, bikin.» [6] Îcar li wê derê şeş kûpên kevirîn hebûn ku
Cihûyan ji bo adetên xwe yên paqijkirinê bi kar dianîn. Her yekî ji
wan di navbera du-sê denan* de av hildida. [7] Îsa ji wan re got:
«Van kûpan bi avê tije bikin.» Û wan jî ew heta ber dev tije kirin.
[8] Hingê wî ji wan re got: «Niha hinekê derxin û ji serekê ziyafetê
re bibin.» Wan jî ew bir. [9] Gava ku serekê ziyafetê ji ava ku bûbû

---

**1:51** Destpêkirin 28:12
**2:6** Dena Cihûyan a hingê nêzîkî 37 lître bû.

şerab vexwar, wî tê dernexist ku ew ji ku derê hatiye. Lê xiz-
metkarên ku av anîbûn, dizanibûn. Serekê ziyafetê gazî zavê kir
10 û jê re got: «Her kes pêşî şeraba qenc pêşkêş dike. Û çaxê ku yên
vexwendî zêde vexwarin, ew a neqenc derdixe. Lê te şeraba qenc
heta niha hilanî.» 11 Ev nîşana ku Îsa li Qenaya Celîlê çêkir a pêşî
bû. Bi vî awayî wî rûmeta xwe da xuyakirin û şagirtên wî bawerî*
pê anîn.
12 Piştî vê yekê, Îsa tevî diya xwe, birayên xwe û şagirtên xwe
çû Kefernahûmê û ew gelek rojan li wê derê neman.

### *Îsa Perestgehê Paqij Dike*

*(Metta 21:12-13; Marqos 11:15-17; Lûqa 19:45-46)*

13 Cejna* Derbasbûnê ya Cihûyan nêzîk bû û Îsa hilkişiya Or-
şelîmê*. 14 Di Perestgehê* de wî ew kesên ku dewar, mî û kevok
difirotin û serafkerên rûniştî dîtin. 15 Îcar wî ji benan qamçiyek
çêkir, ew hemû û dewar û mî jî, ji Perestgehê derxistin; perên pere-
guhêran rijandin û maseyên wan gêr kirin. 16 Wî ji kevokfiroşan re
got: «Van ji vê derê rakin! Êdî mala Bavê* min nekin bazargeh!»
17 Hat bîra şagirtên wî ku hatiye nivîsîn: «Xîretkêşiya ji bo mala te
wê min bixwe.»[a] 18 Li ser vê yekê Cihûyan jê pirsî: «Tê ji bo me çi
nîşanê çêkî ku desthilatiya te heye, tu van dikî?» 19 Îsa bersîva wan
da û got: «Vê Perestgehê hilweşînin, ezê di sê rojan de rakim.»
20 Li ser vê yekê Cihûyan jê re got: «Avakirina vê Perestgehê çil û
şeş salan kişand. Ma tê wê di sê rojan de rakî?» 21 Lê Îsa li ser
Perestgeha bedena xwe dipeyivî. 22 Piştre, dema ku ew ji nav miri-
yan rabû, hat bîra şagirtên wî ku Îsa ev yek gotiye û wan bi
Nivîsara* Pîroz û bi gotinên Îsa bawer* kir.

### *Zanîna Îsa ya li ser Mirovan*

23 Îcar dema ku Îsa di Cejna Derbasbûnê de li Orşelîmê bû,
gelekan ew nîşanên ku wî dikirin dîtin û bawerî bi navê wî anîn.
24 Lê Îsa bawerî li wan nedianî. Çimkî wî bi xwe bi hemû mirovan
dizanibû. 25 Hewcedariya wî bi şahidiya mirovan jî tunebû, çimkî
wî dizanibû ku çi di dilê mirovan de ye.

---

[a] **2:17** Ji: Zebûr 69:9

### *Îsa û Nîkodêmos*

3 Bi navê Nîkodêmos mirovek ji Fêrisiyan* hebû ku serekekî
Cihûyan bû. 2 Ev mirov bi şev hat ba Îsa û jê re got: «Ma-
moste, em dizanin ku tu mamosteyekî ji ba Xwedê hatiyî, çimkî
ew nîşanên ku tu çêdikî, eger Xwedê ne pê re be, tu kes nikare
bike.»
3 Îsa bersîva wî da û got: «Bi rastî, bi rastî ez ji te re dibêjim ku
mirovek ji nû ve çênebe, ew nikare Padîşahiya* Xwedê bibîne.»
4 Nîkodêmos jê pirsî: «Ma mirovekî ku pîr be çawa dikare ji nû ve
çêbe? Ma dikare careke din bikeve malzaroka diya xwe û çêbe?»
5 Îsa bersîva wî da: «Bi rastî, bi rastî ez ji te re dibêjim, heta ku
mirov ji avê û ruh çênebe, nikare bikeve Padîşahiya Xwedê. 6 Yê
ku ji bedenê çêdibe beden e, yê ku ji Ruh çêdibe ruh e. 7 Li peyva*
ku min ji te re got: ‹Divê hûn ji nû ve çêbin›, şaş nemîne. 8 Ba li ku
derê bixwaze lê dixe. Tu dengê wê dibihîzî, lê tu nizanî ku ew ji ku
derê tê û bi ku derê ve diçe; her kesê ku ji Ruh çêdibe weha ye.»
9 Nîkodêmos jê re got: «Ev tişt çawa dikare çêbe?» 10 Îsa lê
vegerand û got: «Tu mamosteyê Îsraêl î û tu van tiştan nizanî?
11 Bi rastî, bi rastî ez ji te re dibêjim, tiştê ku em dizanin, em di-
bêjin, tiştê ku me dîtiye em şahidiya wî dikin; lê hûn şahidiya me
qebûl nakin. 12 Min tiştên li ser erdê ji we re got û hûn bawer na-
kin. Nexwe eger ez tiştên li ezmanan bêjim, hûnê çawa bawer bi-
kin? 13 Ji bilî Kurê* Mirov ê ku ji ezmên hatiye, tu kes derneketiye
ezmên. 14 Çawa ku Mûsa li çolê mar bilind kir, bi vî awayî divê
Kurê Mirov jî bê bilindkirin, 15 da her kesê ku baweriyê bi wî bîne,
jiyana wî ya herheyî hebe.»
16 Çimkî Xwedê wusa ji dinyayê hez kir ku Kurê xwe yê yekta
da, da her kesê ku baweriyê bi wî bîne helak nebe, lê jiyana wî ya
herheyî hebe. 17 Xwedê Kurê xwe neşand ku dinyayê sûcdar derxe,
lê ew şand ku dinya bi wî xilas bibe. 18 Yê ku baweriyê bi wî tîne,
sûcdar nayê derxistin; lê yê ku baweriyê nayne, ji xwe sûcdar bû-
ye, çimkî wî bawerî bi navê Kurê* Xwedê yê yekta neaniye.
19 Sedemê dîwanbûnê* ev e ku ronahî hat dinyayê, lê mirovan ji
ronahiyê bêtir ji tariyê hez kir, çimkî kirinên wan xerab bûn. 20 Her

---

3:8 Bi zimanê Yewnanî peyva ji bo «Ruh» û ji bo «bayê» yek e.

kesê ku xerabiyê dike, kîna wî ji ronahiyê heye; ew ber bi ronahiyê
ve nayê, da ku kirinên wî xuya nebin. 21 Lê yê ku rastiyê dike, tê
ber ronahiyê, da kifş bibe ku kirinên wî ji Xwedê ne.

### *Îsa û Yûhennayê Imadkar*

22 Piştî vê yekê Îsa û şagirtên xwe çûn herêma Cihûstanê*. Îsa
li wê derê bi wan re dima û imad* dikir. 23 Yûhenna bi xwe jî li
Eynona nêzîkî Salîmê imad dikir, çimkî li wê derê pirr av hebû.
Mirov dihatin wê derê û imad dibûn. 24 – Hingê hê Yûhenna nea-
vêtibûn zîndanê. –
25 Îcar di navbera şagirtên Yûhenna û Cihûyekî de, li ser pirsa
adetên paqijiyê munaqeşeyek derket. 26 Îcar ew hatin ba Yûhenna û
jê re gotin: «Mamoste, ew kesê ku li wî aliyê Çemê Urdunê bi te re
bû û te jê re şahidî kir, va ye, ew bi xwe imad dike û hemû kes
diçin ba wî.»
27 Yûhenna bersîv da û got: «Eger ji yekî re ji ezmên neyê
dayîn, ew nikare tiştekî bistîne. 28 Hûn bi xwe ji min re şahid in ku
min gotiye: ‹Ez ne Mesîh im, lê ez di pêşiya wî de hatime şandin.›
29 Bûk ji bo kê be zava ew e. Lê destbirayê zavê yê ku rawestayî ye
û dengê zavê dibihîze, bi dengê wî gelek şa dibe. Îcar ev şabûna
min niha temam bûye. 30 Ji wî re mezinbûn, ji min re biçûkbûn
divê.

### *Yê ku ji Ezmanan Tê*

31 «Yê ku ji jorê hatiye di ser hemûyan re ye. Yê ku ji erdê ye,
ji erdê dipeyive; lê yê ku ji ezmên hatiye, di ser hemûyan re ye.
32 Wî çi dîtibe û çi bihîstibe şahidiya wan dike, lê tu kes şahidiya
wî qebûl nake. 33 Yê ku şahidiya wî qebûl dike, mor dike ku Xwe-
dê rast e. 34 Yê ku Xwedê ew şandiye, ew bi gotina Xwedê dipe-
yive, çimkî Xwedê Ruh bêsînor dide wî. 35 Bav* ji Kur hez dike û
her tişt daye destê wî. 36 Yê ku baweriyê bi Kur tîne, jiyana wî ya
herheyî heye. Yê ku bi ya Kur nake, jiyanê nabîne, lê xezeba Xwe-
dê li ser wî dimîne.»

### *Ava Jiyana Herheyî û Perizîna bi Ruh û Rastiyê*

4 Dema Îsa hîn bû ku Fêrisiyan* bihîstiye, wî ji Yûhenna bêtir
şagirt civandine û bi avê imad dike 2 – lê belê ne Îsa bi xwe, bi

tenê şagirtên wî imad dikirin – [3] ew ji Cihûstanê* derket û dîsa çû
Celîlê*.
[4] Di dema rêwîtiyê de diviya ku ew di Sameryayê* re derbas
bibûya. [5] Ew hat bajarekî Sameryayê ku navê wî Sûxar bû. Ev der
nêzîkî wê zeviyê bû ku Aqûb* dabû kurê xwe Ûsiv. [6] Bîra Aqûb li
wê derê bû. Îsa wusa ji rêwîtiyê westayî li kêleka bîrê rûnişt. Wext
nîvro bû.
[7] Jineke Samerî* hat ku avê bikişîne. Îsa ji wê re got: «Avê
bide min ez vexwim.» [8] Şagirtên wî jî çûbûn bajêr ku tiştên xwa-
rinê bikirrin. [9] Jinika Samerî jê re got: «Çawa dibe ku tu ji min avê
dixwazî? Tu Cihû yî û ez jî jinikeke Samerî me.» – Tu têkiliya Ci-
hûyan bi Sameriyan re tune. – [10] Îsa bersîva wê da û got: «Eger te
bi dayîna Xwedê û yê ku ji te re dibêje: ‹Avê bide min ez vexwim›
bizaniya, teyê jê bixwesta û wiyê ava jiyanê bida te.» [11] Jinikê jê re
got: «Ezxadim, tiştekî te yê ku tu avê pê bikişînî tune û bîr jî kûr e!
Tê ava jiyanê ji ku derê bînî? [12] Ma tu ji bavê me Aqûb meztir î, yê
ku ev bîr daye me? Wî bi xwe, zarokên wî û pez û dewarên wî av
jê vexwarine.» [13] Îsa bersîv da û jê re got: «Her kesê ku ji vê avê
vexwe, wê dîsa tî bibe. [14] Lê kî ji ava ku ez bidimê vexwe, tu caran
tî nabe. Belê ew ava ku ezê bidim wî, wê di dilê wî de ji bo jiyana
herheyî bibe kaniyeke ava ku diherike.» [15] Jinikê jê re got: «Ez-
xadim, vê avê bide min ku êdî ez tî nebim û neyêm ji vir avê
nekişînim.»
[16] Îsa lê vegerand û jê re got: «Here gazî mêrê xwe bike û were
vir.» [17] Jinikê bersîva wî da û got: «Mêrê min tune.» Îsa jê re got:
«Te rast got ku mêrê te tune, [18] çimkî pênc mêrên te hebûn û yê ku
niha tu pê re yî, ne mêrê te ye. Te ev rast got.» [19] Jinikê jê re got:
«Ezxadim, ez dibînim ku tu pêxemberek î. [20] Bav û kalên me li vî
çiyayî perizîn*, lê hûn dibêjin cihê ku divê mirov lê biperize li
Orşelîmê ye.» [21] Îsa jê re got: «Sitiyê, ji min bawer bike, wext tê,
ku hûnê ne li vî çiyayî û ne jî li Orşelîmê biperizin Bav*. [22] Hûn
diperizin wî yê ku hûn nas nakin, lê em diperizin wî yê ku em nas
dikin, çimkî xilasî ji Cihûyan tê. [23] Lê belê wext tê û niha ye: Yên
ku bi rastî diperizin, ewê bi ruh û bi rastiyê biperizin Bav. Çimkî
yên ku Bav li wan digere ew in ku bi vî awayî diperizin wî.
[24] Xwedê ruh e û yên ku diperizin wî, divê bi ruh û bi rastiyê

biperizin wî.» 25 Jinikê jê re got: «Ez dizanim ku Mesîh» – yê ku jê
re ‹Yê Bijartî› dibêjin – «wê bê û gava ku ew bê, ewê her tiştî nîşanî
me bide.» 26 Îsa jê re got: «Ez ê ku bi te re dipeyivim, ez ew im.»
27 Li ser vê yekê şagirtên Îsa hatin. Ew gelek şaş man ku ew bi
jinekê re dipeyive, lê kesî negot: «Tu çi dixwazî?» an «Çima tu bi
wê re dipeyivî?» 28 Îcar jinikê cerê xwe hişt, çû bajêr û ji xelkê re
got: 29 «Werin, wî mirovî bibînin, yê ku hemû tiştên ku min berê
kiribûn ji min re gotin. Gelo Mesîh ev e?» 30 Xelk ji bajêr derketin
û ber bi Îsa ve dihatin.
31 Di vê navê de şagirtên wî jê lava dikirin û digotin: «Ma-
moste, tiştekî bixwe!» 32 Lê Îsa ji wan re got: «Xwarineke min a ku
hûn pê nizanin heye.» 33 Şagirtan ji hevdû pirsî: «Gelo kesekî jê re
xwarin aniye?»
34 Îsa ji wan re got: «Xwarina min ew e, ku ez daxwaza wî yê ku
ez şandime bikim û karên wî pêk bînim. 35 Ma hûn bi xwe nabêjin:
‹Hê ji dema dirûnê re çar meh hene›. Va ye, ez ji we re dibêjim,
çavên xwe hildin û li zeviyên ku zer bûne, ji dirûtinê re amade ne
binêrin. 36 Yê ku didirû heqê xwe distîne û ji bo jiyana herheyî ber
dicivîne, da hem ê ku diçîne û hem ê ku didirû bi hev re dilgeş
bibin. 37 Çimkî li vir peyva* ‹Yek diçîne û yek didirû› rast e: 38 Min
hûn şandin, da ku hûn zeviya ku hûn di ber de nexebitîne bidirûn;
hinekên din di ber de xebitîn û hûn li ser xebata wan rûniştin.»

### *Xelkê Sameryayê Baweriyê bi Îsa Tînin*

39 Gelek Sameriyên ku ji wî bajarî bûn, li ser şahidiya jinikê ya
ku digot: «Hemû tiştên ku min berê kiribûn wî ji min re gotin»,
bawerî bi Îsa anîn. 40 Îcar dema ku Samerî hatin ba wî, jê lava kirin
ku ew li ba wan bimîne. Ew jî du rojan li wê derê ma. 41 Gelekên
din jî li ser gotina wî bawerî anîn 42 û wan ji jinikê re got: «Êdî
bawerkirina me ne li ser gotina te ye, çimkî me bi xwe bihîst û em
dizanin ku bi rastî jî Xilaskarê dinyayê ev e.»

### *Îsa Kurê Karmendekî Qenc Dike*
*(Metta 8:5-13; Lûqa 7:1-10)*

43 Piştî van herdu rojan Îsa ji wir çû Celîlê. 44 Îsa bi xwe bûbû
şahid ku siyaneta* pêxemberekî li welatê wî tune. 45 Îcar dema ku
ew hat Celîlê, Celîliyan ji dil ew qebûl kir. Çimkî ew bi xwe jî li

Orşelîmê beşdarî Cejna* Derbasbûnê bûbûn û tiştên ku wî kiribûn,
dîtibûn.
46 Ew dîsa hat Qenaya Celîlê ya ku wî lê av kiribû şerab. Li wir
karmendekî padîşah hebû ku kurê wî li Kefernahûmê nexweş bû.
47 Dema wî bihîst ku Îsa ji Cihûstanê hatiye Celîlê, ew hat ba Îsa û
jê lava kir ku kurê wî qenc bike; çimkî ew li ber mirinê bû. 48 Îsa ji
wî re got: «Heta ku hûn nîşan û karên mezin nebînin, hûn qet
bawer nakin.» 49 Karmendê padîşah jê re got: «Ezbenî, beriya ku
kurikê min bimire, xwe bigihîne ser.» 50 Îsa lê vegerand û got:
«Here, kurê te dijî.» Zilam bi peyva* ku Îsa jê re gotibû bawer kir
û çû. 51 Hê ew negihîştibû jêr, xulamên wî hatin pêşiya wî û jê re
gotin: «Kurê te dijî.» 52 Îcar wî ji xulamên xwe pirsî, ka kurê wî di
kîjan saetê de ber bi qencbûnê ve çûye. Wan jê re got: «Duh piştî
nîvro saet di yekê de, tayê ew berda.» 53 Hingê bavê kurik fêm kir
ku tam di wê saetê de Îsa jê re gotibû: «Kurê te dijî.» Îcar wî û
tevahiya maliyên wî bawerî anîn. 54 Ev nîşana diduyan bû ku çaxê
Îsa ji Cihûstanê hatibû Celîlê çêkir.

### *Nexweşê Sî û Heşt Salan Qenc Dibe*

5 Piştî vê yekê cejneke Cihûyan hat û Îsa hilkişiya Orşelîmê.
2 Li Orşelîmê, li ber Dergehê Miyê hewzeke bi pênc eywa-
nan hebû. Bi Îbranî* jê re ‹Beythasta› dibêjin. 3-4 Di wan eywanan
de komeke mezin a nexweşan: Kor, şil û şeht* û felcî vedizeliyan.
Ew li benda çeliqandina avê diman. 5 Mirovek li wê derê hebû ku
ji sî û heşt salan ve nexweş bû. 6 Çaxê Îsa ew vezelandî dît û di-
zanibû ku ji demeke dirêj ve ye ku ew nexweş e, wî jê re got: «Ma
tu dixwazî sax bibî?» 7 Mirovê nexweş lê vegerand û got: «Ezbenî,
kesekî min ê ku gava av diçeliqe min bixe hewzê tune. Dema ku ez
dikim xwe bavêjimê, yekî din beriya min xwe davêjê.» 8 Îsa jê re
got: «Rabe, doşeka xwe rake û rêve here.» 9 Di cih de mirov sax
bû, doşeka xwe rakir û rêve çû.
Îcar ew roj Şemî bû 10 û serekên Cihûyan ji wî mirovê ku qenc
bûbû re gotin: «Îro Şemî ye! Nabe ku tu doşeka xwe rakî.» 11 Wî

---

5:4 Di hin destnivîsaran de ev jî heye: «Çimkî dem bi dem milyaketekî Xudan* diket avê û ew diçeliqand. Piştî çeliqandinê, kesê ku berî hemûyan biketa avê, ew ji nexweşiya xwe sax dibû.»

bersîva wan da: «Wî mirovê ku ez sax kirim ji min re got: ‹Doşeka
xwe rake û rêve here.›» 12 Wan jê pirsî: «Ew kî ye ku ji te re got:
‹Doşeka xwe rake û rêve here›?» 13 Lê mirovê ku hatibû qenckirin,
nizanibû ew kî ye, çimkî li wir gelek mirov civiyabûn û Îsa jî di
nav wan de xwe windakiribû. 14 Piştî vê yekê Îsa ew li Perestgehê*
dît û jê re got: «Binêre, tu sax bûyî! Êdî gunehan neke, da ku tiş-
tekî hê xerabtir neyê serê te.»
15 Zilam çû ji serekên Cihûyan re got: «Yê ku ez sax kirime Îsa
ye.» 16 Ji bo vê yekê êdî wan tengahî dida Îsa, çimkî wî ev kar di
roja* Şemiyê de dikirin. 17 Hingê Îsa bersîva wan da: «Bavê* min
heta bi îro jî dixebite, ez jî dixebitim.» 18 Ji bo vê yekê serekên
Cihûyan hê bêtir xebitîn ku wî bikujin. Çimkî wî ne bi tenê roja
Şemiyê şkandibû, lê wî gotibû: «Xwedê bavê min e» û xwe bi
Xwedê re yek girtibû.

### *Xwedê Desthilatî Daye Kur*

19 Loma Îsa ji wan re got: «Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim,
Kur nikare tiştekî ji ber xwe bike, lê tenê tiştên ku ew dibîne Bav
dike, ew jî wan dike. Bav çi bike, Kur jî wusa dike. 20 Çimkî Bav ji
Kur hez dike û hemû tiştên ku dike nîşanî wî dide. Ewê tiştên hê
meztir nîşanî wî bide wusa ku hûn lê şaş bimînin. 21 Erê, ka çawa
Bav dikare miriyan rake û jiyanê bide wan, herweha Kur jî dikare,
wan ên ku ew dixwaze, bide jiyan. 22 Bav dîwana* tu kesî nake, lê
hemû desthilatiya dîwankirinê daye Kur, 23 da ku çawa hemû ji
Bav re hurmetê dikin, wusa ji Kur re jî hurmetê bikin. Yê ku ji Kur
re hurmetê neke, ji Bavê ku ew şandiye re jî hurmetê nake.
24 «Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, yê ku guhê xwe dide
gotinên min û ji yê ku ez şandime bawer dike, jiyana wî ya herheyî
heye; ew nayê dîwankirin, lê ew ji mirinê gihîştiye jiyanê. 25 Bi
rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, wext tê û niha ye: Mirî wê dengê
Kurê* Xwedê bibihîzin û yên ku bibihîzin wê bijîn. 26 Çimkî çawa
ku Bav serkaniya jiyanê ye, bi vî awayî wî kir ku Kur jî serkaniya
jiyanê be. 27 Wî desthilatiya dîwankirinê jî da wî. Çimkî ew Kurê*
Mirov e. 28 Li vê yekê şaş nemînin, çimkî ew wext tê ku hemû ke-
sên di goran de, wê dengê wî bibihîzin 29 û derkevin. Yên ku qencî
kirine, wê ji bo jiyanê, yên ku xerabî kirine, wê ji bo dîwanbûnê
rabin.

30 «Ez nikarim tiştekî ji ber xwe bikim; wek ku ez dibihîzim ez
dîwanê dikim. Dîwankirina min rast e, çimkî ez ne li daxwaza
xwe, lê li daxwaza yê ku ez şandime digerim.

### *Şahidiya ji bo Îsa*

31 «Eger ez ji bo xwe şahidiyê bikim, şahidiya min ne rast e.
32 Lê yekî din heye ku ji bo min şahidiyê dike û ez dizanim ew
şahidiya ku ew ji bo min dike rast e. 33 We mirov şandin ba Yû-
henna û wî şahidiya rastiyê kir. 34 Lê ez şahidiya ku ji mirov tê
naxwazim, lê belê ji bo ku hûn xilas bibin ez van dibêjim. 35 Yû-
henna çirayeke pêketî û ronahîdar bû. We jî xwest ku hûn ji bo
demekê bi vê ronahiya wî dilşa bibin. 36 Lê şahidiya min di ser şa-
hidiya Yûhenna re ye. Ew karên ku Bav spartine min da ku ez pêk
bînim, ew karên ku ez dikim, ji bo min şahid in ku Bav ez şan-
dime. 37 Û Bavê ku ez şandime bi xwe jî ji bo min şahidî kiriye.
We tu caran ne dengê wî bihîstiye û ne jî rûyê wî dîtiye. 38 Û pey-
va* wî di dilê we de namîne, çimkî hûn ji yê ku wî şandiye bawer
nakin. 39 Hûn li Nivîsarên Pîroz dikolin, çimkî li gor bîr û ba-
weriya we jiyana we ya herheyî di wan de ye û yên ku şahidiya
min dikin jî ew in. 40 Lê hûn naxwazin bên ba min, da ku jiyana we
hebe.
41 «Ez rûmeta ku ji mirov tê naxwazim. 42 Lê ez bi we dizanim,
ez dizanim ku di dilê we de hezkirina Xwedê tune. 43 Ez bi navê
Bavê xwe hatim û hûn min qebûl nakin; eger yekî din bi navê xwe
bê, hûnê wî qebûl bikin. 44 Hûn ên ku rûmetê didin hev û li rûmeta
ku ji Xwedayê bi tenê tê nagerin, hûn çawa dikarin bawer bikin?
45 Nefikirin ku ezê we li ber Bav sûcdar bikim; yê ku we sûcdar
dike Mûsa ye, ewê ku we hêviya xwe pê ve girêdaye. 46 Eger we ji
Mûsa bawer bikira, weyê ji min jî bawer bikira, çimkî wî li ser min
nivîsiye. 47 Lê eger hûn baweriyê bi nivîsînên wî neynin, hûnê ça-
wa bi gotinên min bawer bikin?»

### *Îsa Pênc Hezar Mirov Têr Dike*

*(Metta 14:13-21; Marqos 6:30-44; Lûqa 9:10-17)*

6 Piştî vê yekê Îsa derbasî aliyê din ê Gola Celîlê bû ku jê re
Teberiya digotin. 2 Elaleteke* mezin dabû pey wî, çimkî wan
ew nîşan û keramet dîtibûn, yên ku wî ji bo nexweşan çêkiribûn.

[3] Îsa derket serê çiyê û li wê derê bi şagirtên xwe ve rûnişt. [4] Cejna
Cihûyan a Derbasbûnê nêzîk bû.
[5] Gava Îsa çavên xwe hildan, wî dît ku elaleteke* mezin ber bi
wî ve tê. Îsa ji Filîpos re got: «Emê nên ji ku derê bikirrin, ji bo ku
ev mirov bixwin?» [6] Wî ev ji bo ku Filîpos biceribîne got, çimkî wî
dizanibû ku ewê çi bike. [7] Filîpos bersîva wî da: «Ji bo ku ji her
yekî re pariyek bikeve bi du sed zîvî* jî nan têra wan nake!» [8] Yek
ji şagirtan, birayê Şimûn-Petrûs, Endrawis ji wî re got: [9] «Li vir
lawikek heye ku pênc nanên wî yên cehî û du masiyên wî hene, lê
ji bo evqas mirov ev çi ye!»
[10] Îsa got: «Mirovan li erdê bidin rûniştin.» Li wir gelek giya
hebû û ew rûniştin. Hijmara mêran li dora pênc hezar kes bû.
[11] Hingê Îsa nan hildan, piştî ku şikir kir, ew li kesên rûniştî belav
kirin. Bi vî awayî bi qasî ku wan xwest, wî masî jî dan wan. [12] Û
piştî ku têr xwarin, wî ji şagirtên xwe re got: «Wan pariyên ku ma-
ne bidin hev, bila tiştek ziyan nebe.» [13] Şagirtan jî ew berhev kirin
û ji ber wan ên ku pênc nanên cehî xwaribûn, diwanzdeh selik ji
pariyan tije kirin.
[14] Dema ku van mirovan ev nîşana ku Îsa çêkir dîtin, wan got:
«Bi rastî jî ew pêxemberê ku wê bihata dinyayê, ev e!» [15] Îcar Îsa
têgihîşt ku ewê bên û ji bo ku wî bikin padîşah bi zorê bibin; dîsa
ew bi serê xwe hilkişiya çiyê.

### *Îsa li ser Avê Rêve Diçe*

*(Metta 14:22-27; Marqos 6:45-52)*

[16] Dema ku bû êvar, şagirtên wî daketin jêr û çûn golê. [17] Ew li
qeyikekê siwar bûn û ji bo ku derbasî Kefernahûma aliyê din ê
golê bibin, ketin rê. Êdî tarî ketibû erdê û hê jî Îsa nehatibû ba
wan. [18] Golê ji ber bagereke xurt pêl dida. [19] Dema ku ew bi qasî
pênc-şeş kîlometreyan pêşve çûn, wan dît ku Îsa li ser golê rêve
diçe û ber bi qeyikê ve tê. Ew tirsiyan, [20] lê Îsa ji wan re got: «Ne-
tirsin, ez im!» [21] Îcar wan xwest ku wî bixin qeyikê. Qeyik di cih
de gihîşt wî aliyê ku wan dixwest herinê.

### *Mirov li Îsa Digerin*

[22] Dotira rojê, elaleta* ku li aliyê din ê golê mabû, fêm kirin ku
şeva din ji qeyikekê pê ve li wê derê nebû û Îsa bi şagirtên xwe ve

li qeyikê siwar nebûbû, lê şagirtên wî bi serê xwe çûbûn. [23] Ji aliyê
din ve, qeyikên ku ji Teberiyayê hatibûn, gihîştibûn nêzîkî wê dera
ku piştî şikirkirina Xudan*, lê nan hatibû xwarin. [24] Gava elaletê
dît ku ne Îsa û ne jî şagirtên wî li wê derê ne, ew bi xwe li qeyikan
siwar bûn û ji bo ku li Îsa bigerin çûn Kefernahûmê.

### *Nanê Jiyana Herheyî*

[25] Gava ku wan Îsa li aliyê din ê golê dît, wan jê re got: «Ma-
moste, tu kengê hatî vê derê?» [26] Îsa bersîva wan da: «Bi rastî, bi
rastî ez ji we re dibêjim, ne ji ber ku we nîşan dîtine, lê ji ber ku
we ji nên xwar û hûn têr bûn, hûn li min digerin. [27] Ji bo xwarina
pûç nexebitin, lê ji bo xwarina ku ji bo jiyana herheyî dimîne bi-
xebitin; wê xwarinê Kurê* Mirov wê bide we; çimkî Bav Xwedê
mora xwe li wî xistiye.»

[28] Û wan jê pirsî: «Divê em çi bikin, ji bo ku em karên Xwedê
bikin?» [29] Îsa bersîva wan da: «Karê Xwedê ev e ku hûn baweriyê
bi wî kesê ku wî şandiye bînin.» [30] Li ser vê yekê wan jê re got:
«Îcar tê çi nîşanê çêkî, da ku em bibînin û ji te bawer bikin? Tê çi
karî bikî? [31] Bav û kalên me li çolê Manna* xwarin. Çawa ku ha-
tiye nivîsîn: ‹Wî ji bo xwarina wan, ji ezmên nan da.›[a]»

[32] Îsa ji wan re got: «Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, ew ne
Mûsa bû ku ji ezmên nan da we, lê Bavê min e ku nanê rastîn ji
ezmên dide we. [33] Çimkî nanê Xwedê ew e ku ji ezmên tê xwarê û
jiyanê dide dinyayê.» [34] Wan jê re got: «Ezbenî, hergav vî nanî
bide me.»

[35] Îsa ji wan re got: «Nanê jiyanê ez im. Yê ku bê ba min, qet
birçî nabe û yê ku baweriyê bi min bîne, tu caran tî nabe. [36] Lê wek
ku min ji we re got, we ez dîtim, lê hê hûn bawer nakin. [37] Hemû
yên ku Bav dide min, wê bên ba min û yê ku bê ba min, ez wî qet
nazivirînim. [38] Çimkî ez ji ezmên hatim xwarê, ne ji bo ku ez da-
xwaza xwe bikim, lê ji bo ku ez daxwaza yê ku ez şandime bikim.
[39] Daxwaza yê ku ez şandim ev e, ku ez ji hemûyên ku wî dane
min yekî winda nekim, lê di Roja Dawî de wî rakim. [40] Erê, da-
xwaza Bavê min ev e, ku her kesê Kur bibîne û baweriyê bi wî
bîne, jiyana wî ya herheyî hebe. Û di Roja Dawî de ezê wî rakim.»

---

[a] **6:31** Ji: Derketin 16:4; Zebûr 78:24

41 Îcar Cihûyan li pey wî kirin pitepit, çimkî wî got: «Nanê ku
ji ezmên hatiye xwarê ez im.» 42 Wan got: «Ma ev ne Îsayê kurê
Ûsiv e ku em diya wî û bavê wî nas dikin? Ma çawa dibe ku ew
niha dibêje: ‹Ez ji ezmên hatime xwarê›?»
43 Îsa bersîv da û ji wan re got: «Di nav xwe de nekin pitepit.
44 Tu kes nikare bê ba min, heta Bavê ku ez şandime wî ber bi min
ve nekişîne. Û di Roja Dawî de ezê wî rakim. 45 Di nivîsarên pê-
xemberan de hatiye nivîsîn: ‹Hemû wê ji aliyê Xwedê ve hînkirî
bin.›[a] Her kesê ku ji Bav dibihîze û hîn dibe, tê ba min. 46 Ev nayê
wê manê ku kesekî Bav dîtiye. Bi tenê yê ku ji Xwedê ye, wî Bav
dîtiye. 47 Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, yê ku baweriyê tîne
jiyana wî ya herheyî heye. 48 Nanê jiyanê ez im. 49 Bav û kalên we
li çolê Manna* xwarin, lê ew mirin. 50 Ew nanê ku ji ezmên hatiye
xwarê, da her kesê ku jê bixwe nemire, ev e. 51 Ew nanê jîndar ê ku
ji ezmên hatiye xwarê ez im. Eger yek ji vî nanî bixwe, wê her û
her bijî û nanê ku ezê ji bo jiyana dinyayê bidim, bedena min e.»
52 Li ser vê yekê Cihûyan di nav xwe de devjenî kirin û gotin:
«Ev mirov çawa dikare bedena xwe bide me ku em bixwin?»
53 Îcar Îsa ji wan re got: «Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, heta
ku hûn bedena Kurê Mirov nexwin û xwîna wî venexwin, jiyana
we wê nebe. 54 Yê ku bedena min dixwe û xwîna min vedixwe, ji-
yana wî ya herheyî heye û di Roja Dawî de ezê wî rakim. 55 Çimkî
bedena min xwarina rastîn, xwîna min jî vexwarina rastîn e. 56 Yê
ku bedena min dixwe û xwîna min vedixwe, bi min re dimîne û ez
jî bi wî re dimînim. 57 Çawa Bavê ku serkaniya jiyanê ye ez şan-
dime û ez bi saya Bav dijîm, bi vî awayî yê ku min bixwe, wê bi
saya min bijî. 58 Nanê ku ji ezmên hatiye xwarê ev e. Ne wek Man-
nayê* ku bav û kalan xwar û mirin.Yê ku vî nanî bixwe, wê her û
her bijî.» 59 Îsa ev peyv, dema ku li Kefernahûmê hîn dikir, di
kinîştê* de gotin.

### *Peyvên Jiyana Herheyî*

60 Gelek ji şagirtên wî, dema ku ev peyv bihîstin, gotin: «Ev
peyv gelek dijwar e! Kî dikare guh bide wê?» 61 Lê Îsa dizanibû ku
şagirt li ser vê yekê pitepit dikin, wî ji wan re got: «Ma dilê we bi

[a] 6:45 Ji: Îşaya 54:13

vê yekê dimîne? 62 Nexwe eger hûn bibînin ku Kurê Mirov derdikeve cihê ku berê lê bû, wê çawa be...? 63 Yê ku jiyanê dide Ruh e; beden qet bi kêrî tiştekî nayê. Peyvên ku min ji we re gotine, ruh û jiyan in. 64 Lê yên ku di nav we de baweriyê naynin hene.» Çimkî Îsa ji destpêkê ve dizanibû ku kê bawerî neaniye û kî wê wî bide dest. 65 Û wî got: «Ji ber vê yekê min ji we re got heta ku ji aliyê Bav ve neyê dayîn, tu kes nikare bê ba min.»

66 Ji ber vê yekê, ji şagirtên wî gelek kes zivirîn û êdî bi wî re nedigeriyan. 67 Îcar Îsa ji diwanzdehan pirsî: «Ma hûn jî dixwazin herin?» 68 Şimûn-Petrûs bersîva wî da: «Ya Xudan, emê herin ba kê? Gotinên jiyana herheyî bi te re ne. 69 Û me jî bawerî aniye û em dizanin ku Pîrozê* Xwedê tu yî.» 70 Îsa li wan vegerand û got: «Ma min hûn her diwanzdeh nebijartin? Lê belê yek ji we Îblîsek e.» 71 Wî li ser Cihûdayê* kurê Şimûnê Îsxeryotî digot. Bi ser ku ew yek ji diwanzdehan jî bû, yê ku wê Îsa bida dest, ew bû.

### *Îsa û Birayên Xwe*

7 Piştî vê yekê Îsa li Celîlê digeriya. Wî nedixwest ku di Cihûstanê de bigere, çimkî serekên Cihûyan li kuştina wî digeriyan. 2 Gava Cejna* Holikçêkirinê ya Cihûyan nêzîk bû, 3 birayên wî jê re gotin: «Ji vir derkeve û here Cihûstanê, da ku şagirtên te karên ku tu dikî bibînin. 4 Çimkî mirovê ku dixwaze bi eşkereyî xwe bide naskirin, kirinên xwe venaşêre. Madem ku tu van karan dikî, xwe nîşanî dinyayê bide.» 5 Çimkî birayên wî jî bawerî pê nedianîn. 6 Îsa ji wan re got: «Wextê min hê nehatiye, lê ji bo we wext herdem rast e. 7 Dinya nikare ji we nefret bike, lê ji min nefret dike, çimkî ez şahidiyê dikim ku kirinên dinyayê xerab in. 8 Hûn bi xwe herin vê cejnê, lê ez nayêmê. Çimkî hê wextê min bi tevahî nehatiye.» 9 Ew weha peyivî û li Celîlê ma.

### *Îsa Beşdarî Cejnê Dibe*

10 Lê piştî ku birayên wî çûn cejnê, ew jî rabû çû, lê belê ne bi eşkereyî, ji dizî ve. 11 Di vê navê de Cihû di cejnê de lê digeriyan û digotin: «Ew li ku derê ye?» 12 Di nav elaletê de li ser wî gelek tişt dihatin gotin. Hinekan digot: «Ew mirovekî qenc e», hinekan jî digot: «Na, ew xelkê dixapîne.» 13 Lê ji tirsa serekên Cihûyan, kesî nediwêrî bi eşkereyî li ser wî bipeyiviya.

14 Îcar di nîvê cejnê de Îsa derket Perestgehê* û dest bi hînki-
rinê kir. 15 Cihû lê şaş mabûn û digotin: «Ev mirovê ku li ser nivî-
saran nehatiye hînkirin, çawa evqas bi wan dizane?» 16 Îsa bersîva
wan da û got: «Hînkirina min ne ji min, lê ji yê ku ez şandime tê.
17 Eger mirovek bixwaze ku daxwaza Xwedê bike, wê bizane ku
hînkirina min ji Xwedê ye, an ez ji ber xwe dibêjim. 18 Yê ku ji ber
xwe dipeyive, li rûmeta xwe digere; lê yê ku li rûmeta yê ku ew
şandiye digere, ew rast e û li ba wî xapandin tune. 19 Ma Mûsa
Şerîet* neda we? Dîsa jî kes ji we Şerîetê pêk nayne. Çima hûn li
kuştina min digerin?» 20 Elaletê bersîva wî da: «Tu bi cinan ketiyî!
Kî li kuştina te digere?» 21 Îsa li wan vegerand û got: «Min karekî
nedîtî kir, hûn hemû lê şaş man. 22 Mûsa sinet* da we – ev jî ne ji
Mûsa, lê ji bav û kalan e – û hûn roja* Şemiyê mirovekî sinet di-
kin. 23 Madem ji bo ku Şerîeta Mûsa xera nebe, hûn roja Şemiyê
mirov sinet dikin, ji bo ku min di roja Şemiyê de mirovek yekser
sax kiriye, hûn çima li min hêrs dibin? 24 Li gor dîtinê dadbar*
nekin, lê li gor rastiyê dadbar bikin.»

### *Ma Dibe ku Ev Mesîh Be?*

25 Hingê hinek mirovên ku ji Orşelîmê bûn digotin: «Ma ev ne
ew e ku li kuştina wî digerin? 26 Û va ye, li vir ew bi eşkereyî
dipeyive û tu kes jî jê re tiştekî nabêje. Gelo serekan bi rastî fêm
kiriye ku ew Mesîh e? 27 Lê em dizanin ku ev mirov ji ku derê tê.
Gava ku Mesîh bê, kes wê nezane ku ew ji ku derê tê.»

28 Hingê, dema ku Îsa di Perestgehê de hîn dikir, bi dengekî
bilind got: «Nexwe hûn min nas dikin û hûn dizanin ku ez ji ku
derê me! Lê ez ji ber xwe nehatime. Yê ku ez şandime rastî ye, lê
hûn wî nas nakin. 29 Ez wî nas dikim, çimkî ez ji wî me û wî ez
şandime.»

30 Li ser vê yekê ew xebitîn ku Îsa bigirin, lê kesî dest neavêt
wî, çimkî hê saeta wî nehatibû. 31 Lê gelekan ji elaletê bawerî bi wî
anî û gotin: «Ma gava ku Mesîh bê, wê ji kirinên vî bêtir nîşanan
çêke?»

### *Parêzgerên ku ji bo Girtina Îsa Tên Şandin*

32 Fêrisiyan tiştên ku elaletê li ser Îsa dikirin pisepis bihîst. Li
ser vê yekê Fêrisî û serekên kahînan* ji bo girtina wî parêzger

şandin. 33 Îcar Îsa got: «Hê ji bo demeke kurt ez bi we re me; piştre
ezê herim ba yê ku ez şandime. 34 Hûnê li min bigerin, lê hûn min
nabînin; cihê ku ezê lê bim, hûn nikarin bênê.» 35 Hingê Cihûyan ji
hev re got: «Ev mirov wê here ku derê ku em wî nabînin? Nexwe
wê here ba gelê me yê ku li nav Yewnaniyan* belav bûye û
Yewnaniyan hîn bike? 36 Mana peyvên ‹Hûnê li min bigerin, lê hûn
min nabînin û cihê ku ezê lê bim, hûn nikarin bênê› çi ye?»

### *Çemên Ava Jiyanê*

37 Di roja dawîn û herî girîng a cejnê de Îsa ji piyan rawesta û
bi dengekî bilind got: «Eger yek tî be, bila bê ba min û vexwe.
38 Yê ku baweriyê bi min bîne, wek ku di Nivîsara Pîroz de hatiye
gotin: ‹Wê ji dilê wî çemên ava ku jiyanê didin biherikin.›» 39 Îsa
ev peyv li ser wî Ruhê* Pîroz got, yê ku wan ên bawerî bi wî dia-
nîn wê bistandana. Çimkî Ruh hê nehatibû dayîn, ji ber ku hê Îsa
nehatibû birûmetkirin.

### *Dubendiya di nav Elaletê de*

40 Dema ku wan ev gotin bihîstin, hinekan ji elaletê got: «Bi
rastî jî ev ew pêxember e.» 41 Hinekan jî got: «Ev Mesîh e», lê
hinekên din jî gotin: «Ma Mesîh wê ji Celîlê bê? 42 Ma Nivîsara
Pîroz nabêje ku Mesîh wê ji dûndana* Dawid* û ji gundê Dawid,
ji Beytlehmê bê?» 43 Loma di nav elaletê de, li ser wî dubendî çê-
bû. 44 Hinekan ji wan xwest wî bigirin, lê tu kesî dest neavêt wî.

### *Lihevnekirina Cihûyan*

45 Di vê navê de parêzger vegeriyan ba Fêrisî û serekên kahî-
nan. Wan ji parêzgeran pirsî: «We çima ew neanî?» 46 Parêzgeran
bersîva wan da: «Tu mirov, tu caran mîna vî mirovî nepeyiviye!»
47 Fêrisiyan got: «Nexwe, hûn jî hatin xapandin? 48 Ma ji serekan û
ji Fêrisiyan kesekî bawerî bi wî aniye? 49 Na, lê ev elaleta ku bi
Şerîetê nizane, xezeblêbûyî ye.» 50 Nîkodêmos, yê ku berê çûbû ba
Îsa û ji Fêrisiyan bû, ji wan re got: 51 «Gelo Şerîeta me, heta ku
guhdariya mirovekî neke û nezane ku ew çi dike, ma wî dadbar*
dike?» 52 Wan lê vegerand û gotin: «Nexwe tu jî ji Celîlê yî? Lê
bikole, tê bibînî ku ji Celîlê tu pêxember dernakevin.»

---

7:38 Binêre: Gotinên Silêman 18:4; Îşaya 58:11

### *Jina Gunehkar tê Efûkirin*

8 53 Û her kes çû mala xwe, 1 Îsa jî çû Çiyayê Zeytûnê. 2 Serê
sibê zû ew dîsa vegeriya Perestgehê, xelk hemû hat ba wî. Ew
rûnişt û wî dest pê kir û ew hîn kirin. 3 Şerîetzan* û Fêrisiyan
jineke ku li ser zînayê hatibû girtin anîn û li holê dan rawestandin.
4 Wan jê re got: «Mamoste, dema ku vê jinê zîna dikir, hat girtin.
5 Di Şerîetê de, Mûsa li me emir kiriye ku em ên weha bidin ber
keviran. Îcar tu çi dibêjî?» 6 Wan ev ji bo ceribandina Îsa got, da
ku wî sûcdar derxin. Lê Îsa xwe xwar kir û bi tiliya xwe li ser erdê
nivîsî. 7 Careke din li ser pirsîna wan, wî serê xwe rakir û ji wan re
got: «Di nav we de kî bêguneh be, bila kevirê pêşî ew bavêje wê.»
8 Û dîsa wî xwe xwar kir û bi tiliya xwe li ser erdê nivîsî. 9 Lê
dema ku wan ev bihîst, ji mezinan bigire heta yê paşî yek bi yek
derketin. Îsa bi serê xwe ma û jinik jî li wê derê rawestayî bû.
10 Îsa serê xwe rakir û ji wê re got: «Sitiyê, ka ew li ku derê ne?
Ma kesî tu sûcdar dernexist?» 11 Jinikê got: «Tu kesî, ezxadim!» Û
Îsa got: «Ez jî te sûcdar dernaxim; here û êdî ji niha û pê ve
gunehan neke.»

### *Ronahiya Dinyayê*

12 Îsa dîsa bi wan re peyivî û got: «Ez ronahiya dinyayê me; yê
ku li pey min bê, tu caran di tariyê de rêve naçe, lê wê bibe xweyî
ronahiya jiyanê.» 13 Fêrisiyan lê vegerand û gotin: «Tu şahidiya
xwe dikî; şahidiya te ne rast e.» 14 Îsa bersîv da û ji wan re got:
«Eger ez bi xwe şahidiya xwe bikim jî, şahidiya min rast e; çimkî
ez dizanim ku ez ji ku derê hatim û diçim ku derê. Lê hûn nizanin
ku ez ji ku derê têm an diçim ku derê. 15 Hûn li gor ku çav dibîne
dadbar dikin, lê ez tu kesî dadbar nakim. 16 Lê eger ez dadbar bi-
kim jî, dadbarkirina min rast e; çimkî ez ne bi tenê me, ez û Bavê
ku ez şandime em bi hev re ne. 17 Di Şerîeta we de jî hatiye nivîsîn
ku şahidiya du kesan rast e. 18 Ez şahidiya xwe dikim û Bavê ku ez
şandime jî şahidiya min dike.»
19 Li ser vê yekê wan jê pirsî: «Bavê te li ku derê ye?» Îsa ber-

---

8:11 Di hin nivîsaran de 7:53-8:11 tune.

8:17 Dubarekirina Şerîetê 19:15

sîva wan da: «Hûn ne min nas dikin ne jî Bavê min. Eger we ez
nas bikirama, weyê Bavê min jî nas bikira.» [20] Îsa ev peyvên ha,
çaxê li Perestgehê hîn dikir, li cihê ku lê pere dicivandin gotin, lê
kesî ew negirt, çimkî hê saeta wî nehatibû.

### *Hûn Nikarin Bên Cihê ku Ez Diçimê*

[21] Wî dîsa ji wan re got: «Ez diçim; hûnê li min bigerin û hûnê
di nav gunehên xwe de bimirin. Hûn nikarin bên cihê ku ez
diçimê.» [22] Li ser vê yekê Cihûyan weha got: «Ma ewê xwe bikuje
ku dibêje: ‹Hûn nikarin bên cihê ku ez diçimê›?»
[23] Îsa ji wan re got: «Hûn ji jêr in, ez ji jor im; hûn ji vê din-
yayê ne, lê ez ne ji vê dinyayê me. [24] Loma min ji we re got ku
hûnê di nav gunehên xwe de bimirin. Eger hûn bawer nekin ku Ez
Ew im, hûnê di nav gunehên xwe de bimirin.» [25] Îcar wan jê pirsî:
«Tu kî yî?» Îsa ji wan re got: «Ez tam ew im, yê ku min ji destpêkê
ve ji we re gotiye. [26] Gelek tişt hene ku ez li ser we bêjim û we
sûcdar derxim; lê yê ku ez şandime rastî ye û bi tenê tiştên ku min
ji wî bihîstine, ez ji dinyayê re dibêjim.»
[27] Wî li ser Bav ji wan re got, lê wan fêm nekir. [28] Îcar Îsa ji
wan re got: «Çaxê hûn Kurê Mirov rakin jorê, hingê hûnê bizanin
ku Ez Ew im û min qet tu tişt ji ber xwe nekiriye; lê ev tiştên ha
wek ku Bav hînî min kirine ez dibêjim. [29] Û yê ku ez şandime bi
min re ye û wî ez bi tenê nehiştime. Çimkî ez hergav wan karên ku
li wî xweş tên, dikim.» [30] Dema ku Îsa weha peyivî, gelek kesan
bawerî bi wî anî.

### *Rastî Wê We Azad Bike*

[31] Îsa ji Cihûyên ku bawerî bi wî anîbûn re got: «Eger hûn di
peyva min de bimînin, bi rastî jî hûn şagirtên min in. [32] Hûnê
rastiyê bizanin û rastî wê we azad bike.» [33] Wan bersîva wî da:
«Em ji dûndana* Birahîm* in û tu caran em neketine bin nîrê tu
kesî. Çawa tu dibêjî: ‹Hûnê azad bibin›?»
[34] Îsa li wan vegerand û got: «Bi rastî, bi rastî ez ji we re di-
bêjim, her kesê ku gunehan dike, ew xulamê guneh e. [35] Xulam her
û her di malê de namîne, lê kur her û her dimîne. [36] Loma, eger
Kur we azad bike, bi rastî hûnê azad bibin. [37] Ez dizanim ku hûn ji
dûndana Birahîm in, lê dîsa jî hûn li kuştina min digerin. Çimkî

hûn di dilê xwe de cih nadin peyva min. [38] Ez ji tiştên ku min li ba
Bavê xwe dîtine dipeyivim û hûn jî tiştên ku we ji bavê xwe bi-
hîstine dikin.»

## *Zarokên Îblîs*

[39] Wan bersîva Îsa da û jê re got: «Bavê me Birahîm e.» Îsa ji
wan re got: «Eger hûn zarokên Birahîm bûna, weyê kirinên Bi-
rahîm bikirana. [40] Lê niha hûn li kuştina min – li kuştina wî mirovê
rastiya ku ji Xwedê bihîstî ji we re gotiye – digerin. Birahîm ev
yek nekir. [41] Hûn karên bavê xwe dikin.» Wan ji wî re got: «Em ji
zînayê çênebûne! Bavekî me heye, ew jî Xwedê ye.» [42] Îsa ji wan
re got: «Eger Xwedê Bavê we bûya, weyê ji min hez bikira, çimkî
ez ji ba Xwedê hatime û niha ez li vir im. Ez ji ber xwe nehatime,
lê wî ez şandime. [43] Çima hûn tiştên ku ez dibêjim fêm nakin? Ji
ber ku hûn peyva min ranagirin. [44] Hûn ji bavê xwe Îblîs in û hûn
dixwazin xwestekên bavê xwe bînin cih. Ew ji destpêkê ve mêrkuj
bû û tu caran li ser rastiyê nemaye, çimkî rastî li ba wî tune. Çaxê
ku ew derewan dike, ji tiştên xwe bi xwe dibêje; çimkî ew de-
rewkar e û bavê derewan e. [45] Lê ji ber ku ez rastiyê dibêjim, hûn ji
min bawer nakin. [46] Kî ji we dikare nîşan bide ku guneh li ba min
heye? Madem ez rastiyê dibêjim, çima hûn ji min bawer nakin?
[47] Yê ku ji Xwedê be, gotinên Xwedê dibihîze; ji ber ku hûn ne ji
Xwedê ne, hûn nabihîzin.»

## *Îsa û Birahîm*

[48] Cihûyan bersîva wî da û gotin: «Ma heqê me tunebû, dema
ku me got, tu ji Sameryayê* yî û tu bi cinan ketiyî?» [49] Îsa ji wan
re got: «Ez bi cinan neketime, bervajiyê vê, ez siyaneta* Bavê xwe
digirim, lê hûn min bê siyanet dikin. [50] Ez li rûmeta xwe nagerim,
lê yekî ku lê digere û dîwanê* dike heye. [51] Bi rastî, bi rastî ez ji
we re dibêjim, eger yek gotina min bigire, ew tu caran mirinê na-
bîne.» [52] Li ser vê yekê Cihûyan jê re got: «Niha em dizanin ku tu
bi cinan ketiyî! Birahîm jî mir, pêxember jî mirin. Û niha tu dibêjî:
‹Eger yek gotina min bigire, tu caran mirinê tam nake.› [53] Nexwe
tu ji bavê me Birahîm meztir î? Ew mir. Pêxember jî mirin. Ma tu
xwe kî dibînî?»
[54] Îsa bersîv da: «Eger ez rûmetê bidim xwe, rûmeta min ne

tiştek e; yê ku rûmetê dide min Bavê min e ku hûn jê re dibêjin:
‹Ew Xwedayê me ye.› [55] Hûn wî qet nas nakin, lê ez wî nas dikim.
Eger min bigota ku ez wî nas nakim, ez jî wek we dibûm de-
rewker; lê ez wî nas dikim û gotina wî digirim. [56] Bavê we Birahîm
bi hêviya ku wê roja min bibîne gelek şa bû; wî ew dît û dilgeş
bû.» [57] Cihûyan jê re got: «Hê tu ne pêncî salî yî! Ma te Birahîm jî
dîtiye?» [58] Îsa ji wan re got: «Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, ji
beriya bûyîna Birahîm ez heme.» [59] Îcar wan kevir hildan, da ku
bavêjin wî, lê Îsa xwe veşart û ji Perestgehê derket derve.

### *Miroveki Kor Dibîne*

9 Gava ku Îsa derbas dibû, wî mirovek dît ku ji zikmakî ve kor
bû. [2] Şagirtên wî jê pirsîn: «Mamoste, kê guneh kir ku ev mi-
rov kor hat dinyayê? Wî bi xwe an dê û bavê wî?» [3] Îsa bersîva
wan da: «Ne wî guneh kir, ne jî dê û bavê wî, lê ji bo ku karên
Xwedê li ser wî bên dîtin ew kor hat dinyayê. [4] Hê ku roj e divê em
karên ê ku ez şandime bikin. Şev tê, hingê kes nikare karekî bike.
[5] Heta ku ez li dinyayê me, ez ronahiya dinyayê me.»

[6] Wî weha got û tif kir erdê, ji tifê herrî çêkir û ew li çavê
mirov da [7] û jê re got: «Here xwe di hewza Sîlwamê de bişo» ku bê
wergerandin: «Hatiye şandin». Ew jî çû serçavê xwe şuşt û bi ça-
vên vebûyî vegeriya.

[8] Cîranên wî û kesên ku berê dîtibûn ku wî pars dikir, gotin:
«Ewê ku rûdinişt û pars dikir, ma ne ev e?» [9] Hinekan digot: «Ev
ew e», hinekan jî digot: «Ne ew e, lê dimîne wî.» Lê wî bi xwe
digot: «Ez ew im.» [10] Îcar wan jê pirsî: «Nexwe çavên te çawa
vebûn?» [11] Wî bersîva wan da: «Mirovê ku jê re dibêjin Îsa herrî
çêkir û li çavên min da û ji min re got: ‹Here hewza Sîlwamê û
xwe bişo.› Ez jî çûm, min serçavê xwe şuşt û çavên min vebûn.»
[12] Wan jê pirsî: «Ew li ku derê ye?» Wî got: «Ez nizanim.»

### *Fêrisî û Mirovê Qencbûyî*

[13] Wan ew mirovê ku berê kor bû, anîn ba Fêrisiyan. [14] Ew roja
ku Îsa herrî çêkir û çavên wî vekirin, Şemî bû. [15] Fêrisiyan jî jê
pirsî, ka çavên wî çawa vebûne? Mirov ji wan re got: «Wî herrî li

---

8:58 Derketin 3:13-14

çavên min da, min serçavê xwe şuşt û niha ez dibînim.» 16 Hinekan
ji Fêrisiyan got: «Ev mirov ne ji Xwedê ye, çimkî ew Şemiyê
nagire.» Lê hinekan jî got: «Ma mirovekî gunehkar çawa dikare nî-
şanên weha çêke?» Û di navbera wan de dubendî derket. 17 Hingê
wan dîsa ji wî yê ku berê kor bû pirsî: «Tu li ser wî yê ku çavên te
vekirin çi dibêjî?» Wî got: «Ew pêxember e.»

18 Serekên Cihûyan bawer nekirin ku ew kor bû û çavên wî
vebûne, heta gazî dê û bavê wî nekirin 19 û ji dê û bavê wî nepirsîn:
«Ma kurê we yê ku we digot kor hatiye dinyayê, ev e? Çawa dibe
ku niha ew dibîne?» 20 Dê û bavê wî bersîva wan dan: «Em dizanin
ku ev kurê me ye û kor hatiye dinyayê. 21 Lê em nizanin ku niha
ew çawa dibîne û em nizanin kê jî çavên wî vekirine. Ji wî
bipirsin, êdî ew mezin e, bila ew ji bo xwe bêje.» 22 Dê û bavê wî ji
ber ku ji wan ditirsiyan weha peyivîn. Çimkî ji xwe serekên Cihû-
yan gotina xwe kiribûn yek: Her kesê ku bigota ew Mesîh e, ewê ji
kinîştê* bihata avêtin. 23 Ji ber vê yekê dê û bavê wî gotin: «Êdî ew
mezin e, ji wî bipirsin.»

24 Îcar wan cara diduyan gazî wî mirovê ku berê kor bû kir û jê
re gotin: «Li ber Xwedê rastiyê bêje! Em dizanin ku ev mirov gu-
nehkar e.» 25 Wî bersîva wan da: «Ez nizanim ka ew gunehkar e an
ku ne gunehkar e, lê tiştê ku ez dizanim ev e, ez kor bûm û niha ez
dibînim.» 26 Îcar wan jê pirsî: «Wî çi bi te kir? Wî çawa çavên te
vekirin?» 27 Wî li wan vegerand û got: «Min niha ji we re got, lê
we guhê xwe nedayê. Çima hûn dixwazin dîsa bibihîzin? Ma hûn
jî dixwazin ku bibin şagirtên wî?» 28 Wan ew nizim kir û gotin:
«Tu yî şagirtê wî, lê em şagirtên Mûsa ne. 29 Em dizanin ku Xwedê
bi Mûsa re peyivî ye, lê heçî ev mirov e, em nizanin ku ew ji ku
derê tê!»

30 Mirov bersîva wan da û got: «Ev tiştekî ecêb e! Hûn nizanin
ew ji ku derê tê, lê wî çavên min vekirin. 31 Em dizanin ku Xwedê
dengê gunehkaran nabihîze. Lê eger mirovek biperize* Xwedê û
daxwaza wî bike, Xwedê dengê wî mirovî dibihîze. 32 Ji berê ve tu
caran nehatiye bihîstin ku kesekî çavên mirovekî ku kor hatî din-
yayê vekirine. 33 Eger ev mirov ne ji Xwedê bûya, nikaribû tiştek
bikira.» 34 Wan ji wî re got: «Tu bi tevahî di nav gunehan de hatiyî
dinyayê, ma tê hînî me bikî?» Û ew ji kinîştê avêtin derve.

### *Korîtiya Ruhanî*

35 Gava Îsa bihîst ku ew avêtine derve, wî ew dît û jê re got:
«Tu baweriyê bi Kurê Mirov tînî?» 36 Zilam lê vegerand û got:
«Ezbenî, ew kî ye? Bêje, da ku ez baweriyê pê bînim» 37 Îsa jê re
got: «Te ew dît û yê ku niha bi te re dipeyive ew e.» 38 Wî got: «Ya
Xudan*, ez bawer dikim!» û ji Îsa re çû ser çokan. 39 Îsa jî got: «Ez
ji bo dîwankirinê hatime vê dinyayê, da yên ku nabînin bibînin û
yên ku dibînin jî kor bibin.»
40 Hinek ji Fêrisiyên ku li ba wî bûn, dema ku ev bihîstin, jê re
gotin: «Nexwe em jî kor in?» 41 Îsa bersîva wan da: «Eger hûn kor
bûna, gunehê weyê tunebûya. Lê niha hûn dibêjin: ‹Em dibînin›,
îcar gunehê we dimîne.

### *Şivan û Miyên Xwe*

10 «Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, ew kesê ku di derî re
nakeve hewşâ miyan, lê di cihên din re dikevê, ew diz û rê-
bir e. 2 Lê yê ku di derî re dikevê, ew şivanê miyan e. 3 Dergehvan
jê re derî vedike. Mî dengê wî dibihîzin û ew bi navê miyên xwe
gazî wan dike û wan derdixe derve. 4 Dema ku ew hemû miyên
xwe derdixe derve, dide pêşiya wan û mî jî li pey wî diçin, çimkî
dengê wî nas dikin. 5 Ew tu caran li pey yekî xerîb naçin, lê ji wî
direvin, çimkî dengê xerîban nas nakin.»
6 Îsa ev mesele ji wan re got, lê wan fêm nekir ku ew çi ji wan
re dibêje.

### *Şivanê Qenc*

7 Li ser vê yekê Îsa dîsa ji wan re got: «Bi rastî, bi rastî ez ji we
re dibêjim, ez deriyê miyan im. 8 Hemû yên ku beriya min hatine
diz û rêbir in, lê miyan guhdariya wan nekir. 9 Derî ez im; yê ku bi
destê min bikeve hundir, ewê xilas bibe. Ewê bikeve hundir, jê
derkeve û çêrê bibîne. 10 Diz bi tenê ji bo dizîn, kuştin û telefkirinê
tê. Lê ez hatim ji bo ku ji wan re jiyan hebe, jiyaneke bi firehî
hebe.
11 «Ez şivanê qenc im. Şivanê qenc ji bo miyan canê xwe dide.
12 Yê ku bi peran hatiye girtin û ne şivan e, kesê ku ne xwediyê
miyan e, dema ku dibîne gur tê, miyan dihêle û direve. Gur jî li
wan dixe û wan belav dike. 13 Ew direve, çimkî ew bi peran hatiye

girtin û xema miyan naxwe. [14] Ez şivanê qenc im. Ez ên xwe nas
dikim û yên min jî min nas dikin, [15] wek ku Bav min nas dike û ez
jî wî nas dikim. Ez ji bo miyan canê xwe didim. [16] Miyên min ên
din ên ku ne di vê hewşê de ne jî hene. Divê ez wan jî bînim û ewê
dengê min bibihîzin. Bi vî awayî, wê bibin şivanek û keriyek.
[17] Bav ji ber vê yekê ji min hez dike, çimkî ez jiyana xwe didim, da
ku ez wê dîsa bistînim. [18] Tu kes wê ji min nastîne, lê ez jiyana
xwe ji ber xwe didim. Ez dikarim jiyana xwe bidim û dikarim dîsa
bistînim jî. Min ev emir ji Bavê xwe stand.»

[19] Li ser van gotinan dîsa di nav Cihûyan de dubendî derket.
[20] Gelekan ji wan digot: «Ew bi cinan ketiye û ew dîn e. Çima hûn
guhdariya wî dikin?» [21] Hinekên din jî gotin: «Ev ne gotinên yekî
ne ku bi cinan ketiye. Ma cin dikarin çavên koran vekin?»

### *Bêbaweriya Cihûyan*

[22] Hingê li Orşelîmê Cejna* Pîrozkirina Perestgehê hatibû û zi-
vistan bû. [23] Îsa li Perestgehê di Eywana Silêman de digeriya. [24] Ci-
hû li dora wî civiyan û jê pirsîn: «Ma tê heta kengê me di şikê de
bihêlî? Eger tu Mesîh bî, ji me re bi eşkereyî bêje!»

[25] Îsa bersîva wan da: «Min ji we re got. Lê hûn bawer nakin.
Karên ku ez bi navê Bavê xwe dikim, ji min re şahidiyê dikin.
[26] Lê hûn bawer nakin, çimkî hûn ne ji miyên min in. [27] Miyên min
dengê min dibihîzin, ez jî wan nas dikim û ew li pey min tên. [28] Ez
jiyana herheyî didim wan û ew tu caran helak nabin û tu kes nikare
wan ji destê min derxe. [29] Bavê min ê ku ew dane min, ji hemûyan
meztir e û tu kes nikare wan ji destê Bavê min derxe. [30] Ez û Bav
yek in.»

[31] Cihûyan dîsa kevir hildan ku wî bidin ber keviran. [32] Îsa ji
wan re got: «Min ji Bav gelek karên qenc nîşanî we dan. Hûn ji ber
kîjanî min didin ber keviran?» [33] Cihûyan bersîva wî da: «Em te ne
ji ber karekî qenc didin ber keviran, lê em te ji ber çêran* didin ber
keviran! Çimkî tu mirov î, lê tu xwe dikî Xwedê.»

[34] Îsa bersîva wan da: «Ma di Şerîeta we de nenivîsiye ku
Xwedê gotiye: ‹Hûn xwedê ne›[a]? [35] Em dizanin ji wan kesên ku
peyva Xwedê ji wan re hatiye, ‹xwedê› hatibe gotin jî, Nivîsara

[a] **10:34** Ji: Zebûr 82:6

Pîroz xera nabe. 36 Bav ez kirim veqetandiyê pîroz* û ez şandim
dinyayê, îcar ji ber ku min got: ‹Ez Kurê Xwedê me›, hûn çawa ji
min re dibêjin: ‹Tu çêran dikî!› 37 Eger ez karên Bavê xwe nekim,
ji min bawer nekin. 38 Lê eger ez wan dikim, bi ser ku hûn ji min
bawer nakin jî, dîsa bi karên min bawer bikin, da ku hûn bizanin û
fêm bikin ku Bav bi min re ye û ez bi Bav re me.» 39 Hingê dîsa
wan xwest ku Îsa bigirin, lê Îsa ji destê wan derket.

40 Îsa dîsa derbasî aliyê din ê Çemê Urdunê bû û li wê derê ma,
cihê ku Yûhenna di destpêkê de lê imad* dikir. 41 Gelek kes diha-
tin ba wî û digotin: «Yûhenna tu nîşan çênekir, lê hemû tiştên ku
Yûhenna li ser vî mirovî gotin rast derketin.» 42 Û li wê derê ge-
lekan bawerî bi wî anî.

### *Mirina Lazar*

11 Îcar mirovek bi navê Lazar nexweş bû. Ew ji Beytanyayê,
ji gundê Meryemê* û xwişka wê Mertayê bû. 2 Lazarê nex-
weş birayê Meryemê bû, ya ku rûnê bîhnxweş li Xudan dabû û bi
porê xwe lingên wî paqij kiribûn. 3 Herdu xwişkan ji Îsa re xeber
şandin û gotin: «Ya Xudan, yê ku tu jê hez dikî nexweş e.» 4 Lê de-
ma ku Îsa ev yek bihîst, wî got: «Ev nexweşî ne ji bo mirinê ye, lê be-
lê ew ji bo rûmeta Xwedê ye, da ku Kurê Xwedê pê bi rûmet bibe.»
5 Îsa ji Mertayê, ji xwişka wê û ji Lazar hez dikir. 6 Lê dema
bihîst ku Lazar nexweş e, ew du rojên din jî li wî cihê ku lê bû ma.
7 Paşê wî ji şagirtên xwe re got: «Em dîsa herin Cihûstanê.» 8 Şa-
girtan jê re got: «Mamoste, hê niha bû Cihû li kevirkirina te dige-
riyan, ma tu dîsa diçî wê derê?» 9 Îsa bersîva wan da: «Ma di
rojekê de diwanzdeh saet tunin? Eger yek bi roj bigere, naterpile*,
çimkî ew ronahiya vê dinyayê dibîne. 10 Lê eger yek di şevê de
bigere, ew diterpile, çimkî bi wî re ronahî tune.» 11 Piştî van pey-
van wî ji wan re got: «Dostê me Lazar bi xew ve çûye, lê ez diçim
wî hişyar bikim.» 12 Şagirtan jê re got: «Ya Xudan, eger ew ketibe
xewê, ewê qenc bibe.» 13 Niha Îsa li ser mirina wî digot, lê wan
guman kir ku ew li ser razana wî dibêje. 14 Li ser vê yekê Îsa bi
eşkereyî ji wan re got: «Lazar miriye. 15 Û ji bo we ez dilşa me ku
ez ne li wê derê bûm, da ku hûn bawer bikin. De niha rabin, em
herin ba wî.» 16 Hingê Tûmayê ku jê re Cêwî digotin, ji hevalên
xwe yên şagirt re got: «Em jî herin, da ku em bi wî re bimirin.»

### *Vejîn û Jiyan*

[17] Dema ku Îsa hat, wî dît ku beriya çar rojan Lazar kirine go-
rê. [18] Beytanya nêzîkî Orşelîmê bû û li dora sê kîlometreyan jê dûr
bû. [19] Gelek Cihû hatibûn ba Merta û Meryemê, da ku ji ber mirina
birayê wan di ber dilê wan de bên.
[20] Gava Mertayê bihîst ku Îsa tê, ew çû pêşiya wî. Lê Meryem
li malê ma. [21] Mertayê ji Îsa re got: «Ya Xudan, eger tu li vir bû-
yayî, birayê min nedimir. [22] Niha jî ez dizanim tu çi ji Xwedê bi-
xwazî, ewê bide te.» [23] Îsa ji wê re got: «Birayê te wê dîsa rabe.»
[24] Mertayê lê vegerand: «Ez dizanim Roja Dawî, Roja* Vejînê ewê
dîsa rabe.» [25] Îsa ji wê re got: «Vejîn* û jiyan ez im. Yê ku bawerî
bi min anîbe, miribe jî ewê bijî. [26] Û her kesê ku dijî û baweriyê bi
min tîne, qet namire. Tu vê yekê bawer dikî?» [27] Mertayê ji wî re
got: «Erê ya Xudan*, ez bawer dikim ku tu Mesîh î, Kurê Xwedê
yî, yê ku wê bihata dinyayê.»

### *Îsa Digirî*

[28] Piştî ku wê ev got, çû gazî xwişka xwe Meryemê kir û bi
dizî got: «Mamoste li vir e û ew gazî te dike.» [29] Gava ku Mer-
yemê ev bihîst, zû rabû çû ba Îsa. [30] Îsa hê negihîştibû gund û hê li
wî cihî bû, dera ku Merta hatibû pêşiya wî. [31] Cihûyên ku li malê bi
wê re bûn û di ber dilê wê de dihatin, gava dîtin ku Meryem zû
rabû derket derve, dan pey wê. Wan guman kir ew diçe ser gorê ku
bigirî. [32] Dema ku Meryem hat cihê ku Îsa lê bû, ew dît, xwe avêt
lingên wî û got: «Ya Xudan, eger tu li vê derê bûyayî, birayê min
nedimir.» [33] Gava ku Îsa çav bi giriyê wê û bi giriyê Cihûyên ku pê
re hatibûn ket, ji kûr ve naliya û kederê ruhê wî girt. [34] Wî ji wan
pirsî: «We ew li ku derê veşart?» Wan jê re got: «Ya Xudan, were
û bibîne.» [35] Îsa giriya. [36] Hingê Cihûyan got: «Binêrin, çiqas ji wî
hez dikir!» [37] Lê hinekan ji wan got: «Ma yê ku çavên ê kor ve-
kirin, nikaribû tiştekî bike ku ev mirov jî nemire?»

### *Îsa Lazarê Mirî Radike*

[38] Li ser vê yekê Îsa dîsa ji kûr ve naliya û gihîşt ser gorê. Gor
şkeftek bû û kevirek li ber derê wê bû. [39] Îsa got: «Kevir rakin.»
Xwişka yê mirî Mertayê ji wî re got: «Ya Xudan, êdî bîhn ke-
tiyeyê, ev çar roj e ku ew miriye.» [40] Îsa ji wê re got: «Ma min ji te

re negot, eger tu bawer bikî, tê rûmeta Xwedê bibînî?» 41 Îcar kevir
rakirin. Îsa çavên xwe ber bi jor ve hilda û got: «Bavo, ji ber ku te
ez bihîstim, ez ji te re şikir dikim. 42 Ez dizanim ku tu hergav min
dibihîzî, lê min ev ji bo elaleta li hawirdorê rawestayî got, da ku
bawer bikin ku te ez şandime.»
43 Piştî ku wî weha got, ew bi dengekî bilind qîriya: «Lazar,
were derve!» 44 Yê mirî, dest û ling bi caw pêçayî û serçavê wî bi
destmalekê nixamtî derket derve. Îsa ji wan re got: «Wî vekin û
bihêlin bila here.»

### *Şêwira Kuştina Îsa*

*(Metta 26:1-5; Marqos 14:1-2; Lûqa 22:1-2)*

45 Gelek Cihûyên ku hatibûn ba Meryemê û tiştên ku Îsa ki-
ribûn dîtin, bawerî bi wî anîn. 46 Lê hinek ji wan jî çûn ba Fêrisiyan
û tiştên ku Îsa dikirin ji wan re gotin. 47 Îcar Fêrisî û serekên ka-
hînan civîna* giregiran gazî ba hev kirin û gotin: «Emê çi bikin?
Ev mirov gelek nîşanan çêdike. 48 Eger em wî weha bihêlin, hemû
kes wê baweriyê bi wî bîne û Romayî jî wê bên, wî cihê me yê
pîroz û miletê me ji holê rakin.»
49 Yekî ji nav wan, Qeyafayê ku wê salê Serokkahîn bû ji wan
re got: «Hûn qet tiştekî fêm nakin. 50 Ma hûn nafikirin, ji bo ku
tevahiya milet helak nebe, di oxira gel de mirovek bimire, ji bo we
çêtir e.» 51 Wî ev ji ber xwe negot, lê ji ber ku ew Serokkahînê wê
salê bû, wî pêxemberîtî kir ku Îsa wê ji bo milet bimire. 52 Ne bi
tenê di oxira wî miletî de, lê ewê ji bo civandin û yekîtiya zarokên
Xwedê yên belavbûyî jî bimira. 53 Îcar ji wê rojê ve şêwira kuştina
Îsa kirin.
54 Loma Îsa êdî bi eşkereyî di nav Cihûyan de negeriya. Lê ew
ji wê derê derket, çû herêmeke nêzîkî çolê, bajarê ku jê re Efrayîm
digotin û bi şagirtên xwe ve li wê derê ma.
55 Cejna* Derbasbûnê ya Cihûyan nêzîk bû. Gelek kesên ji
gundên hawirdor, ji bo ku li gor adetan xwe paqij bikin, beriya
Cejna Derbasbûnê hilkişiyan Orşelîmê. 56 Ew li wê derê li Îsa di-
geriyan û gava li Perestgehê radiwestan, ji hevdû dipirsîn: «Hûn çi
dibêjin? Ma ew qet nayê cejnê?» 57 Fêrisî û serekên kahînan jî emir
derxistibûn ku, eger kesek bizane ew li ku derê ye, bila haya wan
pê bixe, da ku wî bigirin.

### *Îsa li Beytanyayê*
*(Metta 26:6-13; Marqos 14:3-9)*

12 Îcar şeş roj beriya Cejna* Derbasbûnê, Îsa hat Beytanyayê;
Lazarê ku Îsa ew ji nav miriyan rakiribû li wir rûdinişt. 2 Li
wê derê wan ziyafetek da wî. Mertayê xizmet dikir. Lazar jî yek ji
wan kesan bû, yên ku bi Îsa re li ser sifrê rûdiniştin. 3 Meryemê* ji
rûnê narda* xurû yê pirr hêja lîtrek* Romayî bi lingên Îsa de kir û
di pey de bi porê xwe lingên wî zuwa kirin. Tevahiya malê bi
bîhna rûnê nardê tije bû. 4 Lê yekî ji şagirtên wî, Cihûdayê Îsxer-
yotî – yê ku wê paşê ew bida dest – got: 5 «Çima ev rûnê bîhnxweş
bi sê sed zîvî* nehat firotin û li belengazan nehat belavkirin?» 6 Wî
ev ne ji bo ku xema belengazan dixwar, lê ji ber ku ew diz bû got.
Xelîtka* peran bi wî re bû û tiştê ku diketê jê didizî.
7 Îsa got: «Dev ji jinikê berde. Bila vî ji bo roja ku ez bêm
veşartin hilîne. 8 Belengaz hergav di nav we de ne, lê ez hergav ne
li ba we me.»

### *Şêwira Kuştina Lazar*

9 Dema ku elaleteke mezin ji Cihûyan bihîst ku Îsa li wê derê
ye, ew hatin; ew ne bi tenê ji bo Îsa hatin, lê ji bo ku Lazarê ku wî
ji nav miriyan rakiribû jî bibînin. 10 Îcar serekên kahînan şêwira
kuştina Lazar jî kirin. 11 Çimkî ji rûyê wî gelek Cihû diçûn bawerî
bi Îsa dianîn.

### *Îsa bi Rûmet Dikeve Orşelîmê*
*(Metta 21:1-11; Marqos 11:1-11; Lûqa 19:28-40)*

12 Dotira rojê elaleteke mezin a ku hatibû cejnê, gava bihîst ku
Îsa tê Orşelîmê, 13 wan rahişt guliyên xurmeyan, çûn pêşiya wî û
qîriyan:

«Hosanna*!
Yê ku bi navê Xudan tê pîroz be!
Padîşahê Îsraêlê pîroz be!»[a]

14 Îsa dehşikek dît û lê siwar bû, wek ku hatiye nivîsîn: 15 «Ne-
tirse, ey bajarê Siyonê*. Va ye, padîşahê te li ser pişta dehşikê
siwar e û tê.»[b]

---

[a] **12:13** Ji: Zebûr 118:25-26 [b] **12:15** Ji: Zekerya 9:9
**12:3** Lîtrek Romayî 327 gram bû; lîtra îroyîn 1000 gram e.

16 Şagirtên wî di destpêkê de ev fêm nekirin, lê dema ku Îsa hat bi-
rûmetkirin, hingê hat bîra wan ku ev tişt ji bo wî hatine nivîsîn û
wan ev tişt ji bo wî kirin.
17 Ew elaleta çaxê ku wî ji gorê gazî Lazar kiribû û ew ji nav
miriyan rakiribû pê re bû, şahidiya vê yekê dikir. 18 Ji ber vê yekê
gelek çûn pêşiya wî, çimkî wan bihîstibû ku wî ev nîşan çêkiriye.
19 Loma Fêrisiyan ji hev re got: «Hûn dibînin tiştek ji destê we
nayê; binêrin çawa tevahiya dinyayê daye pey wî.»

### *Hinek Yewnanî li Îsa Digerin*

20 Di nav wan kesan de, yên ku ji bo di cejnê de biperizin*,
hilkişiyabûn Orşelîmê, hinek Yewnanî* jî hebûn. 21 Ev hatin ba
Filîposê ji bajarê Beytsayda Celîlê û ji wî re gotin: «Ezbenî, em
dixwazin Îsa bibînin.» 22 Filîpos çû û ev ji Endrawis re got; End-
rawis û Filîpos jî çûn ji Îsa re gotin. 23 Îsa bersîva wan da: «Saeta
ku Kurê Mirov bê birûmetkirin hat. 24 Bi rastî, bi rastî ez ji we re
dibêjim, heta ku liba genim nekeve erdê û nemire, bi tenê dimîne,
lê eger ew bimire, gelek ber dide. 25 Yê ku ji jiyana xwe hez dike,
ewê wê winda bike; lê yê ku li vê dinyayê ji jiyana xwe nefret
dike, wê ji bo jiyana herheyî hiltîne. 26 Yê ku bixwaze ji bo min
xizmetê bike, bila li pey min were. Ez li ku derê bim, yê ku ji min
re xizmetê dike jî wê li wê derê be. Kî ku ji min re xizmetê bike,
Bav wê wî bide rûmetkirin.

### *Îsa li ser Mirina Xwe Dibêje*

27 «Niha dilê min ketiye tengiyê. Ez çi bêjim? Ma ez bêjim:
‹Bavo, min ji vê saetê xilas bike›? Na, ji bo vê yekê ez hatime vê
saetê. 28 Bavo, navê xwe bi rûmet bike.» Li ser vê yekê dengek ji
ezmên hat: «Min ew bi rûmet kir û ezê dîsa wî bi rûmet bikim.»
29 Ew elaleta ku li wê derê rawesta bû û ev bihîst, got: «Ezman
kir xurexur.» Hinekan jî digot: «Milyaketek bi wî re peyivî.» 30 Îsa
bersîv da û got: «Ev deng ne ji bo min, lê ji bo we hat. 31 Niha
dema dîwana vê dinyayê ye; niha serokê vê dinyayê wê bê avêtin
derve. 32 Çaxê ku ez ji erdê ber bi jor ve bêm hildan, ezê hemûyan
ber bi xwe ve bikişînim.» 33 Wî bi vê gotinê îşaret kir, ka ewê bi
mirineke çawa bimire.
34 Elaletê bersîva wî da: «Me ji Şerîetê bihîstiye ku Mesîh wê

her û her bimîne. Çawa dibe ku tu dibêjî: ‹Divê Kurê Mirov ber bi
jor ve bê hildan›? Kî ye ev ‹Kurê Mirov›?» 35 Îsa ji wan re got:
«Ronahî hê ji bo demeke kurt bi we re ye. Hê ku ronahî bi we re
ye, rêve herin, da ku tarî bi ser we de negire. Yê ku di tariyê de rê-
ve diçe, nizane diçe ku derê. 36 Hê ku ronahî bi we re ye, baweriyê
bi ronahiyê bînin, da ku hûn bibin zarokên ronahiyê.»

### *Bêbawerî*

Piştî ku Îsa weha peyivî, çû û xwe ji ber wan veşart. 37 Bi ser
ku wî li ber wan evqas nîşan çêkiribûn, hê jî wan bawerî bi wî
nedianî. 38 Ev çêbû, da ku gotina Îşaya* pêxember bê cih:

«Ya Xudan, kê bi xebera ku me da bawer kir?
Û zendê Xudan ji kê re hat diyarkirin?»[a]

39 Ji ber vê yekê wan nikaribû bawer bikin. Çimkî Îşaya ev jî
gotiye:

40 «Wî çavên wan kor kiriye
Û dilê wan hişk kiriye.
Da ku bi çavên xwe nebînin,
Û bi dilê xwe fêm nekin û venegerin
Û ez jî wan qenc nekim.»[b]

41 Îşaya weha gotiye, çimkî wî rûmeta Îsa dîtiye û li ser wî
peyiviye. 42 Lê belê dîsa jî ji serekan gelekan bawerî bi wî anî. Lê
ji tirsa Fêrisiyan, ji bo ku ji kinîştê neyên avêtin, ev eşkere nekirin.
43 Çimkî wan ji pesnê Xwedê bêtir ji pesnê mirovan hez kir.

### *Gotina ku di Roja Dawî de Dîwanê Dike*

44 Îsa bi dengekî bilind got: «Yê ku baweriyê bi min tîne, ne bi
min, lê bi wî yê ku ez şandime baweriyê tîne. 45 Û yê ku min
dibîne, wî yê ku ez şandime dibîne. 46 Ez bi ronahîtî hatim dinyayê,
da her kesê ku baweriyê bi min bîne, di tariyê de nemîne. 47 Eger
yek gotina min bibihîze û pêk neyne, ez dîwana wî nakim. Çimkî
ez nehatime ku dîwana dinyayê bikim, lê ez hatime ku dinyayê
xilas bikim. 48 Yê ku min red dike û bi gotinên min nake, yekî ku
dîwana wî bike, heye. Ew gotina ku min gotiye, ew gotin wê di
Roja Dawî de dîwana wî bike. 49 Çimkî ez ji ber xwe nepeyivîm, lê

---

[a] **12:38** Ji: Îşaya 53:1 [b] **12:40** Ji: Îşaya 6:10

tiştê ku ez dibêjim û tiştê ku ez dipeyivim, Bavê ku ez şandime
emir daye min. 50 Ez dizanim ku emrê wî jiyana herheyî ye. Loma
tiştên ku ez dipeyivim, Bavê min çawa ji min re gotine ez wusa
dibêjim.»

### *Nefsbiçûkiya Îsa*

13 Îcar beriya Cejna* Derbasbûnê, Îsa dizanibû saeta wî ya ku
vê dinyayê berde û here ba Bav hatiye. Wî ji hemûyên xwe
yên li dinyayê hez kiribû û heta dawiyê ji wan hez kir. 2 Di dema
xwarina şîva êvarê de, ji xwe hingê Îblîs* xistibû dilê Cihûdayê
kurê Şimûnê Îsxeryotî, ku Îsa bide dest. 3 Îsa dizanibû ku Bav he-
mû tişt daye destên wî û ew ji ba Xwedê hatiye û ewê dîsa vegere
ba Xwedê. 4 Îcar ji ser xwarinê rabû, xiftanê xwe danî aliyekî û
pêşgîrek hilda, li pişta xwe pêça. 5 Di pey de av kir leganekê û dest
bi şuştina lingên şagirtên xwe kir û ew bi pêşgîra li pişta xwe
pêçayî zuwa kirin. 6 Îcar ew hat ba Şimûn-Petrûs, Şimûn-Petrûs jê
re got: «Ya Xudan, ma tê lingên min bişoyî?» 7 Îsa lê vegerand û
got: «Niha tu fêm nakî ez çi dikim, lê paşê tê fêm bikî.» 8 Petrûs jê
re got: «Tu caran tu lingên min naşoyî!» Îsa bersîva wî da: «Eger
ez te neşom, para te bi min re tune.» 9 Şimûn-Petrûs lê vegerand û
got: «Ya Xudan, nexwe ne bi tenê lingên min, lê dest û serê min jî
bişo!» 10 Îsa jê re got: «Yê ku hatiye şuştin, ji bilî lingên wî, ne
hewce ye ku dereke wî ya din bê şuştin. Ew bi tevahî paqij e. Hûn
jî paqij in, lê ne hûn hemû.» 11 Çimkî Îsa dizanibû kî wê wî bide
dest, ji ber vê yekê wî got: «Ne hûn hemû paqij in.»

12 Piştî ku wî lingên wan şuştin, ebayê xwe li xwe kir û dîsa li
ser sifrê rûnişt. Wî ji wan pirsî: «Ma hûn dizanin ku min ji bo we
çi kir? 13 Hûn ji min re dibêjin ‹Mamoste› û ‹Xudan› û hûn rast
dibêjin, çimkî ez ew im. 14 Eger bi ser ku ez Xudan û Mamoste me
jî, min lingên we şuştin, divê hûn jî lingên hevdû bişon. 15 Min
mînakek da we, da ku çawa min ji we re kir, hûn jî wusa bikin.
16 Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, xulam ne di ser axayê xwe re
ye, ne jî yê ku hatiye şandin, di ser ê ku ew şandiye re ye. 17 Ma-
dem ku hûn van tiştan dizanin, xwezî bi we, eger hûn wan bikin.

---

13:1 Weha jî tê fêmkirin: «temam», yanî «bê kêmahî ji wan hez kir.»

### *Îsa Girtina Xwe Dide Zanîn*

*(Metta 26:20-25; Marqos 14:17-21; Lûqa 22:21-23)*

18 «Ez ji bo we hemûyan nabêjim; ez dizanim min kî hilbi-
jartine. Lê divê ew nivîsar bê cih:

‹Yê ku nanê min xwar
Pehniya xwe li hember min rakir.›[a]

19 «Ez van niha, beriya ku bibin ji we re dibêjim. Wusa ku
dema ew bibin, hûn bawer bikin ku ez ew im. 20 Bi rastî, bi rastî ez
ji we re dibêjim, yê ku wî kesê ez dişînim, qebûl bike, min qebûl
dike û yê ku min qebûl bike, wî yê ku ez şandime qebûl dike.»

21 Piştî ku Îsa ev tişt gotin, di ruh de gelek reht bû; wî şahidî
kir û got: «Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, yek ji we wê min
bide dest.»

22 Şagirtan li hevdû nêrî û heyirîn, ka ew li ser kê dibêje. 23 Ye-
kî ji şagirtên wî, yê ku Îsa jê hez dikir, pala xwe dabû singê Îsa.
24 Şimûn-Petrûs ji wî re îşaret kir û got: «Bipirse, ka li ser kê di-
bêje.» 25 Wî jî pala xwe dabû singê Îsa, pirsî: «Ya Xudan, kî ye ew?»

26 Îsa bersîv da û got: «Ez pariyê nên li xwarinê bixim û bidim
kê ew e.» Di pey de wî pariyek nan hilda, li xwarinê xist û da Ci-
hûdayê kurê Şimûnê Îsxeryotî. 27 Piştî ku Cihûda pariyê nên stand,
Îblîs ket dilê wî. Îsa ji wî re got: «Tiştê ku tê bikî, niha zû bike.»
28 Lê ji yên ku li ser sifrê rûdiniştin, tu kesî fêm nekir ku wî çima
weha got. 29 Ji ber ku xelîtka* peran bi Cihûda re bû, hinan ji wan
guman dikir ku Îsa dibêje: «Tiştên ku ji bo cejnê ji me re lazim in
bikirre», an: «Tiştekî bide belengazan.» 30 Gava ku Cihûda pariyê
nên stand, di cih de derket derve. Û şev bû.

### *Emrekî Nû: Ji Hevdû Hez Bikin*

31 Piştî ku ew derket derve, Îsa got: «Niha Kurê Mirov hat
birûmetkirin û Xwedê jî bi wî hat birûmetkirin. 32 Eger Xwedê bi
wî hatibe birûmetkirin, Xwedê jî wê wî bi xwe bi rûmet bike. Hem
jî wê wî di cih de bi rûmet bike. 33 Zarono! Ez hê demeke kurt bi
we re me. Hûnê li min bigerin, lê wek ku min ji Cihûyan re got,
niha ez ji we re jî dibêjim, hûn nikarin bên cihê ku ez diçimê.

---

[a] **13:18** Ji: Zebûr 41:9

34 «Ez emrekî nû didim we: Ji hevdû hez bikin. Wek ku min ji
we hez kir, hûn jî ji hevdû hez bikin. 35 Eger hûn ji hevdû hez
bikin, bi vê yekê hemû wê bizanin ku hûn şagirtên min in.»

### *Îsa Dizane ku Petrûs Wê Wî Înkar Bike*

*(Metta 26:31-35; Marqos 14:27-31; Lûqa 22:31-34)*

36 Şimûn-Petrûs jê pirsî: «Ya Xudan, tu bi ku derê ve diçî?» Îsa
bersîva wî da: «Cihê ku ez diçimê, niha tu nikarî li pey min bêyî,
lê paşê tê li pey min bêyî.» 37 Petrûs jê re got: «Ya Xudan, çima ez
niha nikarim li pey te bêm? Ezê ji bo te canê xwe bidim.» 38 Îsa
bersîva wî da: «Ma tê ji bo min canê xwe bidî? Bi rastî, bi rastî ez
ji te re dibêjim, hê dîk bang nedayî, tê sê caran min înkar bikî.

### *Riya ku Diçe Bav*

14 «Bila dilê we reht nebe. Baweriya xwe bi Xwedê bînin û
baweriya xwe bi min jî bînin. 2 Di mala Bavê min de gelek
ode hene. Eger wusa tunebûya, ma minê ji we re bigota ku ez di-
çim ji we re cih amade bikim? 3 Dema ku ez çûm û min ji we re cih
amade kir, ezê dîsa bêm û we bibim ba xwe, da ku cihê ez lê bim,
hûn jî li wê derê bin. 4 Hûn riya wî cihê ku ez diçimê dizanin.»
5 Tûma jê re got: «Ya Xudan, em nizanin tu diçî ku derê, emê
çawa rê bizanin?» 6 Îsa ji wî re got: «Rê, rastî û jiyan ez im. Heta
ku ne bi destê min be, tu kes nayê ba Bav. 7 Eger we ez nas biki-
rama, weyê Bavê min jî nas bikira. Îcar ji niha ve hûn wî nas dikin
û we ew dîtiye.»
8 Filîpos jê re got: «Ya Xudan, ka Bav nîşanî me bide, ev têra
me dike!» 9 Îsa jê re got: «Ey Filîpos, evqas dem ez bi we re me,
ma hê jî te ez nas nekirime? Yê ku ez dîtime, Bav dîtiye; tu çawa
dibêjî: ‹Bav nîşanî me bide›? 10 Ma tu bawer nakî ku ez bi Bav re
me û Bav jî bi min re ye? Gotinên ku ez ji we re dibêjim, ez ji ber
xwe nabêjim. Lê Bavê ku bi min re dimîne, karên xwe dike. 11 Ji
min bawer bikin ku ez bi Bav re me û Bav jî bi min re ye. Lê qet
nebe, ji ber van karan bawer bikin. 12 Bi rastî, bi rastî ez ji we re
dibêjim, yê ku baweriyê bi min bîne, karên ku ez dikim, ew bi xwe
jî wê bike. Ewê yên hê meztir jî bike, çimkî ez diçim ba Bav. 13 Bi
navê min hûn çi bixwazin, ezê bikim, da ku Bav bi Kur bi rûmet
bibe. 14 Eger hûn bi navê min tiştekî ji min bixwazin, ezê wî bikim.

### *Îsa Soza Şandina Ruhê Pîroz Dide*

15 «Madem hûn ji min hez dikin, hûnê emrên min bînin cih.
16 Û ezê ji Bav bixwazim û ewê Alîkarekî din bide we, da ku her û
her bi we re bimîne. 17 Ew Ruhê Rastiyê ye; dinya nikare wî qebûl
bike, çimkî ne wî dibîne û ne jî wî nas dike. Lê hûn wî nas dikin,
çimkî ew bi we re dimîne û ewê di dilê we de be.
18 «Ez we sêwî nahêlim; ezê dîsa bêm ba we. 19 Piştî demeke
kurt, êdî dinya min nabîne, lê hûnê min bibînin. Madem ez dijîm,
hûn jî, hûnê bijîn. 20 Wê rojê hûnê bizanin ku ez bi Bavê xwe re
me, hûn bi min re ne û ez jî bi we re me.
21 «Yê ku emrên min qebûl dike û wan tîne cih, ew e yê ku ji
min hez dike. Yê ku ji min hez dike, ewê ji aliyê Bavê min ve bê
hezkirin. Ez jî, ezê ji wî hez bikim û xwe ji wî re eşkere bikim.»
22 Cihûda* – ne yê Îsxeryotî – ji wî re got: «Ya Xudan, ev ça-
wa dibe ku tê xwe ji me re eşkere bikî, lê xwe ji dinyayê re eşkere
nakî?»
23 Îsa bersîva wî da û got: «Eger yek ji min hez bike, wê gotina
min bigire. Bavê min jî wê ji wî hez bike û emê bên ba wî û li ba
wî cih bigirin. 24 Yê ku ji min hez nake, gotinên min jî nagire. Go-
tina ku hûn dibihîzin ne ya min e, lê ya wî Bavî ye, ku ez şandime.
25 Hê ez li ba we, min ev tişt ji we re gotin. 26 Lê Alîkar – Ruhê*
Pîroz – yê ku Bav wê bi navê min bişîne, ewê hemû tiştî hînî we
bike û wê her tiştên ku min ji we re gotine, bîne bîra we.
27 «Ez aştiyê* ji we re dihêlim; ez aştiya xwe didim we. Ez
wek ku dinya dide we nadim. Bila dilê we reht nebe û netirsin!
28 We bihîst ku min ji we re got: ‹Ez diçim, lê ezê dîsa bêm ba we!›
Eger we ji min hez bikira, ji bo çûna min a ba Bav, hûnê şa bibûna.
Çimkî Bav di ser min re ye. 29 Min ev niha berî ku çêbin gotin, da
ku, dema ew çêbin, hûn bawer bikin. 30 Êdî ez bi we re pirr nape-
yivim, çimkî serokê vê dinyayê tê. Tu tiştê wî bi min re tune, 31 lê
bila dinya bizane ku ez ji Bav hez dikim û Bav çawa emir daye
min ez wusa dikim.
«Rabin, em ji vir herin.

### *Mêwa Rastîn*

15 «Ez mêwa rastîn im, Bavê min jî rezvan e. 2 Ew her şivika
min a ku fêkî nade dibire; her şivika ku fêkî dide jî, ji bo ku

bêtir fêkî bide dikezixîne û paqij dike. 3 Bi gotina ku min ji we re
got, ji xwe hûn paqij in. 4 Bi min re bimînin, ez jî bi we re. Çawa
ku şivik bi mêwê ve nemîne ji ber xwe nikare fêkî bide, hûn jî
wusa bi min re nemînin hûn nikarin fêkî bidin.
5 «Ez mêw im, hûn jî şivik in. Yê ku bi min re dimîne û ez bi
wî re dimînim, ew gelek fêkî dide. Çimkî bêyî min hûn nikarin tu
tiştî bikin. 6 Eger yek bi min re nemîne, wê wek şivika mêwê bê
avêtin derve û hişk bibe. Hingê ew tên civandin, tên avêtin nav
êgir û dişewitin. 7 Eger hûn bi min re bimînin û gotinên min di dilê
we de bimînin, hûn her çi dixwazin bixwazin, wê ji we re bê dayîn.
8 Bavê min bi vê yekê, bi zêde fêkî dayîna we bi rûmet dibe û bi vî
awayî hûnê bibin şagirtên min.
9 «Wek ku Bav ji min hez dike, ez jî wusa ji we hez dikim. Di
hezkirina min de bimînin. 10 Eger hûn emrên min bînin cih, hûnê di
hezkirina min de bimînin; çawa ku min emrên Bav anîn cih û ez di
hezkirina wî de dimînim. 11 Min ev tişt ji we re gotin, da ku şabûna
min bi we re be û şabûna we temam bibe. 12 Emrê min ev e: Ji
hevdû hez bikin, wek ku min ji we hez kir. 13 Tu hezkirin ne di ser
wê hezkirinê re ye ku mirovek di ber dostên xwe de canê xwe bi-
de. 14 Eger hûn tiştên ku min li we emir kirin bînin cih, hûn dostên
min in. 15 Êdî ez ji we re nabêjim ‹xulam›; çimkî xulam nizane ku
axayê wî çi dike. Ez ji we re dibêjim ‹dostên min›; çimkî her tiştên
ku min ji Bavê xwe bihîstin, min bi we dan zanîn. 16 Ne we ez hil-
bijartim, lê min hûn hilbijartin û kifş kirin, da ku hûn herin fêkî
bidin û fêkiyê we bimîne. Hingê hûn bi navê min çi ji Bav bi-
xwazin ewê bide we. 17 Emrê min ji bo we ev e: Ji hevdû hez bikin.

### *Dijminahiya Dinyayê*

18 «Eger dinya ji we nefret bike, bizanin ku beriya we, ji min
nefret kiriye. 19 Eger hûn ji dinyayê bûna, dinyayê wê ji yên xwe
hez bikira. Lê ji bo ku min hûn ji dinyayê hilbijartine, hûn ne ji
dinyayê ne. Ji ber vê yekê dinya ji we nefret dike. 20 Peyva ku min
ji we re got bînin bîra xwe: ‹Xulam ne di ser axayê xwe re ye.›
Eger wan tengahî dabe min, wê tengahiyê bidin we jî. Eger wan
gotina min girtibe, wê gotina we jî bigirin. 21 Lê van hemû tiştan
wê ji ber navê min bi we bikin, çimkî ew, wî yê ku ez şandime nas
nakin.

22 «Eger ez nehatama û min ji wan re negota, gunehên wan wê
tunebûya. Lê niha ji bo guneh hêceta* wan tune. 23 Yê ku ji min
nefret dike, ji Bavê min jî nefret dike. 24 Karên ku tu kesî nekirine,
eger min di nav wan de nekiribana, wê gunehên wan tunebûya. Lê
niha wan dît û dîsa hem ji min hem jî ji Bavê min nefret kirin.
25 Lê belê ev yek çêbû, da ev gotina ku di Şerîeta wan de hatiye
nivîsîn, bê cih:

«Wan bê sedem ji min nefret kir.»[a]

26 «Çaxê Alîkarê ku ezê ji ba Bav ji we re bişînim, ew Ruhê
Rastiyê yê ku ji ba Bav derdikeve bê, ewê ji bo min şahidiyê bike.
27 Hûn jî, hûnê şahidiyê bikin, çimkî ji destpêkê ve hûn bi min re
ne.

16 «Min ev tişt ji we re gotin, da ku hûn neterpilin*. 2 Ewê we
ji kinîştan bavêjin derve. Erê wextekî wusa tê, her kesê ku
we bikuje wê guman bike ku xizmetê ji Xwedê re dike. 3 Wê van
bikin, çimkî wan ne Bav nas kir û ne jî ez. 4 Lê belê min ev tişt ji
we re gotin, da ku çaxê wextê wan bê, hûn bînin bîra xwe ku min
ev ji we re gotine.

### *Li ser Ruhê Pîroz*

«Min ev di destpêkê de ji we re negotin, çimkî ez bi we re
bûm. 5 Lê niha ez diçim ba yê ku ez şandime. Û ji nav we tu kes ji
min napirse: ‹Tu bi ku derê ve diçî?› 6 Îcar ji ber ku min ev tişt ji
we re gotin, dilê we bi xemgînî tije bûye. 7 Lê belê ez rastiyê ji we
re dibêjim: Çûyîna min ji bo we çêtir e. Eger ez neçim, Alîkar ji
we re nayê. Lê eger ez herim, ezê wî ji we re bişînim. 8 Dema ku
ew bê, ewê di derbarê guneh, rastî û dîwanê* de bala dinyayê bi-
kişîne ser sûcên wê. 9 Li ser guneh, çimkî ew baweriyê bi min
naynin. 10 Li ser rastiyê, çimkî ez diçim ba Bav û êdî hûn min
nabînin. 11 Li ser dîwanê, çimkî serokê vê dinyayê sûcdar hatiye
derxistin.

12 «Hê gelek tiştên ku ez ji we re bêjim hene, lê niha hûn ni-
karin wan ragirin. 13 Lê dema ku ew Ruhê Rastiyê bê, ewê we ber
bi hemû rastiyê ve bibe. Çimkî ew ji ber xwe napeyive, lê tiştên ku

---

[a] 15:25 Ji: Zebûr 35:19; 69:4

bibihîze wê bêje û tiştên ku wê bibin, wê bi we bide zanîn. 14 Ewê
min bi rûmet bike, çimkî ewê ji yê min bistîne û bi we bide zanîn.
15 Her çiyê Bav hebe, yê min e. Ji ber vê yekê min got ku ewê ji yê
min bistîne û bi we bide zanîn.

### *Xemgînî û Şahî*

16 «Piştî demeke kurt, êdî hûn min nabînin. Dîsa piştî demeke
kurt hûnê min bibînin.» 17 Ji şagirtên wî hinekan ji hevdû re gotin:
«Ev çi ye ku ew ji me re dibêje? ‹Piştî demeke kurt hûn min nabî-
nin û dîsa piştî demeke kurt hûnê min bibînin.› Û dibêje: ‹Çimkî
ezê herim ba Bav›?» 18 Îcar wan digot: «Ev ‹dema kurt› a ku dibêje
çi ye? Em fêm nakin ku ew çi dibêje.»
19 Îsa dizanibû ku ew dixwazin jê bipirsin; loma wî ji wan re
got: «Hûn li ser gotina min a ‹Piştî demeke kurt hûn min na-
bînin û dîsa piştî demeke kurt hûnê min bibînin› ji hev dipirsin?
20 Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, hûnê bigirîn û li xwe bixin,
lê dinya wê şa bibe. Hûnê xemgîniyê bikişînin, lê xemgîniya we
wê bibe şahî. 21 Dema ku jin zarokê tîne dinyayê, êşê dikişîne. Lê
piştî ku zarok anî, bi wê şabûna ku mirovek hatiye dinyayê, êdî
ew êşa xwe nayne bîra xwe. 22 Niha hûn jî xemgîn in, lê ezê dîsa
we bibînim û dilê we wê bi şahiyê tije bibe. Û tu kes vê şahiya
we ji we nastîne. 23 Dema ku ew roj bê, hûn tu tiştî ji min na-
pirsin. Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, hûn bi navê min her çi
ji Bav bixwazin, ewê bide we. 24 Heta niha we bi navê min tu tişt
nexwest. Bixwazin, hûnê bistînin, wusa ku şahiya we temam bi-
be.

### *Ez li hember Dinyayê bi ser Ketim*

25 «Min ev tişt ji we re bi meselan gotin. Wext tê ku êdî ez bi
meselan ji we re nabêjim. Êdî ezê bi eşkereyî ji we re li ser Bav
bêjim. 26 Wê rojê hûnê bi navê min bixwazin; ez ji we re dibêjim,
ne lazim e ku ez ji bo we ji Bav bixwazim; 27 Bav bi xwe ji we hez
dike, çimkî hûn ji min hez dikin û bawer dikin ku ez ji ba Xwedê
hatime. 28 Ez ji ba Bav derketim û hatim dinyayê. Dîsa ez dinyayê
dihêlim û diçim ba Bav.»
29 Şagirtên wî gotin: «Va ye, niha tu bi eşkereyî dipeyivî û qet
bi meselan nabêjî. 30 Niha em fêm dikin ku tu her tiştî dizanî û

hewcedariya te tune ku kesek ji te bipirse. Ji bo vê yekê em bawer
dikin ku tu ji ba Xwedê hatiyî.»
31 Îsa ji wan re got: «Niha hûn bawer dikin? 32 Wext tê, erê
hatiye jî, wextê ku her yek ji we wê belav bibe, wê here cihê xwe û
min bi tenê bihêle. Lê ez ne bi tenê me, çimkî Bav bi min re ye.
33 Min ev tişt ji we re gotin, da ku hûn bi min re di aştiyê* de bin.
Hûnê li dinyayê tengahiyê bibînin, lê bi zirav bin! Ez li hember
dinyayê bi ser ketim.»

### *Îsa ji bo Bawermendan Dua Dike*

17 Piştî ku Îsa ev tişt gotin, çavên xwe ber bi ezmên ve hildan
û got: «Ya Bavo, saet hat! Kurê xwe bi rûmet bike, da ku
Kur jî te bi rûmet bike. 2 Çimkî te desthilatî li ser hemû mirovan da
wî, da ku jiyana herheyî bide hemû kesên ku te dane wî. 3 Jiyana
herheyî jî ev e: Ku ew bizanin tu bi tenê Xwedayê rast î, te û Îsa
Mesîhê ku te şandiye nas bikin. 4 Min tu li ser rûyê erdê bi rûmet
kirî. Karê ku te spartibû min, min ew pêk anî. 5 Ya Bavo, beriya ku
dinya çêbe ew rûmeta ku li ba te ya min bû, bi wê niha min li ba
xwe bi rûmet bike.
6 «Min navê te ji wan mirovan re eşkere kir ên ku te ji dinyayê
dan min. Yên te bûn, te ew dan min û wan peyva te girt. 7 Ew niha
dizanin, her tiştên ku te dane min, ji te ne. 8 Peyvên ku te dan min,
min dan wan û wan jî ew qebûl kirin. Ew bi rastî dizanin ku ez ji te
hatime û bawerî anîn ku te ez şandime.
9 «Ez ji bo wan dua dikim. Ne ji bo dinyayê; ez ji bo yên ku te
dane min dua dikim. Çimkî ew ên te ne. 10 Hemû yên ku yên min
in, yên te ne; yên te jî yên min in. Û ez bi wan bi rûmet bûme.
11 Êdî ez ne li dinyayê me, lê ew li dinyayê ne; niha ez têm ba te.
Ya Bavê Pîroz! Bi navê xwe yê ku te da min, wan biparêze, da ku
ew jî wek me bibin yek. 12 Dema ku ez bi wan re bûm, bi navê te
yê ku te dabû min, ez li wan bûm xweyî. Min ew parastin û tu kes
ji wan winda nebû, ji bilî kurê helakê, da ku Nivîsara Pîroz bê cih.
13 Lê niha ez têm ba te û hê ku ez li dinyayê me, ez van gotinan
dibêjim, ji bo ku şabûna min di dilê wan de temam bibe. 14 Min
peyva te gihand wan û dinyayê ji wan nefret kir. Çimkî, çawa ku
ez ne ji dinyayê me, ew jî ne ji dinyayê ne. 15 Ez dua dikim, ne ji
bo ku tu wan ji dinyayê rakî, lê ji bo ku tu wan ji Yê Xerab bi-

parêzî. [16] Çawa ku ez ne ji dinyayê me, ew jî ne ji dinyayê ne.
[17] Wan bi rastiyê pîroz bike û veqetîne; peyva te rastî ye. [18] Wek ku
te ez şandim dinyayê, min jî ew şandin dinyayê. [19] Ez ji bo wan
xwe dikim veqetandiyê pîroz, da ku ew jî bi rastiyê pîroz bibin û
veqetin.
[20] «Ez ne bi tenê ji bo wan, lê ji bo yên ku bi gotina wan
baweriyê bi min tînin jî dua dikim, [21] da ku hemû bibin yek. Ya
Bavo, çawa tu bi min re yî û ez bi te re me, bila ew jî bi me re bin,
da ku dinya bawer bike ku te ez şandime. [22] Rûmeta ku te da min,
min da wan, da ku ew bibin yek, wek ku em yek in: [23] Ez bi wan
re, tu jî bi min re, da ku ew bigihîjin yekîtiyeke temam û dinya
bizane ku te ez şandime û çawa ku tu ji min hez dikî, tu ji wan jî
hez dikî.
[24] «Ya Bavo, ez dixwazim yên ku te dane min, li cihê ku ez lê
me bi min re bin, da ku rûmeta ku te daye min bibînin. Çimkî te
beriya damezrandina dinyayê ji min hez kir. [25] Ya Bavê dadper-
wer*! Dinya te nas nake, lê ez te nas dikim. Ev jî dizanin ku te ez
şandime. [26] Min navê te bi wan da zanîn û ezê hê bidim zanîn, da
ku hezkirina te ya ji min, bi wan re jî be û ez bi wan re bim.»

### *Girtina Îsa*

*(Metta 26:47-56; Marqos 14:43-50; Lûqa 22:47-53)*

18 Piştî ku Îsa ev tişt gotin, bi şagirtên xwe ve derbasî aliyê
din ê newala Qidronê bû. Li wê derê baxçeyek hebû. Îsa
û şagirtên xwe ketinê. [2] Cihûdayê* ku ew da dest jî ev cih di-
zanibû, çimkî Îsa û şagirtên xwe gelek caran li wir li hev di-
civiyan. [3] Îcar Cihûda komeke leşker û hin parêzgerên ku Fêrisî û
serekên kahînan şandibûn, bi fanos, xetîre û çekan ve bi xwe re
anîn û hat wê derê. [4] Îsa hemû tiştên ku wê bihatana serê wî di-
zanibû. Îcar derket pêş û ji wan re got: «Hûn li kê digerin?»
[5] Wan lê vegerand û gotin: «Li Îsayê Nisretî!» Îsa ji wan re got:
«Ez ew im.»
Cihûdayê ku Îsa da dest jî bi wan re bû. [6] Gava ku Îsa ji wan re
got: «Ez ew im!» ew ber bi paş ve çûn û ketin erdê. [7] Wî dîsa ji
wan pirsî: «Hûn li kê digerin?» Wan got: «Li Îsayê Nisretî.»
[8] Îsa bersîva wan da: «Min ji we re got ku ez ew im; madem
hûn li min digerin, bihêlin bila evên ha herin.» [9] Wî ev got, da ew

peyva ku wî gotibû, bê cih: «Ji yên ku te dane min, min yek ji wan
winda nekir.»
[10] Hingê Şimûn-Petrûs şûrê ku pê re bû kişand û daweşand
xulamê Serokkahîn û guhê wî yê rastê jêkir. Navê xulam Malxos
bû. [11] Îsa ji Petrûs re got: «Şûrê xwe bixe kalan! Ma ez wê kasa
tehl a ku Bav daye min venexwim?»

### *Li ber Serokkahîn*

*(Metta 26:57-58; Marqos 14:53-54; Lûqa 22:54)*

[12] Piştî vê yekê koma leşkeran û serdarê wan û parêzgerên Ci-
hûyan Îsa girtin û girêdan. [13] Pêşî ew birin ba Henanê ku xezûrê
Qeyafa bû. Qeyafa Serokkahînê wê salê bû. [14] Ew Qeyafa bû yê ku
şîreta «Di oxira gel de mirina yekî ji bo me çêtir e» li serekên
Cihûyan kiribû.

### *Înkarkirina Petrûs*

*(Metta 26:69-70; Marqos 14:66-68; Lûqa 22:55-57)*

[15] Şimûn-Petrûs û şagirtekî din li pey Îsa diçûn. Ji ber ku ev
şagirt nasê Serokkahîn bû, ew bi Îsa re ket hewşa Serokkahîn. [16] Lê
Petrûs li derve, li ber derî rawestabû. Îcar şagirtê ku nasê Serokka-
hîn bû derket derve û bi dergehvanê re peyivî û Petrûs anî hundir.
[17] Ew keçika dergehvan ji Petrûs pirsî: «Ma tu jî ne yek ji şagirtên
vî mirovî yî?» Petrûs got: «Na, ne ez im.»
[18] Di vê navê de xizmetkar û parêzger li ber agirê ku ji komirê
vêxistibûn, rawestabûn û xwe germ dikirin, çimkî dinya sar bû.
Petrûs jî li ba wan rawestabû û xwe germ dikir.

### *Pirskirina Serokkahîn*

*(Metta 26:59-66; Marqos 14:55-64; Lûqa 22:66-71)*

[19] Hingê Serokkahîn, Îsa li ser şagirtên wî û hînkirina wî
kişand pirsyariyê. [20] Îsa bersîv da û got: «Ez bi eşkereyî bi xelkê re
peyivîm. Min herdem li kinîştan û li Perestgeha ku hemû Cihû lê
diciviyan hîn dikir. Min tu tişt bi dizî negot. [21] Tu çima min diki-
şînî pirsyariyê? Ji yên ku ez bihîstime bipirse, ka min ji wan re çi
gotiye; ew dizanin ku min çi gotiye.»
[22] Dema ku Îsa weha peyivî, yek ji parêzgerên ku li wê derê

---

**18:9** Yûhenna 6:39

disekinîn sîleyek lê xist û got: «Çawa tu bersîva Serokkahîn weha
didî?» [23] Îsa lê vegerand û got: «Eger min ne rast gotibe, nerastiya
min bêje. Lê eger ez rast dibêjim, tu çima li min dixî?» [24] Hingê
Henan ew girêdayî şand ba Qeyafayê Serokkahîn.

### *Petrûs Dîsa Îsa Înkar Dike*

*(Metta 26:71-75; Marqos 14:69-72; Lûqa 22:58-62)*

[25] Di vê navê de Şimûn-Petrûs hê rawestabû, xwe germ dikir.
Ji wî pirsîn: «Ma tu jî ne yek ji şagirtên wî yî?» Wî ev înkar kir û
got: «Na, ne ez im.» [26] Yek ji xizmetkarên Serokkahîn, mirovê wî
yê ku Petrûs guhê wî birrîbû, jê pirsî: «Ma min tu di nav baxçe de
bi wî re nedîtî?» [27] Petrûs dîsa ev înkar kir û di wê gavê de dîk
bang da.

### *Li ber Pîlatosê Walî*

*(Metta 27:1-2, 11-14; Marqos 15:1-5; Lûqa 23:1-5)*

[28] Îcar Îsa ji ba Qeyafa birin qesra walî. Serê sibê zû bû û Cihû
neketin qesrê, da ku adetên paqijiyê yên dînî xera nekin û bikarin
xwarina Cejna* Derbasbûnê bixwin. [29] Loma Pîlatos derket derve,
hat ba wan û pirsî: «Hûn vî mirovî bi çi sûcdar dikin?»
[30] Wan bersîva wî da û got: «Eger ev ne mirovekî xerabkar
bûya, me ew teslîmî te nedikir.» [31] Pîlatos ji wan re got: «Hûn bi
xwe wî bibin û li gor Şerîeta xwe dîwana wî bikin.» Cihûyan lê
vegerand û gotin: «Destûra me tune ku em tu kesî bikujin.» [32] Ev
çêbû, da ku gotina Îsa ku pê îşaret kiribû, ka ewê bi mirineke çawa
bimire, bê cih.
[33] Hingê Pîlatos dîsa ket qesra walî, gazî Îsa kir û jê pirsî: «Ma
tu Padîşahê Cihûyan î?» [34] Îsa lê vegerand û got: «Tu vê ji ber xwe
dibêjî an hinekên din ev yek li ser min ji te re gotine?»
[35] Pîlatos got: «Ma ez Cihû me? Miletê te bi xwe û serekên
kahînan tu dayî destê min. Te çi kiriye?» [36] Îsa bersîv da û got:
«Padîşahiya min ne ji vê dinyayê ye; eger padîşahiya min ji vê
dinyayê bûya, ji bo ku ez nekevim destê Cihûyan, xizmetkarên
min wê li ber xwe bidana. Lê padîşahiya min ne ji vê dinyayê ye.»
[37] Pîlatos jî jê re got: «Nexwe tu padîşah î?» Îsa bersîv da û
got: «Tu ji bo min dibêjî ku ez padîşah im. Ez ji bo vê yekê ji
dayik bûme û ji bo vê yekê hatime dinyayê, da ku ez ji rastiyê re

şahidiyê bikim. Her kesê ku ji aliyê rastiyê be, guhê xwe dide
dengê min.»
[38] Pîlatos jê pirsî: «Ma rastî çi ye?»

### *Îsa Cezayê Mirinê Distîne*

*(Metta 27:15-31; Marqos 15:6-20; Lûqa 23:13-25)*

Piştî vê pirsê, Pîlatos dîsa çû derve ba Cihûyan û ji wan re got:
«Ez tu sedemê sûcdarkirina wî nabînim. [39] Lê adeta we ye ku ez di
Cejna Derbasbûnê de yekî girtî ji bo we berdim. Ma hûn dixwazin
ku ez ji bo we padîşahê Cihûyan berdim?»
[40] Li ser vê yekê wan bi qîrîn got: «Ne vî mirovî, lê Barabas
berde!» Barabas jî serhildêrek bû.

19 Hingê Pîlatos Îsa girt û da ber qamçiyan. [2] Leşkeran jî ji
stiriyan tacek honandin û dan serê wî û xiftanekî binefşî lê
kirin. [3] Îcar dihatin pêş wî û digotin: «Bijî padîşahê Cihûyan!» Û
sîle li wî dixistin.
[4] Pîlatos dîsa derket derve û ji wan re got: «Va ye, niha ez wî
tînim derve ba we, da ku hûn bizanin ku min tu sedemê sûcdarki-
rina wî nedîtiye.» [5] Li ser vê yekê Îsa bi taca serê xwe ya ji stiriyan
çêkirî û bi xiftanê binefşî yê li xwe kirî ve derket derve. Pîlatos ji
wan re got: «Va ye, ew mirov!»
[6] Dema ku serekên kahînan û parêzgeran ew dît, qîriyan û gotin:
«Wî li xaçê bixe, wî li xaçê bixe!» Pîlatos ji wan re got: «Hûn bi xwe
wî bibin li xaçê bixin. Ez bi xwe tu sedemê sûckirina wî nabînim.»
[7] Cihûyan bersîva wî da û gotin: «Şerîeta me heye û li gor
Şerîetê divê ew bimire. Çimkî wî xwe kiriye Kurê Xwedê.»
[8] Dema ku Pîlatos ev gotin bihîst, ew hê bêtir tirsiya. [9] Ew dîsa
çû hundirê qesra walî û ji Îsa re got: «Tu ji ku derê yî?» Lê Îsa
bersîva wî neda. [10] Pîlatos jî jê re got: «Ma tu bi min re napeyivî?
Ma tu nizanî ku desthilatiya min heye ku ez te berdim û dest-
hilatiya min heye ku ez te li xaçê jî bixim?»
[11] Îsa lê vegerand û got: «Eger ji jor ji te re nehata dayîn, tu
desthilatiya te wê li ser min tunebûya. Ji ber vê yekê gunehê wî yê
ku ez dam destê te meztir e.»

---

**19:7 Qanûna Kahîntiyê 24:16**

12 Hingê Pîlatos dixebitî ku Îsa berde, lê Cihû qîriyan û gotin:
«Eger tu vî mirovî berdî, tu ne dostê Qeyser î! Her kesê ku xwe
bike padîşah, li hember Qeyser serî hildaye!»
13 Dema ku Pîlatos ev gotinên ha bihîstin, Îsa anî derve. Ew bi
xwe jî li ser kursiyê dîwanê rûnişt, ku li cihê ‹Reqfa Kevir› bû – bi
Îbranî* jê re ‹Gabata› digotin. 14 Roja* Amadekirinê ya Cejna Der-
basbûnê bû. Saet li dora diwanzdehan bû, nîvro bû. Pîlatos ji Ci-
hûyan re got: «Va ye, padîşahê we!»
15 Lê ew qîriyan: «Bila ji me dûr be, bila ji me dûr be! Wî li
xaçê bixe!» Pîlatos ji wan re got: «Ma ez padîşahê we li xaçê
bixim?» Serekên kahînan bersîva wî dan: «Ji Qeyser pê ve,
padîşahê me tune.» 16 Hingê wî Îsa teslîmî wan kir, da ku li xaçê
bixin.

### *Îsa li Xaçê Tê Xistin*

*(Metta 27:32-44; Marqos 15:21-32; Lûqa 23:26-43)*

Li ser vê yekê wan Îsa bir. 17 Îsa bi xwe xaça xwe hilgirt û der-
ket wî cihê ku jê re ‹Cihê Qoqê Serî› – bi Îbranî ‹Golgota› – di-
gotin. 18 Li wê derê wan ew bi du kesên din re li xaçê xistin. Her
yek li kêlekekê, Îsa di navbera wan de bû. 19 Pîlatos depikek nivîsî
û bi xaçê ve danî. Tiştê nivîsî ev bû: «ÎSAYÊ NISRETÎ, PADÎ-
ŞAHÊ CIHÛYAN.» 20 Gelek Cihûyan ev nivîsdek xwend, çimkî
cihê ku Îsa li xaçê xistibûn nêzîkî bajêr bû û ew bi Îbranî*, Latînî û
Yewnanî hatibû nivîsîn. 21 Lê serekên kahînên Cihûyan ji Pîlatos re
gotin: «Nenivîse ‹Padîşahê Cihûyan›! Binivîse ku ‹Vî mirovî got:
Ez Padîşahê Cihûyan im.›» 22 Pîlatos bersîv da: «Min çi nivîsîbe,
min nivîsiye.»
23 Piştî ku leşkeran Îsa li xaçê xistin, wan cilên wî hildan, kirin
çar par, da ku ji her yekî re parek bikeve. Kirasê wî jî hildan. Kiras
ji serî heta binî honandî û bêdirûtin bû. 24 Îcar ji hevdû re gotin:
«Werin em vî nedirînin, em pişkê bavêjin, ka wê ji kê re bikeve.»
Ev çêbû, da ku ew nivîsar bê cih:

«Cilên min di nav xwe de leva* kirin,
Û ji bo xiftanê min pişk avêtin.»[a]

Hingê leşkeran tam evên ha kirin.

---

[a] 19:24 Ji: Zebûr 22:18

25 Li ber xaça Îsa diya wî, xaltiya wî, Meryema jina Klopas û
Meryema* Mejdelanî rawestabûn. 26 Dema Îsa dît ku diya wî û şa-
girtê wî yê ku wî jê hez dikir li wê derê disekinin, wî ji diya xwe re
got: «Sitiyê! Va ye kurê te!» 27 Di pey de wî ji şagirtê xwe re got:
«Va ye diya te!» Ji hingê û pê ve vî şagirtî ew bir mala xwe.

### *Mirina Îsa*

*(Metta 27:45-56; Marqos 15:33-41; Lûqa 23:44-49)*

28 Piştî vê yekê êdî Îsa dizanibû ku her tişt pêk hat. Ji bo ku
Nivîsara Pîroz bê cih, wî got: «Ez tî me.» 29 Firaxek ji sihikê tije-
kirî li wê derê bû. Avgirek* li nav sihikê xistî bi serê darikê gû-
rizê* ve danîn û dirêjî devê wî kirin. 30 Gava ku Îsa sihik vexwar,
wî got: «Temam bû», serê xwe xwar kir û ruhê xwe da.

### *Gotina Pêxember Tê Cih*

31 Ji ber ku roja* Amadekirinê bû û diviya roja Şemiyê cesed li
ser xaçê nemînin – çimkî ew Şemî rojeke gelek girîng bû – serekên
Cihûyan ji Pîlatos daxwaza şkandina teşkên ên xaçkirî kirin, da ku
ew bên rakirin. 32 Îcar leşker hatin; pêşî teşkên yekî û di pey de
teşkên ê din ên ku bi wî re hatibûn xaçkirin, şkandin. 33 Lê gava ku
ew hatin ba Îsa û dîtin ku ew ji xwe miriye, wan teşkên wî neş-
kandin. 34 Lê dîsa jî ji leşkeran yekî newqa wî bi rimê qul kir û di
cih de av û xwîn herikî. 35 – Yê ku ev dît şahidî kir, da ku hûn jî
bawer bikin. Şahidiya wî rast e û ew dizane ku ew rastiyê dibêje. –
36 Ev çêbû, da ku ew nivîsar bê cih:

«Tu hestiyê wî nayê şkandin.»[a]

37 Û dîsa nivîsareke din weha dibêje:

«Ewê li wî yê ku bedena wî qul kirine binêrin.»[b]

### *Veşartina Îsa*

*(Metta 27:57-61; Marqos 15:42-47; Lûqa 23:50-56)*

38 Piştî vê yekê, Ûsivê ji Arîmetyayê yê ku şagirtê Îsa bû û ji
tirsa serekên Cihûyan xwe veşartibû, daxwaza rakirina cesedê Îsa
ji Pîlatos kir û Pîlatos destûr dayê. Îcar Ûsiv hat û cesedê Îsa rakir.
39 Nîkodêmos jî hat, yê ku cara pêşî bi şev hatibû ba Îsa; wî nêzîkî

---

[a] 19:36 Ji: Derketin 12:46; Hijmartin 9:12; Zebûr 34:20

[b] 19:37 Ji: Zekerya 12:10

sed lîtrên* Romayî ji mur* û dara* ûdê tevlihevkirî anî. 40 Wan ce-
sedê Îsa hilanî, li gor adetên Cihûyan ên veşartina miriyan, giya-
yên bîhnxweş lê dan û bi cawên keten ew pêçan. 41 Li cihê ku Îsa
lê hatibû xaçkirin baxçeyek hebû û di nav baxçe de jî goreke nû
hebû ku hê tu kes lê nehatibû veşartin. 42 Ji ber ku roja* Ama-
dekirinê ya Cihûyan bû û gor jî nêzîk bû, Îsa li wê derê dirêj kirin.

### *Gora Vala*

*(Metta 28:1-10; Marqos 16:1-8; Lûqa 24:1-12)*

20 Roja pêşî ya heftiyê, serê sibê zû, hê ku tarî bû Meryema*
Mejdelanî hat ser gorê. Wê dît ku kevir ji ber derê gorê
hatiye rakirin, 2 bi bez çû ba Şimûn-Petrûs û şagirtê din ê ku Îsa jê
hez dikir û ji wan re got: «Xudan ji gorê derxistine û em nizanin
ku ew danîne ku derê.»

3 Li ser vê yekê Petrûs û şagirtê din derketin derve û bi aliyê
gorê ve hatin. 4 Herdu jî bi hev re dibezîn, lê şagirtê din ji Petrûs
zûtir bezî û ew pêşî gihîşt ser gorê. 5 Dema wî xwe xwar kir û nêrî,
dît ku cawên keten raxistî ne. Lê ew neket hundir. 6 Hingê Şimûn-
Petrûs jî li pey wî hat; ket hundirê gorê, cawên keten ên raxistî 7 û
destmala ku li serê Îsa hatibû pêçandin, dîtin. Destmal ne li ba ca-
wên keten bû, lê pêçayî û ji wan veqetayî bû. 8 Hingê şagirtê din ê
ku pêşî gihîştibû ser gorê ket hundir. Wî dît û bawer kir. 9 – Wan
hê ji Nivîsara Pîroz fêm nedikir ku diviya Îsa ji nav miriyan rabe. –
10 Piştî vê yekê şagirt vegeriyan cihên xwe.

### *Îsa Xwe Nîşanî Meryema Mejdelanî Dide*

*(Marqos 16:9-11)*

11 Lê Meryem li derve, li ber gorê sekinîbû û digiriya. Wê bi
girîn xwe xwar kir û li hundirê gorê nêrî, 12 dît ku du milyaketên
cilspî, li cihê ku cesedê Îsa lê hatibû dirêjkirin rûniştine, yek li cihê
serê wî û yê din li cihê lingên wî. 13 Milyaketan ji wê re got: «Ya
sitiyê! Tu çima digirî?» Meryemê ji wan re got: «Xudanê min raki-
rine û ez nizanim ew danîne ku derê.»

14 Gava wê weha got, li pişt xwe zivirî û dît ku Îsa li wê derê
rawestaye. Lê wê nizanibû ku ew Îsa ye. 15 Îsa ji wê re got: «Ya
sitiyê, tu çima digirî? Tu li kê digerî?» Meryemê jî guman kir ku
ew baxçevan e; wê ji wî re got: «Ezxadim, eger te ew rakiribe, ji

min re bêje, te ew daniye ku derê, da ku ez wî ji wê derê rakim.»
16 Îsa ji wê re got: «Meryem!» Meryem li wî zivirî û bi Îbranî got:
«Rabbonî!» ku bi mana «Mamoste!» ye.
17 Îsa ji wê re got: «Destê xwe li min nede, çimkî hê ez derne-
ketime ba Bav. Lê here ba birayên min û ji wan re bêje: ‹Ez der-
dikevim ba Bavê xwe û Bavê we, ba Xwedayê xwe û ba Xwedayê
we.›» 18 Meryema* Mejdelanî çû ba şagirtan û ji wan re got: «Min
Xudan dît» û tiştên ku wî ji wê re gotibû ji wan re got.

### *Îsa Xwe Nîşanî Şagirtên Xwe Dide*

*(Metta 28:16-20; Marqos 16:14-18; Lûqa 24:36-49)*

19 Wê êvara roja pêşî ya heftiyê, gava şagirt ji tirsa Cihûyan di
pişt deriyên girtî de civiyabûn, Îsa hat, di nav wan de sekinî û ji
wan re got: «Silamet li ser we be.» 20 Ev tişt got, destên xwe û
newqa xwe nîşanî wan da. Gava ku şagirtan Xudan dît, pirr şa bûn.
21 Îsa dîsa ji wan re got: «Silamet li ser we be. Wek ku Bav ez şan-
dim, ez jî we dişînim.» 22 Piştî ku weha peyivî pif kir wan û ji wan
re got: «Ruhê* Pîroz bistînin. 23 Hûn li gunehên kê bibihûrin, ew
lêbihûrtî ne. Hûn li gunehên kê nebihûrin, li wan nayê bihûrtin.»

### *Îsa û Tûma*

24 Tûmayê ku yek ji diwanzdehan bû û jê re Cêwî digotin, gava
ku Îsa hat, ne bi wan re bû. 25 Şagirtên din ji wî re gotin: «Me Xu-
dan* dît.» Lê Tûma ji wan re got: «Heta ku ez di destên wî de cihê
bizmaran nebînim, tiliya xwe li cihê bizmaran nedim û destê xwe
daneynim ser newqa wî, ez qet bawer nakim.»
26 Piştî heşt rojan, şagirtên Îsa dîsa li malekê bûn û Tûma jî bi
wan re bû. Derî girtî bûn, lê Îsa hat, di nav wan de sekinî û got:
«Silamet li ser we be.» 27 Di pey de ji Tûma re got: «Tiliya xwe
bîne vir û li destên min binêre. Destê xwe jî dirêj bike û deyne ser
newqa min. Êdî bêbaweriyê neke, lê belê bi bawerî be!»
28 Tûma lê vegerand û got: «Xudanê* min û Xwedayê min!»
29 Îsa ji wî re got: «Ji ber ku te ez dîtim tu bawer dikî? Xwezî bi
wan ên ku nebînin, lê dîsa bawer dikin!»

### *Armanca Vê Kitêbê*

30 Erê, Îsa li ber şagirtên xwe hê gelek nîşanên din jî çêkirin ku
ew di vê kitêbê* de nehatine nivîsîn. 31 Lê ev hatine nivîsîn, da ku

hûn bawer bikin ku Îsa Mesîh e, Kurê Xwedê ye û bi vê baweriyê
jiyana we bi navê wî hebe.

### *Îsa û Girtina Masiyan*

21 Piştî van bûyeran, Îsa dîsa xwe li perê Gola Teberiyayê nî-
şanî şagirtên xwe da. Ev bi vî awayî çêbû: 2 Şimûn-Petrûs,
Tûmayê ku jê re Cêwî digotin, Natanyêlê ji Qenaya Celîlê, kurên
Zebedî û du şagirtên Îsa yên din bi hev re bûn. 3 Şimûn-Petrûs ji
wan re got: «Ez diçim ku masiyan bigirim.» Wan jî ji wî re got:
«Em jî bi te re tên.» Derketin derve, li qeyikekê siwar bûn, lê wê
şevê tu tişt negirtin.
4 Êdî çaxê bû sibe Îsa li qeraxê golê sekinî, lê şagirtan niza-
nibûn ku ew Îsa ye. 5 Îsa ji wan re got: «Zarono, ma pêxwarina we
heye?» Wan lê vegerand û gotin: «Na.» 6 Îcar Îsa ji wan re got:
«Torê bavêjin aliyê rastê yê qeyikê, hûnê bigirin.» Wan jî tor avêt;
êdî ji pirrbûna masiyan hêza wan têrê nekir ku torê bikişînin.
7 Hingê şagirtê ku Îsa jê hez dikir ji Petrûs re got: «Ev Xudan
e!» Gava ku Şimûn-Petrûs bihîst ku ew Xudan e, wî kirasê xwe li
xwe kir – çimkî wî ew ji xwe kiribû – û xwe avêt golê. 8 Şagirtên
din jî tora tije masî kişandin û bi qeyikê hatin nêzîk. Çimkî ji bejê
ne dûr bûn, lê nêzîkî sed metreyan dûr bûn.

### *Îsa bi Şagirtên Xwe re Xwarinê Dixwe*

9 Gava ku ew derketin bejê, dîtin ku li wir agirê ji komirê heye;
masî li ser e û nan li ber e. 10 Îsa ji wan re got: «Hinek ji wan ma-
siyên ku we niha girtine bînin.» 11 Şimûn-Petrûs ket qeyikê û tora
ku bi sed û pêncî û sê masiyên mezin tije bû kişand bejê. Bi ser ku
ewqas gelek bûn jî dîsa tor neçiriya.
12 Îsa ji wan re got: «Werin taştê bixwin.» Ji şagirtan tu kesî
newêribû ku jê bipirse: «Tu kî yî?» Çimkî wan dizanibû ku ew
Xudan e. 13 Îsa nêzîk bû, nan hilda, da wan û bi vî awayî masî jî da
wan. 14 Piştî rabûna ji nav miriyan, ev cara sisiyan bû ku Îsa xwe
nîşanî şagirtan dida.

### *Îsa û Petrûs*

15 Îcar piştî ku wan taştê xwar, Îsa ji Şimûn-Petrûs pirsî: «Ey
Şimûnê kurê Yûhenna, ma tu ji van bêtir ji min hez dikî?» Petrûs

jê re got: «Erê ya Xudan, tu dizanî ku ez ji te hez dikim.» Îsa ji wî
re got: «Berxên min biçêrîne.»
16 Îsa cara diduyan ji wî re got: «Ey Şimûnê kurê Yûhenna, ma
tu ji min hez dikî?» Wî ji Îsa re got: «Erê ya Xudan; tu dizanî ku
ez ji te hez dikim.» Îsa jê re got: «Şivantiya miyên min bike.»
17 Îsa cara sisiyan ji Petrûs pirsî: «Ey Şimûnê kurê Yûhenna,
ma tu ji min hez dikî?» Li ser pirsîna Îsa ya cara sisiyan «Ma tu ji
min hez dikî?» kederê Petrûs girt û got: «Ya Xudan, tu her tiştî
dizanî; tu dizanî ku ez ji te hez dikim.» Îsa ji wî re got: «Miyên
min biçêrîne. 18 Bi rastî, bi rastî ez ji te re dibêjim, gava ku tu xort
bûyî, te xwe girêdida û dera ku te dixwest tu diçûyiyê. Lê gava ku
tu pîr bibî, tê destên xwe dirêj bikî û yekî din wê pişta te girêbide û
te bibe cihê ku tu naxwazî heriyê.» 19 Wî ev got, ji bo nîşan bide ku
ewê bi çi cûreyê mirinê Xwedê bi rûmet bike. Piştî vê yekê wî ji
Petrûs re got: «Li pey min were.»

### *Îsa û Şagirtê Hezkirî*

20 Gava ku Petrûs bi şûn de vegeriya, dît ew şagirtê ku Îsa jê
hez dike li pey wan tê. Ev, ew şagirt bû ku di şîva êvarê de pala
xwe dabû singê Îsa û gotibû: «Ya Xudan, yê ku wê te bide dest kî
ye?» 21 Dema ku Petrûs ew dît, ji Îsa pirsî: «Ya Xudan, îcar evê
bibe çi?»
22 Îsa ji wî re got: «Eger ez bixwazim ew bimîne heta ku ez
bêm, te çi ji vê ye? Tu li pey min were!»
23 Loma gotina ku ew şagirt namire, di nav birayan de belav
bû. Lê belê Îsa ji bo wî negotibû ku ew namire, lê gotibû: «Eger ez
bixwazim ew bimîne heta ku ez bêm, te çi ji vê ye?»

24 Yê ku ji van tiştan re şahidiyê dike û ev nivîsîne, ev şagirt e.
Em dizanin ku şahidiya wî rast e.
25 Hê gelek tiştên din ên ku Îsa kirine hene. Eger ew yek bi yek
bihatana nivîsîn, ez dibêjim qey kitêbên ku bihatana nivîsîn wê di
dinyayê de bi cih nebûna.

## *Karên Şandiyan*

### *Pêşgotin*

*Kitêba «Karên Şandiyan» destpêka civîna bawermendên Mesîh û belavbûna wê ya li gelek cihan tîne zimên. Nivîskarê wê Lûqa ye. Lûqa ev kitêb di sala 63an de li Romayê nivîsî. Ev kitêb nîşan dide ku bawermendên Mesîh bi rêberiya Ruhê Pîroz çawa li Orşelîmê, li Cihûstanê, li Sameryayê û li welatên din, dest bi dayîna Mizgîniyê kirin (1:8). Ji kitêbê jî kifş dibe ku bawermend bi çi zor û çi zehmetî, bi alîkariya Ruhê Pîroz peyv belav kirin. Ev kitêb ji aliyekî ve jî dîroka belavbûna baweriya Mesîhîtiyê ye û dibêje ku bi çi awayî li Filîstînê, di nav Cihûyan de dest pê kir û paşê di nav miletan de belav bû. Di Karên Şandiyan de em li ser bajarên wek bajarê Orşelîmê, Qeyseriyê, Efesê, Korîntê, Atînayê, Romayê û hê li ser gelek derên din rastî agahiyên bi her awayî rast û girîng tên.*

*Karên Şandiyan dikare bi vî awayî bê beşkirin:*

1. *Piştî hilkişîna Îsa ya ezmanan belavbûna baweriya Mesîhîtiyê li Orşelîmê (1:1-8:3)*
2. *Belavbûna baweriya Mesîhîtiyê ya ji Orşelîm û ji Cihûstanê heta Sameryayê, Şamê û der û dora Filîstînê (8:5-11:18)*
3. *Belavbûna baweriya Mesîhîtiyê ya ji Entakyayê li der û dora Derya Spî, heta bigihîje Romayê (11:19-28:31)*

*Di vê kitêbê de divê mirov bala xwe bide gotina «Em»: 16:11-17; 20:5; 21:18 û beşên 27 û 28an. Ji vê gotina «Em», tê fêmkirin ku nivîskar hevalekî Pawlos e û beşdarî gerên Pawlosê Şandî bû û pê re çû Romayê.*

*Bi kurtî naveroka vê kitêbê bi vî awayî dikare bê beşkirin:*

*I. Destpêka civîna bawermendan 1:1-5:42*
*II. Destpêkirina cefa û tengahiyan 6:1-9:31*
*III. Belavkirina Petrûsê Şandî ya Mizgîniyê 9:32-12:24*
*IV. Gera Pawlos a pêşî 13:1-14:28*
*V. Gera Pawlos a diduyan 15:36-18:22*
*VI. Gera Pawlos a sisiyan 18:23-21:16*
*VII. Girtina Pawlos a li Orşelîmê û rêwîtiya wî ya Romayê 21:17-28:31*

### *Pêşgotin*

1 Têyofîlosê hêja,
min li ser hemû tiştên ku Îsa* ji destpêkê ve û 2 heta roja ku
ber bi ezmanan ve hat hilkişandin, kir û hîn kir, di kitêba* pêşî de
nivîsî. Berî hilkişandina xwe, wî bi Ruhê* Pîroz emir dan Şan-
diyên* ku bijartine. 3 Piştî ku cefa kişand, wî bi gelek delîlan xwe
sax nîşanî Şandiyan da, di nav çil rojan de li wan xuya bû û li ser
Padîşahiya* Xwedê peyivî.
4 Gava ku Îsa bi wan re bû, wî tembîh li şagirtan* kir ku ji
Orşelîmê* dernekevin, lê li hêviya soza Bav* bin. Wî got: «We ev
soz ji min bihîstiye. 5 Yûhenna bi avê imad* kir, lê piştî çend rojan
hûnê bi Ruhê Pîroz imad bibin.»

### *Îsa Hildikişe Ezmanan*
*(Marqos 16:19-20; Lûqa 24:50-53)*

6 Îcar gava ku ew hatin ba hev, wan ji Îsa pirsî: «Ya Xudan*,
ma tê di vê demê de padîşahiyê bi şûn de bidî Îsraêl?» 7 Îsa li wan
vegerand û got: «Ev ne karê we ye ku hûn wan wext û demên ku
Bav* bi hukumdariya xwe biryar dide, bizanin. 8 Lê gava ku Ruhê
Pîroz bê ser we, hûnê hêzê bistînin û li Orşelîmê*, li tevahiya Ci-
hûstanê*, li Sameryayê* û heta bi kujê dinyayê yê herî dûr bibin
şahidên min.» 9 Çaxê wî ev tişt gotin, hê wan lê dinêrî, ew bi ez-
mên ve hat hilkişandin û ewrekî ew ji ber çavê wan stand. 10 Gava
Îsa diçû û wan zîq li ezmên dinêrî, ji nişkê ve du mirovên cilspî li
ba wan rawestan. 11 Wan got: «Celîlîno, çima hûn li vir radiwestin
û li ezmên dinêrin? Ev Îsayê ku ji nav we ber bi ezmên ve hat hil-
kişandin, çawa we dît ku ew hilkişiya ezmên, wusa jî wê vegere.»

### *Di Cihê Cihûda de Matiyos Tê Bijartin*

12 Hingê ew ji dera ku jê re digotin Çiyayê Zeytûnê vegeriyan
Orşelîmê. Ev çiya bi qasî kîlometreyekê ji Orşelîmê dûr bû. 13 Ga-
va ku ew ketin bajêr, çûn oda jorîn a ku lê rûdiniştin. Petrûs*, Yû-
henna*, Aqûb*, Endrawis, Filîpos, Tûma, Bertolomeyos, Metta*,

---

**1:1** Lûqa 1:1-4 **1:1-2** Lûqa 1:1-4 **1:4** Lûqa 24:49
**1:5** Lûqa 3:16 **1:8** Lûqa 24:47-48 **1:9** Lûqa 25:50-51

Aqûbê kurê Halfayos, Şimûnê welatparêz û Cihûdayê kurê Aqûb li
wir bûn. 14 Van hemûyan hergav bi hev re, tevî hinek jinan, bi
Meryema* diya Îsa û birayên wî re, xwe dan duakirinê.
15 Di wan rojan de Petrûs li nav xwişk û birayên ku hijmara
wan li dora sed û bîst mirovan bû, rabû û got: 16 «Birano, diviya ew
nivîsara ku ji pêşî ve bi Ruhê Pîroz bi devê Dawid* li ser Cihûda*
hatibû gotin, bihata cih. 17 Çimkî Cihûda bi ser ku yek ji me hat
hesabkirin û di vê xizmetê de pareke wî jî hebû, bû rêberê wan ên
ku Îsa girtin. 18 Îcar vî mirovî bi heqê xerabiya xwe erdek kirrî;
piştre bi serserkî ket, zik lê qelişî û ûr û roviyên wî derketin derve.
19 Ev yek ji hemûyên ku li Orşelîmê rûdinin re kifş bû, wusa ku bi
zimanê wan ji vê zeviyê re ‹Hakeldama› tê gotin, ku tê mana
«zeviya xwînê». 20 Çimkî li dereke Kitêba Zebûran ev hatiye ni-
vîsîn:

‹Bila mala wî wêran be
Û bila kes tê de rûnene.›[a]

û li dereke din jî:

‹Bila karê wî yê çavdêriyê yekî din bistîne.›[b]

21 Îcar divê yek ji wan zilamên ku di hemû dema ku Xudan* Îsa di
nav me de bihûrandiye de, bi me re bû, 22 ji roja ku Yûhenna* imad
kiriye heta roja ku ew ji nav me ber bi ezmên ve hatiye hilki-
şandin, bê bijartin, da ku bi me re ji vejîna* wî re şahidiyê bike.»
23 Hingê wan du kes, Ûsivê ku jê re Barsabas digotin û bi navê
Yûstos dihat naskirin û Matiyos anîn pêş. 24 Wan dua kir û got:
«Ya Xudan*, tu bi dilê her kesî dizanî. Nîşanî me bide ka te ji van
herduyan kîjan bijart, 25 da ku di vê xizmet û şandîtiyê de wî cihî
bistîne, yê ku Cihûda* berdaye, da ku here cihê xwe yê heqkirî.»
26 Ji bo wan pişk avêtin; pişk li Matiyos ket û ew bi yanzdeh Şan-
diyan re hat hesabkirin.

### *Hatina Ruhê Pîroz*

2 Gava ku Roja* Pentîkostê hat, ew hemû bi hev re li derekê
civiyabûn. 2 Û ji nişkê ve ji ezmên dengek wek rabûna bayekî

---

[a] **1:20** Ji: Zebûr 69:25 [b] **1:20** Ji: Zebûr 109:8
**1:13** Lûqa 6:14-16 **1:18-19** Metta 27:3-8 **1:22** Lûqa 3:21; 24:51
**2:1** Qanûna Kahîntiyê 23:15-21; Dubarekirina Şerîetê 16:9-1

xurt hat û ew mala ku ew lê rûdiniştin tije kir. 3 Zimanên wek pê-
lên agir di nav wan de xuya bûn û li ser her yekî ji wan danîn.
4 Hemû bi Ruhê Pîroz tije bûn û bi gotina ku Ruhê Pîroz dabû wan,
dest pê kirin bi zimanên din peyivîn.
5 Hingê li Orşelîmê, Cihûyên xwedêtirs ji hemû miletên ser rû-
yê erdê hebûn. 6 Li ser vî dengî elaleteke* mezin civiya û tevlihev
bû, çimkî her kesî dibihîst ku bi zimanê wî dipeyivin. 7 Matbûyî û
şaşmayî pirsîn: «Ma ev hemû yên ku dipeyivin ne ji Celîlê* ne?
8 Ma çawa çêdibe ku her yek ji me zimanê xwe yê dê dibihîze?
9 Partoyî, Mêdî, Elamî, yên ku li Mezopotamyayê, Cihûstan*, Ke-
pedokya, Pontos û Asyayê*, 10 li Firîgya û Pamfîlyayê, li Misrê û
li aliyê Lîbyaya li dora Kûrênê rûdinin, yên ku ji Romayê hatin,
11 Cihû û Xwedêperestên ji miletên din, Girîtî û Ereb. Em dibihîzin
ku ev bi zimanên me li ser karên Xwedê yên mezin dibêjin.»
12 Hemû şaş û heyirî man û ji hev pirsîn: «Ma ev çi ye?» 13 Lê
hinekên din jî tinazên xwe dikirin û digotin: «Ev bi şeraba nû
serxweş bûne.»

## *Peyivîna Petrûs*

14 Lê Petrûs bi yanzdehan ve rabû, dengê xwe bilind kir û ji
wan re got: «Gelî Cihûyan û hûn hemû yên ku li Orşelîmê ne! Guh
bidin peyvên* min, vê yekê qenc bizanin. 15 Wek ku hûn difikirin,
ev ne serxweş in. Çimkî niha saet nehê sibê ye. 16 Lê ev ew e ku bi
devê Yoêl pêxember* hatiye gotin:
17 ‹Di rojên dawîn de, Xwedê dibêje:
Ezê ji Ruhê xwe bi ser hemû mirovan de birijînim.
Kur û keçên we wê pêxemberîtiyê bikin
Û xortên we wê dîtiniyan*, kal û pîrên we wê xewnan bibînin.
18 Di wan rojan de, ezê ji Ruhê xwe
Birijînim ser xulam û cêriyên xwe
Û ewê pêxemberîtiyê bikin.
19 Û ezê li jor, li ezmên, tiştên ecêb nîşan bidim

---

**2:4** Zimanên din: Carna şagirtên Îsa bi saya Ruhê Pîroz dikarin bi zimanên ku pê nizanin û hîn nebûn bipeyivin.
**2:9** Asya: Di wê demê ji bo ew der ku îro kêm û zêde Tirkiye ye dihat gotin.

Û li jêr jî, li ser rûyê erdê, nîşanan xuya bikim:
Xwîn û agir, mij û dûman.
20 Berî hatina Roja Xudan* ya mezin û navdar,
Roj wê tarî bibe û heyv wê rengê xwînê bistîne.
21 Hingê, her kî ku gazî navê Xudan bike, wê xilas bibe.›[a]
22 «Gelî Îsraêliyan, guhdariya van gotinan bikin: Îsayê Nisretî,
ji aliyê Xwedê ve ji we re bi kerametan, bi karên mezin û nîşanan
hat erê kirin. Hûn bi xwe bi karên ku Xwedê bi destê wî, di nav we
de kirine dizanin. 23 Li gor armanc û pêşzanîna Xwedê ew ji aliyê
we ve hat girtin û we ew bi destê yên ku Şerîetê* nas nakin li xaçê
xist û kuşt. 24 Lê Xwedê ew vejand û êşên mirinê rakirin, çimkî
îmkan nebû ku ew ji aliyê mirinê ve girtî bima. 25 Dawid* jî li ser
wî weha dibêje:
‹Min Xudan hergav li pêşiya xwe dît,
Ew li milê min ê rastê ye, da ku ez veneleqim.
26 Ji ber vê yekê dilê min geş û zimanê min gelekî şa bû.
Bedena min jî wê bi hêviyê bijî.
27 Çimkî tu canê min li diyarê* miriyan nahêlî
Û tu nahêlî ku Pîrozê* te rizîbûnê bibîne.
28 Te riyên jiyanê bi min dan zanîn;
Tê bi dîtina xwe min di nav şahiyê de bihêlî.›[b]
29 «Birano, divê bi eşkereyî ji we re li ser bavê me Dawid bê
gotin ku ew hem mir û hem jî hat veşartin û gora wî jî heta îro li ba
me ye. 30 Lê ji ber ku ew pêxember bû, wî dizanibû ku Xwedê ‹jê
re sond xwariye ku wê yekî ji dûndana* wî li ser textê wî bide
rûniştin.›[c] 31 Dawid ev ji pêşî ve dît û li ser vejîna* Mesîh got:
‹Ew ne li diyarê miriyan hat hiştin
Û ne jî bedena wî rizîbûn dît.›[d]
32 Xwedê ev Îsa ji nav miriyan rakir û em hemû şahidên vê yekê
ne. 33 Îcar ew hatiye hilkişandin milê Xwedê yê rastê û ji Bav*
soza Ruhê Pîroz stand û çawa ku hûn dibînin û dibihîzin ew ri-
jandiye. 34 Erê, Dawid hilnekişiya ezmanan, lê ew bi xwe dibêje:

---

[a] **2:17-21** Ji: Yoêl 2:28-32 [b] **2:25-28** Ji: Zebûr 16:8-11
[c] **2:30** Ji: Zebûr 132:11 [d] **2:31** Ji: Zebûr 16:10
**2:23** Lûqa 23:33 **2:24** Lûqa 24:5

‹Xudan ji Xudanê min re got:
Li milê min ê rastê rûne,
35 Heta ku ez dijminên te bikim pêgeha lingên te.›[a]
36 Îcar bila hemû mala Îsraêl qenc bizane ku Xwedê ew Îsayê ku
we xaç kir, hem kiriye Xudan û hem Mesîh.»
37 Îcar gava ku wan ev bihîst, wek ku tîrek li dilê wan ketibe, ji
Petrûs û Şandiyên din re gotin: «Birano! Ma em çi bikin?» 38 Pet-
rûs ji wan re got: «Tobe bikin û bila her yek ji we bi navê Îsa
Mesîh imad* bibe, da ku li gunehên we bê bihûrtin û hûnê diyariya
Ruhê Pîroz bistînin. 39 Çimkî ev soz ji bo we, ji bo zarokên we û ji
bo hemûyên ku dûr in; ji bo her kesî ye ku Xudan Xwedayê me
gazî wî dike.» 40 Wî hê bi gelek peyvên* din şahidî kir, ew şi-
dandin û got: «Xwe ji vî nifşê* jirêderketî xilas bikin.» 41 Îcar yên
ku peyvên wî qebûl kirin imad bûn û wê rojê li dora sê hezar
mirov beşdarî wan bûn. 42 Wan herdem xwe da hîndariya Şan-
diyan, hevpariya ruhanî, şkandina nên û duakirinê.

### *Yekîtiya Bawermendan*

43 Tirs ket dilê her kesî. Û gelek karên mezin û nîşan bi destê
Şandiyan dihatin kirin. 44 Hemû bawermend bi hev re bûn û her tiş-
tê wan hevpar bû. 45 Mal û milkên xwe difirotin û bi perên wan li
gor hewcedariya her kesî leva* dikirin. 46 Her roj bi hev re di Pe-
restgehê* de diciviyan, li malên xwe nan dişkandin, bi şahî û bi di-
lekî xwerû xwarin dixwarin. 47 Pesnê Xwedê didan û di nav hemû
xelkê de qedrê wan dihat girtin. Û Xudan jî roj bi roj hijmara yên
xilasbûyî zêdetir dikir.

### *Petrûs Parsekekî Şeht Qenc Dike*

3 Rojekê piştî nîvro saet di sisiyan de, çaxê duakirinê, Petrûs û
Yûhenna hildikişiyan Perestgehê*. 2 Zilamekî ku ji zikmakî
şeht* bû dianîn û ew her roj li ber dergehê Perestgehê yê ku jê re
Bedew digotin, datanîn, da ku ji wan ên ku dikevin Perestgehê par-
sê bike. 3 Gava ku wî dît Petrûs û Yûhenna dikin bikevin Perest-
gehê, wî ji wan xwest ku xêrekê bi wî bikin. 4 Petrûs jî bi Yûhenna
re bi baldarî li wî nêrî û got: «Li me binêre.» 5 Ew jî bi hêviya ku

---

[a] **2:34-35** Ji: Zebûr 110:1

wê tiştekî ji wan bistîne, çavê wî li wan bû. 6 Lê Petrûs got: «Ne
zêrê min û ne jî zîvê min heye; lê tiştê ku bi min re heye, ezê bidim
te. Bi navê Îsa Mesîhê Nisretî rêve here.» 7 Û bi destê wî yê rastê
girt û rakir ser lingan; di cih de piyên wî û gûzikên wî sipîsax bûn.
8 Xwe hilavêt, li ser lingan rawesta û dest pê kir rêve çû. Ew bi
wan re ket Perestgehê, rêve diçû, xwe hildavêt û pesnê Xwedê
dida. 9 Hemû xelkê dît ku ew rêve diçe û pesnê Xwedê dide. 10 Û
gava wan ew nas kir û dîtin ku ev ew e, yê ku li ber dergehê
Perestgehê yê bi navê Bedew rûdinişt ku parsê bike, ew bi tiştê ku
bi wî hatibû, heyirî û mat man.

### *Petrûs di Eywana Silêman de Dipeyive*

11 Hê ku wî bi Petrûs û Yûhenna digirt, hemû xelk bi hev re
ecêbmayî bezîn ba wan, wê eywana ku jê re Eywana Silêman
digotin. 12 Gava Petrûs ev yek dît, ji xelkê re got: «Gelî Îsraêliyan,
hûn çima li vê yekê şaş dimînin, an hûn çima bi baldarî li me
dinêrin? Hûn dibêjin qey me bi hêz an bi dîndariya xwe kiriye ku
ew rêve here? 13 ‹Xwedayê Birahîm*, Xwedayê Îshaq* û Xwedayê
Aqûb*, Xwedayê bav û kalên me›[a], Xizmetkarê xwe Îsa bi rûmet
kir. We ew da dest û li ber Pîlatos înkar kir, bi ser ku wî biryar
dabû ku Îsa berde. 14 Lê we ewê Pîroz û Rast înkar kir û we xwest
ku mêrkujek ji we re bê berdan. 15 We Serokê Jiyanê kuşt, lê Xwe-
dê ew ji nav miriyan rakir. Em şahidên vê yekê ne. 16 Navê Îsa ev
mirovê ku hûn dibînin û nas dikin, sipîsax kir. Wî bawerî* bi navê
Îsa anî û bi saya Îsa, wê baweriyê li ber çavê we hemûyan ev sa-
xîtiya temam da wî.

17 «Û niha birano, ez dizanim ku we jî wek serekên xwe bi
nezanî ev yek kir. 18 Îcar bi vî awayî Xwedê, ev tiştên ku ji pêşî ve
bi devê hemû pêxemberan gotibû ku Mesîh wê cefayê bikişîne, anî
cih. 19 Loma tobe bikin û li Xwedê bizivirin, da ku gunehên we bên
xîşkirin, 20 da ku ji ba Xudan wextên nûvejeniyê bên û Mesîhê ku
ji berê ve ji bo we destnîşan kiriye, yanî Îsa bişîne. 21 Divê ew li
ezmên bimîne, heta ku Xwedê her tiştî nûvejen bike, wek ku wî ji
berê ve bi devê pêxemberên xwe yên pîroz gotiye. 22 Mûsa* jî got:

---

[a] **3:13** Ji: Derketin 3:6, 15
**3:14** Lûqa 23:13-23

‹Xudan Xwedayê we wê ji nav birayên we, ji we re pêxemberekî
wek min rake. Ew her çi ji we re bêje, divê hûn guhdariya wî
bikin. [23] Îcar her kesê ku guhdariya wî pêxemberî neke, wê ji nav
gel bê derxistin û helak bibe.›[a] [24] Û hemû pêxemberan, ji Samûêl*
bigire heta yên pey wî, her kî peyivîbe, li ser van rojan gotine.
[25] Zarokên pêxemberan û wêrisên peymana* ku Xwedê bi bav û
kalên we re girêdaye hûn in. Xwedê ji Birahîm re got: ‹Wê bi dûn-
dana* te, hemû bavikên li ser rûyê erdê bên pîrozkirin.›[b] [26] Gava
ku Xwedê Xizmetkarê xwe rakir, pêşî wî ew şand ba we, da ku we
pîroz bike û her yekî ji we ji xerabiyên wî vegerîne.»

### *Petrûs û Yûhenna li ber Civîna Giregiran*

4 Hê ku Petrûs û Yûhenna bi xelkê re dipeyivîn, kahîn*, serwerê
parêzgerên Perestgehê û Sadûqî* bi ser wan de hatin. [2] Ji ber
ku şagirtan* gel hîn dikir û li ser vejîna miriyan ya ku bi Îsa ye di-
dan bihîstin, pirr li zora wan çû. [3] Wan ew girtin û ji ber ku ji xwe
êvar bû, heta dotira rojê ew di girtîgehê de hiştin. [4] Lê gelekên ku
peyv* bihîstin, bawerî* anîn û hijmara wan gihîşt dora pênc hezar
kes.

[5] Îcar dotira rojê serwer, rihspî û Şerîetzan* li Orşelîmê civi-
yan, [6] Serokkahîn Henan, Qeyafa, Yûhenna, Skender û hemû yên
ku ji malbata Serokkahîn dihatin li wir bûn. [7] Çaxê ku yên girtî li
holê dan rawestandin, wan pirsî: «We bi kîjan hêzê an bi çi navî ev
kir?» [8] Hingê Petrûs bi Ruhê Pîroz tije, ji wan re got: «Gelî serekên
gel û rihspîno! [9] Eger îro em ji bo qenciya ku bi mirovê nexweş
bûye, tên pirsyarkirin ka ew çawa sax bûye, [10] bila ev ji aliyê we
hemûyan û ji aliyê hemû gelê Îsraêl ve bê zanîn ku ev mirov, bi
navê Îsa Mesîhê Nisretî, yê ku we xaç kir û yê ku Xwedê ji nav
miriyan rakir, sipîsax li ber we radiweste. [11] Ev ew e,

‹Ew kevirê ku ji aliyê we hostayan ve kêm hat dîtin,
Bû kevirê serê rikin*.›[c]

[12] Xilasî bi tu kesî din tune; çimkî di bin ezmên de, di nav mirovan
de, navekî din nehatiye dayîn ku em bikarin pê xilas bibin.»

[13] Gava ku wan biziraviya Petrûs û Yûhenna dît û fêm kirin ku

---

[a] **3:22-23** Ji: Dubarekirina Şerîetê 18:15-16; 18:19; Qanûna Kahîntiyê 23:29
[b] **3:25** Ji: Destpêkirin 22:18; 26:4 [c] **4:11** Ji: Zebûr 118:22

ew nexwenda û di halê xwe de ne, şaş man. Wan tê derxist ku ev
mirov bi Îsa re mane. [14] Lê wan, zilamê qencbûyî bi wan re rawes-
tayî dît û nikaribûn tiştekî li dij bêjin. [15] Îcar li wan emir kirin ku ji
civîna* giregiran derkevin û dest pê kirin di nav xwe de şêwirîn.
[16] Wan got: «Em bi van mirovan çi bikin? Çimkî ji hemûyên ku li
Orşelîmê rûdinin re eşkere ye ku bi destê wan nîşaneke berbiçav
hatiye kirin û em nikarin vê înkar bikin. [17] Lê ji bo ku ev hê bêtir di
nav gel de belav nebe, em gef li wan bixwin ku ji niha û pê ve bi
navê Îsa ji kesî re tiştekî nebêjin.» [18] Gazî wan kirin û li wan emir
kirin ku êdî bi navê Îsa qet nepeyivin û kesî hîn nekin. [19] Lê Petrûs
û Yûhenna bersîva wan dan û gotin: «Ma li ber Xwedê kîjan rast
e? Em guhê xwe bidin we, an bidin Xwedê? Hûn bêjin. [20] Çimkî
em nikarin tiştên ku me dîtine û bihîstine nebêjin.» [21] Piştî ku dîsa
gef li wan xwarin ew berdan. Ji ber xelkê tu rê nedîtin ku wan ceza
bikin, çimkî hemûyan ji bo tiştê bûyî pesnê Xwedê dida. [22] Emrê
wî mirovê ku bi vê kerametê qenc bûbû, di ser çilî re bû.

### *Bawermend ji bo Wêrekiyê Dua Dikin*

[23] Piştî ku ew hatin berdan, çûn ba hevalên xwe û her tiştê ku
serekên kahînan* û rihspiyan ji wan re gotibû, ji wan re gotin.
[24] Gava ku wan ev bihîst, bi hev re dengê xwe bilind kirin û ji
Xwedê re gotin: «Ya Xwedayê hukumdar, yê ku erd û ezman, der-
ya û hemû tiştên di wan de afirandiye, tu yî. [25] Te bi Ruhê Pîroz bi
devê xizmetkarê xwe bavê me Dawid got:

‹Çima milet hêç bûn
Û netew tiştên pûç fikirîn?
[26] Padîşahên dinyayê bûn yek,
Û serek li hev civiyan
Li hember Xudan û li hember Mesîhê wî.›[a]

[27] Çimkî bi rastî li vî bajarî, Hêrodês* û Pîlatosê Pontiyos, bi mi-
letan û bi gelê Îsraêl re, li hember xizmetkarê te yê pîroz Îsa, yê ku
te meshkirî*, civiyan; [28] da ku çi bi destê te û li gor daxwaza te ji
berê ve hatibe biryardan, bê cih. [29] Û niha ya Xudan, li gefxwa-
rinên wan binêre! Û vê yekê bide xizmetkarên xwe ku peyva* te

[a] **4:25-26** Ji: Zebûr 2:1-2
**4:24** Nehemya 9:6; Zebûr 146:6 **4:27** Lûqa 23:1-11

tam bi ziravî bêjin. 30 Destê xwe dirêj bike, da ku bi navê xizmet-
karê te yê pîroz Îsa, nexweş qenc bibin, nîşan û karên mezin
çêbin.» 31 Piştî ku wan dua kir, dera ku lê civiyabûn hejiya, ew
hemû bi Ruhê Pîroz tije bûn û peyva Xwedê bi ziravî digotin.

### *Dan û Standina Bawermendan*

32 Dil û ruhê tevahiya koma bawermendan yek bû. Tu kesî ji
wan ji bo tiştên xwe nedigot: «Ev ya min e.» Lê her tiştê wan
hevpar bû. 33 Şandiyan bi hêzeke mezin şahidiya vejîna Xudan Îsa
dikir û keremeke mezin li ser wan hemûyan bû. 34 Û di nav wan de
tu kesê hewcedar tunebû. Çimkî yên ku xweyî xanî an xweyî erd
bûn, ew difirotin û wan tiştan çi bigirta dianîn, 35 ew li ber lingê
Şandiyan datanîn û li gor hewcedariya wan li her kesî dihat
belavkirin. 36 Bi navê Ûsiv yekî Lêwî* ji Qibrisê hebû. Şandiyan jê
re digot Barnabas, ku bê wergerandin: «Kurê handanê*». 37 Zevi-
yeke vî mirovî hebû, wî ew firot û perên wê anîn li ber lingên
Şandiyan danîn.

5 Îcar mirovekî ku navê wî Hananya bû, bi jina xwe Saferya re
milkek firotin. 2 Haya jina wî jî jê hebû, ku wî hinek ji peran ji
xwe re hilanî û hinek jê anî û li ber lingên Şandiyan danî. 3 Petrûs
pirsî û got: «Hananya, çima Îblîs* dilê te tije kir ku tu li Ruhê Pîroz
derewan bikî û hinekê ji perên zeviyê ji xwe re hilînî? 4 Çaxê ku
ew nefirotî bû, ma ew ne ya te bû? Îcar piştî ku hat firotin, ma ew
ne di destê te de bû? Ma çawa çêbû ku te ev yek xist dilê xwe? Te
ne li mirovan, lê li Xwedê derew kir.» 5 Gava ku Hananya ev peyv
bihîstin, ket erdê û can da. Û tirseke mezin ket ser wan ên ku ev
bihîstin. 6 Xort rabûn, kefen lê pêçan, ew derxistin derve û veşartin.
7 Bi qasî piştî sê saetan jina wî jî ket hundir, haya wê jê tunebû
ku çi bûye. 8 Petrûs ji wê re got: «Ji min re bêje, ma we zevî bi
ewqasî firot?» Wê jî got: «Erê, bi ewqasî.» 9 Lê Petrûs ji wê re got:
«Çawa we li hev kir ku hûn Ruhê Xudan biceribînin? Va ye, lin-
gên wan ên ku mêrê te veşartine li ber derî ne, ewê te jî hilînin û
bibin derve.» 10 Jinik di cih de li ber lingên Petrûs ket erdê û can
da. Gava xort ketin hundir, ew mirî dîtin. Wan ew jî hilgirt û birin
derve, li tenişta mêrê wê veşartin. 11 Tirseke mezin ket ser tevahiya
civîna* bawermendan û ser hemûyên ku ev tişt bihîstin.

### *Şandî Gelekan Sax Dikin*

[12] Gelek nîşan û karên mezin bi destê Şandiyan di nav gel de
dihatin kirin. Hemû bi hev re li Eywana Silêman diciviyan. [13] Lê ji
yên din tu kesî nediwêrî ku beşdarî wan bibe, lê heçî xelk bûn,
pesnê wan didan. [14] Hê gelek jin û mêrên ku bawerî* bi Xudan
anîn, beşdarî wan bûn. [15] Wusa ku xelkê nexweşên xwe derdixistin
kuçeyan, ew li ser doşek û şeltan vedizelandin, da ku gava Petrûs
derbas bibe, qet nebe siya wî bikeve ser hinekan. [16] Gelek mirov ji
bajarên der û dora Orşelîmê jî civiyan, nexweş û yên ku ji ruhên
nepak cefa dikişandin anîn, ew hemû jî sax bûn.

### *Li Şandiyan Cefa Tê Kirin*

[17] Serokkahîn û hemû yên bi wî re, ku ji mezheba Sadûqiyan*
bûn, bi çavnebariyê tije bûn, [18] Şandî girtin û ew avêtin girtîgeha
giştî. [19] Îcar bi şev milyaketekî Xudan deriyên zîndanê li wan
vekir, ew derxistin derve û ji wan re got: [20] «Herin, li Perestgehê
rawestin û hemû peyvên vê jiyanê ji gel re bêjin.» [21] Çaxê wan ev
bihîst, serê sibê zû ketin Perestgehê û dest bi hînkirinê kirin.

Gava Serokkahîn û yên bi wî re hatin, wan gazî civîna* giregiran, yanî hemû komela rihspiyên gelê Îsraêl kir ku bicivin, şandin girtîgehê pey wan, da ku wan bînin. [22] Lê gava ku parêzgerên
Perestgehê çûn wê derê, wan ew di zîndanê de nedîtin. Hingê
vegeriyan û gotin: [23] «Me dît ku girtîgeh hişk girtiye û nobedar li
ber derî rawestayî ne, lê gava me derî vekir, me kes li hundir
nedît.» [24] Îcar gava serwerê parêzgerên Perestgehê û serekên kahînan* ev peyv bihîstin, tevlihev bûn, gotin: «Dawiya vê yekê wê
çawa bibe?» [25] Hingê yek hat û ji wan re got: «Va ye, ew zilamên
ku we xistibûn zîndanê, li Perestgehê radiwestin û xelkê hîn
dikin!» [26] Li ser vê yekê serwer bi parêzgerên Perestgehê re çû û
ew anîn; lê ne bi zorê, çimkî ew ji gel ditirsiyan, digotin: «Wê me
bidin ber keviran.»

[27] Çaxê wan ew anîn, ew li ber civîna giregiran dan rawestandin. Serokkahîn ji wan pirsî û [28] got: «Me hişk li we emir kir ku
hûn bi vî navî hîn nekin, lê va ye, we Orşelîm bi hînkirina xwe tije
kir û hûn dixwazin xwîna vî mirovî bixin ser me.» [29] Lê Petrûs û

---

**5:28** Metta 27:25

Şandiyên din bersîv dan û gotin: «Divê em ji mirovan bêtir bi ya
Xwedê bikin. 30 Xwedayê bav û kalên me, ew Îsayê ku we bi dar
ve daleqand û kuşt, rakir. 31 Xwedê ew bilind kir milê xwe yê rastê,
kir Serok û Xilaskar, da ku ew Îsraêl ji gunehên wan vegerîne û li
wan bibihûre. 32 Em şahidên van tiştan in û Ruhê Pîrozê ku Xwedê
daye wan ên ku bi ya wî dikin jî, şahid e.»

33 Gava wan ev bihîst, ew gelek hêrs bûn û xwestin ku Şan-
diyan bikujin. 34 Lê yekî Fêrisiyê* ku navê wî Gamalyêl bû, di ci-
vîna giregiran de rabû. Ew mamosteyê Şerîetê bû û siyaneta* wî di
nav hemû gel de hebû. Wî emir kir ku Şandiyan ji bo demeke kurt
derxin derve 35 û hingê ji civînê re got: «Gelî Îsraêliyan, ji bo tiştê
ku hûnê bi van mirovan bikin, hay ji xwe hebin. 36 Çimkî demekê
berî niha, Tewdas serî hilda, wî xwe hesiband ku ew tiştek e, li
dora çar sed kesî beşdarî wî bûn; lê ew hat kuştin û hemû yên ku li
pey wî diçûn belav bûn û neman. 37 Piştî wî, Cihûdayê Celîlî di
dema hijmartina mirovan de serî hilda û xelk li pey xwe bir. Ew jî
helak bû û hemû yên ku li pey wî diçûn belav bûn. 38 Îcar, ez ji we
re dibêjim: Dev ji van mirovan berdin û wan bihêlin bi serê xwe.
Çimkî eger ev niyet û kar ji mirovan be, wê xera bibe, 39 lê eger ji
Xwedê be, hûn nikarin vê xera bikin. Nebe ku hûn bibin yên ku li
hember Xwedê jî radibin!»

Wan guhê xwe da şîreta Gamalyêl, 40 gazî Şandiyan kirin û li
wan xistin. Piştre li wan emir kirin ku bi navê Îsa nebêjin û ew ber-
dan. 41 Îcar gava ku ew ji ber civîna giregiran derketin, pê şa bûn
ku ew ji ber navê Îsa hêjayî bêrûmetkirinê hatin dîtin. 42 Û wan dev
jê berneda ku her roj li Perestgehê û li malan hîn bikin û Mizgîniyê
bidin ku Mesîh, Îsa ye.

### *Heft Kes ji bo Xizmetê Tên Bijartin*

6 Di wan rojan de, gava ku hijmara şagirtan* zêde dibû, ew
Cihûyên ku bi zimanê Yewnanî dipeyivîn ji Cihûyên Îbranî*
gazin kirin, çimkî di belavkirina xwarina rojane de baş li jinebiyên
wan nedihat nêrîn. 2 Hingê diwanzdehan tevahiya koma şagirtan
gazî ba xwe kirin û gotin: «Ne qenc e ku em dev ji peyva Xwedê
berdin û xizmeta sifreyan bikin. 3 Loma birano, hûn di nav xwe de,
heft mirovên bi Ruhê Pîroz tije û şehreza bibijêrin û em wan
deynin ser vî karî. 4 Heçî em in, emê xwe bidin duayê û xizmeta

peyvê.» [5] Ev yek li hemû koma bawermendan xweş hat û wan ev
mirov bijartin: Steyfan ê ku mirovekî bi bawerî û bi Ruhê Pîroz
tije bû û Filîpos, Prokoros, Nîkanor, Tîmon, Parmênas û Nîkolasê
ji Entakyayê yê ku hatibû ser baweriya Cihûyan. [6] Wan ew li ber
Şandiyan dan rawestandin, Şandiyan jî dua kir û destên xwe danîn
ser wan.

[7] Peyva Xwedê çiqas diçû belav dibû; hijmara şagirtan li Orşe-
lîmê gelek zêde dibû û ji kahînan jî gelekan bawerî qebûl dikir.

### *Steyfan Tê Girtin*

[8] Steyfan, yê ku bi kerem û hêzê tije bû, gelek nîşan û karên
mezin di nav gel de dikirin. [9] Hingê, hinek ji Kinîşta* ku jê re
Kinîşta Azadiyan* digotin û hin Kûrênî, Skenderyayî û hinekên ku
ji Kîlîkya û Asyayê* bûn, rabûn bi Steyfan re devjenî kirin. [10] Lê
wan nikaribû li ber wê şehrezayî û wî Ruhê ku Steyfan pê dipeyivî,
rawestin. [11] Hingê wan serê hinekan tije kirin ku bêjin: «Me bihîst
ku vî mirovî çêrî* Mûsa û Xwedê kir.» [12] Û wan xelk, rihspî û
Şerîetzan* rakirin ser piyan û bi ser Steyfan de hatin, ew girtin,
anîn ber civîna giregiran. [13] Şahidên derewîn derxistin pêş û şa-
hidan got: «Ev mirov dev jê bernade, li hember vî cihê pîroz û
Şerîetê gotinan dibêje. [14] Me bihîst ku wî got: ‹Ev Îsayê Nisretî wê
vê Perestgehê xera bike û wan adetên ku Mûsa dane me bigu-
here.›» [15] Hemû yên ku li civîna giregiran rûdiniştin bi baldarî li wî
nêrîn û dîtin ku rûyê wî wek rûyê milyaketan e.

### *Parastina Steyfan*

7 Hingê Serokkahîn ji wî pirsî û got: «Ma ev tişt rast in?»
[2] Steyfan got:

«Bav û birano! Guhê xwe bidin min. Hê ku bavê me Birahîm*
li Mezopotamyayê bû, beriya ku ew li Heranê rûne, Xwedayê bi
rûmet jê re xuya bû [3] û got: ‹Ji welatê xwe û ji ba mirovên xwe
derkeve û were wê dera ku ezê nîşanî te bidim.›[a] [4] Hingê ew ji
welatê Kildaniyan derket û li Heranê rûnişt. Piştî ku bavê wî mir,
Xwedê ew ji wê derê deranî û anî vî welatê ku niha hûn lê dijîn.

---

[a] 7:3 Ji: Destpêkirin 12:1
7:4 Destpêkirin 11:31; 12:4

[5] Wî bi qasî cihê lingekî jî, bi mîrasî neda wî; lê bi ser ku hê
zarokên wî nebûn jî, soz dayê ku ‹vî welatî bi milkîtî bide wî û
dûndana wî ya ku li pey wî rabe.›[a] [6] Û Xwedê ji wî re weha got:
‹Dûndana te wê li welatekî ku ne yê wan e bi xerîbî rûne, ewê wan
bikin kole û çar sed salî zorê li wan bikin.› [7] Û Xwedê got: ‹Ezê wî
miletê ku ewê jê re koletiyê bikin, ceza bikim› û ‹Piştî van tiştan
wê ji wê derê derkevin û li vî cihî biperizin* min.›[b] [8] Û wî pey-
mana* sinetê* da wî. Bi vî awayî Birahîm bû bavê Îshaq* û di roja
heştan de ew sinet kir. Îshaq* bû bavê Aqûb* û Aqûb jî bû bavê
diwanzdeh bavikan.

[9] «Bavikan çavnebariya Ûsiv kir û ew firotin Misrê; lê Xwedê
bi wî re bû [10] û ew ji hemû tengahiyên wî rizgar kir û li ber Firewn,
yanî padîşahê Misrê kerem û şehrezayî da wî. Firewn jî ew li ser
Misrê û li ser hemû mala xwe kir şahne*. [11] Hingê li hemû welatê
Misrê û li Kenanê* xela rabû, tengahiyeke mezin çêbû û bav û
kalên me nikaribûn xwarin peyda bikirana. [12] Îcar gava ku Aqûb
bihîst li Misrê genim heye, wî cara pêşî bav û kalên me şandin wê
derê. [13] Di çûyîna cara diduyan de, Ûsiv xwe bi birayên xwe da
naskirin û eslê Ûsiv ji Firewn re kifş bû. [14] Îcar Ûsiv şand pey
bavê xwe Aqûb û hemû mirovên xwe, da ku bên ba wî. Hemû bi
hev re heftê û pênc nefs bûn. [15] Û Aqûb daket Misrê. Ew û bav û
kalên me li wê derê mirin. [16] Ew bi şûn ve anîn Şexemê û di wê
gora ku Birahîm bi perên zîv ji kurên Hamorê Şexemî kirrîbû de
veşartin.

[17] «Îcar çaxê ew dema ku Xwedê ji Birahîm re soz dabû, nêzîk
bû, gelê me li Misrê pirr zêde bûbû, [18] heta wê dema ku ‹padî-
şahekî nû yê ku nedizanî ku Ûsiv kî ye, hat ser Misrê›.[c] [19] Wî hî-
lebazî li nijada me kir, li bav û kalên me zor kir ku ew zarokên
xwe bavêjin derve, da ku nejîn. [20] Di wî wextî de Mûsa çêbû. Ew
gelek spehî bû. Sê mehan ew di mala bavê xwe de hat xweyîkirin.
[21] Îcar gava ku ew hat avêtin, keça Firewn ew hilda û ew xweyî kir,

---

[a] 7:5 Ji: Destpêkirin 17:8; 48:8
[b] 7:6-7 Ji: Destpêkirin 15:13-14; Derketin 3:12
[c] 7:18 Ji: Derketin 1:8
7:8 Destpêkirin 17:10-14
7:9 Destpêkirin 37:11-28; 39:2, 21
7:9-10 Destpêkirin 37:1-36; 39:1-41:46
7:11-15 Destpêkirin 41:53-47:31
7:16 Yêşû 24:32
7:19 Derketin 1:10-11, 22

ku bibe kurê wê. 22 Mûsa di hemû şehrezayiya Misriyan de hat
hînkirin, di gotinên xwe û di kirinên xwe de hêzdar bû.
23 «Îcar dema ew bû çil salî, daxwaza dîtina* xwişk û birayên
wî yên Îsraêliyan ket dilê wî. 24 Gava wî dît ku neheqî li yekî ji
wan tê kirin, wî ew parast, li yê Misrî xist û heyfa yê ku dihat
perçiqandin hilanî. 25 Wî guman kir ku xwişk û birayên wî, wê fêm
bikin ku Xwedê wê bi destê wî xilasiyê bide wan, lê wan fêm
nekir. 26 Dotira rojê çaxê ew rastî du Îsraêliyan hat, ku ew pev
diçûn, wî xwest ku wan li hev bîne û got: ‹Camêrno, hûn bira ne;
hûn çima neheqiyê li hev dikin?› 27 Lê mirovê ku neheqî li cîranê
xwe dikir, Mûsa dehf da û got: ‹Kê tu li ser me kiriyî serok û
dadger*? 28 Wek ku te duh yê Misrî kuşt, ma tu dixwazî min jî
bikujî?›[a] 29 Li ser vê peyvê Mûsa reviya û li welatê Midyanê bi
xerîbî ma û bû bavê du kuran.
30 «Piştî ku çil sal temam bûn, ‹li çola nêzîkî Çiyayê Sînayê*,
di pêta agirê nav deviyê de milyaketek li wî xuya bû.›[b] 31 Gava
Mûsa ev dît, ew li vê dîmenê şaş ma û çaxê nêzîk bû ku binêre,
dengê Xudan hat: 32 ‹Ez Xwedayê bav û kalên te, Xwedayê Birahîm,
Aqûb û Îshaq im.›[c] Lerizînê Mûsa girt û nediwêrî ku binêre. 33 Îcar
Xudan ji wî re got: ‹Çaroxa di lingê xwe de derîne, çimkî dera ku
tu lê radiwestî axa pîroz e. 34 Bi rastî min ew tengahiya ku li gelê
min ê ku li Misrê ye tê kirin, dît û min zarîna wan bihîst. Ez
daketim ku wan rizgar bikim. De niha were, ezê te bişînim Misrê.›[d]
35 «Îcar ew, ev Mûsa bû ku wan ew red kir û gotin: ‹Kê tu li ser
me kiriyî serek û dadger?›[e] Û ev, ew bû ku Xwedê ew bi destê wî
milyaketê ku di nav deviyê de li wî xuya bû, bi seroktî û rizgar-
karîtî şand. 36 Wî ew ji wir derxistin. Li Misrê, li Deryaya Sor û çil
salan li çolê wî nîşan û karên mezin kirin. 37 Ev, ew Mûsa ye ku ji
zarokên* Îsraêl re got: ‹Xwedê wê ji nav birayên we pêxemberekî
wek min ji we re rake.›[f] 38 Ev, ew e ku di nav gelê li çolê civiyayî
de bû; bi milyaketê ku li Çiyayê Sînayê* pê re peyivî û bi bav û

[a] 7:27-28 Ji: Derketin 2:14
[b] 7:30 Ji: Derketin 3:2
[c] 7:32 Ji: Derketin 3:6
[d] 7:33-34 Ji: Derketin 3:5-10
[e] 7:35 Ji: Derketin 2:14; 3:2
[f] 7:37 Ji: Dubarekirina Şerîetê 18:15
7:20-22 Derketin 2:1-10
7:29 Derketin 2:11-22; 18:3-4
7:36 Derketin 7:3; 14:21; Hijmartin 14:33

kalên me re bû. Wî peyvên jîndar standin ku bigihîne me. 39 Lê bav
û kalên me nexwestin ku bi ya wî bikin. Ew red kirin û di dilê xwe
de vegeriyan Misrê 40 û ji Harûn re gotin: ‹Ji me re xwedayên ku li
pêşiya me herin çêke. Çimkî em nizanin çi bi wî Mûsayê ku em ji
diyarê Misrê derxistin hat.›[a] 41 Di wan rojan de golikek çêkirin,
gorî* pêşkêşî wî pûtî kirin û ji bo karê destên xwe şahî çêkirin.
42 Lê Xwedê berê xwe ji wan zivirand û hişt ku ew biperizin*
stêrên ezmên; wek ku di Kitêba Pêxemberan de hatiye nivîsîn:

‹Hey mala Îsraêl,
Ma we çil salan li çolê
Ji min re
Diyarî û gorî pêşkêş kirin?
43 We konê Molox*
Û stêra xwedayê we Reyfan,
Ew pûtên ku we çêkiribûn, ku hûn biperizin wan, hilgirtin.
Loma ezê we rakim û ji Babîlê* wêvetir bibim.›[b]

44 «Li çolê Konê* Şahidiyê yê bav û kalên me hebû. Mûsa ew,
wek yê ku pê re peyivîbû û emir kiribû, li gor wê mestereya* ku
dîtibû, çêkir. 45 Bav û kalên me jî ew hildan û gava ku bi Yêşû* re
welatê miletên din ên ku Xwedê ji ber wan derxistin, vegirtin,
hingê ew bi xwe re anîn. Heta dema Dawid ew li wir ma. 46 Dawid
li ba Xwedê kerem dît û xwest ku cihekî rawestanê ji bo Xwedayê
Aqûb çêke. 47 Lê yê ku ji wî re malek çêkir Silêman* bû. 48 Lê belê
Yê Herî Bilind di xaniyên ku bi destan hatine çêkirin de rûnane.
Çawa ku pêxember dibêje:

49 ‹Ezman textê min e,
Û erd pêgeha min e.
Xudan dibêje:
Hûnê maleke çawa ji min re çêkin?
An jî dera ku ez bîhna xwe lê vedim, ku der e?
50 Ma ne destê min ev hemû tişt çêkirine?›[c]

---

[a] **7:40** Ji: Derketin 32:1, 23 [b] **7:42-43** Ji: Amos 5:25-27
[c] **7:49-50** Ji: Îşaya 66:1-2
**7:38** Derketin 19:1-20:17; Dubarekirina Şerîetê 5 **7:41** Derketin 32:2-6
**7:44** Derketin 25:8-9 **7:45** Yêşû 3:14-17
**7:46** 2 Samûêl 7:1-16 **7:47** 1 Padîşah 6

[51] «Hey serhişkno! Di dil de sinetnebûyîno, di guh de kerrno!
Hûn hergav li hember Ruhê Pîroz disekinin; çawa ku bav û kalên
we kirin, hûn jî wusa dikin. [52] Ma bav û kalên we tengahî nedan
kîjan pêxemberî? Wan ew ên ku ji berê ve hatina wî yê Rast dan
zanîn, kuştin û niha hûn bûn xayîn û we ew kuşt. [53] Hûn ew in ku
we Şerîet bi destê milyaketan stand, lê we ew pêk neanî.»

### *Kevirkirina Steyfan*

[54] Gava ku wan ev tişt bihîstin, gelek hêrs bûn û diranên xwe li
Steyfan qirçandin [55] Lê Steyfan bi Ruhê Pîroz tije, çavên xwe ber
bi ezmên ve hildan, rûmeta Xwedê û Îsayê li milê wî yê rastê
rawestayî dît. [56] Hingê got: «Va ye, ez ezmanan vebûyî dibînim û
Kurê* Mirov li milê Xwedê yê rastê radiweste!» [57] Lê wan guhên
xwe girtin, bi dengekî bilind qîriyan û bi hev re êrîşî wî kirin.
[58] Wan ew derxist derveyî bajêr û dan ber keviran. Şahidan ebayên
xwe danîn ber lingê xortekî ku navê wî Şawûl bû. [59] Gava wan
Steyfan kevir dikirin, wî dua kir û got: «Ya Xudan Îsa, ruhê min
bistîne.» [60] Hingê ew çû ser çokan û bi dengekî bilind qîriya: «Ya
Xudan, vî gunehî li wan negire.» Çaxê ev got, bi xew ve çû, mir.

8 Û Şawûl razî bû ku ew bê kuştin.

### *Şawûl Tengahiyê Dide Bawermendan*

Di wê rojê de li Orşelîmê cefayeke şidîd li hember civîna* bawermendan dest pê kir û ji Şandiyan pê ve hemû bawermend ji hev
hatin belavkirin, çûn herêmên Cihûstan* û Sameryayê*. [2] Mirovên
xwedêtirs Steyfan veşartin û şîneke giran li ser wî girtin. [3] Lê Şa-
wûl civîn şeperze dikir; ji malekê diket maleke din, jin û mêr kaş
dikirin û davêtin zîndanê.

### *Filîpos Mizgîniyê li Sameryayê Belav Dike*

[4] Îcar yên ku ji hev belav bûn, Mizgînî* didan her dera ku
diçûnê. [5] Filîpos daket bajarekî Sameryayê û Mesîh ji wan re da bi-
hîstin. [6] Gava elaletê* nîşanên mezin ên ku Filîpos çêdikirin, didî-
tin û dibihîstin, hemûyan bi hev re bi baldarî guhê xwe didan go-
tinên wî. [7] Çimkî ruhên nepak bi dengekî bilind qîriyan û ji gelek

---

7:51 Îşaya 63:10 8:3 Karên Şandiyan 22:4-5; 26:9-11

kesên cinoyî* derketin û gelek kesên felcî û seqet sax bûn. 8 Û
şahiyeke mezin li wî bajarî çêbûbû.

9 Îcar li wî bajarî yekî ku ji demeke dirêj ve sêrbazî dikir hebû,
navê wî Şimûn bû. Wî xelkê Sameryayê şaş dihişt û digot ku ew
mirovekî mezin e. 10 Hemûyan, ji biçûkan heta mezinan bi baldarî
guhdariya wî dikir û digotin: «Hêza Xwedê ya ku jê re Mezin di-
bêjin ev e.» 11 Û wan bi baldarî guhdariya wî dikir, çimkî ji deme-
ke dirêj ve wî bi sêrbaziya xwe ew şaş dikirin. 12 Lê gava ku wan ji
Filîpos bawer kir, yê ku Mizgîniya li ser Padîşahiya* Xwedê û li
ser navê Îsa Mesîh dida, hem jin hem mêr imad* bûn. 13 Şimûn bi
xwe jî bawerî anî. Piştî ku imad bû, hergav li ba Filîpos dima û li
nîşan û kerametên mezin ên ku dihatin kirin, şaş dima.

14 Îcar gava ku Şandiyên li Orşelîmê bihîstin ku Samerya pey-
va Xwedê qebûl kiriye, wan Petrûs û Yûhenna şandin ba wan.
15 Ew jî daketin jêr, ji bo wan dua kirin ku Ruhê Pîroz bistînin,
16 çimkî hê Ruhê Pîroz nehatibû ser yekî ji wan, tenê ew bi navê
Xudan Îsa hatibûn imadkirin*. 17 Hingê Petrûs û Yûhenna destên
xwe danîn ser wan û wan jî Ruhê Pîroz stand. 18 Îcar gava ku
Şimûn dît ku Ruh bi destdanîna* Şandiyan a li ser wan tê dayîn, wî
pere pêşkêşî wan kirin û 19 got: «Vê hêzê bidin min jî, da ku ez
destên xwe deynim ser kê, Ruhê Pîroz bistîne.» 20 Lê Petrûs ji wî
re got: «Bila zîvê te mîrata serê te be, çimkî te guman kir ku di-
yariya Xwedê bi peran tê standin! 21 Ne pişka te û ne jî para te di
vê yekê de heye, çimkî dilê te li ber Xwedê ne rast e. 22 Îcar ji vê
xerabiya xwe tobe bike, ji Xudan lava bike, belkî li niyeta di dilê te
de bê bihûrtin. 23 Çimkî ez te di tehliya zirav de û di zincîrên xera-
biyê de dibînim.» 24 Şimûn lê vegerand û got: «Hûn ji bo min ji
Xudan bixwazin, da ji tiştên ku we gotin tu tişt neyê ser min.»

25 Îcar piştî ku Petrûs û Yûhenna ji peyva Xudan re şahidî kirin
û peyivîn, ew vegeriyan Orşelîmê, Mizgînî li gelek gundên Same-
riyan belav kirin.

### *Filîpos û yê Etyopî*

26 Hingê milyaketekî Xudan ji Filîpos re got: «Rabe û bi aliyê
başûr ve here wê riya ku ji Orşelîmê diçe Xezzeyê.» Ew der çol e.
27 Ew jî rabû û çû û Etyopiyekî nemêrkirî dît. Ew wezîrekî şah-
banûya* Etyopyayê Kendakya bû û li ser hemû xezînên wê bû. Ew

ji bo perizînê hatibû Orşelîmê û [28] vedigeriya malê. Di ereba xwe
de rûniştibû û nivîsara Îşaya* pêxember dixwend. [29] Îcar Ruh ji Fi-
lîpos re got: «Pêşve here û beşdarî vê erebê bibe.» [30] Filîpos bezî û
bihîst ku ew nivîsara Îşaya pêxember dixwîne. Filîpos jê pirsî:
«Ma tiştê ku tu dixwînî, tu fêm dikî?» [31] Wî lê vegerand û got:
«Ezê çawa fêm bikim eger yek ji min re şîrove neke?» Û wî ji
Filîpos hêvî kir ku li ba wî siwar bibe. [32] Ew cihê ku ji nivîsarê
dixwend ev bû:

«Wek miyekê ji bo serjêkirinê hat birin
Û wek ku berx li ber cewîzê* xwe bêziman e,
Ew devê xwe venake.
[33] Di nizimkirina wî de jê re edalet nema.
Kî wê li ser dûndana wî bêje?
Çimkî jiyana wî ji erdê tê rakirin.»[a]

[34] Yê nemêrkirî ji Filîpos pirsî û got: «Hêviya min ji te, pêxem-
ber van li ser kê dibêje? Li ser xwe an li ser yekî din?» [35] Hingê
Filîpos devê xwe vekir û bi vê nivîsarê dest bi gotinê kir û Miz-
gîniya li ser Îsa ji wî re got. [36-37] Gava di riya xwe de diçûn, gihîştin
ser avekê, yê nemêrkirî got: «Va ye av, ma çi ji min re dibe asteng
ku ez imad* nebim?» [38] Wî emir kir ku erebe raweste, herdu bi hev
re, Filîpos û yê nemêrkirî, çûn nav avê û Filîpos ew imad kir.
[39] Çaxê ew ji avê derketin, Ruhê Xudan Filîpos hilda û bir; yê
nemêrkirî hew ew dît û bi şahî di riya xwe de çû. [40] Filîpos xwe li
Aşdodê dît û heta ku hat Qeyseriyê, di hemû bajarên ku di wan re
derbas bû de, Mizgînî belav dikir.

### *Îsa Mesîh ji Şawûl re Xuya Dibe*

*(Karên Şandiyan 22:6-16; 26:12-18)*

9 Hingê Şawûl, hê jî bi gefxwarina kuştina şagirtên Xudan, çû
ba Serokkahîn [2] û ji bo kinîştên* li Şamê name jê xwestin, da

---

[a] **8:32-33** Ji: Îşaya 53:7-8

**8:27** Li Etyopyayê «Kendakya» bernavek bû (wek li Misrê «Firewn» an li derên din «Qeyser»).

**8:32** Cewîz: Ew kesê ku pirça bizinan, hiriya miyan û keja çûran dibire.

**8:36** Di hin destnivîsaran de ev jî heye: «Filîpos jê re got: Eger tu bi hemû dilê xwe bawer bikî, tu dikarî. Wî lê vegerand û got: Ez bawer dikim ku Îsa Mesîh Kurê* Xwedê ye.»

ku ew her kesê ku li pey vê Riyê* diçe bibîne, jin an mêr, wan
bigire û girêdayî bîne Orşelîmê. 3 Gava ew di riya xwe de diçû û
nêzîkî Şamê dibû, ji nişkê ve ji ezmên ronahiyekê li dora wî şewq
da. 4 Ew ket erdê û dengek bihîst ku ji wî re got: «Şawûl, Şawûl, tu
çima tengahiyê didî min?» 5 Şawûl pirsî û got: «Ya Xudan, tu kî
yî?» Wî jî got: «Ez Îsa me, yê ku tu tengahiyê didiyê. 6 Lê rabe û
bikeve bajêr; wê ji te re bê gotin, ku divê tu çi bikî.» 7 Ew zilamên
ku bi Şawûl re rêwîtî dikirin, bêzar man û sekinîn; çimkî wan deng
dibihîst, lê tu kes nedidîtin. 8 Şawûl ji erdê rabû, lê gava wî çavên
xwe vekirin, wî tiştek nedît. Bi destê wî girtin û ew anîn Şamê.
9 Îcar sê rojan wî nedît, ne xwar û ne jî vexwar.

10 Hingê li Şamê şagirtek hebû ku navê wî Hananya bû. Xudan
di dîtiniyekê* de ji wî re got: «Hananya!» Wî bersîv da: «Va me
ez, ya Xudan.» 11 Xudan ji wî re got: «Rabe û here wê kolana ku jê
re dibêjin Rast, li mala Cihûda, li mirovekî Tarsûsî yê ku navê wî
Şawûl e bipirse. Ji ber ku va ye, ew dua dike. 12 Wî di dîtiniyekê de
dîtiye, mirovekî ku navê wî Hananya ye hat ba wî û destên xwe
danîn ser wî, da ku dîsa bibîne.» 13 Hananya bersîv da û got: «Ya
Xudan, min li ser vî zilamî ji gelekan bihîstiye, ku wî di Orşelîmê
de çiqas xerabî li pîrozên te kiriye. 14 Li vir jî desthilatiya wî ji
serekên kahînan heye ku hemûyên gazî navê te dikin bigire.» 15 Lê
Xudan ji wî re got: «Tu here, çimkî ew ji bo min hacetekî bijartî
ye, da ku navê min bigihîne ber miletan, padîşahan û zarokên*
Îsraêl. 16 Ez bi xwe, ezê nîşanî wî bidim ku divê çiqas cefayê di ber
navê min de bikişîne.» 17 Hingê Hananya rabû û çû ket wê malê.
Wî destên xwe danîn ser Şawûl û got: «Birayê Şawûl, Xudan, ew
Îsayê ku di rê de li te xuya bû ez şandim, da ku tu dîsa bibînî û tu
bi Ruhê Pîroz tije bibî.» 18 Di cih de tiştekî wek pûlikan ji çavên wî
ketin û ji nû ve dît. Ew rabû û imad* bû. 19 Piştî ku xwarin xwar,
hêza wî hat cih.

### *Şawûl Mizgîniyê Dide*

Şawûl çend rojan li Şamê bi şagirtan re ma. 20 Û destxwere wî
dest pê kir, di kinîştan de Îsa da bihîstin û got: «Ew Kurê* Xwedê
ye.» 21 Hemû yên ku ew bihîstin şaş man û gotin: «Ma ev ne ew e,
yê ku ew ên li Orşelîmê gazî vî navî dikirin, ji holê radikirin? Ma
ew nehatiye vir, da ku wan girêdayî bibe ber serekên kahînan?»

22 Lê Şawûl hê bêtir bi hêz dibû û ji ber ku eşkere dikir ku Îsa,
Mesîh e, Cihûyên ku li Şamê rûdiniştin matmayî hiştin.
23 Piştî ku gelek roj derbas bûn, Cihû şêwirîn ku wî bikujin.
24 Lê Şawûl bi gêrûfena wan hesiya. Ew bi şev û bi roj li ber derge-
hên bajêr diman, da ku wî bikujin. 25 Lê şagirtên wî bi şev rahiştin
wî û di selikekê de ew ji sûrê daxistin jêr.
26 Gava ku Şawûl hat Orşelîmê, dixebitî ku beşdarî şagirtan
bibe. Lê hemû ji wî ditirsiyan, çimkî bawer nekirin ku ew bûye
şagirt. 27 Hingê Barnabas ew hilda û anî ba Şandiyan; ji wan re got
ku Şawûl çawa di rê de Xudan dîtiye û Xudan bi wî re peyiviye û
wî çawa li Şamê bi navê Îsa bê tirs hîn kiriye. 28 Şawûl êdî li
Orşelîmê bi wan re bû, bi wan re diçû û dihat, bê tirs bi navê
Xudan hîn dikir. 29 Bi Cihûyên ku Yewnanî dipeyivîn re dipeyivî û
bi wan re diket gotûbêjê, lê ew dixebitîn ku wî bikujin. 30 Çaxê bira
pê hesiyan, ew daxistin Qeyseriyê û ji wir jî şandin Tarsûsê.
31 Hingê civînên* bawermendan li tevahiya Cihûstanê*, Celî-
lê* û Sameryayê* di aştiyê* de bûn; ava dibûn, bi tirsa Xudan pêş-
ve diçûn û bi handana* Ruhê Pîroz zêde dibûn.

### *Petrûs li Lîdayê û Yafayê*

32 Gava ku Petrûs li her aliyî digeriya, ew berjêrî ba wan pîro-
zên ku li Lîdayê diman jî bû. 33 Li wir wî mirovek ku navê wî
Eynêyas bû dît, ku heşt salan di nav nivînan de bû; çimkî ew felcî
bû. 34 Petrûs ji wî re got: «Eynêyas, Îsa Mesîh te qenc dike, rabe û
nivînên xwe hilde!» Û di cih de ew rabû ser lingan. 35 Hemû yên
ku li Lîdayê û li Şaronê rûdiniştin ew dîtin û li Xudan zivirîn.
36 Îcar li Yafayê şagirtek hebû, ku navê wê Tabîta bû, ku bê
wergerandin bi mana «Xezal» e. Wê xwe dabû kirinên qenc û xê-
ran. 37 Di wan rojan de ew nexweş ket û mir. Piştî ku ew şuştin, li
oda jorîn danîn. 38 Ji ber ku Lîda nêzîkî Yafayê bû, şagirtan bihîst
ku Petrûs li wê derê ye, du zilam şandin pey wî, jê daxwaz kirin û
gotin: «Ji kerema xwe zû were ba me.» 39 Hingê Petrûs rabû û bi
wan re çû. Çaxê ew gihîşt wê derê, ew birin oda jorîn. Hemû jinebî
li dora wî rawestan, digiriyan û cil û kirasên ku hê Xezalê bi wan
re bû çêkiribûn, nîşan didan. 40 Lê Petrûs hemû derxistin derve, çû

---

9:23-25 2 Korîntî 11:32-33

ser çokan û dua kir. Li cesed zivirî û got: «Tabîta, rabe.» Hingê wê
çavên xwe vekir, Petrûs dît û rûnişt. [41] Wî destê xwe dirêjî wê kir û
ew rakir. Piştre gazî yên pîroz û jinebiyan kir û ew saxbûyî danî ber
wan. [42] Ev yek li hemû Yafayê hat bihîstin û gelekan bawerî bi Xudan
anî. [43] Petrûs jî gelek rojan li Yafayê, li mala Şimûnê çermker ma.

### *Petrûs û Kornêlyosê Sersed*

10 Li Qeyseriyê mirovek hebû ku navê wî Kornêlyos bû; ew
di tabûra* ku jê re ‹ya Îtalyayî› digotin de sersed* bû. [2] Ew
bi hemû maliyên xwe ve dîndar û xwedêtirs bû, wî gelek xêr bi
gelê Cihû dikirin û herdem li ber Xwedê dua dikir. [3] Rojekê piştî
nîvro, di dora saet sisiyan de wî bi zelalî di dîtiniyekê de dît ku
milyaketekî Xwedê hat ba wî û jê re got: «Kornêlyos!» [4] Wî gelek
bi tirs li milyaket nêrî û got: «Çi ye, ya Xudan?» Milyaket got:
«Dua û xêrên te gihîştin ba Xwedê û tu di bîra wî de yî. [5] De niha
zilaman bişîne Yafayê û gazî Şimûnê ku jê re dibêjin Petrûs, bike.
[6] Ew mêvanê Şimûnê çermker e, ku mala wî li ber deryayê ye.»
[7] Çaxê milyaketê ku bi wî re peyivî çû, wî gazî du xulamên xwe û
leşkerekî dîndar ê ku di xizmeta wî de bû, kir; [8] piştî ku hemû tişt ji
wan re got, ew şandin Yafayê.

[9] Dotira rojê çaxê ku ew di riya xwe de bûn û nêzîkî bajêr
dibûn, Petrûs saet li dora diwanzdehan derket ser banê xênî ku dua
bike. [10] Ew pirr birçî bû û xwest ku tiştekî bixwe. Çaxê ku xwarin
amade dikirin, ew ji ser hişê xwe çû. [11] Wî dît ku ezman vebûyî ye
û tiştekî wek çarşefeke mezin, ji çar kujên xwe daleqandî, dadike-
ve erdê. [12] Di hundirê wê de her cûreyê heywanên çarpê, heywanên
ku dişêlin û teyrên ezmên hebûn. [13] Û wî dengek bihîst ku digot:
«Petrûs rabe, serjêke û bixwe.» [14] Lê Petrûs got: «Ev ji min dûr be,
ya Xudan; çimkî min tu caran tiştên murdar* an heram nexwa-
rine.» [15] Dîsa, cara diduyan deng jê re got: «Tiştên ku Xwedê helal
kirine, tu heram nehesibîne.» [16] Ev yek sê caran çêbû û ev tişt di
cih de hat hilkişandin ezmên.

[17] Hê ku Petrûs şaşmayî li ser wê dîtiniya ku dîtibû difikirî, ew
zilamên ku Kornêlyos şandibûn, li mala Şimûn dipirsîn, mal dîtin
û li ber derî rawestan. [18] Wan gazî kir û gotin: «Ma Şimûnê ku jê re
dibêjin Petrûs li vir dimîne?» [19] Îcar Petrûs hê li ser dîtiniyê
difikirî, Ruh ji wî re got: «Va ye, sê mirov li te digerin. [20] Niha

rabe, here jêr, qet dudilî nebe û bi wan re here. Çimkî min ew
şandine.» [21] Petrûs daket jêr û ji zilaman re got: «Ewê ku hûn lê
digerin ez im; ma hûn ji bo çi hatine?» [22] Wan bersîv da û gotin:
«Kornêlyosê sersed em şandin. Ew zilamekî rast û xwedêtirs e û ji
aliyê hemû gelê Cihûyan ve li ser wî bi qencî tê peyivîn. Ji aliyê
milyaketekî pîroz ve jê re hat gotin ku bişîne pey te ku tu bêyî
mala wî û tiştê ku tê bêjî bibihîze.» [23] Îcar Petrûs ew gazî hundir
kirin û ew kirin mêvan.

Dotira rojê ew rabû û bi wan re çû. Çend birayên ji Yafayê jî
bi wî re çûn. [24] Roja din gihîştin Qeyseriyê. Kornêlyos li hêviya
wan bû. Wî gazî mirovên xwe û dostên xwe yên nêzîk jî kiribû û li
ba xwe civandibûn. [25] Gava ku Petrûs ket hundir, Kornêlyos ji ber
ve rabû û xwe avêt ber lingên wî û periziyê. [26] Lê Petrûs ew rakir
ser lingan û got: «Rabe, ez bi xwe jî mirov im.» [27] Hê ku bi wî re
dipeyivî, ket hundir, dît ku gelek mirov civiyane. [28] Petrûs ji wan
re got: «Hûn bi xwe qenc dizanin ku ji bo yekî Cihû çiqas ne rast e
ku bi yekî ji miletên din re têkiliyê deyne an here ba wî; lê Xwedê
nîşanî min da ku ez ji tu kesî re nebêjim murdar an heram. [29] Loma
gava ku ez hatim gazîkirin, bêyî ku ez li hember rabim, ez hatim.
Niha ez dipirsim, gelo we çima gazî min kir?»

[30] Hingê Kornêlyos bersîv da û got: «Berî çar rojan, vî çaxî,
saet di sisiyan de min li mala xwe dua dikir. Ji nişkê ve zilamekî
cilspî li ber min rawesta [31] û got: ‹Kornêlyos, duaya te hat bihîstin
û xêrên ku te kirine li ber Xwedê hatin bîranîn. [32] Îcar zilaman
bişîne Yafayê û gazî Şimûnê ku jê re Petrûs dibêjin bike. Ew li ba
Şimûnê çermker dimîne, mala Şimûn jî li ber deryayê ye.› [33] Ji ber
vê yekê min zû şand pey te û te jî qenc kir ku tu hatî. Niha em
hemû li vê derê li ber Xwedê amade ne, da ku em hemû tiştên ku
Xudan li te emir kirine, bibihîzin.»

### *Petrûs Mizgîniyê Dide Miletên Din*

[34] Petrûs jî dest bi peyivînê kir û got: «Niha bi rastî ez fêm
dikim ku li ba Xwedê xatirgirtin tune. [35] Lê di nav her miletî de yê
ku ji wî ditirse û ya rast dike, ji wî re meqbûl e. [36] Hûn dizanin ku
Xwedê peyv ji zarokên* Îsraêl re şand, bi destê Îsa Mesîh yê ku

---

**10:34** Dubarekirina Şerîetê 10:17

Xudanê hemûyan e, Mizgîniya aştiyê* da. [37] Hûn bi bûyerên piştî
ku Yûhenna ji bo imadbûnê gazî kiribû dizanin, ku çawa li Celîlê
dest pê kirin û li seranserê Cihûstanê belav bûn û [38] çawa Xwedê
Îsayê Nisretî bi Ruhê Pîroz û bi hêzê mesh* kir û çawa ew geriya,
wî qencî kir û hemû yên ku di bin serdestiya Îblîs de bûn sax kirin.
Çimkî Xwedê bi wî re bû. [39] Em ji hemû tiştên ku wî li Cihûstanê û
li Orşelîmê kirin re şahid in. Wan ew bi dar ve daleqand û kuştin.
[40] Lê Xwedê roja sisiyan ew ji nav miriyan rakir û kir ku bi eş-
kereyî bê dîtin. [41] Ne ji hemû gel re, lê ji me re, ji yên ku ji berê ve
ji aliyê Xwedê ve bi şandîtî hatibûn bijartin re eşkere kir. Piştî ku
ew ji nav miriyan rabû, me bi wî re xwar û vexwar. [42] Wî li me
emir kir ku em peyvê bi gel bidin bihîstin û şahidiyê bikin ku dad-
gerê* mirî û zindiyan ê ku Xwedê destnîşan kiriye, ew e. [43] Hemû
pêxember li ser wî şahidiyê dikin, her kesê ku baweriyê bi wî bîne,
bi navê wî efûbûna gunehan distîne.»
[44] Hê Petrûs ev tişt digotin, Ruhê Pîroz hat ser hemûyên ku
peyv bihîstin. [45] Îcar bawermendên Cihû yên ku bi Petrûs re hati-
bûn, şaş man ku çawa diyariya Ruhê Pîroz bi ser miletên din de jî
rijiya bû. [46] Çimkî wan bihîst ku ew bi zimanên* din dipeyivin û
pesnê Xwedê didin. Hingê Petrûs got: [47] «Evên ku wek me Ruhê
Pîroz standine, ma kî dikare nehêle ku bi avê bên imadkirin*?»
[48] Û wî emir kir ku ew bi navê Îsa Mesîh imad bibin. Hingê wan ji
wî hêvî kir ku çend rojan li wir bimîne.

### *Beyanên Petrûs li Orşelîmê*

11 Îcar Şandî û bawermendên li Cihûstanê bihîstin ku miletên
din jî peyva Xwedê qebûl kirine. [2] Îcar gava ku Petrûs
hilkişiya Orşelîmê, bawermendên sinetbûyî* rexne li wî girtin û
[3] gotin: «Çima tu çûyî ba yên sinetnebûyî û te bi wan re xwarin
xwar?» [4] Hingê Petrûs dest pê kir, yek bi yek ji wan re şîrove kir û
got: [5] «Min li bajarê Yafayê dua dikir. Ez ji hişê xwe çûm û min
dîtinî* dît. Tiştek wek çarşefeke mezin, bi çar kujên xwe dale-
qandî, ji ezmên dadiket. Ev tişt heta ba min hat. [6] Çaxê min zîq lê
nêrî, min heywanên çarpê, heywanên wehşî, heywanên ku dişêlin
û teyrên ezmên dîtin. [7] Û min dengek bihîst ku ji min re got:
‹Petrûs, rabe, serjêke û bixwe.› [8] Lê min got: ‹Ev dûrî min be, ya
Xudan, çimkî tu caran tiştekî murdar an heram neketiye devê min.›

9 Lê careke din ew deng ji ezmên hat û got: ‹Tiştên ku Xwedê helal
kirine, tu heram nehesibîne.› 10 Ev tişt sê caran çêbû û piştre hemû
tişt dîsa hilkişiyan ezmên. 11 Hema wê gavê, sê zilamên ku ji Qey-
seriyê şandibûn pey min, li ber wê mala ku em lê diman sekinîn.
12 Ruh ji min re got: ‹Bi wan re here û cihêtiyê neke.› Ev her şeş
bira jî bi min re hatin û em ketin mala wî zilamî. 13 Wî jî ji me re
got, ka çawa dît ku milyaket li mala wî rawesta û jê re got: ‹Bişîne
Yafayê û Şimûnê ku jê re Petrûs dibêjin, bîne. 14 Wê ji te re peyvan
bêje, tu û tevahiya mala te, hûnê bi wan xilas bibin.› 15 Çaxê min
dest bi peyivînê kir, Ruhê Pîroz hat ser wan jî, wek ku di destpêkê
de hatibû ser me. 16 Hingê ev peyva ku Xudan gotibû hat bîra min:
‹Yûhenna bi avê imad kir, lê hûnê bi Ruhê Pîroz imad bibin.›
17 Gava me bawerî bi Xudan Îsa Mesîh anî, Xwedê diyariya Ruhê
Pîroz da me. Îcar, eger Xwedê eynî diyariya ku dabû me, dabe wan
jî, hingê ez kî bûm, ku ez li ber Xwedê rabim.» 18 Gava wan ev bi-
hîst, dengê xwe birrîn. Pesnê Xwedê dan û gotin: «Nexwe Xwedê
ji miletên din re jî rê vekir ku tobe bikin û jiyanê bistînin.»

### *Bawermendên Entakyayê*

19 Îcar yên ku ji ber wê zordestiya dema kuştina Steyfan belav
bûbûn, heta Fînîkya, Qibris û Entakyayê çûbûn. Wan peyv ji Ci-
hûyan pê ve ji kesî din re negotin. 20 Lê hin ji wan ên ku ji Qibris û
Kûrênê bûn, çaxê hatin Entakyayê ji Yewnaniyan* re jî dipeyivîn
û Mizgîniya Xudan Îsa didan. 21 Destê Xudan bi wan re bû, gele-
kan bawerî anî û li Xudan zivirîn. 22 Xebera vê yekê gihîşt guhê
civîna* bawermendan a li Orşelîmê û wan Barnabas şand Entak-
yayê. 23 Îcar gava ku ew hat, wî kerema Xwedê dît, şa bû û ew
hemû şidandin ku ji dil bi Xudan ve girêdayî bimînin. 24 Çimkî ew
zilamekî qenc bû, bi Ruhê Pîroz û baweriyê tije bû. Bi vî awayî
elaleteke* mezin beşdarî Xudan bû. 25 Piştre Barnabas çû Tarsûsê,
ku li Şawûl bigere 26 û gava wî ew dît, ew anî Entakyayê. Salek sax
ew bi hev re tevî civîna bawermendan diciviyan û gelek mirov hîn
dikirin. Û cara pêşî li Entakyayê ji şagirtan re gotin: «Xirîstiyan».

---

**11:16** Karên Şandiyan 1:5 **11:19** Karên Şandiyan 8:1-4
**11:26** «Xirîstiyan» (bi zimanê Yewnanî), yanî «Mesîhî» (bi zimanê Îbranî); mana herduyan ev e: «Yên ku li pey Îsa Mesîh diçin».

[27] Di wan rojan de hin pêxember ji Orşelîmê berjêrî Entakyayê
bûn. [28] Yek ji wan ku navê wî Hagabos bû, rabû û bi rêberiya Ruh
got ku wê li tevahiya dinyayê xelayeke giran çêbe. Û ev xela di
dema Qeyser Klawdyos de çêbû. [29] Şagirtan biryar da ku her yek ji
wan li gor karîna xwe alîkariyê ji bawermendên li Cihûstanê re
bişîne. [30] Wusa jî kirin, bi destê Barnabas û Şawûl ev alîkarî ji rihs-
piyan re şandin.

### *Kuştina Aqûb û Girtina Petrûs*

12 Wê demê Hêrodês* padîşah destê xwe dirêjî hin kesên ji
civîna bawermendan kir, da ku cefayê bide wan. [2] Wî Aqû-
bê* birayê Yûhenna bi şûr kuşt. [3] Gava wî dît ku ev yek li Cihûyan
xweş hat, ew zêde çû, wî Petrûs jî girt. Ev yek di dema Cejna* Na-
nê Şkeva de çêbû. [4] Gava ku Petrûs girt, ew avêt zîndanê û ji bo ku
nobedariya wî bikin, çar kom leşkerên ku her yek ji wan ji çar ke-
san pêk dihat, danîn ber wî. Niyeta wî ew bû ku piştî Cejna* Nanê
Şkeva wî derxe ber gel. [5] Îcar Petrûs di zîndanê de girtî bû, lê civî-
na bawermendan ji dil û can ji bo wî ji Xwedê dixwest.

### *Petrûs ji Zîndanê Rizgar Dibe*

[6] Şevekê beriya wê roja ku Hêrodês wî derxe meydanê, Petrûs
bi du zincîran girêdayî, di navbera du leşkeran de radiza. Û nobe-
daran li ber derî nobedariya zîndanê dikirin. [7] Ji nişkê ve mil-
yaketekî Xudan li ba wî rawesta û ronahiyekê di hucreyê de şewq
da. Milyaket hincikek li kêleka Petrûs da, ew hişyar kir û got: «Zû
rabe!» Hingê zincîr ji destên Petrûs ketin. [8] Milyaket ji wî re got:
«Pişta xwe girêde û çaroxên xwe bixe piyên xwe.» Wî jî wusa kir.
Piştre ji wî re got: «Ebayê xwe li xwe bike û li pey min were.»
[9] Petrûs jî derket derve û li pey wî çû; lê nizanibû tiştê ku bi destê
milyaket dibe rast e; wî digot qey ew dîtiniyekê dibîne. [10] Piştî ku
ew ji nobedarên pêşî û yên diduyan derbas bûn, ew hatin ba der-
gehê hesin ê ku diçe nav bajêr. Ew bi xwe li ber wan vebû, ew
derketin û di kuçeyekê re derbas bûn; ji nişkê ve milyaket ji wî
veqetiya. [11] Hingê Petrûs hat ser hişê xwe û got: «Niha bi rastî ez
dizanim ku Xudan milyaketê xwe şand û ez ji destê Hêrodês û ji
hemû ya ku Cihûyan guman dikir, rizgar kirim.»

---

**11:28** Karên Şandiyan 21:10

[12] Piştî ku wî ev yek bi zelalî fêm kir, çû mala Meryema* diya
Yûhennayê ku jê re digotin Marqos. Li wir gelek civiyabûn û dua
dikirin. [13] Çaxê wî li dergehê derve xist, keçikeke xizmetkar a bi
navê Roda çû û guhê xwe da derî. [14] Gava ku dengê Petrûs nas kir,
wusa kêfa wê hat, bêyî ku derî veke, bezî hundir û got ku Petrûs li
ber dergeh e. [15] Wan ji wê re got: «Te hişê xwe winda kiriye!» Lê
ew ji ya xwe nehat xwarê. Wan got: «Ew milyaketê wî ye.» [16] Pet-
rûs li ser hev li dergeh dixist. Gava wan dergeh vekir, wan ew dît û
pirr şaş man. [17] Wî destê xwe hilda, da ku bêdeng bimînin û ji wan
re got ku Xudan çawa ew ji zîndanê derxistiye. Û got: «Vê yekê ji
Aqûb* û ji birayan re bêjin.» Piştre derket û çû dereke din.
[18] Gava ku bû sibe, tevliheviya nav leşkeran ne hindik bû, ka
gelo çi bi Petrûs hatiye. [19] Çaxê Hêrodês li wî geriya û ew nedît,
nobedar kişandin pirsyariyê û emir kir ku bên kuştin. Û Hêrodês ji
Cihûstanê berjêrî Qeyseriyê bû û li wê derê ma.

### *Mirina Hêrodês Padîşah*

[20] Hêrodês li Sûr* û Saydayiyan gelek hêrs bûbû. Hingê ew
hemû bi hev re hatin, piştî ku Bilastos şahneyê* padîşah kişandin
aliyê xwe, lihevhatin xwestin. Çimkî welatê wan ji aliyê xwarinê
ve bi welatê Hêrodês ve girêdayî bû. [21] Îcar di roja ku hat kifşkirin
de, Hêrodês cilên xwe yên padîşahiyê li xwe kirin, li ser kursiyê
dîwanê* rûnişt û ji wan re peyivî. [22] Hingê xelkê kir qîrîn û gotin:
«Ev dengê xwedayekî ye, ne yê mirovan e!» [23] Û di cih de, ji ber
ku wî rûmet nedabû Xwedê, milyaketekî Xudan li wî xist, kurmî
bû û mir.
[24] Lê peyva Xwedê fireh û zêde dibû. [25] Barnabas û Şawûl, piş-
tî ku xizmeta xwe anîn serî ji Orşelîmê vegeriyan û Yûhennayê ku
jê re digotin Marqos* bi xwe re anîn.

### *Barnabas û Şawûl Tên Wezîfedarkirin û Diçin Qibrisê*

13 Di civîna li Entakyayê de pêxember û mamoste hebûn: Bar-
nabas, Şimûnê ku jê re Nîgêr digotin, Lûkyosê ji Kûrênê,
Menayînê ku birayê şîrî yê Mîr Hêrodês* bû û Şawûl. [2] Çaxê ku ev
diperizîn Xudan û rojî digirtin, Ruhê Pîroz got: «Barnabas û Şawûl
ji bo wî karê ku min gazî wan kiriye, veqetînin.» [3] Hingê piştî ku
rojî girtin û dua kirin, destên xwe danîn ser wan û ew şandin.

[4] Bi vî awayî ew ji aliyê Ruhê Pîroz ve şandî, dageriyan Sêlûk-
yayê û ji wir bi gemiyê çûn Qibrisê. [5] Gava gihîştin Selamîsê, wan
peyva Xwedê di kinîştên* Cihûyan de dan bihîstin. Yûhenna jî alî-
kariya wan dikir. [6] Çaxê ew li seranserê giravê geriyan û hatin Pa-
fosê, wan li wir yekî Cihûyê, ku pêxemberekî derewîn û sêrbaz bû
dît, ku navê wî Baryêşû bû. [7] Ew bi Sergiyos Pawlosê walî re bû.
Walî zilamekî aqilmend bû, wî gazî Barnabas û Şawûl kir û xwest
ku peyva Xwedê bibihîze. [8] Lê Êlûmasê sêrbaz – ku navê wî weha
bê wergerandin – li ber wan rabû û dixebitî ku walî ji bawerkirinê
bizivirîne. [9] Lê Şawûl, yanî Pawlos*, bi Ruhê Pîroz tije bi baldarî li
wî nêrî û [10] got: «Hey kurê Îblîs! Dijminê her rastiyê, bi hemû hîle
û xerabiyan tije! Ma tu dev ji xwarûvîçkirina riyên Xudan ên rast
bernadî? [11] Va ye, destê Xudan li hember te ye, tê kor bibî û tu ji
bo demekê tavê nabînî.» Di cih de mij û tarî bi ser wî de hat,
veşewişî, li yekî geriya ku bi destê wî bigire. [12] Gava walî dît ku çi
bû, wî bawerî anî, ew li hînkirina li ser Xudan gelek şaş ma.

### *Pawlos û Barnabas li Entakya Pisîdyayê*

[13] Pawlos û hevalên xwe bi gemiyê ji Pafosê bi rê ketin û hatin
bajarê Pergêya Pamfîlyayê. Hingê Yûhenna ew hiştin û vegeriya
Orşelîmê. [14] Ew jî ji Pergêyê derbas bûn û hatin Entakya Pisîdyayê
û roja* Şemiyê ketin kinîştê û rûniştin. [15] Piştî xwendina Şerîetê û
Nivîsarên Pêxemberan, serekên kinîştê rêkirin pey wan û gotin:
«Birano, eger peyveke we ya cesaretê ji xelkê re hebe, kerem kin,
bêjin.» [16] Hingê Pawlos rabû, destê xwe hilda û got:
«Gelî Îsraêliyan û hûn ên din ên ku ji Xwedê ditirsin, guhdarî
bikin. [17] Xwedayê vî gelê Îsraêl bav û kalên me bijartin û gava li
welatê Misrê diman ew kirin miletekî mezin. Bi zendê xwe yê hêz-
dar ew ji wir deranîn [18] û bi qasî çil salan li çolê bîhna xwe li wan
fireh kir. [19] Piştî ku wî li welatê Kenanê* heft milet qir kirin, wî
welatê wan bi mîrasî da wan. [20] Wê demê nêzîkî çar sed û pêncî
salan kişand. Piştî vê yekê wî hukumdar dan wan, heta dema Sa-
mûêl* pêxember. [21] Piştre wan padîşahek xwest û Xwedê Şawûlê

---

13:17 Derketin 1:7; 12:51 13:18 Hijmartin 14:34
13:19 Dubarekirina Şerîetê 7:1; Yêşû 14-19
13:20 Hukumdar 2:16; 1 Samûêl 3:20

kurê Kîş ji eşîra Binyamîn* da wan û wî çil salan padîşahî kir.
22 Piştî ku ew ji text anî xwarê, Dawid rakir ku bibe padîşahê wan
û li ser wî weha şahidî kir û got: ‹Min Dawidê kurê Yêşa*, zila-
mekî li gor dilê xwe dît. Ewê hemû daxwazên min bîne cih.›[a] 23 Ji
dûndana vî mirovî Xwedê ji Îsraêl re, wek ku soz dabû, Xilaskar
Îsa şand. 24 Hê beriya hatina wî, Yûhenna ji hemû gelê Îsraêl re
imada* tobekirinê hîn kir. 25 Gava ku Yûhenna karê xwe ber bi
qedandinê ve dianî, got: ‹Di gumana we de ez kî me? Ez ne ew im.
Lê va ye, yek piştî min tê, ez ne hêja me ku dûlikên çaroxa di lingê
wî de vekim.›

26 «Gelî birayan, hûn zarokên dûndana Birahîm* û yên din ên
ku ji Xwedê ditirsin, ev peyva xilasiyê ji me re hatiye şandin.
27 Çimkî yên ku li Orşelîmê rûdinin û serekên wan ew nas nekirin,
wan dîwana* wî kir û ew peyvên pêxemberan ên ku her roja
Şemiyê tên xwendin anîn cih. 28 Bi ser ku ji bo kuştina wî tu sedem
nedîtin jî, ji Pîlatos xwestin ku wî bikuje. 29 Piştî ku wan hemû
tiştên ku li ser wî hatine nivîsîn anîn cih, ew ji dar anîn xwarê û
kirin gorê. 30 Lê Xwedê ew ji nav miriyan rakir. 31 Gelek rojan ji
wan ên ku bi wî re ji Celîlê derketibûn Orşelîmê re xuya bû. Û
niha ew li ber gelê me şahidên wî ne. 32 Îcar em Mizgîniya wê soza
ku Xwedê ji bav û kalên me re dabû, didin we. 33 Wî ev soz ji bo
me, yanî ji bo zarokên wan, bi rakirina Îsa anî cih. Çawa ku di
Zebûra diduyan de jî hatiye nivîsîn:

‹Tu Kurê min î;
Îro tu ji min re bûyî.›[b]

34 Û li ser rakirina wî ya ji nav miriyan, ku êdî ew venegere rizî-
bûnê, wî weha gotiye:

‹Ezê sozên pîroz û dilsoz ên ku Dawid standibûn, bidim
we.›[c]

35 Loma di Zebûreke din de jî weha dibêje:

‹Tu nahêlî ku Pîrozê te rizîbûnê bibîne.›[d]

36 «Çimkî piştî ku Dawid di dema xwe de ji bo armanca

---

[a] 13:22 Ji: 1 Samûêl 13:14; Îşaya 44:28
[b] 13:33 Ji: Zebûr 2:7
[c] 13:34 Ji: Îşaya 55:3
[d] 13:35 Ji: Zebûr 16:10

13:21 1 Samûêl 8:5; 10:21 13:24 Lûqa 3:3 13:25 Lûqa 3:16
13:28 Lûqa 23:21-23 13:29 Lûqa 23:50-56 13:31 Karên Şandiyan 1:3

Xwedê xizmet kir, ew mir û çû ba bav û kalên xwe û riziya. 37 Lê
ewê ku Xwedê ji mirinê rakir, rizîbûn nedît. 38 Ji bo vê yekê bira-
no, bizanin ku bi destê wî, lêbihûrtina gunehan ji we re tê danbi-
hîstin. 39 Û her kesê ku baweriyê bi Îsa tîne, ji wan hemû tiştên ku
bi Şerîeta Mûsa we nikaribû hûn bê sûc bibin, rastdar derdikeve.
40 Loma hay ji xwe hebin, da ev yeka ku pêxemberan gotiye neyê
serê we:

41 ‹Binêrin, hûn ên ku tinazên xwe dikin!
Şaş bimînin û helak bibin,
Çimkî ez di rojên we de karekî dikim
Karekî wusa, ku yek ji we re bêje jî,
Hûn qet bawer nakin.›[a]»

42 Çaxê ku Pawlos û Barnabas derketin derve, xelkê ji wan hê-
vî kir Şemiya ku bê jî li ser van tiştan ji wan re bipeyivin. 43 Çaxê
civîna di kinîştê de belav bû, gelek Cihû û xwedêperestên ji mi-
letên din li pey Pawlos û Barnabas çûn. Ew jî ji wan re peyivîn û
ew hişk şidandin, ku tam di kerema Xwedê de bimînin.

44 Şemiya din, hema bêje tevahiya bajêr ji bo ku peyva Xudan
bibihîze civiya. 45 Lê gava Cihûyan elalet dîtin, bi çavnebariyê tije
bûn, çêr kirin û li hember tiştên ku Pawlos digot rabûn. 46 Hingê
Pawlos û Barnabas, bi ziravî peyivîn û gotin: «Diviya ku pêşî pey-
va Xwedê ji we re bihata gotin. Madem ku hûn wê red dikin û xwe
hêjayî jiyana herheyî nabînin, va ye, em jî li miletên din dizivirin.
47 Çimkî Xudan li me weha emir kiriye:

‹Min tu kirî ronahiya miletan,
Da ku tu xilasiyê heta bi kujê dinyayê yê herî dûr bibî.›[b]»

48 Gava yên ji nav miletan* ev bihîst, şa bûn û pesnê peyva
Xudan dan û yên ku ji bo jiyana herheyî hatibûn kifşkirin, bawerî
anîn. 49 Bi vî awayî peyva Xudan li hemû herêmê belav bû. 50 Lê
Cihûyan jinên xwedêperest û qedirbilind û giregirên bajêr rakirin
ser piyan, tengahî dan Pawlos û Barnabas û ew derxistin derveyî
herêma xwe. 51 Wan jî toza lingên xwe li hember wan daweşandin
û hatin Qonyayê. 52 Îcar şagirt bi şabûnê û bi Ruhê Pîroz tije bûn.

---

[a] **13:41** Ji: Habaqûq 1:5 [b] **13:47** Ji: Îşaya 49:6
**13:51** Lûqa 9:5

### *Pawlos û Barnabas li Qonyayê*

14 Îcar li Qonyayê Pawlos û Barnabas wek her car ketin
kinîşta Cihûyan û wusa peyivîn, ku elaleteke mezin hem ji
Cihûyan û hem ji miletên din bawerî anîn. 2 Lê Cihûyên ku bawer
nekirin, yên ji miletên din rakirin ser piyan û dilê wan li hember
birayan reş kirin. 3 Ew demeke dirêj li wir man, ji bo Xudan bi
ziravî peyivîn; Xudan jî şahidiya peyva kerema xwe dikir, bi destê
wan nîşan û karên mezin çêdikirin. 4 Lê xelkê bajêr bûn du bend;
hinekan pişta Cihûyan girt, hinekan jî ya Şandiyan. 5 Îcar yên ji
miletên din û Cihû, bi serokên xwe ve rabûn ku êrîşî wan bikin,
wan riswa bikin û bidin ber keviran. 6 Gava Şandî bi vê yekê he-
siyan, reviyan bajarên Lîstra û Derbeyê yên Lûkayonyayê û der û
dora wan. 7 Li wan deran jî wan Mizgînî dida.

### *Li Lîstra û Derbê*

8 Li Lîstrayê zilamekî şeht* hebû ku li erdê rûdinişt; ew ji zik-
makî ve şeht bû û tu caran rêve neçûbû. 9 Gava ku Pawlos dipeyivî,
wî guhdariya wî dikir. Û Pawlos bi baldarî li wî nêrî û dît ku ba-
weriya wî heye, ku sax bibe. 10 Hingê bi dengekî bilind got: «Rabe
û li ser lingên xwe raweste.» Wî jî xwe hilavêt û dest pê kir, rêve
çû. 11 Gava elaletê dît ku Pawlos çi kir, dengê xwe hildan û bi
zimanê Lûkayonî gotin: «Îlah di şiklê mirovan de hatine jêr nav
me!» 12 Wan ji Barnabas re got Zews, ji Pawlos re gotin Hermês,
çimkî ew peyvbêjê sereke bû. 13 Kahînê Zews, yê ku perestgeha wî
li derveyî bajêr bû, ga û tacegul anîn ber dergehên bajêr, wî bi ela-
letê re xwest ku goriyan* bide. 14 Gava ku Şandiyan, yanî Barnabas
û Pawlos ev yek bihîstin, wan cilên xwe çirandin, bi nav elaletê ve
bezîn, qîriyan û gotin: 15 «Camêrno, hûn çima wusa dikin? Em jî
wek we mirov in, evdên Xwedê ne; em Mizgîniyê ji we re tînin, da
ku hûn ji van tiştên pûç li wî Xwedayê jîndar vegerin, yê ku erd û
ezman, derya û hemû tiştên ku di wan de ne, afirandine. 16 Di dema
nifşên* bihûrî de, wî hişt ku her milet li riya xwe here. 17 Dîsa jî wî

---

14:12 Zews: Pûtê Yewnaniyan ê herî mezin bû. Bi zimanê Latînî «Yûpîter» jê re digotin. Pûtekî din jî hebû, ku navê wî «Hermês» bû, ew qasidê Zews û pûtên din dihat hesabkirin.

14:15 Zebûr 146:6

xwe bê şahidî nehişt, qencî kir û ji ezmên baran û demsalên berdar
dan we; bi xwarinê hûn têr kirin û dilê we tije şabûn kir.» 18 Bi van
peyvan, wan bi zorê kir ku elalet ji bo wan goriyan nede.
19 Lê Cihû ji Entakya û Qonyayê hatin û elalet kişandin aliyê
xwe. Hingê wan Pawlos dan ber keviran, ew kaş kirin derveyî ba-
jêr û gotin qey miriye. 20 Lê gava ku şagirtan dora wî girt, ew rabû
û çû nav bajêr. Dotira rojê ew bi Barnabas re çû Derbeyê.

### *Vegerîna Entakya Sûriyê*

21 Piştî ku wan Mizgînî da wî bajarî û gelek kes kirin şagirt, ew
vegeriyan Lîstra, Entakya û Qonyayê. 22 Wan dilê şagirtan xurt
dikir û ew dişidandin ku di baweriyê de bimînin û gotin: «Divê em
di gelek tengahiyan re derbas bibin û bikevin Padîşahiya Xwedê.»
23 Piştî ku wan ji bo her civînê rihspî rakirin, bi dua û rojîgirtinê ew
spartin wî Xudanê ku bawerî pê anîbûn.
24 Piştre di Pisîdyayê re derbas bûn û hatin Pamfîlyayê. 25 Li
Pergêyê jî peyva Xwedê gotin û berjêr bûn, çûn Entalyayê. 26 Ji wir
ew bi gemiyê vegeriyan Entakyayê, wê dera ku ji bo vî karê ku
biribûn serî, li kerema Xwedê hatibûn spartin. 27 Gava hatin, wan
civîna bawermendan kom kir û hemû tiştên ku Xwedê bi destê wan
kiribûn û çawa deriyê baweriyê li ber miletan vekiribû, tev gotin.
28 Û ew demeke dirêj li wir bi şagirtan re man.

### *Lihevcivîna Şandiyan a li Orşelîmê*

15 Hinek kesên ku ji Cihûstanê daketibûn Entakyayê, hînî
birayan dikirin û digotin: «Eger hûn li gor adeta Mûsa sinet
nebin, hûn nikarin xilas bibin.» 2 Îcar piştî ku wan û Pawlos û
Barnabas gelek hev birin û anîn û devjenî kirin, hingê birayan
biryar da ku Pawlos, Barnabas û hinekên din hilkişin Orşelîmê, da
ku ji bo vê yekê bi Şandî û rihspiyan re bipeyivin. 3 De îcar civînê
ew bi rê kirin. Çaxê di Fînîkya û Sameryayê* re derbas dibûn, li
ser zivirîna miletan a li Xwedê digotin û hemû bawermend pirr şa
dikirin. 4 Çaxê gihîştin Orşelîmê, ji aliyê civînê, Şandî û rihspiyan
ve hatin qebûlkirin û hemû tiştên ku Xwedê bi destê wan kiribûn,
gotin. 5 Lê hinek bawermendên ku ji mezheba Fêrisiyan* bûn,

---

15:1 Qanûna Kahîntiyê 12:3

rabûn û gotin: «Divê ku ew bên sinetkirin û emir li wan bê kirin ku
Şerîeta Mûsa pêk bînin.»
6 Şandî û rihspî ji bo ku li ser vê pirsê bipeyivin civiyan. 7 Piştî
gotûbêjeke dirêj, Petrûs rabû û got: «Birano, hûn dizanin ku berî
niha Xwedê ji nav we ez bijartim, da ku miletên din peyva Miz-
gîniyê ji min bibihîzin û baweriyê bînin. 8 Û Xwedayê ku bi dilê
mirov dizane, çawa ku Ruhê Pîroz da me, wusa da wan jî û ew erê-
kirin. 9 Wî dilê wan bi baweriyê paqij kir û tu cihêtî nexist navbera
me û wan. 10 Îcar çima hûn Xwedê diceribînin û nîrekî wusa
datînin ser stûyê şagirtan, ku ne bav û kalên me û ne jî me dikaribû
ku em hilgirin? 11 Na, lê em bawer dikin, çawa ku em bi kerema
Xudan Îsa xilas dibin, wusa jî ew xilas dibin.»
12 Hingê tevahiya civînê bêdeng ma û guhê xwe dan gotinên
Barnabas û Pawlos, yên ku Xwedê bi destê wan gelek nîşan û
karên mezin di nav miletên din de kiribûn. 13 Piştî ku wan peyivîna
xwe xilas kir, Aqûb* bersîv da û got: «Birano, guhê xwe bidin
min. 14 Şimûn* got ku çawa Xwedê pêşî hat serdana miletên din,
da ku ji nav wan xelkekî ji bo navê xwe rake. 15 Ev yek peyvên
pêxemberan jî digire, wek ku hatiye nivîsîn:

16 ‹Piştî vê yekê ezê vegerim,
Û konê Dawid ê ketî dîsa vegirim,
Derên wî yên hilweşiyayî careke din ava bikim
Û dîsa rakim.
17 Da ku hemû mirovên bi şûn de mayî
Û hemû miletên mayî yên ku navê min li ser wan e,
Li Xudan bigerin.
18 Ew Xudanê ku ji berê ve ev tişt dane zanîn, vê dibêje.›[a]

19 «Ji ber vê yekê, ez gihîştim vê biryarê ku divê em, wan ên
ku ji miletên din li Xwedê dizivirin nedin tengiyê. 20 Lê em ji wan
re binivîsin ku xwe ji tiştên ku bi pêşkêşkirina ji pûtan re murdar*
bûne, ji fuhûşiyê, ji heywanên mirar û ji xwînê dûr bixin. 21 Çimkî
hê ji demên bihûrtî ve di her bajarî de, Şerîeta Mûsa tê hînkirin û
her roja Şemiyê di kinîştan de tê xwendin.»

---

[a] **15:16-18** Ji: Amos 9:11-12; Îşaya 45:21
**15:7** Karên Şandiyan 10 **15:8** Karên Şandiyan 10:44; 2:4
**15:20** Derketin 34:15-17; Qanûna Kahîntiyê 18:6-23; 17:10-16

### *Nameya Civînê ya ji Miletan re*

22 Hingê di çavên Şandî û rihspiyan û tevahiya civînê de qenc
xuya bû ku ji nav xwe zilaman bibijêrin û bi Pawlos û Barnabas re
bişînin Entakyayê. Wan, Cihûdayê ku jê re dibêjin Barsabas û Sî-
las*, yên ku di nav birayan de sereke bûn, şandin. 23 Bi destê wan
ev name nivîsîn:

«Birayên we Şandî û rihspî, silavan li bawermendên ji miletên
din ên li Entakya, Sûriye û li Kîlîkyayê dikin.

24 Me bihîst ku hin kesên ji nav me derketine, ku me li wan
tembîh nekiriye, bi peyvên xwe hûn reht kirine û serê we tevlihev
kirine. 25 Ji bo vê yekê me hemûyan bi hev re biryar da ku em çend
kesan bibijêrin û bi birayên xwe yên hezkirî Barnabas û Pawlos re
bişînin ba we. 26 Wan herduyan di ber navê Xudanê me Îsa Mesîh
de mirin dane ber çavên xwe. 27 Loma me Cihûda û Sîlas şandin,
ku ewê bi dev jî eynî tiştan ji we re bêjin. 28 Çimkî ji Ruhê Pîroz û
ji me re jî qenc hat dîtin ku em ji van tiştên ku pêwist in pê ve,
barekî din daneynin ser pişta we. 29 Îcar hûn xwe ji tiştên ku bi pêş-
kêşkirina ji pûtan re murdar bûne, ji xwînê, ji heywanên mirar û ji
fuhûşiyê dûr bixin. Eger hûn xwe ji van tiştan biparêzin, hûnê qenc
bikin. Di aştiyê de bimînin.»

30 Îcar ew hatin şandin û daketin Entakyayê. Wan tevahiya ko-
mê civand û name dan wan. 31 Gava wan xwend, bi handana wê*
şa bûn. 32 Cihûda û Sîlas, ku ew bi xwe jî pêxember bûn, bi gelek
peyvan cesaret û hêz dan birayan. 33-34 Piştî ku ew demekê li wir
man, birayan bi aştî ew bi rê kirin ba yên ku ew şandibûn. 35 Lê
Pawlos û Barnabas li Entakyayê man û bi gelekên din re peyva
Xudan hîn kirin û Mizgînî dan.

### *Pawlos û Barnabas ji hev Vediqetin*

36 Piştî çend rojan Pawlos ji Barnabas re got: «Were, em ve-
gerin û herin her bajarê ku me peyva Xudan tê de daye bihîstin,
serekî bidin xwişk û birayan û bibînin ku ew çawa ne.» 37 Barnabas
xwest Yûhennayê ku jê re dibêjin Marqos* jî bi xwe re bibe. 38 Lê
Pawlos qenc nedît, yê ku li Pamfîlyayê ji wan veqetiya û bi wan re
hew xebitî, bi xwe re bibin. 39 Îcar devjeniyeke dijwar ket nav wan,

15:38 Karên Şandiyan 13:13

wusa ku ji hev veqetiyan. Barnabas Marqos hilda û bi gemiyê çû
Qibrisê. 40 Lê Pawlos Sîlas bijart û ket rê; birayan ew spartin
kerema Xudan. 41 Ew li Sûriye û Kîlîkyayê digeriyan û hêz didan
civînan.

### *Tîmotêyos Hevaltiya Pawlos û Sîlas Dike*

16 Hingê Pawlos hat Derbe û Lîstrayê jî. Li wir şagirtek hebû
ku navê wî Tîmotêyos* bû. Ew kurê jineke Cihû ya bawer-
mend bû; lê bavê wî ne Cihû bû. 2 Birayên ku li Lîstra û Qonyayê
bûn, li ser wî bi qencî dipeyivîn. 3 Pawlos xwest ku ew bi wî re bê;
ew hilda û ji ber Cihûyên wan deran ew sinet kir; çimkî hemûyan
dizanibû ku bavê wî ne Cihû bû. 4 Gava ku di bajaran re derbas
dibûn, biryarên ku li Orşelîmê ji aliyê Şandî û rihspiyan ve hatibûn
dayîn, didan wan, da ku wan pêk bînin. 5 Bi vî awayî civînên ba-
wermendan di baweriyê de xurt dibûn û roj bi roj hijmara wan
zêde dibû.

### *Pawlos di Dîtiniyekê de Tê Gazîkirin Mekedonyayê*

6 Ew di herêma Firîgya û Galatyayê re derbas dibûn, çimkî Ru-
hê Pîroz nehişt ku peyva Xwedê li herêma Asyayê* bêjin. 7 Çaxê
ew hatin pêşberî Mîsyayê, xwestin ku herin herêma Bîtînyayê, lê
Ruhê Îsa destûr neda wan. 8 Di ber Mîsyayê re derbas bûn, daketin
Troyayê. 9 Bi şev Pawlos di dîtiniyekê* de dît ku zilamekî Meke-
donî radiwesta, ji wî lava dikir û digot: «Derbasî Mekedonyayê
bibe û alîkariya me bike.» 10 Gava wî ev dîtinî dît, di cih de em
xebitîn ku em herin Mekedonyayê. Me jê derxist ku Xwedê gazî
me dike ku em Mizgîniyê bidin wan.

### *Zivirîna Lîdya*

11 Em ji Troyayê bi gemiyê derketin û sererast çûn Samotraxê.
Dotira rojê em gihîştin Nêyapolîsê. 12 Em ji wir çûn Filîpyayê, ku
ev der bajarekî sereke yê Mekedonyayê ye û koloniyeke* Romayê
ye. Em li vî bajêrî çend rojan man. 13 Roja Şemiyê em di dergehê
bajêr re derketin û çûn ber lêva çem, çimkî em difikirîn ku li wir
cihekî duakirinê heye. Em rûniştin û bi jinên ku li wir civiyabûn re
peyivîn. 14 Di nav wan de jineke xwedêperest a ku navê wê Lîdya
bû guhdariya me dikir. Ew ji bajarê Tiyatîrayê bû û cilên binefşî

difirotin. Xudan dilê wê vekir, da ku bi baldarî guhê xwe bide tiş-
tên ku Pawlos dibêje. 15 Çaxê ew û maliyên xwe imad* bûn, wê ji
me hêvî kir û got: «Eger hûn min bawermendeke Xudan dihe-
sibînin, kerem kin, werin mala min û li wir bimînin.» Û zor li me
kir, em birin.

### *Pawlos û Sîlas Tên Girtin*

16 Û rojekê, çaxê em diçûn cihê duakirinê, keçikeke xizmetkar
a ku ruhê falbaziyê pê re hebû, rastî me hat. Wê bi falvekirinê ji
xwediyên xwe re gelek pere dida qezenckirin. 17 Keçik li pey me û
Pawlos dihat û bi qîrîn digot: «Ev mirovên ha xizmetkarên Xwe-
dayê Herî Bilind in, ew riya xilasiyê bi we didin zanîn.» 18 Keçikê
bi rojan ev yek kir. Lê li zora Pawlos çû, zivirî û ji ruh re got: «Ez
bi navê Îsa Mesîh li te emir dikim, ji wê derkeve.» Û hema wê
gavê ruh ji wê derket.

19 Îcar gava ku xwediyên wê dîtin ku hêviya wan a qezenc-
kirina peran ji dest derket, wan Pawlos û Sîlas* girtin, kaş kirin
meydana sûkê, ba serdaran. 20 Çaxê ew anîn ba serdarên bajêr, wan
got: «Ev mirovên ha bajarê me tevlihev dikin, ev Cihû ne 21 û ade-
tên ku ji bo me Romayiyan çênabin ku em bikin, an qebûl bikin,
hîn dikin.» 22 Hingê elaletê jî êrîşî wan kir, serdarên bajêr cilên ser
wan dan çirandin û emir kirin ku bi daran li wan bixin. 23 Piştî ku
gelek li wan xistin, ew avêtin zîndanê û li qerdiyan emir kirin ku
baş çavnêriya wan bike. 24 Li ser vê emirkirinê, wî ew kirin huc-
reya hundir û lingên wan qeyd kirin.

25 Li dora nîvê şevê Pawlos û Sîlas dua dikirin û ji Xwedê re
lavije* digotin. Girtiyan jî guhdariya wan dikir. 26 Ji nişkê ve erd-
hejîneke wusa mezin çêbû ku bingehên girtîgehê veleqiyan. Û di
cih de hemû derî û zincîrên her kesî vebûn. 27 Çaxê qerdiyan hişyar
bû û dît ku deriyên zîndanê vekirî ne, şûrê xwe kişand û dikir ku
xwe bikuje. Çimkî wî got qey hemû girtî reviyane. 28 Lê Pawlos bi
dengekî bilind gazî kir û got: «Nebe tu xwe bikujî; em hemû li vir
in!» 29 Qerdiyan ronahî xwest û ket hundir, lerizî û xwe avêt ber
Pawlos û Sîlas. 30 Wî ew anîn derve û got: «Ezbenî, ez çi bikim, da
ku ez xilas bibim?» 31 Wan jî bersîv da û gotin: «Baweriya xwe bi
Xudan Îsa bîne, tu û mala te jî hûnê xilas bibin.» 32 Û wan peyva
Xudan ji wî û ji hemûyên li mala wî re gotin. 33 Hema di wê saeta

şevê de, wî ew birin û birînên wan şuştin. Û di cih de ew û hemû
maliyên wî imad bûn. [34] Wî ew derxistin mala xwe, sifre li ber wan
danî. Ew gelek şa bû ku wî û tevahiya mala wî bawerî bi Xwedê
anîn.

[35] Çaxê bû roj, serdarên bajêr wezîfedar şandin û gotin: «Wan
mirovan berdin.» [36] Hingê qerdiyan ev yek ji Pawlos re got: «Ser-
darên bajêr xeber şandin ku hûn bên berdan; de îcar derkevin û bi
silamet herin.» [37] Lê Pawlos li wan vegerand û got: «Em ên ku
hemwelatiyên* Romayî ne, bêyî ku dîwana me bê kirin, li ber xel-
kê li me xistin û em avêtin zîndanê. Niha bi dizî me derdixin? Na,
ev yek çênabe! Bila ew bi xwe bên û me derxin.» [38] Hingê wezî-
fedaran ev peyv ji serdarên bajêr re gotin. Gava wan bihîst ku ew
hemwelatiyên Romayî ne, tirsiyan. [39] Hatin, hêvî ji wan kirin, ew
deranîn û ji wan xwestin ku ji bajêr derkevin. [40] Piştî ku ji zîndanê
derketin, çûn mala Lîdyayê. Li wir xwişk û bira dîtin, han dan wan
û çûn.

### *Gengeşa li Selanîkê*

17 Piştî ku Pawlos û Sîlas di Amfîpolîs û Apolonyayê re der-
bas bûn, hatin Selanîkê. Li wir kinîşteke Cihûyan hebû. [2] Û
Pawlos, wek ku ji xwe re kiribû adet, çû ba wan û sê rojên Şe-
miyan li ser Nivîsarên Pîroz bi wan re peyivî. [3] Ji wan re şîrove kir
û îspat kir ku diviya Mesîh cefa bikişanda û ji nav miriyan rabûya
û got: «Ev Îsayê ku ez ji we re didim bihîstin, Mesîh e.» [4] Hinek ji
wan, komeke mezin ji Yewnaniyên xwedêperest û hinek jinên
xuyayî bawer kirin û beşdarî Pawlos û Sîlas* bûn. [5] Lê Cihûyan
çavnebariya wan kir, ji xelkên çarşiyê, hin mirovên xerab kişandin
aliyê xwe, elaletek civandin û di bajêr de laleşe çêkirin, êrîşî mala
Yason kirin û lê digeriyan ku wan derxin ber xelkê. [6] Lê çaxê
Pawlos û Sîlas nedîtin, wan Yason û çend birayên din kaş kirin ber
serwerên bajêr û bi qîrîn gotin: «Ev mirovên ku dinya serobino
kirine, hatine vir jî [7] û Yason ew hewandine mala xwe. Ev hemû li
hember qanûnên Qeyser radibin û dibêjin: ‹Padîşahekî din heye,
navê wî Îsa ye.›» [8] Gava elaletê û serwerên bajêr ev gotin bihîstin,
hişê wan tevlihev bû û [9] piştî ku ji Yason û yên din kefîltî standin,
ew berdan.

### *Pawlos û Sîlas Dişînin Beroyayê*

10 Hema wê şevê birayan Pawlos û Sîlas şandin Beroyayê.
Çaxê ew gihîştin wir, ew çûn kinîşta Cihûyan. 11 Ev mirovên li wir
ji yên li Selanîkê bêtir hişvekirî bûn. Wan peyv ji dil û can qebûl
kir û her roj li ser Nivîsarên Pîroz lêkolîn kirin, ka gelo ev tişt
wusa ne. 12 Îcar gelekan ji wan bawerî anî, di nav wan de jinên
Yewnanî yên qedirbilind û mêr jî ne kêm bûn. 13 Lê gava Cihûyên
Selanîkê hîn bûn ku Pawlos peyva Xwedê li Beroyayê jî daye
bihîstin, ew hatin wê derê jî, elalet têkdan û rakirin ser piyan.
14 Hingê birayan di cih de Pawlos şand ku here ber deryayê, lê
Sîlas û Tîmotêyos* hê li wir man. 15 Yên ku ew birin, ew anîn heta
Atînayê. Piştî ku ji Pawlos emir standin ku Sîlas û Tîmotêyos zûka
herin ba wî, ew paş ve vegeriyan.

### *Pawlos li Atînayê*

16 Çaxê Pawlos li Atînayê li benda wan bû û dît ku bajar bi
pûtan tije ye, ruhê wî aciz bû. 17 Îcar li kinîştê ew bi Cihûyan û bi
Yewnaniyên* xwedêperest re, li çarşiyê jî her roj rastî kê bihata
diket peyivînê. 18 Hin fîlozofên Êpîkûrî û hinên Stoayî jî bi wî re
gotûbêj kirin. Hinekan got: «Evê kelkelo dixwaze çi bêje?» Hine-
kên din jî gotin: «Wusa xuya dibe ku ew xwedayên xerîb dide
naskirin.» Çimkî wan got qey ew li ser Îsa û li ser Vejînê dipeyive.
19 Wan ew girt û anîn Aryopagosê û gotin: «Gelo em dikarin bi-
zanin, ev hîndariya nû ya ku tu didî naskirin, çi ye? 20 Tu hin tiştên
xerîb tînî guhên me û loma em dixwazin bizanin ku ev tê çi ma-
nê.» 21 Hemû Atînayî û xerîbên ku li wir diman, ji gotin û bihîstina
tiştên nû pê ve, dema xwe bi tiştên din derbas nedikirin.
22 Hingê Pawlos li navenda civîna Aryopagosê rawesta û got:
«Gelî zilamên Atînayî, ez we ji her awayî ve gelek dîndar dibînim.
23 Çaxê ez di nav bajêr de digeriyam û min qenc li tiştên ku hûn

---

17:18 Êpîkûrî: Li gor hîndariya Êpîkûr (beriya Îsa 341-270) ruh jî wek bedenê bi mirin e. Ji jiyana li ser vê erdê zêdetir jiyaneke din tune. Yê ku li dilgeşiyê digere, divê di kûrahiya ruh de lê bigere.

17:18 Stoayî: Li gor vê hîndariyê Xwedê di her tiştî de ye. Dilgeşî tenê bi revîna ji êş û zewqan dikare bê dîtin. Fîlozofê Yewnanî Zenon (beriya Îsa 335-263?) avakarê vê felsefê bû.

diperizinê* nêrî, min di nav wan de gorîgehek* dît ku li ser ni-
vîsîbû: JI XWEDAYÊ NENAS RE. Îcar vî yê ku hûn bi nezanî
diperizinê, ez bi we didim naskirin. 24 Xwedayê ku dinya û hemû
tiştên ku tê de ne çêkiriye, ewê ku Xudanê erd û ezmên e, di
perestgehên ku bi destê mirov hatine çêkirin de rûnane. 25 Wek ku
ew hewcedarê tiştekî be, bi destê mirovan ji wî re xizmet nayê
kirin; lê yê ku jiyan, hilm û her tiştî dide hemûyan, ew e. 26 Ji ba-
vekî, wî hemû miletên dinyayê afirandin û zemanên wan û sînorên
dera ku ew lê dijîn, kifş kir ku ew li ser hemû rûyê erdê rûnin.
27 Wî ev yek kir ku ew li wî bigerin û eger îmkan hebe bi dest-
pelînkê* wî bibînin, lê ew ji tu kesî ji me ne dûr e. 28 Çimkî em bi
wî dijîn, bi wî dilivin û bi wî hene.[a] Çawa ku hin ji hozanên we jî
gotine: ‹Em jî ji dûndana wî ne.›[b]
29 «Îcar ji ber ku em ji dûndana Xwedê ne, divê em nefikirin
ku Xwedê wek zêr, zîv, an wek kevirê ku bi hiş û hunerê mirov
hatiye çêkirin e. 30 Xwedê çavên xwe li demên nezanînê neqand, lê
niha ew li her derê li hemû mirovan emir dike ku tobe bikin.
31 Çimkî wî rojek kifş kiriye û ewê di wê rojê de bi destê zilamê ku
wî destnîşan kiriye bi dadperwerî* dîwana dinyayê bike. Bi raki-
rina wî ya ji nav miriyan wî ewlehî da hemûyan, ku ji bo vî karî
ew mirov hatiye destnîşankirin.»
32 Gava vejîna* miriyan bihîstin, hinekan tinazên xwe kirin; lê
yên din gotin: «Emê li ser vê yekê careke din guhê xwe bidin te».
33 Bi vî awayî Pawlos ji nav wan derket. 34 Lê hinek beşdarî wî bûn
û bawerî anîn. Di nav wan de Diyonîsiyosê endamê Aryopagosê û
jineke ku navê wê Damerîs bû û hinekên din hebûn.

### *Pawlos li Korîntê*

18 Piştî van tiştan Pawlos ji Atînayê derket û çû Korîntê. 2 Li
wir Cihûyek ku navê wî Akîlas bû dît, ku bi eslê xwe ji
Pontosê bû. Ew bi pîreka xwe Priskîla* re nû ji Îtalyayê hatibû.

---

[a] 17:28 Ev li gor gotineke nivîskarê Yewnanî Êpîmenîdos e; ew berî Îsa di sedsala şeşan de dijiya.

[b] 17:28 Ji nivîskarên Yewnanî Aratos û Kleyantos e; ew herdu berî Îsa di sedsala sisiyan de dijiyan.

17:24 1 Padîşah 8:27

Çimkî Klawdyos ferman dabû ku hemû Cihû ji Romayê derkevin.
Pawlos çû ba wan 3 û ji ber ku pîşeyê wî eynî bû, li ba wan ma û bi
wan re xebitî. Karê wan konçêkerî bû. 4 Her roja Şemiyê ew li
kinîştê diket peyivînê û dixebitî ku baweriya Cihû û Yewnaniyan
bîne.

5 Çaxê Sîlas û Tîmotêyos ji Mekedonyayê hatin, Pawlos xwe
tam da hînkirina peyvê û ji Cihûyan re şahidî dikir ku Mesîh, Îsa
ye. 6 Îcar gava ku ew li hember derketin û çêrî wî kirin, wî cilên
xwe daweşandin û got: «Bila xwîna we di stûyê we de be! Ez bêrî
me. Ji niha û pê ve ezê herim ba miletan.» 7 Hingê ew ji kinîştê
derket û çû mala mirovekî ku navê wî Tîtos Yûstos bû. Ew xwe-
dêperest bû û mala wî li kêleka kinîştê bû. 8 Serekê kinîştê Krîspos,
bi tevahiya maliyên xwe ve bawerî bi Xudan anî. Gelek Korîntiyên
ku peyva Pawlos dibihîstin, bawerî dianîn û imad* dibûn. 9 Şevekê
di dîtiniyekê de Xudan ji Pawlos re got: «Netirse, lê belê bêje û
bêdeng nemîne. 10 Çimkî ez bi te re me û tu kes destê xwe dirêjî te
nake ku te biêşîne. Ji ber ku li vî bajarî gelek gelê min heye.»
11 Ew li wê derê salekê û şeş mehan ma; wî di nav wan de peyva
Xwedê hîn dikir.

12 Îcar çaxê ku Galiyos li Axayayê* walî bû, Cihû bûn yek, li
hember Pawlos rabûn û ew derxistin ber dîwanê. 13 Wan got: «Evê
ha baweriya mirovan tîne ku bi riyên li hember qanûnê biperizin*
Xwedê.» 14 Gava Pawlos dikir ku bipeyive, Galiyos ji Cihûyan re
got: «Eger mesele neheqî an sûcekî xerab bûya, Cihûno, ji xwe
minê guhê xwe bida giliyên we. 15 Madem ku mesele li ser peyv,
nav û qanûna we ye, hûn bi xwe lê binêrin. Ez naxwazim bibim
dadgerê* van tiştan.» 16 Û wî ew ji dîwanê deranîn. 17 Hingê hemû-
yan serekê kinîştê Sostênîs girt û li ber dîwanxanê lê xistin. Lê qet
ne xema Galiyos bû.

### *Pawlos Vedigere Entakyayê*

18 Piştî ku Pawlos gelek rojan li wê derê ma, xatir ji bawer-
mendan xwest û bi gemiyê berê xwe da aliyê Sûriyê. Priskîla* û
Akîlas jî bi wî re bûn. Wî li Kenxêryayê porê xwe kur kir, çimkî
nedreke* wî hebû. 19 Çaxê ew gihîştin Efesê, wî ew li wê derê

---

**18:18** Hijmartin 6:18

hiştin, ew bi xwe çû hundirê kinîştê û bi Cihûyan re ket peyivînê.
20 Gava wan jê xwest ku ew hê demeke dirêj bimîne, ew razî nebû.
21 Lê çaxê xatir ji wan xwest, got: «Xwedê hez bike, ezê dîsa vegerim ba we.» Piştre bi gemiyê ji Efesê derket.
22 Gava hat Qeyseriyê, hilkişiya Orşelîmê, silav li civînê kir û daket Entakyayê.

### *Apolos li Efesê Mizgîniyê dide*

23 Piştî ku Pawlos demekê li wir ma, derket rê, li herêma Galatya û Firîgyayê cih bi cih çû her derê û hêz da hemû şagirtan.
24 Îcar Cihûyekî ku navê wî Apolos, bi eslê xwe ji Skenderyayê
û zanebêj bû, hat Efesê. Wî Nivîsarên Pîroz qenc dizanibû. 25 Di
Riya* Xudan de hatibû perwerdekirin, bi kelegermiya ruh li ser Îsa
rast dipeyivî û hîn dikir, lê tenê imadkirina* Yûhenna dizanibû.
26 Wî dest pê kir, li kinîştê bi ziravî peyivî. Gava Priskîla û Akîlas
ew bihîstin, ew birin ba xwe û riya Xwedê hê rastir ji wî re şîrove
kirin. 27 Gava Apolos xwest ku here Axayayê*, birayan cesaret
danê û ji bo ku wî qebûl bikin name ji şagirtan re nivîsîn. Îcar gava
gihîşt wê derê, wî gelek alîkariya wan ên ku bi keremê bawerî
anîbûn kir. 28 Çimkî wî bi eşkereyî dengê Cihûyan dibirrî û bi Nivîsarên Pîroz nîşan dida ku Mesîh, Îsa ye.

### *Pawlos li Efesê*

19 Îcar gava ku Apolos hê li Korîntê bû, Pawlos di herêmên navîn re derbas bû û hat Efesê û li wir çend şagirt dîtin.
2 Wî ji wan re got: «Ma gava ku we bawerî anî, we Ruhê Pîroz
stand?» Wan lê vegerand û gotin: «Na, me qet nebihîstiye jî ku
Ruhê Pîroz heye.» 3 Hingê wî got: «Lê hûn bi çi imadê hatine
imadkirin*?» Wan got: «Bi imada Yûhenna.» 4 Pawlos got: «Imada Yûhenna li ser tobekirinê bû û ji xelkê re digot ku baweriyê bi
wî yê ku piştî wî tê bînin, yanî bi Îsa.» 5 Îcar gava ku ev bihîstin, bi
navê Xudan Îsa imad bûn. 6 Çaxê Pawlos destên xwe danîn ser
wan, Ruhê Pîroz hat ser wan, bi zimanên* din peyivîn û pêxemberîtî kirin. 7 Ew hemû li dora diwanzdeh zilaman bûn.
8 Pawlos ket kinîştê, bi qasî sê mehan bi ziravî peyivî, li ser

---

**19:4** Lûqa 3:1-18

Padîşahiya Xwedê ket peyivînê û baweriya mirovan dianî. 9 Çaxê
hinekan serhişkî kir, bawer nekirin û li ber xelkê bi xerabî li ser
Riyê peyivîn, wî dev ji wan berda, şagirt ji wan veqetandin û her
roj di dersxana Tîranos de diket peyivînê. 10 Vê yekê bi qasî du sa-
lan kişand; bi vî awayî hemû yên ku li herêma Asyayê* rûdiniştin,
hem Cihû û hem jî miletên din peyva Xudan bihîstin.

### *Kurên Skêwa*

11 Xwedê bi destê Pawlos gelek kerametên nedîtî kirin. 12 Heta,
çaxê ew destmal û pêşmalên ku li wî ketibûn ji nexweşan re di-
birin, nexweşiya wan diçû û ruhên xerab ji wan derdiketin. 13 Îcar
di nav Cihûyan de hin gerokên ku cin derdixistin, dest pê kirin li
ser yên ku bi ruhên xerab ketibûn, gazî navê Xudan Îsa kirin û
gotin: «Ez bi navê Îsayê ku Pawlos dide bihîstin, li we emir dikim
ku hûn derkevin.» 14 Heft kurên serekkahînekî Cihûyan ê bi navê
Skêwa, ev yek dikirin. 15 Lê ruhê xerab li wan vegerand û got: «Ez
Îsa nas dikim û bi Pawlos jî dizanim, lê hûn kî ne?» 16 Hingê mi-
rovê ku ruhê xerab pê re bû xwe avêt ser wan, zora hemûyan bir,
wusa ku ew tazî û birîndar ji wê malê derketin. 17 Çaxê ev yek ji
aliyê hemû Cihû û miletên din ên ku li Efesê rûdiniştin ve hat
bihîstin, tirs ket ser hemûyan û navê Xudan Îsa hat bilindkirin.
18 Gelek ji wan ên ku bawerî anîbûn, dihatin, gunehên xwe eşkere
dikirin û kirinên xwe digotin. 19 Gelek ji wan ên ku sêrbazî dikirin,
kitêbên xwe civandin û li ber hemûyan şewitandin. Bihayê wan
kitêban hat hesabkirin, pêncî hezar zîv* digirt. 20 Bi vî awayî peyva
Xudan hê bêtir belav dibû û hêzdar dibû.

### *Li Efesê Hengame*

21 Piştî ku ev tişt çêbûn, Pawlos di ruh de biryar da ku di Me-
kedonya û Axayayê* re derbas bibe û here Orşelîmê. Wî got: «Piş-
tî ku ez herim wê derê, divê ez Romayê jî bibînim.» 22 Wî du
alîkarên xwe, Tîmotêyos û Erastos* şandin Mekedonyayê û ew bi
xwe demeke din jî li herêma Asyayê ma.

23 Di wê demê de tevliheviyeke ne hindik li ser Riyê derket.
24 Mirovekî zîvker ê ku navê wî Dîmîtriyos bû, ji zîv perestgehên
biçûk ên Artemîsê* çêdikirin û bi vê yekê gelek kar ji pîşekaran re
derdixist. 25 Dîmîtriyos ev kesên ha û yên ku bi karên weha ve

mijûl dibûn li hev civandin û got: «Gelî hevalan, hûn dizanin ku
dewlemendiya me ji vî karî ye. [26] Hûn dibînin û dibihîzin ku ne
tenê li Efesê, hema bêje li tevahiya herêma Asyayê, ev Pawlosê ha
dibêje: ‹Yên ku bi destan hatine çêkirin ne xwedê ne› û wî ba-
weriya gelek mirovan aniye û ji rê derxistine. [27] Îcar talûke ne tenê
ew e ku ev pîşeyê me ji giramiya* xwe dikeve, lê ev e ku perest-
geha xwedaya mezin Artemîs bi tiştekî nayê hesabkirin û mezi-
nahiya wê ya ku li tevahiya herêma Asya û li dinyayê tê perizîn,
bêqedir dibe.»
[28] Gava ev yek bihîstin, ew bi hêrsê tije bûn û bi qîrîn gotin:
«Artemîsa Efesiyan mezin e!» [29] Bajar tevlihev bû, hevalriyên
Pawlos, Gayos û Erîstarxosê* Mekedonî bi xwe re kaş kirin û tev
bi hev re zêriyan ber tiyatroyê. [30] Pawlos xwest ku bikeve nav
elaletê, lê şagirtan nehişt. [31] Hin serwerên herêma Asyayê, yên ku
dostên wî bûn, xeber jê re şandin û jê hêvî kirin ku neçe tiyatroyê.
[32] Îcar hinekan tiştek, hinekên din jî tiştekî din diqîriyan; çimkî
elalet tevlihev bû û gelekan ji wan nizanibû ku ji bo çi kom bûne.
[33] Hinekan ji elaletê, Skenderê ku Cihûyan dabû pêş, derxistin na-
vendê. Skender destê xwe bilind kir û xwest ku li hember elaletê
xwe biparêze. [34] Lê çaxê fêm kirin ku ew Cihû ye, bi qasî du saetan
tev bi hev re qîriyan û gotin: «Artemîsa Efesiyan mezin e!» [35] Îcar
çaxê nivîskarê bajêr elalet bêdeng kir, got: «Gelî Efesiyan! Ma li
vir kî heye ku nezane bajarê Efesê parêzgerê perestgeha Artemîsa
mezin û parêzgerê kevirê wê yê ku ji ezmên hatiye xwarê ye? [36] Ji
xwe ev tişt nayên înkarkirin. Îcar divê hûn bêdeng bin û tiştekî
bêpewre* nekin. [37] Ev zilamên ku we anîne vir ne dizên perestgehê
ne û ne jî çêrî xwedaya me kirine. [38] Îcar, eger giliyê Dîmîtriyos û
pîşekarên bi wî re, li hember kesekî hebe, dadgeh* vekirî ne û walî
hene. Bila ew hevdû sûcdar bikin. [39] Lê eger hûn ji wê zêdetir tiş-
tekî bixwazin, bila di civîna resmî de lê bê nêrîn. [40] Çimkî talûke
ev e ku ji bo van tiştên ku îro çêbûne, em dikarin bi serhildanekê
bên sûcdarkirin û ji ber ku sedem tune, em nikarin hesabê vê tev-
liheviyê jî bidin.» [41] Piştî ku wî ev got, civîn belav kir.

### *Pawlos Diçe Mekedonya û Yewnanistanê*

20 Piştî ku hengame rawesta, Pawlos şand pey şagirtan,
cesaret da wan, xatir ji wan xwest û berê xwe da riya

Mekedonyayê. [2] Çaxê di van herêman re derbas bû bi gelek peyvan
cesaret da bawermendan û hat Yewnanistanê. [3] Ew sê mehan li wê
derê ma. Gava wî karê xwe kir ku here Sûriyê, Cihûyan li hember
wî gêrûfenek çêkir. Loma wî biryar da ku di riya Mekedonyayê re
vegere. [4] Ji Beroyayê Sopatrosê kurê Pîros, ji Selanîkiyan Erîs-
tarxos* û Sêkûndos, Gayosê Derbeyî û Tîmotêyos* û ji herêma
Asyayê* Tixîkos* û Trofîmos* bi wî re rêwîtî kirin. [5] Ev berî me
çûbûn û li Troyayê li benda me bûn. [6] Em jî piştî rojên Cejna*
Nanê Şkeva bi gemiyê ji Filîpyayê bi rê ketin û di pênc rojan de li
Troyayê gihîştin ba wan. Em li wir heft rojan man.

## *Saxbûna Eytûxos*

[7] Di roja pêşî ya heftiyê de, çaxê em civiyan ku nên bişkênin,
Pawlos bi wan re dipeyivî û ji ber ku wî dixwest dotira rojê biçûya,
peyivîna xwe heta nîvê şevê dirêj kir. [8] Li oda jorîn a ku em lê
civiyabûn, gelek çira hebûn. [9] Xortekî ku navê wî Eytûxos bû di
pencerê de rûdinişt, ket xeweke giran. Pawlos peyivîna xwe gelek
dirêj kir, Eytûxos bi xewê ve çû, ji qata sisiyan ket xwarê û miriyî
hat hildan. [10] Lê Pawlos çû jêr, bi ser wî de xwar bû, ew himbêz kir
û got: «Nekin qîrîn, ruh hatê.» [11] Piştre Pawlos derket jorê, nan
şkand û xwar, heta ku roj derket bi wan re dûr û dirêj peyivî û rabû
çû. [12] Û xort saxbûyî anîn hundir û gelek dilşa bûn.

## *Rêwîtiya Mîletosê*

[13] Em li gemiyê siwar bûn û ber bi Asosê ve çûn. Niyeta me
ew bû ku em ji wir Pawlos bistînin gemiyê. Çimkî wî biryar dabû
ku peya here. [14] Ew li Asosê hat pêşiya me, me ew hilda gemiyê û
em gihîştin Mitîlînê. [15] Em ji wê derê bi gemiyê çûn û dotira rojê
em gihîştin pêşberî Xiyosê. Roja din em di Samosê re derbas bûn û
dotira rojê gihîştin Mîletosê. [16] Çimkî Pawlos biryar dabû ku bi
gemiyê bêrawestin di ber Efesê re derbas bibe, da ku dema xwe li
herêma Asyayê nebihûrîne. Wî dilezand, ku eger çêbe, di Roja*
Pentîkostê de li Orşelîmê be.

---

20:15 «Xiyos», yanî «Sakiz», bi Kurdî «Girava Benişt»; «Samos», yanî «Sîsam».

### *Pawlos bi Rihspiyên Efesê re Dipeyive*

[17] Pawlos ji Mîletosê xeber şand Efesê û rihspiyên civînê gazî
ba xwe kirin. [18] Çaxê ew hatin ba wî, wî ji wan re got: «Hûn bi
xwe dizanin, ji roja pêşî ve gava ku min lingê xwe avêtiye herêma
Asyayê heta niha, ez çawa di nav we de rabûm û rûniştim. [19] Min
bi hemû dilnizmî û bi hêstirên çavan di nav wan ceribandinên ku ji
gêrûfenên Cihûyan hatin serê min, ji Xudan re xizmet kir. [20] Min
xwe ji gotina tu tiştên ku ji bo we kêr tên neda paş, lê min hem bi
eşkereyî hînî we kir û hem jî ez mal bi mal geriyam. [21] Min hem ji
Cihû û hem ji miletên din re şahidî kir ku li Xwedê vegerin û
baweriyê bi Xudanê me Îsa bînin. [22] Û va ye, niha ez bi daxwaza
Ruh girêdayî diçim Orşelîmê û ez nizanim li wir wê çi bê serê min.
[23] Bi tenê ez dizanim ku Ruhê Pîroz li her bajarî ji min re şahidiyê
dike ku zincîr û tengahî li benda min in. [24] Lê belê ez tu qîmetê
nadim xwe bi xwe; armanca min bi tenê ev e ku ez berpirsiyariya
xwe û wê xizmeta ku min ji Xudan Îsa standiye bînim serî, ku ez
şahidiya Mizgîniya kerema Xwedê bikim.
[25] «Va ye, ez dizanim, hûn hemû yên ku ez di nav we de geri-
yam û min Padîşahî da bihîstin, êdî hûn rûyê min nabînin. [26] Ji ber
vê yekê di roja îro de ez ji we re şahidiyê dikim ku ez ji xwîna her
kesî bêrî me. [27] Çimkî min xwe neda paş, min hemû daxwaza
Xwedê ji we re got. [28] Îcar hay ji xwe û ji hemû keriyê ku Ruhê
Pîroz hûn di nav de kirine çavdêr, hebin. Şivantiya civîna bawer-
mendan a Xwedê bikin a ku wî bi xwîna Kurê xwe bi dest xistiye.
[29] Ez dizanim piştî çûyîna min, gurên har ên ku kerî nadirixînin*,
wê bikevin nav we. [30] Heta ji nav we bi xwe jî zilam wê derkevin û
tiştên xwarûvîç bêjin, da ku şagirtan li pey xwe bibin. [31] Ji ber vê
yekê hişyar bimînin, ji bîr nekin ku sê salan bi şev û bi roj, bi
hêstirên çavan min dev ji hişyarkirina her yekî ji we berneda. [32] Û
niha ez we dispêrim Xwedê û peyva kerema wî. Ew peyv dikare
we ava bike û di nav hemûyên ku hatine pîrozkirin de mîrasê bide
we. [33] Min çav neda zîv an zêr an cilên tu kesî. [34] Hûn bi xwe
dizanin ku ev destên ha hem ji bo hewcedariya min û hem jî ji bo
hewcedariyên wan ên ku bi min re ne xebitîn. [35] Min di her tiştî de
nîşanî we da, ku divê em bi vî awayî gelek bixebitin û alîkariya
bêhêzan bikin û peyvên Xudan Îsa bînin bîra xwe; wî bi xwe digot:
‹Bextewariya dayînê ji ya standinê meztir e.›»

36 Piştî ku ev tişt gotin, ew bi hemûyan re çû ser çokan û dua
kir. 37 Hemû gelek giriyan, xwe avêtin stûyê Pawlos û ew ramûsan.
38 Hê bêtir ji ber wê peyva ku wî gotibû: «Êdî hûn rûyê min
nabînin» keder girtin. Piştre ew birin heta ba gemiyê û bi rê kirin.

### *Pawlos Vedigere Orşelîmê*

21 Îcar gava em ji wan veqetiyan û bi gemiyê ketin rê, sererast
em hatin Kosê. Dotira rojê em gihîştin Rodosê û ji wir jî
em hatin Patarayê. 2 Me gemiyeke ku diçû Fînîkyayê dît, em li wê
siwar bûn û bi rê ketin. 3 Gava ku Qibris xuya bû, me ew li milê
çepê hişt, em bi aliyê Sûriyê ve çûn û li bajarê Sûrê rawestan,
çimkî diviya barê gemiyê li wir bihata valakirin. 4 Me şagirt dîtin û
em heft rojan li wê derê man. Wan bi Ruh ji Pawlos re digot ku ew
neçe Orşelîmê. 5 Îcar çaxê me rojên xwe li wir temam kirin, em
rabûn û bi rê ketin. Hemû bi jin û zarokên xwe ve heta derveyî
bajêr em bi rê kirin. Li wir, li ber lêva deryayê em çûn ser çokan,
me dua kir û 6 me xatir ji hevdû xwest. Piştre em ketin gemiyê û
ew jî vegeriyan malên xwe.
7 Çaxê me rêwîtiya xwe ya Sûrê temam kir, em gihîştin Pito-
lêmayê, me silav li xwişk û birayan kir û em rojekê bi wan re man.
8 Dotira rojê em ji wir derketin û hatin Qeyseriyê. Em çûn mala
Filîposê mizgînvan, yê ku yek ji heftan bû û em li ba wî man.
9 Çar keçên wî yên mêrnekirî yên ku pêxemberîtî dikirin hebûn.
10 Çaxê em li wir gelek rojan man, pêxemberekî ku navê wî Haga-
bos bû ji Cihûstanê daket û hat. 11 Ew hat ba me, piştênka Pawlos
hilda, bi wê dest û lingên xwe girê dan û got: «Ruhê Pîroz weha
dibêje: ‹Li Orşelîmê Cihû wê xwediyê vê piştênkê weha girê bidin
û wî bidin destê miletan.›» 12 Gava me ev bihîst, em û xelkê li wê
derê me ji Pawlos hêvî kir ku neçe Orşelîmê. 13 Hingê Pawlos ber-
sîv da û got: «Ev çi ye hûn dikin; hûn digirîn û dilê min dişkênin?
Ez ne tenê ji girêdanê re, lê ez di ber navê Xudan Îsa de li Orşe-
lîmê ji mirinê re jî amade me.» 14 Çaxê ku wî qîma xwe neanî, em
bêdeng man û me got: «Bila daxwaza Xudan be.»
15 Piştî wan rojan me xwe amade kir û em hilkişiyan Orşelîmê.
16 Hin şagirtên ji Qeyseriyê jî bi me re hatin û em anîn mala

**21:8** Karên Şandiyan 6:1-6; 8:5 **21:10** Karên Şandiyan 11:28

Minasonê Qibrisî. Ew şagirtekî kevin bû û emê li mala wî bibûna mêvan.

### *Pawlos li Orşelîmê Diçe Serdana Aqûb*

[17] Gava em gihîştin Orşelîmê, birayan bi şahî em qebûl kirin.
[18] Dotira rojê Pawlos bi me re hat ba Aqûb*. Hemû rihspî jî amade
bûn. [19] Piştî ku Pawlos silav li wan kir, wî ew tiştên ku Xwedê bi
xizmeta wî di nav miletan de kiribûn, yek bi yek gotin. [20] Gava ku
wan ev bihîst, pesnê Xwedê dan û ji Pawlos re gotin: «Birawo, tu dibînî ku di nav Cihûyan de çend hezar mirov hene ku bawerî anîne û hemû jî ji bo Şerîetê xîretkêş in. [21] Wan li ser te bihîstiye
ku tu hemû Cihûyên di nav miletan de hîn dikî ku dev ji Mûsa berdin û tu dibêjî ku bila ew kurên xwe sinet nekin û li pey adetan
neçin. [22] Îcar em çi bikin? Bêguman wê bibihîzin ku tu hatiyî.
[23] Loma ya ku em ji te re dibêjin, bike. Çar zilamên me yên ku
nedreke* wan heye, hene. [24] Wan bi xwe re bibe û bi wan re xwe li gor adetan paqij bike û xercê wan bide, da ku ew bikarin porê xwe kur bikin. Hingê hemû wê bizanin tiştên ku li ser te hatine gotin ne
rast in û tu bi xwe jî li pey Şerîetê diçî. [25] Îcar heçî yên ji nav miletên din ku bawerî anîne, me biryar daye û ji wan re nivîsiye ku divê ew xwe ji xwarina ku ji pûtan re tê gorîkirin, ji xwînê, ji
heywanên mirar û ji fuhûşiyê dûr bixin.» [26] Hingê Pawlos ew zilam hildan, dotira rojê li gor adetan xwe paqij kir, bi wan re ket Perestgehê û diyar kir ku rojên paqijbûnê yên ku wê gorî ji bo her yekî ji wan bê dayîn, wê kengê temam bibin.

### *Pawlos di Perestgehê de Tê Girtin*

[27] Çaxê ev heft roj li ber temambûnê bûn, Cihûyên ku ji herêma Asyayê bûn ew di Perestgehê de dîtin, tevahiya elaletê têkdan.
Wan ew girt, [28] qîriyan û gotin: «Ey Îsraêlîno, werin alîkariyê! Ew mirovê ku li her derê li hember gelê me, li hember Şerîetê û li hember vî cihî hînî her kesî dike, ev e. Bi ser de jî wî hin kesên ku
ne Cihû ne anîne Perestgehê û ev cihê pîroz herimandiye.» [29] Çimkî wan, berî hingê di nav bajêr de Trofîmosê* Efesî bi wî re
dîtibûn û wan digot qey Pawlos ew aniye Perestgehê. [30] Hingê

---

21:23 Hijmartin 6:13-21 21:25 Karên Şandiyan 15:29

tevahiya bajêr rabû ser lingan û elalet bi lez kom bû. Pawlos girtin
û kaş kirin derveyî Perestgehê. Dergehên Perestgehê di cih de
hatin girtin. 31 Hê ew dixebitîn ku wî bikujin, gotina ku tevahiya
Orşelîmê tevlihev bûye gihîşt serhezarê tabûra* leşkeran. 32 Wî jî
zûka leşker û sersed* hildan û bi ser wan de hat. Gava wan serhe-
zar û leşker dîtin, dev ji lêxistina Pawlos berdan. 33 Hingê serhezar
hat, ew girt û emir kir ku bi du zincîran bê girêdan. Wî pirsyar kir
ku ew kî ye û wî çi kiriye. 34 Ji ber ku ji elaletê her yekî tiştek digot
û dikirin qîrîn, wî ji ber hengameyê ya rast fêm nekir û emir kir ku
wî bînin leşkergehê. 35 Gava Pawlos gihîşt ber derenceyan, ji ber
zorkirina elaletê, leşker mecbûr man ku wî hilgirin. 36 Çimkî ela-
leta ku li pey dihat diqîriya û digot: «Wî bikujin!»

*Pawlos Xwe Diparêze*

37 Gava dikirin ku Pawlos bibin leşkergehê, wî ji serhezar re
got: «Ma ez dikarim ji te re tiştekî bêjim?» Wî jî lê vegerand û got:
«Ma tu bi Yewnanî dizanî? 38 Hingê lazim e, tu ne yê Misrî bî, yê
ku berî demekê serhildanek çêkir û çar hezar mêrkuj derxistin ço-
lê?» 39 Pawlos lê vegerand: «Ez mirovekî Cihû me, ji Tarsûsa Kî-
lîkyayê me, ez hemwelatiyê bajarekî girîng im. Ez ji te hêvî dikim,
destûrê bide ku ez ji gel re bipeyivim. 40 Çaxê wî destûr dayê, Paw-
los li ser derenceyan rawesta û destê xwe hilda, da ku xelk bêdeng
bibe. Gava ku bêpêjiniyeke mezin çêbû, ew bi zimanê Îbranî* pe-
yivî û got:

22 «Bav û birano, niha guhê xwe bidin parastina ku ez li ber
we dikim.» 2 Gava wan bihîst ku ji wan re Îbranî* dipeyive,
ew bêtir bêdeng man. Hingê wî got: 3 «Ez zilamekî Cihû me, li
Tarsûsa Kîlîkyayê hatime dinyayê, lê ez li vî bajarî mezin bûme, li
ber lingên Gamalyêl bi tûndî li gor Şerîeta bav û kalan hatime
perwerdekirin û wek îro we hemûyan, ez jî ji bo Xwedê xîretkêş
bûm. 4 Min heta bi kuştinê jî tengahî da wan ên ku di vê Riyê de
bûn, min hem jin û hem jî mêr girêdidan û davêtin zîndanê. 5 Se-
rokkahîn û tevahiya civîna rihspiyan dikarin li ser vê yekê şahidiyê
ji min re bikin. Min ji wan nameyek ji bo birayên li Şamê stand û

---

22:3 Karên Şandiyan 5:34-39 22:4 Karên Şandiyan 8:3; 26:9-11

ez çûm wê derê, da ku ez yên ku li wir bûn, girêdayî bi xwe re
bînim Orşelîmê, ku ew bên cezakirin.
6 «Îcar gava ku ez di rê de bûm û nêzîkî Şamê dibûm, li dora
nîvro, ji nişkê ve ji ezmên ronahiyeke mezin li dora min şewq da.
7 Ez ketim erdê û min dengek bihîst ku ji min re digot: ‹Şawûl,
Şawûl, tu çima tengahiyê didî min?› 8 Min bersîv da û got: ‹Ya
Xudan, tu kî yî?› Hingê wî ji min re got: ‹Ez Îsayê Nisretî me, yê
ku tu tengahiyê didiyê.› 9 Îcar yên ku bi min re bûn ronahî dîtin, lê
dengê yê ku bi min re dipeyivî nebihîstin. 10 Min got: ‹Ez çi bikim,
ya Xudan?› Xudan ji min re got: ‹Rabe û here Şamê, her tiştê ku
divê tu bikî, wê li wir ji te re bê gotin.› 11 Çaxê ku ji ber şewqa wê
ronahiyê min hew dît, yên ku bi min re bûn bi destê min girtin û ez
birim Şamê.
12 «Zilamekî ku navê wî Hananya bû li wir rûdinişt, li gor
Şerîetê xwedêtirs bû û hemû Cihû li ser wî bi qencî dipeyivîn.
13 Ew hat ba min, rawesta û ji min re got: ‹Birayê Şawûl, bila
çavên te bibînin!› Û hema di wê gavê de çavên min vebûn û min
ew dît. 14 Wî ji min re got: ‹Xwedayê bav û kalên me tu bijartî, da
ku tu daxwaza wî bizanî, wî yê Rast bibînî û dengê wî bibihîzî.
15 Çimkî ji bo tiştên ku te dîtine û bihîstine, tê ji hemû mirovan re
bibî şahidê wî. 16 Îcar tu li benda çi yî? Rabe, imad bibe, gazî navê
wî bike û ji gunehên xwe were şuştin.›
17 «Îcar çaxê ku ez vegeriyam Orşelîmê û min di Perestgehê de
dua dikir, ez ji hişê xwe çûm, 18 min ew dît û wî ji min re got:
‹Bilezîne û zûka ji Orşelîmê derkeve, çimkî ew şahidiya te ya li ser
min qebûl nakin.› 19 Û min got: ‹Ya Xudan, ew bi xwe jî dizanin
ku li her kinîştê min li yên ku bawerî bi te dianîn dixist û ew da-
vêtin zîndanê. 20 Gava ku xwîna şahidê te Steyfan rijiya, ez bi xwe
jî li wir radiwestam. Ez bi wê yekê razî bûm û min çavdêriya cilên
wan ên ku ew kuştin, kir.› 21 Û Xudan ji min re got: ‹Here, çimkî
ezê te bişînim cihên dûr ba miletan.›»

### *Hemwelatiya Pawlos a Romayî*

22 Heta van peyvan xelkê guhdariya wî kir, lê piştre qîriyan,
gotin: «Mirovekî weha ji rûyê erdê rake! Divê yên weha nejîn!»

---

**22:20** Karên Şandiyan 7:58

23 Çaxê ew diqîriyan, ebayên xwe davêtin û toz divirvirandin he-
wayê, 24 serhezar emir kir ku wî bînin leşkergehê, bidin ber qam-
çiyan û bikişînin pirsyariyê, da ku hîn bibe, ka ev elalet çima weha
li hember wî diqîre. 25 Lê gava ku wan ew bi qayîşên çermîn girê-
dan, Pawlos ji sersedê ku li ba wî radiwesta re got: «Ma li gor
qanûnê ye, ku hûn hemwelatiyekî* Romayî, hê berî ku bê dîwan-
kirin, bidin ber qamçiyan?» 26 Gava sersed ev yek bihîst, ew çû ba
serhezar û jê re got: «Tu çi dikî? Ev mirov hemwelatiyê Romayê
ye!» 27 Serhezar hat û ji Pawlos pirsî: «Ji min re bêje: Tu hem-
welatiyê Romayî yî?» Wî got: «Erê.» 28 Serhezar bersîv da û got:
«Min bi gelek peran ev hemwelatî bi dest xistiye.» Pawlos got:
«Lê ez hemwelatî hatim dinyayê.» 29 Di cih de yên ku wê ew
bikişandana pirsyariyê, xwe jê dan aliyekî. Serhezar bi xwe jî çaxê
fêm kir ku ew hemwelatiyê Romayê ye tirsiya, çimkî ew girê dabû.

### *Pawlos li ber Civîna Giregiran*

30 Dotira rojê wî xwest ku rast hîn bibe ka çima Pawlos ji aliyê
Cihûyan ve tê sûcdarkirin. Wî zincîrên Pawlos vekirin û li serekên
kahînan* û li hemû civîna giregiran emir kir ku bicivin. Wî Pawlos
anî xwarê û li ber wan da rawestandin.

23 Pawlos bi baldarî li civîna giregiran nêrî û got: «Gelî bira-
yan! Ez heta îro li ber Xwedê bi wijdaneke paqij jiyam.»
2 Li ser vê yekê Serokkahîn Hananya, li yên ku nêzîkî wî bûn emir
kir ku li devê wî bixin. 3 Hingê Pawlos ji wî re got: «Ey dîwarê
spîkirî, Xwedê wê li te bixe! Tu li wir rûniştî yî ku li gor Şerîetê
dîwana min bikî, ma tu li dijî Şerîetê emir dikî ku li min bixin?»
4 Yên ku nêzîkî wî bûn gotin: «Ma tu Serokkahînê Xwedê nizim
dikî?» 5 Pawlos got: «Birano, min nizanibû ku ew Serokkahîn e;
çimkî hatiye nivîsîn: ‹Tiştekî xerab ji serokê gelê xwe re nebêje.›[a] »
6 Çaxê Pawlos fêm kir ku hinek ji wan Fêrisî* û hinek ji wan jî
Sadûqî* ne, di civîna giregiran de bi dengekî bilind got: «Birano,
ez Fêrisî me, kurê Fêrisiyan im. Ji ber hêviya ku mirî wê vejîn*,
dîwana min tê kirin.» 7 Çaxê wî ev got, di navbera Fêrisî û

---

[a] 23:5 Ji: Derketin 22:28
23:3 Metta 23:27-28

Sadûqiyan de devjenî çêbû û civîn bû du bend. [8] – Çimkî Sadûqî
dibêjin vejîn, milyaket û ruh tune; lê Fêrisî hemûyan jî qebûl dikin. –
[9] Hingê hengameyeke mezin çêbû, hinek Şerîetzanên ji Fêrisiyan
rabûn, xwe kişandin wan û gotin: «Em tu xerabiya vî mirovî na-
bînin. Eger ruh an milyaketekî ji wî re gotibe, wê çi bibe?» [10] Gava
ku bihevketin zêde bû, serhezar tirsiya ku Pawlos perçe bikin.
Emir li leşkeran kir ku herin jêr, bi zorê wî ji nav wan hildin û
bînin leşkergehê.

[11] Dotira şevê Xudan li ba wî rawesta û got: «Bi zirav be! Te
çawa li Orşelîmê ji bo min şahidî da, divê tu wusa li Romayê jî ji
bo min şahidiyê bidî.»

*Niyeta Kuştina Pawlos*

[12] Çaxê bû sibe Cihûyan gotina xwe kir yek û sond xwarin, he-
ta ku Pawlos nekujin, ne bixwin û ne jî vexwin. [13] Yên ku ev sond
xwaribûn ji çilî zêdetir bûn. [14] Ew çûn ba serekên kahînan û rihspi-
yan û gotin: «Me hişk sond xwariye, heta ku em Pawlos nekujin,
em qet tiştekî tam nakin. [15] Îcar hûn û civîna giregiran, ji serhezar
bixwazin ku wî bîne xwarê ba we, wek ku hûnê lêkolîneke hê ras-
tir li ser Pawlos bikin. Em jî amade ne, hê beriya ku ew bigihîje,
em wî bikujin.»

[16] Lê xwarziyê Pawlos, bi vê kemîna wan hesiya, çû ket leşker-
gehê û ji Pawlos re got. [17] Pawlos jî gazî sersedekî kir û got: «Vî
xortê ha bibe ba serhezar, çimkî tiştekî ku jê re bêje heye.» [18] Îcar
sersed ew hilda, anî ba serhezar û got: «Pawlosê girtî gazî min kir
û ji min xwest ku ez vî xortî bînim ba te. Tiştekî ku ji te re bêje
heye.» [19] Serhezar bi destê wî girt, ew xewle kir û jê re got: «Tiştê
ku tê ji min re bêjî çi ye?» [20] Wî bersîv da û got: «Cihûyan ya xwe
kirine yek ku hêvî ji te bikin ku tu sibê Pawlos bînî ber civîna
giregiran, wek ku hê rastir li ser wî bikolin. [21] Lê tu guhê xwe nede
wan, çimkî ji nav wan ji çil zilaman zêdetir di kemînê de li benda
wî ne. Wan sond xwariye, heta ku wî nekujin, ew ne bixwin û ne jî
vexwin. Niha ew amade ne û li benda razîbûna te ne.» [22] Hingê
serhezar ew berda û li wî emir kir û got: «Ji kesî re nebêje ku te ev
ji min re gotiye.»

---

**23:8** Lûqa 20:27

### *Pawlos Dişînin ba Felîksê Walî*

23 Îcar serhezar gazî du sersedan kir û ji wan re got: «Du sed
leşker, heftê siwar û du sed rimdarî amade bikin ku îşev saet di
nehan de herin Qeyseriyê. 24 Wusa jî heywanan peyda bikin, da ku
Pawlos siwar bikin û bi ewlehî wî bibin ba walî Felîks.» 25 Wî
nameyek bi vî awayî nivîsî:
26 «Klawdyos Lûsyos silavan li waliyê giranbiha Felîks dike.
27 Ev zilam ji aliyê Cihûyan ve hatibû girtin û li ber kuştinê bû; lê
çaxê ez hîn bûm ku ew hemwelatiyê Romayê ye, ez bi leşkeran ve
çûm ser wan û min ew ji destê wan xilas kir. 28 Ji bo ku ez sedemê
sûcdarkirina wî hîn bibim, min ew daxist ber civîna wan a gire-
giran. 29 Min dît ku ew ji ber pirsên Şerîeta xwe wî sûcdar dikin, lê
tiştekî ku ji ber bê kuştin an girtin, tune. 30 Çaxê ez hîn bûm ku
gerûfenek li hember wî tê çêkirin, min zûka ew şand ba te. Min
tembîh li wan ên ku wî sûcdar dikin jî kir, ku li ber te ya li hember
wî bêjin.»
31 Îcar leşkeran, wek ku emir li wan hatibû kirin, Pawlos hildan
û bi şev ew birin Antîpatrîsê. 32 Leşkeran dotira rojê siwarên ku wê
bi wî re biçûna hiştin û vegeriyan leşkergehê. 33 Gava ew hatin
Qeyseriyê û name dan walî, Pawlos jî derxistin ber wî. 34 Çaxê ku
wî name xwend, pirsî ka ew ji kîjan herêmê ye. Gava hîn bû ku ew
ji Kîlîkyayê ye, 35 wî got: «Çaxê yên ku giliyê te dikin bên, hingê
ezê guhdariya te bikim.» Û emir kir ku Pawlos di qesra Hêrodês de
girtî bimîne.

### *Pawlos li ber Felîks*

24 Piştî pênc rojan, Serokkahîn Hananya, bi hin rihspiyan û
peyvbêj* Tertûlos ve daket Qeyseriyê û wan li ber walî gi-
liyê Pawlos kir. 2 Çaxê gazî Pawlos kirin, Tertûlos dest bi sûcdar-
kirinê kir û got: «Felîksê giranbiha, bi saya serê te demeke dirêj e
ku em di aştiyê de dijîn û bi pêşbîniya te ev milet pêşve çûye. 3 Em
vê yekê hergav û li her derê bi spasiyeke mezin qebûl dikin. 4 Ez
naxwazim zêde serê te biêşînim, lê ez hêvî dikim ku ji kerema xwe
tu bi kurtî guhdariya me bikî. 5 Me dît ku ev zilam bûye belayek û di
nav hemû Cihûyên dinyayê de tevliheviyê dertîne û yek ji serokên

---

**24:1** Peyvbêj: Di wê demê de carna wek ebûqatê îro bû.

mezheba Nisretiyan e. 6 Heta wî xwest ku Perestgehê biherimîne,
lê me ew girt. 7-8 Îcar gava ku tu bi xwe wî bikişînî pirsyariyê, tu
dikarî hemû tiştên ku em wî pê sûcdar dikin, ji wî hîn bibî.» 9 Cihû
jî beşdarî sûcdarkirinê bûn û gotin ku ev hemû wusa ne.

### *Pawlos Xwe li ber Felîks Diparêze*

10 Çaxê walî îşaret da Pawlos ku gotina xwe bêje, wî bersîv da
û got:
«Ji ber ku ez dizanim bi salan e ku tu dadgerê* vî miletî yî, ezê
bi kêfxweşî parastina xwe bikim. 11 Çawa tu bi xwe dikarî hîn bibî,
ji diwanzdeh rojan ne zêdetir e ku ez ji bo perizînê* derketim Or-
şelîmê. 12 Wan nedîtiye ku ez di Perestgehê de bi kesî re ketime
peyivînê û ne jî dîtin ku min di kinîştan de an jî di bajêr de xelk
rakiriye ser piyan. 13 Ne jî ew dikarin niha sûcdarkirinên xwe ji te
re îspat bikin. 14 Lê ez vê bi eşkereyî ji te re dibêjim ku li gor Riya
ku ew jê re dibêjin mezheb, ez diperizim Xwedayê bav û kalên me
û ez bi hemû tiştên ku di Şerîetê û di Nivîsarên Pêxemberan de
nivîsî ne bawer dikim. 15 Wek ku ew bi xwe jî qebûl dikin ku
vejîna yên rast û nerast wê çêbe, ev hêviya min jî ji Xwedê heye.
16 Ji ber vê yekê heta ku ji destê min bê, ez dixebitim ku hem li ber
Xwedê û hem li ber mirovan hergav wijdaneke min a paqij hebe.
17 Îcar piştî çend salan ez hatim ku alîkariya miletê xwe bikim û
goriyan pêşkêş bikim. 18 Gava ku min ev dikirin, wan ez di Perest-
gehê de paqijbûyî dîtim. Ne ez bi elaletê re bûm û ne jî min hen-
game derxist. 19 Lê hin Cihûyên ji herêma Asyayê* li wê derê he-
bûn, eger tiştekî wan li hember min hebe, diviya ew li vir li ber te
bûna û ez sûcdar bikirama. 20 An bila evên ha bêjin, gava ku ez li ber
civîna giregiran rawestayî bûm, wan çi neheqiya min dît? 21 Tenê
gava ku ez di nav wan de rawesta bûm, min dengê xwe bilind kir û
got: ‹Ji ber vejîna miriyan, îro li ber we dîwana min tê kirin.›»
22 Lê Felîksê ku qenc li ser Riyê dizanî, doz da paş û got: «Ça-
xê ku serhezar Lûsyos dakeve Qeyseriyê, ezê ji bo doza we biryarê
bidim.» 23 Wî li sersed emir kir ku Pawlos girtî bihêlin, hinekî ser-
best bihêlin û ji hevalên wî yên ku jê re dibin alîkar re nebin
asteng.

---

**24:17** Karên Şandiyan 21:17-28 **24:21** Karên Şandiyan 23:6

### *Pawlos Girtî Dimîne*

24 Piştî çend rojan Felîks tevî pîreka xwe ya Cihû Dirûsîla hat, şand pey Pawlos û li ser baweriya ku bi Mesîh Îsa ye, guhdariya wî kir. 25 Û çaxê ew li ser rastiyê, li ser xwegirtinê û li ser dîwana ku wê bê peyivî, Felîks tirsiya û got: «Tu niha here, çaxê ez demeke xweşkeys bibînim, ezê gazî te bikim.» 26 Ji aliyekî ve jî, wî hêvî dikir ku Pawlos wê peran bide wî, ji ber vê yekê wî gelek caran dişand pey wî û pê re dipeyivî.

27 Piştî ku du sal derbas bûn, Porkiyos Fêstos hat cihê Felîks. Ji ber ku Felîks dixwest dilê Cihûyan xweş bike, wî Pawlos girêdayî hişt.

### *Pawlos li ber Fêstos*

25 Îcar Fêstos gihîşt herêmê û piştî sê rojan, ji Qeyseriyê hilkişiya Orşelîmê. 2 Li wir serekên kahînan û giregirên Cihûyan li ber wî giliyê Pawlos kirin û 3 jê xwestin ku qenciyê bi wan bike û wî bîne Orşelîmê. Armanca wan ew bû ku kemînê deynin û di rê de wî bikujin. 4 Lê Fêstos bersîv da, ku Pawlos li Qeyseriyê di girtîgehê de ye û di nêzîk de ew bi xwe jî wê here wê derê. 5 Û got: «Îcar bila serekên we bi min re dakevin û eger wî zilamî tiştekî nerast kiribe, bila wî sûcdar bikin.»

6 Ew di nav wan de ji neh-deh rojan zêdetir nema û daket Qeyseriyê. Dotira rojê ew li ser kursiyê dîwanê rûnişt û emir kir ku Pawlos bînin. 7 Çaxê ew hat, Cihûyên ku ji Orşelîmê hatibûn, hawirdor lê girtin, gelek sûcdarkirinên giran ên ku nikaribûn îspat bikin, li hember wî kirin. 8 Pawlos parastina xwe kir û got: «Min ne li hember Şerîeta Cihûyan, ne li hember Perestgehê û ne jî li hember Qeyser qet sûc nekiriye.» 9 Lê Fêstos, ji bo ku dilê Cihûyan xweş bike, ji Pawlos pirsî û got: «Ma tu dixwazî derkevî Orşelîmê û li wir ji bo van tiştan li ber min dîwana te bê kirin?» 10 Pawlos jî got: «Ez li ber dîwana Qeyser radiwestim, divê li wir dîwana min bê kirin. Min tu neheqî li Cihûyan nekiriye, wek ku tu bi xwe jî qenc dizanî. 11 Niha eger min neheqî an tiştekî ku heqê wî mirin e, kiribe, ez ji mirinê narevim. Lê eger sûcdarkirinên vanên ha ne rast bin, tu kes nikare min bide destê wan. Ez doza xwe dibim ber Qeyser.» 12 Hingê Fêstos, piştî ku bi şêwirmendên xwe re peyivî, bersîv da û got: «Te doza xwe bir ber Qeyser, tê herî ba Qeyser.»

### *Fêstos bi Egrîpa Padîşah Dişêwire*

13 Piştî ku çend roj derbas bûn Egrîpa* padîşah û Bernikê hatin
Qeyseriyê ku herin serdana Fêstos. 14 Gava ku wan çend roj li wir
derbas kirin, Fêstos doza Pawlos ji padîşah re anî zimên û got: «Li
vir zilamekî ku Felîks ew girtî hiştiye heye. 15 Çaxê ku ez li Or-
şelîmê bûm, serekên kahînan û rihspiyên Cihûyan giliyê wî li ber
min kirin û xwestin ku ez dîwana wî bikim. 16 Min ji wan re got ku
ne adeta Romayiyan e ku yekî bidin dest, heta bi yên ku wî sûcdar
dikin re neyê rûbirûkirin û li hember sûcdarkirinên wan fersenda
parastinê ji wî re neyê dayîn. 17 Îcar gava ku ew hatin vir, min bi
derengî nexist, dotira rojê ez li ser kursiyê dîwanê rûniştim û min
emir kir ku wî zilamî bînin. 18 Çaxê yên ku giliyê wî dikirin rabûn,
wan ew bi tu neheqiya ku min guman dikir, sûcdar nekirin. 19 Lê li
hember wî hin meselên wan hebûn, li ser dînê wan û li ser yekî
mirî ku navê wî Îsa ye, lê Pawlos dibêje ku ew sax e. 20 Ez jî li ser
mesela van tiştan dudilî bûm û min ji Pawlos pirsî, ka ew dixwaze
here Orşelîmê û li wir ji bo van tiştan dîwana wî bê kirin. 21 Lê
çaxê Pawlos xwest, heta ku Împerator biryarê bide, di bin çavan de
bimîne, min emir kir ku ew girtî bimîne heta ku ez wî bişînim ber
Qeyser.» 22 Egrîpa jî ji Fêstos re got: «Min bi xwe jî dixwest ku ez
guhdariya vî mirovî bikim.» Fêstos got: «Tê sibê wî bibihîzî.»

### *Pawlos Derdixin pêş Egrîpa*

23 Îcar dotira rojê Egrîpa û Bernikê bi xemlûxêleke mezin, bi
serhezar û giregirên bajêr ve ketin dîwanxanê. Li ser emrê Fêstos
Pawlos anîn hundir. 24 Fêstos got: «Egrîpa padîşah û hemû yên li
vir bi me re amade ne, hûn vî mirovî dibînin. Tevahiya Cihûyan,
hem li Orşelîmê û hem jî li vir, bi qîrîn li ber min gilî kirin û gotin
ku divê ev êdî nejî. 25 Lê min dît ku wî tiştekî ku heqê wî mirin be,
nekiriye. Çaxê wî xwest ku doza wî here ber Qeyser, min biryar da
ku ez wî bişînim. 26 Îcar tiştekî ku ez li ser wî ji efendiyê me re
binivîsim tune. Ji ber vê yekê min ew anî pêş we, bi taybetî jî pêş
te, ya Egrîpa padîşah. Da ku, piştî ew bê kişandin pirsyariyê, tiş-
tekî ku ez binivîsim hebe. 27 Çimkî ji min re bêmane tê, ku ez
girtiyekî bişînim û tiştên ku pê tê sûcdarkirin nenivîsim.»

### *Pawlos li ber Egrîpa Xwe Diparêze*

26 Îcar Egrîpa* ji Pawlos re got: «Destûra te heye ku tu ji bo
xwe bipeyivî.» Hingê Pawlos destê xwe bilind kir û dest pê
kir xwe parast:
2 «Ya padîşah Egrîpa, ji ber ku ezê îro li ber te, xwe li hember
hemû sûcdarkirinên Cihûyan biparêzim, ez xwe bextewar hesab
dikim. 3 Bi taybetî, ji ber ku tu qenc bi hemû adet û meseleyên di
nav Cihûyan de dizanî; loma ez hêvî dikim ku tu bi bîhnfirehî
guhdariya min bikî.
4 «Hemû Cihû ji xortaniya min ve bi jiyana min dizanin. Ev
jiyan ji destpêkê ve di nav gelê min de û li Orşelîmê derbas bûye.
5 Eger bixwazin şahidiyê bikin, ew ji berê ve min nas dikin ku ez li
gor mezheba dînê me ya herî hişk, bi Fêrisîtî jiyam. 6 Ji ber ku min
hêviya xwe bi wê soza ku Xwedê daye bav û kalên me ve girê-
daye, ez niha ji bo ku dîwana min bê kirin, li vir radiwestim. 7 Bi
wê hêviya ku bigihîjin wê sozê, diwanzdeh eşîrên me bi şev û bi
roj ji dil û can diperizin*. Ji ber vê hêviyê, ya padîşah, ez ji aliyê
Cihûyan ve têm sûcdarkirin. 8 Çima baweriya we pê nayê ku Xwe-
dê miriyan rake?
9 «Bi rastî bîr û baweriya min bi xwe jî ev bû ku divê ez li
hember navê Îsayê Nisretî gelek tiştan bikim. 10 Min ev yek li
Orşelîmê kir jî. Bi wê desthilatiya ku min ji serekên kahînan
standibû, min gelek ji yên pîroz avêtin zîndanê û di kuştina wan de
min raya xwe li hember wan dida. 11 Di hemû kinîştan de min
gelek caran ew ceza kirin û min li wan zor kir ku çêran bikin. Ez li
hember wan ewqas har bûbûm, heta ku min di bajarên xerîb de jî
tengahî da wan.
12 «Di van gerên xwe de, bi kardestî û desthilatiya ku min ji
serekên kahînan standibûn, ez diçûm Şamê. 13 Ya padîşah, nîvro di
rê de, min ji ezmên ronahiyek dît ku ji ya rojê bi şewqtir bû û dora
min û yên bi min re ronahî kir. 14 Gava em hemû ketin erdê, min
dengek bihîst ku bi Îbranî ji min re got: ‹Şawûl, Şawûl, tu çima
tengahiyê didî min? Ji te re zehmet e ku tu bi kulmê herî direşikê.›
15 Min got: ‹Tu kî yî, ya Xudan?› Xudan bersîv da û got: ‹Ez Îsa

---

**26:9-11** Karên Şandiyan 8:3; 22:4-5

me yê ku tu tengahiyê didiyê. [16] Lê belê rabe û li ser lingan rawes-
te; çimkî ez ji te re xuya bûm, da ku ez hem ji bo tiştên ku te dîtin
û hem jî ji bo wan ên ku ezê bi wan xwe nîşanî te bidim, te şahid û
xizmetkar destnîşan bikim. [17] Ezê te ji gelê te û ji miletên ku ezê te
bişînim nav wan, xilas bikim, [18] da ku tu çavên wan vekî û wan ji
tariyê bizivirînî ronahiyê û ji hukumdariya Îblîs vegerînî Xwedê,
ku ew lêbihûrtina gunehan bistînin û di nav wan ên ku bi baweriya
navê min hatine pîrozkirin de, xweyî mîras bin.›
[19] «Loma, ya padîşah Egrîpa, ez li ber vê dîtiniya* ezmanî ra-
nebûm. [20] Lê min pêşî ji yên li Şamê re, piştre ji yên li Orşelîmê û
ji yên li tevahiya diyarê Cihûstanê re û ji miletan re jî da zanîn ku
divê ew tobe bikin, li Xwedê bizivirin û kirinên ku li tobekirinê
tên, bikin. [21] Ji ber vê yekê Cihûyan ez di Perestgehê de girtim û
xwestin ku min bikujin. [22] Lê min alîkarî ji Xwedê stand û ez heta
îro mam û ji biçûk û mezinan re şahidiyê dikim. Ez ji tiştên ku
pêxemberan û Mûsa gotine ku wê çêbin pê ve, tiştekî din nabêjim:
[23] Yanî divê ku Mesîh cefayê bikişîne, di vejîna miriyan de bibe yê
pêşî û ji gelê Cihû û ji miletên din re ronahiyê bide zanîn.»

### *Pawlos Bang li Egrîpa Dike ku Baweriyê bi Îsa Bîne*

[24] Çaxê ku wî weha parastina xwe dikir, Fêstos bi dengekî
bilind got: «Te hişê xwe winda kiriye, Pawlos. Zêdexwendina te,
te ji ser hişê te dibe!» [25] Lê belê Pawlos got: «Min hişê xwe winda
nekiriye, Fêstosê giranbiha, lê ez peyvên rast bi aqilmendî dibêjim.
[26] Padîşah bi xwe bi van tiştan dizane, loma ez serbest dipeyivim û
ez piştrast im ku tiştekî ji van, ji wî ne veşartî ye. Çimkî ev tişt di
kuncikekê de çênebûye. [27] Egrîpa padîşah, ma baweriya te bi pê-
xemberan heye? Ez dizanim ku tu bawer dikî.» [28] Egrîpa ji Pawlos
re got: «Tu dibêjî tê di demeke kurt de min bikî Mesîhî?» [29] Paw-
los lê vegerand: «Zû an dereng, ez hêvî ji Xwedê dikim ku ne tenê
tu, lê hemû yên ku îro guhdariya min dikin, ev zincîr ne tê de, wek
min bin.»
[30] Hingê padîşah rabû û bi wî re walî, Bernikê û hemû yên ku
pê re rûniştî bûn jî rabûn. [31] Gava ku derdiketin, ji hev re gotin:
«Vî mirovî tiştekî ku ji ber bê kuştin an girtin, nekiriye.» [32] Û

**26:20** Karên Şandiyan 9:20-29 **26:23** 1 Korîntî 15:20; Îşaya 42:6; 49:6

Egrîpa ji Fêstos re got: «Ev mirov dikaribû bihata berdan, eger
nexwesta ku doza wî here ber Qeyser.»

### *Pawlos bi Gemiyê Dibin Romayê*

27 Gava biryar hat dayîn ku em bi gemiyê herin Îtalyayê, wan
Pawlos û hin girtiyên din spartin sersedekî ji tabûra* Qey-
ser, yê ku navê wî Yûlyos bû. 2 Em li gemiyeke Edremîtê ya ku
diçû keviyên herêma Asyayê* siwar bûn û bi nav deryayê ve çûn.
Ji Selanîkê Erîstarxosê* Mekedonî bi me re bû. 3 Dotira rojê em li
Saydayê peya bûn. Yûlyos qencî bi Pawlos kir û destûr dayê ku
here ba dostên xwe, da ku lê binêrin. 4 Em ji wir bi deryayê ve çûn
û ji ber ku ba ji hember me ve dihat, em di aliyê Qibrisê yê bê ba
re derbas bûn. 5 Piştî ku em di deryaya pêşberî Kîlîkya û Pam-
fîlyayê re derbas bûn, em gihîştin Mîra bajarê Lîkyayê. 6 Li wir
sersed gemiyeke ji Skenderyayê ya ku diçû Îtalyayê dît û em li wê
siwar kirin. 7 Gelek rojan em hêdî hêdî çûn û bi zehmet em gihîştin
pêşberî Kinîdosê. Ji ber ku bayê rê neda me, em di aliyê Girîtê yê
di bin bayê re, di pêşberî Salmonê re derbas bûn. 8 Bi zehmet em di
vê keviyê de derbas bûn û gihîştin dereke ku jê re dibêjin Len-
gergeha* Bedew, ku nêzîkî bajarê Laseyayê bû.

9 Gelek dem hatibû windakirin, ji xwe Roja Rojiyê bihûrî bû û
ji ber ku êdî rêwîtiya deryayê talûke bû, Pawlos şîret li wan kir û
10 got: «Gelî hevalan, ez dibînim ku rêwîtî ne tenê ji bo bar û
gemiyê, lê ji bo me bi xwe jî, wê gelek bi ziyan û zehmet be.»
11 Lê sersed ji gotinên Pawlos zêdetir ji serekê gemîvanan û ji
xwediyê gemiyê bawer dikir. 12 Ji ber ku lengergeh ji bo bihû-
randina zivistanê xweşkeys nebû, pirraniya wan biryar da ku ji wir
bi deryayê ve herin û eger çêbe bigihîjin Fînîksê û zivistanê li wir
derbas bikin. Fînîks lengergeha Girîtê bû, li başûr û li bakûrê
rojava dinêrî.

### *Firtona Deryayê*

13 Çaxê ku bayekî nerm ê başûr hat, wan guman kir ku ew
gihîştin mebesta xwe, lenger kişandin û bi keviya Girîtê ve çûn.

---

27:9 Roja Rojiyê: Rojiya Roja Goriya Berdêlê. Ev cejneke Cihûyan bû û di dawiya meha nehan an jî di destpêka meha dehan (ên niha) dihat pîrozkirin; binêre Qanûna Kahîntiyê 16:29.

[14] Piştî kêlîkekê, ji aliyê Girîtê ve firtoneke xurt a bakûrê-rojhilat
rabû ku jê re digotin ‹Êvrîkilon›. [15] Firtonê li gemiyê xist, êdî wê
nikaribû li hember şeqilan here, me dev jê berda û em hatin xi-
şandin. [16] Em di giraveke biçûk a ku navê wê Kawda bû re derbas
bûn, di bin aliyê wê yê bê ba re, bi zorê me destê xwe gihand
qeyikê. [17] Piştî ku qeyik kişandin jor, gemî ji binî ve bi kendîran
asê kirin. Ji tirsa ku wê di Kendava Sirtê de li girên seylakê* yên
di bin avê de bikevin, taximên gemiyê anîn xwar û bi vî awayî
xişxişîn û çûn. [18] Firtonê gelek zor li me kir, dotira rojê dest pê
kirin barê gemiyê avêtin deryayê. [19] Roja sisiyan bi destên xwe
hacetên gemiyê avêtin. [20] Gelek rojan ne tav û ne jî stêr xuya bûn û
firtone ranewesta, êdî hemû hêviya me ya xilasbûnê winda bû.

[21] Îcar çaxê ku demeke dirêj wan xwarin nexwar, Pawlos di
nav wan de rawesta û got: «Hevalno, diviya ku we bi ya min bi-
kira, hûn ji Girîtê derneketana û we ev ziyan û zehmet nedîtana.
[22] Û niha ez hêvî ji we dikim, bi zirav bin; çimkî kesekî ji we
jiyana xwe winda nake, bi tenê gemî wê here. [23] Çimkî şeva din
milyaketekî wî Xwedayê ku ez yê wî me û xizmetê ji wî re dikim,
li ba min rawesta, [24] û got: ‹Netirse Pawlos; divê tu li ber Qeyser
rawestî û hemû yên ku bi te re di gemiyê de ne, va ye, Xwedê ew
dan xatirê te.› [25] Loma bi zirav bin, hevalno. Çimkî ez ji Xwedê
bawer dikim, wek ku wî ji min re gotiye, wê çêbe. [26] Lê divê em
bikevin giravekê.»

### *Reşahî Tê Dîtin*

[27] Çaxê ku bû şeva çardehan, em hê di deryaya Adriyatîkê de
dixişxişîn. Li dor nîvê şevê gemîvanan guman kir ku nêzîkî bejê
bûne. [28] Hingê kûrpîv avêtin û dîtin ku bi qasî bîst baskî ye. Hinekî
din pêşve çûn, dîsa pîvan û dîtin ku panzdeh bask e. [29] Ew ditirsi-
yan ku em li dereke kevirîn bikevin; ji paş gemiyê ve çar lenger
avêtin û ji bo ku roj derkeve dua kirin. [30] Lê çaxê gemîvan dixe-
bitîn ku ji gemiyê birevin û wek ku ji pêş ve wê lenger bavêtana,
qeyik berdan deryayê, [31] Pawlos ji sersed û leşkeran re got: «Eger
ev mirov di gemiyê de nemînin, hûn nikarin xilas bibin.» [32] Hingê
leşkeran şerîtên qeyikê birrîn û ew xistin.

---

**27:28** Bîst baskî nêzîkî 40 metre ye.

33 Serê sibê, Pawlos ji hemûyan hêvî kir ku xwarinê bixwin û
got: «Îro çardeh roj e ku hûn radiwestin, we tiştek nexwariye û hûn
birçî ne. 34 Loma ez ji we hêvî dikim ku hûn xwarinê bixwin; çimkî
ev ji bo rizgariya we ye. Ji ber ku mûyek ji serê yekî ji we winda
nabe.» 35 Piştî ku wî ev got, nan hilda, li ber hemûyan ji Xwedê re
şikir kir, şkand û dest pê kir xwar. 36 Hingê hemû jî bi zirav bûn û
nan xwarin. 37 – Di gemiyê de em hemû bi hev re du sed û heftê û
şeş nefs bûn. – 38 Piştî ku têr nan xwarin, genim rijandin deryayê û
gemî sivik kirin.

39 Çaxê bû roj bej nas nekirin, lê tengaveke ku seylaka* wê
hebû dîtin û dixwestin, eger çêbe, gemiyê biajon wê derê. 40 Hingê
kendîrên lengeran birrîn, di deryayê de hiştin. Lingên kotelan* sist
kirin, babezka pêşiyê li bayê vekirin û berê xwe dan seylakê. 41 Lê
gemî di nav du herikînên dijber de ma û li wir rawesta; serê ge-
miyê di erdê de çikilî û hew lebitî. Lê ji ber hêza şeqilan paşiya wê
dest pê kir ji hev vebû. 42 Hingê leşkeran xist dilê xwe ku girtiyan
bikujin, da ku kesekî sobayiyê neke û nereve. 43 Lê sersed xwest ku
Pawlos xilas bike, nehişt ku vê niyeta xwe bînin cih. Wî emir kir,
pêşî yên ku dizanin sobayiyê bikin, xwe ji gemiyê bavêjin û der-
kevin bejê 44 û yên mayî jî, hinek li ser depan û hinek jî li ser per-
çên gemiyê derkevin bejê. Bi vî awayî hemû xilas bûn û derketin
bejê.

### *Pawlos li Girava Maltayê*

28 Piştî ku em xilas bûn, em hîn bûn ku navê giravê Malta ye.
2 Xelkê giravê camêriyeke nedîtî nîşanî me da. Ji ber serma
û barana ku dibarî, agir kirin û em hemû qebûl kirin. 3 Gava ku
Pawlos gurzek hejik berhev kir û danî ser êgir, ji germê koremarek
derket û bi destê wî ve zeliqî. 4 Gava xelkê giravê dît ku marek bi
destê wî ve daleqaye ji hev re gotin: «Bêguman, ev mirov mêrkuj
e; bi ser ku ew ji deryayê xilas bû jî, Heq nehişt ku ew bijî.» 5 Lê
Pawlos mar veweşand nav êgir û tu ziyan nedît. 6 Ew li benda
Pawlos bûn ku biwerime, an ji nişkê ve bikeve û bimire. Lê piştî
ku ew demeke dirêj li hêviyê man û dîtin ku tiştek pê nehat, wan
fikra xwe guhert û gotin ku ew xwedayek e.

---

27:40 Kotel: Dimen

[7] Îcar nêzîkî wê derê zeviyên serokê giravê hebûn ku navê wî
Popliyos bû. Wî em qebûl kirin mala xwe û sê rojan bi dostanî em
kirin mêvan. [8] Bavê Popliyos bi tayê û zikêşa bi xwîn ketibû û nex-
weş di nav nivînan de bû. Pawlos çû ba wî, destên xwe danîn ser
wî, dua kir û ew qenc kir. [9] Piştî vê yekê nexweşên giravê yên din
jî hatin û qenc bûn. [10] Wan gelek qedir û qîmeta me girt û gava em
bi nav deryayê ve rê ketin, hemû tiştên ku hewcedariya me bi wan
hebû, xistin gemiyê.

### *Pawlos Tê Romayê*

[11] Piştî sê mehan em bi gemiyeke ji Skenderyayê ya ku zivistan
li giravê derbas kiribû, bi deryayê ve bi rê ketin; nîşana xwedayên
Cêwî li ser gemiyê hebû. [12] Em gihîştin Sîrekûsê û em sê rojan li
wir man. [13] Ji wir em rabûn û çûn Rêgiyomê. Piştî rojekê bayê ba-
şûr rabû û roja diduyan em hatin Potiyolê. [14] Li wir me xwişk û
bira dîtin û ji me hêvî kirin ku em heft rojan li ba wan bimînin. Û
bi vî awayî em hatin Romayê. [15] Çaxê birayên ji wir li ser hatina
me bihîstin, heta bi Çarşiya Epiyû û Sê Mêvanxaneyê hatin pêşiya
me. Gava Pawlos ew dîtin, şikir ji Xwedê re kir û cesaret stand.
[16] Çaxê em ketin Romayê, destûr ji Pawlos re hat dayîn ku bi
leşkerê ku nobedariya wî dike re tenê rûne.
[17] Îcar piştî sê rojan, Pawlos gazî giregirên Cihûyan kir ku
bicivin. Gava ku ew kom bûn, wî ji wan re got: «Birano, bi ser ku
min tiştekî li hember gelê me an adetên bav û kalên me nekiriye jî,
ez li Orşelîmê hatim girtin û ez dam destê Romayiyan. [18] Çaxê wan
ez kişandim pirsyariyê, wan xwest ku min berdin, çimkî ji bo
kuştina min sedemek tunebû. [19] Lê gava ku Cihû li hember vê yekê
derketin, bi ser ku giliyekî min li hember miletê min tunebû jî, ez
mecbûr bûm ku doza xwe bibim ber Qeyser. [20] Ji ber vê yekê min
xwest ku ez we bibînim û bi we re bipeyivim. Çimkî ez di ber
hêviya Îsraêl de bi vê zincîrê girêdayî me.» [21] Wan lê vegerand û
gotin: «Me li ser te tu name ji Cihûstanê nestandine, ne jî yek ji
birayên ku hatiye vir xeber daye me, an tiştekî nebaş li ser te go-
tiye. [22] Lê em dixwazin ji te bibihîzin ka tu çi difikirî. Çimkî em
dizanin ku li her derê li hember vê mezhebê dipeyivin.»

---

**28:19** Karên Şandiyan 25:11

### *Pawlos li Romayê Hîn Dike*

[23] Îcar rojek ji bo wî kifş kirin û gelek hatin ba wî, wî cihê ku
lê dima. Wî ji serê sibê heta êvarê ji wan re şîrove kir, li ser Pa-
dîşahiya Xwedê şahidî kir û xebitî ku hem bi Şerîeta Mûsa û hem
jî bi Nivîsarên Pêxemberan baweriya wan bi Îsa bîne. [24] Hinekan
bawerî bi tiştên ku hatibûn gotin, anîn û hinekan jî neanîn. [25] Çaxê
di nav xwe de li hev nehatin, beriya ku herin Pawlos ev peyv got:
«Ruhê Pîroz bi devê Îşaya pêxember ji bav û kalên we re weha rast
gotiye:

[26] ‹Here ba vî gelî û bêje:
Hûn çiqas bibihîzin jî,
Hûn tu caran fêm nakin.
Hûn çiqas bibînin jî,
Hûn tu caran tênagihîjin.
[27] Çimkî dilê vî gelî hişk bûye
Guhên wan giran bûne
Û wan çavên xwe girtine.
Nebe ku ew bi çavên xwe bibînin
Û bi guhên xwe bibihîzin
Û bi dilê xwe fêm bikin
Û vegerin ku ez wan qenc bikim.›[a]

[28-29] De îcar bizanin ku ev xilaskirina Xwedê ji miletan re hatiye
şandin û ewê guhdarî bikin.»

[30] Pawlos du sal sax li mala xwe ya ku kirê kiribû ma û her
kesê ku dihat ba wî qebûl dikir. [31] Wî Padîşahiya Xwedê dạ bihîs-
tin û bi serbestî, bêyî ku kesek jê re bibe asteng hemû tiştên li ser
Xudan Îsa Mesîh hîn dikirin.

---

[a] **28:26-27** Ji: Îşaya 6:9-10

# *Nameya Pawlos a ji Romayiyan re*

### *Pêşgotin*

*Çend sal piştî rabûna Îsa Mesîh a ji nav miriyan, bawermendên Mesîhî gihîştin Romayê, ya ku paytextê Împeratoriya Romayiyan bû. Pawlosê ku ji aliyê Xwedê ve bi şandîtî hatibû hilbijartin, xwest ku here Romayê û ji wir jî derbasî Spanyayê bibe.*

*Pawlos, hê beriya ku dest bi rêwîtiya xwe bike, ev name ji bawermendên Romayê re nivîsî (15:24-28). Wî ev name di navbera salên 56 û 57an de li bajarê Korîntê nivîsî.*

*Mijara nameyê di beşê 1:16-17an de tê diyarkirin. Ev rastiya esasî ye ya ku ji Peymana Kevin tê (binêrin Habaqûq 2:4), di Nameya ji Galatiyan re (3:11) û Nameya ji Îbraniyan re (10:38) de jî tê diyarkirin.*

*Ev name dikare bi vî awayî bê beşkirin:*

*I. Silav û dabaşa nameyê 1:1-17*
*II. Her kes sûcdar e, rastdarî bi keremê ye 1:18-3:31*
*III. Mînaka Birahîm 4:1-25*
*IV. Lihevhatina mirov û Xwedê 5:1-7:25*
*V. Jiyana bi Ruh 8:1-39*
*VI. Plana Xwedê ya ji bo Cihû û miletên din 9:1-11:36*
*VII. Jiyana kesê ku baweriyê bi Mesîh tîne 12:1-15:21*
*VIII. Planên Pawlos û silavên aştiyê 15:22-16:27*

### *Silav*

1 Ji Pawlosê* xulamê Mesîh* Îsa* yê ku ji bo şandîtiyê hatiye
gazîkirin û hatiye veqetandin, da ku Mizgîniya* Xwedê 2 ya ku
hê ji berê ve wî bi devê pêxemberên* xwe di Nivîsarên* Pîroz de
soz dabû, belav bike. 3 Ev Mizgînî li ser Kurê wî ye, yê ku li gor
bedenê ji dûndana* Dawid* hat 4 û li gor Ruhê pîroziyê bi vejîna*
ji nav miriyan, bi hêzdarî Kurê* Xwedê hatiye diyarkirin. Ew Xudanê* me Îsa Mesîh e. 5 Me bi destê wî û bi xatirê navê wî kerem û
şandîtî stand, da ku em gazî hemû miletan bikin ku baweriyê*
bînin û bi ya wî bikin. 6 Hûn jî di nav gazîkiriyên Îsa Mesîh de ne.
7 Ji we hemû hezkiriyên Xwedê re yên ku li Romayê ne û ji bo

pîrozbûnê* hatine gazîkirin: Ji Bavê me Xwedê û ji Xudan* Îsa
Mesîh, kerem û aştî* li ser we be.

### *Dua û Şikir*

8 Berî her tiştî ez bi saya Îsa Mesîh, ji bo we hemûyan ji
Xwedayê xwe re şikir dikim, çimkî li seranserê dinyayê li ser
baweriya* we tê gotin. 9 Ew Xwedayê ku ez bi ruhê xwe di dayîna
Mizgîniya Kurê wî de xizmetê jê re dikim, şahidê min e ku ez
hergav di duayên xwe de bê rawestin we tînim bîra xwe 10 û lava
dikim ku eger bi daxwaza Xwedê pêk bê, êdî ez bi riyekê bikarim
bêm ba we. 11 Çimkî ez pirr dixwazim we bibînim, da ku ez di-
yariyeke ruhanî bidim we ku hûn qayîm bibin, 12 yanî em bi hev re,
hûn bi baweriya* min û ez bi baweriya we, em bên handan*. 13 Bi-
rano, ez dixwazim hûn bizanin ku gelek caran min xist dilê xwe ku
ez bêm ba we, lê asteng derketin. Wek di nav miletên din de, ez
dixwazim ku di nav we de jî xebata min ber bide. 14 Ez ji Yew-
naniyan û ji hovan re, ji zana û nezanan re deyndar im. 15 Loma ez
amade me ku heta ji destê min bê, ez ji we re jî, hûn ên ku li
Romayê ne, Mizgîniyê bidim.

### *Hêza Mizgîniyê*

16 Çimkî ez ji ber Mizgîniyê şerm nakim. Ji ber ku ew ji her
kesê ku bawer* dike re ji bo xilasiyê hêza Xwedê ye, pêşî ji bo
Cihûyan, hem jî ji bo miletên din. 17 Çimkî di Mizgîniyê de rast-
dariya ku ji Xwedê ye, tê eşkerekirin. Ew ji destpêkê heta dawiyê
bi baweriyê* ye. Wek ku hatiye nivîsîn: «Yê rastdar wê bi bawe-
riyê bijî.»[a]

### *Sûcdariya Mirov*

18 Xezeba Xwedê ji ezmên li hember hemû nepakî û neheqiya
wan mirovên ku bi neheqiyê ji rastiyê re dibin asteng, xuya dibe.
19 Ji ber tiştê ku li ser Xwedê tê zanîn ji wan re diyar e; çimkî
Xwedê ji wan re eşkere kiriye. 20 Hê ji afirandina dinyayê ve hêza
wî ya herheyî û Xwedêtiya wî, bi ser ku nayên dîtin jî, bi tiştên ku
hatine çêkirin bi zelalî tên dîtin û fêmkirin. Loma hêceta* wan

---

[a] **1:17** Ji: Habaqûq 2:4
**1:13** Karên Şandiyan 19:21

tune. 21 Çimkî, bi ser ku Xwedê dizanin jî, bi Xwedêtî rûmet neda-
nê û ne jî jê re şikir kirin; lê belê fikirîna wan bû pûçîtî û dilê wan
ê fêmkor tarî bû. 22 Wan digot: «Em zana ne», lê bêaqil derketin.
23 Û rûmeta Xwedayê bêmirin, bi wêneyên mîna mirovê mirindar,
teyr, heywanên çarpê û yên ku dişêlin, guhertin.
24 Ji ber vê yekê Xwedê ew bi şehwetên dilê wan dane destê
nepakiyê, da ku di nav wan de bedena wan rezîl bibe. 25 Wan ras-
tiya Xwedê bi derewê guhert, ji Afirandar zêdetir perizîn* tiştên
afirandî û ji wan re xizmet kirin. Afirandar her û her pîroz* e.
Amîn*.
26 Ji ber vê yekê Xwedê ew dan destê şehwetên şermezariyê;
jinên wan jî têkiliya xweheyî* bi ya bervajiyê xweheyiyê guhertin.
27 Bi vî awayî mêran jî dev ji têkiliya xweheyî ya bi jinê re berdan
û di şehweta xwe de keribîn hevdû. Mêran bi mêran re riswayîtî kir
û di nefsa xwe de heqê jirêderketina xwe standin.
28 Ji ber ku wan naskirina Xwedê hêja nedît, Xwedê ew dan
destê fikrên xerab, wusa ku ew tiştên ne li ser rê bikin. 29 Ew bi her
cûreyê neheqî, neqencî, çavbirçîtî û xerabiyê tije ne. Bi çavnebarî,
kuştin, pevçûn, hîle û marzikiyê dagirtî ne. Paşgotiniyê dikin,
30 ketmê* dikin, ji Xwedê nefret dikin, serxweçûyî ne, pozbilind û
pesinker in, karên xerab saz dikin û bi ya dê û bavê xwe nakin,
31 fêmkor in, li ser soza xwe namînin, bê dilovanî û bê rehm in.
32 Bi ser ku fermana Xwedê ya rast a ku dibêje: «Yên tiştên weha
dikin, mirin heq kirine», dizanin jî, ew ne tenê van tiştan dikin, lê
belê kêfa wan ji yên ku dikin re jî tê.

### *Dîwankirina Xwedê ya Dadperwer*

2 Ji ber vê yekê, ey mirovê ku dadbar* dike, tu kî bî jî hêceta* te
tune. Ji ber ku di tiştê ku tu yên din dadbar dikî de, tu xwe
sûcdar derdixî. Çimkî tu yê ku dadbar dikî, tu eynî tiştan dikî.
2 Îcar em dizanin ku dîwankirina* Xwedê li gor rastiyê li hember
wan e, yên ku tiştên weha dikin. 3 Ey mirovo! Tu wan ên ku tiştên
weha dikin, dadbar dikî û tu bi xwe jî eynî tiştan dikî, ma tu guman
dikî ku tê ji dîwana Xwedê birevî? 4 An ku tu zêdehiya qencî, sebir
û bîhnfirehiya wî kêm dibînî? Ma tu nizanî ku qenciya Xwedê te

---

**1:23** Dubarekirina Şerîetê 4:15-18 **2:1** Metta 7:1-2

ber bi tobekirinê ve dibe? 5 Lê tu bi rikdarî û dilê xwe yê bêtobe ji
bo Roja Xezebê ya ku dîwana Xwedê ya dadperwer* xuya bibe, li
hember xwe xezebê dicivînî. 6 Çimkî ewê li gor kirinên her kesî
bide wî. 7 Wê jiyana herheyî bide wan ên ku di kirinên qenc de bi
bîhnfirehî li rûmet, siyanet* û nemirinê digerin; 8 lê xezeb û hêrs
wê bên ser wan ên ku xweperest in û li gor rastiyê nakin, lê li pey
neheqiyê diçin. 9 Her mirovê ku xerabiyê dike, wê cefa û tengahiyê
bikişîne; pêşî Cihû û hem jî miletên din. 10 Lê ji her kesê ku karê
qenc dike re, rûmet, siyanet û aştî wê bê dayîn; pêşî ji Cihûyan re,
hem jî ji miletên din re. 11 Çimkî li ba Xwedê xatirgirtin tune ye.
12 Hemû yên ku bê Şerîet* guneh dikin, wê bê Şerîet helak
bibin û hemû yên ku di bin Şerîetê de guneh dikin, wê bi Şerîetê
dîwana wan bê kirin. 13 Çimkî li ba Xwedê ne ew ên ku Şerîetê di-
bihîzin rastdar in, lê belê ew ên ku Şerîetê pêk tînin, wê rastdar
derkevin. 14 Çimkî miletên ku Şerîeta* wan tune, gava ji ber xwe
tiştên ku Şerîet dixwaze dikin, bi ser ku Şerîeta wan tune jî, ew bi
xwe ji bo xwe şerîet in. 15 Ew nîşan didin ku daxwaza Şerîetê di
dilê wan de nivîsî ye. Wijdana wan jî ji wan re şahidiyê dike,
çimkî fikrên wan, an wan sûcdar dikin, an jî carna wan diparêzin;
16 erê, li gor Mizgîniya ku ez didim, rojek wê bê ku Xwedê wê bi
destê Mesîh Îsa dîwana tiştên mirovan ên nependî bike.

### *Cihû û Şerîet*

17 Îcar tu yê ku ji xwe re dibêjî Cihû, tu pişta xwe bi Şerîetê ve
girêdidî û bi zanîna Xwedê pesnê xwe didî! 18 Ji ber ku tu bi Şe-
rîetê hatiyî hînkirin, tu daxwaza Xwedê dizanî û tu dikarî bêjî ya
herî qenc kîjan e. 19 Tu ji xwe piştrast î ku tu rêberê koran î û ji bo
wan ên ku di tariyê de ne, ronahî yî. 20 Tu perwerdekarê bêfêman û
mamosteyê nezanan î, di Şerîetê de xwediyê tevahiya zanîn û ras-
tiyê yî. 21 Îcar tu yê ku yên din hîn dikî, ma tu xwe hîn nakî? Tu yê
ku li hember diziyê dipeyivî, ma tu didizî? 22 Tu yê ku dibêjî: «Zî-
nayê nekin», ma tu bi xwe zînayê dikî? Tu yê ku ji pûtan nefret
dikî, ma tu perestgehan talan dikî? 23 Tu yê ku pesnê xwe bi Şerîetê
didî, ma tu bi şkandina Şerîetê, Xwedê bêrûmet dikî? 24 Çawa ku

---

2:6 Zebûr 62:12; Gotinên Silêman 24:12
2:11 Dubarekirina Şerîetê 10:17

hatiye nivîsîn: «Ji rûyê we di nav miletan de çêrî* navê Xwedê tê kirin.»[a]

25 Îcar, eger tu Şerîetê pêk bînî, sinet* bi kêr tê, lê eger tu Şerîetê bişkênî, sinetbûna te bûye bêsinetî. 26 Îcar, eger yê sinetnebûyî emrên Şerîetê pêk bîne, ma bêsinetiya wî sinetbûn nayê hesabkirin? 27 Û yê ku di bedenê de sinet nebûye, lê Şerîetê pêk tîne, wê te sûcdar derxe, çimkî tu xwediyê nivîsara wê yî û sinetbûyî yî, lê tu Şerîetê dişkênî. 28 Çimkî Cihû ne ew e ku li ber çav Cihû ye û ne jî sinetbûn ew e ku li ber çav di bedenê de tê kirin. 29 Lê belê Cihû ew e ku di hundir de Cihû ye û sinetbûn jî sinetbûna dil e; ev ne karê herfê Şerîetê yê, lê karê Ruh e. Pesnê yê weha ne ji mirovan, lê ji Xwedê ye.

### *Ewlehiya Xwedê*

3 Madem wusa ye, çi taybetiya Cihûyan heye? An feyda sinetbûnê çi ye? 2 Bi her awayî gelek e. Berî her tiştî peyvên* Xwedê li wan hatine spartin. 3 Eger hinekan ji wan, bawerî* neanîbe, çi dibe? Ma bêbaweriya wan dilsoziya Xwedê betal dike? 4 Na, tu caran! Bila Xwedê rast û her mirov derewker be. Çawa ku hatiye nivîsîn:

«Da ku, tu di peyvên xwe de rastdar derkevî
Û çaxê ku bêyî dîwankirin, tu bi ser bikevî.»[b]

5 Lê eger neheqiya me rastdariya Xwedê nîşan dide, em çi bêjin? Ma Xwedê neheq e ku xezeba xwe bîne ser me? – Ez wek mirovan dibêjim. – 6 Na, tu caran! Nexwe Xwedê wê çawa dîwana dinyayê bike? 7 Lê eger bi derewkariya min rastiya Xwedê ji bo rûmeta wî zêde dibe, çima ez dîsa wek gunehkarekî, sûcdar têm derxistin? 8 Çima em nebêjin: «Em xerabiyê bikin, da ku qencî jê derkeve?» wek ku hinek buxtanê li me dikin û tiştên ku me negotine davêjin ser me. Cezaxwarina yên weha rast e.

### *Her Kes ji Rastdariyê Bêpar e*

9 Îcar çi? Ma em Cihû çêtir in? Na, bi tu awayî! Çimkî me berê jî hem Cihû û hem jî miletên din sûcdar kirin ku ew hemû di bin hêza guneh de ne. 10 Çawa ku hatiye nivîsîn:

---

[a] **2:24** Ji: Îşaya 52:5 [b] **3:4** Ji: Zebûr 51:4
**2:29** Dubarekirin Qanûnê 30:6

«Tu kesê rast tune, tenê yek jî tune.
11 Tu kesê ku fêm dike tune,
Tu kesê ku li Xwedê digere tune.
12 Hemû ji rê derketin,
Hemû bi hev re bêkêr bûn.
Tu kesê ku qenciyê dike tune,
Yek tenê jî tune.[a]
13 Gewriya wan gora vekirî ye,
Bi zimanê xwe dixapînin.
Jehra marê reş di bin zimanê wan de ye.[b]
14 Devê wan bi nifir û tehliyê tije ye.[c]
15 Lingên wan ji bo rijandina xwînê bilez in.
16 Şopa wan wêranbûn û rebenî ye
17 Û ew riya aştiyê nizanin.[d]
18 Tirsa Xwedê li ber çavê wan tune.[e]»

19 Îcar em dizanin her tiştê ku Şerîet* dibêje, ji wan mirovan re
dibêje, ku di bin Şerîetê de ne, da ku her dev bê girtin û hemû
dinya li ber Xwedê sûcdar be. 20 Çimkî bi kirina Şerîetê tu kes li
ber Xwedê rastdar dernakeve. Ji ber ku bi Şerîetê guneh tê zanîn.

### *Riya Rastdariyê Yek e*

21 Lê niha, bêyî şerîetê, rastdariya Xwedê eşkere bû û Şerîet û
Nivîsarên Pêxemberan jî jê re şahidiyê dikin. 22 Ev rastdariya ji
Xwedê ya ku bi bawerkirina bi Îsa Mesîh e, ji bo wan hemûyan e
ku bawer dikin. Çimkî tu cihêtî tune: 23 Hemûyan guneh kir û ji
rûmeta Xwedê bêpar man. 24 Ew bi kerema wî, bi rizgariya ku bi
Mesîh Îsa hatiye, bê berdêl rastdar derdikevin. 25 Xwedê ew ji bo
wan ên ku baweriyê bînin, wek goriyeke* kefaretê bi xwîna wî
pêşkêş kir. Wî ev kir, da ku dadperweriya* xwe nîşan bide, çimkî
wî bi sebra xwe çavên xwe li wan gunehên ku berê hatibûn kirin
neqand. 26 Wî ev yek kir, da ku di dema niha de rastdariya xwe

---

[a] 3:10-12 Ji: Zebûr 14:1-3; 53:1-3; Zanebêj 7:20
[b] 3:13 Ji: Zebûr 5:9; Zebûr 140:3 [c] 3:14 Ji: Zebûr 10:7
[d] 3:15-17 Ji: Îşaya 59:7-8; Gotinên Silêman 1:16 [e] 3:18 Ji: Zebûr 36:1
3:20-22 Galatî 2:16
3:25 Goriya kefaretê: Goriyeke ku di ber gunehan tê dayîn, da ku li wan bê bihûrtin.

eşkere bike û ew bi xwe rastdar be û yê ku baweriyê bi Îsa bîne,
rastdar derkeve.
27 Îcar pesindan li ku derê ma? Ew li derve ma. Bi çi qanûnê?
Ma bi kirina Şerîetê? Na, lê belê bi qanûna baweriyê. 28 Çimkî bîr
û baweriya me ev e ku mirov bêyî kirina Şerîetê, bi baweriyê
rastdar derdikeve. 29 Ma Xwedê, tenê Xwedayê Cihûyan e? Ma ew
ne Xwedayê miletên din e jî? Belê, ew yê miletên din e jî, 30 çimkî
Xwedê yek e û ewê yên sinetbûyî* ji ber baweriya wan û yên
sinetnebûyî jî bi baweriyê rastdar derxe.
31 Eger wusa be, ma em bi baweriyê Şerîetê betal dikin? Na, tu
caran! Lê belê em Şerîetê erê dikin.

### *Baweriya Birahîm*

4 Nexwe em li ser Birahîmê* ku li gor bedenê bavkalê me ye çi
bêjin? 2 Eger Birahîm ji ber kirinên xwe rastdar derketibe,
heqê wî heye ku pesnê xwe bide, lê belê ne li ber Xwedê. 3 Ma
Nivîsara Pîroz çi dibêje? «Birahîm ji Xwedê bawer kir û ev yek jê
re rastdarî hat hesabkirin.»[a] 4 Eger mirovek kar bike, destmiza wî
ne kerem, lê belê deyn tê hesabkirin. 5 Lê ji wî re, ku ji kirinên xwe
ne piştrast e, lê baweriyê bi Xwedayê ku yê nepak rastdar derdixe
tîne, baweriya wî rastdarî tê hesab kirin. 6 Çawa ku Dawid* jî li ser
bextewariya wî mirovê ku Xwedê wî bêyî kirinan rastdar hesab
dike, dibêje:

> 7 «Xwezî bi wan mirovên ku li neheqiyên wan hatiye
> bihûrtin
> Û gunehên wan hatine nixumandin.
> 8 Xwezî bi wî mirovî ku Xudan ji wî re guneh hesab
> nake!»[b]

9 Ma ev bextewarî tenê ji bo yên sinetbûyî*, an ji bo yên si-
netnebûyî ye jî? Em dibêjin ku «baweriya Birahîm jê re rastdarî
hat hesab kirin.»[c] 10 Îcar ew çawa rastdar hat hesabkirin? Ma ev
piştî sinetbûna wî, an berî sinetbûna wî bû? Ev ne piştî sinetbûna
wî bû, lê belê berî sinetbûna wî bû. 11 Birahîm hê sinetnebûyî

---

[a] 4:3 Ji: Destpêkirin 15:6 [b] 4:7-8 Ji: Zebûr 32:1-2
[c] 4:9 Ji: Destpêkirin 15:6
4:3 Galatî 3:6; Aqûb 2:23

nîşana sinetê wek mora rastdariya ku bi baweriyê tê, stand. Bi vî
awayî Birahîm bû bavê wan hemûyên ku bê sinet baweriyê tînin,
da ku ew jî rastdar bên hesabkirin. 12 Wusa jî Birahîm bû bavê yên
sinetbûyî yên ku ne bi tenê sinet bûne, lê li ser şopa baweriya bavê
me Birahîm a ku beriya sinetbûna wî hebû, diçin.

### *Soza Xwedê bi Baweriyê Hat Cih*

13 Çimkî soza ku ji Birahîm û dûndana* wî re hat dayîn ku ewê
dinyayê mîras bistîne, ne bi riya Şerîetê*, lê bi riya rastdariya ku ji
baweriyê tê, hat dayîn. 14 Eger yên ku li gor Şerîetê dijîn wêris bin,
hingê bawerî pûç û soz betal e. 15 Çimkî Şerîet xezebê tîne; lê dera
ku şerîet lê tune, şkandina şerîetê jî tune. 16 Ji ber vê yekê soz bi
baweriyê ve girêdayî ye, da ku bi keremê be û ji bo hemû dûndana
Birahîm ewledar be. Ne tenê ji bo yên ku bi Şerîet in, lê belê ji bo
yên ku wek Birahîm bawer dikin jî. Çimkî ew bavê me hemûyan e.
17 Çawa ku hatiye nivîsîn: «Min tu kirî bavê gelek miletan.» [a]
Birahîm li ber wî Xwedayî bawer kir ê ku miriyan vedijîne* û wek
ku hene, gazî tiştên neyî dike.
18 Birahîm di bêhêvîtiyê de bi hêvî bawer kir û bû «bavê gelek
miletan». Wek ku hatibû gotin: «Dûndana te wê weha be.»[b]
19 Çaxê ew fikirî ku hema bêje bedena wî miriye – çimkî ew li dor
sed salî bû – û Sara nikare zarokan bîne, ew di baweriyê de qels
nebû. 20 Ew bi bawernekirinê li ser soza Xwedê dudilî nebû, lê belê
di baweriyê de hêzdar bû û rûmet da Xwedê. 21 Ew tam piştrast bû,
soza ku Xwedê daye, dikare bike jî. 22 Ji ber vê yekê baweriya wî
«jê re rastdarî hat hesab kirin.»[c] 23 Îcar gotina «jê re rastdarî hat
hesab kirin» ne tenê ji bo Birahîm hat nivîsîn, 24 lê belê ji bo me jî
hatiye nivîsîn. Ji me re jî bawerî wê rastdarî bê hesabkirin, em ên
ku baweriyê bi wî yê ku Xudanê me Îsa ji nav miriyan rakir, tînin.
25 Îsa di ber neheqiyên me de teslîmî mirinê hat kirin û ji bo rast-
derxistina me rabû.

---

[a] **4:17** Ji: Destpêkirin 17:5
[b] **4:18** Ji: Destpêkirin 17:5
[c] **4:22** Ji: Destpêkirin 15:6

**4:11** Destpêkirin 17:10
**4:13** Destpêkirin 17:4-6; Galatî 3:29
**4:14** Galatî 3:18
**4:16** Galatî 3:7
**4:19** Destpêkirin 17:17
**4:25** Îşaya 53:4-5

### *Aştî û Şahî*

5 Îcar, ji ber ku em bi baweriyê rastdar derketine, em bi saya
Xudanê me Îsa Mesîh, bi Xwedê re di aştiyê de ne. 2 Bi saya wî
em bi baweriyê gihîştine vê kerema ku em tê de sekinî ne. Û em bi
hêviya rûmeta ku Xwedê wê bide, pesnê xwe didin. 3 Ne bi vê tenê,
lê belê em bi tengahiyên xwe jî pesnê xwe didin, çimkî em dizanin
ku tengahî ragirtinê*, 4 ragirtin tecrûbê û tecrûbe jî hêviyê tîne.
5 Û hêvî me nade şermkirin, çimkî hezkirina Xwedê, bi saya
Ruhê* Pîroz ê ku ji me re hatiye dayîn, rijiyaye dilê me.
6 Ji ber ku hê em qels bûn, Mesîh di dema kifşkirî de ji bo
nepakan mir. 7 Kêm caran yek ji bo mirovekî rast dimire. Ji bo
mirovekî qenc belkî yek mirinê bide ber çavê xwe, 8 lê belê Xwedê
hezkirina xwe ya ji me bi vê kifş dike ku hê em gunehkar bûn,
Mesîh ji bo me mir. 9 Îcar niha em bi xwîna wî rastdar derketibin,
emê hê çiqas zêdetir bi saya wî ji xezebê xilas bibin. 10 Çimkî eger
hê ku em dijmin bûn, em bi mirina Kurê wî bi Xwedê re li hev
hatibin, niha bi wî re lihevhatî, emê hê çiqas bêtir bi jiyana Kurê
wî xilas bibin. 11 Lê belê ji vê zêdetir, em bi saya Xudanê xwe Îsa
Mesîhê ku em bi Xwedê re li hev anîne, pesnê xwe didin.
12 Loma ka çawa bi saya yek mirovî guneh ket dinyayê û ji
guneh mirin hat, wusa jî mirin derbasî hemû mirovan bû, çimkî
hemûyan jî guneh kir. 13 Hê beriya hatina Şerîetê li dinyayê guneh
hebû, lê eger şerîet nebe, guneh nayê hesabkirin. 14 Lê belê mirinê
ji dema Adem* heta dema Mûsa* hukumdarî kir. Heta li ser wan
ên ku wek sûcê Adem guneh nekirin jî.
Adem mînaka wî kesê ku wê bihata bû. 15 Lê belê diyarî ne
wek neheqiya wî ye. Çimkî eger gelek ji ber sûcê yek mirovî miri-
bin, kerema Xwedê û diyariya bi kerema yek mirovî, yanî bi ya Îsa
Mesîh, ji bo gelekan hê bêtir zêde bûye. 16 Û diyarî ne wek gunehê
wî kesî ye. Çimkî dîwankirina* yek sûcî, sûcdarî anî, lê diyariya
ku piştî gelek neheqiyan hat, rastdariyê tîne. 17 Çimkî eger mirinê,
ji ber neheqiya yek mirovî û bi wî, hukumdarî kiribe, yên ku kere-
ma Xwedê ya zêde û diyariya rastdariyê distînin, wê bi yekî, yanî
bi Îsa Mesîh di jiyanê de çiqas bêtir hukumdariyê bikin. 18 Îcar ka

---

5:12 Destpêkirin 3:6

çawa bi neheqiya yek mirovî, hemû mirov sûcdar derketin, wusa jî
bi karê rastdariyê yê yekî, ji bo hemû mirovan rastdarî û jiyan hat.
19 Û çawa bi neguhdariya yek mirovî gelek bûn gunehkar, wusa jî
bi guhdana yekî gelek wê rastdar bên derxistin. 20 Lê Şerîet ket
navberê, da ku sûc zêdetir bibe; lê belê li dera ku guneh lê zêde
bûye, kerem hê bêtir zêde bûye, 21 da ku çawa guneh bi mirinê hu-
kumdarî kir, wusa kerem jî bi rastiyê hukumdariyê bike û bi saya
Xudanê me Îsa Mesîh jiyana herheyî bîne.

### *Rabûna bi Mesîh*

6 Nexwe em çi bêjin? Ma ji bo ku kerem zêde bibe, em di nav
guneh de berdewam bikin? 2 Na, tu caran! Em ên ku li hember
guneh mirine, êdî çawa dikarin di nav guneh de bijîn? 3 An ma hûn
nizanin, em hemû yên ku di hevpariya Mesîh Îsa de imad* bûne,
em di hevpariya mirina wî de imad bûne. 4 Îcar em bi imadbûnê
bûn hevparên mirina wî, bi wî re hatin veşartin; da ku, çawa Mesîh
bi rûmeta Bav* ji nav miriyan rabû, wusa em jî di jiyana nûbûyî de
rêve herin.
5 Çimkî eger em di mirineke mîna ya wî de bi wî re bûbin yek,
emê di vejîna* wî de jî bi wî re bibin yek. 6 Em dizanin ku mirovê
me yê kevin bi wî re hatiye xaçkirin, da ku nefsa me ya gunehkar
betal bibe û êdî em ji guneh re xulamtiyê nekin. 7 Çimkî mirovê ku
miriye ji guneh azad bûye. 8 Îcar, eger em bi Mesîh re mirine, em
bawer dikin ku emê bi wî re bijîn jî. 9 Em dizanin ku Mesîh ji nav
miriyan rabûye û êdî ew namire û êdî hukumdariya mirinê li ser wî
nemaye. 10 Mirina ku ew mir bi carekê li hember guneh bû, lê jiya-
na ku ew dijî, ji Xwedê re dijî. 11 Bi vî awayî hûn jî xwe li hember
guneh mirî, lê bi Mesîh Îsa ji bo Xwedê zindî bihesibînin.
12 Îcar nebe ku guneh di bedena we ya mirindar de hukumda-
riyê bike û nebe ku hûn li gor xwestekên wê bikin. 13 Ne jî enda-
mên bedena xwe wek hacetên neheqiyê pêşkêşî guneh bikin. Lê
belê wek ên ku ji nav miriyan rabûne, xwe pêşkêşî Xwedê bikin û
endamên bedena xwe jî wek hacetên rastiyê pêşkêşî Xwedê bikin.
14 Çimkî guneh wê li ser we hukumdariyê neke. Ji ber ku hûn ne di
bin Şerîetê de, lê belê hûn di bin keremê de ne.

---

6:4 Kolosî 2:12

### *Xulamtiya Rastiyê*

15 Îcar çi? Ji ber ku em ne di bin Şerîetê de, lê belê di bin ke-
remê de ne, ma em guneh bikin? Na, tu caran! 16 Ma hûn nizanin
ku hûn ji bo xulamtiyê xwe bidin destê kê, hûn xulamên wî ne û
hûn bi ya wî dikin? An ji bo mirinê hûn xulamên guneh in, an jî ji
bo rastdariyê hûn xulamên guhdanê ne. 17 Lê şikir ji Xwedê re: Bi
ser ku hûn xulamên guneh bûn jî, we ji dil û can guh da tewrê wê
hîndariya ku hûn lê hatine spartin. 18 Îcar hûn ji guneh hatin azad-
kirin û ji rastdariyê re bûn xulam. 19 Ji ber qelsiya nefsa we ez li
gor mirovan dibêjim. Çawa ku we demekê endamên bedena xwe bi
xulamtî ji bo neheqiyê pêşkêşî pîsîtî û neheqiyê dikir, wusa jî niha
endamên bedena xwe bi xulamtî ji bo pîroziyê pêşkêşî rastdariyê
bikin. 20 Çaxê ku hûn xulamên guneh bûn, hûn ji rastdariyê azad
bûn. 21 Îcar hingê we çi ber ji wan tiştên ku niha hûn ji wan şerm
dikin, civand? Dawiya wan tiştan mirin e. 22 Lê niha hûn ji guneh
hatine azadkirin û ji Xwedê re bûne xulam. Berê ku hûn dicivînin,
pîrozî ye û dawiya wî jiyana herheyî ye. 23 Çimkî meaşê ku guneh
dide, mirin e; lê diyariya Xwedê, bi Xudanê me Mesîh Îsa jiyana
herheyî ye.

### *Mînakeke ji Qanûna Zewacê*

7 Ma hûn nizanin, birano – çimkî ez ji yên ku Şerîetê dizanin re
dibêjim – heta ku mirov sax e desthilatiya Şerîetê li ser wî he-
ye. 2 Mesela, jineke mêrkirî heta ku mêrê wê sax e, bi qanûnê pê ve
girêdayî ye; lê eger mêrê wê bimire, ew ji wê qanûna ku wê bi mêr
ve girêdide, azad dibe. 3 Îcar, heta ku mêrê wê sax be, ew bibe jina
mêrekî din, ew zînakar tê hesibandin. Lê eger mêrê wê bimire,
hingê ew ji wê qanûnê azad dibe û ew bibe jina mêrekî din jî, ew
ne zînakar e.

4 Bi vî awayî birayên min, hûn bi bedena Mesîh ji Şerîetê re
mirin, da ku hûn bibin yên yekî din, yanî yên wî yê ku ji nav mi-
riyan rabûye û em ji bo Xwedê ber bidin. 5 Dema ku hê em li gor
nefsê dijiyan, xwestekên guneh ên ku bi Şerîetê hişyar dibûn, di
endamên bedena me de dixebitîn, da ku ji mirinê re ber bidin. 6 Lê
em li hember Şerîeta ku em girtin mirine, em niha jê hatin azad-
kirin, da ku em ne di riya kevin a herfên Şerîetê de, lê di riya nû ya
Ruh de xizmetê bikin.

### *Şerîet û Guneh*

7 Îcar em çi bêjin? Ma Şerîet guneh e? Na, tu caran! Lê belê
eger Şerîet nebûya, minê nezanibûya ku guneh çi ye. Çimkî eger
Şerîetê negota: «Çavê xwe neavêjê tiştekî!»[a] , minê nezanibûya ku
çavavêtin çi ye. 8 Lê guneh bi rêberiya emir fersend dît û her cû-
reyê çavavêtinê di dilê min de peyda kir. Çimkî Şerîet tune be,
guneh mirî ye. 9 Ez bi xwe ji bo demekê, bê Şerîet zindî bûm, lê
gava emir hat, guneh vejiya 10 û ez mirim. Ew emrê ku diviya jiyan
bianiya, bû sedemê mirina min. 11 Çimkî guneh bi rêberiya emir
fersend dît, ez xapandim û bi destê wî ez kuştim. 12 Îcar Şerîet
pîroz e û emir pîroz, rast û qenc e.

13 Nexwe, ma tiştê qenc ji min re mirin anî? Na, tu caran! Lê
guneh, ji bo kifş bibe ku guneh e, bi tiştê qenc ji min re mirin anî,
da ku bi saya emir guneh hê bêtir gunehkarî bê dîtin. 14 Çimkî em
dizanin ku Şerîet ruhanî ye, lê ez nefsanî me û wek xulamekî ji
guneh re hatime firotin. 15 Ez nizanim ku ez çi dikim. Çimkî tiştê
ku ez dixwazim ez nakim, lê belê tiştê ku ez jê nefret dikim, ez di-
kim. 16 Lê eger tiştê ku ez naxwazim ez bikim, ez erê dikim ku Şe-
rîet qenc e. 17 Nexwe, hingê yê ku vî tiştî dike ne ez im, lê belê ew
gunehê ku di dilê min de rûdine, dike. 18 Çimkî ez dizanim ku di
dilê min de, yanî di nefsa min de, tiştekî qenc nasekine. Daxwaza
min heye, lê ez nikarim tiştê qenc pêk bînim 19 Tiştê qenc ê ku ez
dixwazim, ez nakim; lê belê tiştê xerab ê ku ez naxwazim, ez di-
kim. 20 Îcar, eger ez tiştê ku ez naxwazim bikim, hingê yê ku dike
ne ez im, lê belê ew gunehê ku di dilê min de ye dike. 21 Nexwe ez
ji vê yekê vê qanûnê dertînim: Gava ku ez dixwazim ya qenc
bikim, ya xerab li ber min amade ye. 22 Li gor mirovê hundir kêfa
min ji Şerîeta Xwedê re tê, 23 lê ez di endamên bedena xwe de qa-
nûneke din dibînim. Ev jî bi qanûna ku hişê min qebûl dike re şer
dike û min ji qanûna guneh re ya ku di endamên min de ye, dike
hêsîr*. 24 Ez çi mirovekî reben im! Kî wê min ji vê bedena mirinê
rizgar bike? 25 Bi saya Xudanê me Îsa Mesîh, şikir ji Xwedê re!

Îcar ez bi hişê xwe ji qanûna Xwedê re, lê bi nefsa xwe ji qa-
nûna guneh re xulamtiyê dikim.

---

[a] 7:7 Ji: Derketin 20:17; Dubarekirina Şerîetê 5:21
7:15 Galatî 5:17

### *Jiyana di Ruh de*

8 Ji ber vê yekê, niha ji bo wan ên ku bi Mesîh Îsa re ne, tu sûc-
darderketin tune. 2 Çimkî qanûna Ruhê ku bi Mesîh Îsa jiyanê
dide, ez ji Şerîeta guneh û mirinê azad kirim. 3 Ew tiştê ku Şerîetê
nikaribû bike, ji ber ku ji sedemê nefsê ji hêz ketibû, Xwedê kir:
Wî Kurê xwe di şiklê bedena gunehkar de şand, da ku bibe goriya*
gunehan û bi vî awayî guneh di nefsa mirov de sûcdar derxist.
4 Wusa ku rastdariya ku Şerîet dixwaze, di jiyana me yên ku ne li
gor nefsê, lê belê li gor Ruh rêve diçin de, bê cih. 5 Çimkî yên ku li
gor nefsê dijîn, li ser tiştên nefsê difikirin, lê yên ku li gor Ruh di-
jîn, li ser tiştên Ruh difikirin. 6 Dawiya fikirîna li gor nefsê mirin e,
lê dawiya fikirîna li gor Ruh jiyan û aştî ye. 7 Çimkî fikirîna li gor
nefsê dijminahiya li hember Xwedê ye, ew bi ya Şerîeta Xwedê
nake û hem jî nikare bike. 8 Îcar yên ku li gor nefsê dijîn, nikarin li
Xwedê xweş bên.

9 Lê hûn ne li gor nefsê, lê li gor Ruh* dijîn, çimkî Ruhê*
Xwedê di dilê we de rûdine. Kesê ku Ruhê* Mesîh pê re tune be,
ew ne yê Mesîh e. 10 Û eger Mesîh di dilê we de be, beden ji ber
guneh mirî ye, lê Ruh ji ber rastdariyê jiyanê dide. 11 Û eger Ruhê
wî yê ku Îsa ji nav miriyan rakir, di dilê we de rûniştiye, ewê ku
Mesîh ji nav miriyan rakir, wê bi Ruhê xwe yê ku di dilê we de
rûdine, bedenên we yên mirindar jî vejîne*.

12 Îcar birano, madem ku wusa ye, em deyndar in, lê ne deyn-
darên nefsê ne ku em li gor wê bijîn. 13 Çimkî eger hûn li gor nefsê
bijîn, hûnê bimirin; lê eger hûn kirinên bedenê bi Ruh bikujin, hû-
nê bijîn.

14 Hemû yên ku bi Ruhê Xwedê tên rêvebirin, kurên Xwedê
ne. 15 Çimkî we ruhê xulamtiyê yê ku careke din we dibe tirsê
nestand, lê belê we ruhê kurîtiyê stand. Û em bi vî Ruhî «Abba –
Bavo!» gazî dikin. 16 Ruh bi xwe, bi ruhê me re şahidiyê dike ku
em zarokên Xwedê ne. 17 Madem ku em zarok in, hingê em wêris
in jî, em wêrisên Xwedê û hemwêrisên Mesîh in. Û madem ku em
bi wî re cefayê dikişînin, emê bi wî re bên birûmetkirin jî.

18 Ez dihesibînim ku ev cefayê vî wextî, li ber wê rûmeta ku

---

**8:15-17** Galatî 4:5-7

wê ji me re bê eşkerekirin, qet ne tiştek e. [19] Çimkî afirandin, bi ben-
dewariyeke kelegerm li hêviya xuyabûna zarokên Xwedê disekine.
[20] Ji ber ku afirandin ne bi daxwaza xwe, lê belê ji ber wî yê ku ew
bindest kiriye, li ber pûçîtiyê hatiye bindestkirin. Lê belê hêvî heye
[21] ku afirandin bi xwe jî, ji xulamtiya rizîbûnê azad bibe û bigihîje
azadiya zarokên Xwedê ya bi rûmet. [22] Çimkî em dizanin ku teva-
hiya afirandinê heta niha bi hev re dinale û wek êşa zarokanînê êşê
dikişîne. [23] Û ne bi tenê afirandin, lê em bi xwe jî, em ên ku me Ruh
wek para* pêşî standiye, ji kûr ve dinalin û li benda kurîtiyê û azad-
bûna bedena xwe ne. [24] Çimkî em bi hêviyê xilas bûn. Lê hêviya ku
tê dîtin, ne hêvî ye. Ma tiştê ku mirov dibîne çawa hêvî dike? [25] Lê
eger em, tiştê ku em nabînin hêvî bikin, em bi sebir li bendê dimînin.
[26] Bi vî awayî Ruh jî di qelsiya me de alîkariyê dike. Çimkî em
nizanin ka divê em çawa dua bikin; lê belê Ruh bi xwe bi nalînên
ku nayên îfadekirin ji bo me mehderê* dike. [27] Û Xwedayê ku li
dilan dikole bi fikirîna Ruh dizane. Çimkî Ruh li gor daxwaza
Xwedê ji bo pîrozan mehderê dike.
[28] Îcar em dizanin ji bo wan ên ku ji Xwedê hez dikin û li gor
mebesta wî hatine gazîkirin, hemû tişt bi hev re ji bo qenciyê
dixebitin. [29] Çimkî Xwedê ew ên ku ji berê ve bijartine, ji berê ve
kifş jî kirin ku di sûretê Kurê wî de bin. Wusa ku Kur di nav gelek
birayan de yê nixurî be. [30] Û Xwedê yên ku ji berê ve kifş kiribûn
gazî jî kirin, yên gazîkirî rastdar jî derxistin û yên rastdar derxistî
bi rûmet jî kirin.

### *Hezkirina Xwedê ya bi Mesîh*

[31] Îcar em li ser van tiştan çi bêjin? Piştî ku Xwedê ji aliyê me
ye, kî dikare li hember me be? [32] Ewê ku Kurê xwe nedirixand*, lê
belê ji bo me hemûyan ew teslîm kir, ma ewê çawa bi wî re her
tiştî nede me. [33] Ma kî dikare bijartiyên Xwedê sûcdar bike? Yê ku
wan rast derdixe Xwedê ye. [34] Ma kî dikare sûcdar derxe? Mesîh
Îsa yê ku mir û ji vê jî zêdetir ji nav miriyan rabû, li milê Xwedê
yê rastê ye û mehdera* me dike. [35] Ma kî dikare me ji hezkirina
Mesîh veqetîne? Ma cefa, an tengahî, an êşandin, an xela, an ta-
zîbûnî, an talûke, an ku şûr? [36] Wek ku hatiye nivîsîn:

---

8:20 Destpêkirin 3:17-19 8:23 2 Korîntî 5:1-4

«Tevahiya rojê em di ber te de tên kuştin,
Wek miyên serjêkirinê tên hesibandin.»[a]
37 Lê belê bi saya wî yê ku ji me hez dike, em di van hemûyan de
hê bêtir bi ser dikevin. 38 Çimkî ez piştrast im ku ne mirin, ne ji-
yan, ne milyaket, ne serwerî, ne tiştên niha heyî, ne tiştên ku bên,
ne hêz, 39 ne bilindahî, ne kûrahî û ne jî afirînekî din dikare me ji
hezkirina Xwedê ya ku bi Xudanê me Mesîh Îsa ye, veqetîne.

### *Yên ku Xwedê Bijartine*

9 Ez yê Mesîh, rastiyê dibêjim, ez derewan nakim û wijdana min
jî bi Ruhê Pîroz vê yekê ji min re erê dike: 2 Xemgîniyeke min
a mezin û di dilê min de êşeke bêrawestin heye. 3 Çimkî min dix-
west ku ji bo birayên min, hemnîjadên min, nifir li min bi xwe bi-
bûya û ez ji Mesîh dûr biketama. 4 Ew Îsraêlî ne; kurîtî, rûmet,
peyman*, dayîna Şerîetê, perizîn* û soz yên wan in. 5 Bav û kal,
yên wan in û li gor bedenê Mesîh ji wan e. Mesîh li ser hemûyan e,
Xwedayê her û her pîroz e. Amîn*.
6 Lê ev nayê wê manê ku peyva Xwedê pûç derketiye. Çimkî
hemû yên ku ji dûndana* Îsraêl in, ne Îsraêlî ne. 7 Ew ji dûndana
Birahîm* bin jî, hemû ne zarokên wî ne. Lê hatiye gotin: «Ji Îs-
haq* dûndana te wê zêde bibe.»[b] 8 Yanî ne zarokên bedenê zarokên
Xwedê ne, lê belê zarokên sozê dûndan tên hesibandin. 9 Çimkî
gotina sozê ev bû: «Saleke din, di vê demê de ezê vegerim û wê
kurekî Sara hebe.»[c] 10 Ne bi tenê ev, lê zarokên Rebeka* jî ji yek
bavî, ji bavê me Îshaq bûn. 11-12 Hê ku zarok çênebûbûn û tiştekî
qenc an xerab nekiribûn, ji wê re hat gotin ku: «Yê mezin wê ji yê
biçûk re xulamtiyê bike.»[d] Ev wusa çêbû, da ku mebesta bijartina
Xwedê ne li gor kirinan, lê li gor gazîkirina wî be. 13 Wek ku ha-
tiye nivîsîn: «Min ji Aqûb* hez kir, lê ji Esaw* nefret kir.»[e]
14 Îcar em çi bêjin? Ma gelo neheqî li ba Xwedê heye? Na, tu
caran! 15 Çimkî ew ji Mûsa* re dibêje:
«Yê ku ez rehmê lê dikim, ezê rehmê lê bikim
Û yê ku dilê min pê dişewite, wê pê bişewite.»[f]

---

[a] 8:36 Ji: Zebûr 44:22
[b] 9:7 Ji: Destpêkirin 21:12
[c] 9:9 Ji: Destpêkirin 18:10, 14
[d] 9:11-12 Ji: Destpêkirin 25:23
[e] 9:13 Ji: Melaxî 1:2-3
[f] 9:15 Ji: Derketin 33:19

16 Îcar ev ne bi xwestin û bezîna mirov, lê belê bi rehma Xwedê ye.
17 Çimkî di Nivîsara Pîroz de ji Firewn* re weha tê gotin: «Ji bo vê
yekê min tu rakirî, da ku ez hêza xwe li ser te nîşan bidim û navê
min li seranserê dinyayê bê danbihîstin.»[a] 18 Loma ew bixwaze
rehmê li kê bike, dike û bixwaze dilê kê hişk bike, hişk dike.

### *Xezeb û Dilovaniya Xwedê*

19 Îcar tê ji min re bêjî: «Nexwe çima Xwedê hê li qusûra
mirov dinêre? Ma kî dikare li hember daxwaza wî raweste?» 20 Lê
camêr, tu kî yî ku tu li hember Xwedê bersîvê didî? Gelo tiştê ku ji
herriyê hatiye çêkirin, ji yê ku ew çêkiriye re dibêje: «Te çima ez
weha çêkirim?» 21 Ma desthilatiya cerçêker li ser herriyê tune ku ji
eynî loda herriyê firaxekê ji bo karên bi rûmet û yeke din jî ji bo
karên bêrûmet çêke? 22 Eger Xwedê ji ber ku dixwest xezeba xwe
nîşan bide û hêza xwe bide zanîn, bi bîhnfirehiyeke mezin li hem-
ber wan firaxên ku hêjayî xezebê ne û ji bo helakbûnê amade ne,
ragirtibe*, em çi bêjin? 23 Wî wusa kir, da ku dewlemendiya rû-
meta xwe ji firaxên rehmê re bide zanîn, yên ku wî ji berê ve ew ji
bo rûmetê amade kirin. 24 Em jî di nav wan de ne, yên ku wî ne
tenê ji nav Cihûyan, lê ji nav miletên din jî gazî kirin. 25 Wek ku
ew di nivîsara Hoşêya pêxember de jî dibêje:

> «Ji yên ku ne gelê min in re ezê bêjim: ‹Gelê min›
> Û ji ya heznekirî re ezê bêjim: ‹Hezkiriya min.›»[b]
> 26 Û «li dera ku ji wan re hatiye gotin: ‹Hûn ne gelê min in›,
> Li wê derê wê ji wan re bê gotin: ‹Zarokên Xwedayê jîndar.›»[c]

27 Îşaya* pêxember jî li ser Îsraêl weha diqîre: «Hijmara zarokên*
Îsraêl bi qasî seylaka* ber deryayê be jî, bi tenê jêmayiyeke wan
wê xilas bibe. 28 Çimkî Xudan wê fermana xwe zûka û bi carekê li
ser rûyê erdê pêk bîne.»[d] 29 Wek ku Îşaya ji berê ve gotiye: «Eger
Xudanê Ordiyan ji me re dûndanek nehişta, emê bibûna wek So-
domê û bimînana Gomorayê.»[e]

---

[a] 9:17 Ji: Derketin 9:16
[b] 9:25 Ji: Hoşêya 2:23
[c] 9:26 Ji: Hoşêya 1:10
[d] 9:27-28 Ji: Îşaya 10:22-23
[e] 9:29 Ji: Îşaya 1:9

9:20 Îşaya 29:16; 45:9
9:29 Destpêkirin 19

### *Bêbaweriya Îsraêl*

30 Îcar em çi bêjin? Ew miletên ku li pey rastdariyê neçûn,
gihîştin rastdariyê, yanî gihîştin wê rastdariya ku ji baweriyê tê.
31 Lê gelê Îsraêl ê ku li pey şerîeta ku rastdariyê pêşkêş dike diçû,
negihîşt wê şerîetê. 32 Çima? Ji ber ku ew ne bi baweriyê, lê belê
wek ku wê bi kirinan çêbe lê geriyan. Ew li kevirê terpilînê ketin û
terpilîn*. 33 Wek ku hatiye nivîsîn:

«Va ye, ez li Siyonê* kevirekî terpilînê,
Lateke hilterpilînê datînim.
Lê yê ku baweriyê bi wî bîne, nayê şermkirin.»[a]

10 Birano, daxwaza dilê min û lavakirina min a ji Xwedê ji bo
xilasiya Îsraêliyan e. 2 Ez ji bo wan şahidiyê dikim ku xî-
reta wan ji bo Xwedê heye, lê belê xîreta wan ne bi zanîn e.
3 Çimkî wan rastdariya ku ji Xwedê tê, fêm nekir û xebitîn ku ya
xwe bi xwe ava bikin û serî li ber rastdariya Xwedê danenîn.
4 Çimkî Mesîh dawiya Şerîetê ye, da ku ji bo her kesê ku bawer
bike rastdarî hebe.

### *Xilasî ji bo Her Kesî*

5 Mûsa li ser rastdariya ku ji Şerîetê tê weha dinivîse: «Mirovê
ku van tiştan bike, wê bi wan bijî.»[b] 6 Lê rastdariya ku ji baweriyê
ye weha dibêje: «Di dilê xwe de nebêje: Kî wê hilkişe ezmên?» –
yanî, ji bo ku Mesîh bîne xwarê – 7 an jî: «Kî wê dakeve diyarê*
miriyan?» – ji bo ku Mesîh ji nav miriyan derîne. – 8 Lê belê çi
dibêje? Dibêje: «Peyv» – yanî peyva baweriyê ya ku em didin
bihîstin – «nêzîkî te ye, li ser zimanê te û di dilê te de ye».[c] 9 Eger
tu bi devê xwe eşkere bikî ku Îsa Xudan e û di dilê xwe de bawer
bikî ku Xwedê ew ji nav miriyan rakiriye, tê xilas bibî. 10 Çimkî ji
bo rastdariyê bi dil tê bawerkirin û ji bo xilasbûnê jî bi dev tê
eşkerekirin. 11 Nivîsara Pîroz dibêje: «Her kesê ku baweriyê bi wî
bîne, nayê şermkirin.»[d] 12 Di navbera Cihû û miletên din de cihêtî
tune; eynî Xudan Xudanê hemûyan e û ji hemûyên ku gazî wî

---

[a] **9:33** Ji: Îşaya 8:14; 28:16
[b] **10:5** Ji: Qanûna Kahîntiyê 18:5
[c] **10:6-8** Ji: Dubarekirina Şerîetê 9:4; 30:12-14
[d] **10:11** Ji: Îşaya 28:16

dikin re merd e. 13 Çimkî: «Her kî ku gazî navê Xudan bike, wê
xilas bibe.»[a]
14 Lê ewê çawa gazî wî yê ku bawerî pê neanîne bikin? Û ewê
çawa baweriyê bi wî yê ku li ser nebihîstine bînin? Îcar bêyî ku
yek bide bihîstin, ewê çawa bibihîzin? 15 Û eger ew neyên şandin,
ewê çawa Mizgîniyê bidin? Wek ku hatiye nivîsîn: «Lingên wan
ên ku Mizgîniya xêrê tînin çi spehî ne.»[b] 16 Lê belê hemûyan li gor
Mizgîniyê nekir. Çimkî Îşaya dibêje: «Ya Xudan, kê bi xebera ku
me da, bawer kir?»[c] 17 Îcar bawerî ji bihîstinê tê û tiştê bihîstî ji
peyva Mesîh e. 18 Lê belê ez dibêjim: Ma wan nebihîst? Belê, bê-
guman bihîstin; çimkî: «Dengê wan gihîşt tevahiya erdê û peyvên
wan gihîştine kujên dinyayê.»[d] 19 Dîsa ez dibêjim: Ma Îsraêl ev
fêm nekir? Pêşî Mûsa dibêje:

«Ezê we, bi wan ên ku ne milet in bînim xîretê
Û bi miletekî fêmkor hêrsa we rakim.»[e]

20 Îşaya bê tirs weha dibêje:

«Ez ji aliyê wan ên ku li min nedigeriyan ve hatim dîtin,
Ez li yên ku li min nedipirsîn xuya bûm.»[f]

21 Lê li ser Îsraêl weha dibêje: «Tevahiya rojê min destên xwe
dirêjî miletekî rikdar û neguhdar kir.»[g]

### *Redkirina Îsraêl ne ya Dawî Ye*

11 Îcar ez dipirsim: Ma Xwedê gelê xwe red kir? Na, tu caran!
Ez bi xwe jî yekî Îsraêlî me, ji dûndana Birahîm û ji eşîra
Binyamîn* im. 2 Xwedê gelê xwe yê ku ji berê ve bijartiye red
nekir. An ma hûn nizanin ku Nivîsara Pîroz li ser Êlyas* çi dibêje
û ew çawa li ber Xwedê giliyê Îsraêl dike? 3 Ew dibêje: «Ya
Xudan, wan pêxemberên te kuştin, gorîgehên* te hilweşandin. Ez
bi tenê mam û li kuştina min jî digerin.»[h] 4 Lê bersîva ku Xwedê
dide wî, çi ye? «Min heft hezar mirovên ku li ber Baal* neçûne ser

---

[a] **10:13** Ji: Yoêl 2:32
[b] **10:15** Ji: Îşaya 52:7
[c] **10:16** Ji: Îşaya 53:1
[d] **10:18** Ji: Zebûr 19:4
[e] **10:19** Ji: Dubarekirina Şerîetê 32:21
[f] **10:20** Ji: Îşaya 65:1
[g] **10:21** Ji: Îşaya 65:2
[h] **11:3** Ji: 1 Padîşah 19:10, 14
**11:1** Filîpî 3:5

çokan, ji xwe re veqetandine.»[a] 5 Wusa, di vî wextî de jî jêmayi-
yeke ku bi keremê hatiye hilbijartin heye. 6 Îcar, eger ev bi keremê
be, êdî ne bi kirinan e; an nexwe kerem êdî nabe kerem.
7 Îcar çi? Îsraêl negihîşt tiştê ku lê digeriya. Lê yên bijartî
gihîştinê û dilê yên din hişk bû, 8 wek ku hatiye nivîsîn:

«Xwedê ruhekî tevizîbûnê daye wan,
Heta roja îro jî çavên ku nabînin
Û guhên ku nabihîzin dane wan.»[b]

9 Û Dawid* dibêje:

«Bila sifra wan ji bo wan bibe
Daf û xefik, ceza û terpilîn*.
10 Bila çavên wan tarî bibin, da ku nebînin
Û herdem pişta wan xwar be.»[c]

### *Xilasbûna Miletan*

11 Îcar ez dipirsim: Ma ji bo ku ew bikevin, ew terpilîn? Na, tu
caran! Lê belê bi terpilîna wan xilasî ji miletan re hat, da ku Îsraêlî
bihesidin. 12 Îcar, eger terpilîna wan ji dinyayê re û şkestina wan ji
miletan re bûbe dewlemendî, temambûna hijmara wan hê çiqas
bêtir wê bibe dewlemendî!
13 Lê niha ez ji we miletan re dibêjim: Madem ku ez Şandiyê*
miletan im, ez xizmeta xwe bilind dikim, 14 da ku ez bi riyekê, yên
ku ji gelê min in bihesidînim û hinekan ji wan xilas bikim. 15 Çim-
kî eger redbûna wan bûbe lihevhatina dinyayê ya bi Xwedê re, hin-
gê qebûlbûna wan ne jiyana ji nav miriyan be, wê çi be?
16 Eger hevîrê pêşî pîroz be, tevahiya hevîr pîroz e. Eger ra*
pîroz be, çiqil jî pîroz in. 17 Lê eger hin çiqil hatin birrîn û tu yê ku
dara zeytûnê ya bejik î û bi wan ve hatiyî tamandin û bûyî hevparê
ra û qelewiya dara zeytûnê, 18 li hember wan çiqilan pesnê xwe ne-
de. Lê eger tu pesnê xwe didî, bîne bîra xwe ku ne tu ra hildigirî, lê
belê ra te hildigire. 19 Belkî jî tu bêjî: «Çiqilên darê hatin birrîn, da
ku ez bêm tamandin.» 20 Erê, rast e. Ew ji ber bêbaweriya xwe
hatin birrîn, lê belê tu bi baweriyê disekinî. Îcar pozbilind nebe, lê

---

[a] **11:4** Ji: 1 Padîşah 19:18 [b] **11:8** Ji: Dubarekirina Şerîetê 29:4; Îşaya 29:10
[c] **11:9-10** Ji: Zebûr 69:22-23
**11:16** Hijmartin 15:17-21

bitirse. 21 Çimkî eger Xwedê, çiqilên darê yên xweheyî* nedirixan-
dibin*, te jî nadirixîne. 22 Îcar bala xwe bide qencî û hişkiya Xwe-
dê. Ew li hember ên ketî hişk e; lê ji te re qenc e – eger tu di qen-
ciya wî de bimînî. An na tu jî, tê bêyî birrîn. 23 Û eger Îsraêlî jî di
bêbaweriyê de nemînin, wê bên tamandin; çimkî Xwedê dikare
wan careke din bitamîne. 24 Çimkî eger tu ji dareke zeytûnê ya ku
di xweheyiya xwe de bejik e, hatiyî birrîn û bervajiyê xweheyiyê
bi dara zeytûna qenc ve hatiyî tamandin, ew ên ku çiqilên xweheyî
ne, wê hê çiqas zêdetir bi dara xwe ya zeytûnê ve bên tamandin!

### *Hemû Gelê Îsraêl Wê Xilas Bibe*

25 Birano, ez naxwazim ku hûn ji vê sirê bêhay bin, da ku hûn
xwe zana nebînin. Sir ev e ku dilê pareke gelê Îsraêl hişk bû, heta
ku hijmara miletên ku wê xilas bibin temam be. 26 Û bi vî awayî
tevahiya Îsraêl wê xilas bibe, wek ku hatiye nivîsîn:

«Rizgarkar wê ji Siyonê* bê,
Ewê nepakiyê ji Aqûb* dûr bixe.
27 Çaxê ku ez gunehên wan rakim,
Peymana* min a bi wan re ev e.»[a]

28 Ji aliyê Mizgîniyê ve ew ji bo feyda we dijmin in, lê ji aliyê bi-
jartinê ve ew ji bo xatirê bav û kalan hezkirî ne. 29 Çimkî diyariyên
Xwedê û gazîkirina wî bi şûn ve nayên standin. 30 Çawa ku deme-
kê we bi ya Xwedê nekir û niha bi neguhdariya wan hûn gihîştin
rehmê; 31 bi vî awayî niha ev bûn neguhdar, da ku bi wê rehma ku
li we bûye, ew jî bigihîjin rehmê. 32 Çimkî Xwedê hemû kirin girti-
yên neguhdariyê, da ku li hemûyan rehmê bike.

33 Ey kûrahiya dewlemendî, şehrezayî û zanîna Xwedê! Ma kî
dikare dîwankirina* wî fêm bike! Ma kî dikare riyên wî salix bide!

34 «Ma kê bi fikra Xudan zaniye?
An kî jê re bû şîretkar?»[b]
35 «Ma kê pêşî tiştek daye wî,
Ku bi şûn ve bistîne?»[c]

36 Çimkî her tişt ji wî ye, bi wî ye û ji bo wî ye. Bila rûmet her û
her ji wî re be. Amîn.

---

a **11:26-27** Ji: Îşaya 59:20-21; 27:9  b **11:34** Ji: Îşaya 40:13; Yêremya 23:18
c **11:35** Ji: Eyûb 41:11
**11:33** Îşaya 55:8-9  **11:36** 1 Korîntî 8:6

### *Jiyana Nû ya bi Mesîh*

12 Ji bo vê yekê birano, ez ji ber rehma Xwedê ji we hêvî di-
kim ku hûn bedena xwe wek goriyeke zindî, pîroz û ji bo
Xwedê meqbûl pêşkêş bikin. Perizîna* we ya ruhanî ev e. 2 Hûn li
gor vê dinyayê nekin, lê belê bi nûbûna hişê xwe werin guhertin,
da ku hûn fêm bikin daxwaza Xwedê – tiştên qenc, meqbûl û bêkê-
mahî – çi ye.
3 Ez bi wê kerema ku ji min re hatiye dayîn ji her yekî ji we re
dibêjim: Bila tu kes ji ya ku pêwist e zêdetir li ser xwe nefikire, lê
bila li gor pîvana baweriya ku Xwedê li her kesî leva* kiriye, bi
sergiranî bifikire. 4 Çimkî wek ku di bedena me de gelek endam
hene û karê hemû endaman cihê ye, 5 wusa jî em ên ku gelek in,
em bi Mesîh yek beden in û em hemû endamên hev in. 6 Û li gor
kerema ku ji me re hatiye dayîn, diyariyên me yên cihê hene. Eger
diyariya yekî pêxemberîtî be, bila li gor pîvana baweriyê bike.
7 Eger xizmet be, bila xizmetê bike; eger mamoste be, bila hîn
bike. 8 Eger şîretkar be, bila şîretkariyê bike. Yê ku dide, bila bi
merdî bide. Yê ku serweriyê dike, bila bi xîretkêşî bike. Yê ku
dilovaniyê dike, bila bi rûgeşî bike.

### *Hezkirin*

9 Bila hezkirin bê durûtî be. Ji ya xerab nefret bikin, xwe li ya
qenc bigirin. 10 Di biraheziyê de, bi dilovanî ji hevdû hez bikin. Di
hurmetgirtinê de ji xwe bêtir hurmeta hevdû bigirin. 11 Di xîret-
kêşiyê de sist nebin, di ruh de kelegerm bin, ji Xudan re xizmetê
bikin. 12 Di hêviyê de şa bin, di tengahiyê de sebir bikin, di duayê
de bi xîret bin. 13 Ji hewcedariyên pîrozan re alîkar bin, xwe bidin
mêvanperweriyê. 14 Yên ku tengahiyê didin we, ji wan re qenciyê
bixwazin; qencîxwaz bin û nifiran li wan nekin. 15 Bi yên ku şa ne
re, şa bin, bi yên ku digirîn re bigirîn. 16 Li hember hev hemfikir
bin. Ne pozbilind bin, lê bi yên ku kêm tên dîtin re, hevaltiyê
bikin; xwe zana nebînin. 17 Di şûna xerabiyê de li tu kesî xerabiyê
nekin; lê li ber hemû mirovan hay ji kirina tiştên qenc hebin.
18 Eger bibe, heta ku ji destê we bê, bi hemû mirovan re di aştiyê
de bin. 19 Hezkirîno, heyfa xwe nestînin, lê rê bidin xezeba Xwedê.

---

**12:4-8** 1 Korîntî 12:4-12 **12:14** Metta 5:44 **12:16** Gotinên Silêman 3:7

Çimkî hatiye nivîsîn: «Heyfhilanîn ya min e. Xudan dibêje: ‹Ezê
bergîdana* wê bidim.›»[a] [20] Lê belê: «Eger dijminê te birçî be, xwa-
rinê bidê; tî be, avê bidê. Çimkî bi kirina vê yekê, tê pelên êgir bi
serê wî de kom bikî.»[b] [21] Bila xerabî te bindest neke; lê belê tu bi
qenciyê xerabiyê bindest bike.

### *Serî li ber Desthilatiyê Danîn*

13 Bila her kes bi ya hukûmeta li ser xwe bike; çimkî hukû-
meta ku ne ji aliyê Xwedê ve ye tune û yên heyî ji aliyê
Xwedê ve hatine danîn. [2] Ji ber vê yekê, yê ku li hember desthi-
latiyê derkeve, ew li ber sazûmana Xwedê radibe û yên ku li ber
radibin, wê dîwankirina xwe bînin. [3] Çimkî hukumdar ne ji bo karê
qenc, lê belê ji bo karê xerab tirsdar in. Ma tu dixwazî ku ji hu-
kûmetê netirsî? Tu ya qenc bike, tê ji aliyê wê ve bêyî pesindan.
[4] Çimkî ew ji bo qenciya te xizmetkarê Xwedê ye. Lê eger tu ya
xerab bikî, bitirse; ji ber ku ew badîhewa şûr hilnagire. Ew xiz-
metkarê Xwedê ye, da ku xezebê li yê ku xerabiyê dike bibarîne û
wan ceza bike. [5] Loma ne tenê ji ber xezebê, lê belê ji ber wijdanê
jî divê serî bê danîn. [6] Ji ber vê yekê hûn bacê jî didin, çimkî ew
xizmetkarên Xwedê ne û karê wan ev e. [7] Heqê her kesî bidinê: Yê
ku heqê wî yê bacê heye, bacê bidinê, yê ku heqê wî yê gumrikê
heye, gumrikê; yê ku heqê wî yê tirsê heye, tirsê û yê ku heqê wî
yê siyanetê* heye, siyaneta wî bigirin.

[8] Ji hevhezkirinê pê ve ji bo tu tiştî nebin deyndarê tu kesî.
Çimkî yê ku ji yê din hez dike, Şerîet pêk aniye. [9] Ew emrê ku di-
bêje: «Zînayê neke», «Nekuje», «Nedize», «Çavê xwe neavêjê tiş-
tekî»[c] û eger emrekî din hebe, hemû dikevin nav vê gotinê: «Wek
ku tu ji xwe hez dikî, ji cîranê xwe hez bike.»[d] [10] Hezkirin xerabiyê
li cîran nake; loma hezkirin pêkanîna Şerîetê ye.

[11] Vê yekê bikin, çimkî hûn dizanin ku çi wext e; êdî saet hat
ku hûn ji xewê hişyar bibin, ji ber ku niha xilasiya me, ji dema ku
me bawerî anî nêzîktir e. [12] Şev pêşve çûye, roj nêzîk bûye. Îcar

---

[a] **12:19** Ji: Dubarekirina Şerîetê 32:35 [b] **12:20** Ji: Gotinên Silêman 25:21-22

[c] **13:9** Ji: Derketin 20:13-15, 17; Dubarekirina Şerîetê 5:17-19, 21

[d] **13:9** Ji: Qanûna Kahîntiyê 19:18

**13:6** Metta 22:21

rabin, em karên tariyê ji ser xwe bavêjin û xwe bi çekên ronahiyê
rapêçin. 13 Wek ku bi roj e, em bi awayekî serfiraz rêve herin; ne bi
kêfkirina bi harîtî û serxweşî, ne bi fuhûşî û şehwetê, ne bi pevçûn
û ne jî bi çavnebariyê. 14 Lê belê xwe bi Xudan Îsa Mesîh rapêçin û
ji bo xwestekên nefsê tu tiştî peyda nekin.

### *Hevdû Dadbar Nekin*

14 Yê ku di baweriyê de qels e qebûl bikin, lê li ser fikrên xu-
malî bi wî re devjeniyê nekin. 2 Baweriya yekî heye ku her
tiştî bixwe, lê yê qels bi tenê pincarê dixwe. 3 Bila yê ku dixwe, wî
yê ku naxwe kêm nebîne û yê ku naxwe bila wî yê ku dixwe dad-
bar* neke; çimkî Xwedê ew qebûl kiriye. 4 Tu kî yî ku tu xizmet-
karê yekî din dadbar dikî? Ew dikeve an disekine, mîrzayê wî
dizane; lê ewê bisekine, çimkî Xudan dikare wî bisekinîne.
5 Yek, rojekê di ser roja din re digire, yê din hemû rojan wek-
hev dibîne. Bila her yek ji dîtina xwe piştrast be. 6 Yê ku rojekê di
ser rojeke din de digire, ji bo Xudan digire û yê ku dixwe jî ji bo
Xudan dixwe, çimkî ji Xwedê re şikir dike. Û yê ku naxwe jî ji bo
Xudan naxwe û ji Xwedê re şikir dike.
7 Ji me tu kes ji bo xwe najî û tu kes ji bo xwe namire. 8 Eger
em bijîn, em ji bo Xudan dijîn; eger em bimirin, em ji bo Xudan
dimirin. Îcar em bijîn jî, em bimirin jî, em yên Xudan in. 9 Ji ber ku
Mesîh ji bo vê yekê mir û vejiya, da ku ew hem bibe Xudanê miri-
yan û hem jî yê zindiyan.
10 Îcar tu çima birayê xwe dadbar dikî? An tu çima birayê xwe
kêm dibînî? Em hemû, emê li ber kursiyê Xwedê yê dîwanê ra-
westin. 11 Çimkî hatiye nivîsîn:

«Xudan dibêje: Bi heyîna min, her çok wê li ber min bitewe
Û her ziman wê eşkere bike û bêje: ‹Tu Xwedê yî.›»[a]

12 Îcar her yek ji me wê li ser xwe hesab bide Xwedê.

### *Kesî Neterpilînin*

13 Loma êdî em hevdû dadbar nekin. Lê hê zêdetir, biryarê
bidin ku hûn astengekê daneynin pêşiya birayekî ku biterpile* an ji

---

[a] **14:11** Ji: Îşaya 49:18; 45:23
**14:10** 2 Korîntî 5:10

rê derkeve. [14] Ez dizanim û di baweriya Xudan Îsa de piştrast im
ku tu tişt ji ber xwe ne murdar* e. Lê çaxê ku yek tiştekî murdar
bihesibîne, ew ji bo wî murdar e. [15] Îcar, eger ji ber tiştê ku tu dixwî,
birayê te xemgîn dibe, êdî tu li gor hezkirinê rêve naçî. Wî yê ku
Mesîh ji bo wî miriye, bi xwarina xwe helak neke. [16] Îcar bila li ser
vê yeka ku hûn qenc dibînin, bi xerabî neyê peyivîn. [17] Çimkî Padî-
şahiya* Xwedê ne xwarin û vexwarin e, lê belê rastdarî, aştî û şa-
hiya bi Ruhê Pîroz e. [18] Yê ku bi vê yekê ji Mesîh re xizmetê dike, li
Xwedê xweş tê û ji aliyê mirovan ve tê erêkirin. [19] Madem ku wusa
ye, em bikevin pey tiştên ku ji bo aştiyê û avakirina hevdû ne. [20] Ji
bo xwarinê karê Xwedê xera neke. Erê, her tişt helal e, lê belê yê ku
bi tiştên ku dixwe dibe sedemê terpilîna hinekên din, ew xerabiyê
dike. [21] Ya qenc ew e ku tu goşt nexwî, şerabê venexwî û tu tiştê
ku birayê te pê diterpile nekî. [22] Bîr û baweriya te, bila li ber
Xwedê ji bo te be. Xwezî bi wî yê ku di tiştê ku erê dike de, xwe bi
xwe dadbar nake. [23] Lê yê ku dudilî ye û dixwe, sûcdar tê derxistin,
çimkî ne ji baweriyê ye. Her tiştê ku ne ji baweriyê ye, guneh e.

### *Ne Xwe bi Xwe, lê Yên Din Razî Bikin*

15 Em ên ku xurt in, em deyndar in ku em qelsiyên wan ên ku
di baweriyê de bêhêz in, hilgirin û li dilxweşkirina xwe
negerin. [2] Bila her yek ji me ji bo qenciya cîranê xwe dilê wî xweş
bike, da ku ew bê avakirin. [3] Çimkî Mesîh jî ne dilê xwe bi xwe
xweş kir, lê belê çawa ku hatiye nivîsîn: «Bêsiyanetkirina wan ên
ku te bêsiyanet dikin, hat ser min.»[a] [4] Îcar ji berê ve her çi hatibe
nivîsîn, ji bo perwerdebûna me hatiye nivîsîn, da ku bi sebir û bi
handana* Nivîsarên Pîroz hêviya me hebe. [5] Û bila Xwedayê sebir
û handanê, bike ku hûn li gor Mesîh Îsa hemfikir bin, [6] da ku hûn
hemû bi yek dil û bi yek devî, pesnê Xwedê, Bavê Xudanê me Îsa
Mesîh bidin.

### *Mizgîniya ji bo Cihû û Miletan Yek e*

[7] Ji ber vê yekê ji bo rûmeta Xwedê çawa ku Mesîh hûn qebûl
kirin, hevdû qebûl bikin. [8] Ez ji we re dibêjim ku Mesîh di ber
rastiya Xwedê de, ji Cihûyan re bû xizmetkar, da ku sozên ji bav û

[a] **15:3** Ji: Zebûr 69:9

kalan re rast derîne 9 û milet ji bo rehma wî pesnê Xwedê bidin.
Çawa ku hatiye nivîsîn: «Ji ber vê yekê ezê di nav miletan de ji te
re şikir bikim, ji navê te re lavijeyan* bêjim.»[a] 10 Û ew dîsa dibêje:
«Ey miletno, bi gelê wî re şa bibin.»[b] 11 Û careke din:

«Ey hemû miletno, pesnê Xudan bidin
Û bila hemû gel wî bilind bikin.»[c]

12 Îşaya pêxember jî dibêje:

«Rayê* Yêşa* wê derkeve, ewê rabe,
Da ku serokatiyê li ser miletan bike
Û milet wê hêviya xwe bi wî ve girê bidin.»[d]

13 Îcar bila Xwedayê hêviyê, di baweriyê de dilê we bi hemû şahî û
aştiyê tije bike, da ku bi hêza Ruhê Pîroz hêviya we zêde bibe.

### *Xizmeta ji bo Mesîh*

14 Birayên min, ez bi xwe ji we piştrast im ku hûn bi xwe jî bi
qenciyê tije ne, bi her zanînê rapêçandî ne û hûn dikarin şîretan li
hevdû bikin. 15 Dîsa jî bi wê kerema ku ji aliyê Xwedê ve ji min re
hatiye dayîn, min bi dilawêrî li ser çend tiştan ji we re nivîsiye, da
ku ez wan careke din bînim bîra we. 16 Ev kerem ji min re hat da-
yîn, da ku ez ji bo miletan xizmetkarê Mesîh Îsa bim, yanî ez ji bo
Mizgîniya Xwedê karê kahîntiyê dikim, da ku milet bibin pêşkê-
şeke bi Ruhê Pîroz pîrozbûyî û meqbûl. 17 Loma ez bi saya Mesîh
Îsa ji bo xizmeta xwe ya ji Xwedê re serbilind im. 18 Ji bilî wan
tiştên ku Mesîh bi destê min kir, da ku milet bi ya wî bikin, ez
newêrim li ser tiştekî din bipeyivim. Wî ev bi gotin û kirinê, 19 bi
hêza nîşan û karên mezin, bi hêza Ruhê* Xwedê kiriye. Wusa ku,
ji Orşelîmê* bigire heta bi Îlîryayê ez geriyam û min Mizgîniya
Mesîh bi tevahî da bihîstin. 20 Armanca min ev e ku ez li dera ku
navê Mesîh hê lê nehatiye bihîstin Mizgîniyê belav bikim; ne ku ez
li ser bingeha ku hinekên din danîne ava bikim. 21 Lê çawa ku
hatiye nivîsîn:

«Yên ku li ser wî ji wan re nehatiye gotin, wê bibînin,
Û yên ku li ser wî nebihîstine, wê fêm bikin.»[e]

---

[a] 15:9 Ji: Zebûr 18:49; 2 Samûêl 22:50
[b] 15:10 Ji: Dubarekirina Şerîetê 32:43
[c] 15:11 Ji: Zebûr 117:1
[d] 15:12 Ji: Îşaya 11:10
[e] 15:21 Ji: Îşaya 52:15

### *Fikra Çûyîna Romayê*

22 Ji ber vê yekê gelek caran asteng ji hatina min a ba we re
derketin. 23 Lê niha ji ber ku êdî li van deran cihê ku ez bixebitim
nema û ji gelek salan ve ez dixwazim bêm ba we, 24 çaxê ku ez
herim Spanyayê, ez dixwazim bêm ba we. Hêviya min ew e ku
çaxê ez di wir re derbas bibim, ez we bibînim, pêşî piçekê ji dîtina
we têr bibim û paşê ji aliyê we ve bêm bi rê kirin. 25 Lê niha ez
diçim Orşelîmê, da ku ez ji pîrozên li wir re xizmetê bikim. 26 Çim-
kî ji dilê bawermendên Mekedonya û Axayayê* hat ku ji bo be-
lengazên nav pîrozên Orşelîmê alîkariyekê bikin. 27 Erê, ev li wan
xweş hat û bi rastî jî ew deyndarên wan in. Madem milet bûn
hevparên tiştên ruhanî yên Cihûyan, ew deyndar in ku bi tiştên
cismanî jî ji wan re xizmetê bikin. 28 Îcar piştî ku min ev anî serî û
ev diyariya ku hatiye civandin gihand destê wan, ezê bêm ba we û
ji nav we herim Spanyayê. 29 Û ez dizanim ku gava ez bêm ba we,
ezê bi tijetiya bereketa Mesîh bêm.

30 Birano, ez bi Xudanê me Îsa Mesîh û bi hezkirina Ruh ji we
hêvî dikim ku hûn bi min re, li ber Xwedê bi xîret ji bo min dua
bikin. 31 Wusa ku ez ji wan ên ku li Cihûstanê* bawer nakin rizgar
bibim û xizmeta min a li Orşelîmê ji pîrozan re meqbûl be, 32 û ez
bi daxwaza Xwedê bi şahî bêm ba we û bi we re bîhna xwe vedim.
33 Xwedayê aştiyê bi we hemûyan re be. Amîn.

### *Silav*

16 Ez xwişka me Fîbiyê ji we re tewsiye dikim. Ew bi xwe
alîkara civîna* bawermendan a li Kenxêryayê ye. 2 Wê bi
navê Xudan, bi awayekî ku li pîrozan tê, qebûl bikin û çi hewce-
dariya wê bikeve ba we, alîkariya wê bikin. Çimkî ew jî ji gelekan
re û ji min re jî bû alîkar.

3 Silavan li Priskîla* û Akîlas bikin, ku bi saya Mesîh Îsa he-
valkarên min in. 4 Wan di ber min de stûyê xwe danîn. Ne bi tenê
ez, lê belê hemû civînên bawermendan ên di nav miletan de jî ji
wan re spasdar in. 5 Silavan li civîna ku li mala wan dicive jî bikin.
Silavan li hevalê min ê hezkirî Apênetos bikin. Ew ji wan ên ku li
herêma Asyayê* bawerî bi Mesîh anîne, yê pêşî ye. 6 Silavan li

---

**16:5** Peyv bi peyv: «Ew li Asyayê ji bo Mesîh berê* pêşî ye.»

Meryema ku ji bo we gelek xebitiye bikin. [7] Silavan li Andronîkos
û li Yûnya bikin, ku di nav Şandiyan de giranbiha ne, mirovên min
û bi min re girtî ne û hê beriya min bawerî bi Mesîh anîne. [8] Si-
lavan li Ampliyatos bikin ê ku bi saya Xudan hezkiriyê min e.
[9] Silavan li hevalkarê me yê bi Mesîh, Urbanos û li hezkiriyê min
Staxîs bikin. [10] Silavan li Apêlîsê ya ku bi Mesîh hatiye erêkirin,
bikin. Silavan li maliyên Arîstobûlos bikin. [11] Silavan li mirovê
min Hêrodiyon bikin. Silavan li maliyên Narkîs bikin ên ku di ba-
weriya Xudan de ne. [12] Silavan li Trîfênayê û li Trîfosayê bikin,
yên ku di xizmeta Xudan de dixebitin. Silavan li Persîsa delal a ku
di xizmeta Xudan de gelek ked daye bikin. [13] Silavan li bijartiyê
Xudan Rûfos û diya wî ya ku ji min re jî dêyîtî kiriye, bikin.
[14] Silavan li Asînkrîtos, Flêgon, Hermîs, Patrobas, Hermas û li bi-
rayên ku bi wan re ne bikin. [15] Silavan li Fîlologos, Yûliya, Nêrews
û xwişka wî, li Olîmpas û hemû pîrozên ku bi wan re ne bikin.
[16] Bi ramûsana pîroz silavan li hevdû bikin. Hemû civînên bawer-
mendan ên Mesîh silavan li we dikin.

### *Şîretên Dawî û Xatir*

[17] Îcar, birano, ez ji we hêvî dikim, ku haya we ji wan mirovan
hebe yên ku li hember wê hîndariya ku hûn hîn bûne, dubendiyê
çêdikin û xelkê diterpilînin*. Ji wan dûr bin. [18] Çimkî yên weha ne
ji Xudanê me Mesîh re, lê belê ji zikê xwe re xizmetê dikin. Bi
gotinên xweş û xemilandî dilê mirovên saf dixapînin. [19] Guhdana
we gihîşt guhê hemûyan. Loma ez ji bo we şa dibim. Lê ez dix-
wazim ku hûn ji bo kirinên qenc jîr û ji bo yên xerab saf bin.
[20] Xwedayê aştiyê wê di demeke kurt de Îblîs di bin lingên we de
biperçiqîne. Kerema Xudanê me Îsa li ser we be.
[21] Hevalkarê min Tîmotêyos* û mirovên min Lûkyos, Yason û
Sosîpatros silavan li we dikin. [22] Ez Tertiyos, yê ku ev name nivî-
siye, bi navê Xudan silavan li we dikim. [23-24] Gayosê ku mêvandarê
min û tevahiya civînê ye silavan li we dike. Xiznedarê bajêr Eras-
tos* û birayê me Kuwartos silavan li we dikin.

---

**16:23** Di hin destnivîsaran de ev jî heye: «Kerema Xudanê me Îsa Mesîh li ser we hemûyan be. Amîn.»

### *Dua û Şikir*

25 Îcar bila rûmet ji wî Xwedayî re be yê ku dikare li gor
Mizgîniya min û danezana Îsa Mesîh we qayîm bike; ew sira ku ji
demên berê ve hatibû veşartin
26 niha eşkere bûye û bi nivîsarên
pêxemberan li gor emrê Xwedayê herheyî hatiye dazanîn, da ku
hemû milet bi ya baweriyê bikin.
27 Bila bi saya Îsa Mesîh her û
her rûmet ji Xwedê re be, ew Xwedayê ku bi tenê zana ye. Amîn*.

# *Nameya Pawlos a pêşî ji Korîntiyan re*

### *Pêşgotin*

*Korînt bajarekî Yewnaniyan e û ew der paytextê herêma Axayayê* ya Romayê bû. Ev der bajarekî bazirganî û kêfkirinê bû. Bi kêmahî 12 perestgehên pûtperestiyê yên xwedayên Yewnaniyan ên kevin li vir hebûn. Korînt di nav dest û lepên pûtperestiyê de bû.*

*Pawlos di gera xwe ya diduyan de 18 mehan (Karên Şandiyan 18:11, 18) li vir ma (di navbera salên 50 û 52an de) û bingeha civîna bawermendan danî. Pawlos ev name di sala 54an de nivîsî û piştre careke din vegeriya wir.*

*Pawlos ne tenê sê caran çû serdana Korîntê, lê ji civîna li vir re name jî nivîsîn û li ser pirsên wan rawesta. Di van nameyan de, bersîvên Xwedê yên ji civîna bawermendan re, cih distînin. Mesele, Xwedê di zewac, hevberdan û têkiliyên cinsî de çi emir dike? Goriyên ku ji bo pûtan tên pêşkêşkirin, ma dikarin bên xwarin? Cihê jinan di nav civînê de çi ye? Mirî çawa radibin û hwd.*

*Ev name dikare bi vî awayî bê beşkirin:*

*I. Silav 1:1-9*
*II. Dubendiyên ku di civînê de derketin 1:10-4:21*
*III. Yên ku ji jiyana bi siyanet dûr ketin 5:1-6:20*
*IV. Dabaşa zewacê 7:1-40*
*V. Azadiya bawermendan çi ye? 8:1-11:1*
*VI. Perizîna rast 11:2-14:40*
*VII. Rabûna miriyan 15:1-58*
*VIII. Planên cûr bi cûr 16:1-24*

### *Silav*

1 Ji Pawlosê* ku bi daxwaza Xwedê hatiye gazîkirin ku bibe
Şandiyê Mesîh Îsa û ji birayê me Sostênîs,
2 ji civîna* bawermendan a Xwedê ya li Korîntê, ji yên ku bi
Mesîh Îsa hatine pîrozkirin û ji bo pîrozbûnê hatine gazîkirin û ji
hemûyên ku li her derê gazî navê Îsa Mesîhê ku Xudanê* me û yê
wan e dikin re:

[3] Ji Bavê me Xwedê û ji Xudan Îsa Mesîh, kerem û aştî* li ser
we be.
[4] Ji bo kerema Xwedê ya ku bi Mesîh Îsa ji we re hatiye dayîn,
ez hergav ji bo we ji Xwedayê xwe re spas dikim. [5-6] Çimkî ka
çawa şahidiya Mesîh di nav we de qayîm bûye, hûn bi wî di her
tiştî de, di peyivîn û di zanînê de dewlemend bûne. [7] Wusa ku di tu
diyariya ruhanî de kêmahiya we tune û hûn li hêviya xuyabûna
Xudanê me Îsa Mesîh disekinin. [8] Ew jî wê we heta dawiyê qayîm
bike, da ku hûn di Roja Xudanê me Îsa Mesîh de bê sûc bin.
[9] Xwedê dilsoz e: ji aliyê wî ve hûn hatine gazîkirin, da ku hevpa-
riya we bi Kurê wî, Xudanê me Îsa Mesîh re hebe.

### *Dubendiya di Civîna Bawermendan de*

[10] De îcar birano, ez bi navê Xudanê me Îsa Mesîh hêvî ji we
dikim, hûn hemû eynî tiştî bifikirin, bila di nav we de dubendî tune
be; lê li ser eynî fikrê û eynî dîtinê bibin yek. [11] Çimkî birano, ji
aliyê mirovên Xiloyê ve ji min re hat gotin ku di nav we de pevçûn
heye. [12] Yanî ez li ser vê dibêjim: Her yek ji we dibêje: «Ez yê
Pawlos im» an: «Ez yê Apolos im» an: «Ez yê Kîfas* im» an jî:
«Ez yê Mesîh im.» [13] Ma Mesîh hatiye parve kirin? Ma Pawlos ji
bo we hat xaçkirin? An ku hûn bi navê Pawlos imad* bûn? [14] Ez ji
Xwedê re şikir dikim ku min ji Krîspos û Gayos pê ve tu kes ji we
imad nekiriye; [15] wusa ku tu kes nebêje ku hûn bi navê min imad
bûne. [16] – Min maliyên Stefanas jî imad kirin, ji vê zêdetir ez niza-
nim ku min kesek din imad kiriye an na. – [17] Çimkî Mesîh ez ne-
şandim ku ez imad bikim, lê belê ez şandim ku ez Mizgîniyê*
bidim. Min ev yek bi şehrezayiya gotinan nekir, da ku xaça Mesîh
hêza xwe winda neke.

### *Mesîhê ku Hêz û Şehrezayiya Xwedê Ye*

[18] Erê, peyva* li ser xaçê ji bo yên ku helak dibin bêaqilî ye, lê ji
bo me yên ku rizgar dibin hêza Xwedê ye. [19] Çimkî hatiye nivîsîn:

«Ezê zanebûna zaneyan tune bikim,
Ezê fêmdariya fêmdaran betal bikim.»[a]

---

[a] **1:19** Ji: Îşaya 29:14
**1:12** Kîfas: navê din ê «Petrûs» e; binêre: Yûhenna 1:42.

[20] Ma yê zana li ku derê ye? Yê Şerîetzan* li ku derê ye? Dev-
jenîkerê şehreza yê vê dinyayê li ku derê ye? Ma Xwedê şehre-
zayiya dinyayê venegerand bêaqiliyê? [21] Madem ku dinyayê li gor
şehrezayiya Xwedê, bi şehrezayiya xwe Xwedê nas nekir; li Xwe-
dê xweş hat ku yên baweriyê* tînin bi bêaqiliya Mizgîniyê rizgar
bike. [22] Cihû nîşanan dixwazin û Yewnanî li şehrezayiyê digerin,
[23] lê em, Mesîhê ku hatiye xaçkirin didin bihîstin. Ew ji bo Cihû-
yan terpilînek* û ji bo miletan bêaqilî ye; [24] lê ji bo yên ku hatine
gazîkirin, hem ji bo Cihû û hem jî ji bo Yewnaniyan, ev Mesîh hê-
za Xwedê û şehrezayiya Xwedê ye. [25] Çimkî bêaqiliya xwedayî di
ser şehrezayiya mirovan re û bêhêziya Xwedê jî di ser hêza miro-
van re ye.
[26] Îcar birano, li gazîkirina xwe binêrin: Di nav we de li gor
fikrên mirovan gelekên şehreza, gelekên hêzdar, gelekên esilzade
ne hatine gazî kirin. [27] Lê belê Xwedê, ji bo ku şehrezayan bide
şermkirin, tiştên dinyayê yên bêaqil bijartin; û Xwedê, ji bo ku yên
hêzdar bide şermkirin, tiştên dinyayê yên qels bijartin. [28] Xwedê, ji
bo ku tiştên ku hene betal bike, tiştên dinyayê yên bê rûmet û kêm
tên dîtin, tiştên ku tunin jî, bijartin. [29] Wusa ku tu kes li ber Xwedê
pesnê xwe nede. [30] Bi saya Xwedê hûn bi Mesîh Îsa re ne, yê ku ji
aliyê Xwedê ve ji bo me bû şehrezayî, rastî, pîrozî û rizgarî. [31] Ji
bo vê yekê çawa ku hatiye nivîsîn: «Yê ku pesnê xwe dide, bila bi
Xudan pesnê xwe bide.»[a]

### *Mesîhê ku Hatiye Xaçkirin*

2 Birano, çaxê ku ez hatim ba we ku ez sira Xwedê ji we re
diyar bikim, ez ne bi peyvên xemilandî an şehrezayî hatim.
[2] Çimkî gava ku ez di nav we de bûm, min biryar da ku ez ji Îsa
Mesîhê ku hatî xaçkirin pê ve tiştekî din nezanibim. [3] Ez bi qelsî û
bi tirs hatim ba we; ez gelek jî dilerizîm. [4] Peyv û danezana min,
ne bi qanîkirina peyvên şehrezayiyê, lê bi berçavanîna hêza Ruh
bû, [5] da ku baweriya* we ne li ser şehrezayiya mirovan be, lê li ser
hêza Xwedê be.

---

[a] **1:31** Ji: Yêremya 9:24

### *Şehrezayiya Rastîn*

[6] Erê, em di nav yên gihîştî de şehrezayiyê dibêjin. Lê ev şeh-
rezayî ne ya vê dinyayê ye û ne jî ya serokên wê ye, yên ku wê ji
holê bên rakirin. [7] Lê belê em şehrezayiya Xwedê ya bi sir û veşar-
tî dipeyivin, a ku Xwedê ji beriya dem û zemanan ve ji bo rûmeta
me kifş kiriye. [8] Tu kesî ji serokên vê dinyayê bi vê nezanî. Eger
bizanibûna, wê Xudanê rûmetê xaç nekirana. [9] Lê belê çawa ku
hatiye nivîsîn:
«Tiştên ku çavan nedîtine û guhan nebihîstine[a]
Û di fikra mirov re derbas nebûne,
Xwedê ew ji bo wan ên ku ji wî hez dikin, amade kirine.»
[10] Lê Xwedê ew bi Ruh ji me re kifş kirin. Çimkî Ruh li her tiştî, li
tiştên Xwedê yên kûr jî dikole. [11] Ma tiştên mirov, ji ruhê mirov ê
ku di hundirê mirov de ye pê ve, kî dizane? Wusa jî ji Ruhê* Xwe-
dê pê ve, tu kes bi tiştên Xwedê nizane. [12] Îcar me ne ruhê dinyayê,
lê belê Ruhê ku ji Xwedê tê stand, da ku em wan tiştên ku Xwedê
ji me re kirine diyarî, bizanin.
[13] Em van, ne bi peyvên ku bi şehrezayiya mirovî hatine hîn-
kirin, lê belê bi peyvên ku Ruh hîn kirine dibêjin. Em tiştên ruhanî
ji mirovên ruhanî re eşkere dikin. [14] Lê mirovê nefsanî tiştên Ruhê
Xwedê qebûl nake, ev jê re bêaqilî ne. Nikare wan bizane jî, ji ber
ku ev tişt bi riyên ruhanî tên fêmkirin. [15] Yê ruhanî dikare her tiştî
fêm bike, lê ew ji aliyê tu kesî ve nayê fêm kirin.
[16] «Ma kê bi fikra Xudan zaniye
Ku hînî wî bike?»[b]
Lê fikra Mesîh bi me re ye.

### *Yekîtiya Civînê*

3 Îcar birano, min nikaribû wek ku bi mirovên ruhanî re tê peyi-
vîn, bi we re bipeyivim. Lê belê ez bi we re wek mirovên be-
denî û zarokên di baweriya* Mesîh de, peyivîm. [2] Min ne xwarin,
lê belê min şîr da we. Çimkî we hê nikaribû ku hûn ragirin* û niha
jî hûn nikarin. [3] Çimkî hê jî hûn bedenî ne. Madem ku di nav we de
çavnebarî û devjenî heye, ma hûn ne bedenî ne? Ma hûn ne wek

---

[a] 2:9 Ji: Îşaya 64:4 [b] 2:16 Ji: Îşaya 40:13

mirovan dijîn? [4] Gava ku yek bêje «Ez yê Pawlos im» û yê din
bêje: «Ez yê Apolos im», ma hingê hûn ne mirov in?
[5] Îcar Apolos kî ye, Pawlos kî ye? Li gor ku Xudan daye her
yekî ji wan, ew xizmetkar in û we bi rêberiya wan bawerî aniye.
[6] Min çand, Apolos av da; lê belê Xwedê mezin kir. [7] Îcar ne yê ku
çandiye û ne jî yê ku av daye tiştek e; lê belê Xwedê, yê ku mezin
dike, girîng e. [8] Yê ku çandiye û yê ku av daye yek in; her yek ji
wan wê li gor keda xwe xelata xwe bistîne. [9] Çimkî em hevparên
Xwedê yên xebatê ne, hûn zeviya Xwedê, avahiya Xwedê ne.
[10] Li gor kerema Xwedê ya ku ji min re hat dayîn, min wek
qesirbendekî şehreza bingeh danî, yekî din jî li ser ava dike. Bila
her kes bala xwe bidiyê ku çawa li ser ava dike. [11] Çimkî tu kes ji
bingeha ku hatiye danîn, yanî ji Îsa Mesîh pê ve, nikare bingeheke
din deyne. [12] Eger yek li ser vê bingeha zêr, zîv, kevirên hêja, dep,
giya, qirş ava bike, [13] karê her kesî wê eşkere bibe. Çimkî ew Roj
wê wî nîşan bide, çimkî kar wê bi êgir xuya bibe û agir bi xwe wê
karê her kesî biceribîne ku çi cûre ye. [14] Eger karê ku mirovekî li
ser wê bingehê ava kiriye bimîne, ewê xelat bistîne; [15] eger karê
yekî bişewite, ewê zirarê bikişîne. Lê ew bi xwe wê rizgar bibe, lê
wek ku di êgir re derbas bibe wê rizgar bibe.
[16] Ma hûn nizanin ku hûn Perestgeha* Xwedê ne û Ruhê Xwe-
dê di hundirê we de rûdine? [17] Eger kesek Perestgeha Xwedê xera
bike, Xwedê jî wê wî xera bike. Çimkî Perestgeha Xwedê pîroz e û
ew Perestgeh hûn in.
[18] Bila tu kes xwe nexapîne. Eger di nav we de yek xwe li vê
dinyayê şehreza hesab bike, bila bêaqil be, da ku şehreza bibe.
[19] Çimkî şehrezayiya vê dinyayê li ba Xwedê bêaqilî ye. Wek ku
hatiye nivîsîn: «Ew şehrezayan di hîleyên wan de digire»[a]. [20] Û
dîsa hatiye nivîsîn: «Xudan dizane ku fikrên şehrezayan pûç in.»[b]
[21] Loma bila tu kes pesnê xwe bi mirovan nede. Çimkî her tişt yê
we ye: [22] Dixwazî bila Pawlos be, Apolos be, Kîfas* be, dinya be,
jiyan be, mirin be, dema niha be, dema ku bê be, hemû yên we ne;
[23] û hûn yên Mesîh in, Mesîh jî yê Xwedê ye.

---

[a] **3:19** Ji: Eyûb 5:13 [b] **3:20** Ji: Zebûr 94:11

**3:6** Karên Şandiyan 18:4-11; 18:24-28 **3:16** 1 Korîntî 6:19; 2 Korîntî 6:16

### *Xizmeta Şandiyan*

4 Bila mirov me xizmetkarên Mesîh û şahneyên* sirên Xwedê
bihesibînin. 2 Ne ev tenê, li vir ya ku ji şahneyan tê xwestin ew
e ku ew mirovên dilsoz bin. 3 Îcar ji aliyê we ve an jî ji aliyê dad-
geheke* mirovî ve, dîwana* min bê kirin, ji bo min tiştekî pirr
biçûk e. Ez bi xwe jî dîwana xwe nakim. 4 Wijdana min rihet e, lê
belê ev min bêsûc dernaxe. Dadgerê* min Xudan e. 5 Ji ber vê ye-
kê, heta ku Xudan bê, beriya wext, dîwana tiştekî nekin. Xudan wê
tiştên di tariyê de veşartî ronahî bike û niyeta dilan eşkere bike.
Hingê pesnê her kesî wê ji Xwedê be.
6 Birano, ji bo qenciya we, ji bo ku ji we re bibe mînak min ev
hemû li ser xwe û li ser Apolos anîn; da ku hûn ji me vê yekê hîn
bibin: «Dernekevin derveyî ya nivîsandî», da ku kes ji bo yekî li
hember yê din xwe mezin neke. 7 Ma kî te ji yê din ferq dike? Ma
çiyê te heye ku te ji Xwedê nestandiye? Madem te standiye, nexwe
çima wek ku te nestandiye tu pesnê xwe didî?
8 Ji xwe hûn têr bûne, ji xwe hûn dewlemend bûne. Bêyî me
we dest bi hukumdariyê kir. Xwezî we hukumdarî bikira, da ku me
jî bi we re hukumdarî bikira. 9 Çimkî ez dibêjim qey Xwedê em
Şandî* kirin ên herî kêm, wek ên ku ji bo kuştina li ber hemûyan,
hatine pêşanîn. Çimkî em ji dinyayê re, ji milyaket û mirovan re
bûn temaşe. 10 Em di ber Mesîh de bêaqil in, lê hûn bi saya Mesîh
bi aqil in. Em bêhêz in, lê hûn bihêz in. Hûn xweyî rûmet, lê em
bêrûmet in. 11 Heta vê saetê em tî û birçî ne û bêcil in; li me tê xis-
tin û em bê cih û war in. 12 Em bi destên xwe dixebitin û keda xwe
didin. Gava ku çêrî* me tê kirin, em duayên xêrê dikin; gava ten-
gahî li me tê kirin, em sebir dikin. 13 Gava ku buxtan li me tê kirin,
em bi nermî dipeyivin. Heta niha em bûn mîna ziblê dinyayê û
xirtika her tiştî.
14 Ez van tiştan, ne ji bo ku we bidim şermkirin, lê ji bo ku ez
wek zarokên xwe yên delal şîretan li we bikim dinivîsim. 15 Çimkî
di baweriya Mesîh de, eger deh hezar perwerdekarên we hebin jî,
gelek bavên we tunin; bi Mizgîniyê di baweriya Mesîh Îsa de ez
bûm bavê we. 16 Loma ez hêvî ji we dikim ku hûn bibin mîna min.

---

**4:16** 1 Korîntî 11:1; Filîpî 3:17

17 Ji ber vê yekê min Tîmotêyos* şand ba we. Ew bi saya Xudan
zarokê min ê delal û dilsoz e. Ewê riyên min ên di baweriya Mesîh
Îsa de bîne bîra we, yên ku ez li her derê, li her civîna* bawer-
mendan hîn dikim.
18 Wek ku ezê neyêm ba we, hinek ji we poz bilind bûne. 19 Lê
belê eger Xudan bixwaze, ezê di nêzîk de bêm ba we. Hingê ezê ne
gotina wan ên ku poz bilind bûne, lê belê hêza wan bizanim.
20 Çimkî Padîşahiya* Xwedê ne bi gotinê ye, lê belê bi hêzê ye.
21 Hûn çi dixwazin? Ma ez bi dar bêm ba we, an ku bi hezkirin û
ruhê nerm?

### *Cihê Bêedebiyê Tune*

5 Bi rastî tê gotin ku di nav we de zîna heye. Hem jî zînayek
wusa ku di nav miletên xwedênenas de jî tune: Heta yekî, jina
bavê xwe biriye. 2 Îcar şûna ku we şîn bigirta, da ku yê ev tişt
kiriye ji nav we bihata rakirin, we ne girt, bi ser de jî hûn xwe di-
nepixînin!
3 Bi bedenê ez ne amade bim jî, bi ruh ez di nav we de me.
Wek ku ez di nav we de bim, min bi navê Xudan Îsa ji xwe biryara
dîwana wî yê ku weha kiriye, daye. 4 Gava ku hûn bicivin û ruhê
min jî bi we re, tevî hêza Xudanê me Îsa, 5 ji bo helak kirina
bedenê, vî mirovî bidin destê Îblîs da ku di Roja Xudan de ruhê wî
rizgar bibe.
6 Ne qenc e ku hûn pesnê xwe didin. Ma hûn nizanin ku piçek
hevîrtirşk tevahiya hevîr tirş dike? 7 Xwe ji hevîrtirşkê kevin pak
bikin ku hûn bibin hevîrê nû, wek ku hûn bê hevîrtirşk in. Çimkî
berxê me yê Cejna* Derbasbûnê Mesîh hatiye gorîkirin*. 8 Ji ber
vê yekê em cejnê, ne bi hevîrtirşkê kevin, ne bi hevîrtirşkê kîn û
xerabiyê, lê belê bi nanê şkeva yê dilpakî û rastiyê bikin.
9 Min di nameya xwe de ji we re nivîsî ku hûn bi zînakaran re
nebin heval. 10 Ez qet li ser zînakar, çavbirçî, nijdevan û pûtpe-
restên* vê dinyayê nabêjim. Eger wusa bûya, diviya ku hûn ji vê
dinyayê derketana. 11 Lê niha ez ji we re dinivîsim, bi yekî ku bira
tê gotin, lê zînakar, çavbirçî, pûtperest, çêrker, serxweş an nij-
devan be, pê re têkiliyê nekin, heta bi yekî weha re xwarinê jî

---

**5:1** Dubarekirina Şerîetê 22:30 **5:7-8** Derketin 12; 13:7

nexwin. [12] Ma çi karê min bi dîwankirina yên li derve heye? Ma nakeve ser we ku hûn dîwana yên hundir bikin? [13] Xwedê wê dîwana yên derve bike. «Mirovê xerab ji nav xwe derxin.»[a]

### *Dozên di nav Bawermendan de*

6 Dema di nav we de doza yekî bi yekî din re hebe, çawa diwêre ku ne li ber pîrozan, lê li ber neheqan dozê veke? [2] Ma hûn nizanin ku pîroz wê dîwana dinyayê bikin? Madem ku hûnê dîwana dinyayê bikin, ma hûn têrê nakin ku li ser dozên herî biçûk biryarê bidin? [3] Ma hûn nizanin ku emê dîwana milyaketan bikin? Îcar tiştên rojane li ku derê dimînin? [4] Îcar çaxê dozên tiştên vê dinyayê di nav we de hebin, ma hûn wan ên ku ji aliyê civînê ve kêm tên dîtin, ji bo dîwankirinê rûdinînin? [5] Ji bo ku hûn şerm bibin, ez van dibêjim. Ma di nav we de yekî şehreza peyda nabe, ku bikare di navbera birayan de dadgeriyê bike? [6] Lê bira li hember bira dozê vedike, hem jî li ber bêbaweran!

[7] Ya rast ji xwe li hember hevdû dozvekirina we, ji bo we bi tevahî binketin e. Çima hûn hê bêtir neheqiyê nakişînin? Çima hûn nahêlin hê bêtir malê we bê xwarin? [8] Lê belê hûn bi xwe neheqiyê dikin û malê kesên din dixwin. Hem jî hûn vê li birayan dikin. [9] Ma hûn nizanin ku yên neheq Padîşahiya Xwedê mîras nastînin? Neyên xapandin! Yên ku fuhûşê dikin, an pûtperest*, an zînakar, an qûnde, an qûngê, [10] an diz, an çavbirçî, an serxweş, an çêrker an jî nijdevan, Padîşahiya Xwedê mîras nastînin. [11] Û hin ji we weha bûn; lê belê bi navê Xudan Îsa Mesîh û bi Ruhê Xwedayê me hûn hatin şuştin, pîrozkirin û rastdarkirin.

### *Bi Bedena Xwe Xwedê Bilind bikin*

[12] «Ji bo min her tişt serbest e», lê belê her tişt ne bi kêr e. «Ji bo min her tişt serbest e», lê belê ez nabim bindestê tu tiştî. [13] Xwarin ji bo zik e, zik jî ji bo xwarinê ye. Lê belê Xwedê wê hem zik û hem jî xwarinê wêran bike. Beden ne ji bo fuhûşê ye, lê ji bo Xudan e. Xudan jî ji bo bedenê ye. [14] Xwedê hem Xudan rakir, hem jî wê bi hêza xwe me rake. [15] Ma hûn nizanin ku bedenên we endamên Mesîh in? Ma ez endamên Mesîh bistînim û bikim

---

[a] **5:13** Ji: Dubarekirina Şerîetê 17:7

endamên fahîşeyê? Na, tu caran! [16] Ma hûn nizanin yê ku bi
fahîşeyê ve bizeliqe, bi wê re dibe bedenek? Ji xwe hatiye gotin:
«Herdu wê bibin bedenek.»[a] [17] Lê yê ku bi Xudan ve bizeliqe, bi
wî re dibe ruhek. [18] Ji fuhûşê birevin. Her gunehê ku mirov bike, li
derveyî bedenê ye, lê yê ku fuhûşê dike, li hember bedena xwe
guneh dike. [19] An ma hûn nizanin ku bedena we Perestgeha*
Ruhê* Pîroz e, yê ku di nav we de ye, yê ku we ji Xwedê standiye?
Hûn ne yên xwe bi xwe ne. [20] Çimkî hûn bi bihayekî hatin kirrîn; ji
ber vê yekê Xwedê di bedena xwe de bilind bikin.

### *Pirsa Zewacê*

7 Îcar em bên ser tiştên ku we ji min re nivîsîne: «Ji bo mêr qenc
e ku dest nede jinê.» [2] Lê ji ber fuhûşê, bila jina her mêrî bi
xwe û mêrê her jinê bi xwe hebe. [3] Bila mêr heqê jina xwe, bi eynî
awayî jin jî heqê mêrê xwe bide. [4] Li ser bedena jinê bi xwe ne
desthilatiya wê, lê belê ya mêrê wê heye. Bi vî awayî li ser bedena
mêr bi xwe jî ne desthilatiya wî, lê belê desthilatiya jina wî heye.
[5] Hevdû mehrûm nekin; lê eger ji bo ku hûn xwe bidin duakirinê û
bi dilê herdu aliyan be û ji bo demekê be, hingê çêdibe. Piştre dîsa
herin ba hev, da ku Îblîs ji ber xwenegirtina we, we neceribîne.
[6] Ez vê gotinê ne wek emir, lê wek destûrekê dibêjim. [7] Ez dixwa-
zim ku hemû mirov wek min bi xwe bin. Lê belê hin bi vî awayî,
hin bi wî awayî ne; diyariya her kesî bi xwe ji Xwedê heye.

[8] Ez ji yên nezewicî û jinebiyan re dibêjim: Eger wek min bi-
mînin ji bo wan qenc e. [9] Lê eger nekarin xwe bigerin, bila bizewi-
cin. Çimkî ji dêla ku ew bişewitin, çêtir e ku bizewicin.

[10] Ji yên zewicî re jî ez emir dikim, lê ne ez, Xudan emir dike:
Bila jin dev ji mêrê xwe bernede. [11] Eger dev jê berde jî, bila bê
mêr bimîne, an jî bila bi mêrê xwe re li hev bê. Bila mêr jî jina
xwe bernede.

[12] Lê ji yên din re ne Xudan, ez dibêjim: Eger jina birayekî ya
ku baweriyê nayne hebe û jinik razî be ku bi mêrê xwe re bimîne,
bila mêrê wê, wê bernede. [13] Û eger mêrê jinekê yê ku baweriyê
nayne hebe û razî be ku bi wê re bimîne, bila wî bernede. [14] Çimkî

---

[a] **6:16** Ji: Destpêkirin 2:24; Metta 19:5
**6:19** 1 Korîntî 3:16; 2 Korîntî 6:16 **7:10** Metta 5:32; 19:9; Lûqa 16:18

mêrê ku baweriyê nayne bi jina xwe tê pîrozkirin, jina ku bawer
nake jî bi wî birayê ku mêrê wê ye tê pîrozkirin. Nexwe zarokên
we murdar* diman; lê niha pîroz in. 15 Lê eger yê ku baweriyê nay-
ne dev jê berde, bila berde; bira an xwişkên di vê rewşê de, ne di
bin hêsîrtiyê* de ne. Xwedê hûn gazî aştiyê* kirine. 16 Ey jinê, tu ji
ku derê dizanî ku tê mêrê xwe rizgar bikî? Ey mêro, tu ji ku derê
dizanî ku tê jina xwe rizgar bikî?

### *Li gor Gazîkirina Xwedê Bijîn*

17 Lê Xudan çawa li her kesî leva* kiribe, Xwedê çawa gazî
her kesî kiribe, bila wusa bijî. Ez vê li hemû civînên bawermendan
emir dikim. 18 Yek sinetbûyî* hatibe gazîkirin? Bila ne sinetnebûyî
be.Yek sinetnebûyî hatibe gazîkirin? Bila sinet nebe. 19 Sinetbûn
ne tiştek e, sinetnebûn jî ne tiştek e; ya girîng pêkanîna emrên
Xwedê ye. 20 Bila her kes di rewşa ku tê de hatiye gazîkirin de
bimîne. 21 Gava ku tu hatî gazîkirin tu xulam bûyî? Xem nîne! Lê
Eger tu bikarî azadiya xwe bi dest bixî, hê bêtir vê bi kar bîne.
22 Çimkî xulamê ku ji aliyê Xudan ve hatiye gazîkirin, ew azadê
Xudan e. Bi vî awayî jî yê ku azad e hatiye gazîkirin, xulamê Me-
sîh e. 23 Hûn bi bihayekî hatin kirrîn, nebin xulamên mirovan.
24 Birano, her yek di çi rewşê de hatibe gazîkirin, bila li ber Xwedê
di wê rewşê de bimîne.

### *Yên Nezewicî û Jinebî*

25 Li ser keçik û kurikan, ji Xudan emrê min tune. Lê ez wek
yekî ku bi dilovaniya Xudan dilsoz e, nêrîna xwe dibêjim. 26 Îcar
ez guman dikim ku ev qenc e: Ji ber tengahiya vê demê, ji mirov re
qenc e ku bimîne di wê rewşa ku tê de ye. 27 Ma tu bi jinekê ve
girêdayî yî? Li jêvebûnê negere. Tu bi jinekê ve negirêdayî yî? Li
jinê negere. 28 Lê eger tu jinê bînî, tu guneh nakî. Eger keçikek mêr
bike, guneh nake. Lê di vê bedenê de tengahiyên van wê hebin; ez
dixwazim we ji vê bidirixînim*.

29 Birano, ez vê dibêjim: Wext kurt bûye. Ji niha û pê ve, bila
yên ku jina wan heye jî wek ku jina wan tune; 30 yên ku şînê digirin,
wek ku şînê nagirin, yên ku şa dibin, wek ku şa nabin, yên ku
dikirrin, wek ku malê wan tune 31 û yên ku ji dinyayê dixwin, wek
wan bin, ku jê naxwin. Çimkî halê dinyayê yê niha derbas dibe.

[32] Ez dixwazim ku hûn bê xem bin. Yê ku jin neaniye, ji bo
tiştên Xudan xeman dixwe, ka wê çawa li Xudan xweş bê. [33] Lê yê
ku jin aniye ji bo tiştên dinyayê xeman dixwe, ka wê çawa li jina
xwe xweş bê; [34] û bi vî awayî dilê wî dibe du alî. Îcar jin û keçika
ku mêr nekiriye, ji bo ku hem bi bedenê û hem jî bi ruh pîroz bibe,
ji bo tiştên Xudan xeman dixwe. Lê jina mêrkirî, ji bo tiştên din-
yayê xeman dixwe, ka wê çawa li mêrê xwe xweş bê. [35] Ez vê ji bo
feyda we dibêjim, ne ji bo ku ez dest û lingê we girêdim, lê ji bo
ku hûn bi awayekî rêkûpêk bijîn û bê ku fikrên we belav bibin hûn
ji Xudan re xizmetê bikin.

[36] Lê eger yek difikire ku ew li keça xwe neheqiyê dike, eger
jiyê keçikê pêşve çûbe û eger lazim be, bila ew tiştê ku dixwaze
bike, ew guneh nake; bila wê bide mêr.[a] [37] Lê eger yek ne dudilî be
û ne di bin mecbûriyê de be, lê bikare xwe û di dilê xwe de biryar
dabe ku ewê keça xwe li ba xwe bihêle, ew baş dike.[b] [38] Îcar yê ku
keça xwe bide mêr baş dike, yê ku nede mêr hê çêtir dike.

[39] Jinek, heta ku mêrê wê sax be bi wî ve girêdayî ye. Lê eger
mêrê wê bimire, hingê ew serbest e bi yê ku dixwaze re bizewice.
Tenê bila ew kes girêdayiyê Xudan be. [40] Lê li gor nêrîna min, ew
jin wusa bimîne wê bextewartir be. Û ez dibêjim qey Ruhê Xwedê
bi min re jî heye.

### *Pirsa Goştê Goriyan*

8 Niha em bên ser goriyên* ku ji pûtan re tên pêşkêşkirin: Em
dizanin ku zanîna me hemûyan heye. Zanîn qure dike, lê hez-
kirin, ava dike. [2] Eger yek guman bike ku tiştekî dizane, hê ew tiş-
tekî nizane, ka çawa divê ku ew bizane. [3] Lê eger yek ji Xwedê hez
dike, ew ji aliyê Xwedê ve tê nas kirin. [4] Îcar, li ser xwarina gori-
yên ku ji pûtan re tên pêşkêşkirin, em dizanin ku pût li dinyayê ne
tiştek e û ji yekî pê ve Xwedê tune. [5] Eger li ser erdê an li ezmên
yên ku ji wan re xwedê tê gotin hebin jî – çawa ku gelek xwedê û
gelek xudan hene – [6] ji bo me tenê Xwedayek heye, ew jî Bav e.

---

[a] 7:36 an: «Lê eger yek difikire ku ew li dergistiya xwe neheqiyê dike, eger jiyê keçikê pêşve çûbe û divê wusa be, bila ew ya ku dixwaze bike, ew guneh nake; bila ew bizewicin.»

[b] 7:37 an: «... ku ewê dergistiya xwe berde, ew baş dike.»

Her tişt ji wî ye û em ji bo wî hene. Û tenê Xudanek heye, ew jî Îsa Mesîh e. Her tişt bi destê wî hat afirandin û em bi wî hene.
[7] Lê belê her kes ne xwediyê vê zanînê ye. Hinek jî, ji ber hîn-
bûna pûtan a heta niha, li ser goştê ku ji pûtan re hatiye gorîkirin,
hê jî dibêjin: «Ev goşt ji pûtan re ye» û dixwin. Wusa ji ber ku wij-
dana wan qels e, qirêjî dibe. [8] Xwarin me nêzîkî Xwedê nake. Em
nexwin kêmahiya me çênabe, em bixwin jî zêdehiya me çênabe.
[9] Lê hay jê hebin, bila ev azadiya we ji bo yên qels bi tu awayî
nebe sedemê terpilînê*. [10] Çimkî, eger yek te, tu yê ku zana yî li
perestgeha pûtan li ser sifrê bibîne û ew bi xwe jî qels be, ma wij-
dana wî cesaretê nastîne ku goriyên ku ji pûtan re tên pêşkêşkirin
bixwe? [11] Îcar mirovê qels, ew birayê ku Mesîh di ber de miriye, bi
zanîna te helak dibe. [12] Û bi vî awayî bi gunehkirina li hember bi-
rayan û birîndarkirina wijdana wan a qels, hûn li hember Mesîh
guneh dikin. [13] Ji bo vê yekê eger xwarin bibe sedemê terpilîna bi-
rayê min, ji bo ku ez birayê xwe neterpilînim, ez qet goşt naxwim.

### *Mafên Şandiyan*

9 Ma ez ne azad im? Ma ez ne Şandî me? Ma min Xudanê me
Îsa nedîtiye? Ma hûn di baweriya Xudan de ne berê xebata min
in? [2] Ez ji bo hinekên din ne Şandî bim jî, qet nebe ez ji bo we
Şandî me. Çimkî hûn di baweriya Xudan de mora şandîtiya min in.
[3] Xweparastina min a li hember yên ku min dikişînin pirsê ev
e. [4] Ma heqê me tune ku em bixwin û vexwin? [5] Ma heqê me tune
ku em wek Şandiyên din û wek birayên Xudan û wek Kîfas*,
jineke bawermend bi xwe re bigerînin? [6] An ma heqê min û Bar-
nabas tenê nîne ku em nexebitin? [7] Ma kî bi perê xwe leşkeriyê di-
ke? Ma kî rezekî datîne û berê wî naxwe? Ma kî şivantiya keriyekî
dike û ji şîrê wî venaxwe?
[8] Ma ez van tiştên ha li gor mirovan dibêjim? An ma Şerîet* jî
van tiştan nabêje? [9] Çimkî di Şerîeta Mûsa* de hatiye nivîsîn: «De-
vê gayê ku gêrê dike girê nedin.»[a] Gelo Xwedê xema ga dixwe, [10] an
bi tevahî vê ji bo me dibêje? Erê, ev ji bo me hat nivîsîn. Çimkî yê
ku cot dike, divê bi hêvî cot bike; û yê ku gêrê dike, divê bi hêviya
ku ewê bibe hevpar, gêrê bike. [11] Madem ku me tiştên ruhanî di

---

[a] 9:9 Ji: Dubarekirina Şerîetê 25:4

hundirê we de çand, em tiştên cismanî ji we bidirûn, ma gelek e?
[12] Eger hinekên din di desthilatiyê de li ser we pardar bin, ma heqê
me hê bêtir tune? Lê belê me ev desthilatiya xwe bi kar neanî. Îcar
ji bo ku em astengekê ji Mizgîniya Mesîh re dernexin, em her tiştî
radigirin*.
[13] Ma hûn nizanin, yên ku di karê Perestgehê de dixebitin, ji
Perestgehê dixwin û yên ku di gorîgehê de xizmetê dikin, parê ji
gorîgehê distînin? [14] Bi vî awayî, Xudan emir kir, yên ku Mizgî-
niyê belav dikin, ji Mizgîniyê abora xwe bikin.
[15] Lê min qet yek ji van heqan bi kar neanî. Û ez van tiştan na-
nivîsim ku weha ji bo min bê kirin. Çimkî ji dêla ku yek pesindana
min pûç derxe, mirin ji bo min çêtir e. [16] Eger ez Mizgîniyê bidim,
ew ji bo min nabe pesindan. Çimkî ev barê pişta min e. Wey li
min, eger ez Mizgîniyê belav nekim! [17] Îcar, eger ez vê bi daxwaz
bikim, xelata min heye. Eger ez ne bi daxwaz bikim, wekîltî li min
hatiye spartin. [18] Nexwe xelata min çi ye? Ev e ku çaxê ez Miz-
gîniyê belav dikim, ez Mizgîniyê bê bergîdan* bidim, da ku ez
desthilatiya xwe ya ku di Mizgîniyê de ye bi kar neynim.
[19] Bi ser ku ez ji her kesî azad im, ji bo ku ez hê bêtir mirovan
bi dest bixim, min xwe kir xulamê her kesî. [20] Bi Cihûyan re ez
bûm wek Cihûyan, da ku ez Cihûyan bi dest bixim. Bi wan re yên
ku di bin Şerîetê de ne, ez bûm wek ên ku di bin Şerîetê de ne, da
ku ez wan ên di bin Şerîetê de ne bi dest bixim. – Heçî ew e, ez bi
xwe ne di bin Şerîetê de me. [21] Ez bi wan ên bê Şerîet re bûm wek
ku ez bê Şerîet im, da ku ez wan ên bê Şerîet bi dest bixim. – Heçî
ew e, ez li hember Xwedê ne bê Şerîet im, lê ez di bin Şerîeta
Mesîh de me. [22] Bi qelsan re ez bûm qels, da ku ez yên qels bi dest
bixim. Bi her kesî re ez bûme her tişt, da ku ez bi her awayî hi-
nekan bi dest bixim. [23] Ez van hemûyan ji bo Mizgîniyê dikim, da
ku para min di wê de hebe.
[24] Ma hûn nizanin ku di meydana bezê de, ji hemûyên ku
dikevin hevbezînê tenê yek xelatê distîne. Hûn jî wusa bibezin, da
ku hûn xelatê bistînin. [25] Her kesê ku dikeve berhevdanê, di her
tiştî de nefsa xwe digire. Ew ji bo çelengeke pûç vê dikin, lê em ji

---

**9:13** Dubarekirina Şerîetê 18:1 **9:14** Lûqa 10:7-8

bo yeke nepûç dikin. [26] Ji bo vê yekê ez bêarmanc nabezim, ez badîhewa kulma xwe navêjim hewayê. [27] Ez cefayê didim bedena xwe û wê bindest dikim, da ku piştî min hinekên din hîn kirin, ez bi xwe neyêm redkirin.

### *Ji Pûtperestiyê Dûr Bin*

10 Birano, ez naxwazim ku hûn ji vê yekê bêhay bin, ku bav û kalên me hemû di bin ewr de bûn û hemû di deryayê re derbas bûn, [2] û hemû di ewr de û di deryayê de imad* bûn ku bibin yên Mûsa û [3] hemûyan eynî xwarina ruhanî xwar û [4] hemûyan eynî vexwarina ruhanî vexwar. Çimkî ji lata ruhanî ya ku li pey wan dihat vedixwarin. Û ev lat Mesîh bû. [5] Lê belê Xwedê ji pirraniya wan razî nebû, loma termê wan li çolê hatin raxistin.

[6] Niha ev bûyer ji bo me bûn mînak, da wek ku dilê wan çû tiştên xerab, dilê me jî neçe tiştên xerab. [7] Wek hinekan ji wan, hûn nebin pûtperest*; çawa ku hatiye nivîsîn: «Gel li ser xwarin û vexwarinê rûnişt û rabû ku bileyize.»[a] [8] Em fuhûşiyê nekin, wek hinekan ji wan fuhûşî kir û di rojekê de bîst û sê hezar kes ketin. [9] Û em Mesîh neceribînin wek ku hinekan ji wan kir û ji aliyê maran ve hatin helakkirin. [10] Pitepitê nekin wek ku hinekan ji wan kir pitepit û ji aliyê helakker ve hatin helakkirin. [11] Ev tiştên ha bi mînaktî hatin serê wan û ji bo ku ji me yên ku gihîştin dawiya deman re bibin şîret, hatine nivîsîn. [12] Ji ber vê yekê, yê ku guman dike ku qayîm disekine, bila hay ji xwe hebe, ku nekeve! [13] Hûn ji tiştên mirovî pê ve neketin tu ceribandinên din. Xwedê dilsoz e û destûrê nade ku hûn ji karîna xwe zêdetir bên ceribandin. Lê belê ji bo ku hûn bikarin ragirin*, wê bi ceribandinê re riya jêderketinê jî pêk bîne.

[14] Ji ber vê yekê hezkirîno, ji pûtperestiyê birevin. [15] Ez wek ku ji kesên aqilmend re dibêjim, dipeyivim. Ya ku ez dibêjim, biwezinînin. [16] Kasa pîroziyê ya ku em pîroz dikin, ma ne hevpariya

---

[a] **10:7** Ji: Derketin 32:6

**10:1** Derketin 13:21-22; 14:22-29
**10:3** Derketin 16:35
**10:4** Derketin 17:6; Hijmartin 20:11
**10:5** Hijmartin 14:29-30
**10:6** Hijmartin 11:4
**10:8** Hijmartin 25:1-18
**10:9** Hijmartin 21:5-6
**10:10** Hijmartin 16:41-49

xwîna Mesîh e? Nanê ku em dişkênin, ma ne hevpariya bedena
Mesîh e? [17] Madem ku nan yek e, bi ser ku em gelek in jî em be-
denek in. Çimkî em hemû ji nanekî parê distînin.
[18] Li gelê Îsraêl binêrin, ma yên ku goriyan dixwin ne hev-
parên gorîgehê ne? [19] Nexwe ez çi dibêjim? Ma goriya ku ji pûtan
re tê dayîn tiştek e? An jî pût tiştek e? [20] Na! Ez vê dibêjim, pûtpe-
rest qurbanên xwe ne ji Xwedê re, lê belê ji cinan re pêşkêş dikin.
Îcar ez naxwazim ku hûn bi cinan re bibin hevpar. [21] Hûn nikarin
hem ji kasa Xudan û hem ji kasa cinan vexwin. Hûn nikarin hem ji
sifra Xudan û hem ji sifra cinan parê bistînin. [22] Ma em dixwazin
Xudan hêrs bikin? Ma em ji wî hêzdartir in?

### *Azadiya Bawermendan*

[23] «Her tişt serbest e», lê belê her tişt ne bi feyde ye. «Her tişt
serbest e», lê belê her tişt ava nake. [24] Bila her kes ne li qenciya
xwe, lê belê li qenciya yên din bigere. [25] Her tiştê ku li çarşiya
qesaban tê firotin, bêyî ku ji bo wijdanê hûn lê bipirsin, bixwin.
[26] «Çimkî erd û hemû tiştên ku tê de ne, yên Xudan in.»[a] [27] Eger
yekî ku baweriyê nayne gazî we bike û hûn bixwazin herin, her
tiştê ku danîn ber we, bêyî ku hûn ji bo wijdanê lê bipirsin, bixwin.
[28] Lê eger yek ji we re bêje: «Ev goştê goriyê ye», ji bo yê ku vê
dibêje û ji bo wijdanê nexwin. [29] Çaxê ez li ser wijdanê dibêjim, ne
li ser ya te, lê ez li ser ya mirovê din dibêjim. Gelo çima wijdana
yekî din, azadiya min dadbar* bike? [30] Eger ez bi spasî bixwim,
nexwe çima ji ber tiştê ku min ji bo wî spas kiriye, ez bêm sûc-
darkirin? [31] Loma hûn her çi bixwin, her çi vexwin, her çi bikin,
her tiştî ji bo rûmeta Xwedê bikin. [32] Ne ji bo Cihûyan, ne ji bo
miletên din û ne jî ji bo civîna bawermendan a Xwedê, nebin se-
demê terpilînê*, [33] çawa ku ez jî di her tiştî de dilê hemûyan xweş
dikim. Ez ne li feyda xwe digerim, lê ez li feyda gelekan digerim
da ku ew rizgar bibin.

---

[a] **10:26** Ji: Zebûr 24:1; 50:12; 89:11
**10:16** Metta 26:26-28
**10:18** Qanûna Kahîntiyê 7:6
**10:20** Dubarekirina Şerîetê 32:17

**11** Çawa ku ez mîna Mesîh dikim hûn jî mîna min bikin.

### *Sernixamtin*

2 Ji ber ku hûn di her tiştî de min tînin bîra xwe û hînkirinên ku
min spartine we hûn diparêzin, ez pesnê we didim. 3 Lê ez dix-
wazim hûn bizanin ku serê her zilamî Mesîh, serê jinê mêr û serê
Mesîh jî Xwedê ye. 4 Her zilamê ku sernixamtî dua an jî pêxembe-
rîtiyê dike, ew serê xwe bê siyanet* dike. 5 Lê her jina ku servekirî
dua an jî pêxemberîtiyê dike, serê xwe bê siyanet dike. Çimkî ev,
wek ku serê wê hatiye kurkirin û eynî tişt e. 6 Eger jin xwe neni-
xême, bila porê xwe jî bibire! Lê madem ji bo jinê porbirrîn an jî
serkurkirin şerm e, bila serê xwe binixême. 7 Divê mêr serê xwe
nenixême çimkî ew wêne û rûmeta Xwedê ye. Lê jin rûmeta mêr e.
8 Çimkî ne mêr ji jinê çêbû, lê belê jin ji mêr çêbû. 9 Îcar mêr ne ji
bo jinê, lê belê jin ji bo mêr hat afirandin. 10 Ji bo vê yekê û ji ber
milyaketan, divê desthilatiya jinê li ser serê wê hebe. 11 Lê dîsa li
ba Xudan ne jin ji mêr û ne jî mêr ji jinê serbixwe ye. 12 Çimkî, ka
çawa jin ji mêr çêbû, mêr jî bi jinê tê dinyayê. Lê her tişt ji Xwedê
ye. 13 Hûn bi xwe biwezinînin: Ma li jinê tê ku servekirî li ber
Xwedê dua bike? 14 Ma tebîet jî hînî we nake ku mêr porê xwe di-
rêj bike ji bo wî bêhurmetî ye, 15 lê pordirêjiya jinê ji bo wê rûmet
e? Çimkî por ji bo nixamtinê ji wê re hatiye dayîn. 16 Lê eger yek
bixwaze devjeniyê bike, ne adeteke me ya weha heye, ne jî ya ci-
vînên bawermendan ên Xwedê.

### *Şîva Xudan*

17 Lê di van tiştên ku ez niha tembîh bikim de, ez pesnê we
nadim, çimkî li hev civînên we ji dêla ku feydê bidin, ziyanê didin.
18 Ya pêşî, ez dibihîzim dema ku hûn hemû li hev dicivin, di nav
we de partîkarî hene û ez hinekê ji vê bawer dikim. 19 Erê, divê di
nav we de dubendî hebin, da ku di nav we de yên meqbûl eşkere
bibin. 20 Îcar gava ku hûn li hev bicivin, ev ne ji bo xwarina şîva
Xudan e. 21 Çimkî li ser xwarinê her yek dikeve ser şîva xwe û hin
birçî dimînin, hin jî serxweş dibin. 22 Ma ji bo xwarin û vexwarinê

---

**11:1** 1 Korîntî 4:16; Filîpî 3:17 **11:8** Destpêkirin 2:18-23

malên we tunin? An ku hûn civîna bawermendan a Xwedê biçûk
dibînin û yên ku tiştekî wan tune, hûn didin şermkirin? Ma ez ji we
re çi bêjim? Ma ez pesnê we bidim? Di vê yekê de ez pesnê we
nadim!
23 Çimkî ya ku min ji Xudan stand min spart we: Şeva ku Xu-
dan Îsa dan dest, wî rahişt nên, 24 piştî ku şikir kir, şkand û got:
«Ev bedena min a ji bo we ye. Ji bo bîranîna min vê bikin.» 25 Bi vî
awayî jî piştî xwarina şîvê wî rahişt kasê û got: «Ev kas Peymana*
Nû ya bi xwîna min e. Her cara ku hûn vexwin, ji bo bîranîna min
vê bikin.» 26 Çimkî her cara ku hûn vî nanî bixwin û vê kasê vex-
win, heta ku Xudan bê, hûn mirina wî didin zanîn.
27 Ji ber vê yekê, kî ku bi awayekî nehêja, nên bixwe, an ji kasa
Xudan vexwe, ew li hember beden û xwîna Xudan sûcdar dibe.
28 Îcar bila mirov xwe bi xwe hêre* bike û piştre ji nên bixwe û ji
kasê vexwe. 29 Çimkî yê ku dixwe û vedixwe eger bedenê ferq ne-
ke, bi xwarin û vexwarinê xwe bi xwe dadbar dike. 30 Ji ber vê
yekê gelek ji we nexweş û lawaz in û hin jî razane. 31 Lê eger me
xwe bi xwe hêre bikira, em nedihatin dadbarkirin. 32 Lê gava ku dî-
wana* me bê kirin, ji bo ku em bi dinyayê re sûcdar dernekevin,
em ji aliyê Xudan ve tên terbiyekirin. 33 Îcar birano, gava ku hûn ji
bo xwarinê li hev bicivin, li benda hevdû bimînin. 34 Eger yek birçî
be, bila li mala xwe bixwe, da ku hatina we ya ba hev, nebe sedem
ku hûn bên dîwankirin. Tiştên mayî, gava ku ez bêm ba we ezê se-
rûber bikim.

## *Diyariyên Ruhanî*

12 Îcar heçî pirsa diyariyên ruhanî ye, birano, ez naxwazim ku
hûn nezan bimînin. 2 Gava ku hûn pûtperest* bûn, hûn di-
zanin ka çawa bi xirandina hişê we hûn ber bi pûtên bêziman ve
birin. 3 Ji bo vê yekê ez bi we didim zanîn: Tu kes bi peyivîna ku
bi Ruhê Xwedê ye nabêje: «Nifir li Îsa be!» Û eger ne bi Ruhê Pî-
roz be, tu kes nikare bêje: «Îsa Xudan e.»
4 Îcar cûreyên diyariyên ruhanî hene, lê Ruh eynî ye. 5 Û cûre-
yên xizmetan hene, lê Xudan eynî ye. 6 Û cûreyên kirinan jî hene,
lê yê ku di hemûyan de her karî dike eynî Xwedê ye. 7 Eşkerebûna

---

**11:24-25** Lûqa 22:18-19

Ruh ji bo berjewendiya gelemperî ji her kesî re tê dayîn. [8] Bi saya
Ruh ji yekî re peyva şehrezayiyê, ji yekî din re jî bi eynî Ruhî
peyva zanînê tê dayîn, [9] bi eynî Ruhî ji yekî re bawerî û bi Ruhê ku
yek e ji yekî din re jî diyariyên qenckirina nexweşan tê dayîn. [10] Ji
yekî re hêza kirina kerametan, ji yekî re pêxemberîtî, ji yekî re
karîna ji hev ferqkirina ruhan, ji yekî re zimanên* cûr bi cûr, ji ye-
kî re karîna wergerandina zimanan tê dayîn. [11] Yê ku van hemûyan
pêk tîne, yek û eynî Ruh e. Ruh li gor daxwaza xwe van cihê cihê
li her kesî belav dike.

### *Yekîtiya Bedenê*

[12] Çawa ku beden yek e û gelek endamên wê hene û bi ser ku
endamên bedenê gelek in jî, hemû yek beden in, Mesîh jî weha ye.
[13] Çimkî em, dixwazî Cihû, dixwazî Yewnanî*, dixwazî xulam,
dixwazî azad bin; em hemû bi yek Ruhî hatin imad* kirin ku em
bibin bedenek û ji me hemûyan re eynî Ruh hat dayîn ku em jê
vexwin.
[14] Ji xwe beden ne endamek e, lê gelek endam e. [15] Eger ling
bêje: «Ji ber ku ez ne dest im, ez ne ji bedenê me», ew bi vê yekê
ne li derveyî bedenê ye. [16] Eger guh bêje: «Ji ber ku ez ne çav im,
ez ne ji bedenê me», ew bi vê yekê ne li derveyî bedenê ye. [17] Eger
hemû beden çav bûya, hingê bihîstin li ku derê dima? Eger hemû
bihîstin bûya, bîhnkirin li ku derê dima? [18] Lê Xwedê her yek ji
endaman li gor daxwaza xwe di bedenê de bi cih kir. [19] Îcar, eger
hemû endamek bûya, beden li ku derê dima? [20] Lê niha gelek en-
dam, lê tenê bedenek heye. [21] Çav nikare ji dest re bêje: «Hewce-
dariya min bi te tune!» Serî jî nikare ji lingan re bêje: «Hewce-
dariya min bi we tune!» [22] Tam bervajiyê vê yekê, endamên be-
denê yên ku lawaz tên dîtin, hê lazimtir in. [23] Endamên bedenê yên
ku em bêsiyanet dibînin, em bêtir siyaneta wan digirin û endamên
me yên ku ne spehî ne hê bêtir hurmet ji wan re tê kirin, [24] lê hew-
cedariya endamên me yên spehî bi vê yekê tune. Lê belê Xwedê
beden weha bi hevdû ve danî: hê bêtir siyanetgirtin da yê kêm,

---

12:4-12 Romayî 12:4-8
12:10 Zimanên cûr bi cûr: Carna şagirtên Îsa bi saya Ruhê Pîroz dikarin bi zimanên ku pê nizanin û hîn nebûn bipeyivin.

25 da ku di bedenê de cihêtî nebe, lê belê endam bi eynî pîvanê
xema hev bixwin. 26 Eger endamek êşê bikişîne, hemû endam bi wî
re êşê dikişînin. Eger siyaneta endamekî bê girtin, hemû endam bi
hev re şa dibin.
27 Îcar hûn bedena Mesîh in û endamên wî yên cihê cihê ne.
28 Xwedê di civîna bawermendan de, pêşî Şandî, duwem pêxem-
ber*, sêwem mamoste, piştre yên ku kerametan dikin, yên ku nex-
weşan qenc dikin, yên ku alîkariya kesên din dikin, yên ku dikarin
îdare bikin û yên ku zimanên* din dipeyivin destnîşan kir. 29 Ma
hemû Şandî ne? Ma hemû pêxember in? Ma hemû mamoste ne?
Ma hemû kerametan dikin? 30 Ma diyariya hemûyan heye ku nexwe-
şan qenc bikin? Ma hemû bi zimanan dipeyivin? Ma hemû zimanan
werdigerînin? 31 Îcar hûn bi xîret diyariyên bilindtir bixwazin.
Û ezê riyeke hê çêtir nîşanî we bidim.

### *Riya Herî Hêja: Hezkirin*

13 Eger ez bi zimanên mirov û milyaketan bêjim, lê hezkirina
min tune be, ez bûme wek sifrekî ku deng derdixe an jî
zengilekî ku dike çink çink. 2 Eger pêxemberîtiya min hebe û ez
hemû siran û her zanayiyê bizanim û eger baweriya min a tam a ku
çiyayan ji cihê wan rake hebe, lê hezkirina min tune be, ez qet ne
tu tişt im. 3 Eger ez her tiştê xwe bi alîkarîtî bidim û bedena xwe ji
bo şewitandinê teslîm bikim, lê hezkirina min tune be, qet feyda
min jê tune.
4 Hezkirin sebir dike, hezkirin dilovaniyê dike. Hezkirin çav-
nebariyê nake, xwe mezin nake, pozbilindiyê nake, 5 tiştên ne spe-
hî nake, li feyda xwe nagere, hêrs nabe, li xerabiya kesî nagire; 6 bi
neheqiyê şa nabe, lê bi rastiyê şa dibe; 7 bîhna xwe di her tiştî de
fireh dike, ji her tiştî bawer dike, hêviya wê ji her tiştî heye, li her
tiştî sebir dike.
8 Dawiya hezkirinê qet nayê; lê heçî pêxemberîtî ne, wê betal
bibin; heçî ziman* in, wê xilas bibin; heçî zanîn e, wê betal bibe.
9 Çimkî zanîna me kêm e û pêxemberîtiya me kêm e. 10 Lê çaxê ku
bêkêmahîtî bê, ya kêm wê betal bibe. 11 Çaxê ku ez zarok bûm,
min wek zarokan digot; wek zarokan fêm dikir; ez wek zarokan

---

**12:28** Efesî 4:11 **13:2** Metta 17:20; 21:21

difikirîm; çaxê ez bûm zilam, min dev ji tiştên zaroktiyê berda.
12 Çimkî niha em di neynikê de, ne zelal dibînin, lê hingê emê rû bi
rû bibînin. Niha ez hinekê dizanim, lê wî çaxî, çawa ku ez tam têm
zanîn, ezê tam bizanim.
13 Îcar ev her sê dimînin: Bawerî, hêvî û hezkirin. Û ji van ya
herî mezin hezkirin e.

### *Diyariya Pêxemberîtî û Zimanan*

14 Li pey hezkirinê bibezin û diyariyên ruhanî bi xîret bixwa-
zin, lê hê bêtir pêxemberîtîkirinê. 2 Çimkî yê ku bi zimanê*
din dibêje, ne ji mirovan re, lê ji Xwedê re dibêje. Kes wî fêm
nake; ew bi ruh siran dibêje. 3 Lê yê ku pêxemberîtiyê dike, ji bo
avakirin, cesaretdan û handanê* ji mirovan re dibêje. 4 Yê ku bi zi-
manê* din dipeyive, xwe bi xwe ava dike; lê yê ku pêxemberîtiyê
dike, civîna bawermendan ava dike. 5 Ez dixwazim ku hûn hemû bi
zimanan* bipeyivin; lê ez hê bêtir dixwazim ku hûn pêxemberîtiyê
bikin. Yê ku pêxemberîtiyê dike, ji yê ku bi zimanan dipeyive
meztir e. Lê eger yê ku bi zimanan dipeyive ji bo avakirina civînê
wergerîne, ev tiştek din e.
6 Îcar birano, eger ez bêm ba we û bi zimanan bipeyivim, lê ez
peyxam*, an zanîn, an pêxemberîtî an hînkirinê ji we re nebêjim,
çi feyda min wê li we bibe? 7 Eger tiştên ne zindî yên ku deng der-
dixin, bilûr be an jî çeng be, dengên cihê derneynin, ji ku derê wê
bê zanîn makamê ku bi bilûrê an bi çengê tê lêxistin, çi ye? 8 Eger
borî jî dengekî nekifş derîne, kî wê xwe ji bo şer amade bike?
9 Îcar hûn jî eger bi zimanê din peyvên zelal nebêjin, ya ku tê gotin
çawa wê bê zanîn? Çimkî gotinên we wê li ber bayê herin. 10 Bê-
guman li dinyayê gelek cûreyên zimanan hene û qet yek ji wan ne
bêmane ye. 11 Îcar, eger ez bi mana ziman nezanim, ezê ji bo yê ku
dipeyive xerîb bim û yê ku dipeyive wê ji bo min xerîb be. 12 Îcar
madem ku hûn jî ji bo diyariyên ruhanî xîretkêş in, li vê yekê bi-
gerin ku ji bo avakirina civîna bawermendan hûn di van de zêde
bibin.
13 Ji bo vê yekê, yê ku bi zimanê din dipeyive, bila dua bike da
ku bikare wergerîne. 14 Çimkî, eger ez bi zimanê din dua bikim, ru-
hê min dua dike, lê hişê min bêber dimîne. 15 Îcar ez çi bikim? Ezê
bi ruh dua bikim û ezê bi hiş jî dua bikim; ezê bi ruh lavijeyan*

bêjim û ezê bi hiş jî lavijeyan bêjim. [16] Çimkî eger tu bi ruh şikir
bikî, yê ku ji diyariyên ruhanî fêm nake, ji ber ku nizane tu çi
dibêjî, wê ji şikirkirina te re çawa «Amîn*» bêje? [17] Erê, tu qenc
şikir dikî, lê yê din nayê avakirin. [18] Şikir ji Xwedê re, ez ji we
hemûyan bêtir bi zimanên din dipeyivim. [19] Lê belê di civîna ba-
wermendan de, ji dêla ku ez bi zimanê din deh hezar peyv bêjim, ji
bo ku ez hînî yên din jî bikim, ez bi hişê xwe gotina pênc peyvan
çêtir dibînim.

[20] Birano, di aqil de zarok nebin. Di xerabiyê de bibin zarokên
biçûk, lê di aqil de gihîştî bin. [21] Di Şerîetê de ev hatiye nivîsîn:
«Xudan dibêje:

‹Ezê bi yên ku zimanên biyanî dipeyivin
Û bi lêvên biyaniyan bi vî gelî re bipeyivim
Û dîsa jî ew guhdariya min nakin.›[a]»

[22] Ji ber vê yekê ziman ne ji bo bawermendan, lê ji yên ku ba-
weriyê naynin re, ji bo nîşanekê ne. Û pêxemberîtî ne ji bo yên ku
baweriyê naynin, lê ji bo bawermendan e. [23] Niha eger tevahiya ci-
vîna bawermendan li hev bicive û hemû bi zimanan bipeyivin û
yên ku ji diyariyên ruhanî fêm nakin an jî yên ku baweriyê naynin
bikevin hundir, ma nabêjin ku hişê we ji serê we çûye? [24] Lê eger
hemû pêxemberîtiyê bikin û yekî ku bawer nake an jî yekî ku ji
diyariyên ruhanî fêm nake bikeve hundir, wê ji aliyê hemûyan ve
bê qanî kirin û toqulandin*; [25] tiştên veşartî yên di dilê wî de wê
eşkere bibin û ji ber vê yekê ewê bêje: «Bi rastî jî Xwedê di nav
we de ye», ewê deverû here erdê û biperize* Xwedê.

### *Perizîna bi Serûber*

[26] Birano, divê çawa be? Gava ku hûn dicivin, her yek ji we
lavijeya* wî, hînkirina wî, peyxama* wî, zimanê wî, wergerandina
wî heye. Bila ev hemû ji bo pêşveçûna civînê bin. [27] Eger yek bi
zimanê din bipeyive, dido an herî zêde bila sê kes bi dorê bipe-
yivin û yek jî wergerîne. [28] Lê eger yê ku wergerîne tunebe, bila
ew di civîna bawermendan de deng neke, bila di dilê xwe de ji
Xwedê re bêje. [29] Bila dido an sê pêxember bipeyivin, yên din jî
gotinên wan baş ji hevdû ferq bikin. [30] Lê eger ji yekî din ê rûniştî

---

[a] **14:21** Ji: Îşaya 28:11-12

re peyxamek bê, bila yê pêşî bêdeng bimîne. 31 Çimkî hûn hemû jî
yek bi yek dikarin pêxemberîtiyê bikin, da ku hemû hîn bibin û
cesaretê bistînin. 32 Û ruhê pêxemberan bi ya pêxemberan dike.
33 Ji ber ku Xwedê, ne Xwedayê tevliheviyê ye, lê yê aştiyê ye.
Wek di hemû civînên pîrozan de, 34 bila jin di civînan de bê-
deng bimînin. Çimkî ji bo wan destûra peyivînê tune. Wek ku şe-
rîet jî dibêje bila serî deynin. 35 Eger bixwazin tiştekî hîn bibin, bila
li mal ji mêrê xwe bipirsin. Çimkî di civînê de ji bo jinê peyivîn
şerm e.
36 Ma peyva Xwedê ji we derket? An ku gihîşt we tenê?
37 Eger yek guman bike ku ew pêxember an jî ruhanî ye, bila
fêm bike, tiştê ku min ji we re nivîsiye emrê Xudan e. 38 Lê yê ku
van qebûl neke, bila neyê naskirin.
39 Ji ber vê yekê birano, li pey pêxemberîtî kirinê bibezin û ji
peyivîna zimanan re nebin asteng. 40 Lê bila her tişt li cih û bi
rêkûpêk be.

### *Rabûna Mesîh*

15 Niha birano, ez wê Mizgîniya ku min da we û we jî qebûl
kir û hûn tê de dimînin, bi we didim zanîn. 2 Eger hûn wê
Mizgîniya ku min daye we hişk bigirin, hûnê bi wê rizgar jî bibin;
an na we badîhewa bawer kiriye. 3 Çimkî ya ku min stand, min berî
her tiştî ragihand we. Wusa ku, Mesîh li gor Nivîsarên Pîroz, ji bo
gunehên me mir 4 û hat veşartin û li gor Nivîsarên Pîroz roja si-
siyan hat rakirin. 5 Ji Kîfas* re, piştre ji diwanzdehan re xuya bû.
6 Piştî vê jî, di carekê de ji pênc sed birayî zêdetir kesî re xuya bû;
û pirraniya wan hê dijîn, lê hin ji wan razane. 7 Piştre ji Aqûb re
xuya bû, piştre jî ji hemû Şandiyan re. 8 Piştî hemûyan jî, ji min re
jî xuya bû, ez ê ku mîna zarokekî jiberçûyî me. 9 Çimkî ez, ji Şan-
diyan yê herî biçûk im. Ez ne hêja me ku Şandî bêm gazîkirin; ji
ber ku min tengahî da civîna bawermendan a Xwedê. 10 Lê ez çi
bim, ez bi kerema Xwedê me. Û Kerema wî ya li ser min badîhewa

---

15:3 Îşaya 53:5-12 15:4 Zebûra 16:8-10
15:5 Lûqa 24:34-36; Metta 28:16-17; Marqos 16:14; Yûhenna 20:19
15:6 «hin ji wan razane» li vir bi vê manê ye: «hin ji wan mirine».
15:8 Karên Şandiyan 9:3-6 15:9 Karên Şandiyan 8:3

neçû, lê ez ji wan hemûyan bêtir xebitîm. Ya rast ne ez, lê belê ke-
rema Xwedê ya bi min re xebitî. 11 Îcar, eger ez an jî ew, em weha
didin bihîstin û we jî weha bawer kir.

### *Rabûna Miriyan*

12 Eger tê danbihîstin ku Mesîh ji nav miriyan hat rakirin, çawa
ji nav we hinek dibêjin: «Rabûna miriyan tune.» 13 Eger rabûna
miriyan tune be, Mesîh jî ne hatiye rakirin. 14 Eger Mesîh nehatibe
rakirin, hingê danezana me pûç û baweriya we jî pûç e. 15 Hingê
em şahidên Xwedê yên derewîn derdikevin. Çimkî me li ser Xwe-
dê şahidî kir ku wî Mesîh ji nav miriyan rakir. Lê eger bi rastî mirî
neyên rakirin, hingê Xwedê Mesîh jî ranekir. 16 Çimkî eger mirî
neyên rakirin, nexwe Mesîh jî nehatiye rakirin. 17 Eger Mesîh ne-
hatibe rakirin, baweriya we jî betal e, hê jî hûn di nav gunehên xwe
de ne. 18 Di vê rewşê de, yên ku di baweriya Mesîh de razane jî he-
lak bûne. 19 Eger bi tenê ji bo vê jiyanê, me hêviya xwe bi Mesîh ve
girêdabe, hingê em ji hemû mirovan bêtir di rewşeke reben de ne.

20 Lê rastî ev e ku Mesîh ji nav miriyan hatiye rakirin û ew
berê* pêşî yê razayiyan e. 21 Madem ku mirin bi destê mirov hat,
rabûna miriyan jî bi destê mirov çêbû. 22 Çawa ku hemû bi Adem*
dimirin, wusa jî hemû wê bi Mesîh bên vejandin. 23 Lê her kes di
dora xwe de: Berê* pêşî Mesîh; piştre, di hatina Mesîh de yên wî
wê rabin. 24 Piştre, çaxê ku Mesîh her hukumdarî û her desthilatî û
hêzê betal bike û padîşahiyê bide destê Bav Xwedê, wê bibe dawî.
25 Çimkî, divê Mesîh hukumdariyê bike heta ku Xwedê hemû dij-
minan bike bin lingên wî. 26 Dijminê dawî yê ku divê bê rakirin,
mirin e. 27 Çimkî: «Xwedê her tişt xist bin lingên wî», yanî bin
lingên Mesîh. Lê gava ku tê gotin: «Her tişt xist bin lingên wî»[a],
eşkere ye, yê ku her tişt xistiye bin lingên wî, ew bi xwe ne tê de,
her tişt di bin lingên wî de ye. 28 Gava ku her tişt hat xistin bin
lingê wî, hingê Kur jî wê serê xwe li ber yê ku her tişt xistin bin
lingê wî deyne, da ku Xwedê di her tiştî de her tişt be.

29 Nexwe, yên ku ji bo miriyan imad* dibin, wê çi bikin? Eger
mirî tu caran neyên rakirin, hingê çima ji bo wan imad dibin?

---

[a] **15:27** Ji: Zebûr 8:6
**15:25** Zebûr 110:1

30 Îcar çima em her saet di nav talûkê de dimînin? 31 Birano, bi wê
pesindana min ya ku di yekîtiya Xudanê me Mesîh Îsa de ji we ye,
ez her roj dimirim. 32 Eger min li Efesê, wek ku min bi heywanên
hov re şer kiribe, şer kir, feyda vê ji bo min çi ye? Eger mirî neyên
rakirin, «Em bixwin û vexwin, çimkî emê sibê bimirin.»[a] 33 Neyên
xapandin, «Hevaltiya xerab exlaqê spehî xera dike.»[b] 34 Rast werin
ser hişê xwe û guneh nekin. Çimkî li ba hinekan zanîna Xwedê
tune. Ji bo ku hûn şerm bibin ez van dibêjim.

### *Bedena ji Mirinê Rabûyî*

35 Lê belê yek dikare bêje: «Mirî çawa tên rakirin? Bi bede-
neke çawa tên?» 36 Bêaqilo, tiştê ku tu diçînî, heta ku nemire, şîn
nabe! 37 Tiştê ku tu diçînî, ne beden e ku wê çêbe, lê belê tovekî
tazî, belkî genim an jî tovekî din e. 38 Xwedê li gor daxwaza xwe
bedenekê dide wî, yanî bedena her tovî dide wî. 39 Her goşt ne yek
e; lê belê goştê mirovan cihê ye, goştê heywanan cihê ye, goştê
teyrikan cihê ye û goştê masiyan cihê ye. 40 Bedenên ezmanî û be-
denên dinyayî hene. Lê rûmeta bedenên ezmanî cihê ye, rûmeta
yên dinyayî cihê ye. 41 Rûmeta rojê cihê ye, rûmeta heyvê cihê ye
û rûmeta stêran cihê ye. Di rûmetê de stêr ji stêrê jî cihê ye. 42 Ra-
bûna mirovan jî bi vî awayî ye. Di rizîbûnê de tê çandin, di ne-
rizîbûnê de tê rakirin. 43 Di şermezariyê de tê çandin, di rûmetê de
tê rakirin; di lawaziyê de tê çandin, di hêzdariyê de tê rakirin.
44 Bedena xweheyî* tê çandin, bedena ruhanî tê rakirin. Çawa ku
bedena xweheyî heye, wusa jî bedena ruhanî heye. 45 Weha jî hati-
ye nivîsîn: «Mirovê pêşî Adem, bû canê jîndar.»[c] Lê Ademê paşî
bû ruhê ku jiyanê dide. 46 Lê belê ne bedena ruhanî lê bedena xwe-
heyî pêşî hat; ya ruhanî paşê hat. 47 Mirovê pêşî ji erdê, yanî ji axê
ye; mirovê diduyan ji ezmanan e. 48 Yê ji axê çawa be, yên ku ji
axê ne jî wusa ne. Yê ezmanî çawa be, yên ezmanî jî wusa ne.
49 Çawa ku me wêneyê mirovê ji axê wergirtiye, wusa jî emê wê-
neyê mirovê ezmanî wergirin.

---

[a] 15:32 Ji: Îşaya 22:13; 56:12

[b] 15:33 Ev ji nivîskarê Yewnanî Menander e; ew berî Îsa di nîvê paşî yê sedsala çaran de dijiya.

[c] 15:45 Ji: Destpêkirin 2:7

[50] Birano, ez vê dibêjim: Xwîn û goşt nikarin Padîşahiya Xwe-
dê mîras bistînin. Ne jî rizîbûn dikare nerizîbûnê mîras bistîne.
[51] Va ye, ez ji we re sirekê dibêjim: Em hemû ranazin, lê di
lêxistina boriya dawî de emê hemû di kêlîkekê de, di girtin û veki-
rina çavan da, bên guhertin. [52] Çimkî borî wê bê lêxistin, mirî wê
bi nerizîbûnîtî bên rakirin û emê bên guhertin. [53] Çimkî divê evê ku
dirize nerizîbûnê û evê ku dimire nemirinê li xwe bike. [54] Îcar gava
ku evê dirize nerizîbûnê û evê ku dimire nemirinê li xwe bike, ev
peyva nivîsandî hingê wê bê cih: «Mirin di serketinê de hat daqur-
tandin.[a] [55] Hey mirinê, kanê serketina te li ku derê ma? Hey mirinê,
kanê derziya te li ku derê ma?»[b] [56] Derziya mirinê guneh e; hêza
guneh şerîet e. [57] Lê şikir ji Xwedê re yê ku bi destê Xudanê me Îsa
Mesîh serketinê dide me. [58] Ji bo vê yekê, ey birayên min ên hez-
kirî, veneleqin, nelebte bin, di karê Xudan de herdem xîretkêş bin;
çimkî hûn dizanin ku bi Xudan re keda we ne badîhewa ye.

### *Civandina Peran*

16 Îcar heçî alîkarî civandina ji bo pîrozan e, wek min li ci-
vînên bawermendan ên li Galatyayê tembîh kiriye, hûn jî
wusa bikin. [2] Bila her yek ji we di roja pêşî ya heftiyê de, li gorî
hatina xwe hinek pere bicivîne û li ba xwe hilîne, da ku gava ez
bêm, civandina peran ne hewce be. [3] Gava ku ez bêm, ezê wan ke-
sên ku we li cih dîtine ku diyariya we bibin Orşelîmê*, bi nameyan
ve bişînim. [4] Eger çûna min jî qenc be, ewê bi min re herin.

### *Planê Gerê*

[5] Gava ku ez di Mekedonyayê re derbas bibim ezê bêm ba we.
Çimkî ezê di Mekedonyayê re derbas bibim. [6] Îcar belkî ez li ba we
bimînim an jî zivistanê li ba we derbas bikim; da ku, ez herim ku
derê, hûn min bi rê bixin. [7] Ez naxwazim ku niha we li ser lingan
bibînim; eger Xudan destûrê bide, ez hêvî dikim ku demekê bi we
re bimînim. [8] Lê ezê heta Roja* Pentîkostê li Efesê bimînim. [9] Çimkî
ji bo xebatê deriyekî fireh li ber min vebûye û yên ku li hember
radibin gelek in.

---

[a] 15:54 Ji: Îşaya 25:8 [b] 15:55 Ji: Hoşêya 13:14
15:51 1 Selanîkî 4:14-17

10 Eger Tîmotêyos* tê, wusa bikin ku bêtirs li ba we bimîne.
Çimkî ew jî wek min di karê Xudan de dixebite. 11 Loma bila tu
kes wî kêm nebîne. Ji bo ku bê ba min, wî bi aştî bi rê bixin. Çimkî
bi birayan re ez li benda wî me.
12 Îcar heçî birayê me Apolos e, min pirr rica jê kir ku bi bi-
rayên din re bê ba we, lê daxwaza wî ya hatinê niha qet tune. Di
demeke xweşkeys de ewê bê.

### *Daxwaz û Silav*

13 Hişyar bin, di baweriyê de hîmgirtî bin, mêrxas bin, hêzdar
bin. 14 Her tiştê ku hûn dikin, bila bi hezkirinê bê kirin.
15-16 Birano, daxwazeke min ji we heye; hûn dizanin, maliyên
Stefanas, bawermendên pêşî yên herêma Axayayê* ne. Bi ser de
wan xwe ji xizmeta pîrozan re veqetandiye. Serî li ber yên weha û
li ber hemûyên ku bi wan re dixebitin û keda xwe didin, deynin.
17 Ez şa dibim ku Stefanas, Fortunatos û Axayîkos hatin, çimkî
wan cihê we girt 18 û rihetî dan ruhê min û yê we jî. Loma, yên
weha nas bikin.
19 Civînên bawermendan ên herêma Asyayê* silavan li we di-
kin. Akîlas û Priskîla, bi civîna bawermendan a li mala xwe ve, bi
navê Xudan gelek silavan li we dikin. 20 Hemû bira silavan li we
dikin. Bi ramûsana pîroz silavan li hevdû bikin.
21 Ez Pawlos, bi destê xwe silavên xwe dinivîsim. 22 Eger yek ji
Xudan hez neke, nifir li ser wî be. ‹Maranata›. 23 Kerema Xudan
Îsa li ser we be. 24 Hezkirina min, bi saya Mesîh Îsa bi we hemûyan
re be. Amîn*.

---

**16:15** Peyv bi peyv: «berê* pêşî yên herêma Axayayê ne.»
**16:22** Maranata: Gotineke bi zimanê Aramî ye, a ku mana wê ev e: «Ya Xudan, were!»

# *Nameya Pawlos a diduyan ji Korîntiyan re*

### *Pêşgotin*

*Pawlosê Şandî 5-6 salan piştî serdana xwe ya pêşî, cardin çû serdana Korîntê û sê mehan li wê derê ma (Karên Şandiyan 20:2-3). Pawlos piştre derbasî Mekedonyayê bû û Tîtos dît (7:5-16).*

*Berî ku ew vê namê binivîse, di navbera wî û hinekên ji civîna Korîntê de nexweşî hebû. Wek ku ji namê jî tê fêmkirin, hin ji endamên wê civînê li hember wî rabûbûn. Çaxê Pawlos bihîst ku hinan tobe kirine, wî ev name ji civînê re şand.*

*Ev nama ku kêm û zêde salekê piştî nameya pêşî ya ji Korîntiyan re hatiye nivîsîn, hîsên Pawlosê Şandî nîşan dide. Wek nameya din, di vê nameyê de jî li ser pirsa rabûna ji nav miriyan tê rawestan (5:1-10). Pawlos cesaretê dide civîna Korîntê ku alîkariya bawermendên belengaz ên li Orşelîmê bikin (8:4, 19-20; 9:1, 12-13). Di nameyê de li ser tengahî û cefayên ku çaxê Pawlosê Şandî Mizgînî dida, kişandine jî, tê gotin (11:1-12:10).*

*Di vê nameyê de, rûyê rastîn ê kesên ku xwe wek şandiyan nîşan didin, lê li hember Mizgîniyê derdikevin jî tê nîşandan (11:13). Pawlos îspat dike ku şandîtiya wî ji Xwedê ye (3:1; 5:12; 7:2; 10:2-3; 11:5-6; 12:11; 13:3).*

*Ev name dikare bi vî awayî bê beşkirin:*

*I. Tecrûbeyên Pawlosê Şandî 1:1-2:17*
*II. Xizmeta Pawlosê Şandî ya ku tê ceribandin 3:1-7:16*
*III. Diyariyên ruhanî 8:1-9:15*
*IV. Desthilatiya şandîtiyê 10:1-13:13*

### *Silav*

1 Ji Pawlosê* ku bi daxwaza Xwedê, Şandiyê Mesîh Îsa ye û ji birayê me Tîmotêyos*,
ji civîna* bawermendan a Xwedê ya li Korîntê û ji tevahiya pîrozên li hemû Axayayê* re:
2 Ji Bavê me Xwedê û ji Xudan* Îsa Mesîh, kerem û aştî* li ser we be.

### *Desteka Xwedê*

[3] Xwedayê ku Bavê Xudanê me Îsa Mesîh e, Bavê dilovaniyê
û Xwedayê hemû handanê* pîroz be. [4] Ew di her tengahiya me de
hanê* dide me, da ku em bikarin bi wê handana ku em bi xwe ji
aliyê Xwedê ve tên handan, hanê bidin wan ên ku di her cûreyê
tengahiyê de ne. [5] Çimkî çawa ku cefayên Mesîh li ser me zêde
dibin, wusa jî em bi saya Mesîh zêde tên handan. [6] Îcar, eger em di
tengahiyê de bin, ev ji bo handan û xilasbûna we ye. Eger em bên
handan, ev ji bo ku hûn bên handan e, da ku hûn bikarin wan eynî
cefayên ku em jî dikişînin, ragirin. [7] Hêviya me ya ji bo we qayîm
e. Çimkî em dizanin, çawa ku hûn hevparên cefayên me ne, hûn
wusa jî hevparên handana me ne.

[8] Birano, em naxwazin ku hûn ji tengahiyên ku me li herêma
Asyayê* kişandin bêhay bin. Em ketin bin barekî giran ê di ser
hêza xwe re, wusa ku me hêviya xwe ji jiyanê jî birrî. [9] Bi rastî,
fikra ku cezayê mirinê li ser me hatiye dayîn, hat dilê me. Ev çêbû,
da ku em ne li xwe, lê li Xwedayê ku miriyan radike ewle bin.
[10] Wî em ji talûkeya mirinê ya ewqas mezin rizgar kirin û wê hê jî
rizgar bike. Hêviya me ji wî heye [11] ku bi alîkariya duayên we yên
ji bo me, ewê dîsa jî me rizgar bike. Wusa ku, ji bo kerema ku bi
saya duayên gelekan ji me re hat dayîn, li ser rûyê me, ji aliyê
gelekan ve bê şikirkirin.

### *Derengmayîna Serdana Pawlos*

[12] Pesindana me ev e: Wijdana me şahidiyê dike ku em bi
sadebûnî û dilpakiya ku ji Xwedê tê, di dinyayê de û hê bêtir li ber
we rêve çûn. Ev jî ne bi şehrezayiya mirovî, lê bi kerema Xwedê
bû. [13] Çimkî em ji tiştê ku hûn dikarin bixwînin û fêm bikin pê ve,
tiştên din ji we re nanivîsin. [14] Ez hêvî dikim, wek ku we em hinekî
fêm kirine, hûnê tam fêm bikin. Wusa ku di Roja Xudanê me Îsa
de em pesindana we ne, wek ku hûn jî pesindana me ne.

[15] Bi vê ewlebûnê, ji bo ku ez we du caran şa bikim, min xist
dilê xwe ku ez pêşî bêm ba we, [16] piştre ji ba we derbasî Meke-
donyayê bibim, ji Mekedonyayê dîsa vegerim ba we û ji aliyê we
ve ber bi Cihûstanê* ve bêm bi rê kirin. [17] Gava ku min ev xist dilê

---

**1:16** Karên Şandiyan 19:21

xwe, gelo min sivikahî kir? An ya ku min xist dilê xwe, ma min li
gor fikra mirovî xwest? Ma min ji aliyekê ve «erê, erê» digot, ji
aliyê din ve jî «na, na»? [18] Lê çawa ku Xwedê dilsoz e, gotina me
ya ji we re, ne hem «erê» û hem «na» ye. [19] Çimkî Kurê* Xwedê
Îsa Mesîhê ku me di nav we de da bihîstin – yanî min û Sîlas* û
Tîmotêyos* – ne hem «erê» û hem «na» bû. Lê di şexsê wî de tenê
«erê» heye. [20] Çimkî çiqas sozên Xwedê hebin, di şexsê Mesîh de
«erê» ne. Ji ber vê yekê, em ji bo rûmeta Xwedê, bi wî «Amîn*»
dibêjin. [21] Yê ku em bi we re di yekîtiya Mesîh de qayîm kirine û
em mesh* kirine, Xwedê ye. [22] Wî em mor jî kirin û di dilê me de
destberiya Ruhê* Pîroz daye me.

[23] Xwedê şahidê min e: Ji bo ku ez we bidirixînim*, ez hê ne-
hatime Korîntê. [24] Ev, ne ji ber ku serweriya me li ser baweriya*
we heye, lê em alîkarên şahiya we ne. Çimkî hûn di baweriyê de
hîmgirtî ne.

2 Loma min ji bo xwe biryar da ku ez careke din nayêm ku we
xemgîn bikim. [2] Çimkî, eger ez we xemgîn bikim, ji yê ku ji
aliyê min ve hatiye xemgînkirin pê ve, yê ku min dilşa bike kî ye?
[3] Min ev eynî weha nivîsî, da ku gava ez bêm, ew ên ku divê min
şa bikin, min xemgîn nekin. Ez li we hemûyan ewle me ku şahiya
min şahiya we hemûyan e. [4] Ne ji bo ku hûn xemgîn bibin, lê belê
ji bo ku hûn hezkirina min a zêde ya ji bo we bizanin, min di nav
gelek tengahî û êşa dil de û bi hêstirên çavan ji we re nivîsî.

### *Bexşandina Yê Sûcdar*

[5] Eger yekî xemgînî dabe, ne daye min, lê – ji bo ku ez mezin
nekim – heta dereceyekê daye we hemûyan. [6] Ew cezayê ku pir-
raniya we daye kesê weha, têrê dike. [7] Niha divê hûn hê bêtir li wî
bibihûrin û hanê bidin wî, da ku ev kes di nav xemgîniya zêde de
nefetise [8] Loma, ez ji we lava dikim ku hûn hezkirina xwe ya ji bo
wî erê bikin. [9] Min ji bo vê yekê nivîsî: Da ku ez we biceribînim,
bizanim, ka hûn di her tiştî de bi ya min dikin an na. [10] Hûn tiştekî
li kê bibihûrin, ez jî lê dibihûrim. Eger ez li tiştekî bihûrtibim, ez ji
bo we li ber Mesîh li vê jî bihûrtime. [11] Da ku keysa Îblîs li me
neyê, çimkî em ji gêrûfenên wî ne bêhay in.

### *Şandiyên Peymana Nû*

[12] Gava ku ez ji bo Mizgîniya* Mesîh hatim Troyayê, ji aliyê
Xudan ve deriyek li ber min hat vekirin, [13] lê ji ber ku min birayê
xwe Tîtos* nedît, dilê min rihet nebû. Loma min xatir ji wan
xwest, ez çûm Mekedonyayê.
[14] Lê şikir ji wî Xwedayî re yê ku herdem me bi Mesîh di
rêveçûna serfiraziya serketinê de pêşve dibe û bi rêberiya me bîhna
xweş a zanîna xwe li her derê belav dike. [15] Çimkî em, hem di nav
yên ku xilas dibin û hem jî di nav yên ku helak dibin de, ji Xwedê
re bîhna Mesîh a xweş in. [16] Ji bo yên helakbûyî em bîhna ku ji
mirinê dibe mirinê ne, ji bo yên xilasbûyî jî em bîhna ku ji jiyanê
dibe jiyanê ne. Ma kî têra van tiştan dike? [17] Çimkî em wek
gelekan peyva* Xwedê nakin destgehê bazirganiyê. Lê belê em
wek mirovên ku ji aliyê Xwedê ve hatine şandin, di yekîtiya Mesîh
de li ber Xwedê bi dilekî paqij dipeyivin.

### *Xizmetkarên Peymana Nû*

3 Ma em dîsa dest pê dikin ku xwe tewsiye bikin? An jî wek
hinekan ma nameyên tewsiyê ji bo we, an ji aliyê we ve ji me
re lazim in? [2] Nameya me ya ku ji aliyê hemû mirovan ve tê zanîn
û tê xwendin û di dilê me de nivîsî ye, hûn in. [3] Diyar e ku hûn
nameyeke Mesîh in, ya ku bi xizmeta me hatiye amadekirin. Ew ne
bi hibrê, lê bi Ruhê Xwedayê jîndar, ne li ser nivîsdekên kevirîn, lê
li ser nivîsdekên dil ên ji goşt hatiye nivîsîn.
[4] Bi saya Mesîh ewlehiyeke me ya weha bi Xwedê heye. [5] Em
têrê nakin wek ku tiştekî ji me bi xwe ye em bifikirin; lê belê
karîna me ji Xwedê ye. [6] Wî kir ku em têrê bikin, bibin xizmet-
karên Peymana* Nû; ne xizmetkarên herfan, lê belê yên Ruh. Çim-
kî herf dikuje, lê belê Ruh vedijîne*.
[7] Û eger xizmeta ku mirin aniye, yanî Şerîeta ku bi herfan li ser
ferşan hatiye kolan bi rûmet hatibe – wusa ku zarokên* Îsraêl, ji
ber biriqîna rûyê Mûsa* ya ku dibihûrî, nikaribûn bi baldarî li rûyê
wî binêrîna – [8] hingê xizmeta Ruh çawa hê bêtir bi rûmet nabe?

---

2:13 Karên Şandiyan 20:1
3:3 Derketin 24:12; Yêremya 31:33; Hezekiyêl 11:19; 36:26
3:7 Derketin 34:29

[9] Çimkî eger rûmeta xizmeta ku mirov sûcdar derdixe hebe, rûmeta
xizmeta ku rastdariyê tîne qat bi qat zêdetir e. [10] Çimkî tiştê ku
berê bi rûmet bû, rûmeta xwe li ber tiştê ku hê bêtir bi rûmet e,
winda kiriye. [11] Çimkî eger tiştê ku dema wî dibihûre, bi rûmet
bûbe, tiştê ku mayîndar e, wê hê bêtir bi rûmet be.
[12] Madem ku em xwediyê hêviyeke weha ne, em bi cesareteke
mezin dipeyivin. [13] Em wek Mûsa nakin; ji bo ku zarokên Îsraêl lê
nenêrin û dawiya biriqîna tiştê ku derbas dibe û diçe nebînin, wî
rûyê xwe bi xêliyê nixamt. [14] Lê hişê wan kor bû. Heta îro jî gava
ku Peymana Kevin tê xwendin, ew eynî xêlî li ser fêmdariya wan
e. Çimkî ew, tenê bi destê Mesîh tê hilanîn. [15] Erê, heta îro jî gava
ku Mûsa tê xwendin, xêlî li ser dilê wan dimîne. [16] Lê kengê mirov
li Xudan bizivire, ev xêlî tê rakirin. [17] Xudan Ruh e û Ruhê Xudan
li ku derê be, li wê derê azadî heye. [18] Û em hemû bi rûyê bêxêlî
rûmeta Xudan dibînin, em ji rûmetê ber bi rûmetê ve li eynî sûretî
tên guhertin. Ev jî bi saya Xudanê ku Ruh e, çêdibe.

### *Em Cesareta Xwe Winda Nekin*

4 Ji bo vê yekê, li gor ku Xwedê rehma xwe li me kiriye û ev
xizmeta me heye, em nawestin. [2] Me tiştên veşartî yên bi şerm
red kirin. Em bi qurnaziyê rêve naçin û em peyva Xwedê naguhe-
rin. Lê belê, em rastiyê diyar dikin û li ber Xwedê xwe ji wijdana
her mirovî re tewsiye dikin. [3] Lê eger Mizgîniya ku em didin, ni-
xamtî be jî, ji bo yên ku helak dibin nixamtî ye. [4] Çimkî xwedayê*
vê dinyayê hişê bêbaweran kor kiriye, da ku ronahiya Mizgîniya
rûmeta Mesîhê ku sûretê Xwedê ye, li ser wan dernekeve. [5] Ji ber
ku em ne xwe bi xwe, lê belê em Îsa Mesîh bi Xudantî û xwe jî ji
bo Îsa xulamên we didin bihîstin. [6] Çimkî, Xwedayê ku got: «Bila
ji tariyê ronahî bibiriqe», di dilê me de jî biriqî, da ku ronahiya
zanîna rûmeta Xwedê ya li ser rûyê Îsa Mesîh, bide me.
[7] Em di firaxên herrî de xwediyê vê xezînê ne; da ku bê zanîn,
mezinahiya zêde ya hêzê ne ji me ye, lê ji Xwedê ye. [8] Em bi her
awayî di tengahiyê de ne, lê em ne perçiqî ne; em heyirî dimînin,
lê em ne bêhêvî ne. [9] Tengahiyê didin me, lê dev ji me nehatiye
berdan; em li erdê hatine xistin, lê em ne helakbûyî ne. [10] Ji bo ku

---

**3:13** Derketin 34:33 **3:16** Derketin 34:34 **4:6** Destpêkirin 1:3

jiyana Îsa jî di bedena me de bê dîtin, em mirina Îsa herdem di
bedena xwe de hildigirin. 11 Çimkî, ji bo ku jiyana Îsa di bedena
me ya mirindar de bê dîtin, em ên ku dijîn di ber Îsa de herdem
teslîmî mirinê tên kirin. 12 Wusa ku mirin di hundirê me de, lê ji-
yan di hundirê we de dixebite. 13 Wek ku hatiye nivîsîn: «Min
bawer* kir, loma ez peyivîm»[a], em ên ku xwediyê eynî ruhê
baweriyê ne, em jî bawer dikin û loma em dipeyivin. 14 Çimkî em
dizanin: «Xwedayê ku Xudan Îsa rakir, wê me jî bi Îsa re rake û bi
we re derîne ber xwe.» 15 Erê ev hemû ji bo we ne. Da ku kerem hê
di nav gelekan de zêde bibe û ji bo rûmeta Xwedê şikirdariyê
zêdetir bike.

16 Ji ber vê yekê em nawestin, lê her çiqas mirovê me yê derve
birize jî, mirovê me yê hundir roj bi roj nûvejen dibe. 17 Çimkî ten-
gahiyên me yên sivik û ji bo demekê ji me re rûmeteke giran û
herheyî ya gelek û hê gelektir pêk tînin. 18 Îcar em ne li tiştên ku
tên dîtin, lê belê li yên ku nayên dîtin dinêrin. Çimkî yên ku tên
dîtin ji bo demekê ne, lê belê yên ku nayên dîtin herheyî ne.

5 Em dizanin, eger mala me, yanî konê me yê dinyayî hilweşe, li
ezmanan ji Xwedê avahiyeke me, maleke me ya herheyî ya ku
bi dest nehatiye çêkirin, heye. 2 Çimkî bi rastî di vî konî de em
axînan dikişînin û bêriya lixwekirina mala xwe ya ji ezmên dikin.
3 Wusa ku çaxê em li xwe bikin, em tazî namînin. 4 Çimkî em ên
ku di vî konî de ne, em di bin barekî giran de axînan dikişînin. Em
naxwazin vî ji xwe bikin, lê belê em dixwazin di ser re li xwe
bikin, da ku tiştê mirindar ji aliyê jiyanê ve bê daqurtandin. 5 Yê ku
em tam ji bo vê yekê amade kirine û Ruh bi destberîtî daye me,
Xwedê ye.

6 Loma em hergav ewle ne û em dizanin heta ku em di bedenê
de ne, em ji Xudan dûr in. 7 Çimkî em ne bi dîtinê, lê bi baweriyê
rêve diçin. 8 Erê, ewlehiya me heye û em hê bêtir dixwazin ku ji
bedenê dûr û li ba Xudan bin. 9 Ji bo vê yekê dixwazî bila em di
bedenê de bijîn, dixwazî jî bila em ji bedenê dûr bin, armanca me
ev e ku em li Xudan xweş bên. 10 Çimkî divê em hemû li ber

---

[a] 4:13 Ji: Zebûr 116:10

kursiyê Mesîh ê dîwanê* xuya bibin, da ku her kes li gor tiştên ku
hê ew di bedenê de bû, kirine – qenc bin an jî xerab bin – bistîne.

### *Kardestiya Lihevdûanînê*

11 Îcar, ji ber ku em dizanin tirsa Xudan çi ye, em dixwazin
baweriya mirovan bînin. Em ji Xwedê ve eşkere ne û hêviya min
heye ku em ji wijdana we ve jî eşkere ne. 12 Em ji nû ve xwe ji we
re tewsiye nakin, lê em fersendê didin we ku hûn bi me pesnê xwe
bidin, da ku bersîveke we ji bo yên ku ne ji bo tiştên di dil de, lê ji
bo nîşandana xwe pesnê xwe didin, hebe. 13 Eger em ji ser hişê
xwe çûbin, ev ji bo Xwedê ye; eger aqilê me li serê me be, ev ji bo
we ye. 14 Hezkirina Mesîh me didehfîne, çimkî bîr û baweriya me
ev e ku yek ji bo hemûyan mir. Nexwe hemû mirin. 15 Ew ji bo
hemûyan mir, da ku yên dijîn êdî ne ji bo xwe, lê belê ji bo wî yê
ku ji bo wan mir û hat rakirin, bijîn.
16 Êdî em ji niha û pê ve li gor fikra mirovan tu kesî nas nakin.
Eger me Mesîh li gor fikra mirovan nas kiribe jî, êdî em niha wusa
nas nakin. 17 Nexwe eger yek di yekîtiya Mesîh de be, ew afirînekî
nû ye; tiştên kevin derbas bûn û çûn, va ye, yên nû çêbûn. 18 Evên
ha hemû ji Xwedê ne. Wî bi destê Mesîh em bi xwe re lihev anîn û
xizmeta lihevanînê da me. 19 Yanî Xwedê di şexsê Mesîh de dinya
bi xwe re li hev anî, neheqiyên wan li ser wan hesab nekir û peyva
lihevanînê spart me. 20 Îcar wek ku Xwedê bi devê me hêvî dike,
em ji bo Mesîh qasidiyê dikin. Em ji bo Mesîh lava dikin: «Bi
Xwedê re li hev werin.» 21 Xwedê ewê ku guneh nedizanî ji bo me
kir guneh, da ku em di şexsê wî de bibin rastdariya Xwedê.

6 Em ên ku hevparên Xwedê yên xebatê ne, em ji we lava dikin
ku hûn kerema wî badîhewa qebûl nekin. 2 Çimkî Xwedê di-
bêje:

«Min di dema minasib de tu bihîstî,
Û di roja xilasiyê de min alîkariya te kir.»[a]

Va ye, dema meqbûl niha ye; va ye, roja xilasiyê niha ye. 3 Em di
tu tiştî de ji tu kesî re nebûn sedemê terpilînê*, da ku lome ji

---

[a] **6:2** Ji: Îşaya 49:8
**5:10** Romayî 14:10

xizmeta me neyê kirin. [4] Lê belê bi xizmetkarîtiya Xwedê em di
her tiştî de xwe pêşkêşî qîmanîna we dikin. Di ragirtina* giran de,
di tengahî, zehmetî û belayan de, [5] di lêdan, zîndan, hengame, ked,
bêxewî û di birçîbûnê de, [6] di dilpakî, zanîn, bîhnfirehî, qencî, Ru-
hê Pîroz û hezkirina bêdurûtî de, [7] di peyivîna rastiyê de, di hêza
Xwedê de; di destê rastê û çepê de şûr û mertalê rastdariyê; [8] di
serbilindî û şermezariyê de, di navdariya xerab û di ya qenc de; em
wek xapînokan tên hesibandin, lê em rast in. [9] Wek ên ku nayên
naskirin, lê yên bi nav û deng; wek ên ku dimirin, lê va ye, em di-
jîn; wek ên cezakirî, lê nehatine kuştin. [10] Em xemgîn in, lê em
hergav şa ne. Em belengaz in, lê em gelekan dewlemend dikin.
Wek ên ku tu tiştê wan tune, lê em xwediyê her tiştî ne.

[11] Gelî Korîntiyan! Em eşkere bi we re peyivîn, dilê me ji we
re fireh e. [12] Dilê me ji bo we teng nebûye, lê dilê we bi xwe teng
bûye. [13] Wek ku ez ji zarokên xwe re dibêjim, ez dipeyivim; hûn jî
weha dilê xwe ji me re fireh bikin.

### *Perestgeha Xwedayê Jîndar*

[14] Bi yên bêbawer re nekevin bin eynî nîrî. Ma çi hevkariya
rastiyê bi neheqiyê re heye? An çi danûstandina tariyê bi ronahiyê
re heye? [15] Ma di navbera Mesîh û Beliyal* de çi hevparî heye? An
çi para yê bawermend bi yê ku baweriyê nayne re heye? [16] Ma di
navbera Perestgeha* Xwedê û pûtan de çi lihevkirin heye? Çimkî
em Perestgeha Xwedayê jîndar in. Çawa ku Xwedê gotiye:

«Ezê di nav wan de rûnim,
Û di nav wan de rêve herim;
Ezê bibim Xwedayê wan
Û ew jî wê bibin gelê min.»[a]
[17] Xudan dibêje:
«Loma ji nav wan derkevin û veqetin,
Dest nedin tiştê murdar*.
Hingê ezê we qebûl bikim.»[b]

---

[a] 6:16 Ji: Qanûna Kahîntiyê 26:12; Yêremya 32:38; Hezekiyêl 37:27
[b] 6:17 Ji: Îşaya 52:11; Hezekiyêl 20:34, 41
6:5 Karên Şandiyan 16:22-23; 17:1-10
6:15 Beliyal: Navekî Îblîs e; mana vî navî bi Îbranî «xerabî» an jî «pûçîtî» ye.

18 Xudanê karîndarê* her tiştî dibêje:
«Ezê ji we re bibim Bav*,
Û hûnê ji min re bibin kur û keç.»[a]

7 Îcar hezkirîno, madem ku em xwediyê van sozan in, em xwe ji
her cûreyê murdariya ruh û bedenê paqij bikin û bi tirsa Xwe-
dê pîroziyê temam bikin.

### *Şahiya Pawlos*

2 Di dilê xwe de cih bidin me. Me neheqî li tu kesî nekir, me tu
kes ji rê derneanî, me heqê tu kesî nexwar. 3 Ez vê ne ji bo ku we
sûcdar derxim dibêjim. Çimkî, wek ku min berî niha got, hûn di
dilê me de ne, ku em bi hev re bimirin û bi hev re bijîn. 4 Ez ji we
gelek piştrast im, ez bi we gelek serbilind im, dilê min bi hanê* tije
ye. Di nav hemû tengahiyên me de şahiya min difûre.
5 Ji ber ku gava em hatin Mekedonyayê jî, bedena me qet rihetî
nedît, lê em bi her awayî di tengahiyê de bûn. Li derve pevçûn, di
dilê me de tirs hebû. 6 Lê belê Xwedayê ku li hana şkestiyan tê, bi
hatina Tîtos* li hana me hat. 7 Ne tenê bi hatina wî, lê bi wê hana
ku wî ji we standibû jî em hatin handan. Gava ku Tîtos bêrîkirin,
xemgînî û xîretkêşiya we ya ji bo min ji me re got, ez hê bêtir dilşa
bûm. 8 Çimkî eger min bi nameya xwe hûn xemgîn kiribin jî, ez ne
poşman im. Eger ez poşman bûbim jî – çimkî ez dibînim, ji bo
demekê be jî, wê nameyê hûn xemgîn kirine – 9 niha ez şa me. Ne
ji ber ku hûn xemgîn bûn, lê ji ber ku hûn ji bo tobekirinê xemgîn
bûn, ez dilşa me. Hûn li gor Xwedê xemgîn bûn, wusa ku we di tu
tiştî de ziyan ji me nedît. 10 Çimkî xemgîniya li gor Xwedê, tobeya
ku dibe xilasbûnê pêk tîne û poşmanî tê de tune. Lê heçî xemgî-
niya dinyayê ye, ew mirinê pêk tîne. 11 Binêrin eynî vê xemgîn-
bûna li gor Xwedê bi we re çi sergiranî, çi daxwaza li we neyê
girtin, çi hêrs, çi hişyarbûn, çi bêrîkirin, çi xîret û çi cezakirina
neheqiyê pêk anî. Di vê yekê de we bi her awayî pakbûniya xwe
nîşan da. 12 Min ew name ji we re ne ji bo yê ku neheqî kir, ne jî ji
bo yê ku neheqî lê hat kirin, lê belê ji bo ku xîretkêşiya we ya ji bo

---

[a] **6:18** Ji: 2 Samûêl 7:8, 14

me li ber Xwedê ji we re eşkere bibe, nivîsî. 13 Em bi vê yekê hatin
handan.
Di ser hana ku me stand re, em bi şabûna Tîtos bêtir dilşa bûn.
Çimkî we hemûyan ruhê wî rihet kir. 14 Min pesnê we ji wî re da û
we ez şermezar nekirim. Çawa her tiştê ku me ji we re got, rast bû,
pesindana me ya ji Tîtos re jî rast derket. 15 Û gava ku guhdana we
hemûyan tê bîra wî, ku çawa we ew bi tirs û lerizîn qebûl kir, hez-
kirina wî ya ji bo we hê zêdetir dibe. 16 Ez şa me, ji ber ku ez di her
tiştî de ji we piştrast im.

### *Comerdî*

8 Îcar birano, em kerema Xwedê ya ku di civînên* li Mekedon-
yayê de hatiye dayîn, bi we didin zanîn. 2 Di nav ceribandina
tengahiya mezin de, şahiya wan a germ û belengaziya wan a kûr,
bi dewlemendiya comerdiya wan fûriya. 3 Ez şahidiyê dikim ku
wan li gor karîna xwe, heta ji karîna xwe zêdetir jî bi daxwaza xwe
dan. 4 Ji me gelek lava kirin ku em vê qenciyê bi wan bikin ku em
beşdarbûna wan a ji bo xizmeta pîrozan qebûl bikin. 5 Bi qasî ku
me hêvî dikir hê bêtir, wan pêşî xwe da Xudan û bi daxwaza Xwe-
dê, xwe dan me. 6 Wusa ku, me hêvî ji Tîtos* kir ku vê kerema ku
pêşî bi we dest pê kiriye, bibe serî. 7 Wek ku hûn di baweriyê de,
di peyvê de, di şehrezayî û her cûreyê xîretkêşiyê de, di hezkirina
xwe ya ji bo me û di her tiştî de zêde bûne, bixebitin ku hûn di vê
keremê de jî zêde bibin.
8 Ez vê wek emir nabêjim, lê belê ez bi xîretkêşiya yên din
xwerûtiya hezkirina we diceribînim. 9 Çimkî hûn kerema Xudanê
me Îsa Mesîh dizanin. Bi ser ku ew dewlemend bû jî, ew bû be-
lengaz, da ku hûn bi belengaziya wî dewlemend bibin. 10 Di vê ye-
kê de ez fikra xwe dibêjim. Çimkî ya ku ji bo we bi feyde ye, ev e:
Ji sala par ve, hûn ne tenê di kirinê de, lê belê di xwestinê de jî yên
pêşî bûn. 11 Niha vî karî pêk bînin, wusa ku, çawa hûn di dil-
xwaziyê de ji dil in, wusa jî çiqas ji destê we tê, temam bikin.
12 Çimkî eger dilxwazî hebe, dayîna yekî ne li gor tiştê ku di destê
wî de tune, lê li gor tiştê ku di destê wî de heye, meqbûl e.
13 Armanca me ne ew e ku hinekên din bikevin firehiyê û hûn

---

8:1 Romayî 15:26

bikevin tengahiyê, lê dabaş wekhevî ye. [14] Di dema niha de zêde-
hiya di destê we de bila ji bo kêmahiya wan be, da ku demeke din
zêdehiya di destê wan de ji bo kêmahiya we be, wusa ku wekhevî
çêbe. [15] Çawa ku hatiye nivîsîn:

«Zêdehiya yê ku pirr civand çênebû
Û kêmahiya yê ku hindik civand jî çênebû.»[a]

### *Tîtos û Du Bira Nameyê Tînin*

[16] Îcar şikir ji Xwedê re yê ku ji bo we eynî xîret xist dilê
Tîtos. [17] Çimkî Tîtos hêvîkirina me qebûl kir, lê hê bêtir bi xîret-
kêşî û bi daxwaza xwe derdikeve ba we. [18] Bi wî re em wî birayê
ku di dayîna Mizgîniyê de, di hemû civînan de pesnê wî tê dayîn,
dişînin. [19] Bi ser de ev bira, ji aliyê civînan ve hat hilbijartin, da ku
di xizmeta vê keremê de ji bo ku rûmeta Xudan û dilxwaziya me
nîşan bide, bi me re bigere. [20] Em hay ji xwe hebin ku di xizmeta
me de, ya ku ji bo vê diyariya mezin e, tu kes tu lomeyan ji me
neke. [21] Çimkî ne tenê li ber Xudan, lê li ber mirovan jî haya me ji
kirina tiştên qenc heye. [22] Em bi van herduyan re birayê xwe di-
şînin. Me gelek caran ew ceribandiye û em dizanin ku di gelek
tiştan de xîretkêş e. Û niha, ji ber ku li we gelek ewle ye, ew hê
zêdetir xîretkêş e. [23] Heçî Tîtos e, ew hevparê min û ji bo we
hevalkarê min e; heçî birayên me yên din in jî, şandiyên civînên
bawermendan in, rûmeta Mesîh in. [24] De îcar hezkirina xwe û se-
demê pesindana me ya ji bo we, li ber civînan nîşanî wan bidin.

### *Alîkariya Bawermendên Belengaz*

9 Ne hewce ye ku ez li ser vê xizmeta ku ji pîrozan re tê kirin, ji
we re binivîsim. [2] Çimkî ez dilxwaziya we dizanim. Ez bi vê li
ber Mekedoniyan pesnê xwe didim û dibêjim ku: «Herêma Axa-
yayê* ji par ve amade ye.» Xîreta we, gelek ji wan xistin xep-
tûleptê. [3] Û ez birayan dişînim ba we, da ku xwepesindana me ya li
ser we di vê yekê de pûç dernekeve, lê hûn wek ku min gotiye,
amade bin. [4] Nebe ku, hin ji Mekedoniyan bi min re bên û we
amadenebûyî bibînin. Îcar ya me tune, hûnê di vê ewlehiyê de

[a] **8:15** Ji: Derketin 16:18

şermî bibin. [5] Loma min pêwist dît ku ez ji birayan hêvî bikim ku
ew pêşî bên ba we û diyariya we ya ji pêşî ve sozdayî, hingê
berdest be. Wusa ku diyariya we, ne ji mecbûrî, lê wek diyariya
dilxwaziyê amade be.

[6] Lê vê bizanin: Yê ku hindik diçîne hindik didirû, yê ku pirr
diçîne pirr didirû. [7] Ne bi bêdilî an ji mecbûrî, lê bila her kes wek
ku xistiye dilê xwe bide. Çimkî Xwedê ji yê ku bi rûgeşî dide, hez
dike. [8] Û Xwedê dikare ku her keremê bi zêdehî bide we, wusa ku
hergav di her tiştî de têra we hebe û ji bo her karê qenc hê zêdetir
hebe. [9] Wek ku hatiye nivîsîn:

«Belav kir û da hejaran,
Rastdariya wî her û her dimîne.»[a]

[10] Yê ku ji cotkar re tov û ji bo xwarinê nên peyda dike, wê tovê ku
hûn jî diçînin peyda bike û zêde bike û wê berê rastdariya we
mezin bike. [11] Hûnê di her tiştî de, ji bo her comerdiya ku bi devê
me ji Xwedê re şikirdariyê tîne, dewlemend bibin. [12] Çimkî ev xiz-
meta ku hûn dikin ne tenê kêmahiyên pîrozan temam dike, lê belê
bi gelek şikirkirinê ji Xwedê re zêde dibe. [13] Gelek mirov ji ber
xizmeta we ya kifşbûyî, ji bo guhdana we ya Mizgîniya Mesîh û
eşkerekirina wê û ji bo camêriya we ya levakirina* bi wan û yên
din re, pesnê Xwedê didin. [14] Ji ber wê kerema Xwedê ya ku bi
zêdehî li ser we ye, ew ji bo we dua dikin û bêriya we dikin. [15] Ji
bo diyariya wî ya ku bi ziman nayê salixdan şikir ji Xwedê re.

### *Parastina Pawlos*

10 Ez Pawlos bi xwe, yê ku çaxê di nav we de ye bê zirav, lê
çaxê ku ji we dûr e li hember we bi zirav tê dîtin, ez bi ner-
mî û keremdariya Mesîh hêvî ji we dikim. [2] Ez lava dikim: Gava
ku ez bêm, nebe ku ez mecbûr bimînim bi piştrastî biwêrim li hem-
ber hinekên ku difikirin, em li gor nefsê rêve diçin, rabim. [3] Erê,
em di bedenê de dijîn, lê em li gor hêza bedenê şer nakin. [4] Çimkî
çekên şerê me ne dinyayî ne, lê belê ji bo hilweşandina kelehan ew
hêza xwedayî* ne. Em raman [5] û her tiştê bilind ê ku li hember
zanîna Xwedê radibe, hildiweşînin û her fikrê dikin hêsîr* ku serî

---

[a] 9:9 Ji: Zebûr 112:9
9:10 Îşaya 55:10

li ber Mesîh deyne. [6] Îcar gava ku guhdana we temam bibe, em
amade ne ku her neguhdariyê ceza bikin.
[7] Li tiştê li ber çavê xwe binêrin. Eger yek li xwe ewle ye ku
ew yê Mesîh e, bila ew di dilê xwe de li ser vê yekê jî bifikire, ku
ew bi xwe çawa yê Mesîh e, em jî wusa ne. [8] Çimkî eger ez piçekê
zêde bi wê desthilatiya ku Xudan daye me pesnê xwe bidim jî, ez
şermî nabim. Wî ew ne ji bo hilweşandina we, lê ji bo avakirina
we daye me. [9] Ez naxwazim wek yekî ku we bi nameyên xwe ditir-
sîne bêm dîtin. [10] Çimkî hin dibêjin: «Nameyên wî giran û hêzdar
in, lê dîtina şexsê wî qels û peyivîna wî ne tiştek e.» [11] Mirovekî
weha bila bizane, ku em ji dûr ve bi nameyan di peyvê de çawa
bin, em di nav we de di kirinê de jî wusa ne.
[12] Ji xwe em newêrin ku xwe bi hinekên ku xwe tewsiye dikin
re yek bigirin an jî rû bi rû bikin; lê ew ên ku xwe bi hev re dipîvin
û xwe bi hev re rû bi rû dikin, bêfêm in. [13] Heçî em in, em di ser
pîvanê re pesnê xwe nadin, lê belê li gor pîvana sînorê ku Xwedê
daye me, ya ku digihîje heta ba we, em pesnê xwe didin. [14] Çaxê
em gihîştin we, em di ser pîvana vî sînorî re derbas nebûn, çimkî
em ên pêşî bûn ku bi Mizgîniya Mesîh heta ba we jî hatin. [15] Em ji
pîvanê der, yanî bi keda hinekên din pesnê xwe nadin. Lê hêviya
me ew e ku, bi mezinbûna baweriya we, meydana me ya xebatê di
nav we de hê firehtir bibe, [16] da ku em Mizgîniyê ji we hê wêvetir
bidin. Wusa ku em pesnê xwe bi karê ku ji xwe di sînorê hinekên
din de hatiye kirin, nedin. [17] «Yê ku pesnê xwe dide, bila bi Xudan
pesnê xwe bide.»[a] [18] Çimkî ne yê ku xwe tewsiye dike, lê belê yê
ku Xudan wî tewsiye dike, tê erêkirin.

### *Pawlos û Şandiyên Qelp*

11 Xwezî we di bêaqiliyê de piçekê ez ragirtama! Lê belê ji
xwe hûn min radigirin. [2] Ez bi hesûdiya Xwedê ji bo we
hesûd im, çimkî min hûn ji mêrekî tenê re, ji Mesîh re nîşan kirin,
da ku ez we wek keçikeke pak pêşkêşî wî bikim. [3] Lê ka çawa mar
bi qurnaziya xwe Hawa xapand, ez ditirsim ku fikrên we jî bên xi-
randin û ji sadebûn û dilpakiya ku ji bo Mesîh e veqetin. [4] Eger yek

---

[a] **10:17** Ji: Yêremya 9:24
**11:3** Destpêkirin 3:1-6, 13

bê û Îsayekî din ê ku me nedaye bihîstin bide bihîstin, an eger hûn
ruhekî din ê ku we nestandiye, an Mizgîniyeke din a ku we qebûl
nekiriye bistînin, hûn qenc vê radigirin. [5] Lê ez dibêjim qey di tu
tiştî de ez ji wan şandiyên payebilind ne kêmtir im. [6] Eger ez di
peyvê de xeşîm bim jî, di zanînê de ez ne xeşîm im. Me ev bi her
awayî, di her tiştî de ji we re eşkere kir.
[7] Ji bo ku hûn bilind bibin, ma min guneh kir ku min xwe
nizim kir? Çimkî min Mizgîniya Xwedê belaş da we. [8] Min civînên
din şêlandin û ji wan pere standin, da ku ez ji we re xizmetê bikim.
[9] Û çaxê ku ez di nav we de bûm û hewcedariya min hebû, ez ji tu
kesî ji we re nebûm bar. Çimkî, gava ku bira ji Mekedonyayê ha-
tin, tu kêmahiyên min nehiştin. Min di her tiştî de hay ji xwe hebû
ku ez ji we re nebim bar û ezê hay ji xwe hebim jî. [10] Rastiya Me-
sîh bi min re ye, wusa ku li herêma Axayayê* tu kes nikare devê
min ji vê pesindanê bigire. [11] Çima? Ma ji ber ku ez ji we hez
nakim? Xwedê dizane ku ez ji we hez dikim.
[12] Û tiştê ku ez dikim, ezê hê jî bikim, da ku ez fersendê nedim
wan ên ku li fersendê digerin. Ew dixwazin di tiştê ku pesnê xwe
pê didin de eynî wek me bên dîtin. [13] Çimkî mirovên weha şan-
diyên qelp, karkerên hîlekar in; xwe dixin sûretê Şandiyên* Mesîh.
[14] Ev ne tiştek e ku mirov lê şaş bimîne. Îblîs* bi xwe jî xwe dixe
sûretê milyaketê ronahiyê. [15] Loma eger xizmetkarên wî jî xwe bi-
xin sûretê xizmetkarên rastdariyê, ev ne tiştek mezin e; dawiya
wan wê li gor kirinên wan be.
[16] Ez careke din dibêjim: Bila tu kes min bêaqil guman neke.
Lê eger hûn guman bikin, min di bêaqiltiyê de jî qebûl bikin ku ez
jî piçekê pesnê xwe bidim. [17] Ev tiştê ku ez dibêjim, ez ne li gor
Xudan, lê wek di bêaqiltiyê de, bi piştrastiya ku ji pesindanê tê, ez
dibêjim. [18] Madem ku gelek li gor fikrên mirovî pesnê xwe didin,
ez jî, ezê pesnê xwe bidim. [19] Ji ber ku hûn bi aqil in, hûn bi dil-
xweşî bêaqilan radigirin. [20] Çimkî eger yek we bike xulam, eger yek
ji we bixwe, eger yek feydê ji we bibîne, eger yek li we quretiyê
bike, eger yek li rûyê we bixe, hûn van tiştan radigirin. [21] Ez bi şer-
mî dibêjim: «Hêza me tunebû ku em weha bikin.» Lê eger yek di

---

**11:9** Filîpî 4:15-18

tiştekî de biwêre ku pesnê xwe bide – ez bi bêaqilî dipeyivim – ez
jî diwêrim ku pesnê xwe bidim. 22 Ma ew Îbranî* ne? Ez jî. Ma
Îsraêlî ne? Ez jî. Ma ji dûndana* Birahîm* in? Ez jî. 23 Ma ew
xizmetkarên Mesîh in? Ez wek yekî ku aqilê wî tune bipeyivim –
ez hê zêdetir im. Min zêdetir ked daye, ez zêdetir ketime zîndanê,
min bêtir lêdan xwar, ez pirr caran gihîştime ber mirinê. 24 Ji Ci-
hûyan, pênc caran çil kêm yek dar li min hatin xistin. 25 Sê caran bi
daran li min hat xistin; carekê ez hatim kevirkirin; sê caran di der-
yayê de qeza hat serê min; şev û rojekê ez di deryaya kûr de mam.
26 Min gelek caran rêwîtî kir; ez di talûkeyên çeman re derbas bûm,
di talûkeyên rêbiran de, di talûkeyên ji aliyê gelê xwe ve, di talû-
keyên ji aliyê miletan ve, di talûkeyên di nav bajêr de, di talûkeyên
di çolê de, di talûkeyên di deryayê de û ez di talûkeyên nav birayên
qelp de derbas bûm. 27 Min ked û zehmet kişand; gelek caran ez di
bêxewiyê de, di birçîbûn û tîbûnê de bûm; gelek caran bê xwarin, di
nav serma û tazîbûnê de mam. 28 Ji bilî tiştên ji derve, ya ku her roj
min diperçiqîne, xemxwarina hemû civînan e. 29 Ma kî bêhêz dibe û
ez bêhêz nabim? Ma kî tê terpilandin* û ez naşewitim?
30 Eger xwepesindan pêwist be, ezê bi tiştên ku bêhêziya min
nîşan didin pesnê xwe bidim. 31 Bav, Xwedayê Xudan Îsa, yê ku
her û her pîroz e, dizane ku ez derewan nakim. 32 Li Şamê, waliyê
Arêtas padîşah ji bo ku min bigire, hawirdora tevahiya bajarê
Şamê girtibû. 33 Ez di pencereke ku di sûrê de bû, di selikê de
hatim daxistin û ji destê wî reviyam.

### *Dîtinî û Peyxamên Pawlos*

12 Eger bêfeyde be jî, pesindan lazim e. Niha ezê bêm ser
dîtinî* û peyxamên* Xudan. 2 Ez bawermendekî Mesîh yê
ku berî çardeh salan heta bi ezmanê sisiyan hat hildan nas dikim.
Ez nizanim ka di bedenê de bû, ka li derveyî bedenê bû; ez ni-
zanim, Xwedê dizane. 3 Ez dizanim ku ev mirov heta bi bihiştê*
hat hildan. Îcar di bedenê de, an li derveyî bedenê bû, ez nizanim;
Xwedê dizane. 4 Wî li wir tiştên ku nayên îfadekirin, tiştên ku des-
tûra mirov tune ku wan bêje, bihîstin. 5 Ezê bi yekî weha pesnê

---

**11:24** Dubarekirina Şerîetê 25:3
**11:25** Karên Şandiyan 16:22; 14:19
**11:26** Karên Şandiyan 9:23-25; 14:5
**11:32** Karên Şandiyan 9:23-25

xwe bidim; lê ji bêhêziyên xwe pê ve, ez li ser xwe pesnê xwe
nadim. [6] Lê eger ez bixwazim pesnê xwe bidim jî, ez nabim yekî
bêaqil. Çimkî ezê rastiyê bêjim. Lê ez dipilikim ku kesek ji tiştê ku
li ba min dîtiye an ji min bihîstiye zêdetir li ser min bifikire. [7] Ji bo
ku ez bi peyxamên pirr mezin qure nebim, di bedenê de ji min re
stiriyek yanî milyaketekî Îblîs* hat dayîn, ku min bide ber kulman,
da ku ez qure nebim. [8] Min sê caran ji bo vê ji Xudan hêvî kir, da
ku ji min dûr bixe. [9] Lê wî ji min re got: «Kerema min têra te dike.
Çimkî hêza min di bêhêziyê de temam dibe.» Ji bo vê yekê ezê bi
dilxweşî hê zêdetir bi bêhêziya xwe pesnê xwe bidim, da ku hêza
Mesîh li ser min be. [10] Ji ber vê yekê ez di ber Mesîh de bi bêhêzî,
lome, dijwarî, cefa û tengahiyan kêfxweş im; çimkî kengê ez bê-
hêz bim, hingê ez hêzdar im.

[11] Min bêaqilî kir, we ez mecbûr kirim. Diviya ku ji aliyê we
ve ez bihatama tewsiyekirin. Ji ber ku her çiqas ez ne tiştek bim jî,
bi tu awayî tu kêmahiya min ji van şandiyên payebilind tune. [12] Nî-
şanên şandiyekî, yanî nîşan, karên mezin û keramet, di nav we de
bi hemû bîhnfirehiyê hatin pêkanîn. [13] Ji vê yeka ku ez ji we re
nebûm bar pê ve, ma di çi tiştî de hûn ji civînên din kêmtir man?
Vê neheqiyê li min bibihûrin!

### *Xema ku Pawlos ji bo Korîntiyan Dixwe*

[14] Va ye, ev cara sisiyan e ez amade me ku bêm ba we û ez ji
we re nabim bar. Çimkî ez ne li ya ku bi we re ye, lê belê li we
digerim. Çimkî divê ne zarok ji dê û bavê xwe re, lê belê dê û bav
ji zarokan re mal bidin hev. [15] Ezê ji bo we gelek bi dilxweşî tiştên
xwe bimezêxim û bêm mezaxtin jî. Eger ez zêde ji we hez bikim,
ma ezê kêmtir bêm hezkirin? [16] Bila be, em bêjin ez ji we re nebûm
bar; lê li gor hin ji we min di qurnaziya xwe de hûn bi hîlekarî bi
dest xistine! [17] Ma gelo min bi destê hin ji wan ên ku min şandine
ba we, heqê we xwariye? [18] Min ji Tîtos* hêvî kir ku ew bê ba we
û min birayê din jî pê re şand. Ma Tîtos feydeyek ji we standiye?
Ma em ne di eynî ruhî de, di eynî şopê de rêve çûn?

[19] Ma ev demeke dirêj e ku hûn difikirin, em xwe li ber we di-
parêzin? Em bi saya Mesîh li ber Xwedê dipeyivin, îcar hezkirîno,
her tişt ji bo avabûna we ye. [20] Çimkî ez ditirsim çaxê ku ez bêm,
ez we ne wek ku ez dixwazim bibînim û hûn jî min ne wek ku hûn

dixwazin bibînin, lê ez ditirsim ku pevçûn, çavnebarî, hêrs, hevri-
kî, ketme*, paşgotinî, quretî û tevlihevî çêbin. [21] Ez ditirsim ku ga-
va ez dîsa bêm ba we, Xwedayê min, min li ber we bide şermê û ez
ji bo gelekên ku berê guneh kirine û ji pîsîtî, fuhûşî û şehweta xwe
tobe nekirine, şînê bigirim.

### *Hişyarkirinên Dawî û Silav*

13 Ev cara sisiyan e ku ez têm ba we. «Divê her peyv bi devê
dido an sê şahidan rast derkeve.»[a] [2] Ji wan ên ku berî niha
guneh kirine û ji hemûyên din re ez niha ji dûr ve tiştê ku min di
serdana diduyan de gotibû, careke din dibêjim: Gava ez dîsa bêm,
êdî ez tu kesî nadirixînim*. [3] Madem ku hûn li delîlan digerin, ka
gelo Mesîh bi devê min dipeyive... Mesîh li hember we ne bêhêz
e, lê belê di nav we de hêzdar e. [4] Rast e, ew bi bêhêzî hat xaçkirin,
lê belê ew bi hêza Xwedê dijî. Em jî di yekîtiya wî de bê hêz in, lê
belê bi hêza Xwedê, emê bi wî re ji bo we bijîn.
[5] Xwe bi xwe biceribînin û sihêtiya xwe bikin, ka gelo hûn di
baweriyê de ne. Ma hûn nizanin ku Îsa Mesîh di dilê we de ye? An
nexwe, hûn ji ceribandinê serfiraz dernakevin. [6] Ez hêvîdar im hû-
nê fêm bikin ku em ne yên binketî ne. [7] Îcar em li ber Xwedê dua
dikin ku hûn tiştekî xerab nekin. Ev jî ne ew e ku em di ceri-
bandinê de serketî bên dîtin, lê em wek ên serneketî bin jî, armanc
ew e ku hûn ya qenc bikin. [8] Çimkî ne li hember rastiyê, lê belê ji
bo rastiyê em dikarin tiştekî bikin. [9] Kengê em bê hêz û hûn hêzdar
bin, em şa dibin. Û dua me ev e ku hûn tam bigihîjin. [10] Loma ez hê
nehatî van tiştan dinivîsim, da ku gava ez bêm, ez wê desthilatiya ku
Xudan daye min, bi hişkî bi kar neynim. Çimkî ev desthilatî ne ji bo
xerakirinê, lê ji bo avakirinê ji min re hatiye dayîn.

### *Silavên Aştiyê*

[11] Birano, êdî di xweşiyê de bimînin. Kêmahiyên xwe temam
bikin, hanê* bidin hevdû, hemfikir bin, di aştiyê* de bijîn û Xwe-
dayê aştî û hezkirinê wê bi we re be. [12] Bi ramûsana pîroz silavê li
hev bikin. Hemû pîroz silavan li we dikin.
[13] Kerema Xudan Îsa Mesîh, hezkirina Xwedê û hevpariya Ru-
hê Pîroz li ser we hemûyan be.

---

[a] **13:1** Ji: Dubarekirina Şerîetê 19:15

# *Nameya Pawlos a ji Galatiyan re*

### *Pêşgotin*

*Ev name ji aliyê Pawlosê Şandî ve hat nivîsîn. Tê gumankirin ku ev name, di dora sala 55an de hatiye nivîsîn. Pawlos name ji civînên ku wî li Galatyayê ava kiribûn re nivîsî. Hingê Galatya, li Enedola Navîn herêmeke fireh bû.*

*Ev name ji bo bawermendên Mesîh wek belgeyeke azadiyê tê zanîn. Di vê nameyê de mirov gelek caran rastî peyvên bawerî, kerem, azadî û xaçê tê (1:6; 2:11; 3:1-11; 4:9-11; 5:1-7; 6:15).*

*Pawlos dide zanîn ku Mizgînî ne fikreke mirovî ye, lê ji Xwedê tê (1:10-16; 1:17-2:14). Pawlos bawermendan li hember şandiyên xapînok hişyar dike (5:17-18).*

*Ev name dikare bi vî awayî bê beşkirin.*

*I. Mizgînî û xweparastina Şandiyê Xwedê 1:1-2:21*
*II. Rastiya li ser Şerîet û baweriyê 3:1-4:31*
*III. Azadî ji Ruh tê 5:1-6:10*
*IV. Şîretên dawî 6:11-18*

### *Silav*

1 Ji Pawlosê* Şandî, yê ku ne ji mirovan û ne jî bi destê mirovan, lê belê bi destê Îsa Mesîh û Bav Xwedayê ku ew ji nav
miriyan rakir, bûye Şandî 2 û ji hemû birayên ku bi min re ne,
ji civînên* bawermendan ên li Galatyayê re:
3 Ji Bavê me Xwedê û ji Xudan Îsa Mesîh, kerem û aştî* li ser
we be. 4 Wî xwe di ber gunehên me de feda kir, da ku me ji dinya
xerab xilas bike. Bi vî awayî wî daxwaza Bavê me Xwedê pêkanî.
5 Rûmet her û her ji Xwedê re be! Amîn*.

### *Mizgîniyeke Din Tune*

6 Ez li we şaş dimînim ku hûn çawa evqas zû dev ji yê ku bi
kerema Mesîh gazî we kiriye, berdidin û li mizgîniyeke din dizivirin. 7 Ya rast, mizgîniyeke din tune, lê hin kesên ku we tevlihev
dikin û dixwazin Mizgîniya Mesîh xera bikin, hene. 8 Lê belê eger

em, an jî milyaketekî ji ezmên, ji wê Mizgîniya ku me ji we re
gotiye pê ve, mizgîniyeke din ji we re bêje, bila nifir li wî be. [9] Me
berê çawa gotibe, ez niha dîsa dibêjim: Eger yek, ji Mizgîniya ku
we qebûl kiriye pê ve, yeke din ji we re bêje, nifir li wî be.
[10] Ma niha ez lê digerim ku li mirovan an li Xwedê xweş bêm?
An ez dixebitim ku mirovan dilxweş bikim? Eger min hê bixwesta
ku ez mirovan dilxweş bikim, ez nedibûm xulamê Mesîh.

### *Xwedê Çawa Gazî Pawlos Kiriye*

[11] Birano, ez bi we didim zanîn ku ew Mizgîniya ku ji aliyê
min ve tê dayîn, ne ji mirovan e. [12] Çimkî min ew ji mirovan ne-
stand û ez ji aliyê wan ve nehatim hînkirin, lê belê min ew bi pey-
xama* Îsa Mesîh stand.
[13] We li ser jiyana min a berê ya di Cihûtiyê de bihîst. Hingê
min pirr zêde tengahî dida civîna bawermendan a Xwedê û min
dixwest ku ez wê ji holê rakim. [14] Ez di nav gelê xwe de, ji gelekên
ku di emrê min de bûn, di Cihûtiyê de bêtir pêşve diçûm û ji bo
adetên bav û kalên xwe bi zêdehî xîretkêş bûm. [15] Lê hê ku ez di
malzaroka diya xwe de bûm, Xwedê ez veqetandim û bi kerema
xwe gazî min kir. [16] Û çaxê li wî xweş hat ku Kurê xwe ji min re
eşkere bike, da ku ez di nav miletên din de wî bidim bihîstin, ez bi
xwîn û goşt neşêwirîm [17] û derneketim Orşelîmê*, ba yên ku
beriya min bûbûn Şandî*. Lê belê ez çûm Erebistanê û careke din
vegeriyam Şamê.
[18] Paşê, piştî sê salan ji bo ku ez Kîfas* nas bikim, ez derketim
Orşelîmê û panzdeh rojan li ba wî mam. [19] Lê min ji Şandiyan ke-
sek nedît; min bi tenê birayê Xudan Aqûb dît. [20] Di tiştên ku ez ji
we re dinivîsim de, va ye, li ber Xwedê ez derewan nakim. [21] Piştî
wê ez hatim herêmên Sûriye û Kîlîkyayê. [22] Lê ez bi xwe, ji aliyê
civînên bi Mesîh ên li Cihûstanê* ve rû bi rû nehatibûm naskirin.
[23] Wan bi tenê dibihîst: «Wî mirovê ku demekê tengahî dida me,
ew niha wê baweriya* ku demekê dixwest ji holê rake, hîn dike.»
[24] Û ji bo min pesnê Xwedê didan.

---

**1:13-14** Karên Şandiyan 8:3; 22:3-5
**1:16** Karên Şandiyan 9:3-6
**1:18** Karên Şandiyan 9:26-30
**1:18** Kîfas: navê din ê «Petrûs» e.

### *Pawlos û Şandiyên Din*

2 Piştî çardeh salan, min Tîtos* jî hilda ba xwe û bi Barnabas re
careke din ez derketim Orşelîmê. [2] Ez li gor peyxamê çûm.
Loma ji bo ku ez badîhewa nebezim an nebezî bim, min ew Miz-
gîniya ku ez di nav miletan de didim bihîstin, ji wan re got, di
civîneke bi taybetî de pêşkêşî yên xweyî siyanet* kir. [3] Tîtosê ku bi
min re bû, bi ser ku Yewnanî bû jî, nehat zorkirin ku sinet* bibe.
[4] Ev yek jî ji rûyê birayên qelp derket, yên ku ew kirin hundir û
ketin nav me, da ku bi dizî azadiya me ya bi Mesîh Îsa hîn bibin,
me bikin dîl. [5] Lê ji bo ku rastiya Mizgîniyê herdem bi we re be,
me ji bo saetekê jî li ber wan serî dananî.
[6] Lê yên ku giregir tên dîtin – demekê çi bûn, ji bo min ferq
nake. Xwedê li şexsê mirovan nanêre – ez dibêjim yên giregir,
tiştekî zêde hînî min nekirin. [7] Lê bervajiyê vê: Wan dît, wek ku li
Petrûs hatiye spartin ku Mizgîniyê bide Cihûyan, li min hatiye
spartin ku ez Mizgîniyê bidim miletên din. [8] Çimkî yê ku di jiyana
Petrûs de xebitî ku ew ji Cihûyan re bibe Şandî, di jiyana min de jî
xebitî ku ez ji miletan re bibim Şandî. [9] Aqûb*, Kîfas* û Yûhenna*
yên ku stûn dihatin hesabkirin, gava bi kerema ku ji min re hatiye
dayîn derxistin, ji bo hevpariyê destên xwe yên rastê dan min û
Barnabas û erê kirin ku em herin miletên din û ew jî herin Ci-
hûyan. [10] Bi tenê ji me xwestin ku em belengazan bînin bîra xwe.
Min jî xîretkêşî kir ku ez vê yekê bikim.

### *Pawlos li Entakyayê Erzê Petrûs Dişkêne*

[11] Lê gava ku Kîfas hat Entakyayê, ez bi eşkereyî li ber wî
rabûm. Ji ber ku sûcdar bû. [12] Çimkî, beriya ku hin kes ji aliyê
Aqûb ve bên, Kîfas bi bawermendên ku ji miletan bûn re xwarin
dixwar. Lê piştî ku ew hatin, Kîfas ji yên ku li pey sinetbûnê diçin
tirsiya, xwe da paş û ji wan veqetiya. [13] Cihûyên Mesîhî yên din jî
bi wî re durûtî kirin, wusa ku Barnabas jî bi durûtiya wan hat
girtin. [14] Lê gava min dît ku ew li gor rastiya Mizgîniyê rêve naçin,
min li pêş hemûyan ji Kîfas re got: «Madem ku tu Cihû yî û tu bi
xwe ne wek Cihûyan, lê wek miletan dijiyî, tu çawa miletan
mecbûr dikî ku bibin Cihû?»

---

2:1 Karên Şandiyan 11:30; 15:2

### *Cihû û Milet bi Baweriyê Xilas Dibin*

15 Em yên ku bi eslê xwe Cihû ne û em ne ji gunehkarên
miletên din in 16 em dizanin mirov, ne bi kirina Şerîetê*, lê bi
baweriya* ku bi Îsa Mesîh e rastdar derkeve. Û me jî bawerî bi
Mesîh Îsa aniye, da ku em ne bi kirina Şerîetê, lê bi baweriya bi
Mesîh rastdar derkevin. Çimkî tu kes, bi kirina Şerîetê rastdar
dernakeve.
17 Lê çaxê em dixebitin ku em bi Mesîh rastdar bên hesabkirin
û em jî di vê yekê de gunehkar bên dîtin, qey Mesîh xizmetkarê
guneh e? Na, tu caran! 18 Çimkî, eger ez wan tiştên ku min hil-
weşandine ji nû ve ava bikim, ez kifş dikim ku ez sûcdar im. 19 Lê
ez bi Şerîetê ji bo Şerîetê mirim, da ku ez ji bo Xwedê bijîm. Ez bi
Mesîh re hatim xaçkirin 20 û êdî ez najîm, lê Mesîh di dilê min de
dijî. Ew jiyana ku niha ez di bedenê de dijîm, ez bi baweriya bi
Kurê* Xwedê, yê ku ji min hez dike û ji bo min xwe feda kir,
dijîm. 21 Ez kerema Xwedê betal nakim. Çimkî eger rastdarî bi
Şerîetê be, Mesîh badîhewa miriye.

### *Şerîet û Bawerî*

3 Ey Galatiyên bêhiş! Kî sêrbazî li we kir? Ma li ber çavên we,
Îsa Mesîh xaçkirî ji we re nehat sûretkirin? 2 Ez dixwazim tenê
vê ji we hîn bibim: Ma we Ruhê* Xwedê bi kirina Şerîetê an bi
bihîstin û bawerkirinê stand? 3 Ma hûn evqas bêhiş in? We bi Ruh
dest pê kir, ma niha hûn dixebitin ku bi hêza xwe bibin sêrî? 4 Ma
hûn badîhewa di evqas tecrûbeyan re derbas bûn? – Eger ev bi ras-
tî badîhewa bû. 5 Nexwe yê ku Ruh dide we û di nav we de ke-
rametan dike, ma vê bi kirina Şerîetê an bi bihîstin û bawerkirina
we dike?
6 Li Birahîm* binêrin: «Wî ji Xwedê bawer kir û ev jê re rast-
darî hat hesabkirin.»[a]
7 Loma bizanin, yên ku bawer dikin, kurên Birahîm ew in.
8 Nivîsara* Pîroz ji berê ve dît ku Xwedê wê miletan bi baweriyê
rastdar derxe û ji berê ve ev Mizgînî da Birahîm: «Hemû milet wê

---

[a] **3:6** Ji: Destpêkirin 15:6

**2:16** Romayî 3:20-22 **3:6** Romayî 4:3; Aqûb 2:23 **3:7** Romayî 4:16

bi te bên pîrozkirin.»[a] 9 Wusa ku, yên bawer dikin, wê bi Birahîmê
ku bawer kiriye re bên pîrozkirin.
10 Çimkî hemû yên ku pişta xwe bi kirina Şerîetê ve girêdane,
di bin nifirê de ne. Ji ber ku weha hatiye nivîsîn: «Her kesê ku di
hemû tiştên ku di Kitêba Şerîetê de nivîsî ne, nesekine û neke, di
bin nifirê de ye.»[b] 11 Îcar eşkere ye ku tu kes li ba Xwedê bi Şerîetê
rastdar dernakeve. Çimkî hatiye nivîsîn: «Yê rastdar wê bi bawe-
riyê bijî.»[c] 12 Şerîet ne ji baweriyê ye; lê belê hatiye nivîsîn: «Yê
ku wan tiştan dike, wê bi wan bijî.»[d] 13 Mesîh, em bi berdêl ji nifira
Şerîetê kirrîn û rizgar kirin. Ew ji bo me ket bin nifirê; çimkî
hatiye nivîsîn: «Her kesê ku bi dar ve daleqandî ye, di bin nifirê de
ye.»[e] 14 Ev hemû weha çêbû, da ku bi Mesîh Îsa pîrozbûniya Bi-
rahîm bê ser miletan û em bi baweriyê soza Ruh bistînin.

### *Şerîet û Soza Xwedê ya ji Birahîm re*

15 Birano, ez li gor mirovan dibêjim: Peymana* ku hatiye erê-
kirin, tenê ya mirovekî be jî, tu kes nikare betal bike an tiştekî ser
ve zêde bike. 16 Îcar soz ji Birahîm û ji dûndana* wî re hatin dayîn.
Nayê gotin wek ku ji bo gelekan be: «Ji hemû dûndanê re», lê belê
wek ku ji bo yekî bi tenê be, dibêje: «Ji dûndana te re»[f], ku ev jî
Mesîh e. 17 Îcar ez vê dibêjim: Şerîeta ku piştî çar sed û sî salan
hat, nikare peymana ku Xwedê ji berê ve erê kiribû, rake û bi wî
awayî sozê betal bike. 18 Çimkî eger mîras ji Şerîetê be, êdî ne ji
sozê ye. Lê Xwedê ji kerema xwe ew bi sozê da Birahîm.
19 Nexwe Şerîet çima çêbû? Ew ji bo ku sûcan derxe meydanê,
ser ve hatiye zêdekirin, da ku heta dûndana ku ji wî re hatibû sozdan
bê, bimîne. Ew Şerîet bi rêberiya milyaketan bi destê navberkarekî
hat sazkirin. 20 Navberkar ne ji bo yekî tenê ye, lê Xwedê yek e.
21 Nexwe Şerîet li hember sozên Xwedê ye? Na, tu caran!
Çimkî eger Şerîeteke ku vedijîne* bihata dayîn, hingê erê, rastdarî
wê bi Şerîetê bûya. 22 Lê belê Nivîsara Pîroz her tişt di bin guneh

---

[a] 3:8 Ji: Destpêkirin 12:3; 18:18; 22:18
[b] 3:10 Ji: Dubarekirina Şerîetê 27:26
[c] 3:11 Ji: Habaqûq 2:4
[d] 3:12 Ji: Qanûna Kahîntiyê 18:5
[e] 3:13 Ji: Dubarekirina Şerîetê 21:23
[f] 3:16 Ji: Destpêkirin 13:15; 24:7
3:17 Derketin 12:40
3:18 Romayî 4:14
3:19 Dubarekirina Şerîetê 33:1-4; Îbranî 2:2; Karên Şandiyan 7:38, 52

de girtiye, da ku soz bi baweriya ku bi Îsa Mesîh e, ji yên ku bawer
dikin re bê dayîn.
23 Beriya ku ev bawerî bê, em di bin Şerîetê de girêdayî bûn,
heta xuyabûna baweriya ku wê bihata, em di bin çavan de bûn.
24 Bi vî awayî Şerîet heta bi hatina Mesîh, bû perwerdevanê me, da
ku em bi baweriyê rastdar derkevin. 25 Niha, ji ber ku bawerî hat,
êdî em ne di bin destê perwerdevan de ne. 26 Çimkî hûn hemû bi
baweriyê bi saya Mesîh Îsa kurên Xwedê ne. 27 Ji ber ku hûn hemû
yên ku imad* bûne, ku hûn bibin yên Mesîh, we Mesîh li xwe kir.
28 Êdî ne Cihû û ne jî Yewnanî* hene, ne xulam û ne jî azad hene,
ne jî nêr û mê hene; çimkî di yekîtiya Mesîh Îsa de hûn hemû yek
in. 29 Îcar, madem ku hûn yên Mesîh in, hingê hûn dûndana Bi-
rahîm in û li gor sozê jî hûn wêris in.

4 Lê ez vê jî dibêjim: Her çiqas ku wêris xwediyê her tiştî be jî,
heta ku zarok e ferqa wî ji yê xulam tune. 2 Heta dema ku bavê
wî kifş kiriye, ew di bin destê raspêr* û şahneyan* de ye. 3 Bi vî
awayî jî gava ku em zarok bûn, em di bin hêzên ruhî yên vê din-
yayê de bindest bûn. 4 Lê gava ku dem temam bû, Xwedê Kurê
xwe şand. Ew ji jinê çêbû û di bin Şerîetê de bû, 5 da ku wan ên di
bin Şerîetê de ne bi berdêl xilas bike û em kurîtiyê bistînin. 6 Û ji
ber ku hûn kur in, Xwedê Ruhê Kurê xwe yê ku gazî dike: «Ab-
ba», yanî «Bavo!» şand dilê me. 7 Loma êdî tu ne xulam î, lê tu kur
î. Madem ku tu kur î, nexwe tu bi destê Xwedê wêris î jî.

### *Ma Emê bi şûn ve Herin?*

8 Hingê, çaxê ku we Xwedê nas nedikir, we ji yên ku ji xwe ne
xwedê ne re xulamtî kir. 9 Lê niha piştî ku we Xwedê naskir, hê
zêdetir: Hûn ji aliyê Xwedê ve hatin naskirin, êdî çawa dîsa hûn li
wan hêzên ruhî yên bêhêz û reben vedigerin? Ma hûn dîsa dixwa-
zin xulamtiyê ji wan re bikin? 10 Hûn roj, meh, demsal û salan di-
girin. 11 Ez ji we ditirsim ku xebata min a ji bo we badîhewa here.
12 Birano, ez hêvî ji we dikim: Bibin wek min, çimkî ez jî bûm
wek we. We tu neheqî li min nekir. 13 Hûn dizanin ku min cara

---

3:29 Romayî 4:13    4:5-7 Romayî 8:15-17

pêşî, ji ber nexweşiyeke bedenê Mizgînî da we. [14] Rewşa bedena
min ji bo we tecrûbeyek bû, lê dîsa we ez kêm nedîtim û ez red
nekirim, lê belê we ez wek milyaketekî Xwedê, wek Mesîh Îsa qe-
bûl kirim. [15] Îcar ew bextewariya we li ku derê ma? Çimkî ez ji bo
we şahidiyê dikim ku, eger çêbûya, weyê çavê xwe derxista û bida
min. [16] Îcar ji ber ku min rastî ji we re got, ma ez bûm dijminê we?
[17] Hinekên din ji bo we xeptûleptê dikin, lê ne bi nêta qenc. Ew
dixwazin we ji me veqetînin, da ku hûn ji bo wan xeptûleptê bikin.
[18] Ne tenê gava ku ez li ba we bim, lê qenc e ku mirov hergav di
tiştên qenc de xeptûleptê bike. [19] Ey zarokên min, heta ku Mesîh di
dilê we de sûret bistîne, ez careke din ji bo we êşa zarokanînê
dikişînim. [20] Lê min dixwest ku niha ez li ba we bûma û min dengê
xwe biguherta, çimkî ez li ser we heyirî mame.

### *Mînaka Hacer û Sara*

[21] Ji min re bêjin, ey hûn ên ku dixwazin di bin Şerîetê de bin:
Ma hûn Şerîetê nabihîzin? [22] Hatiye nivîsîn ku du kurên Birahîm
hebûn: Yek ji cêriyê û yek jî ji jina azad. [23] Lê yê ku ji cêriyê bû li
gor bedenê û yê ku ji jina azad bû jî li gor soza Xwedê çêbûye.
[24] Di vê yekê de mînak heye: Ev herdu jin du peyman* in. Yek ji
wan peymanan ji Çiyayê Sînayê* ye û ji bo koletiyê zarokan tîne;
ew Hacer* e. [25] Hacer, Çiyayê Sînayê yê li Erebistanê ye û bi
Orşelîma* niha re hemdeng e. Çimkî bi zarokên xwe ve koletiyê
dike. [26] Lê belê Orşelîma ezmanî azad e, diya me ew e. [27] Ji ber ku
hatiye nivîsîn:

> «Ey jinika bêber, ey ya ku zarokan nayne, şa bibe!
> Ey tu ya ku bi êşa zarokanînê nizanî,
> Bi eşq û şahî dengê xwe bilind bike.
> Çimkî kurên jina devjêberdayî,
> Ji kurên ya ku mêrê wê heye, bêtir in.»[a]

[28] Îcar birano, em wek Îshaq* zarokên sozê ne. [29] Lê, ka çawa hin-
gê yê ku li gor bedenê çêbûye, tengahî da yê ku li gor Ruh çêbûye,
niha jî weha ye. [30] Lê belê Nivîsara Pîroz çi dibêje? Dibêje:

---

[a] 4:27 Ji: Îşaya 54:1

4:22 Destpêkirin 16:15; 21:2 — 4:24 Destpêkirin 16
4:28 Destpêkirin 17:18-22 — 4:29 Destpêkirin 21:9

«Cêriyê û kurê wê bavêje derve.
Çimkî kurê cêriyê,
Bi kurê ya azad re nabe wêris.»[a]
31 Ji bo vê yekê birano, em ne zarokên cêriyê ne, lê em zarokên
jina azad in.

### *Azadiya Xwe Biparêzin*

5 Mesîh em ji bo azadiyê azad kirine; loma hîmgirtî bin û careke
din nekevin bin nîrê xulamtiyê.
2 Va ye, ez Pawlos ji we re dibêjim: Eger hûn sinet bibin, tu
feyda Mesîh ji we re tune. 3 Ez careke din ji her mirovî re şahidiyê
dikim: Yê ku sinet bûye divê tevahiya Şerîetê bike. 4 Ey hûn ên ku
dixwazin bi Şerîetê rastdar derkevin, hûn ji Mesîh veqetiyan û ji
keremê dûr ketin. 5 Lê em bi saya Ruh, bi baweriyê li benda hêviya
rastdariyê ne. 6 Çimkî di yekîtiya Mesîh Îsa de ne sinetbûn û ne jî
sinetnebûn, lê tenê baweriya ku bi hezkirinê dixebite, bi kêr tê.
7 Îcar hûn baş dibezîn; kî ji we re bû asteng ku hûn bi ya
rastiyê nekin? 8 Ev serîpifdan ne ji yê ku gazî we dike ye. 9 Piçek
hevîrtirşk tevahiya hevîr tirş dike. 10 Ez bi saya Xudan ji we pişt-
rast im ku hûn tiştekî din nafikirin; lê yê ku hûn tevlihev kirine, kî
dibe bila ew be, wê cezayê xwe bikişîne.
11 Lê heçî ez im, birano, eger niha jî min sinetbûn hîn bikira,
çima hê tengahî li min tê kirin? Eger wusa bûya, astenga xaçê wê
ji holê rabûya. 12 Xwezî wan ên ku serê we tevlihev kirine, xwe bi
xwe nemêr bikirana.
13 Birano, hûn ji bo azadiyê hatin gazîkirin, tenê bila azadî ji
bo nefsê nebe fersend, lê belê bi hezkirinê ji hevdû re xizmetê bi-
kin. 14 Çimkî tevahiya Şerîetê di gotinekê de, yanî di vê de temam
dibe: «Wek ku tu ji xwe hez dikî, ji cîranê xwe hez bike.»[b] 15 Lê
eger hûn hevdû gez bikin û bixwin, hay ji xwe hebin ku hûn ji
aliyê hevdû ve neyên telefkirin.

### *Berê Ruh û Karê Nefsê*

16 Ez vê dibêjim: Bi Ruh rêve herin, hingê hûn tu caran
xwestekên nefsê naynin cih. 17 Çimkî nefs li hember Ruh û Ruh li

---

[a] **4:30** Ji: Destpêkirin 21:10 [b] **5:14** Ji: Qanûna Kahîntiyê 19:18
**5:9** 1 Korîntî 5:6

hember nefsê daxwaz dike; ev li hember hev in, da ku tiştên hûn
dixwazin bikin, hûn nekin. [18] Îcar, eger hûn ji aliyê Ruh ve tên rê-
vebirin, hingê hûn ne di bin Şerîetê de ne. [19] Heçî kirinên nefsê ne,
ew eşkere ne: Ew fuhûşî, pîsîtî, şehwet, [20] pûtperestî*, sêrbazî,
dijminahî, pevçûn, çavnebarî, hêrs, hevrikî, dubendî, partîkarî,
[21] zikreşî, serxweşî, kêfkirina bi harîtî û sefahet û tiştên wek van in.
Wek ku min berê ji we re got, ez careke din dibêjim: Yên ku tiştên
weha dikin, Padîşahiya* Xwedê mîras nastînin.
[22] Lê berê Ruh, hezkirin, şahî, aştî*, bîhnfirehî, dilovanî, qencî,
dilsozî, [23] nermî û xwegirtin e. Li hember tiştên weha Şerîet tune.
[24] Heçî yên Mesîh Îsa ne, wan nefs bi xwestek û daxwazên wê ve
birine ser xaçê.
[25] Madem ku em bi Ruh dijîn, hingê em bi Ruh rêve jî herin.
[26] Em quretiyê nekin, ji hev re meydanê nexwînin û çavnebariya
hev nekin.

### *Em Barên Hevdû Hilgirin*

6 Birano, eger yek di neheqiyekê de bê girtin, hûn ên ku ruhanî
ne, yekî weha bi ruhê nermîtiyê bînin ser rê. Tu jî hay ji xwe
hebe, da ku tu neyî ceribandin. [2] Barên hevdû hilgirin û bi vî awayî
Şerîeta Mesîh pêk bînin. [3] Çimkî eger yek ne tiştek be û xwe tiştek
hesab bike, ew xwe bi xwe dixapîne. [4] Bila her kes karê xwe bi-
ceribîne. Hingê mirov ne bi kirinên hinekên din, lê tenê bi kirinên
xwe dikare pesnê xwe bide. [5] Çimkî her kes wê barê xwe hilgire.
[6] Yê ku di peyvê* de hatiye hînkirin, bila di hemû tiştên qenc
de parê bide wî yê ku hîn dike. [7] Neyên xapandin! Tinaz bi Xwedê
nayê kirin. Çimkî, mirov çi biçîne, wê wî bidirû. [8] Yê ku li nefsa
xwe biçîne, wê ji nefsê rizîbûnê bidirû. Lê yê ku li Ruh biçîne, wê
ji Ruh jiyana herheyî bidirû. [9] Û em ji qencîkirinê newestin, çimkî
eger em sist nebin, emê di demsala wê de bidirûn. [10] Nexwe heta
ku fersenda me hebe, em ji hemûyan re, bi taybetî jî ji xwişk û
birayên bawermend re qenciyê bikin.

### *Şîretên Dawî û Silavên Aştiyê*

[11] Binêrin, ez bi destê xwe ji we re bi çi herfên mezin dini-
vîsim. [12] Yên ku zorê li we dikin ku hûn sinet bibin, ew kes in ku

---

5:17 Romayî 7:15-23

dixwazin xwe bi tiştên bedenê derxin pêş. Ew bi tenê weha dikin,
da ku mirov di ber xaça Mesîh de tengahiyê nedin wan. 13 Her
çiqas ew sinetbûyî ne jî, ew bi xwe Şerîetê pêk naynin, lê belê
dixwazin ku hûn sinet bibin, da ku bi bedena we pesnê xwe bidin.
14 Lê ji min dûr be ku ez ji xaça Xudanê me Îsa Mesîh pê ve bi
tiştekî din pesnê xwe bidim. Bi wê xaçê dinya ji bo min hatiye
xaçkirin û ez jî ji bo dinyayê. 15 Çimkî ne sinetbûn, ne jî sinet-
nebûn, bi tenê afirandina nû tiştek e. 16 Aştî û rehm li ser hemûyên
ku li gor vê qeydeyî rêve herin û li ser Îsraêlê Xwedê be.

17 Bila ji niha û pê ve tu kes zehmet nede min, çimkî cih-
birînên Îsa li ser bedena min in.

18 Birano, kerema Xudanê me Îsa Mesîh bi ruhê we re be.
Amîn*.

# *Nameya Pawlos a ji Efesiyan re*

### *Pêşgotin*

*Efes bajarekî Romayî yê li Asyaya* Biçûk bû. Ev bajêr li Asyayê paytext bû. Ev bajar bi mezinbûna xwe, di Împeratoriya Romayê de bajarê çaremîn bû. Efes bajarek gelek bedew û xweş bû. Serdana Pawlos a pêşî ya Efesê, di Karên Şandiyan 18:18-21 de, serdana wî ya diduyan jî di 19:2-7an de tê gotin. Pawlos bi qasî sê salan li vî bajarî ma û bawermend perwerde kirin.*

*Pawlos name di girtîgehekê de nivîsî. Her çiqas nameyên Efesiyan û Kolosiyan bimînin hev jî, mijarên wan ên bingehî cihê ne. Mijara vê nameyê di 4:13an de tê eşkerekirin: Xwedê mirovan bi keremê digihîne azadiya jiyanê (1:7; 2:5, 7-10). Armanca wî ew e, ku hemû dinyayê di têgihîştina Mesîh de bigihîne yekîtiyê.*

*Ev name dikare weha bê beşkirin:*

*I. Silav 1:1-14*
*II. Mesîh û Civîn 1:15-3:21*
*III. Jiyana nû ya bi Mesîh 4:1-6:9*
*IV. Çekên Xwedê yên ruhanî û silav 6:10-24*

### *Silav*

1 Ji Pawlosê* ku bi daxwaza Xwedê Şandiyê Mesîh Îsa ye,
ji pîrozên* li Efesê re yên ku bi saya Mesîh Îsa dilsoz in:
2 Ji Bavê me Xwedê û ji Xudan Îsa Mesîh, kerem û aştî* li ser
we be.

### *Pîroziya Ruhanî*

3 Xweda û Bavê Xudanê me Îsa Mesîh pîroz be. Wî em bi saya
Mesîh, bi her bereketa ruhanî ya li cihên ezmanî pîroz kirine. 4 Wî
em ji beriya damezrandina dinyayê bi Mesîh bijartin, da ku em li
ber wî di hezkirinê de pîroz û bêleke bin. 5 Li gor kêf û daxwaza
xwe, wî em ji pêşî ve kifş kirin, da ku em bi saya Îsa Mesîh jê re
bibin zarok. 6 Wusa ku kerema wî ya bi rûmet a ku wî bi Hezkiriyê
xwe ji me re kiriye xelat, bê pesindan. 7 Bi saya wî em bi berdêla
xwîna wî rizgar bûne, me lêbihûrtina neheqiyên xwe standiye. Ev

li gor dewlemendiya kerema wî ye 8 ya ku wî bi her şehrezayî û
fêmdariyê bi zêdehî daye me. 9 Wî sira daxwaza xwe ya ku li gor
dilê xwe bi Mesîh saz kiribû, bi me da zanîn. 10 Yanî li gor vê
plana ku gava wextê wê hat ewê pêk bîne, ewê hemû tiştan, hem
yên li ezmanan, hem jî yên li ser erdê di bin destê Mesîh de bike
yek. 11 Li gor mebesta Xwedayê ku her tiştî li gor biryar û daxwaza
xwe saz dike, em ji berê ve hatin kifşkirin û bi Mesîh hatin bijartin,
12 da ku em ên ku me pêşî hêviya xwe bi Mesîh ve girêdaye, ji bo
pesindana rûmeta wî bijîn. 13 Gava we peyva* rastiyê, Mizgîniya*
xilasiya xwe bihîst û bawerî* bi wî anî, hûn jî bi Ruhê* Pîroz ê ku
hatibû sozdan, di şexsê wî de hatin morkirin. 14 Ruh, heta dema
rizgariya wan ên ku yên Xwedê ne, destberiya mîrasa me ye. Şikir
ji rûmeta Xwedê re!

### *Duaya Pawlos*

15 Ji bo vê yekê ji dema ku min baweriya* we ya bi Xudan Îsa
û hezkirina we ya ji bo hemû pîrozan bihîstiye ve, 16 ez we di dua-
yên xwe de tînim bîra xwe û bê rawestin ji bo we şikir dikim, 17 da
ku Xwedayê Xudanê me Îsa Mesîh, Bavê rûmetê, ruhê peyxam* û
şehrezayiyê bide we, ku hûn wî hê çêtir nas bikin; 18 çavên dilê we
ronahî bibin, da ku hûn bizanin hêviya ku hûn ji bo wê hatine
gazîkirin çi ye û dewlemendiya rûmeta mîrasa wî ji bo pîrozan çi
ye 19 û mezinahiya hêza wî ya bêsînor a ku ji bo me yên ku bawer
dikin, li gor qewet û karîna wî dixebite, çi ye. 20 Ev hêz, hêza wî
ye, yê ku Mesîh ji nav miriyan rakir û li cihên ezmanî, li milê xwe
yê rastê da rûniştin. 21 Xwedê, Mesîh ne tenê di vê dinyayê de, lê
di dinya ku bê de jî derxist ser her serwerî, desthilatî, hêz û xudan-
tiyê û derxist ser her navê ku tê bîranîn. 22 Û Xwedê «her tişt xist
bin lingên wî»[a] û ew bi serîtiya li ser her tiştî da Civînê*. 23 Ev
bedena wî ye, tijetiya wî ye, yê ku li her derê her tiştî tije dike.

### *Ji Mirinê Derbasbûna Jiyanê*

2 Hûn jî ji ber neheqî û gunehên xwe mirî bûn. 2 Hingê hûn li
gor çerxa vê dinyayê, li gor serokê hukumdariya hewayê, yanî

---

[a] **1:22** Ji: Zebûr 8:6

**1:7** Kolosî 1:14 **1:20** Zebûr 110:1 **1:22** Kolosî 1:18 **2:1** Kolosî 2:13

li gor wî ruhê ku niha di nav mirovên neguhdar de dixebite, rêve
çûn. [3] Demekê em jî, em hemû di nav wan de, me bi daxwaza fikir
û bedena xwe kir, em li gor xwestekên nefsê rêve çûn. Ji xwe em jî
wek ên din, zarokên xezebê bûn. [4] Lê Xwedayê ku bi rehmê dew-
lemend e, ji ber hezkirina xwe ya mezin a ku bi wê ji me hez kir,
[5] hê ku em ji ber neheqiyên xwe mirî bûn jî, em bi Mesîh re
vejandin. Hûn bi keremê xilas bûn. [6] Xwedê em di şexsê Mesîh Îsa
de bi wî re rakirin û li cihên ezmanî bi wî re dan rûniştin. [7] Wî ev
yek kir, da ku dewlemendiya kerema xwe ya bêsînor bi wê qenciya
ku bi Mesîh Îsa ji bo me ye, di demên ku bên de nîşan bide. [8] Çim-
kî hûn bi riya baweriyê, bi keremê xilas bûn û ev ne ji we ye, di-
yariya Xwedê ye. [9] Ev ne ji kirinan e, da ku tu kes pesnê xwe nede.
[10] Çimkî em berhema Xwedê ne û em bi Mesîh Îsa hatine afi-
randin, da ku em di van karên qenc de rê ve herin ên ku Xwedê ji
pêşî ve amade kirine.

### *Yekîtiya bi Mesîh*

[11] Loma bînin bîra xwe – hûn ên ku li gor bedenê milet in – ku
hûn demekê ji aliyê wan ên ku bi dest di bedenê de hatine sinet-
kirin* û ji xwe re sinetbûyî dibêjin ve, «sinetnebûyî» dihatin gotin.
[12] Di wê demê de hûn bê Mesîh bûn, hûn ji hemwelatiya gelê Îsraêl
der û ji peymanên* sozê re xerîb, li dinyayê bê hêvî û bê Xwedê
bûn. [13] Lê niha hûn ên ku demekê dûr bûn, di yekîtiya Mesîh Îsa
de, bi saya xwîna Mesîh hûn nêzîk bûne. [14] Çimkî aştiya* me ew e;
wî herdu, Cihû û miletên din kirin yek û bi bedena xwe dîwarê
navbirkê, yanî dijminahî hilweşand. [15] Wî Şerîet* bi emir û qeyde-
yên wê ve betal kir, da ku di şexsê xwe de ji herduyan, ji Cihû û ji
miletên din, mirovekî nû biafirîne û bi wî awayî aştiyê çêke [16] û bi
xaçê herduyan di yek bedenê de bi Xwedê re li hev bîne û bi vê
yekê dijminahiyê bikuje. [17] Îcar ew hat, Mizgîniya aştiyê hem ji we
yên ku dûr bûn re û hem jî ji yên nêzîk re da. [18] Çimkî bi rêberiya
wî em herdu dikarin bi yek Ruhî derkevin ber Bav*. [19] Îcar êdî hûn
ne xerîb û biyanî ne, lê belê hûn hemwelatiyên pîrozan û maliyên
Xwedê ne. [20] Hûn li ser bingeha Şandî* û pêxemberan* avakirî ne
û Mesîh Îsa bi xwe kevirê riknê bingehê ye. [21] Bi wî hemû avahî

---

**2:15** Kolosî 2:14 **2:16** Kolosî 1:20 **2:17** Îşaya 57:19

hevdû digire û ji bo ku bi Xudan bibe perestgeheke pîroz, mezin
dibe. [22] Bi wî hûn jî bi hev re di Ruh de tên avakirin, da ku hûn
bibin warê Xwedê.

### *Xizmeta Pawlos a ji bo Miletan*

3 Ji bo vê yekê ez Pawlos, ji bo we miletan di ber Mesîh Îsa de
girtî me. [2] Bêguman we bihîstiye ku ev şahnetiya* keremê ji
aliyê Xwedê ve ji bo we ji min re hatiye dayîn. [3] Wek ku min berî
niha jî bi kurtî nivîsîbû, ev sir bi peyxamê ji min re hat dayîn. [4] Ga-
va ku hûn vê bixwînin, hûnê bikarin têbigihîjin ku ez sira Mesîh
çawa fêm dikim. [5] Ev sir, wek ku niha ji Şandiyên wî yên pîroz û ji
pêxemberên wî re bi Ruh hatiye eşkere kirin, di dema nifş* û qer-
nên berê de ji mirovan re nehat vekirin. [6] Sir ev e, ku miletên din bi
saya Mizgîniyê hemwêris in, endamên eynî bedenê û hevparên
soza Xwedê ne, ya ku bi Mesîh Îsa ye. [7] Li gor diyariya kerema
Xwedê ya ku bi xebata hêza wî ji min re hatiye dayîn, ez bûm
xizmetkarê vê Mizgîniyê. [8] Bi ser ku ez di nav hemû pîrozan de yê
herî kêm im jî, ev kerem ji min re hat dayîn, da ku ez Mizgîniya
dewlemendiya Mesîh a ku nayê salixdan ji miletan re bidim [9] û
plana bi sira ku ji demên bê destpêk ve li ba Xwedayê ku her tişt
afirandiye veşartî bû, ji hemûyan re derxim ber ronahiyê, ku ew çi
ye. [10] Wusa ku şehrezayiya Xwedê ya pirr alî, bi saya Civînê*, ji
serwerî û desthilatiyên li cihên ezmanî re bê gotin. [11] Ev li gor
mebesta Xwedê ya ji demên bêdestpêk ve bû, ya ku wî bi saya
Xudanê me Mesîh Îsa pêk anî. [12] Di yekîtiya Mesîh de û bi ba-
weriya bi wî, em dikarin bi cesaret û ewlehî derbasî ber Xwedê
bibin. [13] Ji ber vê yekê, ez ji we hêvî dikim ku hûn, ji ber cefayên
ku ez ji bo we dikişînim, dilsar nebin; ew ji bo we rûmet in.

### *Dua ji bo Efesiyan*

[14] Ji bo vê yekê, ez li ber Bavê ku [15] li erd û ezmanan her ba-
vikî nav jê standiye, diçim ser çokan. [16] Bila ew li gor dewlemen-
diya rûmeta xwe, qewetê bide we ku hûn bi Ruhê wî, di mirovê
hundir de xurt bibin, [17] da ku bi baweriyê Mesîh di dilê we de rûne
û hûn di hezkirinê de ra* bidin û hîmgirtî bin, [18] da ku hûn bikarin

---

**3:4-6** Kolosî 1:26-27

bi hemû pîrozan re firehî, dirêjahî, bilindahî û kûrahiya vê hez-
kirinê fêm bikin. 19 Bi vî awayî, hûn hezkirina Mesîh a ku gelek di
ser zanînê re ye bizanin û bi hemû tijetiya Xwedê tije bibin.
20 Ew bi hêza xwe ya ku di hundirê me de dixebite, dikare ji ya
ku em dixwazin an jî em difikirin hê bêtir bike. 21 Di Civînê de û bi
saya Mesîh Îsa heta hemû nifşan û her û her rûmet ji wî re be.
Amîn*.

### *Yekîtiya Bedenê*

4 Îcar ez yê ku di ber Xudan de girtî me, ez ji we hêvî dikim ku
hûn di jiyana xwe de bi awayê ku hêjayî gazîkirina we ye, rêve
herin. 2 Di hezkirinê de bi hemû nefsbiçûkî û nermiyê bi bîhnfirehî
hevdû ragirin. 3 Xîretkêşiyê bikin ku hûn yekîtiya Ruh bi hevgirê-
dana aştiyê biparêzin. 4 Wek ku Xwedê hûn gazî yek hêviyê kirine,
beden yek e, Ruh yek e 5 Xudan yek e, bawerî yek e, imad* yek e.
6 Xwedê yek e, bavê hemûyan e; ew di ser hemûyan re ye, bi he-
mûyan re ye û di nav hemûyan de ye.
7 Û li gor pîvana diyariya Mesîh ji her yekî ji me re kerem hat
dayîn. 8 Loma dibêje:
«Gava ku hilkişiya jor,
Hêsîr* li pey xwe birin,
Û diyarî dan mirovan.»[a]
9 Ev «derket jor» tê mana çi? Dixwaze bêje ku pêşî ew dake-
tibû derên erdê yên jêr. 10 Yê ku daketiye û ji bo ku her tiştî tije
bike derketiye jor, di ser hemû ezmanan re eynî ew e. 11 Wî bi xwe
diyarî da, ku hinek bibin Şandî, hinek pêxember, hinek mizgînvan,
hinek jî şivan û mamoste, 12 da ku yên pîroz ji bo xebata xiz-
metkirinê bên rapêçan û bedena Mesîh bê avakirin 13 heta ku em
hemû bigihîjin yekîtiya bawerî û naskirina Kurê* Xwedê û bibin
mirovê gihîştî, bigihîjin pîvana bejna Mesîh a temam û tije. 14 Da
ku êdî em nebin zarokên ku bi pêlan vir ve û wê ve tên kiş-
kişandin, li ber her bayê hîndariya mirovên xapînok diçin û bi
qurnaziya hîlekariyên wan ji rê derdikevin. 15 Lê em bi hezkirinê
rastiyê bêjin, di her tiştî de ber bi wî ve mezin bibin ku serî ew e,

---

[a] 4:8 Ji: Zebûr 68:18
4:2 Kolosî 3:12-13

Mesîh e. 16 Bi wî hemû beden hevdû digire û bi alîkariya her mo-
vikê girêdayî ye; bi wî her endam li gor qeweta xwe dixebite û bi
vî awayî beden mezin dibe û di hezkirinê de tê avakirin.

### *Jiyana Kevin û ya Nû*

17 Loma ez vê dibêjim û bi navê Xudan li ser disekinim: Êdî
wek miletên din ên ku di fikirîna xwe ya pûç de rêve diçin, hûn
neçin. 18 Têgihîştina wan tarî ye; ew ji ber xeşîmî û hişkîtiya dilê
xwe, ji jiyana Xwedê re biyanî ne. 19 Wan her pêhesîn winda kiriye
û ji bo ku bi çavbirçîtî her pîsîtiyê bikin, xwe dane destê bêede-
biyê. 20 Lê we Mesîh bi vî awayî nas nekir. 21 Bêguman we li ser wî
bihîstiye û wek ku rastî bi Îsa ye, hûn li gor wî hatine hînkirin.
22 Îcar mirovê kevin ê li gor jiyana we ya berê, yê ku bi xwestekên
xapînok dirize, ji ser xwe bavêjin 23 û di ruh û hişê xwe de nû bibin
24 û mirovê nû li xwe bikin, ku di rastdarî û pîroziya rastiyê de li
gor Xwedê hatiye afirandin.
25 Loma derewan ji xwe dûr bixin û «her yek ji we bi cîranê
xwe re rastiyê bipeyivin»[a], çimkî em endamên hev in. 26 «Hêrs bi-
bin, lê guneh nekin»[b]; bila roj li ser hêrsa we neçe ava. 27 Ne jî rê
bidin Îblîs. 28 Yê ku dizî kiriye, divê êdî diziyê neke, lê bila bi
destê xwe tiştê qenc bike û bixebite, da ku tiştekî wî hebe ku bide
yê hewcedar. 29 Bila qet gotina xerab ji devê we dernekeve, lê belê
ji bo perwerdekirinê çi qenc be – wek ku lazim e – wê bêjin, da ku
ew ji guhdaran re keremdar be. 30 Ruhê* Xwedê yê Pîroz ê ku hûn
ji bo roja rizgariyê bi wî hatine morkirin, xemgîn nekin. 31 Bila bi
her xerabiyê re her tehlî, hêrs, xezeb, qîrîn û buxtan ji we dûr ke-
vin. 32 Li hember hev keremdar û dilovan bin û wek ku Xwedê bi
Mesîh li we bihûrtiye, li hevdû bibihûrin.

5 Ji bo vê yekê, wek zarokên delal mîna Xwedê bikin. 2 Çawa ku
Mesîh ji me hez kir û ji bo me xwe feda kir û xwe wek pêşkêş
û goriyeke* bîhnxweş pêşkêşî Xwedê kir, hûn jî wusa di hezkirinê

---

[a] **4:25** Ji: Zekerya 8:16 [b] **4:26** Ji: Zebûr 4:4
**4:16** Kolosî 2:19 **4:22** Kolosî 3:9; Romayî 6:6
**4:24** Kolosî 3:10 **4:32** Kolosî 3:13

de rêve herin. 3 Bi awayê ku li pîrozan tê, divê di nav we de, navê
fuhûşiyê û her cûreyê nepakî an çavbirçîtiyê qet neyê gotin jî. 4 Û
divê peyivîna bêedebî û bi ehmeqî, an henekên zir, yanî tiştên ku
ne hêja ne, nebin, lê hê bêtir hûn şikirdar bin. 5 Vê yekê qenc
bizanin ku di Padîşahiya Mesîh û Xwedê de mîrasa tu mirovê
fuhûşker, nepak an jî mirovê çavbirçî yanî pûtperest*, tune.

### *Zarokên Ronahiyê*

6 Bila tu kes we bi peyvên pûç nexapîne, çimkî xezeba Xwedê
ji ber van tiştan tê ser kurên neguhdariyê. 7 Îcar hûn nebin hev-
parên wan. 8 Demekê hûn tarî bûn, lê niha hûn bi Xudan ronahî ne.
Îcar wek zarokên ronahiyê rêve herin, 9 ji ber ku berê ronahiyê di
her qencî, rastî û heqîqetê de ye. 10 Tiştê ku li xweşa Xudan diçe,
kifş bikin. 11 Nebin hevparên karên tariyê yên bêber, lê hê bêtir
wan tiştan eşkere bikin. 12 Çimkî tiştên ku ew bi dizî dikin, eyb e
ku bên gotin jî. 13 Lê her tiştê ku dikeve ber ronahiyê, xuya dibe.
14 Çimkî her tiştê ku xuya dibe, ronahî ye. Loma tê gotin:

«Ey yê ku radize, hişyar bibe!
Ji nav miriyan rabe û
Mesîh wê ji te re bibiriqe.»

15 Loma bala xwe bidinê ka hûn çawa rêve diçin, ne wek ên
neşehreza, lê belê wek ên şehreza herin. 16 Îcar ji fersenda vê demê
îstifade bikin, çimkî roj xerab in. 17 Loma ne bêaqil bin, lê belê fêm
bikin ka daxwaza Xudan çi ye. 18 Û bi şerabê serxweş nebin, di wê
de bêedebî heye; lê bi Ruh tije bibin. 19 Ji hev re Zebûr, lavije* û
stranên ruhanî bêjin, di dilê xwe de ji Xudan re stran û lavijeyan
bistrînin. 20 Hergav ji bo her tiştî bi navê Xudanê me Îsa Mesîh ji
Bav Xwedê re şikir bikin.

### *Têkiliyên nav Malê*

21 Bi tirsa Mesîh bi ya hev bikin. 22 Ey jinno! Wek ku hûn bi ya
Xudan dikin, wusa bi ya mêrê xwe bikin. 23 Çimkî, ka çawa Mesîh
serê Civînê ye, mêr jî serê jinê ye û Mesîh bi xwe xilaskarê Civînê,
yanî bedenê ye. 24 Îcar çawa ku Civîn bi ya Mesîh dike, bila jin jî

---

5:14 Binêre: Îşaya 26:19; 60:1 — 5:16 Kolosî 4:5
5:19 Kolosî 3:16-17 — 5:22 Kolosî 3:18; 1 Petrûs 3:1

bi vî awayî di her tiştî de bi ya mêrê xwe bike. 25 Ey mêrno! Wek
ku Mesîh ji Civînê hez kir û xwe di ber wê de feda kir, bila her kes
ji jina xwe hez bike. 26 Wî xwe feda kir, da ku Civînê bi peyva xwe
pîroz bike û bi şuştina avê paqij bike, 27 da ku Civînê bi rew-
neqiya* wê ve pêşkêşî xwe bi xwe bike, ku tu leke an qermîçek an
tiştekî wek van li ser wê nebe, lê belê ew pîroz û bêleke be. 28 Bi vî
awayî her mêr jî deyndar e ku wek bedena xwe, ji jina xwe hez
bike. Yê ku ji jina xwe hez dike, ji xwe hez dike. 29 Çimkî tu kes,
tu caran ji bedena xwe nefret nekiriye, lê ew bedena xwe xweyî
dike û xema wê dixwe, wek ku Mesîh jî Civînê xweyî dike û xema
wê dixwe. 30 Çimkî em endamên bedena wî ne. 31 «Loma mêr wê
dê û bavê xwe berde, bi jina xwe re bibe yek û herdu jî wê bibin
bedenek.»[a] 32 Ev sir mezin e; lê ez vê li ser Mesîh û li ser Civînê
dibêjim. 33 Loma bila her yek ji we jî wek ku ji xwe hez dike, ji
jina xwe hez bike û bila jin siyaneta* mêrê xwe bigire.

6 Zarokno, li gor Xudan li ber dê û bavê xwe serî deynin, çimkî
ev rast e. 2 «Qedrê dê û bavê xwe bigire» – emrê pêşî yê bi
sozê, ev e: 3 «Da ku qencî li te bibe û li ser erdê emrê te dirêj be.»[b]
4 Bavno! Hûn jî hêrsa zarokên xwe ranekin, lê wan bi terbiye û
şîreta Xudan perwerde bikin.

5 Xulamno, wek ku hûn li ber Mesîh serî datînin, bi tirs û
lerizîn û ji dil û can li ber mîrzayên xwe yên li ser dinyayê serî
deynin. 6 Vê yekê ne bi xizmeta ku li ber çav tê kirin ku li mirovan
xweş bê, lê belê wek xizmetkarên Mesîh, daxwaza Xwedê ji dil û
can bînin cih. 7 Ne wek ji mirovan re, lê wek ku ji Xudan re tê ki-
rin ji dil û can xizmetê bikin. 8 Û hûn dizanin ku her kî çi qenciyê
bike, wê bergîdanê* ji Xudan bistîne, dixwazî bila xulam be, dix-
wazî bila azad be.

9 Hûn jî, mîrzano eynî tiştan ji wan re bikin û êdî dev ji
gefxwarinê berdin, çimkî hûn dizanin ku Xudanê we û yê wan li
ezmanan e û li ba wî xatirgirtin tune.

---

[a] **5:31** Ji: Destpêkirin 2:24

[b] **6:2-3** Ji: Derketin 20:12; Dubarekirina Şerîetê 5:16

**5:25** Kolosî 3:19; 1 Petrûs 3:7 **6:1** Kolosî 3:20

**6:4-5** Kolosî 3:21-25 **6:9** Kolosî 4:1; Dubarekirina Şerîetê 10:17

### *Çekên ku Xwedê Dide*

[10] Bi kurtî, bi Xudan û bi qeweta karîna wî bi hêz bibin. [11] Ji bo
ku hûn bikarin li hember hîleyên Îblîs rawestin, hemû çekên Xwe-
dê li xwe bikin. [12] Çimkî cenga me ne li hember xwîn û goşt e, lê
belê li hember serweriyan, li hember desthilatiyan, li hember hu-
kumdarên gerdûnê yên vê taristaniyê, li hember ordiyên ruhî yên
xerabiyê yên li cihên ezmanî ye. [13] Ji ber vê yekê hemû çekên
Xwedê bistînin, da ku hûn bikarin di roja xerab de li ber xwe bidin
û piştî ku we her tişt kir, li cihê xwe rawestin. [14] Îcar, pişta xwe bi
rastiyê bipêçin û zirxê rastdariyê li xwe bikin [15] û lingên xwe ji bo
Mizgîniya aştiyê bi amadebûnê pêlav bikin û li cihê xwe bisekinin.
[16] Bi ser hemûyan de, mertalê baweriyê yê ku hûn pê bikarin hemû
tîrên agirî yên Yê Xerab bitemirînin, bigirin destê xwe. [17] Û rahêjin
kumzirxê xilasiyê û şûrê Ruh ê ku peyva Xwedê ye. [18] Bi her dua û
lavakirinê, herdem bi Ruh dua bikin. Ji bo vê yekê hişyar bimînin
û ji bo hemû pîrozan herdem bi berdewamî lava bikin. [19] Ji bo min
jî dua bikin, da ku, gava ez devê xwe vekim, peyv ji min re bê
dayîn û ez sira Mizgîniyê bi ziravî bidim zanîn. [20] Di ber wê de ez
bi zincîran girêdayî qasidiyê dikim. Dua bikin, da ku ez bê tirs,
wek ku pêwist e, wê bêjim.

### *Silavên Aştiyê*

[21] Ji bo ku hûn jî bizanin ez çawa me û çi dikim, birayê hezkirî
û di yekîtiya Xudan de xizmetkarê dilsoz Tixîkos* wê her tiştî bi
we bide zanîn. [22] Ez wî ji bo vê yekê dişînim ba we, da ku hûn tiş-
tên li ser me bizanin û ew cesaretê bide dilê we.
[23] Bila aştî û bi baweriyê hezkirin ji Bav Xwedê û Xudan Îsa
Mesîh ji birayan re be. [24] Kerem li ser wan hemûyan be, yên ku bi
hezkirina nemir ji Xudanê me Îsa Mesîh hez dikin.

---

**6:14** Îşaya 59:17 **6:15** Îşaya 52:7 **6:17** Îşaya 59:17

# *Nameya Pawlos a ji Filîpiyan re*

### *Pêşgotin*

*Pawlosê Şandî ev name di girtîgehekê de nivîsî. Tê gotin ku ew hingê li Efesê bû.*

*Filîpya bajarekî Mekedonyayê bû û Mekedonya bi xwe jî hingê di bin serweriya Împeratoriya Romayê de bû. Civîna bawermendan a li Filîpyayê, bi gera Pawlos a diduyan, di bin mercên zor û zehmet de hat avakirin (Karên Şandiyan 16:11-40). Kesên ku di vê civînê de cih digirtin destvekirî bûn (4:15, 16; 2 Korîntî 8:2).*

*Pawlos di vê nameyê de ji wan Filîpiyên ku diyarî jê re şandine re spasiya xwe pêşkêş dike. Pawlos ji civîna bawermendên ku li Filîpiyê ne dilxweş e û hezkirina xwe ji wan re diyar dike.*

*Pawlos civîna bawermendan li hember hîndariyên xapînok jî hişyar dike (3:4-9, 18, 19). Ew diyar dike ku hînkirina Mesîh û yekbûna bi wî re, armanca bingehî ye (3:10-14).*

*Ev name dikare bi vî awayî bê beşkirin:*

*I. Silav 1:1-11*
*II. Rewşa Pawlosê Şandî 1:12-30*
*III. Jiyana Mesîh ji bo bawermendan mînak e 2:1-2:18*
*IV. Têkiliyên li gor baweriya Mesîhî 2:19-3:21*
*V. Biziravkirin û silav 4:1-23*

### *Silav*

1 Ji xulamên Mesîh Îsa, ji Pawlos* û ji Tîmotêyos*,
ji hemû pîrozên* Mesîh Îsa yên li Filîpyayê re û tevî wan ji
çavdêr û alîkaran re:
2 Ji Bavê me Xwedê û ji Xudan Îsa Mesîh, kerem û aştî li ser
we be.

### *Spasî û Dua*

3 Her cara ku ez we tînim bîra xwe, ez şikir ji Xwedayê xwe re
dikim. 4 Hergav di hemû duakirina xwe de ez bi şahî ji bo we
hemûyan daxwaz dikim. 5 Çimkî ji roja pêşî û heta niha hûn ji bo

pêşveçûna Mizgîniyê bi min re hevpariyê dikin. [6] Ez piştrast im, yê
ku di dilê we de dest bi karê qenc kiriye, wê heta Roja Mesîh Îsa
wî bîne serî. [7] Ji bo min rast e ku ez li ser we hemûyan weha
bifikirim, çimkî hûn di dilê min de ne. Hem di girtina min de û
hem jî di parastin û rastderxistina min a Mizgîniyê de, hûn hemû bi
min re hevparên keremê ne. [8] Xwedê şahidê min e ku çawa ez bi
dilovaniya Mesîh Îsa bêriya we hemûyan dikim. [9] Dua min ev e ku
hezkirina we bi zanîn û hemû têgihîştina di her tiştî de hê û hê
zêdetir bibe, [10] da ku hûn ya herî qenc hilbijêrin û di Roja Mesîh de
paqij û bêqusûr bin. [11] Wusa ku hûn, ji bo rûmet û pesnê Xwedê bi
berê rastiyê yê ku ji Îsa Mesîh tê, tije bibin.

### *Belavbûna Mizgîniyê*

[12] Birano, ez dixwazim ku hûn bizanin, tiştên ku hatin serê
min, hê bêtir ji pêşveçûna Mizgîniyê re bûn alîkar. [13] Wusa ku ji
hemû berevanên qesrê û ji hemûyên din re jî eşkere bû ku ez di ber
Mesîh de girtî me. [14] Gelek birayan ji girtina min ewlehî ji Xudan
stand û ji bo ku bêtirs peyva* Xwedê bêjin, hê bêtir bi zirav bûn.

[15] Erê, hinek ji çavnebarî û hemberiyê Mizgîniya Mesîh didin
bihîstin, lê hinek jî bi niyeteke qenc. [16] Evên ha ji hezkirinê Miz-
gîniyê didin, çimkî dizanin ku ez ji bo parastina Mizgîniyê di
girtîgehê de me. [17] Lê yên din ne bi dilekî pak, lê ji hevrikiyê,
Mesîh didin bihîstin. Ew guman dikin ku wê tengahiyên min di
girtîgehê de zêde bikin.

[18] Xem tune! Dixwazî bila bi hêcetan* be, dixwazî jî bila ji dil
be, bi her awayî Mesîh didin bihîstin û bi vê ez şa dibim. Erê, ezê
bi vê şa bibim jî, [19] çimkî ez dizanim ku bi duayên we û bi alî-
kariya Ruhê Îsa Mesîh ev yek wê ji bo xilasiya min çêbe. [20] Hêvî û
bendewariya min ev e ku ez di tu tiştî de neyêm şermkirin, lê bi
cesareteke temam, eger bi mirina min an jî bi jiyana min be, wek
hergav niha jî Mesîh wê bi bedena min bê bilindkirin. [21] Çimkî ji
bo min jiyan Mesîh e û mirin jî qezenc e. [22] Lê eger jiyana di
bedenê de ji bo xebata min ber bîne, hingê ez nizanim kîjanê
bibijêrim. [23] Ez di navbera herduyan de ketime tengahiyê; ez dix-
wazim veqetim û bi Mesîh re bim, çimkî ev hê gelek çêtir e. [24] Lê
mayîna min a di bedenê de ji bo we bêtir pêwist e. [25] Ez bi vê
piştrast im û dizanim ku ezê bimînim û bi we hemûyan re bim, da

ku hûn pêşve herin û di baweriyê* de şa bibin. 26 Wusa ku, gava ez
dîsa bêm ba we, hûn bi Mesîh Îsa hê bêtir bi min pesnê xwe bidin.
27 Lê bila jiyana we hêjayî Mizgîniya Mesîh be, da ku ez bêm
we bibînim, an neyêm jî, ez bibihîzim ku hûn di ruhekî de hîmgirtî
ne û bi dil û can bi hev re ji bo baweriya* Mizgîniyê tekoşînê*
dikin 28 û di tu tiştî de ji wan ên ku li hember we radiwestin,
natirsin. Ev yek ji bo wan nîşana helakbûnê ye, lê ji bo we, ya
xilasiyê ye û ev jî ji Xwedê ye. 29 Çimkî di ber Mesîh de kerem li
we hatiye kirin ku hûn ne tenê baweriyê bi wî bînin, lê belê di ber
wî de cefayê jî bikişînin. 30 Îcar hûn jî di eynî tekoşînê de ne, wek
ku we ez tê de dîtim û niha jî hûn li ser min dibihîzin.

### *Yekîtiya di Nefsbiçûkiyê de*

2 Eger cesaretdaneke bi Mesîh, handaneke* ji hezkirinê, hev-
pariyeke we bi Ruh, hezkirineke ji dil û dilovaniyek hebe,
2 şahiya min temam bikin. Bila fikra we yek be, eynî hezkirina we
hebe, fikra we û dilê we yek be. 3 Tu tiştî bi hevrikiyê an bi
pesindana pûç nekin. Lê bila bi nefsbiçûkî her yek ji we yên din di
ser xwe re bigire. 4 Bila her yek ji we ne tenê li karê xwe, lê belê li
karê yên din jî binêre. 5 Bila ew fikirîn bi we re hebe, ya ku bi
Mesîh Îsa re jî bû:

6 Ew, bi ser ku di xasîtiya Xwedê de bû jî,
Wî wekheviya bi Xwedê re xenîmetek hesab nekir.
7 Lê belê wî mezinahiya xwe ji xwe xist,
Xasîtiya xulam stand û bû mîna mirovan,
Di şiklê mirovan de xuya bû.
8 Wî xwe nizim kir, îtaet kir û çû mirinê
Heta çû mirina li ser xaçê.
9 Ji bo vê yekê Xwedê ew gelek bilind kir
Û navê di ser her navî re da wî.
10 Da ku bi navê Îsa,
Hemû yên li ezmên, li erdê û di bin erdê de,
Herin ser çokan
11 Û ji bo mezinahiya Bav Xwedê,
Her ziman eşkere bike û bêje ku Îsa Mesîh Xudan e.

---

**1:30** Karên Şandiyan 16:19-40 **2:10-11** Binêre: Îşaya 45:23

### *Wek Stêran Biçirisin*

12 Ji ber vê yekê, hezkirîno, çawa ku we hergav bi ya min
kiribe, niha jî, ne tenê di dema ku ez li ba we me, lê belê hê bêtir di
dema ku ez ne di nav we de me jî, bi ya min bikin; bi tirs û lerizînê
xilasiya xwe pêk bînin. 13 Çimkî yê ku di dilê we de dixebite, Xwe-
dê ye, da ku hem daxwaz û hem jî kirina we li wî xweş bê.
14 Her tiştî bê pitepitkirin û bê devjenî bikin, 15 da ku hûn bê-
qusûr û pak bin. Di nav vî nifşê* xwehr û jirêketî de, ku hûn di nav
wan de wek stêrên ezmên ronahiyê didin, zarokên Xwedê yên
bêleke bin 16 û peyva jiyanê hişk bigirin. Wusa ku, di Roja Mesîh
de ji min re bibe pesin, da ku ez badîhewa nebezîbim û min ba-
dîhewa keda xwe nedabe. 17 Lê belê, eger xwîna min li ser gorî* û
xizmeta baweriya we wek pêşkêşekê bê rijandin jî, ezê şa bim û
ezê bi we hemûyan re şa bim. 18 Bi vî awayî hûn jî şa bin û bi min
re şa bibin.

### *Tîmotêyos û Êpafrodîtos*

19 Îcar hêviya min ji Xudan Îsa heye ku ez di demeke nêzîk de
Tîmotêyos bişînim ba we, da ku ez jî halê we bizanim û dilê min
rihet bibe. 20 Çimkî tu kesê min ê ku mîna wî bi dil û can li ser we
bifikire û ji bo hal û rewşa we xemê bixwe tune; 21 yên din hemû
ne li tiştên Îsa Mesîh, lê li feyda xwe digerin. 22 Lê hûn dilsoziya
wî ya ceribandî dizanin û hûn dizanin ku wek kurekî bi bav re, ew
bi min re di xizmeta Mizgîniyê de dixebitî. 23 Îcar çaxê ez bibînim
ka rewşa min wê çawa çêbe, ez hêvî dikim ku ezê zûka wî bişînim
ba we. 24 Û ez li Xudan ewle me ku di demeke nêzîk de ez bi xwe
jî, ezê bêm.
25 Lê min pêwist dît ku ez birayê xwe, hevalkar û hevalleşkerê
xwe Êpafrodîtos ê ku we şandiye, da ku ew di hewcedariya min de
bibe alîkar, bişînim ba we. 26 Çimkî wî bêriya we hemûyan dikir û
ji ber ku we bihîstibû ku ew nexweş e, xemgîn e. 27 Ew wusa nex-
weş bû ku gihîşt ber mirinê. Lê belê Xwedê li wî hat rehmê; ne
tenê li wî, li min jî hat rehmê, da ku ji min re xemgînî li ser
xemgîniyê çênebe. 28 Loma ez wî hê zûtir dişînim, da ku hûn dîsa
bi dîtina wî şa bibin û xemgîniya min nemîne. 29 Îcar bi şahiyeke

---

**2:15** Dubarekirina Şerîetê 32:5

mezin wî bi navê Xudan qebûl bikin û siyaneta* yên weha bigirin.
[30] Çimkî ew ji bo karê Mesîh nêzîkî mirinê bû, ji bo xizmeta ku we
nikaribû hûn ji bo min bikin, wî canê xwe xist talûkê.

3 Bi kurtî birano, bi saya Xudan şa bibin. Îcar nivîsîna eynî tiş-
tan min aciz nake, lê ewlehiyê dide we.

*Rastdariya Rastîn*

[2] Hay ji yên wek kûçikan, hay ji karkerên xerab û hay ji si-
neta* seqet hebin. [3] Çimkî yên bi sineta rast em in, em bi Ruhê*
Xwedê diperizin*, em bi saya Mesîh Îsa pesnê xwe didin û em li
tiştên bedenê ewle nabin. [4] Eger wusa bûya, min bi xwe jî dikaribû
ku ez li tiştên bedenê ewle bibim. Eger yekî din bifikire ku li tiştên
bedenê ewle bibe, ez hê bêtir dikarim. [5] Ez roja heştan hatime sinet-
kirin, ji gelê Îsraêl, ji eşîra Binyamîn* im, ez Îbraniyekî* xas Îbranî
me. Ez di kirina Şerîetê* de Fêrisî* û [6] wusa xîretkêş bûm ku min
tengahî dida civînê*. Li gor rastdariya Şerîetê, ez bêkêmahî me.
[7] Lê belê her tiştê ku ji bo min qezenc bû, min di ber Mesîh de
zirar hesab kir. [8] Hê zêdetir, ez ji bo feyda zanîna bilind a Xudanê
xwe Mesîh Îsa, her tiştî zirar hesab dikim. Di ber wî de min dev ji
her tiştî berdaye û ez wan wek zibil hesab dikim, da ku ez Mesîh
qezenc bikim [9] û bi wî re bibim yek. Êdî rastdariya min ne ji kirina
Şerîetê, lê ji baweriya ku bi Mesîh e, tê. Ev rastdarî ne ji min e, ji
Xwedê ye û bingeha wê bawerî ye. [10] Ez dixwazim Mesîh û hêza
vejîna* wî bizanim û bibim hevparê cefayên wî û bi mirina wî bi-
bim wek wî, [11] da ku ez bi riyekê bigihîjim rabûna ji nav miriyan.

*Bezîna ber bi Armancê ve*

[12] Ji xwe hê ez negihîştime vê armancê an jî bêkêmahîtiyê, lê
ez li pey vê yekê dibezim, da ku ez, ya ku Mesîh Îsa ez ji bo wê bi
dest xistime, bi dest bixim. [13] Birano, ez xwe hê gihîştî hesab na-
kim, lê ya ku ez dikim ev e: Ez tiştên çûyî ji bîr dikim û xwe dirêjî
yên pêş dikim. [14] Ez ji bo qezenckirina xelata ku Xwedê di gazî-
kirina xwe ya ezmanî de bi Mesîh Îsa pêşkêş dike, ber bi armancê

---

**3:5** Romayî 11:1; Karên Şandiyan 23:6; 26:5
**3:6** Karên Şandiyan 8:3; 22:4; 26:9-11

ve dibezim. [15] Loma em hemû yên gihîştî wusa bifikirin û eger hûn
li ser tiştekî bi awayekî din bifikirin, Xwedê wê vê jî ji we re kifş
bike. [16] Bi tenê, em li gor tiştê ku em gihîştinê pêşve herin.
[17] Birano, bibin wek min û qenc li wan binêrin, yên ku di ji-
yana xwe de wek ku em ji we re bûne mînak, rêve diçin. [18] Çimkî
wek ku min berê jî gelek caran ji we re gotiye û niha jî ez bi girîn
dibêjim, gelek hene ku di jiyana xwe de dijminên xaça Mesîh in.
[19] Dawiya van helakbûn e, xwedayê wan zikê wan e û rûmeta wan
şermezariya wan e. Ew tiştên vê dinyayê difikirin. [20] Lê heçî em in,
welatê me li ezmanan e û ji wir jî em li hêviya Xilaskar, Xudan Îsa
Mesîh disekinin. [21] Ewê bi wê qeweta xwe ya ku dikare her tiştî
bindest bike, bedena me ya reben biguhere û bike wek bedena xwe
ya bi rûmet.

4 Îcar xwişk û birayên min ên hezkirî yên ku ez bêriya wan
dikim, hûn şahiya min û taca serê min in, bi vî awayî bi saya
Xudan qayîm bimînin.

### *Dilşa Bin, di Aştiyê de Bin*

[2] Ez ji Eyodiyayê hêvî dikim û ji Sintîxayê hêvî dikim ku di
yekîtiya Xudan de bibin hemfikir. [3] Erê, ez ji te jî dixwazim, ey he-
valê min ê dilsoz, ji wan jinan re bibe alîkar; çimkî ew bi Klêmens
û hevalkarên min ên din re ku navê wan di Kitêba Jiyanê de ye, di
karê Mizgîniyê de bi min re gelek zehmet kişandine.
[4] Hergav bi Xudan şa bibin; ez careke din dibêjim, şa bibin!
[5] Bila berbiwêriya we ji hemû mirovan re eşkere be. Xudan nêzîk
e. [6] Ji bo tu tiştî xeman nexwin. Lê belê di her tiştî de bila dax-
wazên we bi dua û lavan û bi şikirkirinê ji Xwedê re bên gotin. [7] Û
aştiya Xwedê ya ku di ser her têgihîştinê re ye, wê dilê we û hişê
we bi Mesîh Îsa biparêze.
[8] Bi kurtî birano, çi tiştê rast hebe, çi tiştê rêzdar hebe, çi tiştê
dadperwer*, çi tiştê paqij hebe, çi tiştê delal hebe, çi tiştê bi rûmet
hebe û eger tiştekî hêjabilind û tiştekî hêjayî pesindanê hebe, hûn li
ser wan bifikirin. [9] Wan tiştên ku hûn ji min hîn bûne, we ji min

---

3:17 1 Korîntî 4:16; 11:1
4:5 an jî: «Hatina Xudan nêzîk e.»

standine, we ji min bihîstine û we di jiyana min de dîtine, bikin û Xwedayê aştiyê wê bi we re be.

### *Spasdariya Pawlos ji bo Diyariya Filîpiyan*

10 Ez bi saya Xudan gelek dilşa bûm ku we piştî evqas dem ji
nû ve xema min xwar. Bi rastî, hûn li ser vê yekê difikirîn, lê we
fersend nedidît. 11 Gotina min ne li ser hewcedariyê ye, çimkî ez
hîn bûme ku ez qîma xwe bi halê xwe bînim. 12 Ez hem bi zehf-
heyînê û hem bi neyînê dizanim. Dixwazî bila ez têr bim, dixwazî
bila ez birçî bim, dixwazî bila ez di firehiyê de bim, dixwazî bila
ez di hewcedariyê de bim, ez di her rewşê û di her tiştî de sira vê
yekê hîn bûme. 13 Ez dikarim her tiştî bi destê wî yê ku hêzê dide
min, bikim. 14 Lê we qenc kir ku hûn bûn hevparên tengahiya min.
15 Ey Filîpîno, hûn bi xwe jî dizanin ku di destpêka dayîna
Mizgîniyê de, gava ku ez ji Mekedonyayê derketim, di mijara da-
nûstandinê de, ji we pê ve tu civînê hevpariya min nekir. 16 Çimkî
gava ku ez li Selanîkê jî bûm, we carek du caran tiştê ku hew-
cedariya min pê hebû, ji min re şand. 17 Ne ku ez li pey diyariyê
me, lê ez dixwazim ku qezenca hesabê we zêde bibe, yanî diyariya
we ber bide. 18 Min her tişt stand û ez di firehiyê de me. Min ew di-
yariyên ku we bi destê Êpafrodîtos şandibûn, standin û tu kêmahi-
ya min nema. Ew diyariya we pêşkêşiyeke bîhnxweş û goriyeke ku
ji aliyê Xwedê ve hatiye qebûlkirin e û li wî xweş tê. 19 Û Xweda-
yê min, wê her hewcedariya we, bi Mesîh Îsa li gor dewlemendiya
xwe ya bi rûmet bide we. 20 Rûmet her û her ji Bavê me Xwedê re
be. Amîn.

### *Silavên Aştiyê*

21 Silavan li her pîrozê Mesîh Îsa bikin. Ew birayên ku bi min
re ne, silavan li we dikin. 22 Hemû pîroz, bi taybetî jî yên ji mala
Qeyser silavan li we dikin.
23 Kerema Xudan Îsa Mesîh bi ruhê we re be.

---

**4:16** Karên Şandiyan 17:1-9; 2 Korîntî 11:9

# *Nameya Pawlos a ji Kolosiyan re*

## *Pêşgotin*

*Pawlos ev name di girtîgehekê de nivîsî. Li gor ku tê gotin, hingê ew li Efesê bû. Kolose, li Asyaya* Biçûk, li rojavayê bajarê Denizlî yê îroyîn bû. Armanca wî ew bû ku civînên bawermendên li Kolose, Lawdikya û li Hiyerapolîsê (Pamukkale) biziray bike û hîndariya Xwedê ya pêwist hînî wan bike (4:13-17).*

*Hingê li derûdora Koloseyê gelek hîndariyên şaş dihatin hînkirin. Pawlos hê neçûbû Koloseyê, lê wî dixwest ku bi vê nameyê riya rast nîşanî bawermendan bide û hemûyan hîn bike ku tenê Mesîh xilasiya temam aniye.*

*Her çiqas nameyên Efesiyan û Kolosiyan bimînin hev jî, mijarên wan ên bingehî cihê ne.*

*Ev name dikare bi vî awayî bê beşkirin:*

*I. Silav 1:1-2*
*II. Dua Pawlos 1:3-14*
*III. Mesîh serê hemû afirandinê ye 1:15-23*
*IV. Xizmeta Pawlosê Şandî 1:24-2:5*
*V. Bersîva li ser hîndariyên pûç 2:6-23*
*VI. Jiyana nû ya bi Mesîh 3:1-17*
*VII. Têkiliyên nav malê 3:18-4:1*
*VIII. Şîretên dawî û xatir 4:2-18*

### *Silav*

1 Ji Pawlosê* ku bi daxwaza Xwedê, Şandiyê Mesîh Îsa ye û ji birayê me Tîmotêyos*,
2 ji pîroz* û ji birayên dilsoz ên ku bi Mesîh re ne û li Koloseyê ne:
Ji Bavê me Xwedê, kerem û aştî li ser we be.

### *Spasî û Dua*

3 Gava ku em ji bo we dua dikin, em ji Xwedê, ji Bavê Xudanê
xwe Îsa Mesîh re hergav şikir dikin. 4 Çimkî me li ser baweriya*
we ya bi Mesîh Îsa û hezkirina we ya ji bo hemû pîrozan bihîst.

[5] Ev, ji hêviya ku li ezmanan hilanî ye tê. We ev hêvî berê di pey-
va* rastiyê de, di Mizgîniya ku gihîştiye we de bihîst. [6] Ev Mizgînî
wek ku di hemû dinyayê de ber dide û mezin dibe, ji roja ku we
bihîstiye û kerema Xwedê bi hemû rastiya wê ve fêm kiriye û vir
ve, di nav we de jî ber dide û mezin dibe. [7] Hûn vê ji xizmethevalê
me yê hezkirî Êpafras* hîn bûn. Ew ji bo we jî xizmetkarekî Mesîh
ê dilsoz e. [8] Wî jî hezkirina we ya ji aliyê Ruh ve, ji me re got.

[9] Ji ber vê yekê, ji roja ku me ev bihîstiye û vir ve, me dev ji
duakirin û xwestina ji bo we bernedaye, da ku hûn bi hemû şeh-
rezayî û têgihîştina ruhanî, daxwaza Xwedê tam bizanin [10] û bi
awayekî ku hêjayî Xudan e rêve herin, hûn bi her awayî li wî xweş
bên, di her karê qenc de ber bidin û di naskirina Xwedê de bi-
gihîjin. [11] Wusa ku hûn li gor hemû hêza wî ya ku ji karîna wî ya bi
rûmet tê, xurt bibin, her tiştî bi bîhnfirehî ragirin* û bi şahî [12] ji
Bav* re şikir bikin. Wî têrêkirin daye me, ku em di ronahiyê de
bibin hevparê mîrasa pîrozan. [13] Wî em ji desthilatiya tariyê rizgar
kirin û em derbasî Padîşahiya Kurê xwe yê hezkirî kirin. [14] Rizgarî,
yanî lêbihûrtina gunehên me bi wî ye.

### *Mesîh Serê Hemû Afirandinê Ye*

[15] Ew, sûretê Xwedayê ku nayê dîtin,
Nixuriyê hemû afirînê ye.
[16] Çimkî hemû tiştên li erdê û li ezmanan,
Tiştên ku tên dîtin û nayên dîtin,
Dixwazî bila text, dixwazî bila hukumdarî
Dixwazî bila serwerî, dixwazî bila desthilatî be,
Bi saya wî hatin afirandin;
Her tişt bi saya wî û ji bo wî hat afirandin.
[17] Ew bi xwe beriya her tiştî ye
Û her tişt bi wî bi hev ve girêdayî ye.
[18] Ew serê bedenê, yanî serê Civînê* ye,
Destpêk û nixuriyê ji nav miriyan e,
Da ku di her tiştî de ew yê pêşî be.
[19] Çimkî li Xwedê xweş hat ku
Hemû tijetiya wî di şexsê wî de be,

---

**1:14** Efesî 1:7 **1:15** Filîpî 2:6; Yûhenna 17:5 **1:18** Efesî 1:22-23

[20] Û bi wî her tiştî,
Hem tiştên li ser erdê,
Hem jî yên li ezmanan,
Bi xwe re li hev bîne
Û bi xwîna wî ya ku li ser xaçê rijayî aştiyê çêke.
[21] Hûn jî demekê bi kirinên xwe yên xerab di fikrên xwe de ji
Xwedê re xerîb û dijmin bûn. [22] Lê niha wî hûn bi mirina Mesîh a
di bedenê de, bi xwe re li hev anîn, da ku we li ber xwe pîroz, bê-
leke û bêqusûr derxe. [23] Tenê hûn di baweriyê* de hîmgirtî bin û
veneleqin û ji hêviya Mizgîniya ku we bihîst nelebitin. Ev Mizgînî
ji hemû afirînên li ser rûyê erdê re hatiye dayîn û ez Pawlos bûm
xizmetkarê wê.

### *Xizmeta Pawlos a ji Bawermendan re*

[24] Ez niha bi cefayên ku ez ji bo we dikişînim, şa dibim û wan
tengahiyên Mesîh ên ku mane, di bedena xwe de ji bo Bedena wî
ya ku Civîn e, temam dikim. [25] Ez ji wê Civînê re bûm xizmetkar,
li gor wî karê ku Xwedê ji bo we spartiye min, da ku ez peyva
Xwedê, [26] yanî wê sira ku ji dem û nifşên* berê ve hatiye veşartin,
lê niha ji pîrozên wî re hatiye eşkerekirin, bi tevahî bêjim. [27] Xwe-
dê xwest ku bi pîrozên xwe bide zanîn ku dewlemendiya rûmeta vê
sirê di nav miletan de çiqas mezin e. Ev sir ew e ku Mesîh di dilê
we de ye; ew hêviya gihîştina rûmetê ye. [28] Îcar em wî didin bi-
hîstin, em şîretan li her kesî dikin û bi hemû şehrezayiyê her kesî
hîn dikin, da ku em her kesî di yekîtiya Mesîh de gihîştî pêşkêş
bikin. [29] Ji bo vê yekê ez li gor hemû hêza wî ya ku di hundirê min
de dixebite, xeptûlept û tekoşînê* dikim.

2 Ez dixwazim ku hûn bizanin ez çiqas ji bo we, ji bo yên ku li
Lawdikyayê ne û ji bo hemûyên ku rû bi rû ez nedîtime te-
koşînê dikim. [2] Ez dixwazim ku dilê wan bê handan* û ew di hez-
kirinê de bibin yek, da ku bigihîjin dewlemendiya têgihîştina bêkê-
mahî û sira Xwedê ya ku Mesîh e, bizanin. [3] Di şexsê wî de hemû
xezîneyên zanîn û şehrezayiyê veşartî ne. [4] Ez vê yekê dibêjim, da
ku tu kes we bi peyvên devnermiyê nexapîne. [5] Çimkî her çiqas ez

---

1:20 Efesî 2:16    2:1 Peyxama Yûhenna 1:11; 3:14

bi bedenê ne li ba we bim jî, dîsa ez bi ruh bi we re me û ez bi dîtina serûberî û baweriya* we ya qayîm a bi Mesîh şa dibim.

### *Jiyana bi Mesîh*

[6] Îcar we çawa Xudan Mesîh Îsa qebûl kiribe, wusa bi wî re
girêdayî rêve herin. [7] Bi wî ve ra* bidin û ava bibin; wek ku hûn
hatine hînkirin, di baweriyê de qayîm bibin û bila şikirdariya we
zêde bibe.
[8] Hay ji xwe hebin, bila tu kes we bi felsefe û xapandina pûç li
gor adetên mirovan dîl negire. Ew li gor hêzên ruhî yên vê dinyayê
ne, ne li gor Mesîh in. [9] Çimkî hemû tijetiya Xwedêtiyê bi bedenî
di Mesîh de ye. [10] Ew serê her serwerî û desthilatiyê ye û hûn bi wî
temam bûne. [11] Hûn bi wî sinet* bûn, ne bi sineta ku bi dest hatiye
kirin, lê ji aliyê Mesîh ve hûn hatine sinetkirin û we bedena xwe ya
gunehkar ji xwe kiriye. [12] Di imadê* de hûn bi wî re hatin veşartin
û di imadê de hûn bi wî re hatin rakirin jî, çimkî we baweriya xwe
bi qeweta Xwedayê ku ew ji nav miriyan rakir, anî. [13] Û çaxê hûn
hê di nav neheqiyan û di beden û dilê xwe yê sinetnebûyî de mirî
bûn, Xwedê hûn bi Mesîh re vejandin û li hemû sûcên me bihûrt.
[14] Seneda deynên me ya ku bi qeydeyan li hember me bû, xîş kir, li
xaçê xist û ji holê rakir. [15] Bi vê yekê wî serwer û desthilatî bêçek
kirin û li ser xaçê li hember wan bi serfirazî bi ser ket, bi eşkereyî
wî ew raxistin ber çavan.
[16] Loma bila tu kes di pirsa xwarin, an vexwarin, an cejin, an
meha nû, an jî roja* Şemiyê de, we dadbar* neke. [17] Evên ha siya
wan tiştên ku wê bên in, lê ya rast Mesîh e. [18] Nebe yekî ku ji nefs-
biçûkiya qelp û perizîna* milyaketan, ji dîtiniyên* ku dîtine û ji
quretiya pûç a aqilê xwe yê dinyayî hez dike, we ji xelata we bike.
[19] Yên weha xwe bi Serî ve nagirin. Bi wî Seriyî tevahiya bedenê,
bi movik û pêgirêkan girêdayî tê xweyîkirin û bi mezinbûna ji
Xwedê, mezin dibe.
[20] Madem hûn bi Mesîh re li hember hêzên ruhî yên vê dinyayê
mirine, nexwe çima hûn weha dijîn, wek ku hûn ên vê dinyayê ne,
hûn li gor wan rêz û tertîban dikin, ku dibêjin: [21] «Vê negire, vê

---

**2:12** Romayî 6:4 **2:13** Efesî 2:1-5 **2:14** Efesî 2:15
**2:16** Romayî 14:1-6 **2:19** Efesî 4:16

tam neke, dest bi vê nede!» 22 Evên ha hemû bi karanînê dirizin û
diçin, ew li gor emir û hînkirina mirovan in. 23 Rast e, di dîndariya
ji ber xwe çêkirî, di nefsbiçûkiya qelp û di eziyetkirina bedenê de
ev wek şehrezayiyê tên dîtin, lê ji bo rawestandina xwestekên
nefsê tu qîmeta wan tune.

## *Jiyana Nû ya bi Mesîh*

3 Eger hûn bi Mesîh re hatibin rakirin, li tiştên li jor bigerin. Li
wê derê Mesîh li milê Xwedê yê rastê rûniştiye. 2 Ne tiştên li
ser rûyê erdê, lê tiştên li jor bifikirin. 3 Çimkî hûn mirin û jiyana
we bi Mesîh re li ba Xwedê hilanî ye. 4 Çaxê Mesîh ê ku jiyana we
ye xuya bibe, hûn jî, hûnê hingê bi wî re di rûmetê de xuya bibin.
5 Loma xwestekên xwe yên dinyayî, fuhûşî, pîsîtî, şehwet,
xwesteka xerab û çavbirçîtiya ku pûtperestî* ye, bikujin. 6 Ji ber
van xezeba Xwedê tê ser wan ên ku bi ya wî nakin. 7 Demekê gava
ku hûn di van tiştan de rêve diçûn, we jî dema xwe bi wan derbas
dikir.
8 Lê niha hûn van hemûyan, xezebê, hêrsbûnê, xerabiyê, bux-
tanê û devpîsîtiyê ji xwe bavêjin. 9 Derewan li hev nekin, çimkî we
mirovê kevin bi kirinên wî ve ji ser xwe avêtiye û 10 we mirovê nû,
yê ku ji bo zanîna temam li gor sûretê Afirandarê xwe tê nûkirin, li
xwe kiriye. 11 Êdî Yewnanî* û Cihû, sinetkirî û sinetnekirî, Îskît û
hovên din, xulam û azad tune; lê belê Mesîh her tişt e û bi her kesî
re ye.
12 Îcar wek bijartiyên Xwedê yên pîroz û hezkirî, hûn dilovanî,
qencî, nefsbiçûkî, nermî û bîhnfirehiyê li xwe bikin. 13 Li hember
hev bîhnfireh bin, eger gazina yekî ji yê din hebe, çawa ku Xudan
li we bihûrtiye, hûn jî wusa li hevdû bibihûrin. 14 Îcar li ser van he-
mûyan hezkirina ku girêdana bêkêmahîtiyê ye li xwe bikin. 15 Bila
aştiya Mesîh di dilê we de serwer be. Hûn wek endamên bedenekê
ji bo vê aştiyê hatine gazîkirin û şikirdar bin. 16 Bila peyva Mesîh
bi hemû dewlemendiya xwe ve, di dilê we de cih bigire. Bi hemû
şehrezayiyê hevdû hîn bikin, şîretan li hev bikin; bi gotina Zebû-
ran, lavije* û stranên ruhanî, di dilê xwe de bi şikirdarî ji Xwedê re

---

**3:1** Zebûr 110:1 **3:9** Efesî 4:22 **3:10** Efesî 4:24; Destpêkirin 1:26
**3:12-13** Efesî 4:2 **3:13** Efesî 4:32

bistrînin. 17 Her tiştê ku hûn dikin, bi gotinê be an bi kirinê be, bi
navê Xudan Îsa bikin û bi saya wî ji Bav Xwedê re şikir bikin.

### *Têkiliyên nav Malê*

18 Jinno, bi awayê ku hêjayî Xudan e, bi ya mêrê xwe bikin
19 Mêrno, bila her kes ji jina xwe hez bike û bi wê re ne hişk be.
20 Zarokno, di her tiştî de serî li ber dê û bavê xwe deynin,
çimkî ev li Xudan xweş tê. 21 Bavno, zarokên xwe neêşînin, da ku
cesareta wan neşkê.
22 Xulamno, di her tiştî de serî li ber mîrzayên xwe yên li ser
dinyayê deynin. Vê jî, ne ji bo ku hûn li ber çavê mirovan xweş
bên dîtin, lê belê bi hemû dilê xwe û bi tirsa Xudan bikin.
23 Hûn her çi bikin, wek ku hûn ne ji mirovan re, lê ji Xudan re
dikin, bi dil û can bikin. 24 Hûn dizanin xelata ku mîras e, hûnê ji
Xudan bistînin. Çimkî hûn ji Xudan Mesîh re xizmetê dikin. 25 Lê
yê ku neheqiyê dike, ewê wê neheqiya ku kiriye bistîne û xatir-
girtin tune.

4 Mîrzano, ji xulamên xwe re bi edalet û wekhevîparêz bin; hûn
dizanin ku li ezmên mîrzayekî we jî heye.

### *Dua û Şîret*

2 Hergav xwe bidin duayê û bi şikirdariyê di duayê de hişyar
bimînin. 3 Bi vê yekê re ji bo me jî dua bikin, da ku Xwedê ji bo
peyvê deriyekî li ber me veke, ku em sira Mesîh a ku ez di ber wê
de di girtîgehê de me, bêjin. 4 Û dua bikin, da ku wek ji min re
pêwist e ku ez bêjim, ez vê sirê bi zelalî eşkere bikim.
5 Li hember yên ku ji baweriyê der in, bi şehrezayî rêve herin û
ji fersenda vê demê îstifade bikin. 6 Bila peyva we, wek ku bi xwê
hatiye terbiyekirin, herdem bi keremdarî be, wusa ku hûn bizanin
ka divê çawa hûn bersîva her kesî bidin.

---

**3:16-17** Efesî 5:19-20
**3:18** Efesî 5:22; 1 Petrûs 3:1
**3:19** Efesî 5:25; 1 Petrûs 3:7
**3:20** Efesî 6:1
**3:21** Efesî 6:4
**3:22-25** Efesî 6:5-8
**3:25** Dubarekirina Şerîetê 10:17; Efesî 6:9
**4:1** Efesî 6:9
**4:5** Efesî 5:16

### *Silav û Xatir*

7 Birayê hezkirî Tixîkos* ê ku xizmetkarekî dilsoz û di ye-
kîtiya Xudan de xizmethevalê min e, wê her tiştê min ji we re bêje.
8 Ji bo ku hûn tiştên li ser me bizanin û ew hanê bide dilê we, ez wî
dişînim ba we. 9 Ez bi wî re, birayê hezkirî û dilsoz ê ku yek ji we
ye, Onîsîmos jî dişînim. Ewê li ser hemû tiştên vir ji we re bêjin.
10 Erîstarxosê* ku bi min re girtî ye û xwarziyê Barnabas Mar-
qos* jî silavan li we dikin. We di derheqê Marqos de emir stand,
eger ew bê ba we, wî qebûl bikin. 11 Yêşûyê ku jê re Yûstos dibêjin
jî silavan li we dike. Ji wan ên ku ji bo Padîşahiya* Xwedê heval-
karên min in, evên ha bi tenê ji nav Cihûyan in û ew ji min re bûn
han. 12 Êpafrasê* ku yek ji we ye û xulamê Mesîh Îsa ye, silavan li
we dike. Ji bo ku hûn di her daxwaza Xwedê de bêkêmahî û tam bi
piştrastî bisekinin, ew hergav bi xîretkêşî ji bo we dua dike. 13 Ez ji
bo wî şahidiyê dikim ku hem ji bo we û hem ji bo yên li Lawdikya
û Hiyerapolîsê gelek kedê dide. 14 Hekîmê* hezkirî Lûqa* û Dî-
mas* silavan li we dikin.
15 Li birayên ku li Lawdikyayê ne, li Nîmfayê û civîna li mala
wê silavan bikin. 16 Piştî ku ev name di nav we de hat xwendin,
wusa bikin ku li civîna Lawdikyayê jî bê xwendin û nameya ku wê
ji Lawdikyayê bidin we, hûn jî bixwînin. 17 Ji Arxîpos re bêjin:
«Hay jê hebe da tu wê xizmeta ku te ji Xudan standiye, pêk bînî.»
18 Ez Pawlos, vê silavê bi destê xwe dinivîsim. Bînin bîra xwe
ku ez girêdayî me. Kerem li ser we be.

---

**4:9** Filêmon 1:10
**4:15-16** Peyxama Yûhenna 1:11; 3:14
**4:17** Filêmon 1:2

# *Nameya Pawlos a pêşî ji Selanîkiyan re*

### *Pêşgotin*

*Selanîk paytextê Mekedonyayê bû. Pawlos di gera xwe ya diduyan de çû wir. Gava ku peyva Xwedê belav dikir ew rastî êrîşên giran hat û mecbûr bû ku ji bajêr derkeve (Karên Şandiyan 17:1-10). Beriya ku Pawlos derkeve, civîneke bawermendan hatibû avakirin. Lê belê ev bawermendên ha, hê ji serî ve bê rêber bûn. Pawlos gelek xema vê yekê dixwar, loma hê gava ku li Atînayê bû, Tîmotêyos şand ba wan (1 Selanîkî 3:1-2) û demekê bi serê xwe ma (Karên Şandiyan 17:15-16). Tîmotêyos, piştî ku rêwîtiya xwe qedand û vegeriya Korîntê, ji civîna Selanîkê xeberên şahiyê anîn (1 Selanîkî 3:6; Karên Şandiyan 18:5).*

*Bawermendên Selanîkê, li hember hemû zordarî û êrîşan ji baweriya xwe gav bi şûn de navêtin. Çiqas dihat ew di yekîtiya Mesîh de xurt dibûn û Mizgînî belav dikirin. Lê belê dixwestin ku hin tiştan ji Pawlos hîn bibin, bi taybetî jî li ser hatina diduyan a Îsa Mesîh. Pawlos nameya xwe ya pêşî ji Korîntê ji Selanîkiyan re nivîsî (Karên Şandiyan 18:11).*

*Ev name dikare bi vî awayî bê beşkirin:*

*I. Silav 1:1*
*II. Razîbûn û spasî 1:2-3:13*
*III. Jiyana ku bi dilê Xwedê ye 4:1-12*
*IV. Hîndariya li ser hatina Îsa 4:13-5:11*
*V. Şîret û gotinên dawî 5:12-28*

### *Silavkirin*

1 Ji Pawlos*, Sîlas* û Tîmotêyos*,
ji civîna* bawermendan a Selanîkiyan re, ya ku bi Bav Xwedê
û bi Xudan Îsa Mesîh e:
Kerem û aştî li ser we be.

### *Baweriya Qenc a Selanîkiyan*

2 Em hergav ji bo we hemûyan ji Xwedê re şikir dikin û di nav
duayên xwe de bê rawestin we tînin bîra xwe. 3 Em li ber Bavê

xwe Xwedê kirinên we yên ji baweriya* we, keda we ya ji hezki-
rinê û semaxa* we ya ji hêviya ku bi Xudanê me Îsa Mesîh e, tînin
bîra xwe. 4 Ya birayên ku hezkiriyên Xwedê ne, em dizanin ku wî
hûn bijartin, 5 çimkî Mizgîniya me ne tenê bi peyvê*, lê belê bi hê-
zê, bi Ruhê* Pîroz û bi piştrastiyeke mezin gihîşt we. Hûn dizanin
ku em ji bo we, di nav we de mirovên çawa bûn. 6 Û hûn bûn miro-
vên ku mîna me û mîna Xudan dikin; we di nav gelek tengahiyan
de bi şahiya Ruhê Pîroz peyv qebûl kir. 7 Bi vî awayî hûn ji bo
hemû bawermendên Mekedonya û Axayayê* bûn mînak. 8 Çimkî
peyva Xudan ji nav we derket û ne bi tenê di nav Mekedonya û
Axayayê de belav bû, lê belê baweriya we ya bi Xwedê gihîşt her
cihî, wusa ku êdî ne hewce ye ku em tiştekî ser ve zêde bikin.
9 Çimkî ew li ser me dibêjin, ka we çawa em qebûl kirine û çawa
hûn ji pûtan li Xwedê vegeriyane, ku hûn xulamtiyê ji Xwedayê
jîndar û rast re bikin 10 û li hêviya hatina Kurê wî ya ji ezmanan
bin. Ev, ew Îsa ye, yê ku Xwedê ew ji nav miriyan rakiriye û ew e
yê ku me ji xezeba ku tê xilas dike.

### *Karê Pawlos li Selanîkê*

2 Birano, hûn bi xwe jî dizanin ku hatina me ya ba we ne ba-
dîhewa bû. 2 Lê bi ser ku me pêşî li Filîpyayê cefa kişand û em
hatin riswakirin jî, dîsa me ji Xwedayê xwe cesaret stand ku em di
nav gelek dijraberiyê de, Mizgîniya Xwedê ji we re bêjin. 3 Çimkî
hêvîkirina me ne ji xeletiyê, ne ji nepakiyê û ne jî bi hîleyê ye. 4 Lê
belê çawa ku em ji aliyê Xwedê ve hatin erêkirin ku ew Mizgîniyê
bispêre me, em wusa dipeyivin. Em ne li gor dilê mirovan, lê li gor
daxwaza wî Xwedayê ku dilê me diceribîne dipeyivin. 5 Wek ku
hûn dizanin, me tu caran di gotinên xwe de zimanhilûtî* nekiriye û
ne jî em bi niyeta çavbirçîtiyê peyivîne. Xwedê şahidê me ye! 6 Ji
ber ku em Şandiyên* Mesîh bûn, me dikarî em giraniya xwe li ser
we deynin. Lê em ji mirovan li rûmeta xwe negeriyan, ne ji we û
ne jî ji yên din; 7 Lê belê wek ku dayikeke zaroşîr zarokên xwe
xweyî dike, me xwe di nav we de nerm kir. 8 Em bi hezkirineke
wusa bi we ve hatibûn girêdan ku êdî me dixwest em ne bi tenê
Mizgîniya Xwedê bidin we, lê jiyana xwe jî bi we re leva* bikin,

---

**1:6** Karên Şandiyan 17:5-9 **2:2** Karên Şandiyan 16:19-24; 17:1-9

çimkî hûn bûbûn hezkiriyên me. [9] Birano, bêguman ew ked û zeh-
metê me tê bîra we; çaxê ku me Mizgîniya Xwedê ji we re dida,
em şev û roj dixebitîn, da ku em ji kesek ji we re nebin bargiranî.
[10] Hûn bi xwe şahid in û Xwedê jî şahid e, ku em bi we bawer-
mendan re çawa bi awayekî paqij, rast û bêqusûr, rabûn û rûniştin.
[11] Hûn qenc dizanin, çawa ku bav bi zarokên xwe re dide û distîne,
me wusa bi her yekî ji we re da û stand. [12] Me hûn şidandin, em di
ber dilê we de hatin û em li ser sekinîn, ku hûn hêjayî wî Xwedayê
ku hûn gazî Padîşahî û rûmeta xwe kirine, rêve herin.
[13] Û ji bo vê yekê jî em bê rawestin şikir ji Xwedê re dikin ku
çaxê we ji me peyva Xwedê bihîst, we ew ne wek peyva mirovan,
lê wek peyva Xwedê qebûl kir. Bi rastî jî wusa ye, ev jî di nav we,
bawermendan de dixebite. [14] Çimkî birano, hûn jî ketin eynî rewşa
wan civînên bawermendan ên Xwedê yên ku li Cihûstanê* bi Me-
sîh Îsa ne, we jî eynî cefa ji destê miletê xwe kişand, wek ku wan ji
destê Cihûyan kişand. [15] Wan hem Xudan Îsa, hem jî pêxember*
kuştin û tengahî dan me jî. Xwedê ji wan ne razî ye û ew dijra-
berên hemû mirovan in. [16] Ew ji me re dibin asteng, da ku em ji
miletan re Mizgîniyê nedin, ku ew xilas bibin. Bi vî awayî ew
hergav kasa gunehên xwe tije dikin û êdî heta dawiyê ew di bin
xezebê de ne.

### *Xemxwarina ji bo Selanîkiyan*

[17] Lê birano, heçî em in, em ji bo demeke kurt ji we hatin
veqetandin – ne ku dilê me, lê rûyê me ji hev dûr ket – û me bi
daxwazeke mezin xîretkêşî kir ku em rûyê we bibînin. [18] Ji bo vê
yekê me dixwest ku em bên ba we, ez Pawlos, min bi xwe jî çend
caran xwest ku ez bêm, lê Îblîs ji me re bû asteng. [19] Ma di hatina
Xudanê me Îsa de, li ber wî, hêviya me an şahiya me an taca me ya
pesindanê çi ye? Erê, ma ne hûn in? [20] Çimkî, rûmet û şahiya me
hûn in.

3 Ji bo vê yekê êdî me nikaribû em xwe bigirin. Me qîma xwe
anî ku em li Atînayê bimînin tenê [2] û me Tîmotêyosê ku birayê
me ye û di dayîna Mizgîniya Mesîh de hevalkarê Xwedê ye, şand

2:14 Karên Şandiyan 17:5 3:1 Karên Şandiyan 17:15

ba we, da ku di baweriyê de we qayîm bike û cesaretê bide we, 3 da
ku di van tengahiyan de tu kes veneleqe. Hûn bi xwe dizanin ku
em ji bo vê yekê hatine hilbijartin. 4 Û çaxê em li ba we bûn, me ji
pêşî ve ji we re gotibû ku emê tengahiyan bikişînin û wek ku hûn
dizanin wusa jî çêbû. 5 Ji bo vê yekê, êdî min nikaribû ez xwe
bigirim, min Tîmotêyos şand ku ez baweriya we bizanim. Nebe ku
Yê Diceribîne hûn ceribandibin û keda me badîhewa çûbe.

6 Lê niha Tîmotêyos ji ba we vegeriya û Mizgîniya bawerî û
hezkirina we da me. Wî got ku we hergav bi qencî em dianîn bîra
xwe û wek ku em bêriya we dikin, hûn jî wusa bêriya me dikin.
7 Ji bo vê yekê birano, di nav hemû zehmet û tengahiyên me de, bi
baweriya we, dilê me li ser we rihet bû. 8 Madem ku hûn bi Xudan
nelebte ne, êdî em dijîn. 9 Ma ji bo hemû şahiya ku em ji bo we li
ber Xwedayê xwe pê şa dibin, em dikarin ji bo we çi şikiriyê bidin
Xwedê? 10 Em şev û roj bi dil û can dua dikin, da ku em rûyê we
bibînin û kêmahiyên baweriya we temam bikin.

11 De bila Bavê me Xwedê bi xwe û Xudanê me Îsa berê riya
me bide we. 12 Û ka çawa hezkirina me ji bo we zêde ye, bila Xu-
dan hezkirina we ji bo hevdû û ji bo hemûyan mezin û zêde bike,
13 da ku dilê we xurt bike, ku çaxê Xudanê me Îsa bi hemû pîro-
zên* xwe ve bê, hûn li ber Bavê me Xwedê di pîroziyê de bêkê-
mahî bin.

### *Jiyana ku li Xwedê Xweş Tê*

4 Ji vê pê ve birano, hûn ji me hîn bûn ku divê hûn çawa rêve
herin, da ku hûn li Xwedê xweş bên, çawa ku hûn rê ve diçin
jî. Em bi navê Xudan Îsa ji we hêvî dikin û we dişidînin ku hûn di
vê yekê de hê bêtir pêşve herin. 2 Hûn dizanin ku me ji aliyê Xu-
dan Îsa ve çi tembîh dane we. 3 Çimkî daxwaza Xwedê ev e: Ku
hûn pîroz bibin, yanî hûn xwe ji fuhûşê bidin paş; 4-5 ne wek mi-
letên ku Xwedê nas nakin di xwestekên şehwetê de, lê bila her yek
ji we bizane ku di paqijî û şîrhelaliyê de li bedena xwe bibe xweyî.
6 Û di vê yekê de tu kes heqê birayê xwe nexwe û li hember wî sûc
neke. Wek ku me pêşî ji we re got û tembîh li we kir, Xudan ji bo
van hemû tiştan heyfê hiltîne. 7 Çimkî Xwedê ne ji bo pîsîtiyê, lê ji

---

**3:6** Karên Şandiyan 18:5

bo pîroziyê gazî me kiriye. 8 Îcar yê ku vê yekê red dike, ew ne
mirov red dike, lê ew wî Xwedayê ku Ruhê xwe yê Pîroz dide we,
red dike.
9 Lê ji bo biraheziyê, hewcedariya we tune ku em ji we re
binivîsin, çimkî hûn bi xwe ji aliyê Xwedê ve hatine hînkirin, ku
hûn ji hevdû hez bikin. 10 Ji xwe hûn vê yekê ji bo hemû xwişk û
birayên ku li seranserê Mekedonyayê ne, dikin. Lê xwişk û birano,
em hêvî ji we dikin ku hûn di vê yekê de hê bêtir pêşve herin.
11 Bixebitin ku jiyana we bêpêjin be û wek ku me tembîh li we kir,
hûn bi xebata xwe ve mijûl bibin û bi destên xwe bixebitin, 12 da
ku hûn li hember yên ku li derve ne, bi awayekî serfiraz rêve herin
û hewcedarê tiştekî nebin.

### *Vegerîna Xudan*

13 Xwişk û birano, em naxwazin ku hûn li ser yên razayî nezan
bimînin, da ku hûn wek wan ên din ên ku hêviya wan tune xemgîn
nebin. 14 Madem ku em bawer dikin Îsa mir û rabû, bi wî awayî jî
Xwedê wê wan ên ku di baweriya Îsa de razane bi wî re bîne.
15 Em vê yekê bi peyva Xudan ji we re dibêjin: Em ên ku dijîn
û heta hatina Xudan sax dimînin, em qet nakevin pêşiya yên
razayî. 16 Çimkî Xudan bi xwe wê bi gazîkirineke fermanî, bi den-
gê serekmilyaket û bi lêxistina boriya Xwedê ji ezmên bê xwar û
pêşî miriyên ku yên Mesîh in, wê rabin. 17 Piştre, em ên ku dijîn û
sax mane, emê bi wan re di ewran de bên rahiştin, da ku di hewayê
de em herin pêşiya Xudan û bi vî awayî emê her û her bi Xudan re
bin. 18 Îcar bi van peyvan di ber dilê hev de werin.

5 Lê ji bo dem û wextan birano, ne hewce ye ku em tiştekî ji we
re binivîsin. 2 Hûn bi xwe qenc dizanin, ka diz bi şev çawa tê,
Roja Xudan wê wusa bê. 3 Gava xelk dibêjin: «Dinya aştî û ewle-
darî ye», hingê wek êşa jina bizaro, helak wê ji nişkê ve bê ser wan
û qet nikarin xilas bibin. 4 Lê hûn birano, hûn ne di tariyê de ne, ku
ew roj wek dizan bi ser we de bigire. 5 Çimkî hûn hemû zarokên
ronahiyê û zarokên rojê ne. Em ne ji şevê û ne jî ji tariyê ne.

---

**4:15-17** 1 Korîntî 15:51-52 **5:2** Metta 24:43; Lûqa 12:39; 2 Petrûs 3:10
**4:13** «yên razayî» li vir bi vê manê ye: «yên mirî».

[6] Nexwe em wek ên din ranezin, lê em hişyar û li ser hişê xwe bin.
[7] Çimkî ew ên ku radizin, bi şev radizin û ew ên ku serxweş dibin,
bi şev serxweş dibin. [8] Lê ji ber ku em ji rojê ne, divê em li ser hişê
xwe bin û zirxê bawerî û hezkirinê wergirin û kumzirxê hêviya
xilasbûnê bidin serê xwe. [9] Çimkî Xwedê em ne ji bo xezebê nîşan
kirine, lê em nîşan kirine, da ku em bi Xudanê me Îsa Mesîh bigi-
hîjin xilasiyê. [10] Ew ji bo me mir, da ku, dixwazî em hişyar an jî
razayî bin, em bi wî re bijîn. [11] Ji bo vê yekê, wek ku hûn niha
dikin, di ber dilê hev de werin û hevdû ava bikin.

### *Tembîh û Silavên Aştiyê*

[12] Îcar em hêvî ji we dikin birano, bizanin ew ên ku di nav we
de dixebitin, di baweriya Xudan de serweriyê li we dikin û şîretan
li we dikin, kî ne! [13] Ji bo xebata wan ji wan hez bikin û bi zêdehî
siyaneta* wan bigirin. Bi hev re di aştiyê de bin. [14] Birano, ji bo vê
yekê em ji we hêvî dikin: Şîretan li yên ku jiyana wan bêserûber e
bikin, hanê* bidin bêziravan ji yên qels re bibin piştevan, li hem-
ber hemû mirovan bîhnfireh bin. [15] Binêrin! Tu kes di şûna xera-
biyê de xerabiyê li yekî neke, lê hergav bikevin pey qenciyê, hem
ji bo hev, hem jî ji bo hemû mirovan.

[16] Hergav şa bibin, [17] bê rawestin dua bikin, [18] di her tiştî de şi-
kir bikin, çimkî daxwaza Xwedê, bi Mesîh Îsa ji bo we ev e. [19] Ru-
hê Pîroz netemirînin. [20] Pêxemberîtiyan kêm nebînin. [21] Her tiştî ji
hev derxin, tiştê qenc hişk bigirin. [22] Xwe ji her cûreyê xerabiyê
dûr bixin.

[23] De bila Xwedayê aştiyê bi xwe we bi tevahî pîroz bike û
hemû ruhê we, canê we û bedena we ji bo hatina Xudanê me Îsa
Mesîh, bêqusûr bê parastin. [24] Ewê ku gazî we dike, dilsoz e û ewê
bike jî.

[25] Birano! Ji bo me jî dua bikin.

[26] Bi ramûsana pîroz silavan li hemû birayan bikin. [27] Ez li ber
Xudan tembîh li we dikim ku ev name, li ber hemû birayan bê
xwendin.

[28] Kerema Xudanê me Îsa Mesîh li ser we be.

---

5:8 Îşaya 59:17; Efesî 6:13-17
5:10 «hişyar an razayî» li vir bi vê manê ye: «zindî an mirî».

# *Nameya Pawlos a diduyan ji Selanîkiyan re*

### *Pêşgotin*

*Piştî girtina nameya pêşî, di nav bawermendên di Selanîkê de hê pirsên li ser hatina Îsa Mesîh a diduyan hebûn. Di vê nameyê de, Pawlos li ser van pirsan radiweste û wan dişidîne ku heta hatina Îsa jiyaneke bi rêz û bi pergal bijîn. Pawlos ji bawermendan dixwaze ku hişk bi baweriya xwe ve girêdayî bimînin, li hember zor û zehmetan ji biryara xwe bi şûn de venegerin (1:4, 6-7).*

*Ev name dikare bi vî awayî bê beşkirin:*

*I. Silav 1:1-2*
*II. Razîbûn û cesaretdan 1:3-12*
*III. Hînkirina li ser hatina Mesîh 2:1-17*
*IV. Şîretên li bawermendan 3:1-15*
*V. Gotina dawî 3:16-18*

### *Silav*

1 Ji Pawlos*, Sîlas* û Tîmotêyos*,
ji civîna* bawermendan a Selanîkiyan re, ya ku bi Bavê me
Xwedê û bi Xudan Îsa Mesîh e:
2 Ji Bav Xwedê û ji Xudan Îsa Mesîh, kerem û aştî li ser we be.

### *Vegerîna Îsa û Dîwana Dawî*

3 Ya birano, em deyndar in, ku hergav ji bo we ji Xwedê re
şikir bikin. Û ev yek li cih e jî, çimkî baweriya* we gelek mezin
dibe û hezkirina her yekî ji we ji bo hevdû zêde dibe. 4 Wusa ku
em bi xwe jî di nav civînên Xwedê yên bawermendan de, ji bo
semax* û baweriya we ya li hember wan hemû cefa û tengahiyên
ku hûn dikişînin, pesnê xwe bi we didin. 5 Ev yek nîşana dîwan-
kirina* Xwedê ya dadperwer* e. Wusa ku hûn hêjayî Padîşahiya*
Xwedê bin, ya ku hûn di ber de tengahiyê dikişînin. 6 Çimkî, ev di
çavê Xwedê de rast e ku tengahiyê bide wan ên ku tengahiyê didin
we 7 û we bi me re rihet bike, hûn ên ku tengahiyê dikişînin. Ev wê
weha be: Gava Xudan Îsa bi milyaketên xwe yên bihêz ve di pêta

êgir de ji ezmên xuya bibe; [8] hingê ewê heyfê ji wan ên ku Xwedê
nas nakin û ji wan ên ku bi ya Mizgîniya Xudanê me Îsa nakin,
bistîne. [9] Ew mirov wê ji ba Xudan û ji rûmeta qeweta wî bên avê-
tin û cezayê helakbûna herheyî bikişînin. [10] Wê Rojê gava ew bê,
ewê di nav pîrozên* xwe de bê birûmetkirin û ji aliyê hemû ba-
wermendan ve bi heyranî bê dîtin. Hûn jî, hûnê di nav wan de bin,
çimkî we baweriya xwe bi şahidiya me anî.
[11] Ji bo vê yekê em hergav ji bo we dua dikin, ku Xwedayê me
we bike hêjayî vê gazîkirinê û bi hêza xwe her daxwaza we ya
qenciyê û kirinên we yên ji baweriyê pêk bîne. [12] Wusa ku li gor
kerema Xwedayê me û Xudan Îsa Mesîh, navê Xudanê me Îsa
Mesîh bi we bê birûmetkirin û hûn bi wî bên birûmetkirin.

### *Xuyabûna Mirovê Bêqanûniyê û Vegerîna Mesîh*

2 [1-2] Îcar em hêvî ji we dikin birano ku hûn ne bi ruh, ne bi go-
tinê, ne jî bi nameyeke wek ku ji me be, bi gotinên wek, «Niha
êdî Roja Xudan hatiye», li ser hatina Xudanê me Îsa Mesîh û kom-
bûna me ya li ba wî, di fikrên xwe de zû veneleqin û şaş nebin.
[3] Bila tu kes bi tu awayî we nexapîne, çimkî heta ku pêşî ew vege-
rîna ji baweriyê çênebe û ew mirovê bêqanûniyê yê ku kurê helakê
ye, eşkere nebe, ew roj nayê. [4] Ewê li hember her tiştê ku jê re
xwedê tê gotin an tê perizîn* rabe û xwe di ser her tiştî re bigire,
heta ewê di Perestgeha* Xwedê de rûne û bêje: «Ez Xwedê me.»
[5] Ma nayê bîra we gava ku ez hê li ba we bûm, min ev tiştên ha
ji we re digotin? [6] Hûn dizanin, ji bo ku ew mirov di wextê xwe de
xuya bibe, niha tiştê ku dibe asteng çi ye. [7] Çimkî ji xwe sira bê-
qanûniyê dixebite, lê yê ku niha dibe asteng wê bibe asteng heta ku
ew ji holê bê rakirin. [8] Û hingê yê bêqanûn wê xuya bibe, yê ku
Xudan Îsa wê bi hilma devê xwe wî bikuje û wê bi şewqa hatina
xwe wî helak bike. [9] Hatina yê bêqanûn wê li gor xebata Îblîs be,
wê bi hemû hêz û bi nîşan û kerametên derewîn be [10] û ji bo yên ku
helak bibin, wê bi hemû xapandina neheqiyê be; çimkî wan ji bo
xilasbûna xwe hezkirina rastiyê qebûl nekir. [11] Û ji ber vê yekê
Xwedê hêza xapandinê bi ser wan de dişîne ku baweriya xwe bi

---

**2:1** 1 Selanîkî 4:15-17 **2:4** Hezekiyêl 28:2; Daniyêl 11:36
**2:8** Îşaya 11:4 **2:9** Metta 24:24

wê derewê bînin, 12 da ku ew hemû yên ku baweriya xwe bi rastiyê
neanîne, lê kêfa wan ji neheqiyê re hatiye, bên dîwankirin.

### *Xwedê ji bo Xilasbûnê Gazî Me Kiriye*

13 Ey birayên ku ji aliyê Xudan ve tên hezkirin, em deyndar in
ku hergav ji bo we ji Xwedê re şikir bikin. Çimkî Xwedê hê ji
destpêkê ve hûn bijartin, da ku hûn bi pîrozkirina Ruh û bi baweri-
ya rastiyê xilas bibin. 14 Wî bi Mizgîniya me hûn gazî vê rizgariyê
kirin, da ku hûn bigihîjin rûmeta Xudanê me Îsa Mesîh. 15 Îcar,
madem ku wusa ye birano, nelebte bin û wê hîndariya ku bi go-
tinên me an jî bi nameyên me hûn hîn bûne, hişk bigirin.
16 Bila Xudanê me Îsa Mesîh bi xwe û Bavê me Xwedê, yê ku
ji me hez kiriye û bi keremê hana* herheyî û hêviya qenc daye me,
17 di ber dilê we de bê û we di hemû kirin û gotinên qenc de qayîm
bike.

### *Ji bo Me Dua Bikin*

3 Ji vê pê ve xwişk û birano, ji bo me dua bikin, da ku peyva*
Xudan wek ku di nav we de çêbû, zû pêşve here û bi rûmet
bibe. 2 Dua bikin, da ku em ji mirovên dijraber û xerab xilas bibin,
çimkî hin hene ku baweriya wan tune. 3 Lê Xudan dilsoz e, ewê we
qayîm bike û ji Yê Xerab biparêze. 4 Em bi saya Xudan ji we pişt-
rast in ku çi tiştên me li we tembîh kirine, hûn dikin û hûnê bikin
jî. 5 Îcar bila Xudan dilê we ber bi hezkirina Xwedê û sebira Mesîh
ve bibe.

### *Tembîha ji bo yên Bêpergal û Bêxîret*

6 Îcar birano, em bi navê Xudanê xwe Îsa Mesîh emir li we
dikin ku hûn xwe ji her birayê ku ne li gor wê hînkirina ku we ji
me standiye, lê bi awayekî bêserûber dijî, dûr bixin. 7 Hûn bi xwe
dizanin ku divê hûn bibin mîna me, çimkî em di nav we de bi
awayekî bêserûber nejiyan. 8 Me nanê belaş ji tu kesî nexwar, lê
em bi ked û zehmet şev û roj dixebitîn, da ku em ji kesekî ji we re
nebin bargiranî. 9 Ne ji ber ku desthilatiya me tunebû, lê ji bo ku
em ji we re bibin mînak, me ev kir, da ku hûn bibin mîna me.

---

**2:13** Di hin destnivîsaran de di şûna «ji destpêkê ve» de ev heye: «wek berê pêşî».

[10] Çimkî, gava ku em hê li ba we bûn, me di vê yekê de tembîh li
we dikir: «Eger yek nexwaze bixebite, bila xwarinê jî nexwe.»
[11] Niha em dibihîzin ku di nav we de hinek hene, bi awayekî bê-
serûber dijîn, tu xebatê nakin, bi ser de jî tevli karûberên yên din jî
dibin. [12] Em bi navê Xudan Îsa Mesîh emir li yên weha dikin û
wan dişidînin ku ew bêpêjin bixebitin û nanê xwe bixwin.
[13] Lê hûn, xwişk û birano, ji qencîkirinê newestin. [14] Îcar, eger
yek guhdariya gotinên me yên ku di vê nameyê de ne neke, wî
nîşan bikin û hevaltiyê bi wî re nekin, da ku şermî bibe. [15] Wî wek
dijmin nehesibînin, lê belê wek bira şîretan lê bikin.

### *Silavên Aştiyê*

[16] Îcar bila Xudanê aştiyê bi xwe, hergav û bi her awayî aştiyê
bide we. Xudan bi we hemûyan re be.
[17] Ez Pawlos, vê silavê bi destê xwe dinivîsim. Ev nîşan di her
nameya min de ye, ez weha dinivîsim. [18] Kerema Xudanê me Îsa
Mesîh li ser we hemûyan be.

# *Nameya Pawlos a pêşî ji Tîmotêyos re*

### *Pêşgotin*

*Tîmotêyos* bawermendekî xort bû, ji bajarê Lîstra yê Asyaya* Biçûk bû. Ji vê derê re îro Hatunsaray tê gotin û di nav sînorên bajarê Qonyayê de dimîne. Diya Tîmotêyos Cihû bû, belê bavê wî Yewnanî bû (Karên Şandiyan 16:1). Pawlos di gera xwe ya pêşî de, li bajarê Lîstrayê rastî Tîmotêyos hat û di gera xwe ya diduyan de ew bir ba xwe. Piştre Tîmotêyos bû hevalê wî yê xebatê û di rêza pêşî de bi wî re cih stand. Ji ber vê yekê navê Tîmotêyos gelek caran di Karên Şandiyan û di hemû nameyên Pawlos de tê gotin. Pawlos, Tîmotêyos bi kardestî şand Selanîk, Mekedonya û Korîntê.*

*Ev name di dawiya jiyana Pawlos de hatiye nivîsîn.*

*Pawlos di vê nameya xwe de diyar dike, ka Mesîh çawa ew rizgar kiriye û girîngiya duayê tîne zimên. Di nameyê de li ser karên serwer û xizmetkarên civînê jî tê gotin.*

*Ev name dikare weha bê beşkirin:*

*I. Têkiliya Pawlos û Tîmotêyos 1:1-20*
*II. Perizîn û rêkûpêkiya civînê 2:1-4:16*
*III. Serûberiya civînê 5:1-6:2*
*IV. Hişyarkirina li hember dewlemendiyê 6:2-21*

### *Silav*

1 Ji Pawlosê* ku li gor emrê Xilaskarê me Xwedê û Mesîh Îsa
yê ku hêviya me ye, Şandiyê Mesîh Îsa ye,
2 ji Tîmotêyos* re, yê ku di baweriyê* de kurê min ê rast e:
Ji Bav Xwedê û ji Xudanê me Mesîh Îsa rehm, kerem û aştî li
ser te be.

### *Hişyarkirina li hember Hînkirinên Şaş*

3 Gava ez diçûm Mekedonyayê, min tu şidandî, ku tu li Efesê
bimînî, da ku tu tembîhê bidî hinekan, ku hîndariyên dijber hîn ne-
kin 4 û xwe nedin çîrok û navnameyên malbatî yên ku dawiya wan
nayê. Ew ji pêkanîna karê Xwedê yê ku bi baweriyê* ye zêdetir,
dibin sedemê devjeniyan. 5 Lê armanca tembîhê ew hezkirin e ku ji

dilekî paqij, wijdaneke qenc û ji baweriya bêdurûtî tê. 6 Hinek, ji
van tiştan varî* bûn û ketin pey gotinên pûç. 7 Ew dixwazin bibin
mamosteyên Şerîetê*, lê ew bi xwe nizanin ku çi dibêjin û ne jî
wan tiştên ku didin pêş fêm dikin.

8 Em vê dizanin: Eger mirovek Şerîetê bi awayê rast bi kar
bîne, ew qenc e. 9 Em dizanin ku Şerîet ne ji bo yên rast tê dayîn,
lê ji bo yên neheq û serhişk, ji bo jixwedênetirs û gunehkaran, ji bo
nepaqij û nepakan, ji bo dêkuj û bavkujan, ji bo mêrkuj û 10 fu-
hûşkaran, ji bo qûngê û dizên* mirovan, ji bo derewkar û yên ku bi
derew sond dixwin û ji bo her tiştê din ê ku li hember hîndariya
saxlem radibe, tê dayîn. 11 Ev yek li gor Mizgîniya birûmet a Xwe-
dayê pîroz a ku li min hatiye spartin, weha ye.

### *Rehma Xwedê*

12 Ez ji Xudanê me Mesîh Îsa re şikir dikim ê ku hêz daye min,
çimkî wî ez dilsoz hesab kirim û ez danîm ser vê xizmetê. 13 Bi ser
ku min berê çêrî* wî dikir, ez cefaker û kustax* bûm, rehm li min
hat kirin, çimkî min di bêbaweriyê de bi nezanî kir. 14 Kerema
Xudanê me bi wê bawerî û hezkirina ku bi Mesîh Îsa ye li ser min
zêde bû. 15 Ev peyv* dilsoz e û bi her awayî hêjayî qebûlkirinê ye,
ya ku dibêje: «Mesîh Îsa hatiye dinyayê, da ku gunehkaran xilas
bike» û ji wan ê herî gunehkar ez im. 16 Lê ji bo vê yekê rehm li
min hat kirin, da ku Mesîh Îsa li ser min, serê gunehkaran, sebra
xwe ya herî mezin nîşan bide, da ku ez bibim mînaka wan ên ku
wê ji bo jiyana herheyî baweriya xwe bi wî bînin. 17 Îcar ji wî
Padîşahê herheyî yê ku namire û li çavan xuya nabe, ji Xwedayê
tenê re her û her hurmet û rûmet be! Amîn*.

18 Ey kurê min Tîmotêyos, ez li gor wan pêxemberîtiyên ku ji
pêşî ve li ser te hatibûn kirin, vê tembîhê dispêrim te, da ku tu bi
wan tekoşîna* qenc bikî 19 û baweriyê û wijdana qenc biparêzî. Hi-
nekan guh nedan dengê wijdanê, di aliyê baweriyê de xewirîn* û
çûn. 20 Hîmenayos û Skender ji van in, min ew dan destê Îblîs, da
ku ew hîn bibin çêrî Xwedê nekin.

---

**1:10** Dizên mirovan: Yên ku mirovan digirin û difiroşin, da ku wan bikin xulamên dewlemendan.

**1:13** Karên Şandiyan 8:3; 9:4-5

### *Li ser Dua û Civînê*

2 Îcar berî her tiştî ez ji we dixwazim ku ji bo hemû mirovan
lava, dua, mehder* û spasî bê kirin, 2 wusa jî ji bo padîşahan û
ji bo hemû serweran bikin, da ku em bi hemû tirsa Xwedê û bi rêz
û edeb jiyaneke bêhengame û bê teq û req bijîn. 3 Li ber Xilaskarê
me Xwedê ev qenc e û bi dilê wî ye; 4 ew dixwaze ku hemû mirov
xilas bibin û bigihîjin zanîna rastiyê. 5 Çimkî tenê Xwedayek heye
û di nav Xwedê û mirovan de jî bi tenê aştîkerek heye, ew jî Mesîh
Îsayê mirov e, 6 yê ku xwe ji bo hemûyan kir berdêl. Şahidiya ku
di wextê xwe de hatiye dayîn ev e. 7 Û ez ji bo vê yekê peyvbêj û
Şandî* hatim kifşkirin – ez rast dibêjim, ez derewan nakim – ku ez
ji miletan re bûme mamosteyê bawerî û rastiyê.

8 Loma ez dixwazim ku zilam li her derê destên xwe yên ji
guneh bêrî hildin, bê hêrs û bê gotûbêj dua bikin.

9 Bi vî awayî jî bila jin bi wergirtina xwerû, bi şerm û bi edeb
xwe bixemilînin, ne bi honandina porê xwe, bi zêr, an duran, an jî
bi cilên biha, 10 lê bi kirinên qenc, wek li wan jinan tê, yên ku eş-
kere dikin ku ew di riya Xwedê de diçin. 11 Bila jin bêdeng û tam
bi guhdanê hîn bibe. 12 Ez destûrê nadim jinê ku hîn bike, an jî
serweriyê li mêran bike, lê bila bêdeng be. 13 Çimkî pêşî Adem*
hat afirandin û paşê Hawa. 14 Adem nehat xapandin, lê jin hat xa-
pandin û sûc kir. 15 Lê eger bi edebê di bawerî, hezkirin û pî-
roziyê* de bimîne, bi anîna zarokan wê xilas bibe.

### *Ji bo Çavdêrên Civîna Bawermendan*

3 Ev peyv dilsoz e: Eger yek ji dil çavdêriyê bixwaze, ew karekî
qenc dixwaze. 2 Îcar divê çavdêr bêqusûr be, mêrê jinek tenê
be, di hedê xwe de, sergiran, birêz, mêvanperwer û di hînkirinê de
jêhatî be, 3 ne bindestê şerabê be, ne zordar be, lê berbiwêr be, ne
şerûd be û ji peran hez neke. 4 Bila ew qenc xweyîtiyê li mala xwe
bike, edeba zarokên wî tam be û peyva xwe bi wan bide kirin.
5 Çimkî eger yek nezane xweyîtiyê li mala xwe bike, ewê çawa xe-
ma civîna* bawermendan a Xwedê bixwe? 6 Bila ew ne bawer-
mendekî nû be, da ku qure nebe û wek Îblîs neyê dîwankirin*. 7 Ji

---

**2:4** Hezekiyêl 18:23 **2:9** 1 Petrûs 3:3
**2:13-14** Destpêkirin 2:7; 2:21-22; 3:1-6

bilî vê, divê di nav yên li derve jî navê wî bi qencî derketibe, da ku
lome li wî neyên kirin û ew nekeve xefika Îblîs.

### *Ji bo Xizmetkarên Civîna Bawermendan*

[8] Wusa jî bila alîkar birêz bin, ne peyvguhêr bin, xwe nedin
vexwarina şerabê, li pey qezenca nerast nekevin, [9] bi wijdana paqij
xwediyê sira baweriyê bin. [10] Û evên ha jî bila pêşî bên ceribandin;
eger bêqusûr bin, hingê bila xizmetkariyê bikin. [11] Bi vî awayî bila
jin jî birêz bin, ne buxtanker, lê di hedê xwe de bin û di her tiştî de
dilsoz bin. [12] Bila alîkar, mêrê jinek tenê be, qenc xweyîtiyê li mala
xwe û li zarokên xwe bike. [13] Çimkî yên ku xizmetkariya qenc di-
kin, ji xwe re cihekî qenc û di wê baweriyê de, ya ku bi Mesîh Îsa
ye, cesareteke mezin qezenc dikin.

### *Sira Mezin*

[14] Ez van tiştan bi hêviya ku ezê zû bêm ba te ji te re dinivîsim,
[15] da ku eger ez bi derengî bikevim jî, tu bizanî ku divê çawa di
mala Xwedê de bê rabûn û rûniştin. Ew, Civîna* Xwedayê jîndar e
û stûn û hîmê rastiyê ye. [16] Bêguman, sira jiyana xwedayî* mezin e:

Ew di bedenê de xuya bû,
Ji aliyê Ruh ve rast hat derxistin,
Ji aliyê milyaketan ve hat dîtin,
Di nav miletan de hat danbihîstin.
Di dinyayê de hat bawerkirin
Û bi rûmet hat hilkişandin.

### *Mamosteyên Derewîn*

4 Ruh bi eşkereyî dibêje ku di demên paşê de, hinek wê ji ba-
weriyê bikevin û guh bidin ruhên xapînok û hînkirinên cinan.
[2] Ew hînkirin ji wan ên ku wijdana wan bi durûtiya derewkaran
hatiye daxdan, derdikeve. [3] Ew nahêlin ku mirov bizewicin û dix-
wazin ku mirov xwe ji wan xwarinan dûr bixin, yên ku Xwedê afi-
randine, da ku ew ji aliyê bawermend û rastîzanan ve bi şikirdarî
bên standin. [4] Her tiştê ku Xwedê afirandiye qenc e û eger bi şikir-

---

3:2-7 Tîtos 1:6-9
3:11 Weha jî tê fêmkirin: «Jinên ku xizmetkariyê dikin» (Romayî 16:1).

kirinê bê qebûlkirin, ne hewce ye tu tiştê bê redkirin, [5] çimkî ew bi
peyva Xwedê û bi duayê, pîroz dibe.

### *Xizmetkarê Qenc ê Mesîh Îsa*

[6] Eger tu van tiştan raxî ber çavên birayan, tê bibî xizmetkarekî
qenc ê Mesîh Îsa û tê bi wan peyvên baweriyê û bi hîndariya qenc
a ku tu li pey çûyî, bêyî xweyîkirin. [7] Lê xwe ji çîrokên nepak û
yên pîrejinan dûr bixe. Xwe di jiyana xwedayî* de perwerde bike.
[8] Çimkî îdmana bedenî bi kêrî hindik tiştî tê, lê jiyana xwedayî bi
kêrî her tiştî tê; soza wê hem ji bo jiyana vê dinyayê û hem jî ji bo
jiyana wê dinyayê heye. [9] Ev peyv dilsoz e û bi her awayî hêjayî
qebûlkirinê ye. [10] Ji bo vê yekê em dixebitin û li ber xwe didin,
çimkî me hêviya xwe bi Xwedayê jîndar ve girêdaye, yê ku Xi-
laskarê hemû mirovan e, bi taybetî yê bawermendan e.
[11] Van tiştan tembîh bike û hîn bike. [12] Bila tu kes xortaniya te
kêm nebîne, lê tu di peyivînê de, di rabûn û rûniştinê de, di hez-
kirinê de, di bawerî û dilpakiyê de ji bawermendan re bibe mînak.
[13] Heta ku ez bêm, tu xwe bidê ku tu ji wan re nivîsarên pîroz bix-
wînî, şîretan li wan bikî û hîn bikî. [14] Çaxê rihspiyan destên xwe
danîn ser te, diyariyeke ruhanî bi pêxemberîtiyê ji te re hat dayîn.
Xemsariyê li wê neke! [15] Di van tiştan de xîretkêş be û xwe bide
wan, da ku pêşveçûna te ji hemûyan re eşkere be. [16] Hay ji xwe û ji
hînkirina xwe hebe. Di nav wan de berdewam bike, çimkî eger tu
wusa bikî, tê hem xwe û hem jî guhdarên xwe xilas bikî.

### *Danûstandina di nav Bawermendan de*

5 Li zilamê pîr nehile*, lê wek ku bav e, pê re bide û bistîne. Bi
yên xort re wek birayan, [2] bi jinên pîr re wek diyên xwe û bi
jinên ciwan re wek xwişkên xwe, bi hemû dilpakiyê bide û bistîne.

### *Li ser Jinebiyan*

[3] Qedrê wan jinebiyan bigire yên ku bi rastî jinebî ne. [4] Lê eger
zarok, an neviyên jinebiyekê hebin, bila ew hîn bibin ku pêşî bi
maliyên xwe re bi jiyana xwedayî bijîn û deynê dê û bavê xwe li
wan vegerînin, çimkî ev yek bi dilê Xwedê ye. [5] Ya ku bi rastî
jinebî ye û tenê maye, wê hêviya xwe bi Xwedê ve girêdaye û şev

---

5:1 Qanûna Kahîntiyê 19:32

û roj bi lava û duakirinê berdewam dike. [6] Lê ya ku xwe dide kêfê,
sax be jî mirî ye. [7] Van tiştan tembîh bike, da ku ew bêqusûr bin.
[8] Lê eger yek li mirovên xwe, bi taybetî li maliyên xwe nenêre, wî
bawerî înkar kiriye û ew ji bêbaweran jî xerabtir e.

[9] Jinebiya ku emrê wê ne di bin şêst salan re be, mêrek tenê
kiribe [10] û li ser wê bê gotin ku wê karên qenc kirine: Eger wê
zarok mezin kiribin, eger mêvan qebûl kiribin, eger lingê pîrozan
şuştibe, eger alîkariya tengezaran kiribe û li pey her karên qenc
çûbe, bila navê wê di defterê de bê nivîsîn.

[11] Lê jinebiyên ku hê ciwan in qebûl neke, çimkî gava ew bi
xwestekên xwe ji ba Mesîh tên xirandin, ew dixwazin mêr bikin
[12] û bi vî awayî ew dîwankirina xwe tînin, çimkî soza pêşî şkan-
dine. [13] Ji vê pê ve ew hîn dibin, torîtorî* mal bi mal digerin. Û ne
tenê torîtorî digerin, lê dibin pirrbêj, pozê xwe dixin xebata yên din
û tiştên ku nayên gotin dibêjin. [14] Ji bo vê yekê ez dixwazim ku ew
jinebiyên ku hê ciwan in, mêr bikin, zarokan bînin û xweyîtiyê li
malê bikin, da ku fersendê nedin neyarê baweriyê ku buxtanan
bike. [15] Çimkî ji xwe hin ji rê derketin û li pey Îblîs çûn. [16] Eger
jinebiyên jineke bawermend hebin, bila ew alîkariya wan bike û ji
civînê re nebe bar, da ku civîn bikare alîkariya wan ên ku bi rastî
jinebî mane bike.

### *Ji bo Rihspiyan*

[17] Ew rihspiyên ku serweriya qenc dikin, bi taybetî ew ên ku di
ber peyivîn û hînkirinê de zehmet dikişînin, bila du qat hêjayî
siyanetê bên dîtin. [18] Çimkî Nivîsara Pîroz dibêje: «Devê gayê ku
gêrê dike, girênede»[a] û «Pale hêjayî heqê xwe ye». [19] Heta ku ne bi
şahidiya dido an sisiyan be, sûcdariya li hember rihspiyekî qebûl
neke. [20] Li ber hemûyan dengê xwe li wan ên ku guneh dikin hilde,
da ku tirsa yên din jî hebe.

[21] Ez li ber Xwedê, li ber Mesîh Îsa û li ber milyaketên bijartî
tembîh li te dikim ku tu van tiştan bê alîgirtin biparêzî û tu tiştî ji
bo xatir nekî.

---

[a] **5:18** Ji: Dubarekirina Şerîetê 25:4

**5:18** Lûqa 10:7; Metta 10:10

**5:19** Dubarekirina Şerîetê 19:15; Metta 18:16

[22] Destê xwe bi lez daneyne ser tu kesî, ne jî bibe hevparê
gunehên hinekên din. Xwe paqij bigire.
[23] Êdî tenê avê venexwe, lê ji bo zikê xwe û ji bo nexweşiyên
xwe yên ku pirr caran tên, hinek şerab jî bixe nav.
[24] Gunehên hin mirovan kifş in û ji berî wan diçin ber dîwanê,
lê gunehên hinekan jî li pey wan tên. [25] Bi vî awayî kirinên qenc jî
kifş in û ew ên ku ne kifş in jî nabe ku veşartî bimînin.

### *Ji bo Xulaman*

6 Hemû yên ku di bin nîrê xulamtiyê de ne, bila axayên xwe tam
hêjayî hurmetê hesab bikin, da ku ji navê Xwedê û ji hîndariyê
re peyvên xerab neyên gotin. [2] Ew ên ku axayên wan bawermend
in, ji bo ku ew bira ne, bila wan kêm nebînin. Lê bila hê bêtir xiz-
metê bikin, çimkî yên ku ji vê xizmetkariyê feydê distînin, bawer-
mend û hezkirî ne.

### *Xezîna Rast*

Van tiştan hîn bike û şîret bike. [3] Eger yek tiştekî din hîn bike
û qîma xwe bi gotinên Xudanê me Îsa Mesîh ên saxlem û bi
hîndariya ku li gor jiyana xwedayî ye neyne, [4] ew qure ye û tiştekî
nizane, lê ew nexweşê gengeşî û devjeniya peyvan e. Çavnebarî,
pevçûn, buxtan, gumanên xerab [5] û devjeniyên bêrawestin ên wan
mirovên ku hişê wan xera bûye û ji rastiyê bêpar bûne, ji van tiştan
derdikevin. Ew guman dikin ku jiyana xwedayî riya qezencê ye.
[6] Lê eger bi qinyatê be, jiyana xwedayî qezenceke mezin e.
[7] Me tiştek neaniye dinyayê û em nikarin tiştekî ji dinyayê bibin jî.
[8] Lê eger xwarin û wergirtina me hebe, em bi wan razî bin. [9] Lê ew
ên ku dixwazin dewlemend bibin, dikevin ceribandinê, xefikê û
pey gelek xwestekên bêhiş û ziyanker, yên ku mirov dixewirînin*
nav helakbûn û wêranbûnê. [10] Çimkî hezkirina peran çavkaniyeke
her cûreyê xerabiyê ye. Hinekan dilê xwe birin vê yekê, ji bawe-
riyê ketin û bi gelek êşan cefa dan xwe bi xwe.

---

**5:19** 1 Tîmotêyos 4:14; Karên Şandiyan 6:6; 13:1; 2 Tîmotêyos 1:6
**6:7** Eyûb 1:21
**6:8** Gotinên Silêman 30:8
**6:9** Gotinên Silêman 23:4; 28:22

### *Tembîhên Pawlos ji bo Tîmotêyos*

11 Lê tu, ey mirovê Xwedê, ji van tiştan bireve û bikeve pey
rastî, jiyana xwedayî, bawerî, hezkirin, ragirtin* û nermiyê. 12 Te li
ber gelek şahidan şahidiya qenc da. Tekoşîna* qenc a baweriyê
bike û wê jiyana herheyî ya ku tu ji bo wê hatiyî gazîkirin bigire.
13 Li ber Xwedayê ku jiyanê dide hemû afirînan û li ber Mesîh
Îsayê ku li ber Pîlatosê* Pontiyos şahidiya qenc da, ez tembîh li te
dikim 14 ku tu vî emrî heta xuyabûna Xudanê me Îsa Mesîh bêleke
û bêqusûr bigirî. 15 Xwedê wê di wextê xwe de wî bide xuyakirin.
Ew yê Xwezikdar e, Hukumdarê tenê ye, Padîşahê padîşahan û
Xudanê xudanan e. 16 Ew bi tenê bêmirin e û di ronahiya ku tu kes
nikare nêzîk bibe de rûdine. Û ji mirovan tu kesî ew nedîtiye û ni-
kare bibîne. Hurmet û karîna herheyî ji wî re be! Amîn.

### *Tembîh ji bo yên Dewlemend*

17 Tembîh li dewlemendên vê dinyayê bike, ku bilind nefirin û
hêviya xwe bi dewlemendiya bê ewlehî ve girênedin, lê bila hêviya
xwe bi Xwedê ve girêdin, yê ku her tiştî bi zêdehî dide me, ku em
pê şa bibin. 18 Bila ew qenciyê bikin, bi kirinên qenc dewlemend
bin, merd û ji bo levakirinê* amade bin.
19 Bi vî awayî ewê ji xwe re xezîneke bicivînin ku ji bo dema
bê ji wan re bibe bingeheke saxlem, wusa ku ew jiyana rastîn bi
dest bixin.

### *Tembîhên Dawî û Silav*

20 Ey Tîmotêyos! Tiştê ku li te hatiye spartin, biparêze. Xwe ji
gotinên pûç û nepak û ji dijberiyên ku bi derew ji wan re «zanîn»
tê gotin, bide paş. 21 Hinekan ev yek dan pêş û ji baweriyê ketin.
Kerem li ser we be.

---

**6:13** Yûhenna 18:37
**6:16** Derketin 33:20
**6:17** Zebûr 62:10

# *Nameya Pawlos a diduyan ji Tîmotêyos re*

## *Pêşgotin*

*Pawlos ev nameya xwe jî gava ku li Romayê di girtîgehê de bû û li benda kuştinê bû nivîsî. Çimkî, piştî xweparastina xwe ya pêşî, wî dizanî ku ewê cezayê mirinê bistîne. Li gor ku çavkaniyên dîrokî dinivîsin, piştî demekê serê Pawlos hat jêkirin. Ev girtina Pawlos, bi awayê girtina cara diduyan jî tê zanîn. Ev name, nameya dawî ya Pawlos e. Tîmotêyos ê ku name girt, hingê li Efesê bû. Pawlos beriya ku bê girtin, li gelek deran geriya û bi civînên bawermendan û çavdêrên wan re da û stand.*

*Bi ser ku Pawlos girtî û li benda îdama xwe bû jî, ew cesaretê dide Tîmotêyos, da ku ew di riya Mesîh de bêtirs rêve here û ji bo Mesîh şahidiyê bike.*

*Wek nameya pêşî, di vê nameyê de jî Pawlos Tîmotêyos û bawermendan li hember baweriyên pûç hişyar dike (2:14-18, 23; 3:8, 13; 4:3-4).*

*Naveroka nameyê dikare bi vî awayî bê beşkirin:*

*I. Silav 1:1-2*
*II. Şîret û razîbûn 1:3-2:13*
*III. Hişyarkirin 2:14-4:8*
*IV. Planên Pawlos û silavên aştiyê 4:9-22*

### *Silav*

1 Ji Pawlosê* ku bi daxwaza Xwedê li gor soza jiyana ku bi Me-
sîh Îsa ye, Şandiyê Mesîh Îsa ye,
2 ji kurê min ê delal Tîmotêyos* re:
Ji Bav Xwedê û ji Xudanê me Mesîh Îsa, rehm, kerem û aştî li
ser te be.

### *Razîbûn û Dilşidandin*

3 Ez hergav şev û roj di duayên xwe de te tînim bîra xwe û ji
Xwedayê ku ez ji bav û kalan ve bi wijdana paqij diperizimê* re
şikir dikim 4 Ez hêstirên çavên te tînim bîra xwe û ez bêriya te

dikim, da ku dilê min tije şahî bibe. [5] Ez wê baweriya* te ya ji dil
tînim bîra xwe, ya ku pêşî di dilê dapîra te Loyîsê û diya te Evnîkê
de bû û ez piştrast im ku di dilê te de ye jî. [6] Ji bo vê yekê ez tînim
bîra te, ku tu agirê diyariya Xwedê gur bikî, ya ku bi destdanîna*
min a li ser te, ji te re hatiye dayîn. [7] Çimkî Xwedê ne ruhê tir-
sonekiyê, lê belê Ruhê karîn, hezkirin û xwegirtinê daye me. [8] Îcar
şerm neke, ku tu ji bo Xudanê me şahidiyê bikî, ne jî ji min şerm
bike, ez ê ku di ber wî de girtî me. Lê li gor hêza Xwedê, bi min re
ji bo Mizgîniyê tengahiyê bikişîne.

[9] Xwedê em xilas kirin,
Û ji bo pîroziyê gazî me kir,
Ne ji ber kirinên me,
Lê li gor mebest û kerema xwe.
Ev kerem bi destê Mesîh Îsa,
Ji beriya destpêka deman ve ji me re hat dayîn.
[10] Lê niha ew bi xuyabûna Xilaskarê me
Mesîh Îsa eşkere bû; wî mirin betal kir,
Jiyan û nemirinî bi Mizgîniyê derxist ber ronahiyê.

[11] Ez ji vê Mizgîniyê re peyvbêj, Şandî* û mamoste hatime
kifşkirin. [12] Û ji ber vê yekê jî ez vî cefayî dikişînim. Lê ez şerm
nakim, çimkî ez dizanim ku min bi kê baweriya* xwe aniye û ez
piştrast im, ewê tiştê ku spartiye min, heta wê rojê jî biparêze.
[13] Wan peyvên* saxlem ên ku te ji min bihîstine, bi bawerî û
hezkirina ku bi Mesîh Îsa ye ji xwe re bike mînak. [14] Wan tiştên
qenc ên ku li te hatine spartin, bi Ruhê* Pîroz ê ku di dilê me de
rûdine, biparêze.

[15] Tu dizanî, hemû yên ku di herêma Asyayê* de ne, dev ji min
berdan; Fûgelos û Hêrmoxênîs jî ji wan in. [16] Bila Xudan rehma
xwe li mala Onîsîforos bike, çimkî wî gelek caran dilê min rihet
kir û ji girtîbûna min şerm nekir, [17] lê gava ku hat Romayê, bi
xîretkêşî li min geriya û ez dîtim. [18] Xudan bike, ku di wê rojê de
ew rehmê ji Xudan bibîne. Tu qenc dizanî ku li Efesê wî ji min re
çiqas xizmet kir.

---

1:5 Karên Şandiyan 16:1

### *Leşkerê Îsa Mesîh yê Qenc*

2 Îcar kurê min, tu bi wê kerema ku bi Mesîh Îsa ye, bi hêz bibe.
2 Û wan tiştên ku te li ber gelek şahidan ji min bihîstine, bis-
pêre wan mirovên dilsoz ên ku wê bikarin hînî hinekên din bikin.
3 Wek leşkerekî qenc ê Mesîh Îsa bi min re tengahiyê bikişîne. 4 Yê
ku leşkeriyê dike, tevli karên vê jiyanê nabe, da ku li wî yê ku ew
gazî leşkeriyê kiriye, xweş bê. 5 Sporvanek jî heta li gor adetan
nekeve hevbezînê, çelenga serfiraziyê nastîne. 6 Û cotkarê ku
zehmet dikişîne, divê ew pêşî ji berê erdê par bistîne. 7 Li ser
bifikire ku ez çi dibêjim, çimkî Xudan wê di her tiştî de fêm-
dariyê bide te.
8 Îsa Mesîh bîne bîra xwe, yê ku ji nav miriyan hat rakirin û ji
dûndana* Dawid* e. Mizgîniya ku ez didim zanîn ev e. 9 Ji ber vê
Mizgîniyê ez wek mêrkujekî hatime girêdan û tengahiyê dikişînim,
lê belê peyva Xwedê ne girêdayî ye. 10 Loma ez ji bo xatirê bi-
jartiyan her tiştî radigirim*, da ku ew bi rûmeta herheyî bikevin wê
xilasiya ku bi Mesîh Îsa ye. 11 Ev peyv dilsoz e:

Eger em bi wî re mirine
Emê bi wî re bijîn jî.
12 Eger em ragirin,
Emê bi wî re padîşahiyê jî bikin.
Eger em wî înkar bikin,
Ew jî wê me înkar bike.
13 Eger em dilsoz nemînin jî,
Ewê dilsoz bimîne,
Çimkî ew nikare xwe bi xwe înkar bike.

### *Paleyê Ketî û Rabûyî*

14 Van tiştan bîne bîra wan û wan li ber Xwedê hişyar bike, da
ku li ser peyvan devjeniyê nekin. Feyda vê yekê tune, bi tenê guh-
daran hildiweşîne. 15 Xîretkêşiyê bike ku tu xwe karkerekî bi dilê
Xwedê û yekî ku neyê şermkirin pêşkêşî wî bikî; peyva rastiyê rast
bi kar bîne. 16 Xwe ji peyivîna nepak û pûç dûr bixe, çimkî ew ên
ku xwe dane vê yekê, wê di jiyana nepakiyê de hê pêşvetir herin

---

**2:12** Metta 10:33 **2:13** Binêre: Hijmartin 23:19

[17] û peyvên wan, wê wek penceşêrê* belav bibin. Hîmenayos û
Filîtos jî ji wan in. [18] Ew ji rastiyê derketin û dibêjin, ku vejîn* êdî
çêbûye û baweriya hinekan serobino dikin. [19] Lê belê bingeha ku
Xwedê danî, saxlem disekine û ev mor li ser e: «Xudan, yên xwe
nas dike»[a] û «Her kesê ku navê Xudan eşkere dike, bila ew xwe ji
neheqiyê dûr bixe». [20] Di maleke mezin de ne bi tenê firaxên ji zêr
û zîv hene, lê yên ji dar û ji herriyê jî hene; hinek ji bo karên bi-
rûmet û hinek jî ji bo karên bêrûmet in. [21] Îcar, eger yek xwe ji wan
tiştan paqij bike, ewê bibe firaxeke ji bo karên birûmet, pîrozkirî û
ji bo bikaranîna xwediyê xwe xweşkeys û ji bo hemû karên qenc
amade. [22] Ji xwestekên xortaniyê bireve û bi wan ên ku ji dilekî
paqij gazî Xudan dikin re li pey rastdarî, bawerî, hezkirin û aştiyê
bibeze. [23] Tu xwe ji munaqeşeyên bêaqil û bêfêm dûr bixe, çimkî
tu dizanî ku şer ji wan derdikeve. [24] Divê xulamê Xudan ji pevçûnê
dûr be, lê belê li hember hemûyan nerm be, ji bo hînkirinê jêhatî û
bîhnfireh be. [25] Divê bi nermî şîretan li yên dijraber bike, belkî
Xwedê fersendê bide wan ku tobe bikin û rastiyê bizanin [26] û bi ser
hişê xwe ve bên, wusa ku ji xefika Îblîsê ku ji bo daxwaza xwe ew
girtine, xilas bibin.

### *Xerabiyên Rojên Dawî*

3 Lê vê bizane ku di rojên dawîn de wextên dijwar wê bên.
[2] Çimkî mirov wê bibin xwehez, perehez, pesinker, pozbilind,
çêrker, neguhdarên dê û bavan, nankor, nepak, [3] bêdilovanî, bê-
rehm, bêbext, çilek, har, neyarên qenciyê, [4] xayîn, rikdar, qure û
wê ji Xwedê bêtir ji kêfê hez bikin. [5] Wê şiklê jiyana xwedayî*
nîşan bidin, lê wê hêza wê înkar bikin. Tu xwe ji yên weha dûr
bixe. [6] Yên ku bi qurnazî dikevin nav malan û wan jinên gêjik ên
ku bi guneh hatine barkirin û bi her cûreyê xwestekên xerab tên
ajotin bindest dikin, ji van in. [7] Ew jinên gêjik hergav hîn dibin, lê
tu caran nikarin bigihîjin zanîna rastiyê. [8] Çawa Yanîs û Yambrîs li
ber Mûsa* rabûn, wusa jî ev mirov li dijî rastiyê radiwestin. Fikrên
van mirovên ha xera bûne û di baweriyê de hatine redkirin. [9] Lê ew

---

[a] **2:19** Ji: Hijmartin 16:5; Yûhenna 10:14

**2:17** Penceşêr: Nexweşiyeke giran; lareş, an jî cûreyeke kansêrê ye.

**2:19** Hijmartin 16:26 **3:8** Derketin 7:11, 22; 8:3

gelekî pêşve naçin, çimkî bêfêmiya wan jî wê ji hemûyan re kifş
bibe, çawa ya wan herduyan jî kifş bû.

### *Hişyarkirin*

[10] Lê haya te ji hînkirina min, rabûn û rûniştina min, mebesta
min, baweriya min, bîhnfirehî û hezkirina min, ragirtina* min,
[11] tengahî û cefayên min heye. Tu dizanî li Entakyayê, li Qonyayê,
li Lîstrayê çi tişt hatin serê min. Min di çi cefayan de ragirt*! Lê
Xudan ez ji hemûyan rizgar kirim. [12] Erê, hemû yên ku dixwazin bi
Mesîh Îsa re jiyana xwedayî bijîn, wê tengahiyê bikişînin. [13] Lê
mirovên xerab û derewîn wê di xerabiyê de hê bêtir pêşve herin,
wê bixapînin û bên xapandin. [14] Lê heçî tu yî, tu di nav wan tiştên
ku tu hîn bûyî û te qenc bawerî bi wan aniye de bimîne. Çimkî tu
dizanî tu ji kê û kê hîn bûyî. [15] Tu ji zaroktiya xwe ve bi Nivîsarên
Pîroz dizanî û ew dikarin te şehreza bikin, da ku tu bi baweriya ku
bi Mesîh Îsa ye xilas bibî. [16] Tevahiya Nivîsara Pîroz ji bîhna
Xwedê ye û ji bo hînkirin, lêhilatin, rastkirin û ji bo perwerde-
kirina di riya rastdariyê de bi kêr tê, [17] da ku mirovê Xwedê, ji bo
her karê qenc bêkêmahî û rapêçandî be.

4 Îcar ez li ber Xwedê û li ber Mesîh Îsayê ku wê dîwana* mirî û
zindiyan bike û ji bo xatirê hatina wî û Padîşahiya wî tembîh li
te dikim: [2] Peyva Xwedê bide bihîstin, bi dem û bê dem li ser wê
bisekine, bi hemû bîhnfirehî û hînkirinê hişyar bike, dengê xwe li
wan hilde û cesaretê bide wan. [3] Çimkî wext wê bê ku nexwazin
guhê xwe bidin hîndariya saxlem, lê ewê di cihê vê de li gor xwes-
tekên xwe, ji xwe re gelek mamosteyan bicivînin, yên ku tiştên li
guhên wan xweş bên hîn bikin. [4] Îcar ewê guhên xwe ji rastiyê
bizivirînin û bikevin pey çîrokan. [5] Lê heçî tu yî, tu di her tiştî de li
ser hişê xwe be, di tengahiyê de sebir bike, karê mizgînvaniyê bi-
ke, xizmeta xwe bibe serî.

[6] Çimkî ji xwe ez dibim gorî* û wextê çûyîna min hatiye.
[7] Min tekoşîna* qenc kir, min hevbezîna xwe qedand û min bawerî

---

**3:11** Karên Şandiyan 13:14-14:22; Zebûr 34:19
**3:12** Yûhenna 15:20

parast. [8] Ji niha û pê ve taca rastdariyê ji bo min amade ye, ya ku
dadgerê* dadperwer* Xudan, wê rojê wê bide min û ne tenê min,
lê wê bide wan hemûyan jî yên ku bêriya xuyabûna wî dikin.

### *Daxwaza Dîtinê*

[9] Bilezîne ku tu bêyî ba min. [10] Çimkî Dîmas* ji vê dinyayê
hez kir û dev ji min berda, çû Selanîkê. Kireskîs çû Galatyayê,
Tîtos* jî çû Dalmetyayê. [11] Tenê Lûqa* li ba min e. Marqos* hilde
û bi xwe re bîne, çimkî ew ji bo xizmetê bi kêrî min tê. [12] Min
Tixîkos* şand Efesê. [13] Gava ku tu bêyî, wî ebayê ku min li Troya-
yê li ba Karpos hiştiye, bi xwe re bîne, wusa jî nivîsarên lihev-
pêçayî, bi taybetî yên çermîn. [14] Skenderê sifirker gelek xerabî li
min kir. Xudan wê li gor kirinên wî bide wî. [15] Tu jî hay ji wî hebe,
çimkî ew gelek li hember gotina me rabû.

[16] Di parastina min a pêşî de tu kesî pişta min negirt, hemûyan
ez tenê hiştim. Bila ev yek ji wan re guneh neyê hesabkirin! [17] Lê
Xudan li ba min rawesta û hêz da min, da ku bi saya min Mizgînî
bi tevahî bê gotin û hemû milet bibihîzin. Îcar ez ji devê şêr rizgar
bûm. [18] Xudan wê min ji her tiştê xerab rizgar bike û ji bo Pa-
dîşahiya xwe ya ezmanî xilas bike. Rûmet her û her ji wî re be.
Amîn.

### *Silavên Aştiyê*

[19] Silavan li Priskîla* û Akîlas û herweha li mala Onîsîforos jî
bike. [20] Erastos* li Korîntê ma, min Trofîmos* jî li Mîletosê nex-
weş hişt. [21] Bilezîne ku tu beriya zivistanê bêyî. Eybûlos, Pûdês,
Lînos, Klawdiya û hemû bawermend silavan li te dikin. [22] Xudan
bi ruhê te re be. Kerem li ser we be.

# *Nameya Pawlos a ji Tîtos re*

## *Pêşgotin*

*Tîtos bawermendekî Yewnanî, hevalkarekî jêhatî yê Pawlos bû. Ev nameya ku Pawlos ji Tîtos re nivîsiye, ji serwerê civîna Girîtê re hatiye şandin (1:5). Tîtos hevalkarekî Pawlos e (2 Korîntî 2:13; 7:6, 13; 8:23) û xortekî ji her awayî ve dilsoz e (2 Korîntî 2:12-18; 8:16-18). Pawlos, Tîtos jî bi xwe re bir û çû Orşelîmê, da ku wê Mizgîniya ku dida, ji bawermendên sereke re bêje. (Galatî 2:1-3). Herweha Tîtos, wek qasidê Pawlos carekê çû Korîntê jî (2 Korîntî 8:16-17). Navê Tîtos di 2 Tîmotêyos 4:10an de jî derbas dibe. Çaxê Pawlos ev name nivîsî, hingê ew azad bû û dixwest Tîtos li Nîkopolîsê (Dalmatyayê) bibîne û di vê nameyê de wî gazî ba xwe dike. Çawa ku ji nameyê jî tê fêmkirin Pawlos û Tîtos bi hev re çûn Girîtê. Pawlos, Tîtos li Girîtê hişt, da ku di civînan de rihspiyan kifş bike. Pawlos di şîretên xwe de yên ku ji Tîtos re ne li ser taybetiyên wan kesên ku wê rêberiya civînan bikin jî radiweste.*

*Ev name dikare bi vî awayî bê beşkirin:*

*I. Silav 1:1-4*
*II. Serwerên civînê û berpirsiyariya wan 1:5-16*
*III. Berpirsiyariya bawermendan a di civînê de 2:1-15*
*IV. Şîret û hîndarî 3:1-11*
*V. Paşgotin 3:12-15*

## *Silav*

1 Ji Pawlosê* xulamê Xwedê û Şandiyê Îsa Mesîh: Ji bo bawe-
riya bijartiyên Xwedê û zanîna rastiya bi jiyana xwedayî* ve
girêdayî ye, ez hatime gazîkirin. 2 Ev ji hêviya jiyana herheyî tê.
Xwedayê ku derewan nake, ji beriya destpêka deman ve jiyana
herheyî soz da 3 û di wextê xwe de bi danezana peyva* xwe eşkere
kir. Li gor emrê Xilaskarê me Xwedê xizmeta belavkirina vê
daxuyaniyê bi ewlehî ji min re hat dayîn.
4 Ji Tîtos re, yê ku di baweriya* me ya hevpar de kurê min ê
rast e:

Kerem û aştî ji Bav Xwedê û ji Xilaskarê me Mesîh Îsa li ser
te be.

*Tîtos li Girîtê*

[5] Min ji bo vê yekê tu li Girîtê hiştî, da ku tu kêmahiyan serrast
bikî û wek ku min ji te re gotiye tu di her bajarî de rihspiyan rakî.
[6] Divê rihspî bêqusûr be, mêrê jinek tenê be, zarokên wî bawer-
mend bin û navê wan bi bêedebî û bi neguhdarî derneketibe.
[7] Çimkî çavdêrekî ku şahneyê* Xwedê be, divê bêqusûr be, xwe
dernexe pêş, zû hêrs nebe, ne bindestê şerabê be, ne zordar be, li
pey qezenca ne rast nekeve; [8] lê divê mêvanperwer be, xêrxwaz be,
sergiran be, dadperwer* be, pak be, bikare nefsa xwe, [9] ji dil û can
wek ku hatiye hînkirin, bi peyva dilsoz ve girêdayî be; da ku hem
di hîndariya saxlem de perwerdekar be û hem jî bikare şaşiyên ên
ku li hember derdikevin derew derxe.
[10] Gelek mirovên serhişk, kelkelo û xapînok jî hene; bi taybetî
yên ku ji nav Cihûyan hatin. [11] Divê devê wan bê girtin, çimkî ew
ji bo qezenca xwe ya qirêjî tiştên ku divê neyên hînkirin, hîn dikin
û malan bi tevahî xera dikin. [12] Yekî ji wan, pêxemberekî wan
gotiye: «Girîtî hergav derewkar in, cenawirên xerab û tiralên
xwera ne.» [13] Ev şahidî rast e. Ji ber vê yekê bi hişkî dengê xwe li
wan hilde, da ku ew di baweriyê* de saxlem bin [14] û guhên xwe
nedin çîrokên Cihûyan û emrên wan mirovên ku rastiyê red dikin.
[15] Ji paqijan re her tişt paqij e, lê ji nepakan û bêbaweran re tu tişt
ne paqij e; hem hişê wan û hem jî wijdana wan nepak bûye. [16] Bi
eşkereyî dibêjin ku ew Xwedê nas dikin, lê ew bi kirinên xwe wî
înkar dikin. Ew lewitî ne, neguhdar in û ji bo her karê qenc bêkêr
in.

*Hînkirina Saxlem*

2 Lê heçî tu yî, çi li hîndariya saxlem tê, tu wê bêje. [2] Ji zilamên
pîr re bêje bila di hedê xwe de bin, giran û sergiran bin û di
bawerî, hezkirin û bîhnfirehiyê de saxlem bin. [3] Bi vî awayî, ji
jinên pîr re jî bêje ku bila ew di kirinên xwe de hurmetkar bin. Bila
ne buxtanê bikin û ne jî bibin bindestê şerabê, bila ya qenc hîn
bikin. [4] Bi vî awayî bila jinên ciwan terbiye bikin, ku ji mêrê xwe û
zarokên xwe hez bikin, [5] sergiran bin, dilpak bin, mala xwe baş

îdare bikin, qenc bin û bi ya mêrê xwe bikin, da ku çêrî peyva
Xwedê neyê kirin.
6 Bi vî awayî, şîretan li xortan jî bike ku sergiran bin. 7 Di her
tiştî de ji bo kirinên qenc bibe mînak. Di hînkirina xwe de durust û
giran be, 8 bila tu kes nekare rexne li peyva te bigire, wusa ku yên
li hember me ne, şermî bibin û tiştekî xerab ê ku li ser me bêjin
tunebe. 9 Ji xulaman re bêje ku bi ya axayên xwe bikin û di her tiştî
de li wan xweş bên û bersîva wan nedin. 10 Nedizin, dilsoziyeke
tam û baş nîşan bidin, da ku di her tiştî de hînkirina Xilaskarê me
Xwedê bê xemilandin.
11 Çimkî kerema Xwedê ya ku ji hemû mirovan re xilasiyê
tîne, xuya bû 12 û me perwerde dike ku em nepakiyê û xwestekên
dinyayê red bikin û rast, sergiran û bi tirsa Xwedê li vê dinyayê
bijîn 13 û li benda hêviya pîroz* û xuyabûna rûmeta Xwedayê
mezin û Xilaskarê xwe Îsa Mesîh bimînin. 14 Wî xwe ji bo me feda
kir, da ku me ji her neheqiyê rizgar bike û ji xwe re paqij bike û
bike gelê ku ji bo kirinên qenc bi xîret e. 15 Bi hemû desthilatiyê
van tiştan hîn bike, wan bişidîne û bala wan bikişîne ser sûcê wan.
Bila tu kes te kêm nebîne.

### *Kirina Tiştên Qenc*

3 Bîne bîra wan ku desthilatiya serok û hukûmetan qebûl bikin,
bi ya wan bikin û ji bo her karê qenc amade bin. 2 Bila çêrî
kesî nekin, şerûd nebin, nerm bin û ji hemû mirovan re berbiwêr
bin. 3 Çimkî demekê em bi xwe jî bêfêm, neguhdar, xapiyayî, xu-
lamên kêf û xwestekên cûr bi cûr bûn. Me jiyana xwe bi xerabî û
çavnebariyê derbas dikir; her kesî ji me nefret dikir û cênika me jî
ji hev diçû. 4 Lê çaxê ku qencî û hezkirina Xilaskarê me Xwedê
xuya bû, 5 wî em, ne ji ber kirinên rast ên ku me kirine, lê li gor
rehma xwe, em bi şuştina jinûveçêbûnê û bi nûkirina Ruhê* Pîroz
xilas kirin. 6 Xwedê, bi destê Xilaskarê me Îsa Mesîh, ew Ruh bi
zêdehî bi ser me de rijand, 7 da ku bi kerema wî em rastdar derke-
vin û li gor wê hêviyê em bibin wêrisên jiyana herheyî. 8 Ev peyv
dilsoz e.

Ez dixwazim ku tu li ser van tiştan rawestî, da ku yên ba-
weriyê bi Xwedê tînin, girîngiyê bidin kirinên qenc. Ev tişt ji bo
mirovan qenc û bi kêr in. 9 Lê tu xwe ji devjeniyên bêaqil, nav-

nameyên malbatî, şer û pevçûnên li ser Şerîetê* dûr bixe. Çimkî ev
bêkêr û pûç in. 10 Piştî ku te carek du caran şîret kir, xwe ji mirovê
cudaker dûr bixe. 11 Tu dizanî ku yekî weha ji rê derketiye,
gunehkar e û wî bi xwe, xwe sûcdar derxistiye.

### *Gotinên Dawî û Silav*

12 Gava ez Artemas an Tixîkos* bişînim ba te, bilezîne, da ku
tu bêyî Nîkopolîsê ba min. Çimkî min biryar da ku ez zivistanê li
wir derbas bikim. 13 Xîret bike, Zênasê qanûnzan û Apolos bi rê bi-
xe, hay jê hebe ku tu kêmahiya wan nebe. 14 Bila yên me jî hîn
bibin ku xwe bidin kirinên qenc, da ku ji bo hewcedariyên pêwist
bikarin bidin û bêber nemînin.

15 Hemû yên ku bi min re ne silavan li te dikin. Silavan li wan
ên ku di baweriyê de ji me hez dikin, bike. Kerem li ser we
hemûyan be.

# *Nameya Pawlos a ji Filêmon re*

## *Pêşgotin*

*Filêmon bawermendekî girîng bû. Ew bi xwe dostê Pawlos û ji civîna Koloseyê bû. Bawermendên Koloseyê li mala Filêmon diciviyan. Xulamekî Filêmon hebû ku navê wî Onîsîmos bû. Onîsîmos ji ba Filêmon reviyabû û hatibû ba Pawlos ê ku hingê di girtîgehê de bû. Bi rêberiya Pawlos, ew bû bawermendekî Mesîhî. Li ser vê yekê Pawlos nameyeke hêvîkirinê ji Filêmon re şand, da ku Onîsîmos bibexşîne, wî ne wek xulamekî bexşandî, lê belê wek birayekî Mesîhî qebûl bike.*

*Ev name dikare bi vî awayî bê beşkirin:*

*I. Silav 1-7*
*II. Hêvîkirina ji bo Onîsîmos 8-22*
*III. Paşgotin 23-25*

### *Silav*

Ji Pawlosê* ku di ber Mesîh Îsa de girtî ye û birayê me Tî-
motêyos*,
ji hevalkarê me yê hezkirî Filêmon re, 2 ji xwişka me Afiya, ji
hevalleşkerê me Arxîpos û ji civîna* li mala we re:
3 Ji Bavê me Xwedê û ji Xudan Îsa Mesîh, kerem û aştî li ser
we be.
4 Gava ku ez te di duayên xwe de tînim bîra xwe, ez hergav ji
Xwedayê xwe re şikir dikim. 5 Çimkî ez li ser hezkirina te ya ji bo
hemû pîrozan* û baweriya* te ya bi Xudan Îsa dibihîzim. 6 Duaya
min ew e ku ew hevpariya ruhanî ya ku ji baweriya te tê, bandûra
xwe nîşan bide, da ku tu bi Mesîh hemû qenciyê bizanî. 7 Hezki-
rina te gelek şahî û han* da min. Çimkî dilê pîrozan bi saya te
rihetî dît, ey birayê min.

### *Daxwaza Pawlos a ji bo Onîsîmos*

8 Ji bo vê yekê, bi ser ku pirr cesareta min bi Mesîh heye, ya
ku lazim e, ez li te emir bikim jî, 9 ez dixwazim ji bo xatirê

---

2 Kolosî 4:17

hezkirinê ji te hêvî bikim. Ez Pawlos, zilamekî navser û niha jî di
ber Mesîh Îsa de girtî, [10] ez ji bo kurê xwe Onîsîmos ji te hêvî
dikim ku ez di dema girtîbûna xwe de jê re bûm bav. [11] Demekê
ew ji bo te bêkêr bû, lê niha ew hem ji bo min û hem jî ji bo te bi
kêr e. [12] Ez wî, yanî dilê xwe, ji te re bi şûn ve dişînim. [13] Min
dixwest ku ez wî li ba xwe bihêlim, da ku wî di vê dema ku ez ji
ber Mizgîniyê girêdayî me, di cihê te de ji min re xizmet bikira.
[14] Lê min nexwest ku ez bê dilê te tiştekî bikim, da ku qenciya te bi
dil be, ne ku ji mecbûrî be. [15] Belkî jî sedemê ku ew demekê ji te
dûr ket ev bû, ku ew her û her bibe yê te. [16] Ji niha û pê ve, êdî ew
ne wek xulamekî ye, lê ji xulamekî hêjatir, birayekî hezkirî ye; bi
taybetî ji bo min, lê hê bêtir ji bo te, hem bi mirovî û hem jî di
baweriya Xudan de.

[17] Îcar, eger tu min hevparê xwe dihesibînî, wî wek min qebûl
bike. [18] Eger wî di tiştekî de neheqî li te kiribe, an deyndar be, vê li
ser hesabê min binivîse. [19] Ez Pawlos, ez vê bi destê xwe dinivî-
sim: Ezê li te vegerînim – ez ji te re nebêjim ku tu bi xwe jî
deyndarê min î. [20] Erê birayê min, bila ji bo Xudan ev feyda min ji
te hebe: Ji bo xatirê Mesîh dilê min rihet bike.

[21] Ji ber ku ez piştrast im, ku tê bi ya min bikî, ez ji te re di-
nivîsim û dizanim ku tê ji gotinên min zêdetir jî bikî. [22] Di vê navê
de, ji bo min cihekî amade bike. Çimkî ez hêvî dikim ku ezê bi
duayên we ji we re bêm bexşandin.

### *Silav û Xatir*

[23] Êpafrasê* ku bi min re di ber Mesîh Îsa de girtî ye silavan li
te dike. [24] Hevalkarên min Marqos*, Erîstarxos*, Dîmas* û Lûqa*
jî silavan li te dikin. [25] Kerema Xudan Îsa Mesîh bi ruhê we re be.

---

**10** Kolosî 4:9

# *Nameya ji Îbraniyan re*

### *Pêşgotin*

*Nameya ji Îbraniyan re, ji Cihûyên Mesîhî yên ku di bin zordariyê de bûn û ji wan dihat xwestin ku dev ji baweriya xwe berdin re hatiye nivîsîn. Nivîskarê vê nameyê ne kifş e. Herweha nivîskar di nav diwanzdeh şagirtên Îsa de jî cih nagire; lê belê wî kirinên Îsa ji bawermendên pêşî yên ku li pey Îsa çûne, bihîstiye. Kesên ku name ji wan re hatiye nivîsîn, ji ber bawermendiya xwe berê jî gelek êş kişandine. Nivîskar wan hişyar dike û dişidîne ku baweriya xwe hişk bigirin û kifş dike ku baweriya bi Îsa Mesîh bêkêmahîtiyê û jiyana herheyî tîne.*

*Di vê nameyê de nivîskar li ser sê babetên girîng radiweste:*

1. *Îsa Kurê Xwedê yê herheyî ye. Kurê Xwedê Îsa di ser pêxemberên Peymana Kevin re ye, di ser milyaketan û herweha di ser Mûsa re ye.*
2. *Kahîntiya Îsa ya herheyî ji aliyê Xwedê ve hatiye diyarkirin û ew di ser kahînên Peymana Kevin re ye.*
3. *Bi saya Îsa bawermend ji guneh, ji tirsê û ji mirinê tên rizgarkirin. Kahînê Mezin Îsa, rizgariya rastîn anî.*

*Ev name dikare bi vî awayî bê beşkirin:*

*I. Mesîh peymana Xwedê bir serî 1:1-2:18*
*II. Bêdestpêkiya serokkahîntiya Mesîh 3:1-10:18*
*III. Girîngiya baweriyê 11:1-12:29*
*IV. Şîretên dawî 13:1-19*
*V. Silavên aştiyê 13:20-25*

### *Kur di ser Milyaketan re Ye*

1 Di demên berê de Xwedê gelek caran û bi gelek awayan, bi rê-
beriya pêxemberan* ji bav û kalan re gotiye. 2 Lê di van rojên
dawîn de, ew bi Kurê xwe yê ku ew kiriye wêrisê her tiştî û bi
destê wî erd û ezman çêkirine, ji me re peyivî. 3 Ew şewqa rûmeta
Xwedê û xuyabûna rastîn ya cewhera wî ye. Ew her tiştî bi peyva*
xwe ya hêzdar hildigire. Piştî ku wî paqijbûna gunehan pêkanî, ew

li jorê, li milê Yê Mezin ê rastê rûnişt. [4] Navê ku wî mîras standiye
ka çiqas di ser yê milyaketan re ye, ew jî ewqas ji wan bilindtir bû.
[5] Çimkî ma Xwedê ji kîjan milyaketî re kengê gotiye:

«Tu Kurê min î,
Îro tu ji min re bûyî.»

An jî:

«Ezê ji wî re bibim Bav*
Û ewê ji min re bibe Kur.»[a]

[6] Îcar çaxê Xwedê yê nixurî anî dinyayê, weha got:

«Bila hemû milyaketên Xwedê biperizin* wî.»[b]

[7] Ji bo milyaketan jî Xwedê dibêje:

«Ew milyaketên xwe dike ba
Û xizmetkarên xwe dike pêta êgir.»[c]

[8] Lê ji bo Kur ew weha dibêje:

«Ya Xwedê, textê te herheyî û heta hetayê ye.
Gopalê padîşahiya te gopalê rastiyê ye.
[9] Te ji rastiyê hez kir û ji neheqiyê nefret kir,
Ji ber vê yekê Xwedê, Xwedayê te,
Tu bi rûnê şahiyê ji hevalên te bêtir bilind kirî.»[d]

[10] Û li dereke din:

«Ya Xudan, di destpêkê de
Te bingeha erdê danî
Û ezman jî karên destê te ne.
[11] Ewê wêran bibin, lê tê bimînî,
Ew hemû wê wek cilan kevin bibin.
[12] Tê wan wek xiftan li hev bipêçî û
Ewê wek cilan bên guhertin.
Lê tu hergav eynî yî
Û salên te xilas nabin.»[e]

[13] Lê Xwedê ji kîjan milyaketî re kengê gotiye:

---

[a] **1:5** Ji: Zebûr 2:7; 2 Samûêl 7:14

[b] **1:6** Ji: Dubarekirina Şerîetê 32:43; Zebûr 97:7 (herdu jî li gor wergera Yewnanî)

[c] **1:7** Ji: Zebûr 104:4 [d] **1:8-9** Ji: Zebûr 45:6-7

[e] **1:10-12** Ji: Zebûr 102:25-27

«Li milê min ê rastê rûne,
Heta ku ez dijminên te
Bikim pêgeha lingên te.»[a]
14 Ma hemû milyaket ne ruhên xizmetkar in ku ji bo xizmeta wan
ên ku wê xilasiyê mîras bistînin hatine şandin?

### *Em Baldar Bin*

2 Ji ber vê yekê divê em hê zêdetir bala xwe bidin tiştên ku me
bihîstine, da ku em averê* nebin. 2 Çimkî eger peyva ku bi rê-
beriya milyaketan hatiye gotin qayîm bûbe û her sûc û neguh-
dariyê cezayê ku heq kiriye standibe, 3 eger em li ber vê xilasiya
evqas mezin xemsar bin, emê çawa birevin û xilas bibin? Di dest-
pêkê de Xudan ev xilasî da zanîn û ji aliyê yên ku ew bihîstine ve
ji me re rast hat deranîn. 4 Xwedê jî ji vê re bi nîşanan, bi karên
mezin û kerametên cûr bi cûr û bi diyariyên Ruhê* Pîroz ên ku li
gor daxwaza xwe belav kirine, şahidî kir.

### *Kur Bû Bira*

5 Xwedê, ew dinya ku wê bê, ya ku em li ser dipeyivin, ne bi
milyaketan ve girê da. 6 Lê yekî li derekê gotiye û şahidî kiriye:
«Mirov çi ye ku tu wî bînî bîra xwe,
An jî kurê mirov çi ye ku tu xema wî bixwî?
7 Te ew ji bo demekê ji milyaketan nizimtir kir,
Te taca rûmet û siyanetê* da serê wî.
8 Te her tişt xist bin lingên wî.»[b]
Îcar gava ku Xwedê her tişt xist bin lingên wî, tu tiştê ku nexist bin
lingên wî nehişt. Lê niha em hê nabînin ku her tişt ketiye bin lin-
gên wî. 9 Lê em Îsayê ku ji ber cefayê mirinê taca rûmet û siyanetê
wergirtiye, dibînin. Ew ji bo demekê ji milyaketan hat nizimtir
kirin, da ku bi kerema Xwedê ji bo her kesî mirinê tam bike.
10 Çimkî di cih de bû, Xwedayê ku her tişt ji bo wî ye û bi wî çê-
bûye, pêşengê xilasiyê bi cefayan bigihanda bêkêmahîtiyê, da ku
wî gelek kur bigihandana rûmetê. 11 Çimkî yê ku pîroz* dike û yên

---

[a] **1:13** Ji: Zebûr 110:1 [b] **2:6-8** Ji: Zebûr 8:5-7
**2:7** Di hin destnivîsaran de li dawiyê ev jî heye: «Te ew danî li ser karên destê te.»

ku tên pîrozkirin, hemû ji Yekî ne. Ji ber vê yekê Îsa şerm nake ku
ji wan re bêje ‹bira› [12] û dibêje:

«Ezê navê te ji birayên xwe re bêjim,
Di nav civînê de ezê bi lavijeyan* pesnê te bidim.»[a] [13] û
weha jî dibêje:
«Ezê ewlehiya xwe bi wî bînim.»[b]

û weha jî:

«Va me, ez û zarokên ku Xwedê dane min!»[c]

[14] Loma çawa ku zarok xwîn û goşt in, ew bi xwe jî wusa di eynî
tiştan de bû hevpar; da ku ew, wî yê ku xwediyê hêza mirinê ye,
yanî Îblîs, bi mirinê betal bike [15] û wan ên ku di hemû jiyana xwe
de bi tirsa mirinê bûne xulam, azad bike. [16] Çimkî, bêguman ew ne
alîkariya milyaketan, lê belê alîkariya dûndana* Birahîm* dike.
[17] Loma diviya di her tiştî de bibûya mîna birayên xwe, wusa ku
ew li ber Xwedê Serokkahînekî dilovan û ewledar be, da ku gune-
hên gel bide bexşandin. [18] Ji ber ku ew bi cefakişandinê hat ceri-
bandin, ew dikare bê hawara wan ên ku tên ceribandin.

### *Mûsa Xizmetkar e, Mesîh Kur e*

3 Ji ber vê yekê, ey birayên pîroz û hevparên gazîkirina ezmanî,
bala xwe bidin Îsayê ku Şandî* û Serokkahînê şahidiya me ye.
[2] Wek ku Mûsa* ji tevahiya mala Xwedê re dilsoz bû, Îsa ji yê ku
ew daniye ser kar re dilsoz e. [3] Ka çawa siyaneta* yê ku xanî ava
kiriye di ser ya xênî re ye, wusa jî Îsa ji Mûsa bêtir hêjayî rûmeta
mezin hat dîtin. [4] Çimkî her xanî ji aliyê yekî ve tê avakirin, lê ava-
karê her tiştî Xwedê ye. [5] Rast e, Mûsa, ji bo ku şahidiya wan tiş-
tên ku wê piştre bihatana gotin bike, di tevahiya mala Xwedê de
wek xizmetkarekî dilsoz bû. [6] Lê Mesîh bi Kurîtî li ser mala Xwe-
dê dilsoz bû. Û eger em cesareta xwe û pesindana ku ji hêviya me
tê hişk bigirin, mala wî em in.

### *Hişyarkirina li hember Bêbaweriyê*

[7] Loma, wek ku Ruhê Pîroz dibêje:

«Eger îro hûn dengê wî bibihîzin,

---

[a] **2:12** Ji: Zebûr 22:22 [b] **2:13** Ji: Îşaya 8:17 [c] **2:13** Ji: Îşaya 8:18
**3:2** Hijmartin 12:7

8 Dilê xwe hişk nekin,
Wek wê roja ku bav û kalên we serî hildan
Gava ku li çolê hatibûn ceribandin,
9 Li wir bav û kalên we ez ceribandim û sihêtî kirim
Bi ser ku çil salan kirinên min dîtin.
10 Ji ber vê yekê ez ji wî nifşî* xeyidîm.
Û min got: ‹Ew hergav di dil de varî* dibin.›
Û wan riyên min nezanîn.
11 Wek ku min di hêrsa xwe de sond xwar:
Ew tu caran nakevin rihetiya min.»[a]

12 Birano, hay ji xwe hebin ku bi tu kesî ji we re dilekî xerab û
bêbawer ê ku we ji Xwedayê jîndar bizivirîne, peyda nebe. 13 Lê
belê heta roja ku jê re dibêjin «îro» heye, her roj hevdû bişidînin,
da ku dilê tu kesî ji we bi xapandina guneh hişk nebe. 14 Çimkî em
bûne hevparên Mesîh, lê bi tenê em ewlehiya xwe ya destpêkê heta
dawiyê hişk bigirin. 15 Çawa ku hatiye gotin:

«Eger îro hûn dengê wî bibihîzin
Dilê xwe hişk nekin wek wê roja ku bav û kalên we serî hildan.»[b]

16 Îcar ew kî bûn, ku bihîstin û serî hildan? Ma ne ew hemû bûn ên
ku bi rêberiya Mûsa ji Misrê derketin? 17 Û Xwedê çil salan ji kê
xeyidî? Ma ne ji wan ên ku guneh kirin û bedena wan li çolê ket?
18 Û ji neguhdaran pê ve, ma Xwedê ji bo kê sond xwar ku ew
nekevin rihetiya wî? 19 Îcar em dibînin ku wan ji ber bêbaweriya
xwe nekarîn bikevinê.

4 Ji bo vê yekê, madem ku soza ketina nav rihetiya wî hê heye,
em bitirsin ku yek ji we ji wê bi paş ve mayî xuya nebe. 2 Çim-
kî, wek ku Mizgînî ji wan re hat dayîn, ji me re jî hat dayîn. Lê
belê peyva ku bihîstin bi kêrî wan nehat, çimkî yên ku peyv bi-
hîstibûn, bi baweriyê* ve nekirin yek. 3 Lê em ên ku me bawer ki-
riye, emê bikevin wê rihetiyê, çawa ku Xwedê gotiye:

---

[a] **3:7-11** Ji: Zebûr 95:7-11; Derketin 17:1-7; Hijmartin 20:1-13
[b] **3:15** Ji: Zebûr 95:7-8
**3:16-18** Hijmartin 14:1-35

«Wek ku min di hêrsa xwe de sond xwar:
Ew tu caran nakevin rihetiya min.»[a]

Lê karên wî ji damezrandina dinyayê ve xilas bûne. 4 Çimkî wî di
derekê de li ser roja heftan weha gotiye: «Di roja heftan de Xwedê
ji hemû kirinên xwe bîhna xwe veda.»[b] 5 Û li vê derê dîsa dibêje:
«Ew tu caran nakevin rihetiya min.»[c] 6 Îcar yên ku berê Mizgînî bi-
hîstibûn, ji ber ku bi ya wê nekirin, neketin rihetiyê. Lê belê ketina
vê rihetiyê ji bo hinekan hê parastî ye. 7 Loma piştî demeke dirêj
Xwedê bi devê Dawid* dibêje «îro» û careke din rojekê destnîşan
dike. Wek ku berî niha hatiye gotin:

«Eger îro hûn dengê wî bibihîzin,
Dilê xwe hişk nekin.»[d]

8 Çimkî eger Yêşû* rihetî dabûya wan, Xwedê piştre li ser rojeke
din nedigot. 9 Nexwe, ji bo gelê Xwedê rihetiyeke roja* Şemiyê di-
mîne. 10 Wek ku Xwedê ji kirinên xwe bîhna xwe veda, yê ku dike-
ve nav rihetiya Xwedê jî ji kirinên xwe bi xwe bîhna xwe vedide.
11 Loma ji bo ku tu kes bi eynî cûreyê neguhdariyê nekeve, em
xîretkêşiyê bikin, da ku em bikevin wê rihetiyê.

12 Peyva Xwedê jîndar û bi bandûr e. Ji her şûrê dudev hê tûjtir
e. Û heta can û ruh, hem jî movik û mejî ji hev veqetîne, lê diçe;
dîwana* niyet û ramanên dil dike. 13 Tu afirîn tune ku ji wî veşartî
ye. Lê her tişt li ber çavê wî yê ku divê em hesab bidinê, tazî û
vekirî ye.

## *Serokkahîn Îsa*

14 Loma, madem ku Serokkahînê me yê mezin ê ku di ezmanan
re derbas bûye, Kurê* Xwedê Îsa heye, em wê baweriya ku em
eşkere dikin hişk bigirin. 15 Çimkî Serokkahînê me ne wusa ye ku
di qelsiyên me de nekare hevpariya dilîniya me bike, lê guneh ne
tê de bi her awayî wek me hatiye ceribandin. 16 Loma em bi cesaret
nêzîkî textê keremê bibin, da ku rehm li me bibe û ji bo dema ku
em hewcedarê alîkariyê bin, em keremê bibînin.

---

[a] 4:3 Ji: Zebûr 95:11 [b] 4:4 Ji: Destpêkirin 2:2
[c] 4:5 Ji: Zebûr 95:11 [d] 4:7 Ji: Zebûr 95:7-8
4:10 Destpêkirin 2:2

5 Her Serokkahîn ji nav mirovan tê bijartin û ji bo wan li ser
tiştên ku li ber Xwedê tên kirin, tê danîn, da ku ji bo gunehan
diyarî û goriyan* pêşkêş bike. 2 Ew dikare bi nermî, bi nezan û bi
averêbûyiyan* re bide û bistîne, çimkî ew bi xwe jî bi qelsiyan ha-
tiye rapêçan. 3 Ji ber vê yekê, wek ku ji bo gel dike, ew deyndar e
ku ji bo xwe jî di ber gunehan de goriyan pêşkêş bike. 4 Tu kes ni-
kare ji xwe bi xwe vê rûmetê bistîne, lê bi tenê ewê ku wek Harûn
ji aliyê Xwedê ve tê gazîkirin, distîne.
5 Bi vî awayî Mesîh jî ji bo ku bibe Serokkahîn xwe bi xwe
bilind nekir, lê belê Xwedê ew bilind kir û jê re got:

«Tu Kurê min î,
Îro tu ji min re bûyî.»[a]

6 Çawa ku ew di dereke din de jî dibêje: «Li gor pergala* Melkî-
sedek*, Tu her û her kahîn* î.»[b] 7 Îsa di jiyana xwe ya li ser erdê
de bi hawarên hêzdar û bi hêstirên çavan dua û lavan pêşkêşî wî
kir, yê ku dikarî ew ji mirinê xilas bikira û ji ber xwedêtirsiya xwe
hatibû bihîstin. 8 Bi ser ku Kur bû jî, ji cefayên ku kişandin hînî
guhdanê bû. 9 Gava ku gihîşt bêkêmahîtiyê, ji hemûyên ku bi ya wî
dikin re bû sedemê xilasiya herheyî. 10 Ji aliyê Xwedê ve, li gor
pergala Melkîsedek bi serokkahîntî hat navkirin.

### *Xwe li Soza Xwedê Bigirin*

11 Gelek tişt hene ku em li ser vê yekê bêjin; lê ji ber ku guhên
we giran bûne, şîrovekirina wan zehmet e. 12 Diviya ku heta niha
hûn bibûna mamoste, lê belê dîsa hewcedariya we heye ku yek
dersên pêşî yên peyva Xwedê hînî we bike. Ne xwarina giran, lê
belê hûn hê hewcedarê şîr in. 13 Îcar her kesê ku bi şîr tê xweyî-
kirin, di peyva rastiyê de bêtecrûbe ye; çimkî zarok e. 14 Lê xwa-
rina giran ji bo yên gihîştî ye. Têgihîştina wan bi karanînê hatiye
perwerdekirin, da ku qencî û xerabiyê ji hev derxin.

6 Ji ber vê yekê em hîndariya pêşî ya li ser Mesîh bihêlin, ber bi
bêkêmahîtiyê ve pêşve herin. Û em dîsa bingeha wan tiştan

---

[a] 5:5 Ji: Zebûr 2:7 [b] 5:6 Ji: Zebûr 110:4

5:3 Qanûna Kahîntiyê 9:7 5:4 Derketin 28:1 5:7 Metta 26:36-46

daneynin: Vegerîna ji karên* mirî, baweriya bi Xwedê, 2 hîndariya
imadkirinê*, destdanînserî*, vejîna* miriyan û dîwana herheyî.
3 Xwedê destûrê bide, emê vê bikin. 4 Çimkî yên ku carekê hatine
ronahîkirin, ji diyariya ezmanî tam kirine, ji Ruhê Pîroz par stan-
dine, 5 qenciya peyva Xwedê û hêzên dinya ku bê tam kirine 6 û bi
ser wan de ji rê derketine, êdî ji bo wan çênabe ku dîsa ji bo
tobekirinê bên nûkirin. Çimkî ew ji bo xwe Kurê Xwedê ji nû ve
xaç dikin û bêsiyanet dikin. 7 Çimkî ew axa ku wê barana gelek
caran li ser dibare, vedixwe û ji bo kê hatibe ajotin, berê ku bi
kêr tê bide wan, ji aliyê Xwedê ve tê bereketkirin. 8 Lê eger ew
stirî û diriyan bide, bêkêr e û nêzîkî nifirê ye, dawiya wê şewi-
tandin e.

9 Hezkirîno, her çiqas me weha gotibe jî, em piştrast in ku rew-
şa we ji wan tiştan çêtir e û li gor xilasiyê ye. 10 Çimkî Xwedê ne
bê dadperwerî* ye ku kirinên we, xizmeta ku we ji pîrozan re kiri-
ye û hûn dikin û ew hezkirina ku we ji bo navê wî nîşan daye, ji bîr
bike. 11 Em pirr dixwazin ku her yek ji we heta dawiyê eynî xîret-
kêşiyê nîşan bide, da ku hûn bigihîjin piştrastiya temam a hêviya
xwe. 12 Wusa ku hûn nebin tiral, lê bibin mîna wan ên ku bi bawerî
û bîhnfirehiyê bûn wêrisên sozên Xwedê.

### *Soza Xwedê*

13 Gava ku Xwedê soz da Birahîm*, ji ber ku yekî meztir nebû
ku bi wî sond bixwe, wî bi xwe sond xwar 14 û got:

«Bi rastî jî, ezê te bi zêdehî pîroz bikim
Û ezê bi zêdehî te zêde bikim.»[a]

15 Û bi vî awayî Birahîm sebir kir û gihîşt sozê. 16 Erê, mirov bi ye-
kî ku ji wan meztir e, sond dixwin; sond ji bo bawerîanînê dawiya
her devjeniyê tîne. 17 Bi vî awayî, çaxê Xwedê xwest ku hê bêtir
nîşanî wêrisên sozê bide ku armanca wî nayê guhertin, wî soz da û
bi ser de jî sond xwar. 18 Wusa ku bi du tiştên ku nayên guhertin û
çênabe ku Xwedê di wan de derewan bike, cesareteke me ya xurt
hebe, da ku em vê hêviya ku li ber me hatiye danîn, bigirin. 19 Ev
hêviya me wek lengerê can ê saxlem û ewledar e û derbasî aliyê

---

[a] 6:14 Ji: Destpêkirin 22:16-17
6:18 Hijmartin 23:19

perdê yê hundir dibe. 20 Îsa bi pêşîvanîtî ji bo me derbasî wê
derê bûye. Ew li gor pergala* Melkîsedek* bûye Serokkahînê
herheyî.

### *Kahîntiya Îsa Wek ya Melkîsedek e*

7 Heçî Melkîsedek* e, ew «padîşahê Salêmê* û kahînê Xweda-
yê Herî Bilind bû. Gava Birahîm ji şkandina padîşahan vedi-
geriya, ew hat pêşiya Birahîm û ew pîroz kir.»[a] 2 Birahîm jî ji her
tiştî dehyek* da wî. Mana navê Melkîsedek pêşî: «Padîşahê Rasti-
yê», piştre jî: «Padîşahê Salêmê», yanî «Padîşahê Aştiyê» ye. 3 Ne
bavê wî, ne diya wî û ne jî bav û bavkalkên wî tên zanîn, ne dest-
pêka rojên wî û ne jî dawiya jiyana wî heye. Wek Kurê Xwedê ew
her û her kahîn dimîne.
4 Îcar binêrin ku ew çiqas mezin e! Bavkalê mezin Birahîm
dehyeka xenîmetan daye wî. 5 Yên ku ji kurên Lêwî* kahîntî stan-
dine bi ser ku ew ji dûndana* Birahîm bûn jî, li gor Şerîetê* emrê
wan heye ku ji gel, yanî ji birayên xwe, dehyekê bistînin. 6 Lê ev
mirovê ku ne ji dûndana wan e, dehyek ji Birahîm stand û wî ew ê
ku soz jê re hatine dayîn pîroz kir. 7 Bêguman yê ku pîroz dike di
ser yê ku tê pîrozkirin re ye. 8 Li vê derê mirovên ku dimirin deh-
yekê distînin, lê li wê derê yekî ku şahidî jê re tê kirin ku ew dijî,
dehyekê distîne. 9 Em dikarin bêjin ku Lêwî bi xwe jî, yê ku deh-
yekê distîne, bi destê Birahîm dehyek daye. 10 Çimkî gava ku Mel-
kîsedek hat pêşiya Birahîm, hê Lêwî di pişta bavkalê xwe Birahîm
de bû.
11 Îcar, eger bi kahîntiya Lêwiyan bêkêmahîtî hebûya – çimkî
gel di bin vê kahîntiyê de Şerîet standibû – êdî çi hewce bû, kahî-
nekî din ne li gor pergala* Harûn, lê li gor pergala Melkîsedek bi-
hata? 12 Çimkî gava ku kahîntî bê guhertin, hingê divê Şerîet jî bê
guhertin. 13 Û yê ku ev tişt li ser tên gotin, ji eşîreke din e. Ji vê
eşîrê tu kesî li gorîgehê* xizmet nekiriye. 14 Îcar eşkere ye ku

---

[a] **7:1** Ji: Destpêkirin 14:17-20

**6:19** Di Perestgehê de cihê hundir ê herî pîroz hebû û li ber wî perde hebû; ji Serokkahîn pê ve tu kesî nedikarî derbasî wir bibûya. Binêre: Qanûna Kahîntiyê 16:2.

**6:20** Zebûr 110:4 **7:5** Hijmartin 18:21

Xudanê me ji eşîra Cihûda* hatiye û li ser kahîntiya vê eşîrê Mûsa
tiştek negotiye.
[15] Û bi hatina kahînekî din ê ku mîna Melkîsedek e, êdî ya ku
em dibêjin hê bêtir eşkere ye. [16] Ew ne li gor emrên malbavkî yên
Şerîetê, lê belê li gor hêza jiyana herheyî bûye kahîn. [17] Çimkî we-
ha şahidî tê kirin ku:

«Li gor pergala Melkîsedek,
Tu her û her kahîn î.»[a]

[18] Îcar emrê pêşî ji ber qelsî û bêkêriya xwe betal bû. [19] Çimkî Şe-
rîetê tu tişt negihand bêkêmahîtiyê. Lê di şûna wê de hêviyeke hê
çêtir hatiye anîn, ku bi wê em nêzîkî Xwedê dibin.
[20] Û ev ne bêsond çêbû. Yên din bêsond bûbûn kahîn, [21] lê Îsa
bi sonda yê ku ev peyv jê re gotiye, bû kahîn.

«Xudan sond xwar û ji ya xwe venagere,
Tu her û her kahîn î.»[b]

[22] Bi vî awayî Îsa bûye kefîlê peymaneke* hê çêtir. [23] Kahînên din
gelek bûn, çimkî mirinê nehişt ku ew bidomînin. [24] Lê ji ber ku Îsa
her û her dimîne, kahîntiya wî xilas nabe. [25] Ji ber vê yekê ew dika-
re wan ên ku bi destê wî nêzîkî Xwedê dibin, bi tevahî xilas bike.
Çimkî ew herdem dijî, da ku ji bo wan mehderê* bike.
[26] Çimkî ji me re Serokkahînekî pîroz, bêsûc, bêqusûr, ji gu-
nehkaran veqetiyayî û ji ezmanan hê bilindtir bûyî diviya. [27] Ji wî
re nediviya ku ew her roj wek Serokkahînan, pêşî di ber gunehên
xwe de û piştre di ber gunehên gel de goriyan pêşkêş bike. Çimkî
çaxê ku xwe bi xwe pêşkêş kir, ev yek bi carekê anî cih. [28] Şerîet
mirovên qels datîne ser karê Serokkahîntiyê. Lê peyva sondê ya ku
piştî Şerîetê hat, Kurê ku heta bi herheyiyê hatiye bêkêmahî kirin,
daniye ser karê serokkahîntiyê.

### *Îsa Serokkahînê Peymana Çêtir e*

8 Niha, ji wan tiştên ku em dibêjin ya sereke ev e: Serokkahînekî
me yê weha heye yê ku li ezmanan, li milê rastê yê textê Bi-
lindahiyê rûniştiye. [2] Ew karbidestê pîrozgehê, yanî konê rastîn e,
yê ku ne mirovan, lê Xudan daniye. [3] Çimkî her serokkahîn ji bo

---

[a] 7:17 Ji: Zebûr 110:4 [b] 7:21 Ji: Zebûr 110:4
7:27 Qanûna Kahîntiyê 9:7

pêşkêşkirina diyarî û goriyan tê destnîşankirin. Ji bo vê yekê divê
tiştekî ku Serokkahînê me jî pêşkêş bike hebe. [4] Eger ew li ser din-
yayê bûya, ew bi xwe nedibû kahîn, çimkî ji xwe yên ku li gor Şe-
rîetê diyariyan pêşkêş dikin, hene. [5] Evên ha di vê Perestgehê* de
xizmetê dikin a ku sûret û siya ya ezmanî ye. Çimkî gava ku Mûsa
li ber çêkirina konê perizînê bû, ji aliyê Xwedê ve weha hat hişyar-
kirin: «Binêre ku tê her tiştî li gor mestereya* ku li çiyê ji te re
hatiye nîşandan çêkî.»[a]

[6] Lê Îsa xizmeteke hê bilindtir stand wek ku ew jî navberkarê
peymaneke hê çêtir e, çimkî ew peyman li ser sozên çêtir hatiye
danîn.

[7] Eger ew peymana pêşî bêkêmahî bûya, hewcedarî bi ya didu-
yan nedima. [8] Lê Xwedê gelê xwe biqusûr dibîne û dibêje:

«Xudan dibêje: ‹Va ye, roj tên
Ku ezê bi mala Îsraêl re
Û bi mala Cihûda* re
Peymaneke Nû girêdim.
[9] Ne wek wê peymana ku min
Bi bav û kalên wan re girêda,
Peymana wê roja ku min destê wan girt,
Ku ez wan ji diyarê Misrê derînim.›
Xudan dibêje:
‹Çimkî ew di peymana min de neman,
Min jî ji bo wan xem nexwar.›
[10] Xudan dibêje: ‹Piştî wan rojan
Peymana ku ezê bi mala Îsraêl re girêdim ev e:
Ezê qanûnên xwe bixim hişê wan
Û ezê wan li ser dilê wan binivîsim.
Ezê bibim Xwedayê wan,
Û ew jî wê bibin gelê min.
[11] Êdî tu kes hemwelatiyê xwe,
Û tu kes birayê xwe hîn nake
Û nebêje: ‹Xudan nas bike!›,
Çimkî ji yê biçûk heta yê mezin

---

[a] 8:5 Ji: Derketin 25:40

Ew hemû wê min nas bikin.
12 Çimkî ezê li hember neheqiyên wan dilovan bim
Û êdî ez gunehên wan tu caran naynim bîra xwe.»»[a]
13 Bi gotina «Peymana Nû», Xwedê ya pêşî kevin kiriye. Îcar ya ku
kevnar û kevin bûye, li ber windabûnê ye.

### *Perestgeha Dinyayî û ya Ezmanî*

9 Erê, di peymana pêşî de jî qanûnên perizînê* û Perestgeha li
ser dinyayê hebû. 2 Konek hatibû danîn: Di beşê wî yê pêşî yê
ku jê re Cihê Pîroz digotin de çiradank, sifre û nanê* pêşberiyê
hebû. 3 Di pişt perda diduyan de, di hundir de, Cihê Herî Pîroz he-
bû. 4 Gorîgeha zêrîn ya şewitandina bixûrê* û Sindoqa* Peymanê
ya ku ji her aliyî ve zêrkirî bû tê de bûn. Di hundirê sindoqê de
şerbikê Manna* yê zêrîn, şivdarê Harûn ê bişkivî û nivîsdekên
Peymanê hebûn. 5 Li ser sindoqê xêrûbên* rûmeta Xwedê yên ku
li bexşîngehê* dikirin sî hebûn. Lê niha em nikarin yek bi yek li
ser van bipeyivin.
6 Ev tişt weha hatibûn sazkirin. Kahîn her car diketin beşê pêşî
yê kon û xizmeta xwe dikirin. 7 Lê heçî beşê hundir e, salê carekê
bi tenê Serokkahîn dikeve wî. Lê bêyî wê xwîna ku di ber wî û di
ber gunehên gel ên bêhemdî de tê pêşkêşkirin, ew jî nikare bikeve
wî. 8 Ruhê Pîroz bi vê yekê nîşan dide ku, heta konê pêşî bimîne,
rêya ku diçe Cihê Herî Pîroz hê nehatiye eşkerekirin. 9 Ev ji bo
dema niha mînakek e. Diyarî û goriyên ku tên pêşkêşkirin, nikarin
wijdana mirovê ku diperize paqij bikin. 10 Ew bi tenê bi xwarin,

---

[a] **8:8-12** Ji: Yêremya 31:31-34

**9:2** Derketin 25:31-40; Derketin 25:25-30 **9:3** Derketin 26:31-33

**9:4** Derketin 30:1-6; Derketin 25:10-16; Derketin 16:33; Hijmartin 17:8-10; Derketin 25:16

**9:5** Derketin 25:18-22; Hijmartin 17:1-10

**9:6** Hijmartin 18:2-6 **9:7** Qanûna Kahîntiyê 16

**9:5** Bexşîngeh: Cihê ku li gunehan dihat bihûrtin bû, yanî li wir kefaret hat kirin. Di Peymana Kevin de ev der devê Sindoqa Peymanê bû; binêre: Derketin 25:17-20; Qanûna Kahîntiyê 16:14.

**9:5** Xêrûb: Cûreyekî milyaketên Xwedê ne û heykalên wan ser devê Sindoqa Peymanê bi baskên çêkirî mîna milyaketan bûn û rûmeta Xwedê berçav dikirin.

vexwarin û şuştinên cûr bi cûr ve girêdayî ne û qanûnên dinyayî ne
yên ku heta wextê sazûmana nû dimînin.
11 Lê gava ku Mesîh, Serokkahînê tiştên qenc ên ku hatine,
xuya bû, ew derbasî konê hê meztir û hê tekûztir bû, yê ku ne bi
destan hatiye çêkirin, yanî ne ji vê dinyayê ye. 12 Ew ne bi xwîna
nêrî û golikan, lê belê bi xwîna xwe, bi carekê ket Cihê Herî Pîroz
û rizgariya herheyî peyda kir. 13 Çimkî, eger xwîna nêrî û cone-
gayan û xweliya noginan li yên murdar* bê reşandin û wan paqij
bike, 14 hingê xwîna Mesîhê ku bi Ruhê herheyî xwe bêleke pêş-
kêşî Xwedê kiriye, wê hê çiqas zêdetir wijdana me ji kirinên* mirî
paqij bike, da ku em biperizin Xwedayê jîndar!

*Xwegorîkirina Mesîh Guneh Dûr Kirin*

15 Ji bo vê yekê Mesîh navberkarê Peymana Nû ye, da ku yên
hatine gazîkirin, mîrasa herheyî ya ku hatiye sozdan bistînin. Çim-
kî mirina wî berdêla wan sûcan e yên ku di dema peymana pêşî de
hatin kirin. 16 Heçî wesiyet e, divê mirina yê ku wesiyet kiriye kifş
bibe. 17 Çimkî wesiyet piştî mirinê tê cih. Heta yê ku wesiyet kiriye
sax be, desthilatiya wê tune. 18 Loma peymana pêşî jî bê xwîn ne-
hat girêdan. 19 Çimkî piştî ku Mûsa her emrê Şerîetê ji tevahiya gel
re got, bi hiriya sor û bi çiqilê gûrizê* xwîna nêrî û conegayan bi
avê re, li kitêbê* bi xwe û li tevahiya gel reşand 20 û got: «Ev xwî-
na wê peymanê ye ya ku Xwedê li we emir kiriye.»[a] 21 Bi vî awayî
wî xwîn li kon û li hemû firaxên perizînê reşand. 22 Îcar li gor Şe-
rîetê hema bêje her tişt bi xwînê tê paqijkirin û bê rijandina xwînê
li gunehan nayê bihûrtin.
23 Loma diviya ku wêneyên tiştên li ezmanan bi van goriyan, lê
belê yên ezmanî bi xwe bi goriyên hê çêtir bên paqijkirin. 24 Çimkî
Mesîh neket pîrozgeha ku bi destan hatiye çêkirin û sûretê ya ras-
tîn e; lê belê ew ket ezmên bi xwe, da ku niha ji bo me li ber
Xwedê raweste. 25 Serokkahîn her sal carekê bi xwîna ku ne ya wî
ye dikeve Cihê Herî Pîroz, lê belê Mesîh neketê ku xwe gelek

---

[a] **9:20** Ji: Derketin 24:8

**9:13** Qanûna Kahîntiyê 16:15-16; Hijmartin 19:9, 17-19

**9:19** Derketin 24:3-8

**9:21** Qanûna Kahîntiyê 8:15 **9:22** Qanûna Kahîntiyê 17:11

caran pêşkêş bike. [26] Eger wusa bûya, ji damezrandina dinyayê ve
diviya wî gelek caran cefa bikişanda. Lê niha, di dawiya deman de
ew bi carekê xuya bû, da ku bi xwegorîkirinê guneh ji holê rake.
[27] Û çawa ku ji bo mirovan carekê mirin û piştî wê dîwanbûn neçar
e, [28] Mesîh jî ji bo ku gunehên gelekan hilgire carekê hat pêşkêş-
kirin. Cara diduyan, ew ne ji bo hilgirtina guneh, lê ji bo xilasbûna
wan ên ku li hêviya wî disekinin, wê xuya bibe.

### *Gorîbûna Îsa Gorîbûna Dawî Ye*

10 Şerîet ne xuyabûna rastîn a tiştên qenc ên ku wê bên, lê bi
tenê siya wan e. Ji ber vê yekê Şerîet tu caran nikare bi wan
eynî goriyên ku hergav sal bi sal tên pêşkêşkirin, wan ên ku nêzîk
dibin, bigihîne bêkêmahîtiyê. [2] Nexwe, eger paqij bibûna, wanê dev
ji pêşkêşkirina wan berda. Çimkî eger yên ku diperizin bi carekê ji
gunehên xwe paqij bibûna, êdî di wijdana wan de qet sûcdarkirina
guneh nedima. [3] Lê belê ew gorî sal bi sal gunehên mirovan tînin
bîra wan. [4] Çimkî xwîna conega û nêriyan nikare gunehan rake.
[5] Loma çaxê ku Mesîh hat dinyayê, wî got:

«Te gorî û pêşkêş nexwestin,
Lê te ji min re bedenek amade kir.
[6] Tu bi goriyên şewitandinê
Û bi goriyên ku di ber guneh de tên dayîn, razî nebûyî.
[7] Hingê min got: ‹Wek ku di Kitêbê de li ser min hatiye nivîsîn:
Ya Xwedê, va ye, ez hatim da ku ez daxwaza te bînim cih.›»[a]

[8] Pêşî got: «Te gorî, pêşkêş, goriyên şewitandinê û goriyên ku di
ber guneh de tên dayîn, nexwestin û tu ji van razî nebûyî» – heçî
ev in, ew li gor Şerîetê tên dayîn. [9] Hingê weha got: «Va ye, ez
hatim da ku ez daxwaza te bînim cih.» Ew ya pêşî hiltîne, da ku ya
diduyan deyne. [10] Li gor vê daxwazê bi pêşkêşbûna bedena Îsa Me-
sîh ya bi carekê, em hatin pîrozkirin.
[11] Her kahîn roj bi roj radibe, xizmetê dike û gelek caran eynî
goriyên ku qet nikarin guneh rakin, pêşkêş dike. [12] Lê viyê ha ji bo

---

[a] 10:5-7 Ji: Zebûr 40:6-8
9:27 Destpêkirin 3:19 9:28 Îşaya 53:12

her û her tenê goriyek di ber gunehan de pêşkêş kir û li milê Xwe-
dê yê rastê rûnişt.
13 Ji hingê û pê ve, ew li bendê ye heta ku dijminên wî bibin pê-
geha lingên wî. 14 Çimkî wî bi pêşkêşiyekê ew ên ku tên pîrozkirin,
her û her gihandine bêkêmahîtiyê.
15 Ruhê Pîroz jî li ser vê ji me re şahidiyê dike û dibêje:
16 «Xudan dibêje: ‹Piştî wan rojan
Peymana ku ezê bi wan re girêdim ev e:
Ezê qanûnên xwe bixim dilê wan
Û ezê wan li ser hişê wan binivîsim.
17 Êdî ez gunehên wan û neheqiyên wan
Tu caran naynim bîra xwe.›»[a]
18 Îcar li dera ku lêbihûrtina van heye, êdî pêwistiya pêşkêşiya di
ber guneh de namîne.

### *Şîret û Hişyarkirin*

19 Ji bo vê yekê birano, bi xwîna Îsa em dikarin bi cesaret bi-
kevin Cihê Herî Pîroz. 20 Em di wê riya nû û jîndar re bikevinê ya
ku wî ji bo me di bedena xwe de di perdê de vekiriye. 21 Û li ser
mala Xwedê kahînekî me yê mezin heye. 22 Em bi dilê ku bi xwîn-
reşandinê ji wijdana xerab paqij bûyî û bi bedena ku bi ava paqij
hatî şuştin, bi piştrastiya temam a baweriyê, bi dilekî rastîn nêzîkî
Xwedê bibin. 23 Em, hêviya ku em eşkere dikin hişk bigirin; çimkî
ew ê ku soz daye ewledar e. 24 Û em hay ji hev hebin, ku em hevdû
ji bo hezkirin û kirinên qenc bişidînin. 25 Wek ku hinekan ji xwe re
kiriye adet, em dev ji civînên xwe bernedin, lê çawa ku hûn dibî-
nin Roja Xudan nêzîk dibe, hê zêdetir cesaretê bidin hevdû.
26 Çimkî, piştî ku em gihîştin zanîna rastiyê, eger em bi zanîn
guneh bikin, êdî ji bo gunehan tu gorî namîne, 27 lê tenê libendê-
mayîneke tirsehêz ya dîwanê û agirê kelegerm ê ku dijminan di-
xwe û tune dike, dimîne. 28 Yê ku Şerîeta Mûsa* bişkanda, li ser şa-
hidiya dido an sê kesan, bê rehm dihat kuştin. 29 Îcar di gumana we
de yê ku Kurê Xwedê di bin lingan de biperçiqîne, xwîna Peymanê

---

[a] **10:16-17** Ji: Yêremya 31:33-34; Hezekiyêl 8:10+12
**10:12** Binêre: Zebûr 110:1 **10:22** Qanûna Kahîntiyê 8:30; Hezekiyêl 36:25
**10:28** Dubarekirina Şerîetê 17:6

ya ku ew pê hatiye pîrozkirin, pîs bibîne û Ruhê keremê nizim
bike, ewê cezayekî hê çiqas xerabtir heq bike? 30 Çimkî em wî yê
ku ev gotiye nas dikin: «Heyfhilanîn ya min e, ezê bergîdana* wê
bidim.»[a] Û dîsa: «Xudan wê dîwana gelê xwe bike.»[b] 31 Tiştekî tir-
sehêz e ku mirov bikeve destê Xwedayê jîndar.
32 Îcar wan rojên pêşî yên piştî ku hûn hatin ronahîkirin, bînin
bîra xwe: Gava hûn ketibûn tengahî û cefayên giran, we çawa ev
ragirtibû*. 33 Carna hûn li ber çavan hatin şermezarkirin û hûn ke-
tin tengahiyê. Carna jî hûn bi yên ku weha li wan hat kirin re bûn
hevpar. 34 Çimkî hûn bûn hevalparê derdê girtiyan û we talankirina
malên xwe bi şahî ragirt, çimkî we dizanibû ku malê çêtir û ma-
yîndar ji bo we heye. 35 Loma cesareta xwe neavêjin, xelata wê
mezin e. 36 Ragirtin* ji we re lazim e, da ku hûn daxwaza Xwedê
bikin û soza ku daye bistînin.

37 «Çimkî di demeke kurt de,
Yê ku tê wê bê
Û dereng namîne.
38 Lê yê min ê rast wê bi baweriyê bijî.
Lê eger ew xwe bi şûn ve bikişîne,
Canê min ji wî razî nabe.»[c]

39 Lê belê em ne ji wan in ên ku xwe bi şûn ve dikişînin û helak
dibin; lê em ji wan in ên ku ji bo rizgariya canê xwe bawer dikin.

### *Baweriya Birahîm û Yên Din*

11 Îcar bawerî*, ewlebûna tiştên ku hêvî bi wan tê kirin e,
piştrastbûniya tiştên ku nayên dîtin e. 2 Bi vê baweriyê, bav
û kalên me ji aliyê Xwedê ve hatin erêkirin.
3 Bi baweriyê, em fêm dikin ku erd û ezman bi peyva Xwedê
hatine damezrandin; wusa ku tiştên tên dîtin, ji tiştên nayên dîtin
çêbûne.
4 Bi baweriyê, Habîl* goriyeke ji ya Qayîn çêtir pêşkêşî Xwe-
dê kir. Bi wê baweriyê ew mirovekî rast hat erêkirin, çimkî Xwedê

---

[a] **10:30** Ji: Dubarekirina Şerîetê 32:35

[b] **10:30** Ji: Dubarekirina Şerîetê 32:36; Zebûr 135:14

[c] **10:37-38** Ji: Habaqûq 2:3-4

**10:29** Derketin 24:8 **11:3** Destpêkirin 1:1; Zebûr 33:6-9

diyariyên wî erê kirin. Rast e, Habîl mirî ye, lê bi saya baweriya
xwe hê jî dipeyive*.
[5] Bi saya baweriyê, Henox ji bo ku mirinê nebîne, hat hilki-
şandin. «Ew nehat dîtin, çimkî Xwedê ew hilkişandibû». Û beriya
hilkişandina wî, şahidî hat kirin ku ew li Xwedê xweş hatibû.[a] [6] Û
bê bawerî çênabe ku mirov li Xwedê xweş bê, çimkî yê ku nêzîkî
Xwedê bibe, divê bawer bike ku Xwedê heye û wan ên ku li wî
digerin xelat dike.
[7] Bi baweriyê, Nûh*, gava ew li ser tiştên ku hê nedihatin dîtin
ji aliyê Xwedê ve hat hişyarkirin, bi tirsa Xwedê ji bo xilasiya ma-
la xwe gemiyek çêkir. Bi vê baweriyê wî dinya sûcdar derxist û bû
wêrisê wê rastdariya ku ji baweriyê tê.
[8] Bi baweriyê, gava ku Birahîm* hat gazîkirin ku here wî cihê
ku wê bi mîrasî bistanda, wî li gor peyva Xwedê kir û bêyî ku
bizane wê here ku derê, ket rê. [9] Bi baweriyê, wek yekî xerîb li we-
latê ku jê re hatibû soz dan, ma û bi hevparên eynî sozê, bi Îshaq*
û Aqûb* re di konan de rûnişt. [10] Çimkî ew li hêviya wî bajarê ku
bingeha wî saxlem e dima, ku avakar û çêkerê wî Xwedê ye.
[11] Bi saya baweriyê Birahîm, bi ser ku ew pîr bû û Sara jî
nedikarî zarokan bianiya, dîsa hêz dît ku bibe bav. Çimkî wî, yê ku
soz dabû dilsoz dît. [12] Îcar ji yekî ku hema bêje mirî bû, bi qasî stê-
rên ezmên, wek seylaka* ber devê deryayê bêhesab dûndan* çêbû.
[13] Evên ha hemû di baweriyê de mirin. Ew negihîştin sozên ku
hatibûn dayîn, lê belê ew ji dûr ve dîtin û silav li wan kirin; wan
eşkere kirin ku ew li ser rûyê erdê xerîb û mêvan in. [14] Yên ku tiş-
tên weha dibêjin, kifş dikin ku ew li welatekî digerin. [15] Û bi rastî,
eger wan bêriya dera ku jê derketibûn bikirana, ji bo vegerînê fer-
senda wan wê hebûya. [16] Lê wan welatekî hê çêtir, yanî yê ezmanî
dixwest. Ji ber vê yekê Xwedê şerm nake ku ew bêjin: «Ew
Xwedayê me ye»; çimkî wî ji wan re bajarek amade kiriye.
[17] Gava ku Birahîm hat ceribandin, bi baweriyê wî Îshaq

---

[a] **11:5** Ji: Destpêkirin 5:24

**11:4** Destpêkirin 4:3-10 **11:7** Destpêkirin 6:9-9:17
**11:8** Destpêkirin 12:1-5 **11:9** Destpêkirin 23:4; 26:3; 35:12, 27
**11:11** Destpêkirin 17:19; 18:11-14; 21:2
**11:12** Destpêkirin 15:5-6; 22:17; Derketin 32:13 **11:13** 1 Dîrok 29:15

pêşkêş kir. Wek yekî ku sozên Xwedê standiye, kurê xwê yê yekta
pêşkêş dikir. [18] Ji wî re hatibû gotin: «Ji Îshaq dûndana te wê zêde
bibe.»[a] [19] Birahîm fikirî ku Xwedê dikare ji nav miriyan jî rake û
wî bi awayekî mînakî wek ku Îshaq ji nav miriyan bistîne, ew bi
şûn ve stand.

[20] Bi baweriyê, Îshaq* li ser tiştên ku wê bên ji bo Aqûb* û
Esaw* duayên qenc kirin. [21] Bi baweriyê, Aqûb li ber mirinê ji bo
herdu kurên Ûsiv duayên qenc kirin, «pala xwe da serê gopalê xwe
û perizî* Xwedê.»[b] [22] Bi baweriyê, Ûsiv li ber mirinê, li ser der-
ketina zarokên* Îsraêl ya ji Misrê peyivî û li ser hestiyên xwe li
wan emir kir.

[23] Gava ku Mûsa* çêbû, bi baweriyê, dê û bavê wî sê mehan
ew veşartin. Çimkî dîtin ku zarok pirr xweşik e û ji fermana
padîşah netirsiyan. [24] Gava ku Mûsa mezin bû, bi baweriyê red kir
ku jê re kurê keça Firewn* bê gotin. [25] Ji dêla ku ew demekê kêfa
guneh bike, wî bi gelê Xwedê re cefakişandin bijart [26] û şerme-
zariya di ber Mesîh de ji xezîneyên Misrê dewlemendiyeke meztir
hesab kir. Çimkî wî li xelata ku wê bistanda dinêrî. [27] Bi baweriyê,
ew ji Misrê derket û ji hêrsa padîşah netirsiya. Wek yê ku nayê
dîtin dîtibe, tengahî ragirt. [28] Wî bi baweriyê, Cejna* Derbasbûnê
cara pêşî pêk anî û emir kir ku xwîn li ser deriyan bê reşandin, da
ku milyaketê ku nixuriyan dikuje, dest nede wan. [29] Bi baweriyê,
Îsraêlî wek ku di bejê re derbas bibin, di Derya Sor re derbas bûn.
Gava ku Misriyan ev ceriband, di avê de xeniqîn.

[30] Bi baweriyê, piştî ku Îsraêlî heft rojan li dora sûrên Erîhayê
zivirîn, ew hilweşiyan. [31] Bi baweriyê, Rexaba* fahîşe bi neguhda-
ran re nehat helakkirin, çimkî wê nêrevan* bi aştî qebûl kiribûn.

[32] Û hê ez çi bêjim? Eger ez tiştên li ser Gîdeyon*, Baraq*,
Şimşon*, Yêfta*, Dawid*, Samûêl* û li ser pêxemberan bêjim, de-
ma min têrê nake. [33] Bi baweriyê ew li hember padîşahiyan bi ser
ketin, wan dadperwerî* anîn cih, gihîştin sozên ku hatibûn dayîn,

---

[a] **11:18** Ji: Destpêkirin 21:12
[b] **11:21** Ji: Destpêkirin 47:31; 48:1-20

**11:17** Destpêkirin 22:1-14
**11:20** Destpêkirin 27:27-29; 27:39-40
**11:22** Destpêkirin 50:24-25; Derketin 13:19
**11:23** Derketin 1:22; 2:2
**11:24** Derketin 2:10-12
**11:28** Derketin 12
**11:29** Derketin 14:21-31
**11:30** Yêşû 6:12-21
**11:31** Yêşû 2:1-21; 6:22-25

devê şêran girtin, [34] hêza êgir temirandin, ji devê şûr filitîn, di bê-
hêziyê de hêz standin, di şer de bûn yên xurt, ordiyên biyaniyan
belav kirin. [35] Jinan, miriyên xwe bi vejînê* bi şûn ve standin. Hi-
nekan îşkence kişandin, lê azadî red kirin, da ku ji mirinê rabin û
bigihîjin jiyaneke hê çêtir. [36] Hinekên din bi tinaz û qamçiyan, erê
heta bi girêdan û zîndanê hatin ceribandin. [37] Hatin kevirkirin, bi
birrekê hatin birrîn, ketin ber devê şûr û hatin kuştin. Bi postê
miyan, bi çermê bizinan geriyan; belengazî kişandin, tengahî dîtin,
xerabî li wan hat kirin. [38] Dinya ne hêjayî wan bû; li çolan û li çi-
yayan, di şkeftan û di kunên bin erdê de eware geriyan.
[39] Îcar bi ser ku ew hemû bi baweriyê hatin erêkirin jî, ew
negihîştin tiştên ku hatibûn sozdan. [40] Çimkî, ji bo ku bêyî me ew
negihîjin bêkêmahiyê, Xwedê ji me re tiştekî hê çêtir amade ki-
riye.

### *Mînaka Îsa*

12 Îcar li gor ku ewrekî evqas mezin ê şahidan hawirdora me
girtiye, em jî her giraniyê û gunehê ku bi hêsanî xwe li me
dipêçe ji ser xwe bavêjin, bi bîhna fireh wê hevbezîna ku li ber me
ye, bibezin. [2] Em çavên xwe bidin ser pêşeng û temamkarê bawe-
riya xwe, Îsa. Wî ji bo şahiya ku li ber wî bû xaç ragirt ser xwe û
şermî bi tiştekî hesab nekir û li milê Xwedê yê rastê rûnişt. [3] Îcar li
ser wî bifikirin ê ku dijraberiya mezin a gunehkaran ragirtiye, da
ku hûn newestin û di dilê xwe de sist nebin.
[4] We hê di şerê li hember guneh de li ber xwe nedaye heta ku
xwîna we bê rijandin. [5] Ma we ew şîreta ku li we kuran tê kirin, ji
bîr kir? Dibêje:

«Kurê min, edebkirina Xudan biçûk nebîne,
Û çaxê ku ji aliyê wî ve li te bê hilatin*, sist nebe.
[6] Çimkî Xudan, wî yê ku jê hez dike, edeb dike
Û her kurê ku qebûl dike, ceza dike.»[a]

[7] Ji bo terbiyebûnê hûn radigirin*, çimkî Xwedê wek zarokên

---

[a] **12:5-6** Ji: Gotinên Silêman 3:11-12
**11:33** Daniyêl 6 **11:35** 2 Padîşah 4:25-37
**11:36** 1 Padîşah 22:26-28; Yêremya 20:1-2; 37:15; 38:6
**11:37** 2 Dîrok 24:20-21 **12:2** Binêre: Zebûr 110:1

xwe bi we re dide û distîne. Ma kîjan kur ji aliyê bavê xwe ve nayê
terbiyekirin? [8] Lê eger hûn ji terbiyekirina ku hemû pê tên terbi-
yekirin bêpar bin, hingê hûn ne kur in, lê hûn wek zarokên derveyî
qanûnê ne. [9] Îcar ji vê zêdetir bavên me yên vê dinyayê yên ku em
terbiye dikirin hebûn û me ji wan re hurmet kir. Ma emê ne hê
bêtir bi ya Bavê* xwe yê ruhanî bikin û bijîn? [10] Bavên me wek ku
qenc didîtin, em ji bo demeke kurt terbiye dikirin, lê Xwedê ji bo
feyda me, me terbiye dike, da ku em bibin hevparên pîroziya* wî.
[11] Rast e, her terbiyekirin di sêrî de ne wek şahî, lê belê wek xem-
gîniyê tê dîtin. Lê belê piştre ev ji bo yên ku bi wê hatine per-
werdekirin, berê aştî û rastiyê tîne.

[12] Ji ber vê yekê, destên xwê yên daketî û çokên xwe yên bêta-
qet bişidînin, [13] ji bo lingên xwe riyên rast çêkin, da ku tiştê kulek
ji movikê dernekeve, lê belê sax bibe.

### *Xwedê Red Nekin*

[14] Bikevin pey wê yeka ku hûn bi hemûyan re di aştiyê de bin
û li pey jiyana pîroz a ku bê wê tu kes Xudan nabîne, herin. [15] Hay
ji xwe hebin, bila tu kes ji kerema Xwedê nemîne. Bila di nav we
de tu rayê* tehl ê ku we aciz bike û gelek pê murdar bibin, der-
nekeve. [16] Nebe ku yek, zînakar an bê tirsa Xwedê be, wek Esaw*
ê ku mafê nixurîtiya xwe bi xwarinekê firot. [17] Hûn dizanin ku
piştre wî xwest ku bereketa nixurîtiyê mîras bistîne, lê hat redkirin.
Bi hêstirên çavan li pey geriya jî, wî nikaribû biryara ku hatiye
dayîn biguhere.

[18] Hûn nêzîkî wî çiyayê ku tê destdan û dişewite, bi mij, bi
taristanî û bi bahoz e, nebûn; [19] hûn nêzîkî dengê boriyê û wan
peyvên, yên ku ew bihîstin, lava kirin ku gotineke din ji wan re
neyê gotin, nebûn. [20] Wan ew emrê ku digot: «Eger heywanek jî li
çiyê bikeve, wê bê kevirkirin»[a] nikaribûn ragirin. [21] Dîtin wusa
tirsehêz bû ku Mûsa got: «Ez gelek ditirsim û dilerizim.»[b] [22] Lê
hûn nêzîkî Çiyayê Siyonê* û bajarê Xwedayê jîndar, yanî Orşe-

---

[a] **12:20** Ji: Derketin 19:12-13
[b] **12:21** Ji: Dubarekirina Şerîetê 9:19
**12:7** Dubarekirina Şerîetê 8:5
**12:12** Îşaya 35:3
**12:16** Destpêkirin 25:29-34; 27:30-40
**12:17** Destpêkirin 27:30-40
**12:18** Derketin 19:16-22; 20:18-21
**12:18-19** Derketin 19:10-25; 20:1-21

lîma* ezmanî bûn, ku li wir bi deh hezaran milyaket bi şahî beşdarî
pîrozkirinê bûn. [23] Hûn hatine Civîna* nixuriyên ku navê wan li ez-
manan nivîsî ye û nêzîkî dadgerê* hemûyan Xwedê û ruhên kesên
rast ên ku gihîştine bêkêmahiyê bûne. [24] Hûn nêzîkî navberkarê Pey-
mana Nû Îsa bûn ku xwîna wî ya reşandî ji ya Habîl* çêtir dibêje.
[25] Hay ji xwe hebin û yê ku dipeyive red nekin. Ew ên ku den-
gê wî yê ku ew li ser erdê hişyar kirin, red kirin, xilas nebûn. Îcar,
eger em berê xwe ji wî yê ku ji ezmanan dibêje badin, em hê bêtir
nikarin xilas bibin. [26] Hingê dengê wî erd hejand, lê belê niha soz
daye û gotiye: «Êdî careke din, ezê ne tenê erdê, lê ezmên jî vehe-
jînim.» [27] Bi gotina: «Careke din» jiholêrakirina tiştên ku vedi-
hejin, yanî tiştên ku hatine afirandin, tê eşkerekirin; da ku tiştên ku
venahejin mayîndar bin. [28] Ji ber vê yekê em şikir bikin ku em
padîşahiyeke ku nayê vehejandin, distînin û bi vî awayî em bi tirs
û hurmetê biperizin Xwedê, wek ku li wî xweş tê. [29] Çimkî Xwe-
dayê me agirek e ku dixwe û tune dike.

### *Şîretên Dawî*

13 Bila birahezî mayîndar be. [2] Mêvanperweriyê ji bîr nekin.
Çimkî bi vê yekê hinekan bêyî ku bizanin, milyaket kirin
mêvan. [3] Girtiyan bînin bîra xwe, wek ku hûn bi wan re girtî ne û
cefakêşan jî bînin bîra xwe, wek ku di bedenê de hûn jî wek wan
in. [4] Bila her kes bi hurmet li zewacê binêre û bila nivîna zewacê
bêleke be. Çimkî Xwedê wê dîwana fuhûşkar û zînakaran bike.
[5] Bila rabûn û rûniştina we ji hezkirina peran dûr be; bi tiştê ku di
destê we de ye razî bin. Çimkî Xwedê gotiye:

«Ez tu caran te nahêlim,
Ez tu caran te bernadim.»[a]

[6] Wusa ku em bi ewlehî bêjin:

«Xudan alîkarê min e,
Ez natirsim.
Mirov wê çi bi min bike?»[b]

---

[a] 13:5 Ji: Dubarekirina Şerîetê 31:6
[b] 13:6 Ji: Zebûr 118:6
12:24 Destpêkirin 4:3-10
12:25 Derketin 20:22
12:26 Binêre: Hagay 2:6
12:29 Dubarekirina Şerîetê 4:24
13:2 Destpêkirin 18:1-8; 19:1-3

[7] Rêberên xwe, yên ku peyva Xwedê ji we re gotine, bînin bîra
xwe. Dawiya jiyana wan bînin ber çavên xwe û baweriya wan ji
xwe re bikin mînak. [8] Îsa Mesîh, duh, îro û her û her eynî ye. [9] Bi
hîndariyên xerîb û cihê vir de wê de neyên kişkişandin, çimkî qenc
e ku dil bi kerema Xwedê xurt bibe, ne bi xwarinên taybetî. Yên
ku bi van mijûl bûn tu feyde nedîtin. [10] Gorîgeheke me heye ku yên
di kon de xizmetê dikin, desthilatiya wan tune ku jê bixwin.
[11] Çimkî ew heywanên ku Serokkahîn xwîna wan ji bo guneh
dibe nav Cihê Pîroz, termê wan li derveyî wargeh tê şewitandin.
[12] Ji ber vê yekê Îsa jî, ji bo ku bi xwîna xwe gel pîroz bike, li der-
veyî dergeh cefa kişand. [13] Ji bo vê yekê em jî herin derveyî war-
geh ba wî û şermezariya wî deynin ser xwe. [14] Çimkî li vir bajarekî
me yê ku bimîne, tune; lê em, li yê ku wê bê digerin. [15] Loma em
bi saya Îsa hergav wek goriyekê, pesnê Xwedê bidin, yanî fêkiyê
lêvên ku navê wî eşkere dikin, pêşkêş bikin. [16] Ji bîr nekin ku hûn
qenciyê bikin û tiştên xwe li hev leva* bikin. Çimkî goriyên weha
li Xwedê xweş tên.
[17] Bi ya rêberên xwe bikin û ji gotina wan dernekevin. Çimkî
ew wek ên ku wê hesab bidin, berevaniya canê we dikin. Guh
bidin wan, da ku ew vê yekê ne bi nalîn, lê bi dilxweşî bikin. An
na, wê ji bo we bê kêr be.
[18] Ji bo me dua bikin. Em piştrast in ku wijdana me paqij e û
em dixwazin di her tiştî de bi awayekî rast rêve herin. [19] Ez bi
zêdehî hêvî ji we dikim ku hûn dua bikin, da ku ez zû li we bêm
vegerandin.

### *Silavên Aştiyê*

[20] Îcar Xwedayê aştiyê, yê ku şivanê miyan ê mezin, Xudanê
me Îsa, bi xwîna Peymana herheyî ji nav miriyan rakir, [21] bila we
bi her tiştên qenc rapêçe, da ku hûn daxwaza wî bînin cih û bila bi
rêberiya Îsa Mesîh tiştê ku li wî xweş tê bi me bide kirin. Rûmet
her û her ji wî re be. Amîn*.
[22] Îcar birano, ez hêvî ji we dikim, van peyvên şîretê ragirin.
Çimkî min ji we re kurt nivîsî. [23] Bizanin ku birayê me Tîmotêyos*

---

13:11 Qanûna Kahîntiyê 16:27
13:15 Zebûr 50:14

serbest hat berdan. Eger di nêzîk de bê, ezê bi wî re bêm, we
bibînim.
24 Silavan li hemû rêberên xwe û li pîrozan bikin. Yên li Îtalya-
yê silavan li we dikin. 25 Kerem li ser we hemûyan be. Amîn.

# *Nameya Aqûb*

### *Pêşgotin*

*Aqûb bi xwe serwerekî civîna bawermendan a li Orşelîmê bû (Karên Şandiyan 12:17; 15:13; 21:18; 1 Korîntî 15:7; Galatî 1:19; 2:9). Nameya Aqûb a ku ji hemû bawermendên çar aliyên dinyayê re hatiye nivîsîn, kifş dike ku baweriya bê kirin, mirî ye. Di nameyê de tê dîtin ku li ser pirsên wek dewlemendî û belengazî, ceribandin, karê baş, dadbarkirin, bawerî û dudilîtî, xebitandina zimên, şehrezayî, pevçûn, qaretî û nefsbiçûkî, pesindan, sebir û li ser duayê tê rawestan.*

*Ev name dikare bi vî awayî bê beşkirin:*

*I. Silav*
*II. Bawerî û şehrezayî 1:2-8*
*III. Belengazî û dewlemendî 1:9-11*
*IV. Ceribandin 1:12-18*
*V. Bihîstin û kirin 1:19-27*
*VI. Li hember cudatiyê hişyarî 2:1-13*
*VII. Bawerî û kar 2:14-26*
*VIII. Bawermend û zimanê wî 3:1-18*
*IX. Bawermend û dinya 4:1-5:6*
*X. Bîhnfirehî û dua 5:7-20*

### *Silav*

1 Aqûbê* xulamê Xwedê û Xudan Îsa Mesîh, silavan li diwanzdeh eşîrên ku belav bûne dike.

### *Bawerî û Zanîn*

2 Birayên min, kengê hûn bikevin ceribandinên cûr bi cûr, vê
yekê şahiyeke temam hesab bikin. 3 Çimkî hûn dizanin ceribandina
baweriya* we ragirtinê* pêk tîne. 4 Û bila ragirtin karê xwe temam
bike, da ku hûn bibin mirovên temam û gihîştî û di tiştekî de kêmahiya we tune be. 5 Eger şehrezayiya yekî ji we kêm be, bila ji
Xwedayê ku bi comerdî dide hemûyan û lê nahile, bixwaze û wê ji
wî re bê dayîn. 6 Lê bila bi bawerî* bixwaze û dudilî nebe. Çimkî

yê ku dudilî dibe, wek pêla deryayê ye ya ku ba lê dixe û şeqil
dide. [7] Mirovekî weha bila nefikire ku ewê tiştekî ji Xudan bistîne.
[8] Ew mirovekî dudilî û di hemû riyên xwe de bêbiryar e.

### *Xizanî û Dewlemendî*

[9] Birayê reben bila bi serbilindiya xwe, [10] yê dewlemend jî bila
bi rebeniya xwe pesnê xwe bide. Çimkî ewê wek kulîlka giyê der-
bas bibe. [11] Ji ber ku roj bi germiya xwe ya bi şewat hiltê û giyê
hişk dike. Kulîlka giyê dikeve û spehîtiya wê namîne. Bi vî awayî
yê dewlemend jî wê di nav kar û xebata xwe de biçilmise.

### *Ceribandin*

[12] Xwezî bi wî mirovê ku ceribandinê radigire*. Çimkî gava ku
ji ceribandinê serfiraz derkeve, wê taca jiyanê ya ku Xwedê ji yên
ku ji wî hez dikin re soz daye, bistîne. [13] Gava ku tê ceribandin,
bila tu kes nebêje: «Ez ji aliyê Xwedê ve têm ceribandin.» Çimkî
Xwedê bi tiştên xerab nayê ceribandin û ew bi xwe jî tu kesî nace-
ribîne. [14] Lê her kes ji aliyê xwesteka xwe ve tê kaşkirin, xapandin
û tê ceribandin. [15] Di pey de xwestek avis dibe û guneh tîne. Û
çaxê ku guneh digihîje, mirinê tîne.
[16] Birayên min ên hezkirî, neyên xapandin! [17] Her dayîna qenc
û her diyariya bêkêmahî ji jor e, ji Bavê* ronahiyê tê xwarê. Li ba
wî guherîn û siya zivironekiyê tune. [18] Wî li gor daxwaza xwe, bi
peyva* rastiyê jiyan da me, da ku em bibin cûreyeke berê* pêşî yê
afirînên wî.

### *Guhdarîkirin û Anîna Cih*

[19] Birayên min ên hezkirî, hûn vê bizanin: Bila her mirov di
bihîstinê de bi lez be, di peyivîn û hêrsbûnê de giran be. [20] Çimkî
hêrsbûna mirov rastiya Xwedê pêk nayne. [21] Ji ber vê yekê her
cûreyê pîsîtiyê û xerabiya ku pirr bûye ji ser xwe bavêjin. Bi nermî
peyva ku di dilê we de hatiye çandin û dikare canê we xilas bike,
qebûl bikin.
[22] Xwe nexapînin û nebin yên ku tenê peyvê dibihîzin, lê pey-
vê bînin cih. [23] Eger kesek guhdarê peyva Xwedê be û wê neyne

---

**1:10** Îşaya 40:6-7

cih, wek wî kesî ye ku di neynikê de li rûyê xwe yê rast dinêre.
24 Ew li xwe dinêre, piştre diçe û di cih de ji bîr dike ka ew çawa
ye. 25 Lê belê yê ku li Şerîeta* bêkêmahî ya ku azad dike, qenc
dinêre û di wê de dimîne û tiştên ku dibihîze ji bîr nake, lê pêk
tîne, ewê di karê xwe de bextewar be.
26 Eger yê ku xwe dîndar dihesibîne, zimanê xwe dezgîn* neke
û dilê xwe bixapîne, dîndariya wî pûç e. 27 Li ba Bav Xwedê, dîn-
dariya paqij û bêleke ev e ku mirov di tengahiyên sêwî û jinebiyan
de here serdana wan û xwe ji lekeyên dinyayê biparêze.

### *Li hember Cihêtiyê Rawestin*

2 Birayên min, hûn ên ku baweriyê bi Xudanê me yê bi rûmet
Îsa Mesîh tînin, cihêtiyê nexin nav mirovan. 2 Mesela, eger ye-
kî bi gustîlka zêrîn û bi cilên şewqdar bê civîna we û yekî belengaz
jî bi cilên qirêjî bê 3 û hûn xatirê wî yê ku cilên şewqdar wergirtine
bigirin û bêjin: «Kerem ke, li vir, li jor rûne» û ji yê belengaz re
bêjin: «Li vir raweste» an: «Li ber lingên min rûne», 4 ma hûn hin-
gê di nav xwe de cihêtiyê nakin û nabin dadgerên* fikirxerab?
5 Birayên min ên hezkirî, guhdar bin. Ma Xwedê belengazên li
dinyayê nebijartine ku di baweriyê de dewlemend bin û bibin wê-
risên wê padîşahiya ku wî soz daye wan ên ku ji wî hez dikin? 6 Lê
belê, we yê belengaz bêrûmet kir. Ma yên ku serdestiyê li we dikin
ne yên dewlemend in? Ma ne ew in ku we dikişînin ber dadge-
han*? 7 Ma ne ew in ku çêrî wî navê qenc dikin, yê ku li we hatiye
kirin?
8 Eger hûn li gor Nivîsara* Pîroz a ku dibêje: «Wek ku tu ji
xwe hez dikî, ji cîranê xwe hez bike»[a], Şerîeta Padîşahiyê pêk bî-
nin, hûn qenc dikin. 9 Lê eger hûn cihêtiyê bixin nav mirovan, hûn
guneh dikin û hûnê ji aliyê Şerîetê ve sûcdar bên derxistin. 10 Çim-
kî kî ku tevahiya Şerîetê pêk bîne û di tiştekî tenê de bikeve, li ber
tevahiya wê sûcdar e. 11 Çimkî yê ku gotiye: «Zînayê neke», go-
tiye: «Nekuje» jî.[b] Îcar, eger tu zînayê nekî, lê tu bikujî, te Şerîet
şkandiye. 12 Wek wan ên ku wê bi şerîeta ku azadiyê dide bên
dîwankirin*, weha bipeyivin û bikin. 13 Çimkî dîwan, ji bo wî yê

[a] **2:8** Ji: Qanûna Kahîntiyê 19:18

[b] **2:11** Ji: Derketin 20:13, 14; Dubarekirina Şerîetê 5:17, 18

ku rehm nekiriye, bê rehm e, lê rehm li hember dîwanê bi ser di-
keve.

### *Bawerî û Kirin*

[14] Birayên min, eger yek bêje ku baweriya wî heye, lê kirinên
wî tune, hingê çi feyde heye? Ma ew bawerî dikare wî xilas bike?
[15] Eger birayek an xwişkek tazî û bê xwarina rojane be [16] û yek ji
we ji wan re bêje: «Bi xêr û silamet herin, germ bibin û têr bibin»,
lê hûn hewcedariya wan a bedenê nedin wan, hingê çi feyde heye?
[17] Bi vî awayî baweriya bi serê xwe, eger kirinên wê tune bin, mirî
ye.
[18] Lê belê yek wê bêje: «Baweriya te heye, kirinên min hene!»
Bê kirinên xwe baweriya xwe nîşanî min bide û ezê bi kirinên xwe
ve baweriya xwe nîşanî te bidim. [19] Ma tu bawer dikî ku Xwedê
yek e? Tu qenc dikî. Cin jî bawer dikin – û dilerizin. [20] Ey mirovê
bêhiş, ma tu dixwazî ku ji te re bê eşkerekirin, baweriya bêyî kiri-
nan, bêkêr e? [21] Ma bavê me Birahîm*, gava ku kurê xwe Îshaq* li
ser gorîgehê* pêşkêş kir, ne bi kirinên xwe rastdar derket? [22] Tu
dibînî ku baweriya wî bi kirinên wî re dixebitî û baweriya wî bi
kirinên wî temam bû. [23] Bi vî awayî gotina vê nivîsarê hat cih: «Bi-
rahîm ji Xwedê bawer kir û ev jê re rastdarî hat hesabkirin»[a] û jê re
dostê Xwedê hat gotin. [24] Hûn dibînin ku mirov bi kirinan rastdar
derdikeve, ne tenê bi baweriyê. [25] Bi vî awayî, Rexaba* fahîşe jî
gava ku nêrevan* qebûl kirin û ew di riyeke din re şandin, ma ew
ne bi kirinan rastdar derket? [26] Îcar çawa ku bedena bê ruh mirî ye,
wusa jî baweriya ku bê kirin e, mirî ye.

### *Bi Zimanê Xwe Karîn*

3 Birayên min, bila gelek ji we nebin mamoste, çimkî hûn di-
zanin em ên ku hîn dikin, emê di dîwana hê girantir re derbas
bibin. [2] Em hemû di gelek tiştan de diterpilin*. Eger yek bi devê
xwe nekeve, ew dikare hemû bedena xwe jî dezgîn* bike û ew

---

[a] **2:23** Ji: Destpêkirin 15:6
**2:21** Destpêkirin 22:1-14
**2:23** Romayî 4:3; Galatî 3:6
**2:25** Yêşû 2:1-21; 6:22-25

mirovekî gihîştî ye. 3 Ji bo ku li ber me serî deynin em lixabê dixin
devê hespan û bi vî awayî em hemû bedena wan jî dizivirînin. 4 An
li gemiyan binêrin: Bi ser ku ewqas mezin in û bi bayên xurt tên
kaşkirin, dilê kotelvan* ku derê bixwaze, bi koteleke* biçûk berê
wê bi wî alî ve dike. 5 Bi vî awayî ziman jî endamekî biçûk e, lê bi
tiştên mezin pesnê xwe dide.

Binêrin, çirûskeke biçûk dikare daristaneke çiqas mezin bişe-
witîne! 6 Wusa jî ziman agir e. Di nav endamên bedena me de zi-
man dinyayeke xerabiyê ye. Ew tevahiya mirov qirêjî dike, ji doje-
hê* pêtê distîne û çerxa jiyana me dike pêta agir. 7 Çimkî her cûre
heywanên kûvî û teyr, yên ku dişêlin û afirîdên* deryayê ji aliyê
mirov ve tên girtin û hatine girtin. 8 Lê ji mirovan tu kes nikare
zimên bigire. Ziman, bi jehra mirinê tije ye, xerabiyeke bêrawestin
e. 9 Bi zimên em Bav Xudan pîroz* dikin û bi zimên em nifiran li
wan mirovên ku di mînaka Xwedê de hatine afirandin, dikin. 10 Ji
eynî devî pîrozkirin û nifir derdikeve. Birayên min, divê ev ne
weha be. 11 Ma ji çavkaniyekê hem ava şêrîn û hem jî ava tehl der-
dikeve? 12 Birayên min, ma dara hêjîrê dikare zeytûnan, an jî mêw
dikare hêjîran bide? Wusa jî kaniya ava şor nikare ava şêrîn bide.

### *Yê Şehreza Kî Ye?*

13 Di nav we de yê fêmdar û şehreza kî ye? Bila ew bi awayê
jiyana xwe ya qenc kirinên xwe di nav nermiya şehrezayiyê de
nîşan bide. 14 Lê eger di dilê we de çavnebariya tehl û hevrikî hebe,
pesnê xwe nedin û li hember rastiyê derewan nekin. 15 Ev şehre-
zayî ne ya ji jorê ye, lê belê şehrezayiya dinyayî, nefsanî û Îblîsî
ye. 16 Çimkî li ku derê çavnebarî û hevrikî hebe, li wê derê tev-
lihevî û her kirina xerab heye. 17 Lê şehrezayiya ku ji jor e, berî her
tiştî paqij e; piştre aştîhez, berbiwêr û nerm e. Bi rehmê û berê
qenc tije ye, alînegir û ne durû ye. 18 Û berê rastdariyê ji bo aştî-
keran di aştiyê de tê çandin.

### *Dostaniya Bi Dinyayê Re*

4 Şer û pevçûnên di nav we de ji ku derê ne? Ma ev ne ji xwes-
tekên we yên ku di endamên bedena we de şer dikin, tên? 2 Ça-
vê we li tiştekî ye, lê hûn bi dest naxin. Hûn dikujin û çavnebariyê
dikin, lê hûn nikarin bigihîjin armanca xwe. Hûn şer û pevçûnê

dikin. Hûn bi dest naxin, çimkî hûn ji Xwedê naxwazin. 3 Hûn
dixwazin û nastînin, çimkî hûn bi niyeta xerab dixwazin, da ku hûn
ji bo kêfên xwe bimezêxin. 4 Hey zînakarno! Ma hûn nizanin ku
dostaniya bi dinyayê re, dijminahiya bi Xwedê re ye? Loma kî ku
bixwaze bibe dostê dinyayê, xwe dike dijminê Xwedê. 5 Ma hûn
guman dikin ku Nivîsara Pîroz badîhewa dibêje: «Xwedê bi hesûdî
ruhê ku daye me dixwaze». 6 Lê keremeke hê meztir dide. Loma
dibêje:

«Xwedê li hember pozbilindan disekine,
Lê keremê li nefsbiçûkan dike.»[a]

7 Loma bi ya Xwedê bikin. Li hember Îblîs bisekinin, ewê ji
we bireve. 8 Nêzîkî Xwedê bibin, ew jî wê nêzîkî we bibe. Guneh-
karno, destên xwe paqij bikin. Dudilîno, dilê xwe safî bikin. 9 Bi
keder bin, şînê bigirin û bigirîn. Bila kenê we bibe şîn, şahiya we jî
bibe melûlî. 10 Xwe li ber Xudan nizim bikin, ewê we bilind bike.

### *Hevdû Dadbar Nekin*

11 Birayên min, ketma* hev nekin. Yê ku ketma birayê xwe di-
ke û wî dadbar* dike, ew ketma Şerîetê dike û Şerîetê dadbar dike.
Eger tu Şerîetê dadbar bikî, tu ne ew î ku Şerîetê pêk tîne, lê belê
tu li ser Şerîetê dadger* î. 12 Yê ku Şerîet daniye û dîwanê dike,
tenê yek e. Yê ku dikare xilas bike û helak bike ew e. Îcar tu kî yî
ku tu cîranê xwe dadbar dikî?

### *Pesindana Sibê*

13 De werin, hûn ên ku dibêjin: «Sibê an dusibe emê herin filan
an bêvan bajarî, emê li wir salekê derbas bikin, kirrîn û firotinê
bikin û peran qezenc bikin». 14 Heçî hûn in, hûn nizanin ku wê sibê
çi bibe. Jiyana we çi ye? Hûn hilmek in ku ji bo demeke kurt xuya
dibe û di pey de winda dibe. 15 Di cihê vê de, divê hûn weha bêjin:
«Xwedê hez bike, emê bijîn û vî karî an wî karî bikin.» 16 Lê hûn
bi vî halê xwe, bi quretî pesnê xwe didin. Her pesindana weha
xerab e. 17 Loma yê ku bi ya qenc dizane û nake, jê re guneh e.

---

[a] **4:6** Ji: Gotinên Silêman 3:34
**4:13-14** Gotinên Silêman 27:1

### *Şîret û Hişyarî*

5 Îcar dewlemendno, niha werin û li ser rebeniya xwe ya ku wê
bê serê we bigirîn û bikin qîrîn. 2 Dewlemendiya we riziyaye û
bizûzkan cilên we xwariye. 3 Zêr û zîvên we zengarî bûne. Zengara
wan wê li hember we şahidiyê bike û wek êgir goştê we bixwe. Di
rojên dawîn de we xezîne civandin. 4 Va ye, heqê wan karkerên ku
zeviyên we dirûtine û we bi hîle ji wan standiye, diqîre. Hawar
hawara paleyan gihîştiye guhê Xudanê* Ordiyan. 5 We li dinyayê
xwe da kêf û şahiyê û we dilê xwe ji bo roja serjêkirinê qelew kir.
6 We yê rast ê ku li ber we ranabe, sûcdar derxist û kuşt.

### *Sebra di Êşê de*

7 Loma birano, heta hatina Xudan sebir bikin. Binêrin, cotkar li
benda berê erdê yê hêja dimîne û ji bo vê yekê sebir dike heta
barana biharê û ya payîzê li ser dibare. 8 Hûn jî sebir bikin. Dilê
xwe xurt bigirin, çimkî hatina Xudan nêzîk e. 9 Birano, gazinan ji
hev nekin, da ku hûn neyên dîwankirin. Va ye, dadger li ber derî
rawestayî ye! 10 Birano, pêxemberên* ku bi navê Xudan peyv go-
tine ji bo xwe wek mînaka êşkişandin û sebrê bigirin. 11 Binêrin,
em wan ên ku tengahî ragirtine*, bextewar hesab dikin. We ragir-
tina Eyûb* bihîst û we dît ku Xudan di dawiyê de ji bo wî çi kir.
Çimkî Xudan gelek dilovan û tije rehm e.

12 Îcar birayên min, berî her tiştî, sond nexwin. Ne bi erdê, ne
bi ezmên û ne jî bi tiştekî din sond bixwin. Bila erêya we «Erê» û
naya we «Na» be, da ku hûn neyên dîwankirin.

### *Duaya Baweriyê*

13 Eger di nav we de yek êşê bikişîne, bila dua bike. Eger yek
dilşa be, bila lavijeyan* bêje. 14 Eger di nav we de yek nexweş be,
bila ew gazî rihspiyên civînê* bike û ew li ser wî dua bikin û bi
navê Xudan rûn li wî bidin. 15 Duaya ku bi bawerî tê kirin wê yê
nexweş qenc bike û Xudan wê wî rake. Û eger wî guneh kiribe, wê
lê bê bihûrtin. 16 Loma gunehên xwe ji hevdû re eşkere bikin û ji

---

5:2-3 Metta 6:19 5:4 Dubarekirina Şerîetê 24:14-15
5:11 Eyûb 1:1-22; 2:10; 42:10-17; Zebûr 103:8
5:12 Metta 5:34-37 5:14 Marqos 6:13

bo hev dua bikin, da ku hûn sax bibin. Duaya yê rast, hêzdar û bi
bandûr e. [17] Êlyas* jî mirovekî wek me bû. Ji bo ku baran nebare bi
kelegermî dua kir û li ser rûyê erdê sê sal û şeş mehan baran ne-
barî. [18] Piştre wî dîsa dua kir; ezmên baran da û erdê jî berê xwe
da.

[19] Birayên min, eger yek ji we ji rastiyê averê* bibe û yekî din
careke din wî li rastiyê bizivirîne, [20] bila bizane, yê ku gunehkar ji
riya wî ya averê bizivirîne, wê canekî ji mirinê xilas bike û gelek
gunehan binixumîne.

---

**5:17-18** 1 Padîşah 17:1; 18:1; 18:41-45
**5:20** 1 Petrûs 4:8

# *Nameya Petrûs a pêşî*

### *Pêşgotin*

*Nameya Petrûs a pêşî, ji bawermendên ku li bakûrê Asyaya* Biçûk belav bûbûn re hatiye nivîsîn. Şagirt Petrûs ev name di dawiya jiyana xwe de nivîsiye û li gor ku tê gotin ew di sala 65an de li Romayê hat kuştin.*

*Di vê nameyê de nivîskar dil dide ber wan şagirtên ku ji ber baweriya xwe ya bi Îsa di nav tengahiyê de ne û tên cefakirin. Petrûs bi vê nameya xwe, tîne bîra şagirtan ku mirin û rabûna Îsa û soza hatina wî hêviyê dide. Nivîskar ji şagirtan re diyar dike ku ewê xelata vê tengahî û cefayê ku li ser wan e, di roja hatina Îsa Mesîh de bistînin. Ew ji wan dixwaze û dil dide ber wan ku ew wek gelê Mesîh bijîn û bi wî ve girêdayî bimînin.*

*Ev name dikare bi vî awayî bê beşkirin:*

*I. Silav 1:1-2*
*II. Rizgariya mezin 1:3-21*
*III. Kevirê zindî û gelê bijartî 2:1-10*
*IV. Wek xizmetkarên Xwedê bijîn 2:11-17*
*V. Mînaka êşkişandina Mesîh 2:18-25*
*VI. Jin û mêr 3:1-7*
*VII. Jiyana nû û êşkişandin 3:8-4:19*
*VIII. Li keriyê Xwedê binêrin 5:1-11*
*IX. Gotina dawî 5:12-14*

### *Silav*

1 Ji Şandiyê Îsa Mesîh Petrûs,
ji xerîbên belavbûyî yên li herêmên Pontos, Galatya, Kepe-
dokya, Asya* û Bîtînyayê re, 2 yên ku li gor pêşzanîna Bav Xwedê
hatine bijartin û ji aliyê Ruh ve hatine pîrozkirin*, da ku bi ya Îsa
Mesîh bikin û xwîna wî li ser wan bê reşandin:
Kerem û aştî li ser we zêde bibe.

### *Hêviya Jîndar*

3 Xwedê û Bavê Xudanê me Îsa Mesîh pîroz be. Wî li gor
rehma xwe ya mezin em ji nû ve zayandin. Bi vejîna* Îsa Mesîh a
ji nav miriyan, wî em gihandin hêviyeke jîndar 4 û mîraseke ku
narize, bêleke ye û naçilmise. Ev mîras li ezmanan ji bo we hilanî
ye. 5 Îcar hûn bi hêza Xwedê bi riya baweriyê, ji bo xilasbûna ku
amade ye di wextê dawî de bê eşkerekirin, tên parastin. 6 Hûn bi vê
yekê gelek şa ne, her çiqas niha divê ku hûn ji bo demeke kurt bi
ceribandinên cûr bi cûr xemgîn bibin jî. 7 Ew tên, da ku hêjabûna
baweriya we kifş bibe û çaxê ku Îsa Mesîh xuya bibe ji we re bibe
pesin, rûmet û serbilindî. Bi ser ku zêr tune dibe û diçe, dîsa di êgir
de tê helandin. Û baweriya we ji zêr gelek hêjatir e. 8 We ew ne-
dîtiye, lê hûn ji wî hez dikin; niha hûn wî nabînin, lê dîsa jî hûn
baweriyê bi wî tînin û hûn bi şabûneke ku nayê gotin dilşa dibin.
9 Çimkî hûn di dawiya baweriya xwe de, digihîjin xilasiya canê xwe.
10 Li ser vê xilasbûnê, pêxemberên* ku li ser kerema ku wê ji
we re bihata anîn, pêxemberîtî kirin, bi baldarî lêkolîn kirin û lê
geriyan. 11 Ruhê* Mesîh ê ku di dilê wan de bû, ji berê ve kifş dikir
ku Mesîh wê cefayê bikişîne û piştre bi rûmet bibe. Wan lê kolan
ku bizanin ka ev xilasî wê kengê an wextekî çawa bê. 12 Ji wan re
hat kifşkirin ku di van tiştan de ne ji xwe re, lê ji we re xizmet
dikirin û ev niha bi destê Ruhê* Pîroz ê ku ji ezmên hatiye şandin,
ji aliyê yên ku Mizgîniyê didin ve, ji we re hat diyarkirin. Milyaket
jî pirr dixwazin ku nêzîk bibin û li van tiştan binêrin.

### *Banga Jiyana Pîroz*

13 Ji ber vê yekê li ser hişê xwe bin, amade û hişyar bin. Hemû
hêviya xwe bi wê keremê ve girêdin, ya ku hûnê bi xuyabûna Îsa
Mesîh bistînin. 14 Wek zarokên guhdar bin û li pey xwestekên xwe
yên dema nezaniyê neçin. 15 Lê belê, çawa yê ku gazî we kiriye
pîroz e, hûn jî di hemû rabûn û rûniştina xwe de pîroz bin. 16 Ji ber
ku hatiye nivîsîn: «Pîroz bin, çimkî ez pîroz im.»[a]
17 Madem hûn ji yê ku cihêtiyê naxe nav mirovan û her kesî li
gor kirina wî dîwan* dike re, dibêjin Bav*, dema xwe ya xerîbiyê

---

[a] **1:16** Ji: Qanûna Kahîntiyê 11:44-45; 19:2; 20:7

ya li ser dinyayê bi tirsa Xwedê derbas bikin. 18 Çimkî hûn dizanin
ku hûn ne bi berdêla tiştên pûç ên wek zêr an zîv ji jiyana vala ya
ku ji bav û kalên we maye, hatine kirrîn, 19 lê belê bi berdêla xwîna
Mesîh a hêja û wek berxekî bêleke û bêkêmahî hûn hatine kirrîn.
20 Hê berî damezrandina dinyayê ew hat destnîşankirin, lê di da-
wiya deman de di ber we de xuya bû. 21 Bi saya wî hûn baweriyê bi
wî Xwedayê ku ew ji nav miriyan rakiriye û rûmet daye wî tînin,
wusa ku bawerî û hêviya we bi Xwedê be.

22 Niha we bi ya rastiyê kir û canê xwe paqij kir, biraheziya we
bê durûtî ye. Loma ji dil û can û bi germî ji hevdû hez bikin.
23 Hûn ne ji tovê ku xera dibe, lê ji yê ku xera nabe, bi peyva*
Xwedê ya jîndar û mayîndar ji nû ve çêbûn.

24 Çimkî:
«Hemû mirov wek giyê ne
Û hemû rûmeta wan jî wek kulîlka giyê ye.
Giya hişk dibe û kulîlka wî dikeve.
25 Lê peyva Xudan her û her dimîne.»[a]

Ev ew peyv e ku bi Mizgîniyê ji we re hat dayîn.

### *Kevirê Zindî û Gelê Bijartî*

2 Loma xwe ji her xerabiyê, ji her hîle, durûtî, çavnebarî û ji her
cûre ketmê* dûr bixin. 2 Wek zarokên nûbûyî, bêriya şîrê safî
û ruhanî bikin, da ku hûn bi wî, ji bo xilasiyê mezin bibin. 3 Çimkî
we qenciya Xudan tam kiriye.

4 Werin, nêzîkî kevirê zindî bibin ê ku ji aliyê mirovan ve hat
redkirin, lê li ba Xwedê bijare û hêja ye. 5 Hûn jî wek kevirên zindî
ji bo xaniyekî ruhanî bên avakirin, da ku hûn bibin kahînên* pîroz
û bi destê Îsa Mesîh goriyên* ruhanî yên ku li Xwedê xweş tên,
pêşkêş bikin. 6 Çimkî di Nivîsara Pîroz de dibêje:
«Va ye, ez di Siyonê* de kevirekî datînim
Kevirê hêja û bijare yê rikin*.
Yê ku baweriyê bi wî bîne, qet nayê şermkirin.»[b]

7 Îcar ji bo we, hûn ên ku bawer dikin, ev kevir hêja ye; lê ji bo yên
ku bawer nakin,

---

[a] 1:24-25 Ji: Îşaya 40:6-8 [b] 2:6 Ji: Îşaya 28:16
2:3 Zebûr 34:8

«Ew kevirê ku hostayan red kir,
Bû kevirê serê rikin.»[a]
8 û:
«Ji bo wan bû kevirê terpilînê*
Û lata hilterpilînê.»[b]
Ew diterpilin, çimkî ew bi ya peyvê nakin û ji xwe ew ji bo vê ye-
kê hatine kifşkirin.
9 Lê hûn «nifşekî* bijartî, kahînên Padîşahiyê, miletekî pîroz û
gelê Xwedê bi xwe ne, da ku hûn karên wî yên bilindhêja bidin
bihîstin.»[c] Wî, hûn ji tariyê gazî ronahiya xwe ya nedîtî kirine.
10 Demekê hûn ne gel bûn,
Lê niha hûn gelê Xwedê ne.
Demekê rehm li we nebûbû,
Lê niha rehm li we bûye.

### *Wek Xizmetkarên Xwedê Bijîn*

11 Hezkirîno, ez ji we hêvî dikim ku hûn xwe ji xwestekên
nefsî yên ku li hember can şer dikin, dûr bixin, ji ber ku hûn li vê
dinyayê xerîb û mêvan in. 12 Di nav miletan de jiyaneke qenc bijîn.
Û eger wek ku hûn xerabkar in ketma we bikin jî, bila kirinên we
yên qenc bibînin û di Roja Edaletê de pesnê Xwedê bidin.
13 Ji bo xatirê Xudan, bi ya hemû sazûmanên mirovî bikin, dix-
wazî bila padîşahê ku di ser hemûyan re be, 14 an jî dixwazî bila ew
waliyên ku ji aliyê wî ve hatine şandin bin, da ku xerabkaran ceza
bikin û rûmetê bidin qencîkeran. 15 Çimkî daxwaza Xwedê ev e ku
hûn bi kirina qenciyê dengê nezaniya mirovên bêaqil bibirrin. 16 Mî-
na mirovên azad bijîn, lê belê azadiya xwe ji bo xerabîkirinê nekin
hêcet*, wek xulamên Xwedê bijîn. 17 Ji hemûyan re hurmetê bikin.
Ji biratiyê hez bikin. Ji Xwedê bitirsin û ji padîşah re hurmetê bikin.

### *Mînaka Êşkişandina Mesîh*

18 Xulamno! Bi hemû hurmetkariyê bi ya axayên xwe bikin; ne
tenê bi ya qenc û berbiwêran, lê belê bi ya cirnexweşan jî bikin.

---

[a] 2:7 Ji: Zebûr 118:22 [b] 2:8 Ji: Îşaya 8:14-15
[c] 2:9 Ji: Îşaya 43:20-21; Derketin 19:5-6
2:10 Binêre: Hoşêya 2:23

19 Çimkî eger yek bi neheqî cefayê bikişîne û ji ber ku ji Xwedê
ditirse xemgîniyê radigire*, ev li Xwedê xweş tê. 20 Eger ji ber xe-
rabîkirinê li we bê xistin û hûn vê radigirin, ev ji bo we çi ser-
bilindî ye? Lê eger hûn ji ber qencîkirinê cefayê bikişînin û hûn vê
radigirin, ev li Xwedê xweş tê. 21 Erê, ji bo vê yekê hûn hatin ga-
zîkirin. Çimkî Mesîh jî ji bo we cefa kişand û mînak ji we re hişt,
da ku hûn li ser şopa wî herin.

22 «Wî qet guneh nekir
Û peyveke bi hîle ji devê wî derneket.»[a]

23 Çaxê ku dihat nizimkirin, wî bi nizimkirinê bersîv neda. Ça-
xê ku êş dikişand wî li kesî gef nexwar; lê wî xwe spart wî yê ku bi
dadperwerî* dîwanê dike. 24 Wî li ser xaçê, gunehên me di bedena
xwe de hilgirtin, da ku em li hember gunehan mirî bin û ji bo ras-
tiyê bijîn. We bi birînên wî şîfa dît. 25 Çimkî hûn wek miyên varî*
bûn, lê belê niha hûn li Şivan û Çavdêrê canê xwe vegeriyan.

### *Jin û Mêr*

3 Jinno, bi vî awayî hûn jî bi ya mêrê xwe bikin. Wusa ku, eger
hinek ji wan bi peyva Xwedê baweriyê neynin jî, 2 gava ew ji-
yana we ya hurmetkar û şîrhelal bibînin, bê gotin bi jiyana jina
xwe bên qezenckirin. 3 Bila xemla we ne bi tiştên berbiçav, bi ho-
nandina porê xwe, zêr bi xwe ve kirin û lixwekirina cilên spehî be,
4 lê bila heyîna we ya veşartî, bi ruhê we yê rihet û nermê ku xera
nabe, xemla we be. Ev li ba Xwedê pirr hêja ye. 5 Çimkî di demên
berê de jî, jinên pîroz ên ku hêviya xwe bi Xwedê ve girêdabûn, bi
qebûlkirina desthilatiya mêrên xwe, weha xwe dixemilandin. 6 Bi
vî awayî Sara* bi ya Birahîm* kir û jê re got: «Mîrzayê min.» Eger
hûn jî qenciyê bikin û ji tu tiştî nebizdin, hûn keçên wê ne.

7 Mêrno, bila bi vî awayî her yek di jiyana bi jina xwe re
fêmdar û têgihîştî be, ji jina ku naziktir e re hurmetê bikin, çimkî
ew bi xwe jî wêrisên kerema jiyanê ne. Wusa ku ji duayên we re
asteng dernekeve.

---

[a] 2:22 Ji: Îşaya 53:9
2:23 Îşaya 53:7 — 2:24 Îşaya 53:5-6
3:1 Efesî 5:22; Kolosî 3:18 — 3:3 1 Tîmotêyos 2:9
3:7 Efesî 5:25; Kolosî 3:19

### *Cefakişandina di Riya Rastiyê de*

8 Bi kurtî, hûn hemû hemfikir bin, derdên hev hilgirin, ji hevdû
hez bikin, dilbirehm û nefsbiçûk bin. 9 Di şûna xerabiyê de xerabi-
yê nekin, di şûna nizimkirinê de jî nizim nekin. Bervajiyê vê yekê,
pîroz* bikin, çimkî ji bo ku hûn bereketê mîras bistînin, hûn hatin
gazîkirin. 10 Ji ber ku:

«Yê ku ji jiyanê hez dike
Û dixwaze rojên qenc bibîne,
Bila zimanê xwe ji xerabiyê
Û devê xwe ji gotina hîle biparêze,
11 Bila ew xwe ji xerabiyê dûr bixe û qenciyê bike,
Bila ew li aştiyê bigere û bikeve pey wê.
12 Çimkî çavên Xudan li ser yên rast in
Û guhên wî ji bo duayên wan vekirî ne.
Lê rûyê Xudan li hember xerabkaran e.»[a]

13 Îcar, eger hûn ji dil û can bixwazin ya qenc bikin, kî wê xe-
rabiyê li we bike? 14 Lê eger hûn di ber rastiyê de cefayê bikişînin
jî, xwezî bi we! Ji tiştê ku ew ditirsin, hûn netirsin û nebizdin,
15 Lê Mesîh bi xudantî di dilê xwe de pîroz bikin. Hergav amade
bin ku hûn bersîvê bidin her kesê ku sedemê wê hêviya ku di dilê
we de ye dipirse. 16 Lê vê yekê bi nermî û hurmetê bikin. Bila wij-
dana we paqij be, da ew ên ku li ser jiyana we ya qenc a bi Mesîh
bi xerabî dipeyivin di wan tiştên ku ketma we dikin de, bên şer-
mezarkirin. 17 Eger bi daxwaza Xwedê be, çêtir e ku em ne di ber
xerabîkirinê, lê di ber qencîkirinê de cefayê bikişînin. 18 Mesîh jî bi
carekê ji bo gunehan cefa kişand, da ku me bigihîne Xwedê. Yê
rast ji bo yên nerast mir. Ew di bedenê de hat kuştin, lê ji aliyê Ruh
ve hat vejandin. 19 Ew bi ruh çû û ji ruhên di zîndanê de girtî re
peyv got. 20 Van ruhan berê, yanî di dema Nûh* de, çaxê ku gemî
dihat çêkirin û Xwedê bi bîhnfirehî sebir dikir, neguhdarî kir. Di
wê gemiyê de çend kes, yanî heşt nefs ji avê derketin, xilas bûn.
21 Ev jî mînaka imadê* ye ya ku îro we xilas dike. Imad ne şuştina
qirêja bedenê ye, lê belê ew li ber Xwedê daxwaza wijdana paqij e.

---

[a] **3:10-12** Ji: Zebûr 34:12-16
**3:14** Metta 5:10 **3:14-15** Îşaya 8:12-13 **3:20** Destpêkirin 6:9-8:22

Ev yek bi vejîna* Îsa Mesîh pêk hat. [22] Ew hilkişiya ezmên, li milê
Xwedê yê rastê ye û milyaket, desthilatî û hêz bi ya wî dikin.

### *Ji bo Xwedê Jiyan*

4 Îcar çawa ku Mesîh di bedenê de cefa kişand, hûn jî bi eynî
niyetê xwe çekdar bikin. Çimkî yê ku di bedenê de cefa kişan-
diye, dev ji guneh berdaye. [2] Wusa ku di dema jiyana xwe ya mayî
de, ne li gor xwestekên mirovî, lê li gor daxwaza Xwedê bijîn.
[3] Êdî bes e ku we li gor xwestina pûtperestan* dema jiyana xwe ya
derbasbûyî bi bêedebî, şehwet, serxweşî, kêfkirina bi harîtî, şerab-
vexwarina civatî û di pûtperestiya pîs de derbas kir. [4] Ji wan re
ecêb tê ku êdî hûn bi wan re li pey van pîsîtiyan nabezin û çêrî we
dikin. [5] Lê ewê hesab bidin wî yê ku amade ye dîwana mirî û zin-
diyan bike. [6] Loma Mizgînî ji miriyan re jî hat dayîn, da ku di ruh
de li gor Xwedê bijîn, bi ser ku ew di bedenê de wek mirovan ha-
tine dîwankirin.

[7] Dawiya her tiştî nêzîk e; loma sergiran bin û ji bo duakirinê li
ser hişê xwe bin. [8] Berî her tiştî, bila hezkirina we ya ji hev re
hergav germ be; çimkî hezkirin gelek gunehan dinixumîne. [9] Bê
pìtepit ji hevdû re mêvanperwer bin. [10] Her yek ji we, çi diyariya
ruhanî standibe, bi wê wek şahneyên* qenc ên kerema Xwedê ya
cûr bi cûr, ji hev re xizmetê bikin. [11] Eger yek bipeyive, bila pey-
vên Xwedê bêje. Eger yek xizmetê bike, bila bi wê hêza ku Xwedê
daye bike, da ku Xwedê di her tiştî de bi destê Îsa Mesîh bê bi-
rûmetkirin. Rûmet û karîn her û her ên wî ne. Amîn*.

### *Cefakişandina di Riya Mesîh de*

[12] Hezkirîno, li ber tengahiyên wek êgir dijwar ên ku ji bo ceri-
bandinê tên ser we, şaş nemînin û vê ecêb nebînin. [13] Lê belê şa
bibin ku hûn bûne hevparên cefayên Mesîh, da ku çaxê rûmeta wî
xuya bibe, hûn bi dilgeşiyeke mezin gelek şa bibin. [14] Eger di ber
navê Mesîh de hûn bên nizimkirin, xwezî bi we, çimkî Ruhê rû-
metê, yanî Ruhê* Xwedê li ser we dimîne. [15] Lê bila tu kes ji we, ji
bo mêrkujî, dizî, xerabîkirin û têkilbûna karên hinekên din cefayê
nekişîne. [16] Lê eger yek ji we ji ber ku Mesîhî ye cefayê bikişîne,

---

**4:8** Aqûb 5:20; Gotinên Silêman 10:12

bila ew şerm neke, lê bila bi vî navî pesnê Xwedê bide. 17 Çimkî wext hat ku dîwan ji mala Xwedê dest pê bike. Eger ji me dest pê bike, dawiya wan ên ku li gor Mizgîniya Xwedê nakin wê çawa be? 18 Û:

«Eger yê rast zor xilas bibe,
Êdî halê yê nepak û gunehkar wê çawa be?»[a]

19 Ji ber vê yekê, yên ku li gor daxwaza Xwedê cefayê dikişînin, bila bi qencîkirinê xwe bispêrin Afirandarê dilsoz.

### *Li Keriyê Xwedê Binêrin*

5 Ez ê ku yek ji rihspiyan im û şahidê cefayên Mesîh û hevparê wê rûmetê me, ku wê bê, ez hêvî ji rihspiyên nav we dikim: 2 Wek ku Xwedê ji we dixwaze, bi çavdêrîtî şivantiya keriyê Xwedê yê ku li ber we ye, ne ji mecbûrî lê ji dil bikin. Îcar vê ne ji bo qezenceke bêserûber, lê bi dilxwazî bikin. 3 Ne wek ku hûn hukumdariyê li wan ên ku li we hatine spartin bikin, lê belê ji bo kerî bibin mînak. 4 Îcar gava ku Serokşivan xuya bibe, hûnê taca rûmetê ya ku qet naçilmise bistînin.

5 Xortno, bi vî awayî bi ya rihspiyan bikin û hemû li hember hev nefsbiçûk bin. Çimkî:

«Xwedê li hember pozbilindan disekine
Lê keremê li nefsbiçûkan dike.»[b]

6 Loma xwe di bin destê Xwedê yê hêzdar de nizim bikin, da ku di wextê xwe de we bilind bike. 7 Hemû xemên xwe bavêjin ser wî, çimkî ew xema we dixwe.

8 Li ser hişê xwe bin û hişyar bin. Neyarê we Îblîs, wek şêrekî ku dihumîne digere, ka ewê kê daqurtîne. 9 Di baweriyê de hîmgirtî li hember wî bisekinin; çimkî hûn dizanin birayên we jî li seranserê dinyayê eynî cefayê dikişînin. 10 Lê Xwedayê hemû keremê, yê ku bi Mesîh Îsa hûn gazî rûmeta xwe ya herheyî kirine, piştî ku hûn demeke kurt cefayê bikişînin, ew bi xwe wê we nûvejen bike, xurt bike, hêzdar bike û we li ser bingehê qayîm bike. 11 Karîn her û her ji wî re be. Amîn.

---

[a] 4:18 Ji: Gotinên Silêman 11:31
5:2 Yûhenna 21:15-17

[b] 5:5 Ji: Gotinên Silêman 3:34
5:6 Metta 23:12; Lûqa 14:11; 18:14

### *Silavên Aştiyê*

12 Min bi destê Sîlas* ê ku ez wî birayekî dilsoz hesab dikim,
bi kurtî ji we re nivîsî, da ku ez we bişidînim û şahidiyê bikim ku
kerema Xwedê ya rastîn ev e. Di vê de bimînin. 13 Civîna* li Ba-
bîlê* ya ku bi we re hatiye bijartin û kurê min Marqos* jî silavan li
we dike. 14 Bi ramûsana hezkirinê silavan li hev bikin.

Silamet li ser we hemûyan be, hûn ên ku yên Mesîh in.

# *Nameya Petrûs a diduyan*

### *Pêşgotin*

*Petrûs bi vê nameya xwe ya diduyan deng li hemû bawermendên pêşî dike. Bi vê nameyê, bawermendan li hember mamosteyên xerabker, li hember wê jiyana bê serûber ya ku ji wan hîndariyan tê û li hember tevzkeran hişyar dike. Bersîva van hîndariyên şaş, di zanebûna Xwedê û Îsa Mesîh de ye. Ev zanîn, bi wan kesên ku Îsa Mesîh rû bi rû dîtine û hînkirina wî bihîstine tê ragihandin.*

*Nivîskar bi taybetî li ser hînkirina wan kesên ku dibêjin: «Mesîh cardin nayê!» radiweste. Bi ya wî Xwedê bi aramî dilive, çimkî ew naxwaze ku tu kes helak bibe, lê belê dixwaze ku her kes tobe bike û xilas bibe. Ev name bi naveroka xwe dimîne Nameya Cihûda.*

*Ev name dikare bi vî awayî bê beşkirin:*

*I. Silav 1:1-2*
*II. Gazîkirina li bawermendan 1:3-21*
*III. Hînkirinên şaş 2:1-22*
*IV. Hatina Mesîh ya diduyan 3:1-18*

### *Silav*

1 Ji xulam û Şandiyê Îsa Mesîh Şimûn Petrûs,
ji wan re yên ku bi rastiya Xwedayê me, Xilaskarê me Îsa
Mesîh, bi me re gihîştine eynî baweriya giranbiha:
2 Di naskirina Xwedê û Xudanê me Îsa de kerem û aştî bi firehî li ser we be.

### *Gazîkirin û Hilbijartina Xwedê*

3 Bi naskirina wî yê ku bi rûmet û qenciya xwe gazî me kiriye,
hêza wî ya xwedayî*, her tiştê ku ji bo jiyan û xwedênasiyê pêwist
e, da me. 4 Bi van tiştan wî sozên giranbiha û gelek mezin dane
me, da ku hûn bi wan bibin hevparên tebîeta xwedayî û ji wê xerabûnê
birevin, ya ku ji xwestekên dinyayê tê. 5 Erê, ji ber vê yekê
hemû xîretkêşiyê bi kar bînin, bi baweriya xwe hêjabilindiyê
peyda bikin, bi hêjabilindiyê zanînê, 6 bi zanînê xwegirtinê, bi

xwegirtinê ragirtinê*, bi ragirtinê jiyana xwedayî, [7] bi jiyana xwe-
dayî birahezî û bi biraheziyê hezkirinê peyda bikin. [8] Çimkî eger
hûn xwediyê van tiştan bin û ev di nav we de zêde bibin, hûn di
naskirina Xudanê me Îsa Mesîh de bêkêr û bêber namînin. [9] Lê yê
ku ji van tiştan bêpar e, kor e, dûr nabîne û ji bîra wî çûye ku ew ji
gunehên xwe yên berê paqij bûye. [10] Ji ber vê yekê birano, xîret-
kêşiyê bikin ku hûn gazîkirin û hilbijartina xwe qayîm bikin. Eger
hûn van tiştan bikin, hûn tu caran naterpilin*. [11] Û bi vî awayî der-
geh wê bi tevahî li ber we vebe, da ku hûn bikevin Padîşahiya
herheyî ya Xudan û Xilaskarê me Îsa Mesîh.
[12] Ji bo vê yekê, her çiqas hûn van tiştan dizanin û hûn bi wê
rastiya ku bi we re ye hîmgirtî ne jî, ez dixwazim hergav van bînim
bîra we. [13] Û heta ku ez di vê çadirê de me, ez vê yekê rast dibînim
ku bi anîna bîra we, we hişyar bikim. [14] Çimkî wek ku Xudanê me
Îsa Mesîh jî ji min re kifş kiriye, ez dizanim ku rakirina çadira min
nêzîk e. [15] Îcar ezê xîretkêşiyê bikim, da ku piştî çûyîna min jî hûn
hergav bikarin van tiştan bînin bîra xwe.

### *Şahidên Rûmeta Mesîh*

[16] Çaxê ku me hêz û hatina Xudanê me Îsa Mesîh bi we da za-
nîn, em neketin pey çîrokên ku bi qurnazî ji ber xwe hatine çêkirin,
lê me bi çavên xwe mezinahiya wî dît.
[17] Çimkî gava ji rûmeta herî bilind dengekî weha jê re hat û
got:

«Kurê min ê delal ev e.
Dilê min bi wî xweş e»,

hingê wî ji Bav Xwedê rûmet û siyanet* stand. [18] Û gava em bi wî
re li ser çiyayê pîroz* bûn, ev dengê ku ji ezmên hat, me bi xwe
bihîst.
[19] Bi vî awayî peyva* pêxemberîtiyê ji me re hê bêtir qayîm
hat deranîn. Heta ku sibe zelal bibe û stêrka sibê di dilê we de der-
keve, wek çiraya ku di tariyê de ronahî dide, hûnê qenc bikin ku
hûn bala xwe bidin peyvên pêxemberîtiyê. [20] Divê berî her tiştî hûn
vê bizanin ku tu pêxemberîtiya Nivîsara Pîroz ne ji şîrovekirina ji

---

1:13 «Çadir» li vir «bedena mirov» e.
1:17 Metta 17:1-5

ber xwe çêkirî ye. [21] Çimkî pêxemberîtî tu caran bi daxwaza mirov
nehatiye; lê belê mirovan bi rêberiya Ruhê* Pîroz, peyv ji Xwedê
gotine.

### *Pêxemberên Derewîn û Cezakirina Wan*

2 Lê çawa ku di nav gelê Îsraêl de pêxemberên derewîn hebûn;
wusa wê di nav we de jî mamosteyên derewîn hebin. Ewê bi
dizî hînkirinên wêranker bînin hundir û heta ewê wî Xudanê ku ew
kirrîne jî înkar bikin. Lê belê ewê zûka helakê bînin ser xwe. [2] Ge-
lek wê bikevin pey bêedebiya wan û ji rûyê wan wê çêrî riya rast
bê kirin. [3] Bi çavbirçîtiya xwe, ewê bi peyvên xapînok li ser pişta
we biçêrin. Dîwanbûna* ku ji berê ve ji bo wan e, dereng namîne û
helaka wan naponije.

[4] Çimkî Xwedê ew milyaketên ku guneh kirin jî nedirixandin*,
lê ew avêtin kortala* bêbinî, da ku ew ji bo Roja Dawî di kûrahiya
taristaniyê de bi zincîran girêdayî bên hilanîn.

[5] Xwedê dinya berê jî nedirixand, lê çaxê wî tofan bi ser dinya
nepakan de anî, wî bi tenê Nûh* ê ku peyvbêjê rastiyê bû û heftên
din parastin. [6] Xwedê bajarên Sodom* û Gomorayê jî sûcdar der-
xistin, ew kirin xwelî, wêran kirin û ji wan ên ku wê bi nepakî bi-
jîn re kirin mînak. [7] Û mirovê rast Lût* ê ku bi jiyana nepak a ne-
heqan xemgîn bûbû rizgar kir. [8] Çimkî wî yê rast ê ku di nav wan
de dijiya, kirinên wan ên neheq didît û dibihîst, roj bi roj cefa dida
canê xwe yê rast.

[9] Xudanê ku bi vî awayî kir, dizane ku çawa xwedênasan ji
ceribandinê rizgar bike û yên ku neheqiyê dikin, [10] bi taybetî jî yên
ku li pey xwesteka pîs a nefsê dikevin û desthilatiyê kêm dibînin, ji
bo cezakirinê heta Roja Dawî hiltîne.

Evên curetkar û qure, ji çêrkirina yên xweyî rûmet natirsin.
[11] Lê bi ser ku milyaket di hêz û karînê de ji wan meztir in jî, li ber
Xudan wan bi çêrkirinê sûcdar nakin. [12] Lê evên ha wek heywanên
bêfêm û afirîdên* bi fêmkirina xweheyî* yên ku ji bo girtin û kuş-
tinê çêbûne, çêrî tiştên ku jê fêm nakin, dikin. Ew jî wê wek wan
heywanan di xerabûniya xwe de helak bibin [13] û ewê cezayê nehe-
qiya xwe bikişînin. Roj li nava rojê, li zewq û sefa xwe dinêrin, vê

---

**2:5** Destpêkirin 6:18; 7:13 **2:6-7** Destpêkirin 19

yekê kêf dihesibînin. Evên ha, leke û rûreşî ne. Gava ew bi we re
dixwin û vedixwin, ew bi xapandina xwe bi xwe kêfê dikin. 14 Ça-
vên wan tije zîna ye, ji gunehkirinê têr nabin û canên xilupilo*
dixapînin. Dilê wan hînî çavbirçîtiyê bûye, ew zarokên nifirê ne.
15 Wan dev ji riya rast berda, varî* bûn û riya kurê Beyor Balamê*
ku ji pereyê neheqiyê hez kir, girtin. 16 Îcar ji ber neheqiya wî li wî
hat hilatin*; kerê bê zar û ziman bi dengê mirovan peyivî û pêşî li
harbûna pêxember girt.

17 Ev mirovên ha kaniyên bê av û mijên ku li ber bagerê tên
ajotin in. Tariya reş ji bo wan hatiye hilanîn. 18 Çimkî ew peyvên
mezin û pûç dibêjin û bi xwestekên nefsê yên bêedeb, wan kesan
dixapînin, yên ku nû ji mirovên di riya çewt de diçin, rizgar bûne.
19 Bi ser ku ew bi xwe xulamên xerabûnê ne, ji wan re soza azadiyê
didin. Çimkî mirov dibe xulamê wî yê ku mirov bindest dike.
20 Çimkî, eger ew bi naskirina Xudan û Xilaskarê me Îsa Mesîh ji
nepakiyên dinyayê rizgar bûbin û paşê dîsa li van tiştan bizivirin û
bindest bibin, hingê halê wan ê paşî wê ji yê pêşî xerabtir be.
21 Çimkî, eger piştî ku wan riya rastiyê zanî û ji pey emrê pîroz ê
ku li wan hatibû spartin vegeriyabin, hingê nezanîna riya rastiyê
wê ji bo wan hê çêtir bûya. 22 Erê, wek vê mesela rast hat serê wan:

«Kûçik li vereşîna xwe vedigere»

û:

«Beraz piştî şuştinê
Dîsa xwe di nav herriyê de digevizîne.»[a]

### *Soza Hatina Xudan*

3 Hezkirîno, niha ev nameya min a diduyan e ku ez ji we re di-
nivîsim. Di herduyan de jî ez fikrên we yên paqij hişyar dikim,
tînim bîra we. 2 Ez dixwazim ku hûn gotinên ku ji berê ve ji aliyê
pêxemberên pîroz ve hatine gotin û emrên ku Xudan û Xilaskar bi
destê Şandiyên we dane, bînin bîra xwe.

3 Berî her tiştî vê bizanin ku di rojên dawîn de tinazkar wê
derkevin, li gor xwestekên xwe rêve herin, tinazan bikin 4 û bêjin:
«Ka soza hatina wî li ku derê ma? Ji mirina bav û kalan ve, her tişt

---

[a] **2:22** Ji: Gotinên Silêman 26:11

**2:15** Hijmartin 22 **3:3** Cihûda 1:18

wekî destpêka afirandinê berdewam dike!» [5] Lê ew bi vîna xwe vê
yekê ji bîr dikin ku bi peyva Xwedê, ji berê ve ezman hebûn û erd
jî bi avê, ji nav avê peyda bû. [6] Û bi avê, dinya berê bi tofanê helak
bû. [7] Lê erd û ezmanên niha jî bi eynî peyvê ji bo êgir tên hilanîn;
ew ji bo roja dîwankirin û helakkirina nepakan tên hiştin.
[8] Lê hezkirîno, vî tiştî ji bîr nekin ku li ba Xudan rojek wek
hezar salî ye û hezar sal jî wek rojekê ye. [9] Wek ku hinek guman
dikin, Xudan di soza xwe de bi derengî nakeve, lê belê bîhna xwe
li we fireh dike û naxwaze ku kesek helak bibe, lê dixwaze ku
hemû tobe bikin. [10] Lê Roja Xudan wê wek dizan bê. Di wê rojê de
ezman wê bi xurexureke mezin winda bibin, hêman wê bişewitin,
erd û her tiştê ku tê de ye wê ji hev bikeve, tune bibe.
[11] Îcar, madem ku ev hemû tişt wê bi vî awayî ji hev belav
bibin, divê ku hûn mirovên çawa bin? Divê ku hûn di jiyana pîroz
û xwedayî* de bijîn. [12] Li hêviya Roja Xwedê bin û hatina wê bi
lez bixin. Wê rojê ezman wê bişewitin û belav bibin û hêman wê
bi kelegermî bihelin. [13] Lê li gor soza wî, em li hêviya erdekî nû û
ezmanên nû ne, ku rastî wê di wan de bimîne.
[14] Ji ber vê yekê hezkirîno, madem ku hûn li hêviya van tiştan
in, xîretkêşiyê bikin ku hûn li ber wî bêleke, bêkêmahî û di aştiyê
de bin. [15] Îcar bîhnfirehiya Xudanê me xilasî hesab bikin, çawa ku
birayê me yê hezkirî Pawlos* jî, li gor şehrezayiya ku ji wî re ha-
tiye dayîn, ji we re nivîsiye. [16] Ew di hemû nameyên xwe de li ser
van tiştan dibêje. Di wan de hin tişt hene ku fêmkirina wan zehmet
e. Yên nezan û dilê wan xilupilo*, wek ku di nivîsarên pîroz ên din
de dikin, van jî çewt şîrove dikin û bi kirina vê yekê helakbûna
xwe tînin.
[17] Loma hezkirîno, wek ku hûn ji pêşî ve van tiştan dizanin,
hay ji xwe hebin, da ku hûn bi xapandina yên neheq neyên xiran-
din û ji nelebtebûna xwe nekevin. [18] Lê di kerem û naskirina Xu-
dan û Xilaskarê me Îsa Mesîh de bigihîjin. Rûmet niha û her û her
ji wî re be. Amîn*.

---

**3:5** Destpêkirin 1:6-9 — **3:6** Destpêkirin 7:11
**3:8** Zebûr 90:4 — **3:10** Metta 24:43; 1 Selanîkî 5:2

# *Nameya Yûhenna ya pêşî*

### *Pêşgotin*

*Nivîskarê vê nameyê bi xwe navê xwe nade, lê belê li gor şahidên sedsala pêşî nivîskarê vê nameyê Yûhenna ye. Nameyên Yûhenna gelek dimînin Mizgîniya Yûhenna, loma bawermend hê ji serî ve wusa qebûl dikin ku ev hemû ji aliyê eynî Yûhennayî ve hatine nivîsîn. Yûhenna ev name di dawiya sedsala pêşî de, li Efesê nivîsiye.*

*Du armancên bingehî yên vê nameyê hene:*

1. *Ew xwendevanan bizirav dike, da ku di hezkirina Xwedê û Kurê wî Îsa Mesîh de bimînin.*
2. *Ew li hember hîndariyên şaş ên ku dikarin vê girêdanê xera bikin, wan hişyar dike.*

*Li gor dîtina wan mamosteyên derewîn, her tiştê ku li vê dinyayê li ber çav e, ew xerab e; li gor wan tenê tiştên ruhanî qenc in û tiştên ruhanî û fîzîkî jî nikarin bên ba hev û bibin yek. Ji ber vê yekê wan nedixwest ku bawer bikin ku Îsa Kurê Xwedê ye û bi xwîn û goşt hatiye dinyayê. Nivîskar li hember vê nêrîna şaş bi eşkereyî nîşan dide ku Îsa Mesîh tam mirov û tam Xwedê bû.*

*Yûhenna gelek caran tîne bîra bawermendan ku ji Xwedê û ji hevdû hez bikin.*

*Ev name dikare bi vî awayî bê beşkirin:*

*I. Destpêk 1:1-4*
*II. Ronahî û tarî 1:5-2:29*
*III. Zarokên Xwedê û zarokên Îblîs 3:1-24*
*IV. Rastî û şaşî 4:1-6*
*V. Hezkirina Xwedê û birahezî 4:7-21*
*VI. Serketina baweriyê 5:1-21*

### *Peyva Jiyanê*

1 Ev Peyva* ku em bi we didin bihîstin, Peyva jiyanê ye. Ew ji
destpêkê ve hebû, me bihîstiye, me bi çavên xwe dîtiye, me lê
nêriye û dest daye wê. [2] Ev jiyan xuya bû, me ew dît û em jê re

---

**1:1** Yûhenna 1:1

şahidiyê dikin û em wê jiyana herheyî ya ku bi Bav* re bû û ji me
re xuya bû, bi we didin zanîn. [3] Tiştê ku me dîtiye û bihîstiye, em
bi we jî didin zanîn, da ku hevpariya we jî bi me re hebe. Bi rastî
hevpariya me bi Bav* û bi Kurê wî Îsa Mesîh re ye. [4] Em van tiş-
tan ji we re dinivîsin, da ku şahiya me temam be.

### *Xwedê Ronahî Ye*

[5] Tiştê ku me ji wî bihîstiye û peyva* ku em dixwazin bi we
bidin bihîstin ev e: Xwedê ronahî ye û li ba wî qet tarî tune. [6] Eger
em bêjin: «Hevpariya me bi wî re heye» û hê jî em di tariyê de
rêve herin, em derewan dikin û li gor rastiyê nakin. [7] Lê eger em di
ronahiyê de rêve herin, wek ku ew di ronahiyê de ye, hevpariya me
bi hevdû re heye û xwîna Kurê wî Îsa, me ji her gunehî paqij dike.
[8] Eger em bêjin: «Gunehê me tune», em xwe dixapînin û rastî
bi me re tune. [9] Lê eger em gunehên xwe eşkere bikin, ew dilsoz û
rastîparêz e ku li gunehên me bibihûre û me ji her neheqiyê paqij
bike. [10] Eger em bêjin: «Me guneh nekiriye», em wî derewker di-
kin û peyva wî bi me re tune.

### *Mehdervanê Me Mesîh*

2 Zarokên min ên delal, ez van tiştan ji we re dinivîsim, da ku
hûn guneh nekin. Lê eger yek guneh bike, li ba Bav*, mehder-
vanê* me Îsa Mesîhê rastdar heye. [2] Ew ji bo gunehên me berdêla
lêbihûrtinê ye; ne tenê ji bo yên me, lê ji bo gunehên hemû dinya-
yê jî.
[3] Eger em emrên wî bînin cih, bi vê yekê em dizanin ku em wî
nas dikin. [4] Yê ku bêje: «Ez wî nas dikim», lê emrên wî neyne cih,
derewkar e û li ba wî rastî tune. [5] Lê kî ku gotina wî bigire, bi rastî
hezkirina Xwedê li ba wî temam bûye. Bi vê em dizanin ku em bi
wî re ne: [6] Yê ku bêje: «Ez bi wî re dimînim», divê wek ku Îsa rêve
çûye, ew jî rêve here.

### *Emrê Nû*

[7] Hezkirîno, ne ku ez emrekî nû ji we re dinivîsim, lê ez wî
emrê kevin ê ku we ji destpêkê ve dizanibû, dinivîsim. Emrê kevin

---

1:2 Yûhenna 1:14

ew peyv e ya ku we bihîstiye. 8 Dîsa jî ez emrekî nû ji we re dini-
vîsim. Rastiya wî hem li ba wî û hem li ba we xuya ye. Çimkî tarî
derbas dibe û ronahiya rastîn ji xwe şewq dide.
9 Yê ku bêje: «Ez di ronahiyê de me» û ji birayê xwe nefret
bike, hê jî ew di tariyê de ye. 10 Yê ku ji birayê xwe hez dike, di
ronahiyê de dimîne û ji bo wî sedemê terpilînê* tune. 11 Lê yê ku ji
birayê xwe nefret dike, di tariyê de ye, di tariyê de rêve diçe û
nizane ku diçe ku derê, çimkî tariyê çavên wî kor kirine.

12 Zarokên min, ez ji we re dinivîsim,
Çimkî di ber navê wî de li gunehên we hatiye bihûrtin.
13 Bavno, ez ji we re dinivîsim,
Çimkî hûn, yê ji destpêkê ve heyî nas dikin.
Xortno, ez ji we re dinivîsim,
Çimkî hûn li hember Yê Xerab bi ser ketin.
14 Zarono, ez ji we re dinivîsim,
Çimkî hûn Bav* nas dikin.
Bavno, ez ji we re dinivîsim,
Çimkî hûn, yê ji destpêkê ve heyî nas dikin.
Xortno, ez ji we re dinivîsim,
Çimkî hûn bi hêz in û peyva Xwedê bi we re dimîne
Û hûn li hember Yê Xerab bi ser ketin.

15 Ji dinyayê û tiştên ku di dinyayê de ne, hez nekin. Eger yek
ji dinyayê hez bike, hezkirina Bav* bi wî re tune. 16 Çimkî her tiştê
ku di dinyayê de ye, xwesteka nefsê, xwesteka çavan û quretiya
maldariyê, ne ji Bav, lê ji dinyayê ne. 17 Îcar dinya û xwesteka wê
derbas dibe, lê yê ku daxwaza Xwedê dike her û her dijî.

### *Dijminên Mesîh*

18 Zarono, saeta dawî ye! Wek ku we bihîstiye, yê ku dijberê
Mesîh e wê bê û niha jî gelek dijberên Mesîh derketine. Ji wê yekê
em dizanin ku saeta dawî ye. 19 Ew ji nav me derketin, lê belê ew
ne ji me bûn. Eger ew ji me bûna, wê bi me re bimana. Lê çûna
wan diyar kir ku ew hemû ne ji me ne.
20 Lê hûn ji aliyê Yê Pîroz ve bi Ruh hatine meshkirin* û hûn
hemû jî rastiyê dizanin. 21 Ne ji ber ku hûn rastiyê nizanin ez ji we

---

2:7 Yûhenna 13:34 2:12 Binêre: Zebûr 25:11

re dinivîsim, lê ji ber ku hûn dizanin. Û hûn dizanin ku her derew
ne ji rastiyê ye. 22 Ji yê ku dibêje: «Îsa ne Mesîh e» pê ve, kî de-
rewkar e? Dijberê Mesîh ew e ku hem Bav û hem jî Kur înkar
dike. 23 Di dilê her kesê ku Kur înkar dike de, Bav jî tune, lê di dilê
yê ku Kur eşkere dike de, Bav jî heye.
24 Bila tiştê ku we ji destpêkê ve bihîstiye, bi we re bimîne.
Eger tiştê ku we ji destpêkê ve bihîstiye bi we re bimîne, hûn jî,
hûnê bi Kur re û bi Bav re bimînin. 25 Îcar ev soza ku wî daye me
jiyana herheyî ye.
26 Min ev tişt li ser wan ên ku dixwazin we bixapînin ji we re
nivîsîn. 27 Îcar heçî hûn in, ew Ruhê ku Mesîh hûn pê mesh* kirine
bi we re dimîne û hewcedariya we bi hînkirina tu kesî tune. Çimkî
mesha wî, li ser her tiştî çawa hînî we bike, rast e, ne derew e û
çawa hînî we kiribe, bi Mesîh re bimînin.
28 Û niha, zarono, bi wî re bimînin, da ku gava ew xuya bibe,
cesareta me hebe û em di hatina wî de, li ber wî şermî nebin.
29 Madem ku hûn dizanin ew rast e, hûn dizanin her kesê ku rastiyê
dike ji wî çêbûye.

### *Zarokên Xwedê*

3 Binêrin, Bav* çiqas ji me hez kir ku em zarokên Xwedê bên
gazîkirin! Û em ew in. Ji ber vê yekê dinya me nas nake, çimkî
ew nas nekir. 2 Hezkirîno, niha em zarokên Xwedê ne û hê ne eş-
kere ye ku emê bibin çi. Lê em vê yekê dizanin: Gava ku ew xuya
bibe, emê bibin wek wî. Çimkî ew çawa be, emê wî wusa bibînin.
3 Her kesê ku hêviya xwe bi wî ve girêdide, wek ku ew paqij e,
xwe paqij dike.
4 Her kesê ku guneh dike, li hember Şerîetê* radibe; çimkî gu-
neh li hember Şerîetê rabûn e. 5 Hûn dizanin ku ew xuya bû, da ku
guneh rake; û li ba wî guneh tune. 6 Her kesê ku bi wî re dimîne, gu-
neh nake; her kesê ku guneh dike, ne ew dîtiye û ne jî ew nas kiriye.
7 Zarono, bila kes we nexapîne. Yê ku rastiyê dike rast e, çawa
ku ew rast e. 8 Yê ku guneh dike ji Îblîs e, çimkî Îblîs ji destpêkê
ve guneh dike. Ji bo vê yekê Kurê* Xwedê xuya bû, da ku karên
Îblîs xera bike.

---

3:1 Yûhenna 1:12 3:5 Yûhenna 1:29

[9] Her kesê ku ji Xwedê çêbûye guneh nake, çimkî tovê Xwedê
di dilê wî de dijî û ew nikare guneh bike, ji ber ku ew ji Xwedê
çêbûye. [10] Zarokên Xwedê û zarokên Îblîs bi vê yekê ji hev kifş
dibin: Her kesê ku rastiyê nake ne ji Xwedê ye û yê ku ji birayê
xwe hez nake jî ne ji Xwedê ye.

### *Ji hevdû Hez Bikin*

[11] Çimkî gotina ku we ji destpêkê ve bihîstiye ev e ku em ji
hevdû hez bikin. [12] Em ne wek Qayîn* bin ê ku ji Yê Xerab bû û
birayê xwe kuşt. Û çima wî ew kuşt? Ji ber ku kirinên wî bi xwe
xerab bûn, lê yên birayê wî rast bûn.
[13] Gelî birayan, eger dinya ji we nefret bike, şaş nemînin. [14] Em
dizanin ku em ji mirinê gihîştine jiyanê, çimkî em ji birayan hez
dikin. Yê ku hez nake di mirinê de dimîne. [15] Her kesê ku ji birayê
xwe nefret dike, mêrkuj e û hûn dizanin ku jiyana herheyî bi tu
mêrkujî re tune.
[16] Em hezkirinê bi vê yekê dizanin: Îsa canê xwe di ber me de
da û divê em jî di ber birayan de canê xwe bidin. [17] Eger malê din-
yayê bi kesekî re hebe û birayê xwe di rewşeke hewcedar de bibîne
û dilê wî pê neşewite, çawa hezkirina Xwedê di dilê wî de dimîne?
[18] Zarono, ne bi gotin û peyvê, lê bi kirin û rastiyê em hez
bikin. [19] Û bi vê yekê emê bizanin ku em ji rastiyê ne û li ber wî
emê dilê xwe rihet bikin. [20] Eger dilê me, me sûcdar derxe, Xwedê
ji dilê me meztir e û ew her tiştî dizane.
[21] Hezkirîno, eger dilê me, me sûcdar dernexe, li ber Xwedê
cesareta me heye [22] û em her çi bixwazin emê jê bistînin. Çimkî em
emrên wî tînin cih û em tiştên ku li wî xweş tên dikin. [23] Emrê wî
ev e ku em baweriya* xwe bi navê Kurê wî Îsa Mesîh bînin û ji
hevdû hez bikin, wek ku wî li me emir kiriye. [24] Yê ku emrên wî
tîne cih, bi Xwedê re dimîne û Xwedê jî bi wî re dimîne. Em bi vê
yekê dizanin ku ew bi me re dimîne: Bi Ruhê ku daye me.

### *Ceribandina Ruh*

4 Hezkirîno, ji her ruhî bawer* nekin, lê ruhan biceribînin ka ew
ji Xwedê ne an ne. Çimkî gelek pêxemberên derewîn derketin

---

**3:11** Yûhenna 13:34 **3:12** Destpêkirin 4 **3:23** Yûhenna 13:34; 15:12, 17

dinyayê. 2 Hûn bi vê yekê Ruhê* Xwedê nas dikin: Her ruhê ku eşkere dike, Îsa Mesîh bi xwîn û goşt hatiye, ji Xwedê ye, 3 lê her ruhê ku Îsa eşkere nake, ne ji Xwedê ye. Û ruhê dijberê Mesîh ê ku we li ser bihîstiye wê bê, ev e û ji xwe niha di dinyayê de ye.

4 Zarono, hûn ji Xwedê ne û hûn li hember pêxemberên derewîn bi ser ketin. Çimkî yê ku bi we re ye, ji yê ku di dinyayê de ye meztir e. 5 Ew ji dinyayê ne, ji ber vê yekê gotina wan ji dinyayê ye û dinya guhdariya wan dike. 6 Em ji Xwedê ne. Yê ku Xwedê nas dike guhdariya me dike, lê yê ku ne ji Xwedê ye guhdariya me nake. Em bi vê yekê Ruhê rastiyê û ruhê derewîn nas dikin.

### *Xwedê Hezkirin e*

7 Hezkirîno, em ji hevdû hez bikin; çimkî hezkirin ji Xwedê ye û her kesê ku hez dike, ji Xwedê çêbûye û Xwedê nas dike. 8 Yê ku hez nake, Xwedê nas nake, çimkî Xwedê hezkirin e. 9 Hezkirina Xwedê bi vê yekê di nav me de xuya bû: Xwedê Kurê xwe yê yekta şand dinyayê, da ku em bi wî bijîn. 10 Hezkirin ev e, ne ku me ji Xwedê hez kir, lê wî ji me hez kir û Kurê xwe şand, ku di ber gunehên me de bibe berdêl.

11 Hezkirîno, madem ku Xwedê bi vî awayî ji me hez kir, divê em jî ji hevdû hez bikin. 12 Tu caran, tu kesî Xwedê nedîtiye; eger em ji hevdû hez bikin, Xwedê bi me re dimîne û hezkirina wî bi me re bêkêmahî dibe.

13 Bi vê yekê em dizanin ku em bi wî re dimînin û ew bi me re dimîne, çimkî wî ji Ruhê xwe daye me. 14 Me dît û em şahidiyê dikin ku Bav* Kurê xwe şand ku bibe Xilaskarê dinyayê. 15 Eger yek bi eşkereyî bêje: «Îsa Kurê* Xwedê ye», Xwedê bi wî re dimîne û ew jî bi Xwedê re dimîne. 16 Û em hezkirina Xwedê ya ku ji bo me ye dizanin û jê bawer dikin.

Xwedê hezkirin e û yê ku di hezkirinê de dimîne, bi Xwedê re dimîne û Xwedê bi wî re dimîne. 17 Hezkirin bi vî awayî di nav me de temam bûye, da ku di Roja Dawî de cesareta me hebe, çimkî ew çawa be, li vê dinyayê em jî wusa ne. 18 Di hezkirinê de tirs tune, lê hezkirina temam tirsê ji dil derdixe; çimkî di tirsê de cefa heye û yê ku ditirse di hezkirinê de bêkêmahî nebûye.

---

**4:12** Yûhenna 1:18

19 Em hez dikin, çimkî pêşî wî ji me hez kir. 20 Eger yek bêje:
«Ez ji Xwedê hez dikim» û ji birayê xwe nefret bike, derewkar e.
Çimkî yê ku ji birayê xwe yê ku dibîne hez neke, nikare ji Xwe-
dayê ku nabîne hez bike. 21 Emrê ku me jê standiye ev e: Yê ku ji
Xwedê hez dike, bila ji birayê xwe jî hez bike.

### *Bawerî li hember Dinyayê Bi Ser Dikeve*

5 Her kesê ku bawer dike ku Îsa, Mesîh e, ji Xwedê çêbûye û
her kesê ku ji Bav* hez dike, ji zarokê Bav jî hez dike. 2 Çaxê
ku em ji Xwedê hez bikin û emrên wî pêk bînin, hingê em dizanin
ku em ji zarokên Xwedê hez dikin. 3 Çimkî hezkirina Xwedê ev e,
ku em emrên wî bînin cih. Û emrên wî ne giran in. 4 Çimkî her
kesê ku ji Xwedê çêbûye li hember dinyayê bi ser dikeve. Û bi vî
awayî em li hember dinyayê bi ser dikevin, yanî bi baweriya xwe.
5 Ji wî yê ku bawer dike ku Îsa Kurê Xwedê ye pê ve, kî li hember
dinyayê bi ser dikeve?

### *Şahidiya li ser Îsa Mesîh*

6 Ev, ew e ku bi av û xwînê hat, Îsa Mesîh, ne tenê bi avê, lê bi
av û xwînê hat. Û Ruh e ku şahidiyê dike; çimkî Ruh rastî ye.
7 Yên ku şahidiyê dikin sisê ne: 8 Ruh, av û xwîn. Û şahidiya her
siyan yek e. 9 Eger em şahidiya mirovan qebûl bikin, şahidiya
Xwedê hê meztir e; çimkî ev, şahidiya Xwedê ya li ser Kurê wî ye.
10 Yê ku baweriyê bi Kurê Xwedê tîne, ev şahidî di dilê wî de ye.
Yê ku ji Xwedê bawer nake, wî ew derewker kiriye, çimkî wî ba-
werî bi şahidiya ku Xwedê ji bo Kurê xwe kiriye, neaniye. 11 Şahi-
dî ev e: Xwedê jiyana herheyî daye me û ev jiyan di Kurê wî de
ye. 12 Yê ku Kur di dilê wî de ye, jiyana wî heye, yê ku Kurê
Xwedê di dilê wî de tune, jiyana wî tune.

### *Peyva Dawî*

13 Ez van tiştan ji we re, ji hûn ên ku baweriyê bi navê Kurê
Xwedê tînin re, dinivîsim, da ku hûn bizanin jiyana we ya herheyî
heye. 14 Cesareta me ya li ber wî ev e: Çaxê em tiştekî li gor dax-
waza wî bixwazin, ew guhê xwe dide me. 15 Û eger em bizanin ku

5:3 Yûhenna 14:15 5:11 Yûhenna 1:4; 3:36

em her çi bixwazin ew guh dide me, hingê em dizanin tiştên ku me
jê xwestine, me standine.
[16] Eger yek bibîne ku birayê wî gunehekî ku nabe mirinê dike,
bila ji Xwedê bixwaze û wê jiyanê bide wî yê ku gunehê ku nabe
mirinê kiriye. Gunehê ku dibe mirinê heye; ez nabêjim bila ji bo
gunehekî weha dua bike. [17] Her neheqî guneh e; lê gunehê ku nabe
mirinê heye.
[18] Em dizanin her kesê ku ji Xwedê çêbûye guneh nake, lê Ni-
xuriyê Xwedê wî diparêze û Yê Xerab dest nade wî. [19] Em dizanin
ku em ji Xwedê ne û tevahiya dinyayê di bin desthilatiya Yê Xerab
de ye.
[20] Em dizanin ku Kurê Xwedê hatiye û ji bo ku em Yê Rast bi-
zanin, fêmdarî daye me. Û em bi Yê Rast re, bi Kurê wî Îsa Mesîh
re ne. Xwedayê rast û jiyana herheyî ev e.
[21] Zarono, xwe ji pûtan biparêzin.

# *Nameya Yûhenna ya diduyan*

### *Pêşgotin*

*Yûhenna vê nameya xwe wek «berpirsiyarê civînê, ji sitiya hêja û zarokên wê» re dinivîse (ku bi mana civîna derekê û bawermendên wê ye). Armanca esasî ya vê nameyê, hezkirina bawermendan a ji hevdû û li hember hîndariyên şaş hişyarkirina wan e.*

*Ev name dikare bi vî awayî bê beşkirin:*

*I. Silav 1-3*
*II. Rastî û hezkirinê 4-11*
*III. Gotinên dawî 12-13*

### *Silav*

Ji vî rihspiyî,
ji sitiya* bijartî û zarokên wê re, ji yên ku ez bi rastiyê ji wan
hez dikim re. Ne tenê ez, lê hemû yên ku rastiyê dizanin jî ji wan
hez dikin. 2 Çimkî rastî di dilê me de dimîne û wê her û her bi me
re be:
3 Rehm, kerem û aştî ji Bav Xwedê û ji Kurê Bav Îsa Mesîh, di
rastî û hezkirinê de wê li ser me be.

### *Rastî û Hezkirin*

4 Bi dîtina hin zarokên te yên li gor emrê ku me ji Bav*
standiye, di rastiyê de rêve diçin, ez gelek şa bûm. 5 Lê niha, sitiya
delal, ne wek ku emrekî nû ez ji te re dinivîsim, lê li gor emrê ku ji
destpêkê ve li me hatiye kirin, ez ji te hêvî dikim ku em ji hevdû
hez bikin. 6 Îcar hezkirin ev e ku em li gor emrên wî rêve herin.
Wek ku we ji destpêkê ve bihîstiye, emir ev e ku hûn di hezkirinê
de rêve herin.
7 Gelekên ku xelkê dixapînin, li dinyayê belav bûn. Ew eşkere
nakin ku Îsa Mesîh bi xwîn û goşt hatiye. Yê ku xapînok e û dijberê Mesîh e, ev e. 8 Hay ji xwe hebin, da ku hûn tiştê ku we di ber
de keda xwe daye winda nekin, lê xelata xwe bi tevahî bistînin.

---

5 Yûhenna 13:34; 15:12, 17 6 1 Yûhenna 5:3

9 Her kesê ku zêde diçe û di hînkirina Mesîh de namîne, di dilê wî
de Xwedê tune. Di dilê wî yê ku di hînkirina Mesîh de dimîne,
hem Bav* û hem jî Kur* heye. 10 Eger yek bê ba we û vê hînkirinê
neyne, wî nehewînin malê û silavê nedinê. 11 Çimkî, kî silavê bide
wî, dibe hevparê kirinên wî yên xerab.

### *Gotinên Dawî û Silav*

12 Hê gelek tiştên ku ez ji we re binivîsim hene, lê min nexwest
ku ez bi kaxez û bi hibrê binivîsim. Ez hêvî dikim ku ez bêm ba
we û rû bi rû bi we re bipeyivim, da ku şahiya me temam bibe.
13 Zarokên xwişka te ya bijartî silavan li te dikin.

# *Nameya Yûhenna ya sisiyan*

### *Pêşgotin*

*Nameya Yûhenna ya sisiyan ji Gayos re hatiye nivîsîn. Nivîskar di vê nameyê de ji bo ku alîkariya bawermendan kiriye pesnê wî dide û li hember mirovekî bi navê Diyotrefîs bawermendan hişyar dike. Diyotrefîs xwe li ber bawermendan mezin dike, şandiyan qebûl nake û paşgotiniyê dike.*

*Ev name dikare bi vî awayî bê beşkirin:*

*I. Destpêk 1-4*
*II. Fedakariya ji bo birayan 5-8*
*III. Diyotrefîs û Dîmîtriyos 9-12*
*IV. Silavên aştiyê 13-15*

### *Silav*

Ji yê rihspî,
ji Gayosê hezkiriyê ku ez bi rastî jê hez dikim re.
2 Hezkiriyo, wek ku canê te di rihetiyê de ye, ez dua dikim ku
tu di hemû tiştan de di rihetî û di saxiyê de bî. 3 Ez gelek şa bûm
çaxê ku çend bira hatin û li ser dilsoziya te ya ji rastiyê re şahidî
kirin ku tu çawa di rastiyê de rêve diçî. 4 Ji bo min, ji vê yeka ku ez
dibihîzim zarokên min di rastiyê de rêve diçin, şahiyeke meztir
tune.

### *Fedakariya ji bo Birayan*

5 Hezkiriyo, ji birayan re, heta ji yên nenas re, her tiştê ku tu
dikî, tu bi dilsozî dikî. 6 Wan li ber civîna* bawermendan li ser
hezkirina te şahidî kir. Îcar tu wan bi awayekî ku hêjayî Xwedê ye
bi rê bikî, tê qenc bikî. 7 Çimkî ew ji bo navê Mesîh ketin rê û ji
yên ku bawer nakin tiştek nestandin. 8 Loma divê em yên weha
qenc qebûl bikin, da ku em ji rastiyê re bibin hevalkar.

### *Diyotrefîs û Dîmîtriyos*

9 Min ji civînê re hin tişt nivîsîn, lê Diyotrefîsê ku dixwaze
xwe di nav wan de derxe pêş, me qebûl nake. 10 Ji ber vê yekê gava

ku ez bêm, ezê balê bikişînim ser wan fesadiyên ku bi peyvên
xerab li hember me kirine. Ew qîma xwe bi van fesadiyan tenê
nayne, birayan qebûl nake û rê nade wan ên ku qebûl dikin jî. Bi
ser de jî, ew wan ji civînê davêje derve.
11 Hezkiriyo, tu çavê xwe nede tiştê xerab, lê bide tiştê qenc.
Yê ku qenciyê dike ji Xwedê ye; yê ku xerabiyê dike Xwedê
nedîtiye.
12 Hemû li ser qenciya Dîmîtriyos şahidiyê dikin, heta rastî bi
xwe jî şahidiyê dike. Em jî ji bo wî şahidiyê dikin û tu dizanî ku
şahidiya me rast e.

### *Silavên Aştiyê*

13 Gelek tiştên ku ez ji te re binivîsim hene, lê ez naxwazim ku
bi kaxez û bi hibrê binivîsim. 14 Lê ez hêvî dikim ku di nêzîk de
ezê te bibînim, hingê emê bi hev re rû bi rû bipeyivin.
15 Aştî li ser te be. Dost silavan li te dikin. Nav bi nav silavan li
dostan bike.

# *Nameya Cihûda*

### *Pêşgotin*

*Nivîskarê vê nameyê Cihûda birayê Aqûb (Aqûb 1:1) e. Name bi naveroka xwe dimîne Nameya Petrûs a diduyan.*

*Name li hember wan mamosteyên derewîn ên ku xwe bawermend nîşan didin, hatiye nivîsîn. Nivîskar bi nameyê dil dide ber bawermendan, da ku ji bo baweriya xwe ya ku Xwedê carekê ji bo her û her daye wan, tekoşînê bikin.*

*Ev name dikare bi vî awayî bê beşkirin:*

*I. Silav 1-2*
*II. Taybetiyên mamosteyên derewîn 3-16*
*III. Ji bo parastina baweriyê hay ji xwe hebûn 17-23*
*IV. Pîrozî û xêrxwestin 24-25*

### *Silav*

Ji Cihûda*, xulamê Îsa Mesîh û birayê Aqûb*,
ji gazîkiriyên ku ji aliyê Bav Xwedê ve tên hezkirin û bi Îsa
Mesîh tên parastin re:
2 Aştî, rehm û hezkirin ji we re zêde bibe.

### *Guneh û Dîwan*

3 Hezkirîno, çaxê min bi xîretkêşî xwest ku ez li ser xilasiya
me ya hevpar ji we re binivîsim, min xwe mecbûr dît ku ez bi-
nivîsim û ji we hêvî bikim ku hûn, ji bo baweriya* ku yekcar li
pîrozan* hatiye spartin, tekoşînê* bikin. 4 Çimkî hin mirovên ne-
pak ên ku kerema Xwedayê me bi bêedebiyê diguherin û Mîrzayê
me yê tenê Xudanê me Îsa Mesîh înkar dikin, bi dizî ketin nav we.
Ew ji berê ve ji bo vê dîwanê* hatine destnîşankirin
5 Îcar her çiqas hûn her tiştî dizanin jî, ez dixwazim bînim bîra
we ku Xudan gelê xwe ji diyarê Misrê xilas kiribe jî, yên ku bawer
nekirin, piştre helak kirin. 6 Û wî ew milyaketên ku serwertiya xwe
neparastin, lê belê dev ji rûniştgehên xwe berdan, bi zincîrên

---

5 Derketin 12:51; Hijmartin 14:29-30

herheyî ji bo dîwana Roja Mezin di bin tariyê de hilanîn. [7] Bi eynî
awayî Sodom, Gomora û bajarên der û dora wan jî wek wan fuhûşî
kirin û ketin pey bedenên din. Ew bajar bi kişandina cezayê agirê
herheyî bûn mînak. [8] Lê evên ha jî bi eynî awayî dikevin pey
xeyalan û bedenê murdar* dikin, hukumdariya Xudan red dikin û
çêrî yên xweyî rûmet dikin. [9] Lê belê gava ku serekmilyaket Mîxa-
yîl li hember Îblîs derket û ji bo cesedê Mûsa* munaqeşe kir,
ranebû ku bi çêrkirinê wî sûcdar bike. Lê tenê got: «Bila Xudan
dengê xwe li te hilde!» [10] Lê evên ha, çêrî tiştên ku nizanin dikin û
wek heywanên bêfêm, bi tiştên ku ji ber xwe fêm dikin, helak
dibin. [11] Wey li wan! Ew li ser riya Qayîn* çûn û ji bo qezencê
xwe avêtin nav xapandina Balam* û di serhildana Qorax* de helak
bûn. [12] Evên ha di ziyafetên we yên hezkirinê de bê tirs dixwin û
vedixwin, ew leke ne. Ew mîna wan şivanan in ku bi tenê xwe
xweyî dikin. Ewrên bêbaran in ên ku li ber bayê diçin; darên
payîzê yên bêfêkî ne, ew du caran mirine û ji ra* ve hatine hilkirin.
[13] Ew wek şeqlên deryayê yên hêç ên ku kef didin, şerma xwe
direşînin. Stêrên serserî ne ku ji bo wan tariya reş a her û her
hatine hilanîn. [14] Henoxê* ku piştî Adem* ji nifşê* heftan e li ser
wan weha pêxemberîtî* kir: «Va ye, Xudan bi deh hezarên xwe
yên pîroz ve hat, [15] da ku dîwana hemûyan bike û ji bo hemû ki-
rinên nepak ku wan bi nepakiyê kirine û ji bo hemû tiştên hişk ên
ku gunehkarên nepak li hember Xudan gotine, bala her yekî biki-
şîne ser sûcê wî.» [16] Evên ha pitepitê dikin, gazinan dikin, li gor
xwestekên xwe rêve diçin, devê wan peyvên* mezin dibêjin, ji bo
qezencê siyaneta* xelkê digirin.

### *Hişyarî û Şîret*

[17] Lê hûn, ey hezkirîno, gotinên ku ji pêşî ve ji aliyê Şandiyên*
Xudanê me Îsa Mesîh ve hatine gotin, bînin bîra xwe, [18] ku ji we re
digotin: «Di dema dawî de tinazkarên ku li gor xwestekên xwe yên
nepak rêve diçin, wê derkevin.» [19] Ev ew in, ên ku dubendiyê
dikin, nefsanî ne û ji Ruh bêpar in. [20] Lê hûn, ey hezkirîno, xwe li

---

7 Destpêkirin 19
11 Qayîn: Destpêkirin 4:3-8; Balam: Hijmartin 22; Qorax: Hijmartin 16
14 Destpêkirin 5:18-24 18 2 Petrûs 3:3

ser baweriya xwe ya herî pîroz ava bikin, bi Ruhê* Pîroz dua
bikin, 21 xwe di hezkirina Xwedê de bigirin û ji bo jiyana herheyî li
hêviya rehma Xudanê me Îsa Mesîh bimînin. 22 Li yên ku dudilî
ne, rehmê bikin. 23 Yên ku di nav êgir de ne, bikişînin û xilas bikin,
li hinekên din bi tirs werin rehmê, lê heta bila cênika we ji kirasên
ku ji bedena gunehkar lewitîne jî biçe.

### *Pesin ji Xwedê re*

24 Xilaskarê me Xwedayê tenê, dikare we ji ketinê biparêze û
bi şahiyeke mezin, bêleke we derxe ber rûmeta xwe; 25 bila ji be-
riya deman ve, niha û her û her, bi destê Xudanê me Îsa Mesîh
rûmet, mezinahî, karîn û desthilatî jê re be. Amîn*.

# *Peyxama Yûhenna*

## *Pêşgotin*

*Nivîskarê vê kitêbê Yûhennayê Şandiyê Mesîh e. Ev peyxam di wê dema ku bawermend ji bo baweriya xwe ya bi Îsa Mesîh dihatin cefadan de hatiye nivîsîn. Armanca bingehî ya vê peyxamê ew e ku dil bide ber bawermendan û hêviya wan xurt bike, da ku ew di demên tengahî û êşkişandinê de dev ji baweriya xwe bernedin. Nivîskarê Peyxamê Yûhenna, hingê li girava Patmosê girtî bû.*

*Yûhenna ji bo dayîna Mizgîniyê ji aliyê Împeratoriya Romayê ve li vê giravê hatibû sirgûn kirin. Ev peyxam, an di dema Împerator Neron de (piştî Îsa 54-68) an jî di dema Împerator Domîtiyan de hatiye nivîsîn. (piştî Îsa 81-96)*

*Peyxama Yûhenna bi heft daxuyaniyên ku ji heft civînên Enedolê re tên şandin, dest pê dike. Naveroka bingehî ya vê peyxamê ev e: Mesîh Xudan e û ewê di dawiyê de Îblîs û hemû dijminên xwe bixe bin lingên xwe û wê bawermendan bibe Padîşahiya Ezmanan û wan pîroz û xelat bike.*

*Ev kitêb dikare bi vî awayî bê beşkirin:*

*I. Destpêk 1:1-8*
*II. Dîtiniya pêşî û nameyên ji heft civînan re 1:9-3:22*
*III. Dîtina textê Xwedê 4:1-11*
*IV. Kitêb û heft mor 5:1-8:1*
*V. Heft borî 8:2-11:19*
*VI. Jin, ejder û du cenawir 12:1-13:18*
*VII. Dîtiniyên cûr bi cûr 14:1-15:8*
*VIII. Heft piyanên xezeba Xwedê 16:1-21*
*IX. Wêranbûna Babîlê, têkçûna dijminên Xwedê 17:1-20:10*
*X. Dîwana dawî 20:11-15*
*XI. Erdê nû, ezmanê nû û Orşelîma nû 21:1-22:5*
*XII. Paşgotin: 22:6-21*

### *Destpêk*

1 Ev peyxama* Îsa Mesîh* e ya ku Xwedê da wî, da ku wan
tiştên ku divê di nêzîk de çêbin nîşanî xulamên wî bide. Û wî
ev bi destê milyaketê xwe şand û ew bi xulamê xwe Yûhenna da
zanîn. 2 Yûhenna jî li ser wan hemû tiştên ku wî dîtibûn şahidî kir,
yanî li ser peyva* Xwedê û li ser şahidiya Îsa Mesîh. 3 Xwezî bi wî
yê ku van peyvên pêxemberîtiyê* dixwîne û xwezî bi wan ên ku
guhdariya wan dikin û tiştên ku di wê de hatine nivîsîn digirin.
Çimkî wext nêzîk e.

### *Silav*

4 Ji Yûhenna, ji heft civînên* bawermendan re yên ku li he-
rêma Asyayê* ne:
Ji Yê ku Heye, Yê ku Hebû û Yê ku Wê Bê û ji heft ruhên ku
li ber textê wî ne 5-6 û ji Îsa Mesîh, yê ku şahidê dilsoz, nixuriyê
miriyan û serokê padîşahên erdê ye, kerem û aştî* li ser we be.
Rûmet û karîn her û her ji wî re be, yê ku ji me hez dike û bi
xwîna xwe em ji gunehên me azad kirine û em ji Bavê xwe Xwedê
re kirine padîşahî û kahîn*. Amîn*.

7 Va ye, ew bi ewran re tê.
Her çav wê wî bibîne, heta ew ên ku bedena wî qul kirine jî.
Û hemû gelên dinyayê wê li ser wî li xwe bixin.

Erê. Amîn.
8 Xudan* Xwedê, Yê ku Heye, Yê ku Hebû û Yê ku Wê Bê,
Karîndarê* her tiştî, dibêje: «Alfa* û Omêga Ez im.»

### *Dîtiniya Yûhenna ya li ser Îsa Mesîh*

9 Ez birayê we Yûhenna* me yê ku bi Îsa re di tengahiyê de, di
padîşahiyê û di bîhnfirehiyê de hevparê we ye. Ez di ber peyva
Xwedê û di ber şahidiya Îsa de li wê giravê bûm ku jê re Patmos tê
gotin. 10 Di roja Xudan de Ruh hat ser min û min li pişt xwe

---

1:4 Derketin 3:14 1:5-6 Derketin 19:6
1:7 Binêre: Daniyêl 7:13; Metta 24:30; 1 Selanîkî 4:17; Zekerya 12:10-14; Yûhenna 19:34
1:8 Alfa û Omêga: Destpêk û Dawî. Alfa û Omêga herfên pêşî û paşî yên alfabeya Yewnanî ne.

dengekî bilind bihîst ku wek dengê boriyê bû 11 û digot: «Tiştê ku
tu dibînî, di kitêbê de binivîse û ji heft civînên* bawermendan re
bişîne, yên ku li Efes, Îzmîr, Pergama, Tiyatîra, Sardeys, Filadel-
fiya û li Lawdikyayê ne.» 12 Ez zivirîm, da ku ez wî dengê ku bi
min re dipeyive bibînim. Îcar gava ez zivirîm, min heft çiradankên
zêrîn dîtin. 13 Di navenda çiradankan de min yek dît ku mîna Kurê*
Mirov bû, cilek heta bi lingan dirêj wergirtibû û kembereke zêrîn li
singê wî girêdayî bû. 14 Porê serê wî spî bû, wek livaya spî, mîna
berfê bû. Û çavên wî wek pêta êgir bûn. 15 Lingên wî wek wî tûncê
xas ê ku di firnê de hatiye sorkirin dibiriqî û dengê wî wek dengê
xuşîna aveke boş bû. 16 Û di destê wî yê rastê de heft stêr hebûn û
ji devê wî şûrekî dudevî yê tûj derdiket. Rûyê wî wek wê rojê ye,
ku bi hemû hêza xwe şewq dide.
17 Gava min ew dît, ez wek yekî mirî ketim ber lingên wî. Wî jî
destê xwe yê rastê danî ser min û got: «Netirse, ez Yê pêşî û Paşî
me. 18 Û Yê Zindî ez im. Ez mirî bûm, lê va ye, ez her û her dijîm.
Û miftên mirinê û yên diyarê* miriyan bi min re ne. 19 Îcar tiştên
ku tu niha dibînî, tiştên ku bûne û yên ku ji niha û pê ve wê bibin,
binivîse. 20 Sira van stêrên ku te di destê min yê rastê de dîtine û ya
heft çiradankên zêrîn ev e: Heft stêr milyaketên heft civînên* ba-
wermendan in û heft çiradank heft civîn in.

### *Ji Civîna Bawermendên Efesê re*

2 «Ji milyaketê civîna bawermendên Efesê re binivîse:
‹Yê ku heft stêran di destê xwe yê rastê de digire û di navenda
heft çiradankên zêrîn de rêve diçe, van tiştan dibêje: 2 Ez bi kirinên
te, bi xebata te û bi bîhnfirehiya te dizanim. Û ez dizanim ku tu
nikarî xeraban ragirî*. Û yên ku ji xwe re dibêjin Şandî*, lê ne
Şandî ne, te ew ceribandin û derewîn derxistin. 3 Tu bîhnfireh î û te
di ber navê min de li ber xwe da û tu newestiyayî. 4 Lê belê
gazineke min ji te heye: Te dev ji hezkirina xwe ya pêşî berdaye.
5 Îcar bîne bîra xwe ku tu ji ku derê ketiyî; tobe bike û karên pêşî
bike. An ku tu tobe nekî, ezê bêm te û ezê çiradanka te ji cihê wê

**1:11** Dema ku ev hatibû nivîsîn, navê bajarê Îzmîrê «Smîrna» bû.
**1:13-14** Daniyêl 7:9, 13; 10:6
**1:15** Hezekiyêl 1:24 **1:17** Îşaya 44:6

rakim. [6] Lê belê tiştekî te yê qenc heye: Tu ji kirinên Nîkolasiyan
nefret dikî; ez jî ji wan karan nefret dikim.
[7] Ewê ku guhên wî hene, bila bibihîze ku Ruh* ji civînan re çi
dibêje. Ewê ku bi ser dikeve, ezê xwarina ji dara jiyanê ya ku di
bihişta* Xwedê de ye bidim wî.›»

### *Ji Civîna Bawermendên Smîrnayê re*

[8] «Ji milyaketê civîna bawermendên Smîrnayê re binivîse:
‹Yê ku Pêşî û Paşî ye, yê ku mir û careke din rabû, van tiştan
dibêje: [9] Ez bi tengahî û belengaziya te dizanim, lê belê tu dew-
lemend î! Ez bi buxtana wan ên ku ji xwe re dibêjin Cihû dizanim;
ew ne Cihû ne, lê ew kinîşta* Îblîs in. [10] Ji wan tengahiyên ku tu li
ber kişandinê yî netirse. Va ye, Îblîs wê hinan ji we bavêje zînda-
nê, da ku hûn bên ceribandin û hûnê deh rojan cefayê bikişînin.
Heta mirinê dilsoz bimîne, ezê taca jiyanê bidim te.
[11] Ewê ku guhên wî hene, bila bibihîze ku Ruh ji civînan re çi
dibêje. Ewê ku bi ser dikeve, ji mirina diduyan qet ziyanê nabî-
ne.›»

### *Ji Civîna Bawermendên Pergamayê re*

[12] «Ji milyaketê civîna bawermendên Pergamayê re binivîse:
‹Yê ku şûrê wî yê dudeviyê tûj heye, van tiştan dibêje: [13] Ez
dizanim ku tu li ku derê rûdinî. Li dera ku textê* Îblîs lê ye, tu li
wê derê rûdinî. Û tu navê min hişk digirî û li wê dera ku Îblîs lê
rûdine, di wan rojên ku di nav we de, şahidê min ê dilsoz Antîpas
hat kuştin jî, te baweriya xwe ya ku bi min e înkar nekir. [14] Lê belê
piçek gazina min ji te heye: Li wê derê hin mirovên te hene ku
hînkirina Balam* digirin. Wî hînî Balaq* kir ku zarokên* Îsraêl ji
rê derxe, da ku goriyên* ji pûtan re hatine serjêkirin bixwin û fu-
hûşiyê bikin. [15] Bi vî awayî, wek wan, hin mirovên te jî hene ku
hînkirina Nîkolasiyan digirin. [16] Îcar tobe bike, an na ezê zûka bêm
te û ezê li hember wan bi şûrê devê xwe şer bikim.
[17] Ewê ku guhên wî hene, bila bibihîze ku Ruh ji civînan re çi

---

2:6 Nîkolasî: Li gor hîndariya vê tarîqatê jiyana bêexlaqî tu tesîrê li jiyana ruhanî nake. Loma her çi dixwestin, dikirin.
2:7 Destpêkirin 2:9 2:14 Hijmartin 31:16; 25:1-3

dibêje. Ewê ku bi ser dikeve, ezê ji Mannayê* veşartî bidim wî.
Ezê kevirekî spî yê ku navekî nû li ser nivîsiye bidim wî; ji yê
standî pê ve, kes nizane.›»

## *Ji Civîna Bawermendên Tiyatîrayê re*

18 «Ji milyaketê civîna bawermendên Tiyatîrayê re binivîse:
‹Kurê* Xwedê yê ku çavên wî wek pêta êgir in û lingên wî
mîna wî tûncê xas ê ku dibiriqe ne, van tiştan dibêje: 19 Ez bi ki-
rinên te, bi hezkirina te, bi baweriya te, bi xizmet û bîhnfirehiya te
dizanim û ez dizanim ku karên te yên paşî ji yên pêşî hê bêtir in.
20 Lê belê gazineke min ji te heye: Tu dihêlî ew jin, Yezabel a ku ji
xwe re dibêje pêxember*, bi hînkirina xwe xulamên min ji rê der-
xe ku fuhûşiyê bikin û goriyên ku ji pûtan re tên serjêkirin bixwin.
21 Min wext da wê, da ku tobe bike; lê ew naxwaze ji fuhûşiya xwe
tobe bike. 22 Va ye, ezê wê bavêjim nav nivîneke nexweşiya giran
û yên ku bi wê re zînayê dikin, eger ji kirinên wê tobe nekin, ezê
wan jî bixim tengahiyeke mezin. 23 Û ezê li zarokên wê bixim û
bikujim û hemû civîn wê bizanin ku yê li dil û daxwazan dikole ez
im û ezê li gor kirinên her yekî ji we bidim we. 24 Lê ez ji we yên
din re dibêjim, hûn ên ku li Tiyatîrayê ne û li gor vê hînkirinê
nakin û wan tiştên ku ji wan re ‹sirên Îblîs ên kûr› dibêjin, nizanin:
Ez barekî din danaynim ser pişta we: 25 Bi tenê heta ku ez bêm, tiştê
ku bi we re ye hişk bigirin. 26-27 Û ewê ku bi ser dikeve û heta dawi-
yê karên min li ba xwe digire, çawa ku min ji Bavê* xwe standiye,

Ez jî, ezê li ser miletan hukumdariyê bidim wî.
Wek ku firaxên cerîn dişkênin,
Wê bi gopalê hesin serweriyê li wan bike.

28 Û ezê stêra sibehê bidim wî.
29 Ewê ku guhên wî hene, bila bibihîze ku Ruh ji civînan re çi
dibêje.›»

---

**2:17** Derketin 16:14-14
**2:17** Kevirê spî: Bi mana «xelata serketinê» tê bikaranîn.
**2:20** Yezabel: Bi mana sembolîk tê bikaranîn. Di Peymana Kevin de Yezabel şahbanûyek bû ku gelekî li hember Xwedê derdiket (1 Padîşah 16:31; 18:4). Zarok (ayeta 23an), şagirtên wê jina li Tiyatîrayê ne.
**2:23** Gotinên Silêman 24:12 **2:26-27** Binêre: Zebûr 2:8-9

### *Ji Civîna Bawermendên Sardeysê re*

3 «Ji milyaketê civîna bawermendên Sardeysê re binivîse:
‹Yê ku heft ruhên Xwedê û heft stêr pê re ne, van tiştan dibêje:
Ez kirinên te dizanim, wek ku tu dijî navekî te heye, lê tu miriyî.
2 Hişyar bibe û tiştên ku bi şûn de mane û li ber mirinê ne, bi hêz
bike; çimkî min kirinên te li ber Xwedayê xwe temambûyî nedîtin.
3 Îcar bîne bîra xwe ku te çi standiye û bihîstiye; wan tiştan bigire
û tobe bike. Lê eger tu hişyar nebî, ezê wek dizan bêm û tu nizanî
ku ezê di kîjan saetê de bavêjim ser te. 4 Lê di Sardeysê de çend
kesên te hene ku wan cilên xwe nelewitandine. Ewê bi min re bi
cilên spî bigerin, ji ber ku ew hêja ne. 5 Ewê ku bi ser dikeve bi vî
awayî wê bi cilên spî bê wergirtin. Û ez navê wî ji Kitêba Jiyanê tu
caran xîş nakim, lê ezê navê wî li ber Bavê* xwe û li ber mil-
yaketên wî eşkere bikim.
6 Ewê ku guhên wî hene, bila bibihîze ku Ruh ji civînan re çi
dibêje.›»

### *Ji Civîna Bawermendên Filadelfiyayê re*

7 «Ji milyaketê civîna bawermendên Filadelfiyayê re binivîse:
‹Yê Pîroz, yê Rastîn,
Yê ku mifta Dawid* pê re ye,
Yê ku vedike û tu kes nikare bigire
Û yê ku digire û tu kes nikare veke,
Van tiştan dibêje:
8 Ez bi kirinên te dizanim. Va ye, min deriyekî vekirî daniye ber te
ku tu kes nikare bigire. Ez dizanim ku hêza te hindik e û dîsa jî te
peyva* min girt û te navê min înkar nekir. 9 Va ye, hinek ji kinîş-
ta* Îblîs hene. Ew ne Cihû ne, lê bi derew ji xwe re dibêjin Cihû.
Ezê wusa bi wan bikim, ku ewê bên û li ber lingên te herin ser
çokan û wê bizanin ku ez ji te hez dikim. 10 Madem ku te bi ragir-
tinê* peyva min girt, ez jî, ezê te di saeta ceribandinê de bigirim;
ew saet ji bo ceribandina yên ku li ser erdê rûdinin e û ewê bê ser
seranserê dinyayê. 11 Ezê zûka bêm, tiştê ku bi te re ye hişk bigire,
da ku tu kes taca te nestîne. 12 Ewê ku bi ser dikeve ezê wî di

---

**3:3** Metta 24:34-44 **3:5** Derketin 32:33 **3:7** Binêre: Îşaya 22:22

Perestgeha* Xwedayê xwe de bikim stûn û ew êdî tu caran der-
nakeve derve. Ezê navê Xwedayê xwe, navê bajarê Xwedayê xwe,
navê Orşelîma* nû ya ku ji Xwedayê min, ji ezmên tê xwarê û na-
vê xwe yê nû li ser wî binivîsim.
13 Ewê ku guhên wî hene, bila bibihîze ku Ruh ji civînan re çi
dibêje.›»

### *Ji Civîna Bawermendên Lawdikyayê re*

14 «Ji milyaketê civîna bawermendên Lawdikyayê re binivîse:
‹Yê Amîn*, şahidê rastîn û dilsoz, serkaniya afirandinên Xwe-
dê, van tiştan dibêje: 15 Ez bi kirinên te dizanim, tu ne sar î û ne jî
germ î. Xwezî tu an sar an germ bûyayî. 16 Lê ji ber ku tu ne sar û
ne jî germ î, tu sarûgermo yî, ezê te ji devê xwe vereşim. 17 Tu
dibêjî: «Ez dewlemend im, ez gelek dewlemend bûme û qet
hewcedariya min tune». Lê tu nizanî ku tu reben, jar, belengaz, kor
û tazî yî. 18 Şîreta min li te ev e: Zêrê ku bi êgir hatiye safîkirin ji
min bikirre, da ku tu dewlemend bibî; cilên spî ji min bikire, da ku
tu li xwe bikî û şerma tazîbûna te bê nixumandin. Û dermanê
çavan ji min bikire û li çavên xwe bide, da ku tu bibînî. 19 Ez dengê
xwe li hemûyên ku ez ji wan hez dikim hildidim û wan edeb
dikim. Loma bi xîret be û tobe bike! 20 Va ye, ez li ber derî ra-
diwestim û lê dixim. Eger yek dengê min bibihîze û derî veke, ezê
herim ba wî û ez bi wî re û ew bi min re, emê şîvê bixwin. 21 Yê ku
bi ser dikeve, ezê heq bidim wî ku bi min re li ser textê min rûne,
çawa ku ez bi ser ketim û bi Bavê* xwe re li ser textê wî rûniştim.
22 Ewê ku guhên wî hene, bila bibihîze ku Ruh ji civînan re çi
dibêje.›»

### *Textê li Ezmên*

4 Piştî van tiştan min dît ku va ye, li ezmên deriyekî vekirî heye.
Ew dengê ku min pêşî bihîstibû û wek dengê boriyê bû, ji min
re got: «Hilkişe vir û ezê wan tiştên ku divê ji niha û pê ve çêbin,
nîşanî te bidim.» 2 Di cih de Ruh hat ser min, min dît, textek li ez-
mên hebû û li ser text yek rûniştî bû. 3 Û dîtina yê rûniştî mîna
kevirê yêşîm û eqîqê sor yê şewqdar bû. Li hawirdora text kes-

---

**3:12** Îşaya 62:2
**3:14** Kolosî 2:1; 4:13-16
**3:19** Gotinên Silêman 3:11-12
**4:2-8** Hezekiyêl 1:5-28

kesoreke mîna zimrûd hebû. 4 Li hawirdora text bîst û çar textên
din hebûn û li ser wan textan bîst û çar rihspî rûdiniştin. Li ser serê
wan tacên zêrîn hebûn û cilên spî wergirtibûn. 5 Û ji text birûsk,
deng û xurexurên ewran derdiketin. Û li ber text heft xetîrên êgir
yên pêketî hebûn, ew heft ruhên Xwedê ne. 6 Li ber text tiştek wek
deryayeke camîn û mîna belûr hebû.

Û li navendê, li hawirdora text, çar afirîdên* jîndar hebûn ku ji
pêş û ji paş ve bi çavan tije bûn. 7 Afirîdê pêşî mîna şêr bû, yê di-
duyan mîna conega bû û rûyê afirîdê sisiyan wek rûyê mirovan bû
û afirîdê çaran mîna eyloyê firek bû. 8 Û ji çar afirîdan her yek ji
wan şeş baskên wî hebûn, hawirdora wî û hundirê wî bi çavan tije
bû. Bi şev û bi roj bê rawestin dibêjin:

> «Pîroz, pîroz, pîroz,
> Xudan, Xwedayê karîndarê* her tiştî,
> Yê ku Hebû, Yê ku Heye û Yê ku Wê Bê.»

9 Û her cara ku çar afirîdên jîndar rûmet, hurmet û şikiriyê didin yê
ku li ser text rûniştiye û her û her dijî, 10 bîst û çar rihspî li ber yê
ku li ser text rûniştiye deverû diçin ser çokan, diperizin* wî yê ku
her û her dijî û tacên xwe davêjin ber text û dibêjin:

> 11 «Ya Xudan, Xwedayê me,
> Tu hêja yî ku rûmet, hurmet û hêzê bistînî.
> Çimkî te her tişt afirandin
> Û bi daxwaza te ew afirîn û hene.»

### *Kitêba Morkirî û Berx*

5 Hingê min di destê rastê yê wî yê ku li ser text rûdinişt de nivî-
sara lihevpêçayî dît. Ew ji herdu aliyan ve hatibû nivîsîn û bi
heft moran hatibû morkirin. 2 Û min milyaketekî hêzdar dît ku bi
dengekî bilind digot: «Kî hêja ye ku kitêbê* veke û morên wê
rake?» 3 Lê ne li ezmên, ne li ser erdê û ne jî di bin erdê de tu kesî
nikaribû kitêb vekira û lê binêriya. 4 Ez gelek digiriyam, çimkî ke-
sek hêjayî peyda nebû ku kitêbê veke û lê binêre. 5 Hingê yekî ji
rihspiyan ji min re got: «Negirî! Va ye, Şêrê ku ji eşîra Cihûda*
ye, Rayê* Dawid* bi ser ket, ku kitêbê û heft morên wê veke.»

---

4:5 Derketin 19:16
4:8 Binêre: Îşaya 6:3; Amos 4:13; Îşaya 41:4
5:1 Hezekiyêl 2:9-10
5:5 Binêre: Destpêkirin 49:9; Îşaya 11:1

[6] Hingê li ber text û di navenda çar afirîdên* jîndar û rihspiyan
de min Berxek dît, wek ku serjêkirî be. Heft strûhên* wî û heft
çavên wî hebûn. Evên ha heft ruhên Xwedê ne yên ku li seranserê
dinyayê hatine şandin. [7] Ew hat û kitêb ji destê rastê yê wî yê ku li
ser text rûdinişt stand. [8] Çaxê wî ew stand, çar afirîdên jîndar û bîst
û çar rihspî li ber Berx deverû çûn ser çokan. Di destê her yekî ji
wan de çeng* û piyanên zêrîn ên tije bixûr* hebûn. Bixûr duayên
mirovên pîroz in. [9] Û lavijekê nû distrandin û digotin:

«Tu hêja yî ku kitêbê bistînî
Û morên wê vekî.
Çimkî tu hatî serjêkirin
Û te bi xwîna xwe ji her bavikî, ji her zimanî,
Ji her gel û ji her miletî mirov ji Xwedê re kirrîn;
[10] Û te ew ji Xwedayê me re kirin padîşahî û kahîn*
Û ewê li ser dinyayê padîşahiyê bikin.»

[11] Hingê min nêrî, li hawirdora text û afirîdên jîndar û rihspi-
yan, min dengê gelek milyaketan bihîst û hijmara wan bi hezaran
hezar û bi deh hezaran deh hezar bû. [12] Bi dengekî bilind digotin:

«Berxê serjêkirî hêja ye ku hêz,
Dewlemendî, şehrezayî, karîn, hurmet,
Rûmet û pesin bistîne.»

[13] Hingê min bihîst ku her afirînên li ezmên, li ser erdê, di bin erdê
de û di deryayê de û hemû tiştên di wan de, digotin:

«Bila her û her pesin, hurmet, rûmet û qudret
Ji yê ku li ser text rûniştiye re û ji Berx re be!»

[14] Û çar afirîdên* jîndar digotin: «Amîn» û rihspî deverû çûn ser
çokan û perizîn*.

### *Şeş Morên Pêşî Tên Vekirin*

6 Hingê min dît ku Berx yek ji heft moran vekir û min bihîst ku
yek ji çar afirîdên jîndar, bi dengekî wek xurexura ewran got:
«Were!» [2] Û min dît, va ye, hespekî boz xuya bû û di destê siwarê
wî de kevanek hebû. Tacek ji wî re hat dayîn û ew bi serketin der-
ket, da ku bi ser keve.

---

5:6 Îşaya 53:7 5:8 Zebûr 141:2 5:10 Binêre: Derketin 19:6; Îşaya 61:6
5:12 Binêre: 1 Dîrok 29:11; Îşaya 53:7 5:13 Binêre: Zebûr 47:8; Îşaya 6:1

[3] Gava ku Berx mora diduyan vekir, min bihîst ku afirîdê
jîndar yê diduyan got: «Were!» [4] Hingê hespekî din ê sor derket û
ji siwarê wî re destûr hat dayîn, ku aştiyê* ji dinyayê rake û miro-
van bi hevdû bide serjêkirin. Û şûrekî mezin ji wî re hat dayîn.
[5] Gava ku Berx mora sisiyan vekir, min bihîst ku afirîdê jîndar
yê sisiyan got: «Were!» Û min dît, va ye, hespekî reş û di destê si-
warê wî de şihînek* heye. [6] Hingê min di navenda çar afirîdên jîndar
de dengek bihîst, wek ku digot: «Çapikek tenê genim bi zîvekî* û
sê çapik tenê ceh bi zîvekî. Lê ziyanê nede dohnê zeytê û şerabê.»
[7] Gava ku Berx mora çaran vekir, min dengê afirîdê jîndar yê
çaran bihîst ku digot: «Were!» [8] Hingê min dît, va ye, hespekî
kimêt ku navê siwarê wî Mirin bû. Diyarê* miriyan li pey wî dihat.
Li ser çaryeka dinyayê desthilatî ji wî re hat dayîn, da ku bi şûr, bi
xelayê, bi mirinê û bi heywanên dehbe yên dinyayê wan bikuje.
[9] Gava ku Berx mora pêncan vekir, min di bin gorîgehê* de
canê wan mirovan dît, yên ku di ber peyva* Xwedê û di ber şahi-
diya ku kirine de, hatibûn kuştin. [10] Wan bi dengekî bilind gazî kir
û gotin: «Ey Xudanê hukumdar! Tu pîroz û rastîn î. Ma heta kengê
tu dîwanê* nakî û tu heyfa xwîna me ji wan ên ku li dinyayê rû-
dinin nastînî?» [11] Hingê ji her yekî ji wan re xiftanê spî hat dayîn û
ji wan re hat gotin ku demeke kurt rihet bimînin, heta ku hijmara
xizmet-hevalên wan û birayên wan ên ku wê wek wan bên kuştin,
temam bibe.
[12] Gava ku Berx mora şeşan vekir, min dît ku erdhejîneke me-
zin çêbû. Roj wek xirariyê* ji mû, reş bû û tevahiya heyvê bû wek
xwînê. [13] Stêrên ezmên ketin ser erdê, wek ku dara hêjîrê ji ber ba-
yekî mezin bihejike, hêjîrên xwe yên bihûrî biweşîne. [14] Û ezman
wek pêçekekê li hev hat pêçan û hemû çiya û girav ji cihên xwe
hatin rakirin. [15] Hingê padîşahên dinyayê, mezinên wê, serekleş-
kerên wê, dewlemendên wê û hêzdarên wê û hemû mirovên xulam
û azad xwe di şkeft û latên çiyan de veşartin. [16] Wan ji çiyan û la-
tan re digot: «Bi ser me de bikevin û me ji ber rûyê yê ku li ser text
rûniştiye û ji ber xezeba Berx veşêrin. [17] Çimkî roja mezin a xe-
zeba wan hat û kî dikare li ber bisekine?»

---

**6:12** Îşaya 13:10; Yoêl 2:10, 31; 3:5 Metta 24:29 **6:13-14** Îşaya 34:4
**6:15** Îşaya 2:19-21 **6:16** Hoşêya 10:8 **6:17** Yoêl 2:11; Melaxî 3:2

### *Ji Kurên Îsraêl 144 Hezar Mirov Tên Morkirin*

7 Piştî vê yekê min çar milyaket dîtin ku li ser çar kujên erdê
disekinîn û bayên çar kujên erdê digirtin, da ku ba li erdê, li
deryayê û li tu daran nexe. 2 Min milyaketekî din jî dît ku ji Roj-
hilatê derdiket û mora Xwedayê jîndar pê re bû. Bi dengekî bilind
gazî wan çar milyaketan kir, yên ku desthilatî ji wan re hatibû
dayîn, ku zirarê bidin erd û deryayê; wî ji wan re got: 3 «Heta ku
em morê li ser eniya xulamên Xwedayê xwe nexin, ziyanê nedin
erdê, deryayê û daran.» 4 Hingê min hijmara yên ku hatibûn mor-
kirin bihîst: Ji hemû eşîrên kurên Îsraêl sed û çil û çar hezar
hatibûn morkirin.

5 Ji eşîra Cihûda diwanzdeh hezar hatibûn morkirin.
Ji eşîra Rûbên diwanzdeh hezar,
Ji eşîra Gad diwanzdeh hezar,
6 Ji eşîra Aşêr diwanzdeh hezar,
Ji eşîra Neftelî diwanzdeh hezar,
Ji eşîra Minaşe diwanzdeh hezar,
7 Ji eşîra Şimûn diwanzdeh hezar,
Ji eşîra Lêwî diwanzdeh hezar,
Ji eşîra Îsexar diwanzdeh hezar,
8 Ji eşîra Zebûlon diwanzdeh hezar,
Ji eşîra Ûsiv diwanzdeh hezar,
Ji eşîra Binyamîn diwanzdeh hezar hatibûn morkirin.

### *Elaleta ji Hemû Miletan*

9 Piştî vê yekê min dît ku va ye, elaleteke* mezin ya ku ji her
miletî, ji her bavikî, ji her gelî û ji her zimanî ku tu kesî nedikarî
bihijmarta; xiftanên spî li xwe kiribûn û guliyên xurmeyan di des-
tên wan de bûn û li ber text û li ber Berx radiwestan. 10 Wan bi
dengekî bilind gazî dikir û digotin:

«Xilasî babetê Xwedayê me ye yê ku
Li ser text rûniştiye û babetê Berx e.»

11 Hemû milyaket li hawirdora text û rihspiyan û afirîdên jîndar
disekinîn. Û li ber text xwe deverû davêtin erdê, diperizîn* Xwedê
û digotin:

---

7:1 Daniyêl 7:2 7:3 Hezekiyêl 9:4-6

12 «Amîn. Pesin, rûmet, şehrezayî,
Şikir, hurmet, hêz û karîn
Bila her û her ji Xwedayê me re be.
Amîn.»
13 Yek ji rihspiyan peyivî û ji min re got: «Evên ku bi xiftanên
spî hatine wergirtin kî ne û ji ku derê hatine?» 14 Min ji wî re got:
«Ezbenî, tu dizanî.» Hingê wî ji min re got: «Evên ha ew in ku ji
wê tengahiya mezin hatine, xiftanên xwe şuştine û bi xwîna Berx
spî kirine.
15 Ji bo vê yekê li ber textê Xwedê ne
Û di Perestgeha* wî de şev û roj diperizin wî.
Yê ku li ser text rûniştiye, wê konê* xwe li ser wan vegire.
16 Êdî ew birçî nabin û êdî tî nabin
Û ne tav û ne jî germî li wan dixe.
17 Çimkî ew Berxê ku di navenda text de ye
Wê şivantiyê li wan bike
Û wê wan bibe ser kaniyên ava jiyanê.
Xwedê wê hemû hêstiran ji çavên wan paqij bike.»

### *Mora Heftan û Bixûrdanka Zêrîn*

8 Û çaxê Berx mora heftan vekir, li dor nîv saetê li ezmên bê-
pêjiniyeke mezin çêbû. 2 Hingê min heft milyaketên ku li ber
Xwedê rawestabûn dîtin. Heft borî ji wan re hatin dayîn.
3 Û milyaketekî din hat ku di destê wî de bixûrdanka zêrîn
hebû û ew li ber Gorîgeha zêrîn rawesta. Gelek bixûr* jê re hat da-
yîn, da ku li ser Gorîgeha zêrîn ya li ber text, bi duayên hemû pîro-
zan pêşkêş bike. 4 Û dûmana bixûrê bi duayên pîrozan re ji destê
milyaket bilind bû ber Xwedê. 5 Piştre milyaket rahişt bixûrdankê
û ew ji agirê Gorîgehê dagirt û avêt ser erdê. Xurexura ewran,
deng, birûsk û erdhejîn çêbûn.

### *Çar Boriyên Pêşî*

6 Hingê heft milyaketên ku heft borî bi wan re bûn xwe amade
kirin, ku li boriyan bixin.

---

7:14 Daniyêl 12:1; Metta 24:21
7:16 Binêre: Îşaya 49:10
7:17 Binêre: Zebûr 23:1-2; Îşaya 25:8; 49:10
8:3 Derketin 30:1-3

7 Û yê pêşî li boriyê xist, teyrok û agirê tevli xwînê bûyî çêbû
û hat avêtin ser erdê. Û sêyeka erdê şewitî, sêyeka daran şewitî û
hemû giyayê şîn şewitî.
8 Milyaketê diduyan li boriyê xist, tiştekî wek çiyayekî mezin
ku bi êgir dişewitî hat avêtin nav deryayê û sêyeka deryayê bû
xwîn. 9 Hingê sêyeka wan afirînên ku di deryayê de dijiyan mirin û
sêyeka gemiyan telef bû.
10 Milyaketê sisiyan li boriyê xist û stêreke mezin ya ku wek
xetîre dişewitî ji ezmên ket ser sêyeka çeman û ser çavkaniyên
avê. 11 Navê stêrê Zerender e. Sêyeka avê wek zerender tehl bû û
gelek mirov ji avê mirin, çimkî av tehl bûbû.
12 Û milyaketê çaran li boriyê xist, sêyeka rojê, sêyeka heyvê û
sêyeka stêran derb standin, wusa ku sêyeka wan tarî dibû, sêyeka
rojê û sêyeka şevê jî bê ronahî dima.
13 Hingê min nêrî û min dengê eylo bihîst ku di nîvê ezmên de
difirî û bi dengekî bilind digot: «Ji ber dengê boriyên wan sê mil-
yaketên mayî yên ku wê li boriyê bixin: Wey, wey, wey li wan ên
ku li ser rûyê erdê rûdinin.»

### *Boriya Pêncan*

9 Milyaketê pêncan li boriyê xist û min stêrek dît ku ji ezmên
ketibû ser rûyê erdê. Û mifta deriyê kortala* bêbinî ji stêrê re
hat dayîn. 2 Gava ku wê deriyê kortala bêbinî vekir, wek dûmana
kûrheke mezin dûman ji çalê derket û ji dûmana çalê, roj û hewa
bûn tarî. 3 Ji nav dûmanê kulî derketin ser rûyê erdê; wek ku dest-
hilatiya dûpişkên erdê heye, desthilatî ji wan re jî hat dayîn. 4 Û ji
wan re hat gotin ku ziyanê nedin giyayê erdê, ne jî tu dar û tu
şînayiyê, lê ziyanê bidin wan mirovên ku mora Xwedê li ser eniya
wan tune. 5 Destûra kuliyan hat dayîn, ku pênc mehan ezabê bidin
wan, lê wan nekujin. Êşa wan wek êşa pêvedana dûpişkan bû. 6 Di
wan rojan de mirov wê li mirinê bigerin, lê ew tu caran wê nabî-
nin; ewê bixwazin ku bimirin, lê mirin wê ji wan bireve.

---

**8:7** Derketin 9:23-25; Hezekiyêl 38:22
**8:11** Zerender: Giyayek gelek tehl e.
**8:12** Îşaya 13:10; Hezekiyêl 32:7; Yoêl 2:10, 31; 3:15 **9:2** Destpêkirin 19:28
**9:3** Derketin 10:12-15 **9:4** Hezekiyêl 9:4 **9:6** Yêremya 8:3

[7] Dîtina kuliyan mîna wan hespan bûn ku ji bo cengê hatine
amadekirin. Li ser serê wan tiştek wek tacên zêrîn hebû û rûyê wan
wek rûyê mirovan bû. [8] Porê wan wek porê jinan û diranên wan
wek diranên şêran bûn. [9] Û wek zirxên hesinî zirxên wan hebûn û
dengê baskên wan mîna dengê wan erebeyan bû ku gelek hesp wan
dikişînin û dibezin cengê. [10] Mîna dûpişkan dûvikê wan û derziya
wan hebû; û desthilatiya wan a ku pênc mehan cefayê bidin miro-
van di dûvikê wan de bû. [11] Û milyaketê kortala bêbinî li ser wan
padîşah bû, ku navê wî bi Îbranî* ‹Abadûn› û bi Yewnanî ‹Apoli-
yon› e.
[12] Waweylêya pêşî derbas bû; va ye, hê du waweylêyên din
tên.

### *Boriya Şeşan*

[13] Û milyaketê şeşan li boriyê xist û min dengek ji çar strûhên*
Gorîgeha* zêrîn ya ku li ber Xwedê bû, bihîst. [14] Deng ji milyaketê
şeşan re, yê ku borî di destê wî de bû got: «Wan çar milyaketên ku
li ba çemê Firatê yê mezin girêdayî ne, veke.» [15] Û çar milyaketên
ku ji bo vê saetê, vê rojê, vê mehê û vê salê hatibûn amadekirin,
hatin berdan, da ku sêyeka mirovan bikujin. [16] Hijmara ordiyên
siwarên hespan du caran deh hezar car deh hezar bû; min hijmara
wan bihîst. [17] Di dîtiniya* ku min dît de hesp û siwarên wan bi vî
awayî xuya dibûn: Zirxên wan hebûn ku bi rengê êgir, yaqûtê ez-
manî û kewkurtê bûn. Serê hespên wan wek serê şêran bû. Ji devê
wan agir, dûman û kewkurt derdiket. [18] Sêyeka mirovan bi van her
sê belayan, bi êgir, bi dûman û bi kewkurta ku ji devê wan der-
diket, hatin kuştin. [19] Çimkî desthilatiya hespan di devê wan û di
dûvê wan de ye. Dûvên wan mîna maran in û serê wan heye û bi
van ziyanê didin.
[20] Û ew mirovên ku bi şûn de mabûn û bi van belayan neha-
tibûn kuştin, ji wan pûtên ku bi destên xwe çêdikirin, tobe nekirin.
Dev ji perizîna cin û wan pûtan bernedan, yên ku zêrîn, zîvîn, tûn-
cîn, kevirîn û darîn in û nabînin, nabihîzin û rêve naçin. [21] Û ji kuş-
tin, sêrbazî, fuhûşî û diziya xwe jî tobe nekirin.

---

9:7 Yoêl 2:4 9:20 Zebûr 115:4-7
9:11 «Abadûn» û «Apoliyon»: Ev herdu nav bi mana «Wêranker» in.

### *Milyaket û Kitêba Biçûk*

10 Hingê min milyaketekî din ê hêzdar dît ku ji ezmên dihat
xwarê. Ew bi ewr wergirtî bû û li ser serê wî keskesor
hebû. Rûyê wî wek rojê û lingên wî wek stûnên êgir bûn. 2 Di des-
tê wî de kitêbeke* biçûk a vekirî hebû. Lingê xwe yê rastê danî ser
deryayê û lingê xwe yê çepê danî ser bejê. 3 Çawa ku şêr dike hu-
mênî bi dengekî bilind bang kir. Çaxê ku wî bang kir, heft xurexu-
rên ewran bi dengên xwe peyivîn. 4 Gava ku heft xurexurên ewran
peyivîn, ez li ber nivîsînê bûm. Û min ji ezmên dengek bihîst ku
digot: «Ew tiştên ku heft xurexurên ewran gotin, mor bike, wan
nenivîse.»
5 Piştre ew milyaketê ku min ew li ser deryayê û li ser bejê
rawestayî dîtibû, destê xwe yê rastê ber bi ezmên ve bilind kir. 6 Û
wî bi wî yê ku her û her dijî, yê ku ezman û yên ku tê de ne, erd û
yên ku te de ne, derya û yên ku tê de ne afirandine, sond xwar û
got: «Êdî wê bi derengmayîn nebe. 7 Lê belê di rojên ku milyaketê
heftan dengê xwe bide bihîstin de, çaxê ew li boriyê bixe, tam wek
ku Xwedê mizgînî ji xulamên xwe yên pêxember re dabû, sira
Xwedê wê temam bibe.»
8 Hingê ew dengê ku min ji ezmên bihîstibû, careke din bi min
re peyivî û got: «Here, wê kitêba vekirî ya ku di destê wî milya-
ketê ku li ser deryayê û bejê rawestayî de ye bistîne.» 9 Îcar ez çûm
ba milyaket û min jê xwest, ku kitêba* biçûk bide min. Wî ji min
re got: «Wê bigire û bixwe. Wê zikê te tehl bike, lê wê di devê te
de wek hingiv şêrîn be.» 10 Min kitêba biçûk ji destê milyaket
stand û min ew xwar. Di devê min de wek hingiv şêrîn bû; lê ça-
xê min ew xwar, zikê min tehl bû. 11 Û ji min re hat gotin: «Divê
ku tu dîsa li ser gelek gel, milet, ziman û padîşahan pêxemberî-
tiyê bikî.»

### *Du Şahid*

11 Qamîşekî mîna şivdar ji min re hat dayîn û hat gotin: «Ra-
be, Perestgeha* Xwedê, Gorîgehê û yên ku tê de diperizin
bipîve. 2 Lê hewşa Perestgehê ya derve bihêle û wê nepîve; çimkî
ew ji miletan re hat dayîn. Ewê Bajarê* Pîroz çil û du mehan di bin

---

10:8-10 Hezekiyêl 2:8-3:3 11:2 Lûqa 21:24

lingan de biperçiqînin. 3 Û ezê desthilatiyê bidim du şahidên xwe û
ewê xirarî* li xwe kirî hezar û du sed û şêst rojan pêxemberîtiyê
bikin.» 4 Ev in ew herdu darên zeytûnan û herdu çiradankên ku li
ber Xudanê dinyayê disekinin. 5 Eger mirovek bixwaze ziyanê bide
wan, ji devê wan agir derdikeve û dijminên wan dixwe û helak
dike. Û eger mirovek bixwaze ziyanê bide wan, divê ew bi xwe bi
vî awayî bê kuştin. 6 Desthilatiya wan heye, ku di rojên pêxem-
berîtiya xwe de ezmên bigirin, da ku baran nebare. Û desthilatiya
wan li ser avê heye, ku wê bikin xwîn û kengê bixwazin, dikarin
her belayê bi ser rûyê erdê de bînin.

7 Çaxê şahidiya xwe bibin serî, ew cenawirê ku ji kortala* bê-
binî derdikeve wê bi wan re şer bike, li hember wan bi ser keve û
wan bikuje. 8 Cesedê wan wê li ser meydana wî bajarê mezin bi-
mîne, ku bi mana ruhanî jê re Sodom û Misir tê gotin. Xudanê wan
bi xwe jî li wê derê hat xaçkirin. 9 Ji her gel, her bavik, her ziman û
her miletan mirov wê sê roj û nîvan li cesedê wan binêrin û ew
destûrê nadin, ku cesedê wan bixin gorê. 10 Yên ku li ser rûyê erdê
rûdinin wê li ser wan şa bibin û wê gelek dilgeş bibin û ewê di-
yariyan ji hev re bişînin. Çimkî van herdu pêxemberan ezab didan
wan ên ku li ser rûyê erdê rûdiniştin.

11 Û piştî sê roj û nîvan ji Xwedê ruhê jiyanê ket hundirê wan û
ew rabûn ser lingên xwe. Îcar tirseke mezin ket ser wan ên ku ew
dîtin. 12 Hingê wan dengekî mezin ji ezmên bihîst ku ji wan re
digot: «Werin jorê.» Û li ber çavên dijminên xwe ew di ewr de hil-
kişiyan ezmên. 13 Di wê saetê de erdhejîneke mezin çêbû, dehyeka
bajêr hilweşiya û di erdhejînê de heft hezar mirov mirin. Yên bi
şûn de man, tirsiyan û rûmet dan Xwedayê ezmên.

14 Waweylêya diduyan derbas bû; va ye, waweylêya sisiyan
zûka tê.

### *Boriya Heftan: Perizîna li Ezmên*

15 Milyaketê heftan li boriyê xist û li ezmên dengên mezin
çêbûn ku digotin:

---

**11:4** Zekerya 4:3, 11-14 **11:6** 1 Padîşah 17:1; Derketin 7:17-19
**11:8** Sodom: Destpêkirin 19; Misir: Misir ew der e ku gelê Îsraêl ji bo demeke dirêj lê hatibû bindestkirin (Derketin 1 û 5).

«Padîşahiya dinyayê bû ya Xudanê me û ya Mesîhê wî.
Ewê her û her padîşahiyê bike».
[16] Û bîst û çar rihspiyên li ber Xwedê yên ku li ser textên xwe
rûdiniştin, xwe deverû avêtin erdê, perizîn Xwedê û gotin:
[17] «Ya Xudan, Xwedayê karîndarê* her tiştî,
Yê ku Hebû û Yê ku Heye,
Em ji te re şikir dikin;
Çimkî te hêza xwe ya mezin stand
Û te dest bi hukumdariya xwe kir.
[18] Milet hêrs bûn, lê xezeba te hat;
Wext hat, ku dîwana* miriyan bê kirin.
Wextê dayîna xelata xulamên te yên pêxember
Û yên pîroz, biçûk û mezin, yên ku ji te ditirsin hat.
Û wextê xerakirina yên ku dinyayê xera dikin hat.»
[19] Hingê Perestgeha Xwedê ya ku li ezmên bû vebû û di Perestgeha
wî de Sindoqa* Peymana wî xuya bû. Birûskan lê da, deng û xure-
xura ewran hat bihîstin, erdhejînek û teyrokeke şedîd çêbû.

### *Jinik û Ejder*

12 Hingê nîşaneke mezin li ezmên xuya bû: Jinek hebû ku bi
rojê pêçayî, heyv di bin lingên wê de û taca ji diwanzdeh
stêran li ser serê wê bû. [2] Ew bizaro bû û ji bo ku zarokê xwe
bianiya, di cefayê de bû, êş dikişand û dikir qîrîn.
[3] Nîşaneke din jî li ezmên xuya bû. Va ye, ejderekî sor ê mezin
ku heft serî û deh strûhên* wî hebûn û li ser serên wî heft tac
hebûn. [4] Û dûvikê wî sêyeka stêrên ezmên xişandin û ew avêtin ser
rûyê erdê. Ejder li ber wê jina ku li ber zarokanînê bû rawesta. Ew
li benda bûyîna zarok bû, ku wî daqurtîne. [5] Jinikê zarokekî kur
anî, kurekî ku ewê bi gopalê hesin şivantiyê li hemû miletan bike.
Û zarokê wê birin ba Xwedê û ber textê wî. [6] Jinik jî reviya çû ço-
lê. Li wê derê cihê wê yê ku ji aliyê Xwedê ve hatibû amadekirin
hebû, da ku ew hezar û du sed û şêst rojan bê xweyîkirin.

---

**11:15** Binêre: Derketin 15:18; Zebûra 10:16; Daniyêl 2:44
**11:17** Binêre: Amos 3:13; Derketin 3:14
**11:18** Binêre: Zebûr 2:1; Daniyêl 9:6; Amos 3:7; Zebûr 115:13
**12:3-4** Daniyêl 7:7; 8:10 **12:5** Zebûr 2:9

7 Hingê li ezmên ceng çêbû. Mîxayîl û milyaketên xwe bi ejder
re şer kirin. Û ejder û milyaketên xwe şer kirin, 8 lê bi ser neketin û
li ezmên êdî ji bo wan cih nema. 9 Ejderê mezin yê ku jê re Îblîs û
Şeytan tê gotin, ew marê kevin ê ku hemû dinya xapandiye, ew û
milyaketên wî pê re hatin avêtin ser rûyê erdê.
10 Hingê min li ezmên dengekî bilind bihîst ku got:

«Êdî wextê xilasî, hêz û Padîşahiya Xwedayê me
Û desthilatiya Mesîhê wî hat.
Çimkî sûcdarkerê birayên me,
Yê ku şev û roj wan li ber Xwedayê me sûcdar dike,
Hat avêtin xwarê.
11 Ew bi xwîna Berx û bi peyva şahidiya xwe
Li hember wî bi ser ketin
Û heta mirinê jî ji jiyana xwe hez nekirin.
12 Ji bo vê yekê şa bibin, ya ezmanno
Û yên ku di wan de rûdinin.
Lê wey li erdê û li deryayê,
Çimkî Îblîs dizane ku wextê wî hindik e,
Bi xezebeke mezin peya bû û hat we.»

13 Gava ejder dît ku ew hat avêtin ser rûyê erdê, ket pey wê ji-
nika ku zarokê kur anîbû. 14 Du baskên eyloyekî mezin ji jinikê re
hatin dayîn, da ku bifire here çolê cihê xwe. Li wê derê, ji mar dûr,
wê sê sal û nîvan bê xweyîkirin. 15 Hingê mar ji devê xwe wek çem
av pijiqand pey wê, da ku wê bi avê bixeniqîne. 16 Lê erdê alîka-
riya jinikê kir, devê xwe vekir û ew çemê ku ejder ji devê xwe
pijiqandibû daqurtand. 17 Îcar ejder ji jinikê hêrs bû û çû, da ku bi
wan re şer bike, yên ku ji dûndana* wê mane, yên ku emrên Xwe-
dê tînin cih û şahidiya Îsa bi wan re ye. 18 Ejder li ber devê deryayê
sekinî.

### *Du Cenawir*

13 Piştre min cenawirekî ku ji deryayê derdiket dît. Deh strû-
hên* wî û heft serên wî hebûn û li ser strûhên wî deh tac û
li ser serên wî navên çêran* hebûn. 2 Ew cenawirê ku min dît, mîna

---

**12:7-8** Daniyêl 10:13, 21; 12:1 **12:9** Destpêkirin 3
**12:10** Binêre Eyûb 1:9-11; Zekerya 3:1

piling bû, lingên wî wek lingên hirçê bûn û devê wî wek devê şêr
bû. Û ejder hêza xwe, textê xwe û desthilatiya mezin da wî. 3 Û
seriyek ji seriyên cenawir wek ku li ber mirinê be birîndar bû, lê
birîna mirinê hat qenckirin û seranserê dinyayê li cenawir şaş ma.
4 Hingê mirov ji ejder re çûn ser çokan, çimkî wî desthilatiya xwe
da cenawir. Mirov perizîn cenawir û gotin: «Gelo kî mîna cenawir
e? Û kî dikare bi wî re şer bike?»
5 Devê ku tiştên mezin dibêje û çêran dike ji wî re hat dayîn û
desthilatî ji wî re hat dayîn, ku çil û du mehan çi bixwaze bike. 6 Ji
bo ku li dijî Xwedê çêran bike, devê xwe vekir û çêrî navê wî, ko-
nê wî û yên ku li ezmên rûdinin kir. 7 Destûr ji wî re hat dayîn, ku
bi pîrozan re şer bike û li hember wan bi ser keve. Û desthilatiya li
ser her bavik, gel, ziman û miletan ji wî re hat dayîn. 8 Hemû yên
ku li ser erdê rûdinin, hemû yên ku navên wan ji damezrandina
dinyayê ve di Kitêba Jiyanê ya Berxê serjêkirî de nehatine nivîsîn,
wê jê re herin ser çokan.
9 Guhê kê hebe, bila bibihîze:
10 Yê hêsîrtiyê*, wê here hêsîrtiyê;
Yê şûr, wê bi şûr bê kuştin.
Li vê derê bîhnfirehî û baweriya pîrozan divê.
11 Hingê min cenawirekî din dît ku ji erdê derdiket. Wek ber-
xekî, du strûhên wî hebûn û wek ejder dipeyivî. 12 Û hemû desthi-
latiya cenawirê pêşî li ber wî bi kar dianî. Wî wusa kir, ku rûyê
erdê û yên ku li ser wê rûdinin ji wî cenawirê pêşî re herin ser
çokan, yê ku birîna wî ya mirinê hatibû qenckirin. 13 Wî li ber
mirovan nîşanên mezin dikirin, heta dikaribû ku ji ezmên êgir bîne
ser rûyê erdê. 14 Û bi wan nîşanên ku jê re hatibûn dayîn, da ku li
ber cenawirê pêşî bike, wî ew ên ku li ser rûyê erdê rûdiniştin, di-
xapandin. Ji wan re digot ku sûretekî ji wî cenawirî re çêkin ê ku bi
şûr hatibû birîndarkirin û dîsa dijiya. 15 Desthilatî ji wî re hat dayîn,
da ku nefesê bide sûretê cenawir ku sûretê cenawir bipeyive û bi-
kare wan ên ku neperizin cenawir bide kuştin. 16 Wî destê rastê an
eniya hemû biçûk û mezinan, dewlemend û belengazan, azad û
xulaman dida deqkirin. 17 Wusa ku heçî kesê deqa cenawir, yanî

---

**13:5-7** Daniyêl 7:8, 21, 25 **13:8** Zebûr 69:28
**13:10** Binêre: Yêremya 15:2; 43:11

navê wî an hijmara navê wî pê re nebe, nekaribe kirrîn û firotinê
bike.
18 Li vê derê şehrezayî divê: Yê ku fêmdar be, bila hijmara ce-
nawir hesab bike. Çimkî hijmara mirov e û hijmara wî şeş sed û
şêst û şeş e.

### *Berx û yên Xilasbûyî*

14 Hingê min dît ku va ye, Berx li ser Çiyayê Siyonê* disekinî
û bi wî re sed û çil û çar hezar mirov hebûn ku li ser eniya
wan navê wî û navê Bavê* wî nivîsî bûn. 2 Û min ji ezmên dengekî
wek dengê aveke boş û wek dengekî bilind yê xurexura ewran
bihîst. Dengê ku min bihîstibû, wek dengê mûzîkvanên ku li çen-
gên* xwe dixin bû. 3 Wan li ber text û li ber çar afirîdên jîndar û
rihspiyan straneke nû digot. Ji wan sed û çil û çar hezarên ku ji
rûyê erdê bi berdêl hatine kirrîn pê ve, tu kes nikare wê stranê hîn
bibe. 4 Yên ku bi jinan re nelewitîne ev in. Çimkî keçên keçîn,
kurên kurîn in. Ev ew in ku Berx bi ku derê ve here, li pey wî
diçin. Evên ha berê* pêşî ne ku ji bo Xwedê û ji bo Berx ji nav
mirovan hatine kirrîn. 5 Derew ji devê wan derneket. Ew bêleke ne.

### *Sê Milyaket*

6 Hingê min milyaketekî din dît ku di nava ezmên de difirî,
Mizgîniyeke herheyî bi wî re bû, da ku Mizgîniyê bide yên ku li
ser rûyê erdê rûdinin, yanî bide her milet, bavik, ziman û gelan.
7 Bi dengekî bilind digot: «Ji Xwedê bitirsin û rûmetê bidin wî,
çimkî saeta ku ew dîwanê bike, hat. Biperizin wî yê ku erd û ez-
man, derya û çavkaniyên avê afirandine.»
8 Hingê milyaketê diduyan li pey wî hat û got: «Hilweşiya! Ew
Babîla* mezin ya ku ji şeraba fuhûşiya xwe ya har bi hemû mi-
letan daye vexwarin, hilweşiya.»
9 Piştre milyaketê sisiyan li pey wan hat û bi dengekî bilind
got: «Eger kesek ji cenawir re û ji sûretê wî re here ser çokan û li
ser eniya xwe an li ser destê xwe deqê qebûl bike, 10 ew jî wê ji

---

**13:18** Tê fêmkirin ku hijmara 6 bi mana kêmahiyê ye, 7 bi mana temamiyê ye.
**14:8** Îşaya 21:9; Yêremya 51:8

şeraba hêrsa Xwedê ya ku safî di kasa xezeba wî de hatiye ama-
dekirin vexwe û li ber milyaketên pîroz û li ber Berx bi êgir û bi
kewkurtê ezab wê li wî bê kirin. [11] Û dûmana ezaba wan her û her
dû dike. Ew ên ku ji cenawir û ji sûretê wî re diçin ser çokan û her
kî ku deqa navê wî qebûl bike, şev û roj rihetiya wan tune.»
[12] Loma divê ew pîrozên ku emrên Xwedê û baweriya Îsa
digirin, bi bîhnfirehî ragirin*.
[13] Hingê min ji ezmên dengek bihîst ku digot: «Binivîse: Xwe-
zî bi wan miriyên ku ji niha û pê ve di yekîtiya Xudan de bimirin!»
Ruh dibêje: «Erê! Da ku ji xebata xwe rihet bibin, çimkî kirinên
wan bi wan re diçin.»

### *Dirûna Rûyê Erdê*

[14] Û min dît, va ye, ewrekî spî û yekî mîna Kurê* Mirov li ser
ewr rûniştî ye. Li ser serê wî taca zêrîn û di destê wî de daseke tûj
hebû. [15] Û milyaketekî din ji Perestgehê derket, bi dengekî bilind
gazî wî yê ku li ser ewr rûniştibû kir û got: «Dasa xwe bavêje û
bidirû. Saeta dirûnê hat, çimkî berê erdê gihîştiye.» [16] Û yê ku li
ser ewr rûdinişt dasa xwe avêt rûyê erdê û erd hat dirûn.
[17] Milyaketekî din ji wê Perestgeha ku li ezmên bû derket û di
destê wî de jî daseke tûj hebû.
[18] Îcar milyaketekî din ê ku li ser êgir hukumdariya wî heye, ji
Gorîgehê derket û bi dengekî bilind bang kir wî yê ku dasa wî ya
tûj heye û got: «Dasa xwe ya tûj bavêjê û gûşiyên mêwa erdê bi-
civîne, çimkî tiriyê wê gihîştine.» [19] Milyaket dasa xwe avêt erdê û
berê erdê yê mêwê civand û avêt mahsera xezeba Xwedê ya mezin.
[20] Mahsere li derveyê bajêr hat guvaştin û xwîna ku jê herikî,
cihekî bi qasî hezar û şeş sed meydanî* girt û xwe avêt heta lixaba
hespan.

### *Heft Milyaket û Heft Bela*

15 Hingê min li ezmên nîşaneke din a mezin û ecêb dît: Heft
milyaket hebûn, ku heft belayên dawîn bi wan re bûn. Çim-
kî xezeba Xwedê bi wan temam dibe. [2] Min dît ku tiştekî wek

---

**14:10** Destpêkirin 19:24; Hezekiyêl 38:22
**14:14** Daniyêl 7:13 **14:15** Yoêl 3:13
**14:20** 1600 meydan li dor 300 km in.

deryayeke camîn a bi êgir tevlihev hebû û min dît yên ku li hember
cenawir û sûretê wî û hijmara navê wî bi ser ketibûn, li ser deryaya
camîn radiwestan. Çengên* ku Xwedê dane wan di destên wan de
bûn 3 û strana xulamê Xwedê Mûsa* û strana Berx distrandin û
digotin:

«Ya Xudan, Xwedayê karîndarê her tiştî,
Karên te mezin û ecêb in;
Ya Padîşahê miletan,
Riyên te rast û dadperwer* in.
4 Ya Xudan, kî natirse
Û rûmetê nade navê te?
Çimkî bi tenê tu pîroz î,
Hemû milet wê bên
Û li ber te herin ser çokan,
Çimkî karên te yên dadperwer eşkere bûn.»

5 Piştî van tiştan min dît ku li ezmên Perestgeh, yanî Konê*
Şahidiyê vebû. 6 Heft milyaketên ku heft bela bi wan re bûn ji Pe-
restgehê derketin. Wan kitanê paqij yê ku dibiriqî li xwe kiribûn û
kemberên zêr li singê xwe pêçabûn. 7 Yekî ji çar afirîdên jîndar
heft piyanên zêrîn yên ku bi xezeba wî Xwedayê ku her û her dijî
tije bûn, dan heft milyaketan. 8 Û Perestgeh bi dûmana rûmet û
hêza Xwedê tije bû û heta ku heft belayên heft milyaketan temam
bûn, tu kesî nikaribû bikeve Perestgehê.

### *Heft Piyanên Xezeba Xwedê*

16 Hingê min dengekî bilind ji Perestgehê bihîst ku ji heft mil-
yaketan re got: «Herin û heft piyanên xezeba Xwedê biri-
jînin ser rûyê erdê.»

2 Yê pêşî çû û piyana xwe rijand ser erdê û ew mirovên ku
deqa cenawir li ser wan hebû û ji sûretê wî re çûbûn ser çokan, kû-
nêrên pîs û xerab li ser wan çêbûn.

3 Yê diduyan piyana xwe rijand ser deryayê û derya bû wek
xwîna miriyan. Û her afirînê jîndar ê ku di deryayê de bû mir.

---

**15:3** Binêre: Dubarekirina Şerîetê 32:4; Zebûr 145:17; Yêremya 10:10
**15:4** Binêre: Yêremya 10:6-7; Zebûr 86:9; Melaxî 1:11
**15:8** Derketin 40:34; 1 Padîşah 8:10-11; Îşaya 6:1-4 **16:2** Derketin 9:10

[4] Yê sisiyan piyana xwe rijand ser çem û ser çavkaniyên avê û
ew bûn xwîn. [5] Hingê min bihîst ku milyaketê avê weha got:
«Ya Yê ku Heye û Yê ku Hebû, Yê Pîroz,
Tu dadperwer î, ku te weha dîwan kir!
[6] Çimkî wan xwîna pîroz û pêxemberan rijand
Û te ji bo vexwarinê xwîn da wan.
Wan ev heq kir.»
[7] Û min dengê gorîgehê bihîst ku got:
«Erê, ya Xudan, Xwedayê karîndarê her tiştî,
Dîwankirina te rast û dadperwer e.»
[8] Yê çaran piyana xwe rijand ser rojê. Ji rojê re desthilatî hat
dayîn, ku mirovan bi êgir biqelîne. [9] Îcar mirov bi kelegermiyeke
mezin hatin qelandin û çêr kirin navê wî Xwedayê ku desthilatiya
wî li ser van belayan heye. Lê ji kirinên xwe yên xerab tobe ne-
kirin û rûmet nedan wî.
[10] Yê pêncan piyana xwe rijand ser textê cenawir û padîşahiya
wî bû taristanî. Ji êşê, mirovan zimanê xwe gez kirin [11] û ji ber êş
û kûnêrên xwe çêrî Xwedayê ezmên kirin, lê ji kirinên xwe tobe
nekirin.
[12] Yê şeşan piyana xwe rijand ser çemê Firatê yê mezin. Ava
wî çikiya, da ku rê ji bo padîşahên Rojhilatê bê amadekirin.
[13] Piştre min sê ruhên nepak ên mîna beqan dîtin. Ew ji devê ejder,
ji devê cenawir û ji devê pêxemberê derewîn derdiketin. [14] Ew ru-
hên ku cin in nîşanên mezin çêdikin. Ew diçin ba hemû padîşahên
dinyayê, da ku wan ji bo cenga Roja Mezin a Xwedayê karîndarê
her tiştî bicivînin.
[15] «Va ye, ez wek dizan têm! Xwezî bi wî yê ku hişyar diseki-
ne û cilên xwe parastine, da ku tazî negere û eyba wî neyê dîtin!»
[16] Hingê wan ruhan ew padîşah li wî cihî civandin, ku bi
Îbranî* jê re ‹Harmegedon› tê gotin.
[17] Yê heftan piyana xwe rijand ser bayê û ji Perestgehê, ji text
dengekî bilind derket û got: «Çêbû». [18] Hingê birûskê lê da, deng
hat, bû xurexura ewran û erdhejîneke wusa mezin çêbû ku ji çaxê

---

16:4 Derketin 7:17-21 16:5 Binêre: Derketin 3:14; Zebûr 145:17
16:6 Binêre: Zebûr 79:3; Îşaya 49:26 16:7 Binêre: Zebûr 19:9; 119:37
16:10 Derketin 10:21 16:12 Îşaya 11:15

mirov li ser rûyê erdê ne û heta niha erdhejîneke wusa çênebûye.
19 Bajarê mezin bû sê perçe û bajarên miletan hilweşiyan. Û Babî-
la* mezin hat bîra Xwedê, da ku kasa şeraba xezeba xwe ya dijwar
bide wê. 20 Hemû girav reviyan û çiya êdî nehatin dîtin. 21 Ji ezmên
teyroka mezin ya bi giraniya telantekê* li ser mirovan barî. Miro-
van jî ji ber belaya teyrokê çêrî Xwedê kirin, çimkî bela wê gelek
mezin bû.

### *Diya Xerabiyan*

17 Yek ji wan heft milyaketên ku heft piyan bi wan re bûn hat,
bi min re peyivî û got: «Were vê derê, ezê nîşanî te bidim,
ka çawa ew fahîşeya mezin a ku li ser gelek avê rûniştiye, tê dî-
wankirin. 2 Padîşahên dinyayê bi wê re fuhûşî kirin û yên ku li ser
rûyê erdê rûdinin bi şeraba fuhûşiya wê serxweş bûn.»
3 Hingê milyaket ez bi Ruh birim çolê û min jinek dît ku li ser
cenawirekî sor siwar bûbû. Cenawir ji her aliyî ve bi navên çêran
tije bû û heft serî û deh strûhên* wî hebûn. 4 Jinik bi cilên binefşî û
sor hatibû wergirtin û bi zêr, bi kevirên hêja, bi lal û duran hatibû
xemilandin û kaseke zêrîn di destê wê de bû. Kas jî tije tiştên
mekruh û tiştên fuhûşiya wê yên murdar* bû.
5 Li ser eniya wê, ew navê bi sir nivîsî bû: BABÎLA* MEZIN,
DIYA FAHÎŞEYAN Û TIŞTÊN MEKRUH ÊN DINYAYÊ. 6 Û
min dît ku jinik bi xwîna pîrozan û bi xwîna şahidên Îsa serxweş e.
Gava ku min ew dît, ez gelek şaş bûm. 7 Hingê milyaket ji min
re got: «Çima tu şaş dimînî? Ezê sira jinikê û sira wî cenawirê ku
wê hildigire, yê ku heft serên wî û deh strûhên wî hene, ji te re
bêjim. 8 Ew cenawirê ku te dîtiye hebû, lê niha tune; ewê zû ji
kortala* bêbinî derkeve û here helakê. Û ew ên ku li ser rûyê erdê
rûdinin û navê wan ji damezrandina dinyayê ve di Kitêba Jiyanê de
nehatiye nivîsîn, çaxê cenawir bibînin, wê şaş bibin. Çimkî hebû û
niha tune, lê wê hebe. 9 Li vê derê aqilmendî û şehrezayî divê: Heft
serî, heft çiyayên ku jinik li ser wan rûniştî ye û heft padîşah in:
10 Pênc ji wan ketin, yek ji wan heye, yê din hê nehatiye û çaxê bê,
divê demeke kurt bimîne. 11 Cenawirê ku hebû û tune, ew bi xwe jî
padîşahê heştan e. Ew yek ji heftan e û diçe helakê.

---

**16:21** Derketin 9:23 **17:1** Yêremya 51:12-13

12 «Ew deh strûhên ku te dîtine, deh padîşah in ku hê padîşahî
nestandine; lê belê wê desthilatiyê bistînin, ku bi cenawir re ji bo
saetekê padîşahiyê bikin. 13 Fikra van yek e, ew hêz û desthilatiya
xwe didin cenawir. 14 Evên ha wê bi Berx re şer bikin û Berx wê li
hember wan bi ser keve. Çimkî ew Xudanê xudanan û Padîşahê
padîşahan e; û yên ku bi wî re bi ser ketine, yên gazîkirî, hilbijartî
û dilsoz in.»
15 Û milyaket ji min re got: «Ew ava te dît ku fahîşe li ser wê
rûniştî ye, gel, elalet*, milet û ziman in. 16 Ew deh strûhên ku te
dîtin û cenawir, wê ji fahîşeyê nefret bikin. Ewê wê tazî û şeperze
bikin, wê goştê wê bixwin û wê di êgir de bişewitînin. 17 Çimkî
Xwedê xist dilê wan, ku daxwaza wî pêk bînin û di fikrekê de bin
û padîşahiya xwe bidin cenawir heta ku peyvên Xwedê bên cihê
xwe. 18 Ew jina ku te dîtiye, ew bajarê mezin e ku padîşahiya wî li
ser padîşahên dinyayê heye.»

### *Hilweşîna Babîlê*

18 Piştî van tiştan min milyaketekî din dît ku ji ezmên dihat
xwarê. Desthilatiya wî ya mezin hebû û ji rûmeta wî rûyê
erdê bû ronahî. 2 Wî bi dengekî xurt gazî kir û got:

«Hilweşiya! Babîla mezin hilweşiya!
Bû cih û warê cinan
Û nivana hemû ruhên nepak,
Bû nivana hemû teyr û heywanên nepak û murdar.
3 Çimkî ji şeraba fuhûşiya wê ya har
Hemû miletan vexwar
Û padîşahên dinyayê bi wê re fuhûşî kirin;
Û bazirganên dinyayê ji zêdehiya kêfa wê dewlemend bûn.»

4 Hingê min ji ezmên dengekî din bihîst ku digot:

«Ya gelê min, ji wê derkevin,
Da ku hûn nebin hevparên gunehên wê
Û ji belayên wê,
Parê nestînin.

---

**17:12** Daniyêl 7:24
**18:2** Binêre: Îşaya 21:9; 13:21; Yêremya 50:39
**18:3** Binêre: Îşaya 23:17; Yêremya 51:7

[5] Çimkî gunehên wê gihîştin heta bi ezmên
Û Xwedê neheqiyên wê anîn bîra xwe.
[6] Wê bi xwe çawa dabe, hûn jî wusa bidin wê
Û li gor kirinên wê du qat bidin wê;
Û ew kasa ku wê daye vexwarin, hûn du qat bi wê bidin
vexwarin.
[7] Çiqas rûmet dabe xwe û kêf û şahî kiribe,
Ewqas cefa û xemgîniyê bidin wê.
Çimkî di dilê xwe de dibêje:
‹Ez bi şahbanûyî* rûdinim,
Ez ne jinebî me
Û ez tu caran şînê nagirim.›
[8] Ji bo vê yekê belayên wê
– Mirin, şîn û xela – wê di rojekê de bên
Û ewê bi êgir bê şewitandin.
Çimkî Xudan Xwedayê ku dîwana wê dike, hêzdar e.»
[9] Û padîşahên dinyayê yên ku pê re fuhûşî û kêf kirine, çaxê
dûmana şewitandina wê bibînin, wê li ser wê bigirîn û li xwe bi-
din. [10] Ji tirsa cefayê wê, ewê li dûr bisekinin û bêjin:
«Wax, wax, bajarê mezin,
Bajarê hêzdar, Babîl!
Çimkî dîwanbûna te wusa di saetekê de hat.»
[11] Bazirganên dinyayê wê li ser wê bigirîn û şînê bigirin. Çim-
kî malên wan, [12] zêr û zîv, kevirên hêja, lal û dur, kitanê hêja, qu-
maşên binefşî, hevrîşim, qumaşên sor, her cûreyê darê bîhnxweş û
her tiştên ji diranên fîlan, tiştên ji darê herî hêja, ji tûnc, ji hesin û
ji mermer; [13] darçîn, biharat, bixûr*, rûnê bîhnxweş, cewîşêrîn*,
şerab, dohnê zeytê, arê xas, genim, dewar, mî, hesp, erebe, kole û
mirovan êdî tu kes nakirre. [14] Ewê bêjin:
«Ew fêkiyên ku dilê te diçû wan
Ji destê te derketin,
Tiştên şewqdar û dilkêş

---

18:4 Binêre: Îşaya 52:11; Yêremya 50:8; 51:6
18:5 Binêre: Destpêkirin 18:20-21; Yêremya 51:9
18:6 Binêre: Zebûr 137:8; Yêremya 50:15
18:7-8 Binêre: Îşaya 47:7-9 18:10 Binêre: Hezekiyêl 26:17

Ji te re neman
Û êdî tu kes tu caran wan nabîne.»
15 Bazirganên van tiştan, yên ku ji Babîlê dewlemend bûne, wê ji
tirsa cefayê wê li dûr bisekinin û bi şîn û girîn bêjin:
16 «Wax, wax, bajarê mezin!
Ku ew bi kitanê hêja, qumaşê binefşî û sor hatiye pêçan
Û bi zêr, kevirê hêja û bi duran hatiye xemilandin!
17 Evqas dewlemendî di saetekê de wêran bû!»
Û her serdarê gemiyê û her rêwiyê ku bi gemiyê diçe cihekî,
gemîvan û hemû yên ku bi kar û xebatên deryayê abora xwe dikin,
li dûr sekinîn 18 û gava dûmana şewitandina wî dîtin, bi qîrîn gotin:
«Ma bajarekî din ê wek vî bajarê mezin heye?» 19 Wan xwelî li
serê xwe kir, bi şîn û girîn kirin qîrîn û gotin:
«Wax, wax, bajarê mezin!
Yên ku di deryayê de gemiyên wan hene
Hemû bi malên wî yên hêja dewlemend bûn.
Lê wusa di saetekê de bajar wêran bû.
20 Ey ezmanno û hûn pîrozno!
Şandîno û pêxemberno! Li ser wî şa bibin!
Çimkî Xwedê dîwana wî kir, heqê we ji wî stand.»
21 Hingê milyaketekî hêzdar kevirek wek beraşekî mezin hilda,
avêt deryayê û got:
«Bajarê mezin Babîl weha bi ketineke mezin wê bê avêtin
Û êdî tu caran xuya nabe.
22 Êdî dengê çengvan, mûzîkvan,
Bilûrvan û borîzanan
Tu caran di nav te de nayê bihîstin.
Êdî pîşekarên tu pîşeyî
Tu caran di nav te de peyda nabin.
Û êdî dengê beraşan
Tu caran di nav te de nayê bihîstin.
23 Êdî ronahiya qendîlan

---

**18:16** Binêre: Hezekiyêl 28:13
**18:17-19** Binêre: Hezekiyêl 27:27-34
**18:21** Binêre: Yêremya 51:63-64; Hezekiyêl 26:21
**18:22** Binêre: Îşaya 24:8; Hezekiyêl 26:13

Tu caran di nav te de ronahî nade
Û êdî dengê bûk û zava
Tu caran di nav te de nayê bihîstin.
Bazirganên te giregirên dinyayê bûn
Û hemû milet bi sêrbaziya te ji rê derketin.
24 Xwîna pêxember, pîroz û hemûyên ku
Li ser rûyê erdê hatine serjêkirin ket stûyê wî bajarî.»

### *Şabûna li Ezmên*

19 Piştî van tiştan, min li ezmên dengekî bilind bihîst, wek
dengê elaleteke* mezin bû û digot:
«Helêlûya*!
Xilasî, rûmet û hêz, yên Xwedayê me ne!
2 Çimkî dîwankirina wî rast û dadperwer* e.
Wî dîwana fahîşeya mezin kir,
Ya ku rûyê erdê bi fuhûşiya xwe xera kiriye
Û wî heyfa xwîna pîrozên xwe jê stand.»
3 Û cara diduyan gotin:
«Helêlûya*!
Dûmana bajêr her û her bilind dibe.»
4 Bîst û çar rihspî û çar afirîdên jîndar deverû çûn ser çokan û
perizîn Xwedayê ku li ser text rûniştiye û gotin:
«Amîn, Helêlûya.»
5 Hingê dengek ji text hat û got:
«Ya hemû xulamên wî yên ku ji wî ditirsin,
Biçûk û mezin pesnê Xwedayê me bidin.»
6 Piştre min dengek wek dengê elaleteke mezin, dengê gelek
avê û dengê xurexura ewrên hêzdar bihîst ku digot:
«Helêlûya!
Çimkî Xudan Xwedayê me,
Karîndarê her tiştî, hukumdariyê dike.
7 Em şa û dilgeş bibin

---

**18:23** Binêre: Yêremya 25:10
**19:2** Binêre: Zebûr 19:9; 119:37; Dubarekirina Şerîetê 32:43; Zebûr 79:10
**19:3** Binêre: Îşaya 34:10 **19:5** Binêre: Zebûr 22:23; 134:1; 115:13
**19:6** Binêre: Derketin 15:18; Zebûr 22:28; Daniyêl 7:14

Û em rûmetê bidin wî.
Çimkî daweta Berx hat
Û bûka ku ji bo wî ye, xwe amade kir.
8 Û jê re hat dayîn, ku ew
Kitanê hêja yê ku dibiriqe û paqij e, wergire.
Çimkî mana kitanê hêja, kirinên pîrozan ên dadperwer in.»
9 Hingê milyaket ji min re got: «Binivîse: ‹Xwezî bi wan ên ku
ji bo ziyafeta daweta Berx hatine vexwendin!›» Û ji min re got:
«Evên ha peyvên Xwedê yên rast in.»
10 Û ez li ber lingên wî deverû çûm ser çokan, ku ez biperizim
wî. Lê wî ji min re got: «Nebe ku tu vê yekê bikî! Ez xizmet-
hevalê te û xizmet-hevalê birayên te me, yên ku şahidiya Îsa bi
wan re ye. Biperize Xwedê, çimkî şahidiya Îsa ruhê pêxemberîtiyê
ye.»

### *Mesîh Cenawir û Ordiyên Wî Bindest Dike*

11 Hingê min ezman vebûyî dît. Va ye, hespekî boz. Ji siwarê
wî re Dilsoz û yê Rast tê gotin; ew di şer û dîwankirinê de dad-
perwer e. 12 Çavên wî wek pêta êgir in û li ser serê wî gelek tac
hene. Navekî wî yê nivîsî heye ku ji wî pê ve tu kes nizane. 13 Û
cilek li xwe kiriye ku li xwînê hatiye xistin û navê wî ‹Peyva*
Xwedê› ye. 14 Ordiyên li ezmên ên ku bi kitanê hêja yê spî û paqij
hatibûn wergirtin, li ser hespên boz li pey wî dihatin. 15 Şûrekî tûj
ji devê wî derdikeve, da ku li miletan bixe û ew bi xwe wê bi
gopalê hesin serweriyê li wan bike. Ew bi xwe wê mahsera şeraba
xezeba Xwedayê karîndarê her tiştî ya dijwar biguvêşe. 16 Li ser
cilê wî û li ser kemaxa wî navekî nivîsî heye: PADÎŞAHÊ
PADÎŞAHAN Û XUDANÊ XUDANAN.
17 Û min milyaketek dît ku li ser rojê disekinî û bi dengekî
bilind gazî kir û ji hemû teyrên ku di nava ezmên de difirîn re got:
«Werin ziyafeta Xwedê ya mezin, li cihekî bicivin, 18 da ku hûn
goştê padîşahan, goştê serdaran, goştê mêrxasan, goştê hespan û
siwarên wan, goştê hemû azad û xulaman, biçûk û mezinan bix-
win.»

---

**19:8** Binêre: Îşaya 61:10 **19:9** Metta 22:2-14
**19:13** Yûhenna 1:1 **19:17-18** Hezekiyêl 39:17-20

[19] Hingê min cenawir û padîşahên dinyayê û ordiyên wan li
cihekî civiyayî dîtin, da ku cengê bi siwarê hêsp û bi ordiya wî re
bikin. [20] Û cenawir û pêxemberê derewîn bi wî re, bi hêsîrtî* hatin
girtin. Pêxemberê derewîn ew bû ku li ber cenawir nîşanên mezin
dikirin û bi wan nîşanan ew ên ku deqa cenawir distandin û ji
sûretê wî re diçûn ser çokan, dixapandin. Ev herduyên ha sax hatin
avêtin nav gola êgir a ku bi kewkurtê dişewite. [21] Yên bi şûn de
mayî, bi wî şûrê ku ji devê siwarê hêsp derdiket, hatin kuştin û
hemû teyran ji goştê wan têr xwar.

### *Padîşahiya Hezar Salî*

20 Û min milyaketek dît ku ji ezmên dihat xwarê; di destê wî
de mifta kortala* bêbinî û zincîreke mezin hebû. [2] Wî ejder,
marê kevin ê ku Îblîs, yanî Şeytan e, girt û ew hezar salî girêda.
[3] Wî ew avêt kortala bêbinî, ser wî girt û mor kir, da ku heta hezar
sal temam bibin êdî miletan nexapîne. Piştî vê yekê divê ku ew
demeke kurt bê berdan.

[4] Min text dîtin û ew li ser wan rûniştin, desthilatî ji wan re hat
dayîn, ku ew dîwanê bikin. Îcar min canê wan ên ku ji ber şahidiya
Îsa û ji ber peyva Xwedê serê wan hatiye birrîn dîtin. Ew ji cena-
wir re û ji sûretê wî re neçûne ser çokan û li ser eniya xwe û li ser
destê xwe deq nestandine. Ew vejiyan* û wan bi Mesîh re hezar
salî padîşahî kir. [5] Ew miriyên ku bi şûn de man, heta hezar sal
temam bûn venejîn*. Vejîna pêşî ev e. [6] Yê ku para wî di vejîna
pêşî de heye pîroz e û xwezî bi wî; hukumdariya mirina diduyan li
ser wan tune. Lê belê wê bibin kahînên* Xwedê û yên Mesîh û wê
bi wî re hezar salî padîşahiyê bikin.

### *Îblîs Tê Dîwankirin*

[7] Çaxê hezar sal temam bibin, Îblîs wê ji zîndanê bê berdan.
[8] Ewê derkeve, da ku wan miletên ku li ser her çar riknên erdê ne –
Gog û Magog – bixapîne û ji bo cengê wan li cihekî bicivîne. Hij-
mara wan wek seylaka* ber deryayê ye. [9] Ew derketin ser pehna-
hiya erdê û hawirdora wargehê pîrozan û bajarê hezkirî girtin. Lê ji
ezmên agir hat xwarê û ew xwarin. [10] Îcar ew Îblîsê ku ew ji rê

---

20:2 Destpêkirin 3 20:8 Hezekiyêl 38

derxistine, hat avêtin nav gola êgir û kewkurtê, cihê ku cenawir û pêxemberê derewîn tê de ne. Bi şev û roj, her û her ezab wê li wan bê kirin.

### *Dîwana Dawî*

[11] Hingê min textekî mezin ê spî û yê li ser wî rûniştibû dît.
Erd û ezmên ji ber wî bazdan û cihek ji bo wan peyda nebû. [12] Û
min yên mirî, yên biçûk û mezin, li ber text sekinî dîtin. Kitêb vebûn û kitêbeke din a ku Kitêba Jiyanê ye vebû. Mirî, li gor kirinên
xwe yên ku di kitêban de nivîsî bûn, hatin dîwankirin. [13] Û deryayê
ew miriyên ku di wê de bûn dan; mirinê û diyarê* miriyan jî ew miriyên ku di wan de bûn, dan. Û her yek li gor kirinên xwe hat
dîwankirin. [14] Hingê mirin û diyarê miriyan hatin avêtin nav gola
êgir. Ev gola êgir mirina diduyan e. [15] Û navê kê di Kitêba Jiyanê
de nivîsî nehatibe dîtin, hat avêtin nav gola êgir.

### *Erdê Nû û Ezmanê Nû*

21 Hingê min erdekî nû û ezmanekî nû dîtin; çimkî ezmanê
pêşî û erdê pêşî bihûrîn û êdî derya tunebû. [2] Min dît ku
Bajarê Pîroz, Orşelîma nû wek bûka ku ji bo mêrê xwe hatiye
xemilandin, ji nav ezmên ji Xwedê dihat xwarê. [3] Û min ji text
dengekî bilind bihîst ku digot: «Va ye, konê Xwedê di nav mirovan de ye û ew bi xwe wê bi wan re bijî. Ewê gelên wî bin û
Xwedê bi xwe wê bi wan re be û Xwedayê wan be. [4] Ewê ji çavên
wan hemû hêstirên wan paqij bike û êdî mirin wê nebe. Êdî şîn û
girîn, êş û elem jî wê nebin; çimkî tiştên berê bihûrîn.»
[5] Hingê yê ku li ser text rûniştibû got: «Va ye, ez her tiştî nû
çêdikim.» Û got: «Binivîse, çimkî ev peyvên ha dilsoz û rast in».
[6] Û ji min re got: «Her tişt çêbû. Ez Alfa û Omêga, Destpêk û Dawî me. Ezê ji kaniya ava jiyanê belaş bidim yê ku tî bûye. [7] Yê ku
bi ser bikeve wê ji van tiştan parê bistîne û ezê Xwedayê wî bim û
ewê kurê min be. [8] Lê heçî yên tirsonek in, yên bêewle, yên di nav
pîsîtiyê de ne, yên kuştinê dikin, yên zînakar, yên sêrbaz, yên

---

20:12 Daniyêl 7:10 20:13 Zebûr 62:12 21:1 Îşaya 65:17; 2 Petrûs 3:13
21:3 Qanûna Kahîntiyê 26:11; Hezekiyêl 37:28
21:4 Îşaya 25:8 21:7 Zebûr 89:26-27
21:6 Alfa û Omêga: Herfên pêşî û paşî yên alfabeya Yewnanî.

pûtperest* û hemû yên ku derewkar in, para wan di wê golê de ye,
ya ku bi êgir û kewkurtê dişewite. Mirina diduyan ev e.»

### *Bajarê Orşelîma Nû*

9 Milyaketek ji wan heft milyaketan hat, yên ku heft piyanên bi
heft belayên dawî tije bi wan re bûn, bi min re peyivî û got: «Were
vê derê, ezê bûkê nîşanî te bidim, bûka ku ji bo Berx e.» 10 Îcar wî
ez bi Ruh birim çiyayekî mezin û bilind û Bajarê Pîroz Orşelîm
nîşanî min da, ku ji nav ezmên ji ba Xwedê dihat xwarê. 11 Di nav
wî de rûmeta Xwedê şewq dida; ronahiya wî wek kevirê hêja bû,
wek kevirê yêşîm yê ku ronahî tê re xuya dike. 12 Dîwarê wî yê
mezin û bilind hebû, diwanzdeh dergeh û li ber dergehan diwanz-
deh milyaket hebûn. Li ser dergehan navên her diwanzdeh eşîrên
kurên Îsraêl nivîsî bûn. 13 Ji aliyê rojhilat ve sê dergeh û ji aliyê
bakur ve sê dergeh û ji aliyê başûr ve sê dergeh û ji aliyê rojava ve
sê dergeh hebûn. 14 Diwanzdeh bingehên dîwarê bajêr hebûn û li
ser wan, diwanzdeh navên diwanzdeh Şandiyên Berx nivîsî bûn.
15 Û di destê wî milyaketê ku bi min re dipeyivî de ji bo pî-
vandinê qamîşekî zêrîn hebû, da ku bajêr, dergehên wî û dîwarê wî
bipîve. 16 Çar riknên bajêr hebûn, dirêjahiya bajêr wek pehnahiya
wî bû. Wî bajar bi qamîş pîva, diwanzdeh hezar meydan bû; dirê-
jahî, pehnahî û bilindahiya wî wek hev bûn. 17 Wî dîwarê bajêr pî-
va û li gor pîvana milyaket, ya ku mirov wê bi kar tîne, sed û çil û
çar gaz* bû. 18 Û dîwar ji yêşîm hatibû çêkirin û bajar zêrê xasê
mîna cama safî bû. 19 Bingehên dîwarê bajêr, bi her cûreyê kevirên
hêja hatibûn xemilandin. Bingeha pêşî yêşîm, ya diduyan safîr, ya
sisiyan eqîqê gewr, ya çaran zimrûd, 20 ya pêncan eqîqê spî, ya
şeşan eqîqê sor, ya heftan yaqûtê zer, ya heştan zimrûdê şîn, ya
nehan zeberced, ya dehan zimrûdê zer, ya yanzdehan yaqûtê şîn,
ya diwanzdehan yaqûtê binefşî bû. 21 Diwanzdeh dergeh diwanz-
deh dur bûn, her dergehek ji durekê bû û kolana bajêr zêrê xas ê
wek cama zelal bû.

---

**21:10** Hezekiyêl 40:2 **21:12-13** Hezekiyêl 48:30-35
**21:16** 12 000 meydan ji 2200 km bêtir in.
**21:17** 144 gaz li dor 70 metre ne.
**21:18-21** Îşaya 54:11-12

22 Min di bajêr de Perestgeh nedît; çimkî Xudan Xwedayê
karîndarê her tiştî û Berx Perestgeha wî ne. 23 Ne hewce ye ku roj û
heyv bajêr ronahî bikin, çimkî rûmeta Xwedê wî ronahî dike û
Berx çira wî ye. 24 Milet wê di ronahiya wî de rêve herin û pa-
dîşahên dinyayê wê rûmeta xwe bînin nav wî. 25 Tu rojan dergehên
wî nayên girtin, çimkî li wê derê nabe şev. 26 Wê rûmet û serbi-
lindahiya miletan bînin nav wî. 27 Lê qet tiştekî murdar nakeve nav
bajêr. Û yên ku pîsîtiyê dikin û derewan dikin jî, nakevin nav wî.
Bi tenê yên ku di kitêba Berx ya jiyanê de hatine nivîsîn wê
bikevin nav wî.

### *Çemê Ava Jiyanê*

22 Hingê milyaket çemê ava jiyanê nîşanî min da. Ew wek
cama zelal bû û ji textê Xwedê û Berx derdiket û di nava
kolana bajêr de diherikî. 2 Li herdu aliyên çem dara jiyanê hebû;
diwanzdeh cûreyên fêkî pê ve tê û ew her meh fêkiyê xwe dide. Û
pelên darê ji bo saxbûna miletan in. 3 Êdî tiştê nifirlêbûyî wê qet
nebe. Textê Xwedê û Berx wê di nav bajêr de be û xulamên wî wê
xizmetê ji wî re bikin. 4 Ewê rûyê wî bibînin û navê wî wê li ser
eniya wan be. 5 Û êdî nabe şev û hewcedariya wan bi ronahiya
çirayê û bi ronahiya rojê namîne, çimkî Xudan Xwedê wê ronahiyê
bide wan û wê her û her padîşahiyê bikin.

### *Îsa Mesîh Tê*

6 Milyaket ji min re got: «Ev peyvên ha dilsoz û rast in. Xu-
dan, Xwedayê ku Ruhê xwe dide pêxemberan, milyaketê xwe
şand, da ku tiştên ku divê di nêzîk de çêbin, nîşanî xulamên xwe
bide.»

7 «Va ye, ez zû têm. Xwezî bi wî yê ku peyvên pêxemberîtiyê
yên vê kitêbê digire!»

8 Ez Yûhenna* me, yê ku ev tiştên ha bihîstine û dîtine. Û gava
min ew bihîstin û dîtin, ez li ber lingên wî milyaketê ku ev tiştên
ha nîşanî min dan, deverû çûm ser çokan, da ku ez biperizim wî.
9 Lê wî ji min re got: «Nebe ku tu vê yekê bikî! Ez xizmet-hevalê

---

**21:23** Îşaya 60:19-20 **21:24-25** Îşaya 60:3, 11 **21:27** Hezekiyêl 44:9
**22:2** Destpêkirin 2:9; Hezekiyêl 47:12 **22:5** Îşaya 60:19; Daniyêl 7:18

te me, yê birayên te yên pêxember û yê wan kesan im ku peyvên
vê kitêbê digirin. Ji Xwedê re here ser çokan.»
10 Hingê wî ji min re got: «Peyvên pêxemberîtiyê yên vê kitêbê
mor neke, çimkî wext nêzîk e. 11 Yê ku neheqiyê dike, bila hê ne-
heqiyê bike, yê pîs bila hê pîs bimîne, yê rast bila hê rastiyê bike û
yê pîroz bila hê pîroz bimîne.»
12 «Va ye, ez zû têm û xelata min di destê min de ye, da ku ez
li gor kirinên her yekî bidim wî. 13 Alfa û Omêga, Yê Pêşî û Yê
Paşî, Destpêk û Dawî ez im.»
14 «Xwezî bi wan ên ku xiftanê xwe şuştine, da ku heqê wan
hebe, ku bên dara jiyanê û di dergehên bajêr re bikevin hundir!
15 Yên wek kûçikan, yên sêrbaz, yên zînakar û yên mêrkuj, yên
pûtperest û her kesê ku ji derewan hez dike û derewan dike, ew li
derve ne.
16 «Ez Îsa, min milyaketê xwe şand, da ku ew ji bo civînên
bawermendan li ser van bûyeran ji we re şahidiyê bike. Ez ra* û
dûndana* Dawid* im, ez stêra sibê ya şewqdar im.»
17 Ruh û bûk dibêjin: «Were!» Û yê dibihîze bila bêje: «We-
re!» Û yê tî bûye bila bê; yê dixwaze bila belaş ava jiyanê bistîne.
18 Ez ji her kesê ku peyvên pêxemberîtiyê yên vê kitêbê di-
bihîze re şahidiyê dikim: Eger mirovek tiştekî li ser van zêde bike,
Xwedê wê van belayên ku di vê kitêbê de nivîsî ne bîne serê wî.
19 Û eger mirovek ji peyvên pêxemberîtiyê yên vê kitêbê derxe,
Xwedê wê para wî ji dara jiyanê ya ku di vê kitêbê de nivîsî ye û ji
Bajarê* Pîroz derxe.
20 Yê ku şahidiyê ji van tiştan re dike, dibêje: «Erê, ez zû têm».
Amîn. Were, ya Xudan Îsa.
21 Kerema Xudan Îsa li ser we hemûyan be.

---

**22:12** Îşaya 62:11; Yêremya 17:10
**22:14** Destpêkirin 2:9
**22:16** Hijmartin 24:17
**22:17** Îşaya 55:1
**22:18** Dubarekirina Şerîetê 12:32

## *Ferhengok*

Pêşî ew peyvên ku fêmkirina wan hinekî zehmet e, tên şîrovekirin; li dawiyê jî lîsteyeke wan peyvan heye, yên ku di hemû devokan de ne wek hev tên gotin an fêmkirin.

**Abba** – Bi zimanê Aramî, ABBA bi mana ‹bav› e. Binêre: Marqos 14:36; Romayî 8:15; Galatî 4:6.

**Adem** – Mirovê pêşî bû yê ku Xwedê afirand. Xwedê ew ji axa erdê afirand (Destpêkirin 2) û piştre Hewa afirand. Adem û jina xwe Hewa ew bûn, yên ku zû peyva Xwedê şkandin û guneh kirin (Destpêkirin 3). Ji hingê ve mirov guneh kir. Di Peymana Nû de tê gotin ku Îsa Mesîh ‹Ademê paşî› ye (1 Korîntî 15:45). Ademê pêşî, bû bavê temamiya mirovan. Îsa Mesîhê ku Ademê diduyan e, jiyana ruhanî dide her kesê ku baweriya xwe bi wî tîne. Binêre: Lûqa 3:38; Romayî 5:12-15; 1 Korîntî 15:22, 45-47; 1 Tîmotêyos 2:13-14.

**Amîn** – Peyveke zimanê Îbranî ye, ku mana wê ev e: ‹Rast e›, ‹Belê›, ‹Bila wusa be›, ‹Ez razî me› (Romayî 1:25; 9:5; 1 Korîntî 14:16; 2 Korîntî 1:20). Di Peyxama Yûhenna 3:14 de ev navekî Îsa Mesîh e, çimkî Yê Rast ew e.

**Aramî** – Zimanekî kevin e. Di dema kevin de miletekî ku li Sûriye û Îraqa îroyîn rûdinişt û Samî bû, pê dipeyivî. Zimanê Aramî zimanê Aşûrî, Kildanî û Sûriyanî ye. Di zemanê Îsa Mesîh de gelek Cihûyan zimanê Aramî dizanibûn, çimkî ew zimanê bazirganiyê bû.

**Artemîs** – Navê pûtekî Yewnaniyan e, ku di dema Peymana Nû de li gelek cihan dihat perizîn (Karên Şandiyan 19:24-35).

**Arxêlayos** – Ji kerema xwe li peyva Hêrodês binêrin.

**Asya / Asyaya Biçûk** – Di wê demê ji bo ew der ku îro kêm û zêde Tirkiye ye dihat gotin.

**Atî** – Edroyî, bi hal ketî.

**Aqûb** – 1) Aqûbê kurê Îshaqê kurê Birahîm bû. Ew bavê her diwanzdeh eşîrên gelê Îsraêl e. Di Peymana Nû de çend caran

Aqûb ji dêla hemû gelê Îsraêl ve tê gotin. Ji kerema xwe li peyva ‹Mala Aqûb› binêrin.
2) Aqûbê Halfayos û Aqûbê Zebedî (birayê Yûhenna) du şagirtên Îsa Mesîh bûn.
3) Aqûb serwerekî civîna li Orşelîmê bû. Ew bi xwe nivîskarê Nameya Aqûb e.

**Axaya** – Axaya herêmeke kevin a welatê Yewnanistanê bû. Bajarê Korîntê hingê diket nav herêma Axayayê ya Romayî (Karên Şandiyan 18).

**Baal** – Navê pûtê Kenaniyan ê herî girîng bû. Ew pûtekî zêdebûnê, yanî zayînê bû. Bawermendên wî pûtî bawer dikirin ku ewê heywanên wan, zevî û rezên wan bereket bike. Mena peyva Baal ‹xweyî› ye. Gelek miletên hawirdora Îsraêl diperizîn wî pûtî. Gelê Îsraêl jî çaxê ji Xwedê dûr diket, diperizî Baal û bi vî awayî hêrsa Xwedê dianîn ser xwe. Lê her gav jî Îsraêliyên rast hebûn ku tu caran perizîna Baal qebûl nekirin. Binêre: Romayî 11:4; 1 Padîşah 19.

**Babîl** – 1. Babîl navê bajarekî gelekî kevin e. Di sedsala şeşan berî hatina Îsa de, padîşahê Babîlê gelek welatên din bindest kiribûn. Miletê wî bi gelê Îsraêl re şer kir û ew bindest kirin. Gelek Cihû bi xulamtî birin welatê xwe. Gelê Îsraêl heftê salan li wir ma (Metta 1:11-12, 17; Karên Şandiyan 7:43).
2. Li gor fikra gelekan di 1 Petrûs 5:13 û di Peyxama Yûhenna de ‹Babîl› ji bo bajarê Romayê tê gotin. Di Peyxama Yûhenna de ‹Babîl› mînaka miletên ku bi ya Xwedê nakin e, çimkî mirovên bajarê Babîlê guhê xwe nedan peyva Xwedê (Peyxama Yûhenna 14:8; 17:5; serê 18).

**Bacgir** – (xercgir, vêrgîstên, qemçorçî) Bacgir li ser navê dewletê pere ji xelkê distandin. Ji ber ku gelekî xapînok û derewîn bûn, ew di nav Cihûyan de gunehkarên herî xerab dihatin hesibandin.

**Bajarê Dawid / Bajarê Pîroz** – Ji bajarê Orşelîmê re tê gotin. Ji kerema xwe li peyva ‹Orşelîmê› binêrin.

**Balam** – Balam di dema Mûsa de pêxemberîtî kir. Padîşahê Mowabê Balaq jê dixwest ku nifir li gelê Îsraêl bike û ji bo vê yekê

pere pêşkêşî wî kir. Lê bi ser ku dixwest, Balam nikaribû li gor daxwaza Balaq bike, çimkî Xwedê nehişt û milyaketê xwe şand ku rê li ber wî bigire. Dawiyê Balam mecbûr ma ku gelê Îsraêl pîroz û bimbarek bike. Binêre: Hijmartin 22:4-35; 2 Petrûs 2:15-16; Cihûda 11; Peyxama Yûhenna 2:14.

**Baraq** – Beriya ku li Îsraêl padîşah hebin, ew yek ji hukumdarên gelê Îsraêl bû. Wî di şer de serwerî dikir û dijmin bindest kir (Hukumdar 4-5; Îbranî 11:32).

**Bav** – Di Mizgîniyê de ‹Bav› navekî Xwedê ye. Xwedê serkaniya her tiştî ye. Her tişt ji Xwedê ye û wî her tişt afirandiye. Çawa ku bê bav zarok çênabin, bê Xwedê jî tu tişt çênebûye. Lê belê Xwedê mirov di şiklê (sûretê) xwe de afirand, wî hiş û bîr û ruh da mirov. Ji ber vê yekê ew bi mana ruhanî bavê hemû mirovan e, lê belê ev qet bi mana cismanî (fîzîkî) nayê fikirîn. Û wek ku bav ji zarokên xwe hez dike û ji bo wan xem dixwe, Xwedê jî wusa ji mirovan hez dike û xema wan dixwe. Bêguman hezkirina Xwedê qat qat di ser ya mirovan re ye. Xwedê bavê mirov ê ruhanî û ezmanî ye. Kurê Bavê ezmanî yê taybetî jî Îsa Mesîh e. Ji kerema xwe li peyva ‹Kurê Xwedê› jî binêrin.

**Bawerî** – (îman) Di Peymana Nû de bawerî û bawerkirin dabaşeke girîng e. Mirov ne bi xîret û karên xwe yên qenc xilas dibe, lê bi baweriyê (Romayî 4; Galatî 3: Îbranî 11).

**Bazbend** – Xwedê bi destê Mûsa pêxember ji gelê Îsraêl re emir kir ku peyvên Xwedê hergav ‹li ber çavên wan› bin (Dubarekirina Qanûnê 6:8). Ji ber vê yekê hin ji Cihûyan çend ayetên Şerîeta Mûsa li ser kaxezên biçûk dinivîsîn, dixistin nav bazbendan û datanîn ser çeng an eniya xwe.

**Belzebûl** – Mîrê cinan. Pêşî Belzebûl navê pûtekî Filîstîniyan bû. Piştre di nav Cihûyan de, bi mana şermezarkirinê jê re digotin: ‹Xwediyê Mêşan›. Di Peymana Nû de Belzebûl bi mana Îblîs tê bikaranîn. Binêre: Metta 10:25; 12:24, 27; Marqos 3:22; Lûqa 11:15-19.

**Berê pêşî** – Di dema Peymana Kevin de li gor emrê Xwedê li Îsraêl her tiştê ku pêşî çêbûye, kur be, heywanê nêr be, an jî berê

erdê, rêz û daran be, ‹berê pêşî› dihat hesibandin û ji Xwedê re dihat dayîn, çimkî berê pêşî ji Xwedê re pîroz û bi taybetî yê wî bû. Bi dayîna berê pêşî kifş dibe ku her tişt yê Xwedê ye. Çaxê berê pêşî derdiket, hêviya mirovan hebû, ku hemû derameta wan wê qenc çêbe. Binêre: Derketin 13:12-15; 34:19, 26; Qanûna Kahîntiyê 23:17; Hijmartin 18:12; Gotinên Silêman 3:9-10.

Di Peymana Nû de ev peyva ‹berê pêşî › bi çend awayan bi mana ruhanî tê bikaranîn: Romayî 8:23; 1 Korîntî 15:20, 23; Aqûb 1:18; Peyxama Yûhenna 14:4.

**Binyamîn** – Ji her diwanzdeh kurên Aqûb yê herî biçûk bû. Pawlos ji eşîra Binyamîn bû. Binêre: Destpêkirin 35:18; Karên Şandiyan 13:21; Romayî 11:1; Filîpî 3:5; Peyxama Yûhenna 7:8.

**Birahîm** – Bavê Aqûb û bavê hemû gelê Îsraêl û bi mana ruhanî bavê hemû bawermendan e jî. Pêşî bi pîreka xwe Sara re li bajarê Ûrê (li Îraqê) rûniştibû, lê Xwedê gazî wî kir û welatê Kenaniyan pê re soz da. Birahîm bi ya Xwedê kir, ji bajarê xwe derket, pêşî çû Heranê û piştre gihîşt welatê sozdayî. Xwedê bi wî re peyman girêda û soz dayê, ku dûndana (zuriyeta) wî wê pirr zêde bibe. Û got ku bi wî hemû milet wê bên bereketkirin. Binêre: Lûqa 1:55; 3:8, 34; Karên Şandiyan 7:2-32; Romayî 4; Galatî 3; Îbranî 11:8-19. Ji kerema xwe li peyva ‹peymanê› binêrin.

**Bixûr** – Cewiya daran e (wek şîrêzê ye). Ew ji darên nejihev tê civandin û hişkkirin. Gava tê şewitandin, bîhneke pirr xweş jê diçe. Di Perestgehê de bixûr li ser gorîgeha bixûrê ji Xwedê re dihat şewitandin (Derketin 30).

**Cejna Derbasbûnê** – (Eyda Fishê) Bi zimanê Îbranî PASAX e, mana pasax jî derbasbûn e. Ev cejin (eyd) rizgarbûna gelê Îsraêl a ji bindestiya Misriyan bibîr tîne û ji hingê ve di nav Cihûyan de, di çardehê meha Nîsanê de tê pîrozkirin. Di wê rojê de Milyaketê Mirinê hemû nixuriyên Misriyan, hem mirov û hem heywan kuştin. Lê ew di ser malên gelê Îsraêl re derbas bû û yek ji wan nekuşt (Derketin 12). Ji ber vê yekê, ji vê cejnê re Cejna Derbasbûnê tê gotin. Piştî vê bûyerê, Firewn destûr da gelê Îsraêl ku ji diyarê Misrê derkevin. Binêre: Metta 26:2, 5, 18-19; 1 Korîntî 5:7-8.

**Cejna Holikçêkirinê** – Her sal payîzê ji 15 heta 21ê meha Çiriyê (di navbera Îlon û Çiriyê de, yanî di navbera meha nehan û dehan de) tê pîrozkirin. Cihû diçin ser rezên xwe û holikan (kolik) çêdikin û di wan de ji bo heftiyekê dimînin. Cihû vê yekê dikin, da ku bînin bîra xwe ka çawa Mûsa pêxember gelê Îsraêl ji Misrê deranî û li ser vê yekê ew çil salan li çolê di konan de man (Qanûna Kahîntiyê 23:33-36, 39-42, Dubarekirina Şerîetê 16:13-15). Binêre: Yûhenna 7:2.

**Cejna Nanê Şkeva** – Ev cejin (eyd) li pey Cejna Derbasbûnê tê û ji panzdeh heta bîst û diduyê meha Nîsanê dikişîne. Ev cejin jî li ser rizgarbûna gelê Îsraêl a ji bindestiya Misriyan tê pîrozkirin. Di vê Cejnê de heft rojan nanê şkeva tê xwarin. Nanê bi hevîrtirşk çêbûyî nayê xwarin. Binêre: Derketin 12:15; Metta 26:17; Marqos 14:1, 12; Lûqa 22:1, 7; Karên Şandiyan 12:4.

**Cejna Pîrozkirina Perestgehê** – 167 sal beriya bûyîna Îsa, Perestgeha Orşelîmê ji aliyê miletê Sûrî ve hatibû herimandin. Piştî sê salan Cihû ji bin destê Sûriyan azad bûn û Perestgeh hat paqijkirin. Ji hingê ve Cejna Pîrozkirina Perestgehê tê pîrozkirin. Cejnê ji 25ê meha Kislevê (meha 12an) dest pê dike û heşt rojan dikişîne (Yûhenna 10:22).

**Celîle** – Herêmeke li bakurê Îsraêlê ye. Bajarê Nisretê li wir e. Îsa li Celîlê mezin bû û di gelek bajarên Celîlê de Mizgînî da û keramet kirin.

**Cewîşêrîn** – Cûreyekî bixûrê ye . Bixûr tiştekî gelek bi qîmet bû û çaxê stêrnas ji bo perizînê hatin ba Îsa, wan ew ji zarok re anî (Metta 2:11). Binêre: Peyxama Yûhenna 18:13.

**Cênîsart** – Di perê Gola Celîlê de bajarokek e.

**Cihûda** – 1) Diwanzdeh kurên Aqûb hebûn. Yek ji wan Cihûda bû. Her diwanzdeh kurên Aqûb bûn diwanzdeh eşîrên Îsraêl. Navê welatê Cihûstanê ji navê Cihûda hatiye standin, ji ber ku ew eşîr li wir dijiya.

2) Bi navê Cihûda du şagirtên Îsa Mesîh hebûn (Lûqa 6:16). Ji van herduyan Cihûdayê Îsxeryotî xayîn derket û wî Îsa da destê yên ku dixwestin wî bikujin.

3) Cihûda birayekî Aqûb bû û bi xwe nivîskarê ‹Nameya Cihûda› ye (Cihûda 1:1).

**Cihûstan** – Herêmeke li Îsraêlê ye.

**Civîn / civîna bawermendan** – Lihevkombûna bawermendên ku bi navê Îsa Mesîh dicivin. Civîna bawermendên Mesîhî ya pêşî li Orşelîmê çêbû (Karên Şandiyan 1-5) û ji wir, hin bi hin di nav miletên Rojhilata Navîn de belav bû.

Carna jî peyva civînê an civîna bawermendan ji bo tevahiya bawermendên Mesîh tê bikaranîn (Efesî 1:22-23; 5:23-32; Kolosî 1:18-25).

**Civîna giregiran** – Civîna mezinên Cihûyan bû. Heftê endamên wê hebû û ew mêr bi xwe kahîn, Şerîetzan an rihspiyên Cihûyan bûn. Serokkahîn serekê Civîna giregiran bû. Ji bo jiyan, bawerî û qanûnên Cihûyan, desthilatî û biryarên Civîna giregiran gelekî girîng bûn, lê destûra wan tune bû ku cezayê mirinê bidin; ev heqê waliyê Romayiyan bû. Binêre: Metta 26:59; Lûqa 22:66; Yûhenna 11:47; Karên Şandiyan 4:15; 5:21; 6:12; 22:30; 23:1.

**Çap** – Di wê demê de 8-10 kîlo bû.

**Çeng** – Kevaneke bi çend têlan ji bo mûzîkê.

**Çerxî** – Pere; ji kerema xwe li tabloya li dawiya ferhengokê binêrin.

**Dara ûdê** – Ji wê darê tozeke bîhnxweş tê çêkirin. Cihûyan berî veşartinê ev dikirin ser cesedê miriyan (Yûhenna 19:39).

**Dawid** – Ji kerema xwe li peyva ‹Mala Dawid› binêrin.

**Dehyek** – Di nav gelê Îsraêl de ji van her diwanzdeh eşîran, eşîra Lêwî kahîntî û kar û barên Konê Şahidiyê / Perestgehê dikirin. Li gor Şerîeta Mûsa dehyeka berê her tiştên gelê Îsraêl li ser navê Xwedê ji eşîra Lêwî re dihat dayîn (Qanûna Kahîntiyê 27:30-32).

**Deramet** – Mehsûl, hatina erdê, wek genim û ceh, nîsk û nok (Lûqa 18:12).

**Destdanînserî** – Destdanîna ser serê yekî ye (2 Tîmotêyos 1:6). Gelek caran ev nîşaneke bereketkirinê ye. Carna, çaxê Îsa mirovekî nexweş qenc dikir, wî destê xwe datanî ser wî (Marqos 6:5). Çaxê yekî bawermend dest bi karekî ruhanî kir jî, dest datanîn ser wî (Karên Şandiyan 6:6; 13:3).

**Dêkapolîs** – Herêmeke li Rojhilata Çemê Urdunê ye.

**Diyarê Miriyan** – (dinya miriyan) Navê dinya miriyan bi zimanê Yewnanî HADÎS e û bi zimanê Îbranî ŞEOL e. Ew cihekî tarî yê ji bo miriyan e (Eyûb 10:21). Carna di Kitêba Pîroz de peyva HADÎS bi mana ‹dojehê› (cehnemê) tê bikaranîn, çawa ku ew cihekî ezabê ye (Lûqa 16:23). Ji kerema xwe li peyva ‹dojehê› binêre.

**Dîmas** – Hevalê Pawlos bû û di dayîna Mizgîniyê de alîkariya wî kiribû. Binêre: Kolosî 4:14; 2 Tîmotêyos 4:10; Filêmon 1:24.

**Dojeh** – (cehnem) Bi Yewnanî GEENNA, bi Îbranî GEHINNOM. Ew bi xwe cihê ezabê herheyî ye, ji bo wan ên ku di Roja Dawî (Roja Axretê) de dîwana wan tê kirin. Binêre: Metta 5:22, 29-30; 10:28; 18:9; 23:15, 33; Marqos 9:43-47; Lûqa 12:5; Aqûb 3:6. Ji kerema xwe li peyvên ‹kortala bêbinî› û ‹diyarê miriyan› binêrin.

**Egrîpa** – Ji kerema xwe li peyva ‹Hêrodês› binêrin.

**Erastos** – Hevalê Pawlos bû û di dayîna Mizgîniyê de alîkariya wî dikir. Binêrin: Karên Şandiyan 19:22; 2 Tîmotêyos 4:20. Di Romayî 16:23 de belkî behsa yekî din tê kirin.

**Erîstarxos** – Hevalê Pawlos bû û di dayîna Mizgîniyê de alîkariya wî dikir. Binêre: Karên Şandiyan19:29; 20:4; 27:2; Kolosî 4:10; Filêmon 1:24.

**Esaw** – Kurê Îshaqê kurê Birahîm e, birayê wî Aqûb e. Esaw yê mezin bû û rojekê gava ew gelekî birçî bû, ew heqê nixurîtiya xwe da xwarina zik, ew firot Aqûbê birayê xwe yê biçûk. Xwedê Aqûb û dûndana (zuriyeta) wî bijart û kir gelê xwe. Binêre: Destpêkirin 25:21-26; 27:1-41; 32:3-33:16; Romayî 9:10-13; Îbranî 11:20; 12:16-17.

**Êlîşa** – Pêxemberekî Îsraêl bû. Di dema Peymana Kevin de gelek keramet bi destê wî dihatin kirin (2 Padîşah 2:1-8:15). Bi destê Êlîşa Xwedê Nemanê serwerê leşkerên Sûriyê ji kotîbûna wî qenc kir (2 Padîşah 5; Lûqa 4:27).

**Êlyas** – Pêxemberekî mezin ê Xwedê bû. Wî li padîşahekî xerab, Ahab û li hemûyên ku li Îsraêlê pûtperestî dikirin hilat. Gelek Cihû difikirîn ku Êlyas wê dîsa bihata, da ku gel ji bo hatina Mesîh amade bike (Malaxî 4:5). Ji gelek aliyan ve Yûhennayê imadkar mîna Êlyas bû. Binêre: 1 Padîşah 17; Metta 11:14; Marqos 9:4; Lûqa 1:17; Romayî 11:2-5; Aqûb 5:17.

**Êpafras** – Hevalê Pawlos bû û di dayîna Mizgîniyê de alîkariya wî dikir. Binêre: Kolosî 1:7; 4:12; Filêmon 1:23;

**Fêrisî** – Di nav Cihûyan de partiyeke olperestan (dîndaran) hebû. Ji endamên vê partiyê re ‹Fêrisî› dihat gotin. Wan Şerîeta Mûsa (Qanûna Mûsa) qenc dizanibû. Ew dîndarên tîr (hişk) bûn. Wan bawer dikir ku milyaket û ruh hene û mirov piştî mirinê wê careke din rabin. Gelek rêz û tertîbên (adetên) ku Fêrisiyan pêk dianîn, di nav Cihûyan de hebûn. Hin ji nav Fêrisiyan ji Îsa hîn dibûn û piştî rabûna wî bûn şagirtên Îsa (Karên Şandiyan 15:5), lê gelek ji wan li hember wî derketin.

**Firewn** – Bernavê padîşah yanî mezinê Misriyan bû. Binêre: Karên Şandiyan 7:10-21; Romayî 9:17; Îbranî 11:24.

**Gîdeyon** – Hukumdarekî gelê Îsraêl bû. Baweriya wî mezin bû û dua kir û Xwedê bi destê wî gel ji bindestiya Amalekiyan rizgar kir. Hijmara leşkerên wî pirr hindik bû, lê wî bawer kir û Xwedê alîkariya wî kir, ew bi ser ket. Binêre: Hukumdar 6:11-8:27; Îbranî 11:32.

**Gorî** – (qurban, diyarî, pêşkêş ) Di Qanûna Kahîntiyê de li ser çend cûreyên goriyan tê gotin. Hin ji wan heywan bûn (bizin, berx an conega yên bêqisûr û bêleke), ew dihatin serjêkirin û piştre ew bi tevahî an jî perçeyek ji wan dihat şewitandin. Carna perçeyeke goştê goriyê ji aliyê kahînan an ji aliyê wiyê ku gorî dabû ve, dihat xwarin. Diyarî û pêşkêşên din jî carna genim an jî biharat bûn. Ji kerema xwe li peyva ‹goriya şewitandinê› jî binêrin.

**Goriya şewitandinê** – Goriyên şewitandinê bizin, berx û conega bûn û ew rojê du caran bi tevahî li ser gorîgehê dihatin şewitandin (Qanûna Kahîntiyê 1:3-9).

**Gorîgeh** – (mezbeh) Maseya (sifra) ku li ser, gorî (qurban, hediye, diyarî û xêr) dihatin dayîn (an jî dihatin serjêkirin) û şewitandin. Pêşî gorîgeh ji keviran hatin çêkirin, piştre ji bo Cihûyan ya herî girîng li Orşelîmê di hewşa Perestgehê de bû, ji sifir hatibû çêkirin. Ji bo gorîgeha bixûrê li peyva ‹bixûrê› binêrin.

**Gûriz** – Giyayek e, ku nêrî dide. Ew wek avgirekê ji bo adetê dîn dihat bikaranîn. Kahînan ew dixist nav xwîna goriyê û direşandin ser mirovan, da ku ew li ber Xwedê pîroz bibin. Binêre: Derketin 12:22; Qanûna Kahîntiyê 14:4; Hijmartin 19:6, 18; Yûhenna 19:29; Îbranî 9:19.

**Habîl û Qayîn** – Ew herdu kurên Adem û Hewayê bûn. Qayîn gelek çavnebariya birayê xwe yê biçûk Habîl dikir, çimkî Xwedê berxên ku Habîl kiribûn gorî, qebûl kiribû, lê genimê ku Qayîn anî-bû qebûl nekiribû. Hingê Qayîn Habîl kuşt. Xwedê got, ku gerekê Qayîn li ser erdê revok û serserî be (Destpêkirin 4:1-24). Habîl bawer kir û kirinên wî rast bûn (Îbranî 11:4). Li ser Qayîn tê gotin ku karên wî xerab bûn û ew bi xwe ji Yê Xerab bû (1 Yûhenna 3:12). Binêre: Metta 23:35. Cihûda 11.

**Hacer** – Cêriya Saraya jina Birahîm bû. Ji ber ku Sara zarok nedianîn, Hacer da Birahîm û Îsmayîl ji wan re çêbû. Lê Îsmayîl ne ew bû, yê ku Xwedê ji Birahîm re soz dabû. Piştî çend salên din Îshaq kurê Sarayê ji wan re çêbû û ew bû ew kurê ku Xwedê soz ji Birahîm re dabû (Galatî 4:21-31).

**Helêlûya** – Peyveke bi zimanê Îbranî ye û mana wê ev e: ‹Pesinê Xudan bidin› an ‹Şikir ji Xwedê re›. Binêre: Peyxama Yûhenna 19:1-6.

**Hemwelatiya Romayî** – Bi tenê perçek ji wan mirovên ku di Împeratoriya Romayê de rûniştibûn hemwelatiyên Romayî bûn. Pawlos di nav wan de bû. Mafên wan ên taybetî hebûn (Karên Şandiyan 16:37).

**Hêrodês** – Di Peymana Nû de sê Hêrodês hene û Arxêlayos jî ji mala wan e:

1) Hêrodêsê Mezin: Gava Îsa Mesîh hat dinyayê, Hêrodêsê Mezin li Cihûstanê, Celîlê, Îtûryayê û Traxonîdayê padîşah bû (Metta 2:1-19, Lûqa 1:5). Navê bavê wî Antîpater bû. Ew gelekî bêrehm bû, wî jineke xwe, sê kurên xwe, xesûya xwe, apekî xwe û gelekên din (ji bilî zarokên Beytlehmê) kuştin.
2) Hêrodês-Antîpas: Gava Îsa Mesîh û Yûhennayê imadkar dest bi karên xwe kirin, Hêrodês-Antîpas serdarê, yanî mîrê Celîlê bû (Lûqa 3:1). Bavê wî Hêrodêsê Mezin bû. Wî serê Yûhennayê imadkar da birîn (Metta 14:1-12, Marqos 6:14-29, Lûqa 9:9). Îsa birin ber Hêrodês û wî Îsa bêqedir kir û tinazên xwe bi wî kirin (Lûqa 23:3-12). Binêre: Karên Şandiyan 13:1.
3) Hêrodês-Egrîpa padîşah: Çawa ku di Karên Şandiyan 12:1-24 de tê diyarkirin, Hêrodês-Egrîpa Petrûs û Aqûb girtin û Aqûb da kuştin. Bavê Hêrodês-Egrîpa Arîstobûlos bû, Arîstobûlos jî kurê Hêrodêsê Mezin bû.

   Kurê Hêrodês-Egrîpa hebû, navê wî jî Hêrodês-Egrîpa (yê diduyan) bû. Wî carekê guhê xwe da Pawlos (Karên Şandiyan 25:13-26:32). Dirûsîla û Bernikê (Karên Şandiyan 24:24; 25:13) jî xwişkên wî bûn.
4) Arxêlayos: Kurê Hêrodêsê Mezin û birayê Hêrodês-Antîpas bû. Piştî mirina bavê xwe ew ji bo demeke kurt bû serdarê Cihûstanê (Metta 2:22).

**Hosanna** – Şikir, spasî; HOSANNA bi Îbranî pêşî bi mana ‹Xilas bike!› bû; piştre ew bû gotineke bi mana ‹Şikir ji Xwedê re!›. Binêre: Metta 21:9.

**Imadkar** – Ji Yûhennayê imadkar re dihat gotin. Gava wî peyva Xwedê da bihîstin, wî tobedar di avê de imad dikirin. Bi vî awayî wî dilê mirovan ji bo Mizgîniya Îsa Mesîh amade dikir. Binêre: Lûqa 1:5-25; Metta 3:1.

**Imadkirin** – (îmadkirin, emadkirin, vaftîz kirin, babtîskirin) Gava mirov ji dil ji gunehên xwe vedigere, yanî tobe dike, ew tê ‹noq kirin›, û piştre ji avê tê derxistin. Ev yek dibe nîşana tobekirin, paqijbûn û afûbûna wî ya ji gunehan. Imadbûna mirov jî dide

kifşkirin, ku yê bawermend tevî Îsa mir, hat veşartin û dîsa rabû. Êdî jiyana wî ne ji bo wî bi xwe ye, lê belê ji bo Îsa Mesîh dijî. Binêre: Metta 28:19; Karên Şandiyan 2:38-41; 10:47-48; Romayî 6:3-4; 1 Korîntî 10:2; 12:13; Galatî 3:27; Kolosî 2:12; 1 Petrûs 3:21.

**Îblîs** – Dijminê Xwedê û mirovan e. Di Peymana Nû de gelek navên wî hene: Mîrê cinan (Metta 9:34) Belzebûl (Metta 12:24), yê ku diceribîne (Metta 4:3), yê Xerab (Metta 5:37), ejder an jî marê kevin (Peyxama Yûhenna 20:2), bavê derewan (Yûhenna 8:44). Îblîs mirovan dixapîne, ji rê derdixe û dixwaze ku mirov ji guneh azad nebe. Îsa Mesîh hat, da ku karên Îblîs xera bike (1 Yûhenna 3:8), li gunehên mirovan bibihûre û wan ji hukumdariya Îblîs vegerîne Xwedê (Karên Şandiyan 26:18). Li dawiya demê, Îblîs û alîkarên wî wê bên avêtin nav gola êgir (Metta 25:41; Peyxama Yûhenna 20:10).

**Îbranî** – Îbranî hingê zimanê Cihûyan bû. Kêm û zêde tevahiya Pirraniya Peymana Kevin bi zimanê Îbranî hatibû nivîsîn.

**Îdûmeya** – Herêmeke ku dikeve Başûrê Cihûstanê. Hêrodesê Mezin yekî Îdûmeyî bû.

**Îman** – Bawerî. Îman peyveke ji zimanên Sêmîtî (Erebî, Îbranî, Sûriyanî, Aşûrî) tê û Kurdiya wê ‹bawerî› ye.

**Încîl** – Ji kerema xwe li peyva ‹Mizgîniyê› binêrin.

**Îsa** – Navê Îsa di Îbranî de (zimanê Tewratê) YÊŞÛAH e. Mana navê Îsa / Yêşûah bi Îbranî ‹Xudan, (me) xilas dike›, ‹Xudan, (me) rizgar dike› ye (Metta 1:21).

**Îshaq** – Kurê Birahîm û Sarayê bû. Ew bavê Aqûb û Esaw bû, navê jina wî Rebeka bû. Mana navê wî ‹ken› e, ji ber ku dê û bavê wî nikaribûn bawer bikin ku di pîrîtiya xwe de zarokekî wan wê hebe û kenîn (Destpêkirin 17:17-19; 18: 10-15). Binêre: Destpêkirin 21:1-8; Karên Şandiyan 7:8; Romayî 9:7; Îbranî 11:9.

**Îsraêl** – Du maneyên vê peyvê hene:
1) Navê mirov e: Çaxê Xwedê Aqûbê bavê gelê Îsraêl pîroz kir, ji wî re got: Ji niha û pê ve navê te wê bibe Îsraêl.

2) Di Kitêba Pîroz de navê gel û welatê Cihûyan e. Di dema Îsa Mesîh de Celîle, Cihûstan, Samerya û Pêreya navên herêmên Îsraêlê bûn.

**Îşaya** – Pêxemberekî bi nav û deng bû, yê ku kêm û zêde 700 salan berî bûyîna Îsa Mesîh li Îsraêlê dijiya. Wî li ser Mesîh gelek pêxemberîtî kiriye, behsa bûyîna wî ya bi taybetî û mirina wî ya di ber mirovan de kiriye û ew di Peymana Kevin, di kitêba Îşaya de berhevkirî ne. Binêre: Metta 3:3; Karên Şandiyan 8:30; Romayî 9:27-29.

**Kahîn** – Kahîn ji dûndana (zuriyeta) Harûn ê birayê Mûsa pêxember dihatin. Wan ew goriyên ku gelê Îsraêl dianîn, serjêdikirin û pêşkêşî Xwedê dikirin (Lûqa 1:5-10). Ew di ber gel de li ber Xwedê disekinîn, dua û şefaet dikirin û daxwaza Xwedê bi xelkê didan naskirin. Wan dehyeka (deheka, zikata) dexilê û dehyeka hatina berê erdê Îsraêlê ji xwe re distandin.

Di dema Peymana Nû de di nav civîna mezinên (giregirên) Cihûyan de serekên kahînan jî hebûn. Serokkahîn mezinê hemû kahînan bû û berpirsiyariya civîna giregiran dikir (Metta 26:59-66).

Ji serokkahîn pê ve destûra tu kesî nebû ku bikeve cihê herî pîroz ê Perestgehê û ew jî salê carekê bi tenê diketê, da ku ji bo gunehên gelê Îsraêl afûbûnê bixwaze (Îbranî 9:7).

**Karîndar / Karîndarê her tiştî** – Yê ku dikare her tiştî bike; di Mizgîniyê de bi tenê ji bo Xwedê û Îsa Mesîh tê gotin.

**Kenan** – Welatê Kenanê navê kevin ê welatê Îsraêl e (Karên Şandiyan 7:11; 13:19).

**Kinîşt** – (bi Yewnanî: SÎNAGOG) Cihê civîna ruhanî ya Cihûyan e. Di dema Îsa Mesîh de kinîşt di her bajarê Cihûyan de hebûn, ne bi tenê li Îsraêl, lê di welatên din de jî yên ku Cihû lê diman, hebûn. Cihû ji bo xwendina Tewrat, Zebûr û Nivîsînên Pêxemberan û ji bo perizîna (îbadeta) Xwedê li kinîştê dicivin, bi taybetî roja Şemiyê. Gorî (qurban) li wir nayên serjêkirin. Ji kerema xwe li peyva ‹Perestgehê› binêrin.

**Kirinên mirî** – Karên bi guneh, yanî karên ku di çavên Xwedê de pûç in; karên ku mirov dibin ber bi mirinê (Îbranî 6:1).

**Kitêb** – Hingê kitêb ne wek yên îroyîn bûn, lê nivîsar li ser çerm dihatin nivîsîn û li hev dihatin pêçan.

**Kitêba Pîroz / Nivîsarên Pîroz** – Di dema Îsa Mesîh de Kitêba Pîroz Peymana Kevin bû, yanî Tewrat, Kitêbên Dîrokî, Zebûr û Nivîsînên Pêxemberan. Mizgîniya Xwedê (Încîl), yanî Peymana Nû piştî rabûna Îsa Mesîh hat nivîsîn.

**Kîfas** – Navê din ê Petrûs e (Yûhenna 1:42).

**Kolonî** – Mana kolonî di wê demê de ne mana peyva îroyîn bû. Romayiyan mirovên xwe dibirin derekê, li wir bajarekî nû ava kir û ji derên weha re digotin ‹kolonî›.

**Konê Şahidiyê** – Piştî ku gelê Îsraêl ji Misrê derketibû, Xwedê li serê Çiyayê Sînayê ji Mûsa re got, çawa divê ku cihê perizînê (mesken, cihê rawestanê, sekinê) tevî Konê Şahidiyê bê çêkirin (Derketin 25). Gava wan ew çêkirin, rûmeta Xwedê (mezinahiya Xwedê) ew cih tije kir û bi vî awayî Xwedê dida xuyakirin ku ew bi wan re ye (Derketin 38:21). Konê Şahidiyê û Konê Civînê (Derketin 27:21) yek bû. Gelê Îsraêl li wir diciviya. Silêman jî li Orşelîmê Perestgeh di cihê wî de ava kir. Di Konê Şahidiyê de (û di Perestgehê de jî) du ode hebûn. Di cihê herî pîroz de sindoqa peymana Xudan (Dubarekirina Qanûnê 10:8), yanî sindoqa şahidiyê (Hijmartin 4:5) hebû. Di cihê pîroz de gorîgeha bixûrê, maseyê nanê pêşberiyê û çiradanka zêrîn hebû. Li ber kon, gorîgeha şewitandinê û sîtileke mezin a avê hebû.

**Kortala bêbinî** – (cehnem) Bi Yewnanî ABÛSSOS. Li gora hînkirineke Cihûyan a gelekî kevin, cin li wir girtî tên hilanîn heta ku cezayê xwe bistînin (Lûqa 8:31). Li dawiya demê Îblîs û cinên wî wê ji bo demekê li wir bên girtin (Peyxama Yûhenna 20:1-3), lê ew der ne cihê ezabê herheyî ye.

**Kotel** – Dimen; perçê ku rêberiya gemiyê pê tê kirin.

**Kotî** – Gurî, girî, nexweşiya çerm. Yên kotî li gor Şerîeta Mûsa murdar bûn û nikaribûn nêzîkî mirovên din bin (Metta 8:2; Lûqa 17:12). Binêre: Qanûna Kahîntiyê 13:46.

**Kurê Dawid** – Ji Mesîh re ‹Kurê Dawid› jî tê gotin, ji ber ku pêxemberan digot ku ewê ji mala Dawid bê.

**Kurê Mirov** – (Kurê Însan) Îsa Mesîh bi xwe ev nav li xwe kir. Ev nav di nav Cihûyan de nas bû, ji ber ku ew di kitêba Daniyêl pêxember de heye (7:13-14). Ev xwebinavkirina Îsa bi rengekî nixumandî dide xuyakirin ku Îsa ew Mesîh e, ku diviya bihata, herweha ew dîsa ew e, yê ku Xwedê kir padîşahê erd û ezmên. Binêre: Metta 26:64; Marqos 14:62; Yûhenna 3:13.

**Kurê Xwedê** – Navekî Îsa Mesîh e. Di Kitêba Pîroz de Kurê Xwedê qet bi mana fîzîkî (cismanî) nayê xebitandin. Îsa Mesîh bi mana ruhanî Kurê Xwedê ye. Kurê Xwedê Peyva Xwedê ye û Peyva Xwedê bi xwe Xwedê ye. Kurê Xwedê ji Bav, ji Xwedê tê. Ji berî afirandina (xuliqandina) erd û ezmanan Kur li ba Bav bû. Bav û Kur yek in, daxwaza wan jî yek e, hukumdariya Kur wek a Bav e û Kur, Bav ji mirovan re dide zanîn û eşkerekirin. Kur bi her awayî eşkerebûna Bav e (Lûqa 10:22; Yûhenna 1:1-5; 5:21-23; 10:30; 13:3; 14:9; 16:27-28; 17:1; Îbranî 1:1-4).

**Lavije** – Îlahî, stranên ruhanî yên ku ji Xwedê re tên gotin.

**Lejyon** – Ordiya leşkerî. ‹Lejyon› di ordiya Romayiyan de komeke leşkeriyan di dora 5000-6000an de bû.

**Lêwî** – 1) Yek ji her diwanzdeh kurên Aqûb bû (ji Aqûb re Îsraêl jî tê gotin). Lêwî bi xwe jî yek ji wan her diwanzdeh eşîrên Îsraêl bû (Peyxama Yûhenna 7:7). Mûsa pêxember û birayê wî Harûn, herdu jî ji vê eşîrê bûn. Xwedê Harûn û dûndana (zuriyeta) wî ji bo kahîntiyê hilbijartin. Yên ji vê eşîrê mayî alîkariya van kahînan dikirin (Lûqa 10:32). Ji kerema xwe li peyva ‹kahîn› jî binêrin.
2) Navê şagirtekî Îsa Mesîh e. Jê re Metta jî tê gotin. Binêre: Metta 9:9-13; Marqos 2:14-15.

**Lût** – Biraziyê Birahîm bû. Gava Birahîm çû welatê ku Xwedê soz dabû wî, Lût bi wî re çû. Çaxê ku ew gihîştin wî welatî, Lût bi mala xwe ve çû bajarê Sodomê û li wir di nav mirovên xerab de ma. Beriya ku Xwedê bajarê Sodom wêran bike, wî milyaket şan-

din, da ku Lût û mala wî rizgar bikin, lê jina Lût guhê xwe neda wan û mir. Binêre: Destpêkirin 11:27. 31; 14:1-16; 19:1-38; Lûqa 17:28-32; 2 Petrûs 2:7.

**Lûqa** – Hekîm (textor) û dîrokzan bû. Ew şagirtê Îsa bû, lê ne ji her diwanzdeh şandiyan bû. Wî ‹Mizgîniya li gor Lûqa› û ‹Karên Şandiyan› nivîsiye. Binêre: Kolosî 4:14; 2 Tîmotêyos 4:11; Filêmon 1:24.

**Mala Aqûb** – Gelê (miletê) Îsraêl. Aqûb û Îsraêl yek in. Her diwanzdeh kurên Aqûb, yanî kurên Îsraêl, bûne diwanzdeh eşîrên Îsraêl.

**Mala Dawid** – Di dema Peymana Kevin de Dawid padîşahê Îsraêlê yê herî mezin bû. Piştî wî kurê wî Silêman bû padîşahê Îsraêlê. Ji mal û dûndana (zuriyeta) Dawid gelek padîşah rabûn. Dawid kêm û zêde hezar salî berî bûyîna Mesîh dijiya. Ji kerema xwe li peyva ‹Kurê Dawid› jî binêrin.

**Mala Xwedê** – Ji wî cihê ku Xwedê ji bo xwe hilbijartiye re, Mala Xwedê tê gotin. Di dema Mûsa de konek (Konê Şahidiyê) bû û piştre ji dêla vî konî ve li Orşelîmê Perestgeh hat avakirin û ew bû Mala Xwedê. Ew cihê perizînê (îbadetê) yê gelê Îsraêl bû.

**Manna** – Çaxê Xwedê gelê Îsraêl ji Misrê derxist, anî çolê. Ew der cihekî xurû-vala (viqî-vala), bê şînayî û bê dar bû. Li wir her sibe, ji bo xwarinê Xwedê manna ji ezmanan dibarand û dida wan, çimkî xwarina wan tunebû. Her sibê gelê Îsraêl derdiket derve, diçû, ji bo rojekê manna dicivandin û dikirin nan, dixwarin. Manna tiştekî wek xwîsê xuya dibû. Libên wî girover û spî bûn, wek tovê gijnîjê (kişniş). Û tama wî wek tama nanê şkevayê hingivkirî bû. (Derketin 16; Hijmartin 11:4-9, Îbranî 9:4).

Ji kerema xwe li van ayetan jî binêrin: Yûhenna 6:31-58. Derketin 16:32-34 û Peyxama Yûhenna 2:17.

**Marqos** – Wî ‹Mizgîniya li gor Marqos› nivîsiye û di dayîna Mizgîniyê de alîkariya Barnabas û Pawlos dikir. Binêre: Karên Şandiyan 12:12, 25; 13:13; 15:37-39; Filêmon 24; 2 Tîmotêyos 4:11; 1 Petrûs 5:13.

**Mehder / Mehdervan** – Şefaet; yê ku şefaet an navberiyê dike. Binêre: Romayî 8:26; Îbranî 7:25; 1 Yûhenna 2:1.

**Melkîsedek** – Ew di dema Birahîm de padîşahê Şelîmê (Orşelîmê) û kahînê Xwedê bû. Wî Birahîm pîroz kir û Birahîm jî dehyek da wî. Di Nameya ji Îbraniyan re ew bi Îsa Mesîh tê rû bi rû kirin. Binêre: Destpêkirin 14:17-20; Îbranî 5:6-10; 6:20; 7:1-17.

**Meryem** – Çend jinên bi navê Meryem hene:
1. Diya Îsa (Metta 1:18; Lûqa 1:30; Karên Şandiyan 1:14).
2. Meryema Mejdelanî (Metta 27:56; Marqos 16:9; Lûqa 8:2; Yûhenna 20:1-2, 11-18).
3. Meryema xwişka Merta û Lazar (Lûqa 10:38-42; Yûhenna 11:1-5; 12:1-7).
4. Meryema diya Aqûbê şagirtê Îsa Mesîh (Metta 27:56; Marqos 15:40; 16:1; Lûqa 24:10).
5. Meryema diya Yûhenna-Marqos. Mala wê li Orşelîmê hebû, li wir şagirtên Îsa diciviyan (Karên Şandiyan 12:12).

**Meshkirin** – (Rûnkirin, dohnkirin)
1) Li gor adeta Cihûyan gava yek dibû padîşah, ew dihat rûnkirin. Ev jî dibû nîşana ku ev kes bûye padîşah. Êdî mesîhê Xwedê ew e, ku Xwedê hilbijartiye û nîşan kiriye, yanî Mesîh e (Lûqa 4:18). Ji kerema xwe di bin peyva ‹Mesîh› de bixwînin.
2) Xelkê hingê jî rûn, wek rûnekî (dohn, hetwan) bîhnxweş li serê mêvanên xwe dida (Lûqa 7:46, Zebûr 23:5) û laşên miriyên xwe jî pê rûn dikirin (Lûqa 23:56-24:1).

**Mesîh** – Mesîh peyveke Îbranî ye. Mana vê peyvê bi Îbranî ev e: ‹Yê rûnkirî / yê dohnkirî / yê mesîhandî›. Di Peymana Kevin de, gava yek dibû padîşah, ew dihat rûnkirin. Ev jî dibû nîşana ku ev kes bûye padîşah. Di Mizgîniyê de Mesîh padîşahê seranserê dinyayê ye. Rûnkirina wî ji ezmanan e. Xwedê ew hilbijart û kifş kir, da ku mirovan ji gunehên wan xilas bike. Peyva ‹Mesîh› bi zimanê Yewnanî XRISTOS e. (Gotina ‹Xristiyan› an jî ‹Mesîhî› ji vir tê.)

**Metta** – Bacgir bû. Ew şagirtekî Îsa Mesîh bû û ‹Încîla Metta› jî wî nivîsiye. Binêre: Metta 9:9-13.

**Milet / miletên din** – Di nav Cihûyan de ‹milet› ji bo hemû mirovên ku ne Cihû ne dihat gotin.

**Mizgînî** – (Mizgîniya Xwedê) ‹Încîl› ji qurmê (ra, kok) peyva EUANGELION a bi zimanê Yewnanî tê. Mana wê ‹Mizgînî› ye.

**Molox û Reyfan** – Molox xwedayekî (pûtekî) gelê Amoniyan bû û tê gotin ku Reyfan xwedayekî Misriyan an Aşûriyan bû (Karên Şandiyan 7:43).

**Mur** – Rûnekî bîhnxweş ku wek derman an jî wek parfum hat bikaranîn. Mur tiştekî gelekî biha bû.

**Murdar û paqij / nepak û pak** – (helal û heram)

1. Ji bo Cihûyan ev bi emrên li ser xwarin û vexwarinê, şuştin û rabûn û rûniştinê girêdayî ye. Li gor Şerîeta Mûsa hin cûreyên heywanan heram dihatin hesibandin: Mesele çend cûreyên teyrên ezmanan, beraz, çend heywanên deryayê û hemû qumqumeyan (margîseyan, kêlegirakan). Cesedê mirovan, mirovên kotî û yên bi nexweşiyên çerm (Qanûna Kahîntiyê 11; Dubarekirina Qanûnê 14:3-21). Eger yekî destê xwe li mirovekî kotî an cesed bida, ew êdî murdar (heram) dibû û destûra wî nebû ku nêzîkî mirovên din an jî cihên pîroz bibe. Ji bo ku mirovek dîsa paqij / pak bibûya, qanûnên cûr bi cûr hebûn. Mesele mirov bi gorîdayînê û bi xweşuştinê paqij dibû. Carna lazim bû ku ew biçe ba kahîn, da ku ew bêje, ka ew paqij bûye an na. (Qanûna Kahîntiyê 13; Metta 8:4). Îsa di wan tiştan de guh neda adetên bav û kalan (Marqos 7:1-24). Mesele Îsa jî destê xwe li mirovên kotî da û ew qenc, yanî paqij kirin (Metta 8:1-4). Li gor gotina Îsa Mesîh kifş e ku hemû xwarin helal e (Marqos 7:19).
2. Mirovên ku bi ruhên nepak (cinan) ketibûn jî murdar dihatin hesibandin. Hêza Îsa li ser wan ruhên xerab jî hebû. Wî ew derxistin û mirov qenc bûn (Lûqa 4:30-36).

**Mûsa** – Pêxember û serwerê pêşî yê gelê Îsraêl bû. Ew bi xwe li Misrê hat dinyayê û bû yek ji mezinên Firewn. Dema ku gelê Îsraêl hêsîr û xulamên welatê Misrê bûn, Xwedê ew bijart û gelê Îsraêl bi destê wî rizgar kir. Xwedê bi destê Mûsa Şerîet jî daye

gelê Îsraêl. (Derketin 1-20). Binêre: Metta 8:4; 17:3-4; Yûhenna 5:45-46; Îbranî 3:2-5, 16.

**Nanê pêşberiyê** – (nanê hizûrê) Di Konê Şahidiyê de (Konê Civînê) û piştre jî di Perestgehê de nanê pîroz hebû. Ev nan li ser maseyê zêrîn ‹li pêşberî Xudan› dihatin rêzkirin. Her roja Şemiyê kahînan diwanzdeh nanên şkeva yên bê hevîrtirşk çêdikirin, li ser maseyê zêrîn (sifra zêrîn) datanîn û yên ji heftiya din mayî di cihekî pîroz de dixwarin. Tenê destûra kahînan (kurên Harûn) hebû ku vî nanî bixwin. Ev nan nîşaneke Peymana Xudan bû, ku ew tevî gelê Îsraêl e (Qanûna Kahîntiyê 24:1-9). Binêre: Metta 12:4; Marqos 2:26; Lûqa 6:4; Îbranî 9:2.

**Nard** – (sumbul, mur, zimir) Şînayiyeke Hindistanî ye. Rûnê (dohnê) bîhnxweş jê tê derxistin. Nard gelekî biha bû. Binêre: Marqos 14:3; Yûhenna 12:3, 5.

**Nedir** – (gorî, qurban) Ew tişt in ku ji Xwedê re hatine sozdan (Karên Şandiyan 18:18; 21:23).

Li gor Şerîeta Mûsa (Derketin 13) mirov û heywanên nixurî yên nêr ji bo Xwedê nedir (gorî) bûn (Lûqa 2:23). Heywanên nixurî dihatin serjêkirin û ji dêla her zarokê nixurî ve jî heywanek dihat serjêkirin. Carna mirovan jî pêşkêşek wek nedir ji Xwedê re soz didan (Karên Şandiyan 18:18; 21:23).

**Neman** – Serwerekî leşkerên welatê Sûriyê bû. Ew kotî bû û gava li ser Êlîşa pêxember bihîst, çû ba wî, hêvî jê kir ku wî qenc bike. Êlîşa jê re got ku divê ew here çemê Ûrdunê û heft caran xwe noqî bin avê bike. Neman bi ya pêxember kir û Xwedê ew paqij û qenc kir. Binêre: 2 Padîşah 5:1-27; Lûqa 4:27.

**Nêrevan** – Yên ku diçin cihekî din, hîn dibin û li ser rewşa wî cihî agahiyê didin.

**Nivîsarên Pîroz** – (Nivîsara Pîroz) Di dema Îsa Mesîh de ev bûn: Tewrat, Zebûr, Nivîsînên Pêxemberan. Mizgîniya Xwedê (Încîl) piştî rabûna Îsa Mesîh hat nivîsîn.

**Nînewa** – Bajarekî kevin li aliyê Mosûlê ye. Xwedê Ûnis pêxember şand wir, da ku ew wan ji riyên wan ên xerab vegerîne. Gava

wan peyvên Ûnis bihîstin, bi şîn û girîn tobe kirin û Xwedê li wan bihûrt. Binêre: Kitêba Ûnis 1-4; Metta 12:41; Lûqa 11:30-32.

**Nûh** – Mirovekî rast û bi dilê Xwedê bû. Hemû mirovên demê wî, gelek xerabî û guneh dikirin û Xwedê biryar da ku ew bi tofaneke mezin hemû mirovan helak bike. Xwedê ji Nûh re got ku divê ew gemiyeke mezin çêke, da ku ew û mala wî û ji her heywanan jî cotek pê rizgar bibin. Wî bi ya Xwedê kir û xilas bû. Binêre: Destpêkirin 6:9-10:32; Metta 24:37-39; Lûqa 3:36; 17:26-27; Îbranî 11:7; 1 Petrûs 3:20; 2 Petrûs 2:5.

**Orşelîm** – (Quds, Qudus) Jê re ‹Qudsa Şerîf› jî tê gotin. Ew bajarê Cihûyan ê herî girîng e. Perestgeha Cihûyan li vir bû. 1000 salî berî hatina Îsa, Dawid padîşah Orşelîm ji destê miletê Yebûsiyan derxist.

**Padîşahiya Xwedê / Padîşahiya Ezmanan / Padîşahî** – (Desthilatiya Xwedê, Qiraliya Xwedê) Padîşahiya Xwedê hukumdariya wî ye. Gava mirov li ber Xwedê rabû (Destpêkirin 3), hingê Îblîs ew kir bindestê gunehan (Lûqa 4:5-6, 1 Korîntî 2:8, 15:24-27, 2 Korîntî 4:4). Lê belê Xwedê bi jiyan, mirin û rabûna Îsa Mesîh deriyê Padîşahiya xwe ji mirovan re vekir. Kesên ku bi Mizgîniya Îsa Mesîh bawer dikin, dikevin Padîşahiya Xwedê (Marqos 10:15, Metta 19:16-17, 23-30, 6:33). Hingê Xwedê dibe Padîşahê wan û ew ji bin hukumdariya Îblîs û gunehan derdikevin ( Kolosî 1:13). Ji ber vê yekê tê gotin ku bi hatina Mesîh Padîşahiya Xwedê jî bi awayekî nû di nav mirovan de destpêkiriye. Gava ku Îsa Mesîh careke din bê, hingê Padîşahiya Xwedê wê tam temam bibe.

Metta peyva ‹Ezmanan› ji dêla ‹Xwedê› ve bikar anî, çimkî wî bêtir li gor devokê Cihûyan nivîsî û ne adeta Cihûyan bû, ku navê Xwedê yê pîroz pirr zêde bi kar bînin.. Li derên ku Metta ‹Padîşahiya Ezmanan› nivîsî, Marqos û Lûqa ‹Padîşahiya Xwedê› nivîsîn (Metta 4:17 û Marqos 1:15; Metta 5:9 û Lûqa 6:20; Metta 8:11 û Lûqa 13:28).

**Para pêşî** – Ji kerema xwe li peyva ‹Berê pêşî› binêrin.

**Pawlos** – Ew yekî Fêrisî bû û pêşî dijminê bawermendên Mesîh bû. Îsa jê re xuya bû û ew kir şandiyê ji bo miletên ku ne Cihû bûn

(Karên Şandiyan 9). Ew gelekî li Sûriye, li Enedolû û li Yewnanistanê geriya û Mizgînî dida bihîstin. Tê gotin ku ew li Romayê ji ber baweriya Mesîhî hat kuştin. Pirraniya nameyên di Peymana Nû de, ji aliyê wî ve hatine nivîsîn û gelek serhatiyên wî di kitêba Karên Şandiyan de nivîsî ne.

**Peredank** – Sindoqa bêş û xêran. Xelkê xêr û xêratên xwe dixistin wê.

**Perestgeh** – (Îbadetxane, Mabet) Perestgeh avahiya herî girîng a Cihûyan bû. Silêman padîşah Perestgeha pêşî di bajarê Orşelîmê de ava kir. Ew li Orşelîmê tenê hebû. Gelê Îsraêl dua û perizînên (îbadetên) xwe li wir dikirin û goriyên (qurbanên) xwe li wir serjêdikirin. Perestgeha ku Silêman ava kiribû, piştî 350 salan ji aliyê xelkên Babîlê ve hat xera kirin. Perestgeha ku di dema Îsa de hebû, Hêrodêsê Mezin bi awayekî gelekî spehî çêkir.

Perestgeh çar beş (qisim) bû: Hewş, Hundir, Pîrozgeh û Cihê Herî Pîroz (Pîroziya Pîroz, Pîroztirîn). Perdeyeke mezin Pîrozgeh û Cihê Herî Pîroz ji hev vediqetand. Salê carekê Serokkahîn diçû Cihê Pîroz. Piştî ku gorî dihatin serjêkirin, wî li wir hem di ber gunehên xwe de û hem di ber gunehên gelê xwe de dua dikir û afûbûna gunehan ji Xwedê dixwest. Gava Îsa li ser xaçê mir, ev perda pîroz di nîvî re çiriya (Lûqa 23:44-46).

Di sala 70ê de, piştî bûyîna Îsa Mesîh, fermandarê leşkerî yê Împeratoriya Romayê, Tîtos, Perestgeh ji destê Cihûyan derxist û wêran kir. Ji hingê ve û heta roja îro Perestgeh careke din nehatiye avakirin. Niha civîna bawermendan û bawermend bi xwe perestgeha Xwedê ne (1 Korîntî 3:17; 6:19; 2 Korîntî 6:16; Efesî 2:20-21). Ji kerema xwe li peyva ‹Konê Şahidiyê› binêrin.

**Petrûs** – Jê re Şimûn jî tê gotin. Ew yek ji her diwanzdeh şagirtên Îsa bû. Ew şandiyê Îsa bû û di civîna pêşî ya li Orşelîmê de mirovekî girîng bû. Mana navê Petrûs bi Yewnanî ‹kevir / lat› e. Di Peymana Nû de du nameyên wî hene (1 û 2 Petrûs). Navê wî yê din ‹Kîfas› e (Yûhenna 1:42).

**Peyman** – (ehd) Peyman di nav mirovan de, di nav dewletan de, an jî di nav Xwedê û mirovan de tê girêdan. Di Kitêba Pîroz de, Xwedê çend peyman girêdan: Bi Nûh re (Destpêkirin 9:1-17), bi

Birahîm re (Destpêkirin 17:1-8), bi gelê Îsraêl re (Dubarekirina Qanûnê 29:10-15) û di dawiyê de bi wan hemûyên ku baweriya xwe bi Îsa tînin re peymana xwe girêda. Di Kitêba Pîroz de, peyman yek alî ye. Peymana ku di nav Xwedê û gelê wî de ye, ne peymaneke di nav heval an şirîkên wekhev de ye. Peyman ji aliyê Xwedê ve û li gor daxwaza wî bi mirovan re tê girêdan. Xwedê soz dide ku alîkariya mirovan bike, lê Xwedê çavnêriyê jî dike ka mirov emrên wî bi cih tînin an naynin.

**Peymana Kevin** – Tewrat. Di kitêba Peymana Kevin de Tewrat, Kitêbên Dîrokî, Zebûr û Nivîsarên Pêxemberan hatine berhevkirin. Peymana ku Xwedê bi Mûsa û bi gelê Îsraêl re girêdaye Peymana Kevin e. Ji kerema xwe li peyva ‹peymanê› jî binêrin.

**Peymana Nû** – Încîl; Di kitêba Peymana Nû de Încîl, Karên Şandiyan, Nameyên Şandiyan û Peyxama Yûhenna hatine berhevkirin. Peymana Nû ew peyman e, ya ku Xwedê bi Îsa Mesîh pêşkêşî hemû mirovan dike. Ji kerema xwe li peyva ‹peymanê› jî binêrin.

**Peyv** – (gotin, xeber, qise, kelam, kelîme) Di dema Îsa Mesîh de, di nav Cihûyan de, Peyv û Peyva Xwedê bi mana taybetî dihat bikaranîn. Peyv ew gotin e ku ji devê Xwedê derdikeve û her tişt bi wê diafire û afiriye (çêbû ye). Gava Xwedê erd û ezman afirandin, wî peyva xwe got û ew bi wê çêbûn (Destpêkirin 1, Zebûr 33:6, 9; Yûhenna 1:3; Gotinên Silêman 8:22-31; Îşaya 55:11). Peyv ew gotin e ku ji devê Xwedê derdikeve û daxwaza wî pêk tîne (Zebûr 107:19-20; Yûhenna 3:16; 5:24; 6:68). Peyv jî zanîn û şehrezayiya Xwedê ye (Gotinên Silêman 8). Peyv bi xwe Xwedê ye (Yûhenna 1:1); serkaniya jiyanê ye (1:4, 5:24, 26, 6:57, 68) û Peyv bi şexsê Îsa Mesîh bû xwîn û goşt, hat vê dinyayê (Yûhenna 1:14).

**Peyxam** – Tiştê ku Xwedê ji yekî re eşkere dike, dibêje, an nîşan dide. Binêre: 1 Korîntî 14:6, 26, 30; 2 Korîntî 12:1, 7; Galatî 1:12; Peyxama Yûhenna 1:1.

**Pêxember** – (nebî) Ew mirovên xwedênas bûn. Xwedê bi wan re dipeyivî, da ku ew gotina wî bigihînin mirovan. Di Peymana Kevin de yên herî nas ev in: Mûsa, Êlyas, Îşaya, Yêremya, Ûnis û Daniyêl. Hê gelek pêxemberên din jî hebûn.

**Pîroz** – Xwedê pîroz e, yanî ew bêkêmahî ye, ew yê herî bilind, yê herî rewnaq û yê herî şewqdar e (Lûqa 1:49; Peyxama Yûhenna 4:8). Em dikarin şikir ji Xwedê re bikin, qenc li ser wî bêjin û navê wî pîroz bikin (Efesî 1:3), yanî pesnê wî bikin.

Îsa Mesîh pîroz e (Marqos 1:24; Lûqa 1:35; Yûhenna 6:69), yanî ew jî bêkêmahî ye û ji bo Xwedê hêja ye; ew bi xwe yê Xwedê ye, bi Xwedê re ye û Xwedê ye. Peyva ‹pîroz› rûmet, hêjatî û bilindahiya wî şîrove dike (Metta 23:39; Lûqa 13:35).

Mirovên ku dixwazin nêzîkî Xwedê bibin, divê pîroz bin (1 Selanîkî 3:13; 4:7; 1 Petrûs 1:16), yanî ji Xwedê re veqetandî bin; di ruh, di bîr û baweriya xwe û di jiyana xwe de pak û paqij bin, ji Xwedê re meqbûl bin û li gor peyva wî bikin. Mirov bi hêza xwe bi xwe nikare bigihîje vê pîroziyê, lê belê Îsa Mesîh xwe ji bo şagirtên xwe, xwe kir veqetandiyê pîroz, da ku ew jî bi rastiyê pîroz bibin (Yûhenna 17:19). Îcar bawermend pîroz in, çimkî Xwedê ew bijartine (1 Petrûs 2:9-10).

Carna peyva ‹pîrozkirin› bi mana ‹bimbarekkirinê› ye: Bijartin, duayên qenc kirin, xêrxwestin, parastin.

**Pol** – polik. Perên bronz (mefrek) in, yên herî bêqîmet in. Ji kerema xwe li tabloya li dawiya ferhengokê binêrin.

**Priskîla û Akîlas** – Hevalên Pawlos bûn û di dayîna Mizgîniyê de alîkariya wî dikirin. Binêre: Karên Şandiyan 18:2, 18, 26; Romayî 16:3-5; 1 Korîntî 16:19; 2 Tîmotêyos 4:19.

**Pûtperest** – Kesên pûtperêz. Yên ku hingê ne Cihû bûn, lê ji hemû gelên din bûn ku bawerî bi Xwedayê rast nedianîn an jî diperizîn kevir, dar û tiştên din.

**Qayîn** – Ji kerema xwe li peyva ‹Habîl› binêrin.

**Qorax** – Yekî Lêwî bû; ew bi hin mirovên din li hember Mûsa û Harûn rabû. Xezeba Xwedê hat ser Qorax û hevalên wî, erd vebû ew sax-sax daqurtandin. Binêre: Cihûda 1:11; Hijmartin 16.

**Quriş** – (quruş) Perê hûr; ji kerema xwe li tabloya li dawiya ferhengokê binêrin.

**Rebbî** – Ji bo pisporên Şerîetê dihat gotin. Bi Aramî bi mana ‹Mamoste› ye.

**Rebeka** – Pîreka Îshaqê kurê Birahîm bû. Diya Aqûb û Esaw (Romayî 9:10-13).

**Rexab** – Çaxê gelê Îsraêl welatê Kenan vegirt, li Erîhayê fahîşe bû, lê baweriya xwe bi Xwedê anî û alîkariya nêrevanên gelê Îsraêl kir û rizgar bû. Binêre: Metta 1:5; Îbranî 11:31; Aqûb 2:25.

**Rê, Riya Xudan** – Li ser mirovên ku baweriya xwe bi Îsa Mesîh anîn tê gotin ku ew li ser Riya Xudan dimeşin. Carna mana Rê ‹bawerî› an ‹bi Îsa Mesîh bawerkirin› e.

**Rêşî** – Xwedê ji Mûsa re got ku ew li gelê Îsraêl emir bike ku ew rêşiyan bi dawa cilên xwe ve bikin, da ku çaxê wan bibînin, ew hemû emrên Xwedê bînin bîra xwe û wan pêk bînin û dilê wan ji Xwedê dûr nekeve (Hijmartin 15:37-40). Fêrisiyan rêşiyên cilên xwe gelek dirêj dikirin, da ku xelk bêjin ew gelek bawermend in û nêzîkî Xwedê ne, lê wan ev yek ji durûtiya xwe dikirin (Metta 23:5).

**Roja Amadekirinê** – Roja berî roja Şemiyê bû, yanî roja Înê bû. Di vê rojê de Cihûyan xwe ji bo roja Şemiyê amade dikir, çimkî di roja Sebtê de destûra wan tunebû ku bixebitin.

**Roja Pentîkostê** – Bi zimanê Yewnanî PENTEKOSTÊ, yanî roja pêncî; di Peymana Kevin de Xwedê emir da gelê Îsraêl ku heft heftiyan piştî Cejna Derbasbûnê cejneke din pîroz bikin. Di vê cejnê de gel ji hemû berê xwe yê pêşî diyarî pêşkêşî Xwedê dikirin (Qanûna Kahîntiyê 23:15-21). Îsa Mesîh Ruhê Pîroz ji Bav stand û Roja Cejna Pentîkostê cara pêşî da bawermendên xwe (Karên Şandiyan 2:1-41).

**Roja Şemiyê** – (Roja Sebtê) Ji bo gelê Îsraêl roja Şemiyê rojeke taybetî û pîroz e (Derketin 16:23, 20:8, 11, 31:14-15). Bi Îbranî ŞABAT e. Bi Kurmancî ‹Sebt›, ji Şabatê hatiye. Ji bo Cihûyan, Şabat navê roja heftan e û ya dawiya heftiyê ye. Înê êvarê, gava roj diçe ava, Şabat dest pê dike û heta 24 saetên din dikişîne. Li gor Tewratê (Destpêkirin 2:2-3, Derketin 20:8-11, 35:2) di roja Şabatê

de kar (xebat) qet nayê kirin, ev roja riheti û perizînê (îbadetê) ye (Qanûna Kahîntiyê 23:1-3).

**Roja Vejînê / Roja rabûna miriyan** – (roja qiyametê) Roja Vejînê, roja ku hemû mirov wê ji diyarê miriyan rabin û li ber Xwedê û Îsa Mesîh hesabê kirinên xwe bidin.

**Ruhê Pîroz / Ruhê Xwedê / Ruhê Mesîh / Ruh** – (Ruhê Miqedes, Rûhul Qudus) Ruhê Pîroz bi xwe Ruhê Xwedê ye. Ew li vê dinyayê alîkariya mirovan dike. Ew bi ruhê wan re dipeyive, dilê wan vedike û daxwazên Xwedê bi wan dide naskirin. Piştî hilkişîna Îsa Mesîh a ezmanan, Ruhê Pîroz karê wî li ser vê dinyayê berdewam dike. Di Roja Pentîkostê de, Ruhê Pîroz hat ser bawermendên pêşî û heta îro jî Îsa Mesîh Ruhê Pîroz dide wanên ku baweriya xwe bi Mesîh tînin. Ji kerema xwe li peyva ‹Roja Pentîkostê› binêre.

**Sadûqî** – Di nav Cihûyan de partiyeke olperestan (dînperestan) hebû. Pirraniya endamên wê kahîn bûn. Wan bi her pênc kitêbên Mûsa (yên Tewratê) bawer dikir, lê belê wan bi ser vê de bawer nedikir, ku milyaket û ruh hene û piştî mirinê rabûn (qiyametê) heye.

**Samerî** – Piştî mirina Silêman padîşah, gelê Îsraêl ji hev veqetiya. Rêhoboam padîşah bi sê eşîrên Îsraêl ve li bajarê Orşelîmê û di Cihûstanê de ma. Yêroboam padîşah bi neh eşîrên Îsraêl ve Samerya ji xwe re kir paytext. Bi vê, gelê Îsraêl bû du milet û carna dijminatiya hev kir. Piştî demekê dirêj padîşahê Aşûriyan gelek Îsraêlî ji hawirdora Sameryayê sergom kir ew di bajarên Aşûrî û Mêdan de bi cih kirin (2 Padîşah 17:1-6). Di cihê Îsraêliyên sergomkirî de padîşahê Aşûriyan gelek miletên biyanî (xerîb) bi pûtên wan ve anîn û di welatê Samerya de cihwar kirin (2 Padîşah 18:24-40). Bi vî awayî Cihûyên ku li Sameryayê mabûn, bi miletên pûtperestan re da û stand û piştre ji aliyê Cihûyên ku ji sergombûna Babîlê vegeriyan, wek Cihûyên rast qebûl nehat kirin. Di dema Îsa Mesîh de qet dan û standin di nav Cihû û Sameriyan nebû (Yûhenna 4:9).

**Samûêl** – Pêxemberek bû. Bi destê wî Xwedê Dawid hilbijart û kir padîşah. Binêre: 1 Samûêl 1-7; Karên Şandiyan 3:24; 13:20; Îbranî 11:32.

**Sirgûnbûna Babîlê** – Çaxê Nebûkednêsar padîşahê Babîlê bû, wî gelê Îsraêl ajot û sirgûn kir Babîlê û gelê Îsraêl kêm û zêde 70 salan li wê derê ma.

**Sersed** – (serwerê sedî, serpel) Payeyeke (rutbeyeke) leşkerî. Di ordiya Romayiyan de sersed fermandarê sed leşkerî bû.

**Silêman** – Kurê Dawid û padîşahê Îsraêlê bû. Xwedê gelek şehrezayî da wî û ew gelek dewlemend bû. Wî Perestgeha pêşî da çêkirin. Di Peymana Kevin de nivîsarên wî jî hene (Gotinên Silêman). Binêre: Metta 1:6-7; 6:29; 12:42; Lûqa 11:31; 12:27; Karên Şandiyan 7:47.

**Siyon** – Di Peymana Kevin de navekî din ê bajarê Orşelîmê ye (Romayî 11:26; Îbranî 12:22).

**Sîlas** – Hevalê Pawlos bû û di dayîna Mizgîniyê de alîkariya wî dikir. Binêre: Karên Şandiyan 15:22-18:5; 2 Korîntî 1:19; 1 Selanîkî 1:1; 2 Selanîkî 1:1; 1 Petrûs 5:12.

**Sînay** – Ew çiya ye, ku li wir Xwedê her deh emrên mezin û qanûnên din ên Şerîetê dane Mûsa pêxember. Carna jî bi mînakê û bi mana ruhanî tê fêmkirin (Galatî 4:24).

**Sindoqa Peymanê** – Sindoqeke ji dar û zêrkirî bû, di Konê Şahidiyê û piştre di Perestgehê de bû. Ew û çi ku tê de bûn (nivîsdekên deh emrên mezin, şivdarê Harûn û şerbikê manna), nîşanên peymana Xwedê bi gelê Îsraêl re bûn. Binêre: Derketin 25:10-21; Îbranî 9:4; Peyxama Yûhenna 11:19.

**Sinet, yên sinetbûyî** – Sinet nîşana vê peymanê ye ya ku Xwedê bi Birahîm re girêdaye. Kurekî Cihû di roja 8an de tê sinetkirin. Ji ber vê yekê di Kitêba Pîroz de, gotina ‹yên sinetbûyî› ji bo gelê Îsraêl tê bikaranîn. Peymana Nû kifş dike, ku sinetbûn bêyî ku yekî baweriya xwe bi Îsa Mesîh bîne bê kêr e. Di Nameya ji Galatiyan re de Pawlos ev yek şîrove kiriye. Binêre: Destpêkirin 17:9-14; Derketin 4:25; Yûhenna 7:22; Romayî 2:28-29; Galatî 5:6; 6:15; Kolosî 2:11. Yên sinetnebûyî jî ew in yên ku ne ji gelê Îsraêl in. Di Peymana Nû de ‹sinetnebûyî› ji wan re jî tê gotin ên ku guhdariya Xwedê nakin, yanî bi ya Xwedê nakin.

**Sodom û Gomora** – Di dema Birahîm de, Sodom û Gomora du bajarên Kenaniyan ên nêzîkî Gola Mirî bûn. Xelkên herdu bajaran bi gunehkariya xwe wusa ji Xwedê dûr ketibûn, ku Xwedê ew bi êgir û kewkurtê şewitandin û helak kirin (Destpêkirin 19).

**Sûr û Sayda** – Du bajarên ku li Fînîkya Sûriyê bûn. Îro ew li Lubnanê ne.

**Şagirt** – Yên ku hîn dibin (dielimin). Gelek şagirtên Îsa hebûn. Diwanzdeh ji nav wan hilbijartî bûn. Ew Şandî bûn. Şagirtên Yûhennayê imadkar jî hebûn (Yûhenna 1:34; Karên Şandiyan 19:1-6).

**Şahbanû** – Jina ku bûye padîşah, an jî pîreka padîşah.

**Şahne** – Şahne berpirsiyarê her tiştî yê padîşah an yekî mezin e.

**Şandî** – (qasid, resûl) Bi zimanê Yewnanî APOSTOLOS e. Mana vê gotinê bi Kurmancî ‹yê şandî› ye. Îsa Mesîh ji nav şagirtên xwe diwanzdeh Şandî (resûl) hilbijartin (neqandin) û şandin, da ku Mizgîniya Xwedê bidin miletên dinyayê.

**Şerîeta Mûsa** – (Qanûna Mûsa) Şerîeta Mûsa şerîeta ku di Tewratê de ye. Xwedê ev Şerîet (qanûn, emir û tembîh) li ser Çiyayê Sînayê di nav ewran de bi Mûsa da hînkirin. Carna Şerîet ji hemû kitêbên ‹Peymana Kevin› (Tewrat, Zebûr û Nivîsarên Pêxemberan) re jî tê gotin.

**Şerîetzan** – (qanûnzan, katib, nivîskar) Ew di nav gelê Îsraêl de li ser Şerîeta (Qanûna) Mûsa dixebitîn, Şerîet qenc dizanibûn, bi destan Şerîet zêde (kopî) dikirin û xelk hîn dikirin. Wan jiyana xwe ji bo hînbûn û hînkirina Şerîetê didan û kitêb dinivîsîn. Pirraniya wan ji Fêrisiyan bûn.

**Şimûn** – Jê re Petrûs jî tê gotin. Ji kerema xwe li peyva ‹Petrûs› binêrin.

**Şimşon** – Mêrxas û mirovekî gelekî xurt bû. Xwedê bi destê wî gelek caran Filîstîniyên ku dijminên herî giring ên Îsraêl bûn şkênandin. Binêre: Hukumdar 13:2-16:31; Îbranî 11:32.

**Tabûr** – Ordiya leşkerî. ‹Tabûr› di ordiya Romayiyan de komeke 500-600 leşkeran bû.

**Tekoşîn** – Di Încîlê de ji bo armanceke ruhanî berxwedan û ragirtin e; ne şerê bi çekan e, ne jî şerê li hember xwîn û goşt e, şerê li hember Îblîs û guneh e. Binêre: Efesî 6:10-12; 1 Tîmotêyos 1:18.

**Telant** – 6000 zîv. Ji kerema xwe li tabloya li dawiya ferhengokê binêrin. Di Peyxama Yûhenna 16:21 de giraniya telantê kêm û zêde 59 kîlo ye.

**Textê Îblîs** – (Peyxama Yûhenna 2:13) Li gor ku tê zanîn, ji ber van sedeman weha dihat gotin: / sedemê ku weha tê gotin, dikarin ev tiştên ha bin: 1) Pergama navendeke mezin a pûtperestiyê bû. 2) Li Pergamayê gorîgeheke mezin a xwedayê Yewnaniyan Zews hebû. 3) Pergama navendeke wê yekê bû, ku xelk biperizin Qeyserê Romayiyan ê ku xwedê dihat hesibandin.

**Tixîkos** – Hevalê Pawlos bû û di dayîna Mizgîniyê de alîkariya wî dikir. Binêre: Karên Şandiyan 20:4; Efesî 6:21; Kolosî 4:7; 2 Tîmotêyos 4:12; Tîtos 3:12.

**Tîmotêyos** – Hevalê Pawlos bû û di dayîna Mizgîniyê de alîkariya wî dikir. Binêre: Karên Şandiyan 16:1; 17:14-15; 18:5; 19:22; 20:4; Romayî 16:21; 1 Korîntî 4:17; 16:10; 2 Korîntî 1:1, 19; Filîpî 1:1; 2:19; Kolosî 1:1; 1 Selanîkî 1:1; 3:2, 6; 2 Selanîkî 1:1; 1 Tîmotêyos; 2 Tîmotêyos; Filêmon 1:1; Îbranî 13:23.

**Tîtos** – Hevalê Pawlos bû û di dayîna Mizgîniyê de alîkariya wî dikir. Binêre: 2 Korîntî 2:13; Galatî 2:1-3; 2 Tîmotêyos 4:10; Tîtos 1:4.

**Trofîmos** – Hevalê Pawlos bû û di dayîna Mizgîniyê de alîkariya wî dikir. Karên Şandiyan 20:4; 21:29; 2 Tîmotêyos 4:20

**Ûnis** – Ew pêxember bû. Xwedê ew şand Nînewê, lê Ûnis nexwest bi ya Xwedê bike. Bi gemiyê çû cihekî din, lê Xwedê firtoneke mezin şand ser wan. Gemîvanan ew avêt deryayê û masiyekî mezin Ûnis daqurtand. Ûnis sê rojan di zikê wî masî de ma, dua kir û hingê masî ew ji devê xwe avêt keviya deryayê. Piştre Ûnis

guhdarî kir, çû Nînewayê û peyva Xwedê ji xelkê re got. Binêre: Kitêba Ûnis 1-4; Metta 12:39-41; 16:4; Lûqa 11:29-32.

**Xelîtik** – Peredanka çermîn e, li piştê tê girêdan.

**Xirarî** – Xirarî ji mûyê pezê hîte bi tevnê tê raçandin. Ji wî xirarî hem konan çêdikin û hem jî şêlên kayê çêdikin. Hingê lixwekirina xirarî, nîşaneke şîngirtin û xweşkandinê bû.

**Xudan** – (Reb, Xwedî, Xweyî) Di Kitêba Pîroz de mana Xudan ‹xweyî› (xwedî) ye. Di Kitêba Pîroz de ‹Xudan› sifatek e, ku hem ji bo Xwedê û hem ji bo Îsa Mesîh tê bikaranîn.

**Xwedayî** – Li gor daxwaza Xwedê; bi awayê ku li Xwedê xweş tê (jiyana xwedayî).

**xwedê** – Çaxê xwedê bi herfa biçûk dest pê dike, carna li ser mirovan, carna li ser pûtan û carna jî li ser Îblîs (‹xwedayê vê dinyayê›) dibêje.

**Yewnanî** – 1) Miletê welatê Yewnanistan (Karên Şandiyan 17:4, 12).
2) Di dema Îsa Mesîh de, Cihûyan ji hemû miletên din ên ku ne Cihû bûn re bi gelemperî ‹Yewnanî› digotin (Marqos 7:26; Karên Şandiyan 11:20; 17:17).

**Yêremya** – Pêxemberekî bi nav û deng bû. Ew kêm û zêde 500 salan berî bûyîna Îsa Mesîh li Orşelîmê dijiya. Hingê gelê Îsraêl qet bi ya Xwedê nedikir. Yêremya li wan hilat û ji wan re got, ku tobe bikin. Gelek pêxemberîtiyên wî yên li ser Mesîh û miletên hawirdora Îsraêlê di kitêba Yêremya de di Peymana Kevin de nivîsî ne. Binêre: Metta 2:17; 16:14; 27:9.

**Yêfta** – Hukumdarê gelê Îsraêl û serdarekî leşkeran bû. Binêre: Hukumdar 11:1-12:7; Îbranî 11:32.

**Yêşa** – Bavê Dawid padîşah bû. Îsa Mesîh ji malbata Yêşa bû. Di Peymana Kevin de Îşaya pêxember nivîsî ku Mesîh wê ji dûndana (zuriyeta) Yêşa û Dawid bê. Binêre: Rût 4:17-22; 1 Samûêl 16:1-22; Metta 1:5-6; Lûqa 3:32; Karên Şandiyan 13:22; Romayî 15:12.

**Yêşû** – Kurê Nûn. Piştî mirina Mûsa ew serwerê Îsraêl bû. Bi rêberiya wî gelê Îsraêl welatê Kenanê yê ku Xwedê bi sozdayîna xwe dabû wan vegirt. Serhatiyên wî di Peymana Kevin de di kitêba Yêşû de nivîsî ne. Binêre: Derketin 17:8-13; Hijmartin 13:1-17; Yêşû 1-24; Karên Şandiyan 7:45; Îbranî 4:8. (Di Kitêba Pîroz hin mirovên din jî bi vî navî hene).

**Yûhenna** – 1) Yek ji her diwanzdeh şagirtên Îsa bû (Marqos 1:19). Ew Şandî bû. Wî ‹Încîla Yûhenna› û sê name (mektûb) yên ku di Încîlê de ne û Peyxama Yûhenna nivîsîne.
2) Yûhennayê imadkar, zilamekî din bû. Ji kerema xwe li peyva ‹Yûhennayê imadkar› binêrin.

**Yûhennayê imadkar** – Pêxember û gotinbêjê peyva Xwedê bû (Lûqa 1:13-17; 7:26). Wî tobedar di avê de imad dikirin û gelê Îsraêl ji bo Mesîh amade (hazir) dikir (Lûqa 3:3-20; 7:27). Yûhenna berê gel dida Îsa Mesîh, da ku baweriya xwe bi wî bînin.

**Zarokên Îsraêl** – Gelê Îsraêl, qewmê Îsraêl, Benî Îsraêl.

**Zêr** – Di wergerê de cûreyek pere ye. Ji kerema xwe li tabloya li dawiya ferhengokê binêrin.

**Ziman / Zimanên din** – Carna şagirtên Îsa bi saya Ruhê Pîroz dikarin bi zimanên ku pê nizanin û hîn nebûne bipeyivin. Ev diyariyeke Ruhê Pîroz e. Binêre: Karên Şandiyan 2:5-13; 10:46; 19:1-6; 1 Korîntî 12:10, 30; 13:8; 14:1-25.

**Zîv** – Zîvek mîna heqê roja palekî bû. Ji kerema xwe li tabloya li dawiya ferhengokê binêrin.

**Zîvê mezin** – Hingê zîvekî mezin bi qasî çar zîvan bû. Ji kerema xwe li tabloya li dawiya ferhengokê binerîn.

* * *

**Afirîd** – Mexlûq
**Aştî** – Haştî, silamet
**Averê bûn** – Ji rê derketin
**Avgir** – Sunger
**Bergîdan** – Berdêl, bedel
**Bêpewre** – Kirina bê pîvan û bê raman
**Destpelînk / bi destpelînkê** – Lêgerîna bi destan
**Bihişt** – Cinet
**Cewîz** – Yê ku pirça mî, berx û bizinan diqusîne.
**Cinoyî** – Bi cinan ketî
**Çêr** – Sixêf, dijûn
**Dadbarkirin** – Sûcdarkirin, lomekirin, hukumkirin
**Dadgeh** – Mehkeme
**Dadger** – Hakim
**Dadperwerî** – Edalet
**Desgîn** – Hefsar; ji bo girtina hesp û hêstiran tê bikaranîn
**Dirixandin** – Ji ber vegirtin, parastin, nedan û hilanîn, dan paş, şûn de girtin
**Dîtinî** – Tiştên ku carna di xewê de, carna jî bi hişyarî Xwedê tîne ber çavê mirovan
**Dîwankirin** – Mehkemekirin
**Dûndan** – Zuriyet
**Elalet** – Qerebalix, li hevkombûna gelek mirovan
**Giramî** – Hurmet, siyanet
**Han, handan** – Hatina di ber dilê yekî de, di ber de hatin, teselîkirin
**Hekîm** – Textor, tuxtor
**Hêcet** – Hêncet, bafik
**Hêrekirin** – Hûr û kûr li tiştekî an li yekî nêrîn
**Hêsîr** – Dîl, êsîr
**Ketme** – Paşgotinî, li ser yekî xerab peyivîn, biçûk kirin
**Kustax** – Qure, pozbilind, xwe mezin dîtin
**Lengergeh** – Stirîngeh, kara gemiyan, gemîwergeh
**Letan** – Li benda fersendê man (bi nêta xerab)
**Levakirin** – Parîkirin, parvekirin
**Lê hilatin** – Erz şkandin; deng lê hildan

**Mestere** – Şiklê orîjînal ê tiştekî, nimûne
**Nêrevan** – Yên ku diçin cihekî din, hîn dibin û li ser rewşa wî cihî agahiyê didin (casûs)
**Nifş** – Nesil, nesîl
**Pergal** – rêkûpêkî, rêz û tertîb, sîstem
**Perizîn** – Îbadetkirin, hebandina Xwedê
**Ra** – Reh, kok
**Ragirtin** – Tehmûlkirin
**Raspêr** – Yê ku zarok lê tê spartin
**Rewneqî** – Rûmet, bilindahî, spehîtayî
**Rikin** – Enîşka dîwarê xênî. Kevirê rikin: Kevirê enîşkê
**Semax** – Sebirkirin; xwegirtin; ragirtin
**Seylak** – Sîlik, qûm
**Sitî** – Xanim, xatûn
**Siyanet** – Hurmet
**Strûh** – Qiloç, strih
**Şahbanû** – Jina ku bûye padîşah; jina padîşah
**Şeht / Şil û şeht** – Felcî
**Şihîn** – Mêzîn
**Terpilîn** – Lukumîn, li tiştekî qelibîn, ketin
**Toqulandin** – Li bîr û baweriya yekî qenc nêrîn û bi wan zanîn
**Torîtorî** – Eware, bê ser û ber
**Varîbûn** – Ji rê derketin
**Vejîn** – Rabûna ji nav miriyan, jinûverabûn, qiyamet
**Xewirîn** – Daketin, di nav de çûn
**Xilupilo** – Bê biryar, dudilî
**Xweheyî** – Tebîî, tebîet
**Zimanhilûtî** – Gotina peyvên xweş û xapînok

# *Di dema Îsa Mesîh de pere*

| **Kurdî** | **Yewnanî** | **Dera ku derbas dibe** |
|---|---|---|
| polik | = lepton | Marqos 12:42 |
| quriş | = quadrans | Metta 5:28 |
| çerxî | = assarion | Metta 10:29 |
| zîv* | = dînarion | Metta 18:28 |
| | an draxmê | Metta 17:24 |
| zîvê mezin | = statêr | Metta 17:27 |
| zêr | = mna | Lûqa 19:13 |
| telant | = talanton | Metta 18:24 |

* Zîvek bi qasî heqê roja palekî bû.

**Kurdî**

| | |
|---|---|
| 2 polik | = qurişek |
| 4 quriş | = çerxiyek |
| 16 çerxî | = zîvek |
| 4 zîv | = zîvekî mezin |
| 100 zîv | = zêrek |
| 6000 zîv | = telantek |

**Yewnanî**

| | |
|---|---|
| 2 lepton | = quadrans |
| 4 quadrans | = assarion |
| 16 assarion | = dînarion an draxmê |
| 4 dînarion | = statêr |
| 100 dînarion | = mna |
| 6000 dînarion | = talanton |

Tê di peyvên Xwedê de ronahî, alîkarî û handanê bibînî ...

**... çaxê tu aciz û bê sebir î:**
Metta 6:25-34; 10:26-31; Romayî 5:3-5; Filîpî 4:6-7; Îbranî 6:13-20; Aqûb 5:7-11;1 Petrûs 1:3-5; 5:6-7.

**... çaxê dilê te ne rihet e û tu xeman dixwî:**
Metta 6:19-21; Yûhenna 14:1-14; 1 Tîmotêyos 6:6-10; Îbranî 13:5-6; Peyxama Yûhenna 21:1-8.

**... çaxê tu ne piştrast î:**
Filîpî 4:10-20; 1 Yûhenna 3:19-24.

**... çaxê tu ditirsî:**
Lûqa 8:22-25; Yûhenna 14:27; 16:33; Romayî 8:1; 8:31-39; 1 Yûhenna 4:13-18.

**... çaxê tu nawêrî baweriya xwe ya bi Mesîh eşkere bikî:**
Metta 5:11-12; 10:16-20; Romayî 10:8-15.

**... çaxê tu ji mirinê ditirsî:**
Yûhenna 6:35-40; Romayî 8:18-39; 1 Korîntî 15:35-37; 2 Korîntî 5:1-10; 2 Tîmotêyos 1:8-10.

**... çaxê tu bê beval û hogir î:**
Metta 28:20; Yûhenna 14:15-31; 1 Petrûs 5:7.

**... çaxê tu di tengahiyê de yî û cefayê dikişînî:**
Romayî 8: 31-39; 2 Korîntî 1:3-6; 4:16-18; 12:7-10; Aqûb 1:2-4; Peyxama Yûhenna 2:10.

**... çaxê tu nexweş î:**
Romayî 5:1-5; Aqûb 5:14-15; 1 Petrûs 5:10-11.

**... çaxê tu di nexweşiyeke giran de yî:**
Romayî 8:18-30; 2 Korîntî 5:1-10.

**... çaxê tu li ser mirina dost û hevalan xemgîn î:**
Yûhenna 11:25-26; 1 Korîntî 15:50-58; 1 Selanîkî 4:13-18.

**... çaxê ber tişt ber bi xerabiyê ve diçe:**
Romayî 8:28.

**... çaxê tu bi guneh têyî ceribandin:**
Lûqa 4:1-13; Romayî 12:1-2; 1 Korîntî 10:12-13; Îbranî 2:17-18; 4:14-16; Aqûb 1:12-15; 4:7.

**... çaxê perizîna te ya ji bo Xwedê, ne ji dil e:**
Efesî 3:16-17; Îbranî 10:23-25.

**... çaxê ku divê tu biryarê bidî:**
Aqûb 1:5-8; 1 Korîntî 10:31; Galatî 6:10; Aqûb 1:5-8.

**... çaxê tu hêrs dibî:**
Metta 5:21-24; 5:44-48; Romayî 12:17-21; 1 Korîntî 13; Efesî 4:26-32; Kolosî 3:12-17; Aqûb 1:19-20.

**... çaxê tu dixwazî heyfa xwe bistînî:**
Metta 5:38-42; Romayî 12:17-21.

**... çaxê tu çavnebariyê dikî:**
Aqûb 3:13-18 ; 1 Korîntî 13:1-8.

**... çaxê sûcê te li ber çavê te ye:**
Metta 6:14-15; Lûqa 15; Yûhenna 6:37; Îbranî 4:14-16; 1 Yûhenna 1:5-2:2.

**... çaxê tu difikirî ku Xwedê ji te dûr ketiye:**
Filîpî 4:6-7; Îbranî 10:19-25.

**... çaxê baweriya te sist dibe:**
Metta 7:7-12; Lûqa 17:5-6; Yûhenna 20:24-31; Romayî 4:13-25; Îbranî 11; 1 Yûhenna 5:13-15.

**... çaxê dilê te westiyayî ye:**
Metta 11:25-30; 2 Selanîkî 3:16; Îbranî 4:1-11; 12:1-3.

**... çaxê tu xwe bextreş dibînî û tu li ser her tiştî reş difikirî:**
Yûhenna 3:14-17; Efesî 3:14-21.

**... çaxê bêviya te hatiye şkandin:**
Romayî 15:13; 2 Korîntî 4:16-18; Filîpî 4:10-13; Kolosî 1:9-14; Îbranî 6:9-12.

**... çaxê tu di ber baweriya xwe de ji aliyê mirovan ve têyî redkirin:**
Yûhenna 15:18-16:4; Metta 9:9-13; Lûqa 4:16-30; Efesî 1:3-14; 1 Petrûs 2:1-10.

**... çaxê tu xwe ji her kesî nehêjayîtir dibînî:**
1 Korîntî 12:12-31; Galatî 1:11-24; Efesî 4:1-16; 1 Petrûs 2:1-10.

**... çaxê barê te pirr giran e:**
Metta 11:25-30; 2 Korîntî 6:3-10; Peyxama Yûhenna 22:17.

**... çaxê tu li riya ku diçe ezmên digerî:**
Yûhenna 14:1-6; 3:1-21; Romayî 1:16-17; 5:1-11; 6:20-23; 10: 5-13; Efesî 1:3-14; 2:8-9.

**... çaxê tu nizanî ku çawa dua bikî:**
Metta 6:5-15; Marqos 14:36; Yûhenna 15:7; Filîpî 4:6-7; 1 Selanîkî 5:17; 1 Yûhenna 5:14-15.

**... çaxê tu ji bo kerem û bereketa Xwedê sipasdar î:**
1 Selanîkî 5:16-18.

# Nexş




Di dema Peymana Kevin de Rojhilata Navîn

# Di dema Peymana Nû de Filistîn





Gerên Pawlos ên Mizgîndayînê û rêwîtiya Romayê




**Di dema Peymana Nû de**
**Asyaya Biçûk û hawîrdora wê**

● Cihên heft civînên ku di Peyxama Yûhenna de derbas dibin.

Bandrol uygulamasına ilişkin
usul ve esaslar hakkındaki
yönetmeliğin 5. maddesinin
2. fıkrası çerçevesinde bandrol
taşıması zorunlu değildir.

ISBN 975-462-056-3

9 789754 620566